



**ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN JÎNDAR
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê EDEBIYATA
KURDÎ**

**DI VEGOTINÊN GELÊRÎ DE GUHERÎNÊN DI
NAVBERA CIVAKÊN ETNO-DÎNÎ DE
(NIMÛNEYA KURDÊN ELEWÎ Ê KURDÊN ÊZÎDÎ)**

Amadekar

Hikmettin ATLI

Teza Doktorayê

Şewirmendê Tezê

Doç. Dr. Canser KARDAŞ

Bîngol-2020

ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN JÎNDAR
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û EDEBIYATA
KURDÎ

DI VEGOTINÊN GELÊRÎ DE GUHERÎNÊN DI
NAVBERA CIVAKÊN ETNO-DÎNÎ DE
(NIMÛNEYA KURDÊN ELEWÎ Û KURDÊN ÊZÎDÎ)

Amadekar

Hikmettin ATLI

Teza Doktorayê

Şêwirmendê Tezê

Doç. Dr. Canser KARDAŞ

Bîngol-2020

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI

HALK ANLATILARININ ETNO-DİNİ
TOPLULUKLAR ARASINDAKİ DEĞİŞİMİ
(ALEVİ VE EZİDİ KÜRTLERİ ÖRNEĞİ)

Hazırlayan
Hikmettin ATLI

Doktora Tezi

Tez Danışmanı
Doç. Dr. Canser KARDAŞ

Bingöl-2020

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Hikmettin ATLI tarafından hazırlanan *Di Vegotinên Gelêrî De Guherînên Di Navbera Civakên Etno-Dînî De (Mînaka Kurdên Elewî û Kurdên Êzîdî)* başlıklı bu çalışma, 04.09.2020 tarihinde yapılan tez savunma sınavı sonucunda [oybirliği/oy çokluğuyla] başarılı / başarısız bulunarak jürimiz tarafından *Kürt Dili ve Edebiyatı* Anabilim Dalı'nda Doktora tezi olarak kabul edilmiştir.

TEZ JÜRİSİ ÜYELERİ (Unvanı, Adı ve Soyadı)

Başkan	: Prof. Dr. Hasan ÇİFTÇİ	İmza:
Danışman	: Doç. Dr. Canser KARDAŞ	İmza:
Üye	: Doç. Dr. Mustafa ASLAN	İmza:
Üye	: Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN	İmza:
Üye	: Dr. Öğr. Üyesi Bedrettin BASUĞUY	İmza:

ONAY

Bu Tez, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yönetim Kurulunun/...../ 20..... tarih ve sayılı oturumunda belirlenen jüri tarafından kabul edilmiştir.

Doç. Dr. Abdulnasır SÜT

Enstitü Müdürü



NAVEROK

BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ.....	VI
KURTE	VII
ÖZET.....	VIII
ABSTRACT	IX
PÊŞGOTIN	X
KURTKIRIN.....	XI
DESTPÊK	1
Çarçoveya Têgihî Ya Tezê	9
Çand.....	9
Bawerî.....	13
Etnîsîte	18
Folklor.....	24
BEŞA YEKEM	35
1. WEKÎ DU KOMÊN ETNO-DÎNÎ ELEWÎ Û ÊZÎDIYÊN KURD	35
1.1. Nêrîneke Giştî Li Ser Komên Etno-Dînî Yên Nava Civaka Kurd.....	35
1.2. Êzdiyatiî	46
1.2.1. Demografya û Erdnîgarî	47
1.2.2. Dîrok û Taybetmendiyên Baweriya Êzdiyatiyê.....	50
1.2.3. Di Nava Civaka Êzîdî De Nasnameya Etno-Dînî.....	60
1.3. Elewîtiî.....	67
1.3.1. Demgorafya û Erdnîgarî	67
1.3.2. Dîrok û Taybetmendiyên Baweriya Elewîtiyê.....	73
1.3.3. Di Nava Civaka Kurdên Elewî De Nasnameya Etno-Dînî.....	75
BEŞA DUYEM.....	81
2. DI VEGOTINÊN GELÊRÎ YÊN KURDÊN ELEWÎ Û ÊZÎDÎ DE.....	81
DERÇÛNÊN NASNAMEYÎ Û DÎNÎ.....	81
2.1. Di Vegotinên Gelêrî Yên Kurdên Elewî De Nîşaneyên Nasnameya Etno-Dînî	822
2.2. Di Vegotinên Gelêrî Yên Kurdên Elewî De Motîfên Dînî	94
2.2.1. Xizir/Xidir.....	95
2.2.1.1. Di Nava Termînolojiya Dînî Ya Kurdên Elewî De Xizir/Xidir.....	95
2.2.1.2. Di Vegotinên Gelêrî Yên Kurdên Elewî De Motîfa Xizir/Xidir	99

2.2.2. Sir.....	106
2.2.2.1. Di Nava Termînolojiya Dînî Ya Kurdên Elewî De Sir.....	107
2.2.2.2. Di Vegotinên Gelêrî Yên Kurdên Elewî De Motîfa Sirê.....	109
2.2.3. Heq.....	116
2.2.3.1. Di Nava Termînolojiya Dînî Ya Kurdên Elewî De Heq.....	116
2.2.3.2. Di Vegotinên Gelêrî Yên Kurdên Elewî De Motîfa Heq.....	117
2.3. Di Vegotinên Gelêrî Yên Kurdên Êzîdî De Nasnameya Etno-Dînî	122
2.3.1. Di Vegotinên Gelêrî Yên Kurdên Êzîdî De Motîfên Dînî.....	132
2.3.1.1. Melekê Tawis/Melekê Cebbar.....	133
2.3.1.1.1. Di Nava Termînolojiya Dînî Ya Êzdiyatîyê De Melekê Tawis....	133
2.3.1.1.2. Di Vegotinê Gelêrî Yên Êzîdîyan De Motîfa Melekê Tawis/Melekê Cebbar.....	135
2.3.1.2. Ferwar/Firwar.....	138
2.3.1.2.1. Di Nava Termînolojiya Dînî Ya Êzîdîyan De Ferwar/Firwar.....	138
2.3.1.2.2. Di Vegotinên Gelêrî Yên Êzîdîyan De Motîfa Ferwar/Firwar..	140
2.3.1.3. Xidir-Ilyas/Xidilyas.....	143
2.3.1.3.1. Di Nava Termînolojiya Dînî Ya Êzîdîyan De Xidir-Ilyas.....	143
2.3.1.3.2. Di Vegotinên Gelêrî Yên Êzîdîyan De Motîfa Xidir-Ilyas.....	145
2.3.1.4. Sur.....	148
2.3.1.4.1. Di Nava Termînolojiya Dînî Ya Êzdiyatîyê De Sur.....	148
2.3.1.4.2. Di Vegotinên Gelêrî Yên Êzîdîyan De Motîfa Surê.....	152
BEŞA SÊYEM.....	156
3. ANALÎZ Û BERAWIRDKIRINA HIN METNAN DI KONTEKSTA BAWERİYÊN ELEWÎTÎ Û ÊZDIYATÎYÊ DE.....	156
3.1. Çîroka Elik û Fatik/Alik û Fatik.....	157
3.1.1. Di Konteksta Varyantên Kurdên Elewî û Kurdên Êzîdî De Avaniya Çîrokê.....	158
3.1.2. Di Konteksta Varyantên Çîroka Elik û Fatik De Berawirdkirina Hin Temayên Dînî-Bawerî.....	166
3.2. Efsaneya Şahêmaran.....	171
3.2.1. Varyanta Kurdên Elewî.....	172
3.2.2. Varyanta Kurdên Êzîdî.....	176
3.3. Destana Zembîlfiroş.....	178
3.3.1. Varyantên Kurdên Êzîdî.....	178

3.3.2. Varyantên Kurdên Elewî	185
3.4. Destana Kela Dimdim.....	190
3.4.1. Varyanta Oskar Mann	193
3.4.2. Varyantên Kurdên Êzîdî	199
3.5. Destana Derwêşê Evdî û Edûlê.....	205
3.5.1. Varyantên Kurdên Êzîdî	206
3.5.2. Varyantên Kurdên Mislîman	214
ENCAM	225
ÇAVKANÎ	233
PÊVEK 1.....	243
ÇÎROKÊN HERÊMA PERTEGÊ/DÊRSIM	243
PÊVEK 2.....	296
ÇÎROKÊN HERÊMA MAZGÎRDÊ/DÊRSIM.....	296
PÊVEK 3.....	321
HEVPEYVÎN BI LÊKOLER Û FOLKLORZANÊN KURDÊN ÊZÎDÎ RE	321
JÎNNAME	358

BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ

Doktora tezi olarak hazırladığım *Di Vegotinên Gelêrî De Guherînên Di Navbera Civakên Etno-Dînî De (Nimûneya Kurdên Elewî û Kurdên Êzîdî)* adlı çalışmanın öneri aşamasından sonuçlanmasına kadar geçen süreçte bilimsel etiğe ve akademik kurallara özenle uyduğumu, tez içindeki tüm bilgileri bilimsel ahlak ve gelenek çerçevesinde elde ettiğimi, tez yazım kurallarına uygun olarak hazırladığım bu çalışmamda doğrudan veya dolaylı olarak yaptığım her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve yararlandığım eserlerin kaynakçada gösterilenlerden oluştuğunu beyan ederim.

18/ 09/ 2020

Hikmettin ATLI

KURTE

Berhemên folklorî, bi taybetî jî vegotinên gelêrî di gelek astan de tûşî guherînan dibin ku di van guherînan de diyardeyên mîna erdnîgarî, çand, ziman û dîn/bawerî xwedî bandor in. Ev diyardeyên hanê, di heman demê de di avabûna nasnameyên civakan de jî faktorên bingehîn in. Lewre berhemên folklorî di heman demê de di heqê nasnameya kolektîf a civakan de gelek agahiyan didin me.

Di nava civakên kurd de, elewî û êzîdî du civakên taybet in ku bi rehên xwe yê etnîk ve girêdayî, li derdora baweriyên xwe nasnameyên xwerû ava kirine. Ev nasnameyên xwerû di heman demê de di kategoriya nasnameyên etno-dînî de hatine nirxandin. Di mînakên bi vî rengî de nasname ne bi tenê li dû rehên etnîk û ne jî bi tenê li dû dîn û baweriyê tê diyarkirin lê di encama têkeliya van her du diyardeyan de tê avakirin.

Bi rêya vê xebatê me xwest, em hêmanên ku vê nasnameya xwerû pêktînin, di encama seyra vegotinên gelêrî yê van her du civakan de derxin meydanê. Ji bo vê armancê me hem vekolîna lîteratorî û hem jî xebata sehayê kir. Me xebata sehayê li navenda Dêrsimê û navçeyên wê yê Perteg û Mazgîrdê di nava civaka kurdên elewî de kir. Ji bo herêmanên kurdên êzîdî, ji ber zehmetiyên rewşa wan herêman (girêdayî şer û tevliheviyên civakî), em neçûn sehayê lê me ji derfetên teknolojiyê sûd wergirt û ji dûr be jî hevdiîtinên xwe pêk anîn.

Di vekolîna lîteratorî de me ji gelek xebatên ku heya niha hatine kirin; çî çapkirî û çî jî neçapkirî sûd wergirt. Bi taybetî xebatên ku li Herêma Kurdistana Federal ji aliyê lêkolerên kurd ve di bin banê *Enstîtuya Kelepûra Kurdî* de hatine kirin, xebatên kurdên Kafkasyayê û xebatên kurdologên rojavayî ku di sedsalên 19 û 20an de hatine kirin ji bo teza me gelekî bikêr bûn.

Di vekolîna xwe de me, berhemên folklorî yê van her du civakên etno-dînî hem di asta derçûnên dînî û etnîk de analîz kir û hem jî di pêwendiya hêmanên nasnameyî (dînî-etnîk) de miqayese kir û nîşan da ku heman berhema folklorî çawa di navbera van civakan de diguhere. Di encamê de hate dîtin ku civakên kurdên elewî û êzîdî berhemên folklorî di çarçoveya nasnameya xwe ya etno-dînî de ji nû ve şîrove dikin an jî diguherînin. Her wiha dîn û bawerî di avabûna nasnameya wan de ji faktorên dî bi bandortir e.

Peyvên Sereke: Vegotinên Gelêrî, Kurd, Elewî, Êzîdî, Etno-Dîn

ÖZET

Folklor ürünleri, özellikle de halk anlatıları birçok düzlemde değişime uğrarlar ve bu değişimde coğrafya, kültür, dil ve din/inanç gibi olgular etkilidirler. Bu olgular, aynı zamanda toplumların kimliğinin oluşumunda da aslî faktörlerdir. Bundan dolayıdır ki folklor ürünleri aynı zamanda toplumların kolektif kimlikleri hakkında da bize önemli bilgiler verir.

Kürt toplulukları arasında, alevi ve ezidi kürtler iki özgün toplulukturlar ve bu iki topluluk etnik bağlarına bağlı ama aynı zamanda da inançlarının çevresinde özgün bir kimlik oluşturmuşlardır. Bu özgün kimlikler etno-dini kimlikler olarak değerlendirilmiştir. Bu tür örneklerde kimlik, ne sadece etnik bağlar ne de sadece inanç çerçevesinde belirlenir fakat bu iki olgunun karışımı sonucunda oluşturulur.

Bu çalışmayla amacımız, kimliğin oluşumunda etkili olan bu unsurları, halk anlatılarını takip etmek ve inceleme sonucunda ortaya çıkarmaktır. Bunun için, hem literatür taraması yaptık hem de saha çalışması yaptık. Saha çalışmasını Tunceli merkez ve Mazgirt ile Pertek bölgelerinde Kürt Alevi topluluğu içinde yaptık. Ezidi Kürt bölgeleri için, alanda saha çalışması yapmanın zorluklarından dolayı (savaş ve toplumsal kargaşaya bağlı), söz konusu bölgelere gidemedik. Ancak teknolojinin bize sunduğu imkanlardan yararlandık ve uzaktan da olsa görüşmelerimizi gerçekleştirdik.

Literatür taraması için günümüze kadar yapılmış, basılı ya da basılı olmayan birçok çalışmadan faydalandık. Özellikle Federal Kürdistan Bölgesi'nde *Enstîtuya Kelepûra Kurdî (Kürt Folklorü Enstitüsü)* bünyesinde yapılan çalışmalar, Kafkas Kürtlerinin çalışmaları ile 19. ve 20. yüzyılda batılı kürdologların yaptığı çalışmalar tezimiz için çok faydalı oldu

Tezimizde, bu her iki etno-dini topluluğun folklor ürünlerini, hem dini ve etnik dışavurumlar boyutunda hem de kimliksel (etnik-dini) unsurlar bağlamında karşılaştırdık ve folklor ürünlerinin bu topluluklar arasında nasıl değiştiğini gösterdik. Sonuçta görüldü ki alevî ve ezidi kürtler folklor ürünlerini kendi etno-dini kimlikleri çerçevesinde yeniden yorumlamaktalar. Ayrıca din ve inanç bu iki topluluğun kimlik oluşumunda, diğer faktörlerden daha önemli bir yere sahiptir.

Anahtar Kelimeler: Halk Anlatıları, Kürd, Alevi, Ezidi, Etno-Din

ABSTRACT

Folklore products, especially folk narratives, change on many levels and facts such as geography, culture, language and religion/belief are effective in this change. These facts are also the main factors in the formation of the identity of societies. Therefore, folklore products also give us important information about the collective identity of societies.

Among the Kurdish communities, the Alevi and Ezidi Kurds are two unique communities, and these two communities are tied to their ethnic ties, but also have a unique identity around their beliefs. This unique identity was also evaluated as an ethno-religious identity. In such cases, identity is determined not only within the context of ethnic ties and not only within the framework of faith, but it is created as a result of a mixture of these two cases.

Our aim with this study is to identify and reveal these elements that affect the formation of identity. For this, we both made a literature review and field work. We did the field work in the Kurdish Alevi community in the Tunceli center and Mazgirt and Pertek regions. Due to the difficulties of doing field work in the field (due to war and social turmoil), we could not go to the Kurdish Ezidi regions. However we took advantage of the opportunities provided by technology and held our talks, even from a distance.

For the literature review, we have benefited from many studies, whether printed or not, that have been made to date. Especially in the Federal Kurdistan Region, works within the body of *Enstûtuya Kelepûra Kurdî (Kurdish Folklore Institute)*, the work of Caucasian Kurds and the work of western Kurdologists in the 19th and 20th centuries were very useful for our thesis.

In our thesis, we analyzed the folklore products of both ethno-religious communities both in terms of religious and ethnic manifestations, and compared them in the context of identity (ethnic-religious) elements and showed how the common folklore products have changed between these communities. As a result, it has been seen that Alevi and Ezidi Kurds reinterpret their folklore products within the framework of their ethno-religious identity. In addition, religion and belief have a more important place in the identity formation of these two communities than other factors.

Keywords: Folk Narratives, Kurd, Alevi, Ezidi, Ethno Religion

PÊŞGOTIN

Awayê xwe pênasekirina civakan, nîqaşeke zanistî ye ku di asta dem û mekanê de, girêdayî diyardeyên mîna bingeha etnîk, terîtorya, ziman/zarava, dîn/bawerî û çandê diguhere. Girîngiya van diyardeyan ji bo civakê mijareke konjektora ye û ev yek di encama polîtîkayên wê civakê bi xwe de di nava van diyardeyan de hiyerarşiyek derdixe meydanê. Lewma dibe ku civakek li ser bingeha zimanî xwe pênase bike û dibe ku li ser bingeha terîtoryal an jî li ser bingeha dîn û baweriyên. Di nava civakên kurd de jî hin komên etno-dînî hene ku, pênaseyên wan yên nasnameyî yên di heqê xwe de, hem nîqaşa li ser nasnameya kurdî kûrtir dikin û hem jî nîqaşa li ser nasnameya wan bi xwe derdixe meydanê.

Dema ku em li awayê rûdana van nîqaşan dinihêrin, tê dîtin ku ev nîqaş di asta civakê de girêdayî faktorên konjektora demê reng digire û di asta lêkolera de, pirî caran li dû prensîbên zanistî bi rê ve naçe. Di vê çarçoveyê de civakên elewî û êzîdî yên kurd, ji aliyê şênberiya vê nîqaşê ve du mînakên gelek girîng in. Wekî îlaweyek li vê nîqaşê, em ê berê xwe bidin metnên folklorî ku li wê derê ji tesbîtên derveyî bêtir, tesewîrên civakî derdikevin pêş me ku ev yek meyla civakê ya girêdayî faktorên dem û mekanê dide der.

Di nava civaka kurd de û di xebatên kurdolojîyê de, xebatên li ser vegotinên gelêrî bi piranî di asta berhevkarîyê de û wekî binbeşeke wêjeya gelêrî hatine birêvebirin. Lê aliyê bingehî yê van berheman; tîkiliya wan ya bi çand, bawerî û nasnameya civakan re ye. Em bi rêya vê xebatê hewil didin nîşan bidin ku folklor û bi taybetî jî vegotinên gelêrî platformeke veguhêz in ji bo îdîayên nasnameyî yên civakan. Di mînaka civakên kurdên elewî û kurdên êzîdî de jî, ji ber taybetmendiyên nasnameya etno-dînî, ev aliyê vegotinên gelêrî bêtir derdikeve pêş. Lewre ew di her merheleyê de mohra xwe ya dînî û nasnameyî li berhema folklorê dixin.

Di pêvajoya xebat û nivîsîna vê vekolînê de, hevsera min a hêja her tim li kêleka min bû û bi piştgirî û tîgehîştina xwe ya fireh, nehişt ku ez dîsîplîn û motîvasyonê xwe hunda bikim. Spasiyên xwe yên ji dil pêşkêşî wê û keça xwe ya delal dikim. Di vê pêvajoyê de, min ji tecrubeyên şewirmendê xwe, mamosteyê hêja **Canser Kardaş** gelekî sîd wergirt û spasiyên xwe yên ji dil bo cenabê wî pêşkêş dikim. Ji bo alîkariyên bi qîmet yên mamosteyên Zanîngeha Munzurê; **İbrahim Tosun, Ali Koç, Sibel Taş û Yılmaz Kaval** spasiyên xwe pêşkêş dikim.

Hikmettin Atlı

KURTKIRIN

- Bnr. : binêrin
c. : cild
ç. : çap
g. : gotar
g.n. : gotara navborî
h.b. : heman berhem
h.g. : heman gotar
j. : jimare
k. : koçî
bz. : berî zayinê
pz. : piştî zayinê
r. : rûpel
hwd. : her wekî din
yd. : yên dî
wer. : werger
vgz. : veguhêz
z. : zayînî
ss. : sedsal
IBV. : İsmail Beşikçi Vakfı

DESTPÊK

Di destpêka teza xwe de em ê pêşî di heqê mijara tezê, armanca tezê, sînorên tezê, arîşeyên tezê, rêbazên tezê, jêderên sereke yên tezê û plana tezê de agahiyan bidin. Piştî van agahiyan em ê bi rengekî kurt behsa çarçoveya têgihî ya teza xwe bikin. Di binê vê sernavê de em ê di heqê hin têgihên girîng de, ku mijara teza me li derdora wan digere, agahiyên termînolojîk bidin. Ev têgih; çand, bawerî, etnîsîte û folklor in.

Mijara Tezê

Mijara teza me; di vegotinên gelêrî yên kurdên êzîdî û kurdên elewî de tesbîtkirina nîşaneyên nasnameya etno-dînî ye. Ji ber ku folklor bi hemî cureyên çanda gelêrî re têkildar e em dikarin bi rêya berhemên folklorî di heqê civakek de bigihîjin gelek agahiyan. Nasname yek ji van qadan e ku di berhemên folklorî de der diçe. Mijara vekolîna me di asta teorîk de têgihên folklor û nasname ne. Me di vê tezê de van her du têgihan hem di nava termînolojiya giştî ya antropolojî, etnolojî û civaknasiyê de hem jî di çarçoveya civakên kurdên elewî û kurdên êzîdî de vekolaye.

Nasname, diyardeyeke pirtebeqeyî ye û dîn, ziman, çand, bawerî, bingehên etnîk hin ji van tebeqeyan in ku pêkve nasnameyê ava dikin. Nasname çendî têgiheke tesewirî be, civak jî ew çend ji avaniyên şênber pêktê. Folklor di navbera vê rewşa şênber û tesewirî de wekî amrazek kar dike. Lewre me di vekolîna xwe da folklorê van her du civakan ji xwe re kiriye bingeh da ku em di heqê tesewirên wan yên nasnameyî de bigihîjin agahiyan.

Civakên kurdên elewî û kurdên êzîdî ji ber nîqaşên li ser nasnameya wan û ji ber cihê wan yê taybet yê di nava nasnameya giştî ya kurdî de, her tim di navenda nîqaşên civakî, siyasî û zanistî de cih girtine. Vekolînên li ser wan di asta teorîk de hem di heqê têgiha nasnameyê de bergehên nûh derdixe pêş me û hem jî me ber bi nêrîneke kûrtir û firehtir ya li ser nasnameya kurdî ve dibe. Di vê vekolînê de em ê hewil bidin ji perspektîfa folklorê nêzî vê nîqaşê bibin û di heqê nêrîna wan ya derbarê 'xwe' de û ya derbarê 'dîkeyên xwe' de bigihîjin agahiyên objektîf.

Têgihîştineke tam ya nasnameyî bi xwe re pêwîstiya miqayeseyê tîne. Lewre ku pênameya tu civakê bi serê xwe di mewcûdiyeta wê ya îzole de nikare bê dîtin. Hebûna her koma civakî bi derdora wê re bi wate ye. Ji ber vê yekê me di teza xwe de ji bo miqayeseyê baş di hin mînakên de serî li civakên cîranên kurdên elewî û kurdên êzîdî daye da ku tesewira wan ya nasnameyî bi awayekî zelaltir bê fêmkirin.

Girîngiya Tezê

Nasnameya kurdî di gelek xebatên kurdnasiyê de wekî nasnameyê etnîk/netewî û hevpar ji bo hemî civakên ku di binê vê nasnameyê de têne dîtin hatiye bikaranîn. Her çendî ku ev nêrîn bingeha xwe ji realîteya dîrokî digire jî ev nayê wê wateyê ku civaka kurd civakeke monolîtîk e û hemî beşên wê vê realîteya dîrokî di heman dereceyê de pesend dikin. Lewre ku di nava civaka kurd de gelek nasnameyên cuda û etnîk hene. Girîngiya vê xebatê ev e ku em ê bi rêya berhemên folklorî hewil bidin nîşan bidin ku nasname di asta civakên etno-dînî de bi çi rengî tê tesewirkirin û ev civak xwe di nava nasnameya giştî de bi çi rengî bi cih dikin.

Armanca Tezê

Armanca vê vekolînê ev e ku; em bi rêya rûberkirina berhemên folklorî nîşan bidin ku heman berhemên folklorî dema ku di nava civakên kurdên elewî û kurdên êzîdî de têne vegotin, tesewirên nasnameyî çawa li der dikevin. Gelo di pêwendiya berhemên folklorî de têgihîştina nasnameyî ya van her du civakan çawa xwe dide der? Her çendî ku ev her du civak di hin mecrayan de xwe di binê banê giştî yê nasnameya kurdî de dibînin jî carina ew bi hesasiyet ji kurdbûnê bêtir nasnameya xwe ya etno-dînî derdixin pêş û xwerûbûna civak, dîrok û xaka xwe li ser vê nasnameyê însa dikin. Gelo ev her du civak di mijara îdîayên nasnameyî de berhemên folklorî bi çi rengî bi kar tînin an jî dikin navgîn bo tesewirên xwe yê nasnameyî?

Di vê xebatê de em ê bi rêya vekolînên li ser berhemên folklorî hewil bidin nîşan bidin ku têgiha nasnameya hevpar ya kurdî, di eslê xwe de di nava komên curbecur de, yê ku vê nasnameyê pêktînin, xwedî wateyên cuda ye. Her çendî ku rewşenbîr û lêkolerên kurd, li hember cîhana derveyî, her tim bi dîskûrsa

‘nasnameya hevpar ya kurdî’ li hember biçûkdîtin û kêmxistinê bersiv dane jî, di binê vê ‘nasnameya hevpar’ ya kurdî de gelek nasnameyên etnîk û dînî û carina zimanî û xakî hene ku tevlêbûna wan ya nava nasnameya hevpar li gorî konjektora û berjewendiyên van civakan diguhere. Bi rêya vê xebatê em ê hewil bidin nîşan bidin ku gelo refleksên nasnameyî di kîjan konjektoran de bi çi rengî li der dikevin. Gelo dîn di pênasayên nasnameyî de heya ku derê xwedî rol e? Gelo cudahiya mezhebî rê lê vedikin ku civakek bi tevahî ji xwe re nasnameyeke nûn ava bike? Gelo li kêleka dîn, rola ziman/zarava, çand û xakê heya kîjan radeyê diyarker e?

Bi rêya vê vekolînê em ê hewil bidin nîşan bidin ku berhemên folklorî bi çi rengî dibin bersiv ji van pirsan re.

Sînoren Tezê

Xebatên li ser folklorê civakan, ji ber nezelaliya di sînoren folklorê de, ji sedî sed nikare bibe xwedî sînoren diyar. Lewre ku folklor ji ber xwezaya xwe di navenda gelek dîsîplînên civakî de ye. Lê di vekolînên zanistî de bisînorkirina mijarê ji bo zelalkirin û gihîştina armancên şênber girîng e. Di xebatên kurdnasiyê de, ji ber kêmbûna metodolojiyê ev pêwîstî bi piranî hatiye îhmalkirin. Lewre vekolîna zanistî berî her tiştî bi tesbîtkirina sînoren vekolînê pabend e.

Ev vekolîn wekî sînora xwe di nava civakên kurd de, bi civaka kurdên elewî û kurdên êzîdî bi sînora kiriye. Di asta termînolojîk de jî sînoren vê xebatê nasnameya etno-dînî ya van her du civakan e. Nîşaneyên nasnameya etno-dînî di berhemên folklorî yên van civakan de hatiye vekolîn. Ji bo ku rewşa taybet ya van her du civakên etno-dînî baş bê dîtin, di hin pêwendiyên de miqayese di nava nasnameya giştî ya kurdî de hatiye kirin. Ji ber ku ev her du civak ji alî xak û baweriyê ve di erdnîgariya kurdan de wekî du civakên ser sînora yên ji hev dûr li pêş me ne, di hin rewşan de miqayeseya berhemên folklorî di pêwendiya civaka kurdên misliman/sunî de hatiye kirin.

Arîşeyên Tezê

Di vê xebatê de zehmet bû ku em xwe bigihînin çavkaniyên resen. Ji alî xebatên ku hatine kirin, me ji kuliyateke berfireh sûd wergirt û hem ji xebatên

kurdnasên biyanî yê ku di sedsalên 19 û 20an de hatine kirin sûd wergirt û hem jî me xwe gihand xebatên ku lêkolerên kurd kirine.

Ji bo xebata sehayê dema ku em li Dêrsim, Perteg û Mazgîrdê xebitîn, gelek zehmetiyên ewlehî û yê fîzîkî çêbûn ku em xwe bigihînin çavkaniyên resen. Di nava vê beşa civaka kurd de, ji ber asta jorîn ya asîmîlasyonê, hem di axaftina zimanê kurdî de (kurmancî/kirmancî) hem jî di parastina hafizeya folklorî de gelek arîşe li pêş me derketin. Di hin rewşan de me xwe gihand çavkaniyên resen lê red dikirin ku biaxivin û carina jî bi îsrar dixwestin ku bi tirkî biaxivin.

Saziyên fermî yê dewletê yê wekî Mala Extiyaran ya Dêrsimê (Tunceli Huzur Evi) li pêş me bûn asteng ku em bi kesên li wê derê re hevdîtin çê bikin. Li cihê ku me xwe digihand jêderan, kesên ku diaxivîn bi piranî xwe bi 'Bûyerên Dêrsimê' yê salên 1937-1938an bi sînor dikirin. Lewma ji gelek kesên ku me bi wan re hevdîtin kirin, bi mijara me re eleqedar kêr berhem derketin. Lê dîsa jî me wan ji bo analîzên xwe kirin bingeh.

Ji bo xebata sehayê ya li herêmên Şengal û Sîncarê, me plan kir ku em herin li wan deveran xebatê bikin lê ji ber aloziya siyasî û leşkerî ya wê herêmê ev plana me pêk nehat. Lê me dîsa jî xwe gihand hin xebatan ku li wê sehayê ji aliyê kesên pispor ve hatine kirin. Xebatên ku di binê banê *Enstîtuya Kelepûra Kurdî*, ji aliyê *Xeyrî Şengalî* û *Dawid Mirad Xetari* ve hatine kirin di vî warî de ji bo me gelek bi kêr hatin. Her wiha me bi rêya înternetê ji wê herêmê bi lêkoler û folklornasên wekî Celîlê Celîl, Arshad Hamid Miho, Kovan Xankî, Dawid Mirad Xetari û Xeyrî Bozanî re hevpeyvînan kir û me ev hevpeyvîn di beşa pêvekê de li teza xwe zêde kirin. Ev xebatên orjînal ku me xwe gihande wan û hevpeyvînan ku me kirin bo teza me gelek sûdemend bûn. Me jî şîrove û analîzên xwe yê li ser berhemên folklorî yê wê herêmê di çarçoveya van berhem û hevpeyvînan de kir.

Rêbaza Tezê

Li gorî Kenneth S. Goldstein; folklor wekî dîsîplînek ne xwedî rêbazeke taybet ya vekolînê ye. Goldstein îfade dike ku; rêbazên ji aliyê folklorzanan ve

têne bikaranîn, bi piranî aydê antropolojiya çandî ne.¹ Folklorzanên Amerîkayê yên wekî Alan Lomax, Richard Dorson û Herbert Halpert di xebatên sehayên folklorê de îşaret bi rêbazên etnografyayê kirine.² Arnold Van Gennep îfade dike ku folklorzan dikarin rêbazên dîrokzanan bikar bînin û bi rêya vekolîna li ser berhemên ku berê hatine nivîsîn li ser materyalên folklorî bixebitin lê bi şertê ku ew materyal hê jî zindî bin û di nav gel de hebin.³ Goldstein jî destnîşan dike ku xebatên folklorê li ser du esasan dimeşin. Yek jê xebatên teorîk in û ya din jî xebatên sehayê ne.⁴

Di vê tezê de me jî hem rêbaza vekolîna lîteraturî û hem jî xebata sehayê tetbîq kiriye. Di vekolîna lîteraturê de me pirtûk, xebat û gotarên ku ji aliyê pisporên qadê ve hatine nivîsîn ji xwe re kirin bingeş. Bi taybetî xebatên ku ji aliyê kurdnasên biyanî ve di sedesala 19 û 20an de di nava civakên kurdên elewî û kurdên êzîdî de hatine kirin, materyalên wan yên folklorî berhev kirine, palpişteke qehîm ya vê tezê ne. Her wiha xebatên ku ji aliyê lêkolerên ku ji nava vê civakê bi xwe hatine kirin, di heqê têgihîştina nasnameyî ya van civakan de gelek daneyan dan me.

Di vê vekolînê de, di xebata sehayê de, rêbazên hevdiîn, hevpeyvîn û qeydgirtin hatine bikaranîn û ev rêbaz li herêmên kurdên elewî yên Dêrsimê hatine tetbîqkirin. Ji bo herêmên kurdên êzîdî jî ji ber hin astengiyên herêmî em neçûn herêmên Şengal û Şêxanê lê me bi gelek berhevkar û lêkolerên wê herêmê re bi rêya înternetê hevpeyvîn çêkirin, me ev hevpeyvîn qeyd kirin û bi dû re deşîfre kirin û li dawîya tezê zêde kirin.

Beriya ku em herêma vekolînê helbijêrin me bi kesên pispor yên herêmê re hevdiîn kirin û bi rêya wan xwe gihande kesên çavkanî. Ev kesên çavkanî hem çavkaniyên berhemên folklorî bûn û hem jî pêşwayên dîmî bûn ku di heqê nasnameya herêmî de xwedî têgihîştineke civakî bûn. Me di hevdiînan de wekî pêwîstiyê rêbaza hevdiînê, ji wan pirsan kirine û bersivên wan qeyd kirine. Herêmên ku me xebata sehayê lê tetbîq kirin, Dêrsima navend, Perteg û Mazgîrd

¹ Kenneth S. Goldstein, *Sahada Folklor Derleme Metodları*, Milli Folklor Araştırma Dairesi Yayınları, Çev: Ahmet E. Uysal, 2. Baskı, 1983, Ankara, r. V.

² H.b., r. 6.

³ Arnold Van Gennep, *Folklor*, 'Halk Edebiyatı Dersleri', Çev. Pertev Naili Boratav, Tarih Vakfı Yayınları, 2. Basım, 2011, İstanbul, r. 163.

⁴ H.b., r. 10.

in. Her çendî ku ji ber asta asîmîlasyonê gelek zehmet bû ku em xwe bigihînin çavkaniyên resen jî, me dîsa hewl da û li gundên van her du bajarokên ku şênîyên wan kurdên elewî ne hevdîtinên xwe kirin û qeydên xwe girtin.

Piştî xebata sehayê, berhevkirina daneyan û deşîfrasyona qeydan; ji bo analîza daneyan, wekî rêbaz, rêbaza miqayeseyê hatiye bikaranîn. Rêbaza miqayeseyê navgîneke hevpar ya gelek zanistan e. Van Gennep qeyd dike ku, rêbaza miqayeseyê çawa ku di encama şerê xwe yê bi rêbaza dîrokzanan re serkeftinê bi dest xistiye, wisa jî îro ev rêbaz, di sehayê xebatên folklorê de jî bûye rêbazeke sereke.⁵ Me jî di xebata xwe de analîzên xwe yên di navbera civaka kurdên elewî û kurdên êzîdî de li ser vê esasê kir.

Jêderên Sereke yên Tezê

Di teza xwe de me ji gelek jêderan sûd wergirt. Ji bo çarçoveya teorîk ya vekolînê, me ji xebatên ku di sehayê folklor, antropolojî, etnolojî û civaknasiyê de hatine kirin sûd wergirt. Ji bo sehayê folklorê, xebata ku bi edîtorîya Öcal Oğuz hatiye amadekirin, ya bi navê *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar I, II, III, IV*⁶ ji bo me bû çavkaniyeke girîng. Di sehayê antropolojî, etnolojî û civaknasiyê de xebata ku bi edîtorîya R. Jon McGee û Richard L. Warms hatiye amadekirin, ya bi navê *Anthropological Theory*⁷ ji bo me bû jêdereke referansê. Ji bo nîqaşên li ser têgiha nasnameyê û nasnameya etno-dînî, me Anthony D. Smith û xebata wî ya *Ulusların Etnik Kökeni*⁸ wekî jêdereke referansê hilbijart.

Di heqê bawerî û folklorê kurdên êzîdî de xebata Philip G. Kreyenbroek û Xelîl Cindî Reşow ya bi navê *Tanrı Ve Şeyh Adî Kusursuzdur*⁹ û xebata Xeyrî Şengalî ya bi navê *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre*¹⁰ bûne bingeh ji bo

⁵ H.b., r. 166.

⁶ Öcal Oğuz (yd), *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar I, II, III, IV*, Geleneksel Yayıncılık, 2006, 2014, 2015, 2014, Ankara.

⁷ R. Jon McGee-Richard L. Warms (ed), *Anthropological Theory*, Texas State University-San Marcos, McGraw-Hill Press, 2008, America/NewYork.

⁸ Anthony D. Smith, *Ulusların Etnik Kökeni*, Dost Yayınları, Çeviren: Sonay Bayramoğlu, Hülya Kendir, 1. Baskı, 2002, Ankara.

⁹ Philip G. Kreyenbroek-Xelîl Cindî Reşow, *Tanrı Ve Şeyh Adî Kusursuzdur*, Avesta Yayınları, Çeviren: İbrahim Bingöl, 1. Baskı, 2011, İstanbul

¹⁰ Xeyrî Şengalî, *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre*, Weş. Enstituya Kelepûrî Kurdî-Senterî Duhok, Ç. 1. 2011, Duhok

teza me. Li ser bawerî û folklora civaka kurdên elewî xebata Daimi Cengiz ya bi navê *Dizeleriye Tarihe Tanik Dersim Şairi Sey Qaji*¹¹ û xebata Caner Canerik ya bi navê *Dersim Masallari*¹² bûne çavkaniyên girîng yê referansê ji bo me.

Ji bilî xebatên nivîskî me ji herêman kurdên elewî û kurdên êzîdî bi gelek kesan re hevdiştin kirin. Ji herêma kurdên êzîdî pisporên çand û folklora êzîdîyan yê wekî Celîlê Celîl, Dawid Mirad Xetari, Arshad Hamid Miho, Kovan Xankî û Xeyrî Bozanî bûne jêderên sereke ji bo xebata me. Bêguman gelek pisporên di jî hene di nava vê civakê de ku me karîbû ji wan sûd werbigirta lê ji ber tevliheviya civakî û siyasî ya vê herêmê me nikaribû xwe bigihanda wan. Ji herêma kurdên elewî, me ji navçeyên Perteg û Mazgîrdê, bi çîrokbêj û pisporên folklora herêmê re hevdiştin kirin. Ji van herêman Sultan Yıldırım, Şirin Hasbay, Makbule Taşkın, Hüseyin Bayır û Hüseyin Erdoğan bûne jêderên girîng ji bo xebata me. Me di heqê jêderên xwe yê devkî de di beşa çavkaniyê de agahî dane.

Plana Tezê

Ev tez ji destpêk, sê beşan, encam û pêvekê pêk hatiye. Di destpêkê de tevî mijar, armanc, girîngî, sînor, arîşe, rêbaz, jêderên sereke û plana tezê, ji bo çarçoveya teorîk ya tezê, di heqê têgihên çand, bawerî, etnîsîte û folklorê de nîqaşeke literatûrî û termînolojîk hatiye kirin.

Di beşa yekem de me di binê sernava, “Wekî Du Komên Etno-Dînî Elewî û Êzîdiyên Kurd” de, pêşî bi kurtî behsa civaka kurd û pêkhatiyên wê di konteksta dîrok, erdnîgarî, ziman û baweriyê de kiriye. Di vê beşê de binê vê sernavê de me bi sernava ‘Êzdiyati’ behsa civaka êzîdî, demografya û erdnîgariya wan, dîrok û taybetmendiyên baweriyê êzdiyatiyê û di nava civaka êzîdî de nasnameya etno-dînî kiriye. Dîsa di vê beşê de wekî binbeşek, bi navê ‘elewîti’ me behsa demografya û erdnîgariya civaka elewî, dîrok û taybetmendiyên baweriyê elewîtiyê û di nava civaka kurdên elewî de nasnameya etno-dînî kiriye.

Di beşa duyem de di binê sernava “Di Vegotinên Gelêrî Yê Kurdên Elewî û Êzîdî De Derçûnên Nasnameyî û Dînî” de me pêşî behsa derçûnên nasnameya etno-dînî ya civaka kurdên elewî kiriye û di berhemên folklorî de nîşan daye ku

¹¹ Daimi Cengiz, *Dizeleriye Tarihe Tanik Dersim Şairi Sey Qaji*, Horasan Yayınları, 1. Baskı, 2010, İstanbul

¹² Caner Canerik, *Dersim Masallari*, Dönüş Yayınları, I. Baskı, 2019, İstanbul

ew xwe bi çî rengî pênase dikin an jî binav dikin. Dîsa di vê beşê de wekî palpiştekan bo nasnameya etno-dînî me wekî binbeş di binê sernava ‘Di Vegotinên Gelêrî Yên Kurdên Elewî De Motîfên Dînî’ de, li derdora têgihên Xizir, Sir û Heq, bala xwe daye vegotinên wan yên gelêrî ku ev motîfên taybet in bi baweriyaya elewîtiyê di çî astî de derdikevin pêş me. Me her têgihê pêşî di nava termînolojiya wan ya dînî de daye da ku em girîngiya wê ya dînî bo vê civakê têbigihîjin û bi dû re me bala xwe dayê ku ew di berhemên folklorî de çawa derdikevin pêş me. Dîsa di vê beşê de me wekî binbeşek bi sernava “Di Vegotinên Gelêrî Yên Kurdên Êzîdî De Nasnameya Etno-Dînî” de bala xwe daye berhemên folklorî ku ew tê de xwe çawa û bi kîjan têgihan pênase dikin. Wekî binbeşeke vê, me bi sernava ‘Di Vegotinên Gelêrî Yên Kurdên Êzîdî De Motîfên Dînî’, li derdora têgihên Melekê Tawis, Firwar, Xizir û Sir vekolînekê di nava berhemên wan yên folklorî de kiriye. Me her têgiha dînî pêşî di nava pêwendiya wê ya dînî de, bi termînolojiya dînî ve têkildar daye û bi dû re bala xwe dayê ku ew têgih di berhemên folklorî de çawa derdikevin pêş me.

Di beşa sêyem de me di binê sernava “Analîz û Berawirdkirina Hin Metnan Di Konteksta Baweriyên Elewîtiyê û Êzîdiyatîyê De” li derdora çend berhemên folklorî yên hilbijartî hem berawirdiyê kiriye û hem jî tehlîla van metnan daye. Ev berhemên folklorî bi vî rengî ne: Çîroka Elik û Fatik, Efsaneya Şahêmaran, Destana Zembîlfiroş, Destana Kela Dimdimê û Destana Derwêşê Evdî û Edûlê. Sedema hilbijartina van metnan ew e ku ew ev metnan, de ji aliyê xwendina navbera civakên etno-dînî ve gelek daneyan didin dest me. Me di van metnan de ji bo ku guherînan navber civakên etno-dînî baş bêne dîtîn, miqayeseyê bi metnên kurdên sunî re jî kiriye.

Di encamê de me li gorî daneyên ku em gihîştîne enacmên ku me ji wan derxistîye di çarçoveya nasnameya etno-dînî ya civakên kurdên elewî û kurdên êzîdî de pêşkêş kiriye.

Di pêvekê de me xebatên ku li sehayê kirine, hevdiştinên xwe, hevpeyvînên xwe û berhevkarîyên xwe, bi rengekî nivîskî li tezê zêde kirine. Me berhevkarîyên sehayê Pertegê wekî Pêvek 1, berhevkarîyên sehayê Mazgîrdê wekî Pêvek 2 û hevpeyvînên ku me bi berhevkar û vekolerên êzîdî re kiriye jî wekî Pêvek 3 bi nav kiriye û li tezê zêde kiriye. Kesên ku me di xebata sehayê de ji wan sûd

wergirtiye, bi wan re hevdiînan û hevpeyvînan kiriye, wekî jêderên devkî hatine binavkirin û me di para çavkaniyê de her yek ji van jêderên devkî, bi sîmgeyek kod kiriye. Ev sîmge wekî J.1., J.2. hatine bikaranîn. Di dirêjahiya tezê de dema ku me van jêderên devkî refere kiribe, me di jêrenotan de bi koda wî/wê ew nivîsiye.

Çarçoveya Têgihî Ya Tezê

Ji destpêka xebatên folklorê heya roja îroyîn, çî xebatên ku rasterast di sehaya folklor û vegotinên gelêrî de hatine kirin, çî jî xebatên ku di sehayên din yên zanistê, wekî etnolojî, antropolojî, lînguîstîk, civaknasî, dîn û dîrokê de hatine kirin lê bi rengekî temasî mijarên folklorê kirine; bi giranî li ser du xetan pêş ketine. Yek ji van xetan; aliyê edebî-estetîk yên vegotinên gelêrî ye, yanê aliyê wan yê hunerî/wêjeyî û muzîkal. Ya din; aliyê wan yê ku bi van zanistên navborî re têkildar e.

Her çendî ku hin folklornasan, armanca xebatên folklorê di xeta pêşîn de diîtine û vekolîna li ser berhemên folklorê, tenê di nava sînorên zanista folklorê de îcra kirine jî, ku di vê nêzîkatiyê de nêrînek bi vî rengî heye ku berhemên folklorê bi tenê divê di çarçoveya wan ya edebî û muzîkal de bîn vekolîn; gelek folklornasên kevin û nûjen, xwe bi vê armancê bi sînor nekirine û her tim li aliyên cuda yên berhemên folklorê nihêrîne, vekolane û şîrove kirine. Em dikarin bibêjin ku xebatên folklorê yên pêşîn ku bûne palpişt ji bo avakirina folklorîstîkê jî, di xeta duyem de hatine kirin û folklor bûye pirek di têgihîştina taybetmendiyên çandî, dînî û etnîk yên civakan de.

Di teza xwe de me jî nuqteya nêrîna xwe di xeta duyem de bi cih kir ku ev yek, ravekirinek di heqê têgihên mîna çand, bawerî, etnîsîte û folklorê de pêwîst dike. Lewre folklor, wekî diyardeyek, di navenda sêgoşeya ku ji aliyê çand, etnîsîte û baweriyê ve hatiye çêkirin de cih digire. Ev vekolîn, di asta têgihî de li ser bingeha têgihên; çand, bawerî, etnîsîte û folklorê hatiye avakirin.

Çand

Ji du sed salî vir ve, pênaseya herî berfireh û karîger ya ji bo çandê, ji alî Sir Edward Brunett Tylor ve hatiye kirin:

*“Çand; hemî zanîn, bawerî, huner, exlaq, urf û edet û gelekî qabilyet û elimînan digire nava xwe ku ev hemî ji aliyê mirovê ku endamê civakêkê ye hatine hînkirin.”*¹³

Di vê pênaseya berfireh de gelek xal hene ku li serê nîqaş dikarin bêne kirin. Li dû vê pênaseyê, wekî ku Daniel B. Gates jî îşaret pê dike; çand her tiştê ku hatiye hînkirin digire nava xwe.¹⁴ Ev rewş, di destpêkê de, têkiliya aktîf ya mirov û xwezayê an jî mirov û derdora fîzîkî nîşan dide. Hînbûyîna mirov ya destpêkê di encama vê têkiliyê de rû dide. Bêguman ji bilî mirovan gelek heyinên di yên kûvî hene ku, bi xwezayê re di nava têkiliyê aktîf de ne û her wiha ji her tevgerên wan em dikarin tê derbixin ku, ew jî eger ku însiyakî be jî wekî mirovan xwedî endîşeya mayendebûn û berdewamiya neslî ne lê em nikarin vê pratîka van heyinên kûvî wekî çand bi nav bikin. Di vê nuqteyê de nêrîna Ralph Linton, cudahiya di navbera pratîkên mirov û pratîkên heyinên di de aşkere dike:

*“Çand bi awayê mîraseke biyolojîk nayê neqilkirin, tê hînkirin.”*¹⁵

Eger ku çand tê hînkirin, wekî ku di gelek pênaseyên di de jî derdikeve pêş me, ev tê wê wateyê ku ev aktîvîteyê civakî ye. Lewre li vê derê mebest ne ew e ku yek di encama pratîka xwe ya takekesî de, ji hin tiştan ders derdixe û hîn dike. Ev aktîvîteyê civakî ye ku civak ji bo ewlehiya xwe ya madî û manewî, bi gelek awayên curbicur neqlî endamê xwe dike. Wekî ku Haviland jî îşaret pê dike; çand ji têgihîştin, nîrx û nêrînên hevpar re tê gotin ku civakê wan parve dike û di nava endamê xwe de belav dike.¹⁶

Li gorî Wallerstein çand; di sîstema nûjen ya cîhanê de qada şerê îdeolojîk e. Civak ji bo ku xwe ji civakên di veqetînin çandê bi kar tînin.¹⁷ Li vê derê çand wekî ku tê xuyakirin ne wekî hêmaneke lihevçûnê lê wekî hêmaneke cudakar tê dîtin.

¹³ Sir Edward Burnett Tylor, ‘The Science of Culture’, *Antropological Theory* (Ed. R. Jon McGee-Richard L. Warms), Texas State University-San Marcos, McGraw-Hill Press, 2008, America/NewYork, r. 28.

¹⁴ Daniel G. Bates, *21. Yüzyılda Kültürel Antropoloji*, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, Çev. Süavi Aydın, 1. Baskı, 2009, İstanbul, r. 6.

¹⁵ William A. Haviland (yd), *Kültürel Antropoloji*, Kaknüs Yayınları, Çev. İnan Denis Erguvan Sarıoğlu, 1. Baskı, İstanbul, 2008, r. 113.

¹⁶ H.b., r. 103.

¹⁷ Vgz. Canser Kardeş, *Dengbejlik Geleneği ve Aşık Edebiyatı İle Karşılaştırması*, Teza Doktorayê ya Neçapkirî, Zanîngeha Firat, 2013, Elazığ, r. 2.

Her çendî ku di pêşketina mirovahiyê de an jî di tekamula çandî de teknoloji diyardeya bingehîn be jî li gorî Lewis Henry Morgan, tekamula çandî ne ji pêşketina teknîkê îbaret e. Di heman demê de di etîkê (nirxên civakî) de jî pêşketin pêktê.¹⁸ Yanê her hêmana çanda madî, di heman demê de rê li fikrên nûh vedike ku bi vê yekê mirovahî ber bi mirovê îroyîn hatiye. Li vê derê divê em pêşketina etîkê, ne di wateya îroyîn de bibînin an jî bi nirxên îroyîn şîrove nekin. Wekî mînak; mirovxurî an jî yamyamtî, têkiliyên cinsî an jî ensest, çêkirina qanûnan û parastina mafên xwezayî. Bêguman ji bo mirovê prîmîtîv û yê îroyîn di heqê wateya van têgihan de ferqeke mezin heye. Pêşketina etîkê di heman demê de bi xwe re sazîbûnên di warê çandî, qanûnî û baweriyê de jî tîne. Henry Morgan wiha îfade dike:

“Tekamula çandî li ser du xetan pêş ketiye. Yek îcad û keşif e ya duyem jî pêşketina di warê sazîbûnê de.”¹⁹

Tekamulparêzî di xwezaya xwe de fikra bilindbûn û nizimbûna hin çînan, hin çandan heta hin netewan tîne bîra mirov. Lewre her çendî ku darwinizm bi aliyê tekamula biyolojîk gelek deng daye û asoyek nûh li pêş zanistê vekiriye jî, darwinizma civakî, di pêşketina fikrên etnosentrîk û nijadperest de gelekî caran wekî paşxaneyê zanistî hatiye bikaranîn û îmajê wê ya negatîf heye.

Julian Steward di dîroka vekolînên çandê de bêtir bi îfadekirina têgiha *herêmên çandî* tê zanîn. Steward îdîa dike ku karakterîstîka her çandê di dîrok û derdora wê de veşarî ye. Digel ku ew hebûna hin qanûnên giştî red nake jî. Ev nêrîn, di heman demê de nêrîna Boass e ku dîroka yekane ya civakê û derdora fîzîkî ya yekane ku ew di navê de dijîn, wekî dînamîzma bingehîn ya çandê dibîne.²⁰

“Herêma çandî, ji wê herêma cografîk re tê gotin ku, çend civakên ji hev cuda lê xwedî heman rêbazên jiyînê yên lihevçûyî tê de dijîn... Zimanê wan cuda be jî ew heman çandê parve dikin”²¹

Têgiha herêmên çandî, her çendî bêtir bi erdnîgariyê re têkildar hatibe bikaranîn jî, di heman demê de ekoyeke (dengvedaneke) wê ya dîrokî jî heye ku

¹⁸ Lewis Hnery Morgan, ‘Ethnical Periods’, *Anthropological Theory*, r. 43.

¹⁹ H.b., r. 43.

²⁰ H.b., r. 22.

²¹ W. A. Haviland., *Kültürel Antropoloji*, r. 321.

ev yek me ber bi relativîzma çandî ve dibe. Relativîzma çandî ku ji alî antropologê pêşeng Franz Boass ve hatiye pêşniyazkirin, tê vê wateyê:

*“Lêkoler, bawerî û kevneşopiyên civakê divê di nava konteksta çanda wan bi xwe de bibîne, ne ya xwe. Yanê bi nêrîneke etnosentrik vekolîn nabe.”*²²

Têgiha herêmên çandî, pêşî di xebatên etnolojiyê de ji bo polînkirina daneyan hatiye bikaranîn. Di herêmeke çandî de, lihevçûnên çandî ji cudahiyan çandî zêdetirin. Bi piranî li herêmên bi vî rengî, navendeke çandî an jî bi gotina Kroeber klîmakseke çandî heye û derdorên wê hene. Lê dibe ku herêm û klîmaksên vê herêma çandî di nava periyodên dîrokê de biguherin û her wiha di nava vê herêma çandî de hin ‘çandên marjînal’ jî hebin.²³

*“Eger ku herêma çandî ji aliyê hêmanên ku ji dereke diyar belav dibin were têgihîştin, fêmkirina wê dê hêsantir be. Sînorên wê li wî cihê dest pê dike an diqede ku taybetiyên herêmek di zêdetir dibin... Sehayek, herêmek an jî hevkevneşopiyek, unîteyêke dîrokî ye ku ji aliyê hêmanên hevpar ve tê diyarkirin. Lê dibe ku ew ji aliyê entegrasyonên civakî-çandî ve gelek bi cure be lewre hejmarek konfigurasyonên herêmî û pêşketinên dîrokî pêktên ku ev bi piranî ji bandorên dîrokê diqewimin.”*²⁴

Steward li kêleka têgiha herêmên çandî behsa tîp û hawzayên çandî jî dike ku ev yek ji bo xebatên li ser çandê û her wiha folklorê jî girîng in.²⁵

A. L. Kroeber, erdnîgariyê û derdora fîzîkî di pêşketina çandê de wekî faktoreke bingehîn nabîne.

*“Erdnîgarî û derdora fîzîkî ji alî medeniyetê ve hatine bikaranîn lê ne faktorek in ku reng dane medeniyetê an jî îzaha medeniyetê bi wan bê kirin.”*²⁶

Antropolog û civaknasên wekî Spencer û Durkheim, wilo difikirîn ku hin yasayên civakê hene ku ew ji mudaxeleya takekesî bêrî ne. Ew nayên çêkirin lê çê dibin. Spencer yekem kes e ku di teşekula çandê de têgiha *superorganîk* bi kar tîne. Li dû nêrîna wî; ev superorganîkbûn bêguman bi pêdiviyên civakê re têkildar

²² D. G. Bates, *21. Yüzyılda Kültürel Antropoloji*, r. 14-15.

²³ Julian Steward, *Theory of Culture Change*, University of Illinois Press, Urbana Chicago, 2. Edition, 1973, London, r. 80-82.

²⁴ H.b., r. 87.

²⁵ W. A. Haviland, *Kültürel Antropoloji*, r. 28.

²⁶ A.L. Kroeber, ‘Eighteen Professions’, *Anthropological Theory*, r. 131.

e. Ew îdîa dike ku di nava civakê de hêzeke şênber heye ku rê vedike ku di heqê hin guherînan de hêzeke civakî çê bibe. Çêkirina qanûnan jî bi vê yekê re têkildar e. Her çendî ku hin caran ev qanûn û civak li hev nekin jî heta her çendî ku hin aktîvîte takekesî bêne xuyakirin jî. Spencer vê nêrfîna xwe bi vê vecîza xwe temam dike: Civak çêdibe ne ku tê çêkirin.²⁷

Di gotara xwe ya navdar; *What Is A Social Fact (Diyardeya Civakî Çi Ye)* de Durkheim, bi baldarî datîne meydanê ku çawa sîstem û pêdiviyên derveyî îradeya şexsî, di her warê jiyana civakî de hene bêyî ku em çavdêrî bikin ku ferdên civakê pêgir an ne pêgirên wan sîsteman e. Di vê gotarê de Durkheim hewl dide bipeyitîne ku sîstemeke civakê heye ku ne girîng e kes wê dişopînin an naşopînin. Ew bi renegekî superorganîk kar dike, xwedî qanûnên xwe ye ku em dikarin bi vê rêyê li serê vekolînan bikin.²⁸ Di vê nuqteyê de Kroeber jî wekî Durkheim difikire. Li gorî wî medeniyet ji ferdên ku wê pêktînin cudatir e. Medeniyet bêyî mirovên ku di teşekula wê de cih digirin heye.²⁹

Nîqaşên li ser çandê, ne tenê di navenda dîsîplenekê de cih digirin. Gelek dîsîplînên civakî vê têgihê kirina navenda vekolîna xwe û ji ber vê yekê jî ev têgih xwedî sînoreke firawan e.

Bawerî

Li gorî Durkheim dîn, yekûna nîrxên exlaqî û baweriyên kolektîf yên civakekê ye.³⁰ Her çendî ku em îro ji têgiha dîn, hin wateyên cuda derbixin jî, bêtir dînen navendî û mezin werin bîra me jî, antropolog di vê mijarê de li rehên ku dîn ji serê derketine dinihêrin. Yanê bawerî û nîrxên ku civak wan ji xwe re wekî pîroz dibînin.

Tylor di vê mijarê de wiha dinivîse:

“Hemî bawerî û dîn, hewldana li heyatê mayîna mirovan didin der û di vê yekê de serkeftî ne. Ji anîmîzmê heya xirîstiyaniyê hemî baweriyên wê daxwaza civakê pêkanîne”³¹

²⁷ Herbert Spencer, ‘The Social Organism’, *Anthropological Theory*, r. 14.

²⁸ Emile Durkheim, ‘What Is a social Fact’, *Anthropological Theory*, r. 73-79.

²⁹ A.L. Kroeber, ‘Eighteen Professions’, *Anthropological Theory*, r. 130.

³⁰ Vgz., D. B. Gates, *21. Yüzyılda Kültürel Antropoloji*, r. 442.

³¹ E. B. Tylor, ‘The Science of Culture’, *Anthropological Theory*, r. 41.

Hewldana mayendebûna mirovan, di heman demê de dînamîka bingehîn ya çandê ye jî. Lewre ji bo ku mirov û civak li heyatê bimînin, pêdivî bi afirandina sîstemên maddî û manewî hene. Ev yek jî di her du astan de sazîbûnê pêwîst dike ku çand jî ji vê nuqteyê derdikeve meydanê. Lewre bawerî û dîn, ji afirandina çandê ne bêrî ne. Ew di nava prosesa afirandina çandê de cihekî taybet digirin. Haviland jî li ser heman fikrê ye:

“Dîn parçeyekî ye di nava sîstema çandî de ku nêrîna civakê ya li cîhanê dide der.”³²

Qaîdeyên dînî, her çendî ku di hin xaçerêyan de li gorî hin herêman rastî hin guherînan hatibin jî, teqez in û ji herêma ku ew derketine, yanê ji herêma çandî ku ew ji navê derketine, gihîştine gelek herêmên cuda. Wekî mînak, xirîstiyani jî herêma rojhilata navîn derketiye, lê bi taybet li ewropa, afrîka, amerîka heta asyaya rojhilat belav bûye. Ev herêm ji hev gelekî dûr in û xwedî çandên ciyawaz in lê bi rêya dîn belkî her ku çûye çanda wan nêzîkî hev bûye. Di eslê xwe de dînen emperyal çanda civakan nêzî hev kirine. Ew wekî networkeke gerdûnî dixebitin û rêbazên jiyana civakan dişibînin hev. Her wiha li şûna herêmên an jî mekanên ku nûneriya çand û polîtîkayê dikin, ew navendên nûh diafirînin û ji wan navendan bawerî belav dibin. Hobsbawm di heqê vê taybetmendiya dînan de wiha dibêje:

“Dîn di avakirina komunyônên hevpar de, rêbazeke kevin û ceribandî ye. Ew di navbera gelek mirovan de pevgerîdana biratiyê çê dike ku wekî dîn aliyên van mirovan/bawermendan yê hevpar tune. Di hin awayên dînan de, yê wekî mûsewîtiyê, dîn wekî nîşaneyê endamtiya koma mirovan hatiye destnîşankirin.”³³

Li gorî Gellner jî dema ku komeke etnîk daxilî nava dînekî mezin dibe, (Mebesta Gellner ji van komên etnîk bi piranî komên etnîk yê ji hin aliyan ve bi dezavantaj e) bi çandên mezin û bi taybetî bi çandên nivîsê re têkilî datîne, ev yek rê vedike ku ew grûba etnîk hin avantajan bi dest bixe û sîstema xwe ya civakî li gorî pêdiviyên cîhana medenî reorganîze bike û bi vî rengî li ser lingan bimîne.³⁴

³² W. A. Haviland. *Kültürel Antropoloji*, r. 642.

³³ E. J. Hobsbawm, *Millîyetler ve Milliyetçilik*, Ayrıntı Yayınları, Çev., Osman Akınbay, 6. Baskı, 2017, İstanbul, r. 94.

³⁴ Vgz., E. J. Hobsbawm, H.b., r. 97-98.

Li vê derê tiştê ku ji bo mijara me girîng e ev e ku, bawerî û dînên civakan di heman demê de dibin cureyê nasname ji bo wan. Ew xwe bi wan baweriyên pênasê dikin, di çarçova wan baweriyên de li cîhanê dinîyê û jiyana xwe ya rojane, helwestên xwe yên civakî, polîtîk û estetîk di çarçoveya îdeolojiya dînî an jî wan baweriyên mîstîk de îfade dikin.

“Sîstemên dînî-bawerî, taybetmendiyên bingehîn yên civaka ku ew ji navê derketine didin der.”³⁵

Bêguman her bawerî çawa ku bi şertên herêmî an jî çandî ve girêdayî be, bi heman pîvanê girêdayî ye bi dem an jî serdema ku ew ji navê derketiye.

Li gorî Haviland; di sed hezar salên dawîn de ku mirovahî tê re derbas bûye, li ser rûyê cîhanê tu komê mirov tune ye ku ne xwediyê dîn an jî baweriyek be.³⁶ Dîn û bawerî ji gelek aliyên ve karîger in li ser helwestên civakê. Du tiştên sereke ku ji civakên prîmîtîv mane ji me re, bi baweriyên wan re têkildar in. Yek jê mît an jî efsaneyên wan in ku em bi rêya analîzên pir bi detay ji nava vegotinên gelêrî yên îroyîn dikarin wan derbixin û ji nû ve însa bikin. Ya dî jî perestgeh an jî hin avahiyên pîroz yên aydê baweriyên kevnan in ku bi rengê heya îro hatine parastin. Ev her du hêman di heman demê de rê lê vedikin ku em di heqê civakên kevnan de bigihîjin agahiyan, tesewira wan ya cîhanê hîn bikin, di heqê ziman û mîmariya wan de hin tiştan fêr bibin û li serê şîroveyan bikin.

Mîtên ku di gelekî çandan de di heqê bingeha jiyana de tene gotin dibin alîkar ku ferd û civak li ser rûyê erdê cihê xwe diyar bike. Yanê ew bi rêya van vegotinên pîroz li hember jiyana û xwezayê xwe bicîh dikin. Ji bo xwe palîşteke qehîm bi dest dixin û ji wê nuqteya nêrînê li cîhanê dinîyê. Ferd an jî civak ji cihê ku lê ye ne bawer be hingê xetereyê mezin li dorê heye. Li gorî Haviland; dîn, navgîneke kontrolkirinê ye li ser sîstema civakê. Bi afirandina kozmogoniyek nîzamî, armanc dîke ku helwestên nîzamî yên mirovan teşwîq bike.³⁷

³⁵ G. E. Swanson, *The Birth of the Gods*, The Origin of Primitive Beliefs, University of Michigan Press, 1960, Ann Arbor, r. 62.

³⁶ W. A. Haviland, *Kültürel Antropoloji*, r. 644.

³⁷ H. b., r. 678.

“Erka pêşîn ya dîn û baweriyay; dûrxistina endîşeyê ji nava mirovan, belavkirina hîsa pêbaweriyê û bi vî rengî alîkirina mirovan e da ku karibin bi heqîqeta jiyane re serî derkevin.”³⁸

Li gorî James Frazer, bingehên dîn û folklorê di gelek waran de digihîjin hev.³⁹ Xala ku dîn û folklorê herî zêde nêzî hev dike, mît an jî efsane ne. Îro em hin ji vanan wekî çîrok an jî hikayeyên gelêrî jî bi nav dikin. Haviland di vê mijarê de wiha dinivîse:

“Çîrokên gelêrî, bi piranî wekî piştgirekî ne ji sîstemên dînî re. Di gelek cihên Tewrat û Qurânê de mesajên îlahî bi çîrokan hatine xurtkirin.”⁴⁰

Dema ku em ji nuqteyê nezera folklorê binihêrin, ne pêkan e ku em hemî çîrokên gelêrî bi vî rengî îzah bikin. Heta em dikarin bibêjin ku vegotinên gelêrî bi giştî, ne di xizmeta sîstema baweriyê de ne.

Di mijara mît û efsaneyan de antropologê navdar, Strauss, xebatên girîng kirine. Her çendî ku Strauss jî wekî gelek antropologên di di navbera mît û çandê de hebûna têkiliyekê qebûl dike jî, ew di vê mijarê de ji antropologên di cuda dibe. Li dû fikra Strauss, mît; derçûnên konseptên bingehîn an jî fikrên bingehîn yên mirovan e. Ew temsîla fikrîyata gerdûnî dikin. Ji erdnîgariya xwe û dîroka xwe, çanda xwe bêrî hene û wateyên gerdûnî yên binhişî di xwe de dihevin. Her wiha Strauss balê dikêşe serê ku tu mîtek bi serê xwe nayê têgihîştin. Ew divê di nava sîstema mezin ya mitolojiyê de bê fikirîn. Lewre ew di roja îroyîn de bi perçeyên ji hev cuda li pêş me bin jî, ya rast her mît perçeyêke sîstema mîtan ya ji xwe mezintir e.⁴¹

Di vê mijarê de yek ji lêkolerê girîng Malinowski ye. Malinowski, ji çand an jî sîstemeke mezin ya mîtan bêtir, balê dikişîne ser trajediyên mirovan. Li dû nêrîna Malinowski; dîn ne ji spekulasyon û tefekurê lê ji trajediyên rastîn yên jiyana mirovan der dikeve. Mebesta Malinowski ji trajediyê; bûyerên mezin wekî mirin, xela, afat, erdhej, rabûna avê, lehî û hwd. ne. Bi nêrîna wî; bawerî û dîn, ji jêknegiriya realîte û texeyulên mirovan derdikeve. Li dû vê yekê, dîn an jî bawerî

³⁸ H.b., r. 646.

³⁹ James Frazer, *Dinin ve Folklorün Kökleri*, YKY Yayinlari, Çev. Mehmet H. Doğan, 1. Baskı. 2017, İstanbul, r. 405.

⁴⁰ W. A. Haviland, *Kültürel Antropoloji*, r. 678.

⁴¹ Claude Levi Strauss, ‘Four Winnebago Myths: A Structural Scetch’, *Anthropological Theory*, r. 340.

di vê valahiyê de derdikevin ku mirov ji van bûyerên derasa re îzaheke mantiqî-aqlî nikarin bibînin.⁴²

Ev hemî nêrînên li ser bawerî û dînan, bêguman her yek jê aliyêke vê fenomenê ronî dikin. Bi ya me; ya herî girîng ew e ku dîn, di nava çandekê de derdikevin û reng digirin. Her çendî ku îro hin bawerî an jî pîrozî di bin siya dînen emperyal de çilmisî bin jî girîngiya wan ya çandî û nasnameyî hê jî li pêş e. Bi taybetî li herêmên ku gelek etnîsîte an jî çandên ji hev cuda dijîn.

“Di nava civakên pir etnîk de an jî civakên têkel ku ji curbecur mîrasan teşekulbûyî, bi piranî dîn wekî sînore derveyîn yê zewacê tê dîtin.”⁴³

Herwekî ku em di vê tesbîtê de jî dibînin; dîn û bawerî diyardeyên bi wî rengî ne ku li ser biryara berdewamkirina nesla xwe ya mirovan jî bandoreke wan ya diyarker heye. Ev yek di heman demê de di teşekula civakekê de jî rola dîn û baweriyên aşkera dike. Bi taybetî di nava civakên rojhilat de, sînoren dînî ne bi tenê sînoren zewacan teşkîl dikin lê di heman demê de sînoren etnîsîteyan jî diyar dikin. Yanê avabûna nasnameya etnîk bi dîn re gelekî ji nêz ve têkildar e. Hobsbawm di vê mijarê de wiha dibêje:

“Nasnameya dînî-etnîk li cihê ku tê dîtin, bi tevahî tê çî wateyê? Aşkera ye ku di hin mînakên de, ew meyla xwecudakirina ji xelk û dewletên cînar dide der.”⁴⁴

Her çendî ku dîn bi vî rengî carina xizmet li yekîtiya etnîk-netewî ya civakan dikin jî, dîsa li gorî Hobsbawm di hin mînakên de jî em dibînin ku carina dîn hin civakan jî perçe dike. Di mînakên bi vî rengî de, civakek yan ji aliyê du mezhebên dînekî ve an jî ji aliyê du dînan ve perçe dibe. Di mînaka sirp û xirwatan de miletek di nava du mezheban de (ortodoks û katolîk) perçe bûye. Di mînaka Pakîstan û Hindîstanê de du dînen cuda li pêş me ne.⁴⁵

Antropolog Thomas Hylland Eriksen jî, di vê mijarê de balê dikêşe ser korelasyona di navbera civakên etnîk û dîn de. Li dû fikra Eriksen, gelek tevgerên etnîk ji aliyê karaktera xwe ve dînî ne û pêwîstiyên dînî li endamên xwe ferz

⁴² Vgz., D. G. Bates, H. b., r. 460.

⁴³ H.b., r. 448.

⁴⁴ E. J. Hobsbawm, *Milletler ve Milliyetçilik*, r. 95.

⁴⁵ H.b., r. 96.

dikin.⁴⁶ Li gorî wî civakên etnîk, dîn di çarçoveya kontrolkirina civaka xwe de û her wiha ji bo parastin û pêşvebirina civaka xwe bi kar tînin. Eriksen balê dikêşe ser taybetmendiya dîn ya ku endogamiyê li ser civaka etnîk ferz dike.

“Eger ku trenda zewaca navber etnîkan berdewam bike, yek ji encamên vê; bidawî hatina etnîsîteyê ye. Gelek kesên ku qaîdeyan nas nakin, dibin asteng li pêş parastina sînorên teqez... Lê dîn hê jî bariyereke girîng e li hember vê yekê. Eger ku yên dizewicin ji dînen cuda bin, hingê zewaca wan bê palpişt e û pîrî caran berdewam nake.”⁴⁷

Tê dîtin ku dîn û bawerî, çawa ku ji nava çandê derdikevin wisa jî reng didin çanda ku ew ji navê derketine an jî wê çandê ji nû ve organîze dikin. Ew ji aliyek ve encama refleksên civakî ne û ji aliyek dî ve jî refleksên civakê kontrol dikin. Ew carina gerdûnî ne û deriyên wan ji her cure komên mirovan re vekirîne lê carina jî bi nasnameya komek mirov an jî miletek re dikelîjin û ji bo wan dibin nasname.

Di nava civaka kurd de jî em dibînin ku ji aliyek ve piraniya civakê di dirêjahiya dîrokê de îslamiyeta sunî ji xwe re wekî cureyek nasname qebûl kiriye û bi vî rengî xwe îfade kiriye lê li aliyê dî di nava civaka kurd de civakên elewî, êzîdî, yaresanî jî hene ku li herêmen ku ev bawerî hene, bawerî ji bo wan bûye cureyek nasnameya etno-dînî. Ramazan Pertev jî li ser wê fikrê ye ku heya sedala dawîn jî di nava civaka kurd de dîn di temsîliyeta nasnameya netewî de cihekî girîng digirt lê her ku awayên jiyana nûjen li nava civakê belav bûne di vê ferasetê de qelsî çêbûye û li şûna dîn hin diyardeyên dî bi cih bûne.⁴⁸ Her çendî ku ev tesbît îşaret bi aliyekî girîng yê vê rastîyê dike jî dema ku em ji aliyê komên etno-dînî ve dinihêrin tê dîtin ku dîn û bawerî hê jî di avaniya nasnameyî ya van civakan de cihekî sereke digire.

Etnîsîte

Têgiha etnîsîteyê, digel nîqaşên ku li ser wateya wê tîne kirin, di navenda gelek vekolînên zanistî yên ji curbecur zanistan û di navenda gelek nîqaşên polîtîk

⁴⁶ Thomas Hylland Eriksen, *Etnisite ve Milliyetçilik, Antropolojik Bir Bakış*, Avesta Yay., Çev., Ekin Uşaklı, 1. Baskı, 2004, İstanbul, r. 106.

⁴⁷ H.b., r. 236-237.

⁴⁸ Ramazan Pertev, *Folklor û Nasnameya Kurdî ya Neteweyî*, Weş. Avesta, Ç.1., 2018, Stembol, r. 100.

de cih digire lewre komên etnîk bi xwe jî pêkhatayên polîtîk in. Bêguman hebûna wan a xwezayî di hin astan de ji nîqaşên polîtîk û dîsa ji vekolînên zanistî bêrî ye.

Bingehê têgiha etnîsîteyê ji zimanê latînî maye û heya îro hatiye. Anthony Smith di heqê wateya têgihê de wiha nivîsiye:

“Gelek bikaranînên cuda yên vê têgiha yewnanî hene: Di Îlyadayê de di wateya koma hevalan de ‘ethnos etairon’, yan jî di wateya girseya mirovan de ‘ethnos laon’; Homeros di wateya qebîleya Akha an jî Lîkya de ‘ethnos Achaion’ û ‘Lukion’ bi kar aniye. Di Pindarosê de di wateya nijada jin û mêr de ‘ethnos aneron’ û ‘gunaikon’; di Herodotos de bi heman wateyê bi wateya gel an jî miletê Med de ‘Medikon ethnos’ hatiye bikaranîn. Platon di wateya çîn an jî tebeqeyeke civakî de ‘ethnos kêrukikon’ bi kar aniye lê Ksenophon di wateya cinsiyetê an jî nijada cinsî de ji bo jinan ‘thêlu etnos’ gotiye.”⁴⁹

Her wekî ku em di vê îzahata jorîn de jî dibînin, têgiha etnîsîteyê bi gelek wateyên nêzî hev hatiye bikaranîn. Bêguman bikaranînên wê yên di demên kevnar de nayê wê wateyê ku ew îro jî di heman wateyê de tê bikaranîn. Lewre têgih jî û wateyên wan jî dibe ku di nava demê de biguherin.

“Bikaranîna herî nêz ya di zimanê yewnanî de, di ‘ethnie’ ya fransîziya îro de derdikeve pêş me. Ev têgih di fransîzî de di konteksta dîrokê an jî civakeke dîrokî de fokusa li ser cudahiya çandî destnîşan dike. Têgihîştina vê cudahiya çandî, an jî xwe di nava vê çanda cuda de têgihîştin; gelekî ji gelekî din cuda dike û nasnameyêke cuda dide wî gelî.”⁵⁰

Li gorî Abbas Vali, têgiha etnîsîteyê di gelek waran de bi rengekî xelet li şûna nasnameya netewî tê bikaranîn. Vali destnîşan dike ku; divê etniye bi rengekî bi dîqet ji nasnameya netewî bê veqetandin.⁵¹

Eriksen, li dû wê fikrê ye ku tu têkiliyêke mecbûrî di nava etnîsîteyê û ziman, bingehên irqî an jî terîtorya û dîn de tune ye. Etnîsîte û nasnameyên civakî bi piranî îzafî ne û girêdayî şert û mercan e.⁵² Eriksen jî wekî Vali îfade dike ku di ziman û bikaranîna rojane de têgiha etnîsîteyê bi piranî ji bo pênasekirina

⁴⁹ Vgz., Anthony D. Smith, *Ulusların Etnik Kökeni*, Dost Yayınları, Çev. Sonay Bayramoğlu, Hülya Kendir, 1. Baskı, 2002, Ankara, r. 45.

⁵⁰ H.b., r. 46.

⁵¹ Abbas Vali, *Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri*, Avesta Yay., Çev., Fahriye Adsay, Ümit Aydoğmuş, Sema Kılıç., 1. Baskı, 2005, İstanbul, r. 86-87.

⁵² T. H. Eriksen, *Etnisite ve Milliyetçilik*, r. 52.

‘têkiliyên irqî’ û ‘problemên kêmaran’ tê bikaranîn lê di antropolojiya civakî de ev têgih ji bo têkiliyên navbera komên civakî ku xwe ji aliyê çandî ve cuda dibînin û ji aliyê yên dî ve jî bi vî rengî tên dîtin tê bikaranîn.⁵³

Frederick Barth jî balê kêşaye ser heman taybetmendiya çandî ya ku dibe bingeh ji bo komên etnîk.

“Têgihîştina bingehên etnîk bi awayekî genetîk, ne nêrîneke xwedî palpiştên qehîm e. Lewre, bingehên koma etnîk ku ew bi xwe wekî modeleke rêxistina civakî ye, ne biyolojîk in lê çandî ne.”⁵⁴

Li gorî Schermerhon; civaka etnîk, ew civak e ku xwe dispêre bav û kalên hevpar yên rastî an jî farazî; xwediyê bîranînên hevpar yên dîrokî ye; kolketîvîteyeke wisa ye ku di hin sembolen giştî de xwedî hevpariyekê ye ku ev simbol ji bo gelbûna wê koma mirovan pêwîst in; hişmendiya hevpar wekî şertekî adaptasyonê di nava wan de heye. Li gorî Smith; Schermerhon, bi vê pênaseyê etnîsîteyê bêtir di kategoriya civakên kêmar de dibîne.⁵⁵

Max Weber, ji bo van sembolen giştî bi piranî li ser girêdayinên xwînî, yanê nijadî û ziman sekiniye. Lê Durkheim her çendî ku zêde li ser vê problemê nesekinîbe jî bêtir bala xwe daye fenomenên civakî ku navenda çandê ne û ew di heman demê de ji bo civakê wekî nasname derdikevin pêş.

Ji bo ku komeke mirov karibin wekî komeke etnîk bêne binavkirin lazim e ku ew di hin taybetmendiyan de xwedî hevpariyeye berbelav bin. Ev taybetmendî; ziman, bingehên xwînî/irqî, kevneşop, xak û bawerî ne.⁵⁶

Xak ji bo komên etnîk eger ew li serê bijîn jî û eger ew li serê bi rengekî fîzîkî nejin jî hêmaneke hevpar e ku di nava endamên koma etnîk de heman hîsan diafirîne. Di vê mijarê de Smith wiha dibêje:

“Ethnie, her tim bi terîtoryayekê re têkildar e ku ew wê wekî mulkiyeta xwe dibîne. Dibe ku ev xwedantî ne fîzîkî be, dibe ku li wir niştecih be an jî nebe.”⁵⁷

⁵³ H.b., r. 15.

⁵⁴ E. J. Hobsbawm, *Millîyetler ve Milliyetçilik*, r. 88.

⁵⁵ Vgz., A. D. Smith, *Ulusların Etnik Kökeni*, r. 290, Not: 35.

⁵⁶ W. A. Haviland, *Kültürel Antropoloji*, r. 107.

⁵⁷ A. D. Smith, *Ulusların Etnik Kökeni*, r. 53.

Smith qeyd dike ku; ethnîe, bi hundakirina terîtoryaya xwe ji ethnîebûnê dernakeve. Ethnîe meseleyek e ku bi mît, hafîze, nîrx û sembolan re têkildar e. Bi desthilatdariya siyasî an jî mulkiyeta madî re ne têkildar e.”⁵⁸

Di hin rewşan de em dibînin ku komeke etnîk li terîtoryayeke fireh belav bûye ku di nava vê terîtoryayê de, bi rengekî xwezayî gelek herêmên ji hev cuda hene. Heta çand di asteke girîng de diçûhere lê dîsa jî tu zefiyet li ser nasnameya hevpar ya etnîk peyda nabe. Bêguman hebûna çandê hepar di encamê de nayê wê wateyê ku her ferdê civakê an jî her herêm bi heman rengî para xwe jê digire. Guherînên çandî her tim di nava asteke (boyut) demî û mekanî re derbas dibin. Yanê ew ji bandorên demê û mekanê ne bêrî ne. Ev yek di heman demê de ji bo jiyanbûna çandê jî dînamîzmeke bivê neyê ye. Haviland di vê mijarê de wiha dibêje:

“Di nava endamên civakê de, di asta girtin û absorbekirina çandê de her tim cudahî hene. Her takekes bi awayeke cuda têdîgihîje... Her wiha dema ku hin parçeyên ku wê çandê pêk tînin, bi hev re hevterîb nîn bin, hingê kaosa çandî dest pê dike.”⁵⁹

Ev cudahiyan biçûk di heman demê de di pêşxistin û guherînên çandî de dibin dînamîkên girîng. Civakên etnîk û netew, dema ku ji dûr ve li wan bê nihêrîn wekî yekîneyeke bê pirûz, bê cudahî xuya dikin. Lê dema ku ji nêz ve bê nihêrîn, hingê parçeyên ku wê yekîtiyê însa dikin derdikevin meydanê.

Hobsbawm jî di mijara nasnameye netewan de balê dikêşe ser vê rewşa parçeybûna erdnîgarî û çanda welatan. Li gorî Hobsbawm; hişmendiya netewî di nava herêm û komên civakî yên welatekî de bi rengekî wekhev pêş nakeve. Ev ciyawaziyên herêmî û sedemên vê ciyawaziyê bi piranî hatine piştguhkirin.⁶⁰

Mît an jî bawerî di birêxistina civakê de faktorên pir girîng in û civakê li hember xetereyan her tim zindî dihêlin. Çawa ku di yekîneya herî biçûk ya civakê de, heta çawa ku di takekes de jî wilo ye; eger motîvasyona jiyanê an jî armanca jiyanê tîk biçê, kes jî tîk diçe û bê armanc dimîne. Lê mît an jî bawerî tu car divê di jiyanê civakê de valahiyek nehêlin. Ji her pîrsa civakê re ku li tarîtiyê diqelibe,

⁵⁸ H.b., r. 53.

⁵⁹ W. A. Haviland, *Kültürel Antropoloji*, r. 119.

⁶⁰ E. J. Hobsbawm, *Milletler ve Milliyetçilik*, r. 27.

bersivew wan hebe û her wiha ji bo civakê, ji bo takekesên civakê îdealan çê bikin da ku ew bê tirs, bi hêvî li pêşeroja xwe binihêrin. Smith vê taybetmendiya civakê wiha dinirxîne:

“Eger em dixwazin karaktera taybet ya nasnameya etnîk têbigihîjin; lazim e em li hafizeya wan ya dîrokî ku xwe di mît-sembolê de dide der binihêrin. Lewre ya ku sîstema etnîk li ser piyan dihêle; parastin û belavkirina wan mîtan e.”⁶¹

Di van mîtên afirînê de, ku wekî *mythomotheur* têne binavkirin, tê bawer kirin ku cedekî (bavûkal) hevpar yê civakê heye. Ev yek di nava koma etnîk de hîseke bi wî rengî çê dike ku ew hemî yek in, ji yek bingehe tên, ew yek malbat in, ew, “em” in. Li cîhana derveyîn gelek “ew”ên dî hene ku ji bo hebûna wan xetere ne. Lewre divê ew tu car vê wesfîyeta xwe ya “em” bûnê hunda nekin.

Li gorî Eriksen jî çalakiya pêşîn ya etnîsîteyê afirandina termînolojiya yê li vî alî û yê li wî alî, yê li hundir û yê li derve ye; cîbicîkirina cudahiyeke sîstematîk di navbera ‘em’ û ‘wan’ de ye. Ev prensîb nîn be etnîsîte jî nîn e. Lewre ferdên etnîsîteyê hay ji cudahiya çandî ya di navbera ‘em’ û ‘wan’ de hene.⁶²

Ev xwecudakirina bi termînolojiya ‘em’ û wan’ ku di eslê xwe de pirî caran ji cudahiyên çandî-dînî rû dide, ji bo însaya nasnameya ‘em’ ê, her tim serî li mît û efsaneyan dide. Hebûna cedekî, bavekî hevpar ji bo hîkayeyên mîtolojîk hêmaneke gelek populer e. Bi rastî ev ‘cedê hevpar’, ji alî biyolojîk ve ne pêkan e. Ev pirî caran bi tenê farazî ye. Lê ya girîng ev e ku civak ji vê bawer dike. Smith civakên etnîk wiha pênase dike:

“Em dikarin civakên etnîk wiha pênase bikin; xwedî mîteke hevpar ya nijadî, bi dîrok û çanda xwe bi terîtoryayek re yekbûyî û di heman demê de di alîkariya hev kirinê de xwedî hîsên hevpar.”⁶³

Eriksen etnîsîteyê ji diyardeyeke bi serê xwe bêtir wekî têkiliyeke hevbendorî ya komên ji hev cuda dibîne. Li dû fikra wî eger ku li derekê çend komên ji hev cuda hebin etnîsîte heye.

⁶¹ A. D. Smith, *Ulusların Etnik Kökeni*, r. 38.

⁶² T. H. Eriksen, *Etnisite ve Milliyetçilik*, r. 35.

⁶³ A. D. Smith, *Ulusların Etnik Kökeni*, r. 57.

“Çawa ku di pênaseyên wan de jî xuya dike, komên etnîk ji hev cuda ne lê ew hay ji hebûna endamên komên di jî hene. Ji vê jî wêdetir ev kom an jî tebeqe bi rêya vê temasê (temasa di navbera du komên etnîk de) tên afirandin. Nasnameya komên etnîk divê hertim bi têkiliya tiştê ku, ew ne ew in, were pênasekirin. Yanê bi gotineke di; bi yê ku ne endamên komê ne bê pênasekirin.”⁶⁴

Ethnie û netew, ne hebûnên sabît û neguhêrbar in lê ev nayê wê wateyê ku avaniya wan li gorî keyfîyeta her hêzî an jî hêzên derveyîn reng digire. Dema ku em li hin aliyên girîng û hin xetên xelet yê li ser ziman, dîn, kevneşop û saziyan binihêrin em dikevin wê xeletiyê ku ethnîe primordîal (kevnar) û sabît e. Carina jî ku em bala xwe bidin tevgerên siyasî-konjektîrî û aborî yê koma etnîk, hingê em dikevin xeletiyê ku ew ne xwedî qaîdeyên sabît e. Ethnie a rast hem diguhere hem jî hemanên berdehamiyê di xwe de dihewîne. Ji her tiştî bêtir, pênaseya ku ew bo xwe dike girîng e, mît û sembolen ku jiyana wê ya manewî, atmosfera manewî radipêçin girîng in.

Frederik Barth jî balê dikêşe ser vê realîteyê. Li dû fikra wî; sînor û statuya nasnameyên etnîk ne statîk e. Nasnameya komên etnîk di encama têkiliyên demî de ji nû ve tê avakirin. Ew xwedî avaniyeke dînamîk e û li gorî rewş, şert û pêdiviyên demê dikare bê manîpulekirin an jî wesfîyetên nûh li xwe bar bike.⁶⁵ Suart Hall jî bi heman rengî difikire ku prosesa avabûna nasnameyê tu caran temam nabe. Nasname ne statîk e û her tim di nava bûyinê de ye.⁶⁶

Raoull Narol, ji bo katetegorîzasyona klasîk ya komên etnîk, wesfên bîngêhîn ku komeke mirov ji ya di wekî komeke etnîk cuda dikin wiha rêz dike:

- “1. Di wê şîyanê de ye ku bi renekî biyolojîk nesla xwe, hebûna xwe domdar bike.*
- 2. Di formên çandî de, bi yekîtiyeke aşkera, nîrxên bîngêhîn yê çandî parve dike.*
- 3. Ji bo xwe, sehayêke komînikasyonê ya hevbandoriyê însa dike.*

⁶⁴ T. H. Eriksen, *Etnisite ve Milliyetçilik*, r. 24.

⁶⁵ Vgz., Necat Keskin, *Akışkan Kimlikler: Etnik ve Dini Kimlik Arasında Becirman Seyyidleri*, Teza Doktorayê ya Neçapkirî, Zanîngeha Hacettepe, 2014, Ankara, r.52

⁶⁶ Vgz., Ramazan Pertev, *Folklor û Nasnameya Kurdî Ya Neteweyî*, r. 63

4. *Xwedî sistemeke endamtiyê ye ku ew bi xwe wê pênase dike û ev ji aliyên dî ve tê naskirin. Ku bi vî rengî di nava heman nîzamê de kategoriyeke cuda ji kategoriyan dî teşkil dike.*⁶⁷

Eger civakêk di parvekirina van xalan de hevpar be û xwe ji civakên derdora xwe di van hêmanan de cuda kiribe, hingê ew dikarin wekî komeke etnîk bêne pênasekirin.

Li gorî Gellner, netewîfî îdeolojiya grûbên etnîk e ku wî heqê di xwe de dibînin ku koma wan, etnîsîteya wan dewletê bi rê ve bibe.⁶⁸ Li dû vê mantiqê her koma etnîk ne daxwazkarê netewbûnê ye. Dibe ku ew mayendebûna xwe di parastina nasnameya xwe ya etnîk de dibînin. Her wiha Gellner di heqê netewiyetê de jî îdîa dike ku meşrûiyeta teoriya netewiyetê di wê xalê de ye ku ew sînorên xwe yên etnîk ji sînorên siyasî wêdetir nebe û di nava dewletê de cudahiye di navbera desthilatdar û yên tene rêvebirin de ji aliyê etnîk ve çêneke.⁶⁹

Folklor

Yek ji sedema ku me li jorê bi dirêjahî behsa hin têgehên ku bi piranî di sehaya antropolojiyê de derdikevin pêş me kir ev e ku; folklor digel ku bi serê xwe jî zanistek e lê dîsa jî bi antropolojiyê re pir ji nêz ve têkildar e. Alan Dundes, jî îşaret bi vê realîteya xebatên folklorî dike ku pêşî ji nava xebatên antropolojiyê derketiye.⁷⁰ William Bascom jî folklorê wekî antropolojiya çandî dinirxîne:

*“Folklor dikeve nava antropojiya çandî ku ew li ser urf û edetên civakên îroyîn û li ser saziyên wan vekolînan dike.... Xebatên antropoloîk ku cih nedabin zanînen gel, kêr mayî ne.”*⁷¹

Bascom di berdewamiya gotara xwe de îzah dike ku folklomasên ku ji sehaya wêjeyê tîrê di nêrînen stîlistîk de pişpor in. Lê ev yek bi serê xwe tîrê têgehîştina fenomena folklorê nake.⁷²

⁶⁷Stephan Stern, ‘Etnik Folklor ve Etnisite Folklorü’, *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar IV* (Ed., Öcal Oğuz û yd.), Geleneksel Yayınları, Çev. Başak Çalışkan, 2014, Ankara, r. 215.

⁶⁸Vgz, T. H. Eriksen, *Etnisite ve Milliyetçilik*, r. 152.

⁶⁹Ernest Gellner, *Uluslar ve Ulusçuluk*, Hil Yayınları, Çev. Büşra Ersanlı-Güney Göksu Özdoğan, 1. Baskı, 1992, İstanbul, r. 20.

⁷⁰Alan Dundes, ‘Doku, Metin ve Kontekst’, *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar I* (Ed: Öcal Oğuz û yd.), Geleneksel Yayınları, Çev., Metin Ekici, Ankara, 2014, r. 43.

⁷¹William R. Bascom, ‘Halk Bilimi ve Antropoji’, *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar I*, (Ed. Öcal Oğuz û yd.), Geleneksel Yayınları, Çev. Metin Ekici, , r. 54-55.

Lutz Rohrich qeyd dike ku eger berhemên folklorê bi tenê ji aliyê edebî ve bêne nirxandin wê ev têrî têgihîştina wan neke.

*“Bi dubare hatiye têgihîştin ku çîrokên periyên hin realîteyên dinî û felsefî, bi kînyayê, mecazî an jî simbolî di hundirîn. Û divê bi tenê ji aliyê edebî ve neyêne nirxandin.”*⁷³

Bêguman ev nayê wê wateyê ku; bi tenê ji aliyê edebî ve vekolîna li ser van berhemên, sivikdîtinek e. Ev dê nêrîneke xelet be. Wêje jî wekî her qadê, dikare li ser berhemên folklorî ji aliyê prensîbên dîsîplîna wêjeyê ve vekolîne bike. Lê folklorê, wekî binbeşeke wêjeyê dîtin, dê di fêmkirina vê mefhûmê de me nebe ber bi rastiya tevdeyî.

Li gorî Rohrich, berhemên folklorî divê di nava wê sîstema çandî de, ku ew ji navê derketine, bêne nirxandin. Çand, sîstemên watedayinê ne. Yanê metna ku tê xwendin di nava wê çandê de li gorî temen, cinsiyet û aîdiyetên etnîk tê watedarkirin.⁷⁴

Bêguman her vekolîna antropolojiyê, nayê wê watêyê ku di heman demê de ew vekolîneke folklorê ye jî. Antropolojî ji zanista folklorê firehtir e. Lê her vekolîna folklorê jî di heman demê de ne vekolîneke antropolojiyê ye. Lewre aliyê stîlistîk bi piranî li derveyê eleqeya antropolojiyê dimîne. Lê berhevkirina materyaleke folklorî, teqez e ku hem çalakiyeke folklorîstîkê hem jî çalakiyeke antropolojiyê ye.

Eger hemî jê wilo nîn bin jî gelekî dîsîplînên akademîk ji alî xweza û qada xwe ve miqayeseyî ne.⁷⁵ Xebatên folklorê j ber xwezaya fenomena folklorê pêwîst e ku miqayeseyî bin. Lewre folklor wekî hewzekî ye ku zansitên mîna wêjezanî, antropolojî, etnolojî, civaknasî, derûnnasî, zimannasî, dîrokzanî, erdnîgarî û heta teolojî, nebatnasî, zoolojî dikarin jê sûdê wergirin. Piralîbûna daneyên folklorê îmkanek an jî pêwîstiyek wiha derdixe pêş lêkoleran ku ew bi rengê berawirdî

⁷² H.b., r. 60.

⁷³ Lutz Rohrich, ‘Halk Anlatısı Araştırmasında Anlam Arayışı’, *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar I*, (Ed. Öcal Oğuz û yd.), Geleneksel Yayınları, Çev. Kürşat M. Korkmaz, 3. Baskı, 2006, Ankara, r. 153.

⁷⁴ H.b., r. 154.

⁷⁵ Alan Dundes, ‘Antropolog ve Folklorlarda Karşılaştırmalı Metot’, *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar 3*, (Ed. Öcal Oğuz û yd.), Geleneksel Yayıncılık, Çev. Seval Kasımoğlu-Ferya Çalış, 2. Baskı, 2015, Ankara, r. 78.

xebata xwe bikin. Lê ev nayê wê wateyê ku folklorzan divê hay ji hemî van dîsîplînan hebin. Ev ne pêkan e. Alan Dundes vê rewşê wiha îzah dike:

“Di xebatên pêşîn ên folklorê de hate fêmkirin ku bêyî nêrîneke miqayeseyî, ne pêkan e ku mirov bibe folklorzanek rast.”⁷⁶

Ji xwe dema ku folklorzan li ser rabirdûya çîrokek an jî berhemeke dî yê vegotinên gelêrî xebitî, bi regekî xwezayî, ne pêkan e ku ew hemî rastiyên di heqê wê metnê de keşif bike. Lewre divê ew ji dernûnnas, civaknas û antropologan re qadeke ku karibin bixebitin bihêle.⁷⁷

Her çendî ku ji bo folklorê gelekî pênase hatibin kirin jî, wekî ku em ji dîroka xebatên folklorê jî dizanin, di heqê sehaya xebatên folklorê de lihevkiyên teqez jî tune ye. Bi taybetî di nava xebatên antropolojî û folklorê de. Andrew Lang, ji bo sehaya xebatên folklorê pênaseyeke wiha dike:

“Folklor; fikrên ku di dema me de cih digirin lê ne aydê dema me ne, baweriyên batil û hikayet û berhemên ne madî yê civakên berê, kom dike û miqayese dike.”⁷⁸

Digel ku di nêrîna Lang de ekoyeke(dengvedaneke) etnosentrîk heye jî, ev realîteyek e ku folklor û bi taybetî vegotinên gelêrî di heqê serencama civakan de gelek daneyan didin me. Li wê derê bi regekî xerîb hin tişt tene parastin ku bi rastî jî ne aydê dema me ne. Ev yek dibe ku helwestek kevneşopî ya mirovan be.

Folklor digel ku hêmanên aydê demên berê di nava xwe de diparêze jî, eger wesfîyeta wê bi tevahî li ser vê bingehe bûna, ne pêkan bû ku ew heya dema îro bihatana. Lewre folklor bi dînamîzma civakê li ser piya ye. Eger ku me folklorê bi tenê wekî zanînen aydê demên berê bidîtana, hingê divê me têgiheke gelek girîng ji nava xebatên folklorê derbixista. Ev yek têgiha kontekstê ye. Folklor di kontekstekê de dijî. Bêyî têgihîştina konteksta berhemeke folklorê, analîzên ku dê li ser wê berhemê bêne kirin, kê an xelet bin. Ev taybetmendî, taybetmendiya jiyanîbûn û dînamîkbûna wê nîşanê me dide. Di heman demê de nîşan dide ku ew li kêleka parastina hin hêmanên kevnar, li gorî şertên demî û mekanî û civakî-çandî diguhere, rengên nûh digire.

⁷⁶ H.b., r. 84.

⁷⁷ A. Dundes, ‘Antropolog ve Folklorde Karşılaştırmalı Metot’, *Halk bilminde Kuramlar ve Yaklaşımlar* 3, r. 90.

⁷⁸ Vgz., A. Dundes, h.b., r. 80.

Richard Bauman, ji bo têgihîştineke kûr ya fenomena folklorê têgihîştina kontekstê dide pêş û ji bo vê şeş şertan rêz dike:

1. *Konteksta Wateyê: Berhema folklorî ji alî civakê ve çawa tê fêmkirin û şîrovekirin?*

2. *Konteksta Dînî: Di nava çandê de li ku derê tê, li ku derê bi cih dibe?*

3. *Konteksta Ramana Çandî: Girêdayina wê ya bi cureyên dî yên folklorîstîkê re bi çi rengî ye?*

4. *Bingeha Civakî: Aydê kîjan cureya mirovan e?*

5. *Konteksta Takekesî: Bi çi awayî li jiyana vebêj tê?*

6. *Konteksta Rewşê: Di rewşên civakî de faydeyên wê çi ne?*⁷⁹

Di vegotinên gelêrî de têgihîştina mefhûma kontekstê girîng e. Lewre ev di heman demê de nîşan dide ku folklor, ne bi tenê hebûneke ji dewrên berê mayî ye, an jî *fosîleke zindî* ye. Ev nîşan dide ku folklor, di roja îroyîn de jî heye. Ew fenomeneke bi wî rengî ye ku di nava şertên ku tê îcrakirin de divê bê fêmkirin. Li vê derê rola derdora fîzîkî û bi wê derdora fîzîkî ve girêdayî çanda wê herêmê, zimanê ku li wê herêmê tê axaftin, baweriyên wê herêmê, nasnameya etnîk ya ku di wê herêmê de serdest e, periyoda dîrokî ku ew berhem tê de tê îcrakirin her wiha rewşên taybet yên vebêj, cînsiyet û tebeqeyên civakî hemî xwedî bandor in.

Heciyê Cindî di pêşgotina pirtûka xwe ya navdar, *Hikayetêd Cimeata Kurda* de, di heqê taybetmendiya vegotinên gelêrî de tesbîten girîng kirine. Li gorî wî, vegotinên gelêrî di konteksta dem û mekanê de dijîn, di navbera wan û dem û mekanê de têkiliyeke înteraktîf heye.

“Hikyat wekî lîteratora zargotinê hesab dibin, bi zarkî ji silsiletêkê tîn derbazî ya dinê dibin, hertim teze dibin, zeman ra xeber didin û çîqa diçin bi êpîzod û fikrêd teze fire û mezin dibin, ew nola gîzîka rîsê: wekî bere-bere rîsê badayî ser da ser da zêde dibe, mezin dibe, dibe gilokek terikî. Hikyat jî wisa ne, her cara tiştekek lê zêde dibin, hikayetbêj bi forma xwe dibêjin, şimşat dikin, wekî dinê çawa dibêjin, rêdaktoriyê lê dikin û hikyata meye çûk nava dewr û zemana da xwe radigire,

⁷⁹ Lauri Hanko, ‘Halk Anlatısı Araştırma Metotları, Bu Metotların Durumu ve Geleceği’, *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar I*, r. 174.

serencema wê dewletî dibe, mezin dibe, usa mezin, wekî ji orîgînalê xwe gelekî dûr dikeve."⁸⁰

Tesbîta ku Cindî dike girîng e û vê yekê nîşanê me dide ku vegotinên gelêrî ji nuqtaya ku derketine, ber bi mekan û demên nûh ve diçin û di vê rêwîtiyê de ew li gorî dem û mekana ku tê re derbas dibin an jî tê de bi cih dibin formên nûh digirin. Lewre ku vegotinên gelêrî ne monolog in. Ew her tim bi dem û mekanê re di nava diyalogê de ne û di encama vê diyalogê de hem di vegotinên gelêrî de guherîn çê dibin û hem jî ew bandorê li nihêrîna dem û mekanê dikin.

Ev adaptasyona li dem û mekanê ya ku Cindî behs dike, di heman demê de têgiha 'ekotîp'ê tîne bîra me ku Carl Wilhelm von Sydow bi kar tîne. Her çendî ku ev têgih di sehaya botanîkê de ji berê de heye jî, yekem car wê ev têgih di sehaya folklorê de bi kar aniye. Von Sydow vê têgihê carina bi rengê 'oicotypes' carina jî bi rengê 'oikotype' bi kar aniye. Di botanîkê de ev têgih ji tîpa herêmî an jî erdnîgarî ya wê nebatê re tê gotin. Têgih ji peyva 'oikos' a yewnanî ku tê wateya xane, mal hatiye hilberandin. Di peyvên mîna ekonomî an jî ekolojî de jî heman kok heye. Li gorî Sydow; çawa ku nebatek xwe adaptayê şertê îklîm û taybetmendiya axa herêmekê dike; çîrok an jî cureyên dî yên vegotinên gelêrî jî, dema ku ji welatek ber bi welatek dî ve diçin, bi heman rengî tevdigerin û taybetmendiyan herêmî yên welatê nûh li xwe bar dikin. Ekotîp, di encama mantiqa rêbaza miqayeseyî de derdikeve meydanê. Yek heta ku miqayeseyê di navbera varyantên cuda yên vegotîneke gelêrî de neke, di heqê wê vegotîne de nikare bigihîje qenaeteke rast an jî tam.⁸¹

Li gorî folklorzanên mîna Roger Abrahams, Alan Dundes, Richard Bauman jî; folklor û vegotinên gelêrî, di konteksa herêm, çand, civak heta takekes de hene. Ew ji meyl, derûnî, dîrok ku encamên yekane yên çandê û taybetmendiyan fîzîkî, ne bêrî ne.

"Mirov dikare di navbera belavbûna çîrokên gel ji civakek bo civakek dî û belavbûna halet, teknîk, helwest, ayîneke dînî, têgeh an jî prensîbeke qanûnî de, miqayeseyê bike. Di hemî vekolînên vê biwarê de, problema qebûlîkirin û redkirinê

⁸⁰ Heciyê Cindî, *Hikayetêd Cimeata Kurda I*, Weşanên Rûpel, Ç.1, 2014, Stenbol, r. 15-16.

⁸¹ Carl Wilhelm von Sydow, 'Coğrafya ve Masal Ekotipleri', *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar II*, (Ed. M. Öcal Oğuz, Selcan Gürçayır Teke), Geleneksel Yayıncılık, Çev., Tuğçe Işıkkhan, 3. Baskı, 2014, Ankara, r. 62.

wê derbikeve. Eger guherînên bi dû re, bi mebesta bicihbûna hêmaneke nûh bo nava çandêke diyar, hatibe kirin, wê ev problem ji aliyê antropologan ve wekî 'diyardeya entegrasyonê' bê nîrxandin. Ev rewş bi heman rengî ji bo şopên çanda devkî jî an jî ji bo belavbûna çîrok an jî gotinên pêşiyên jî derdikeve pêş me."⁸²

Li dû nêrîna Bascom; hewldana ji nû ve înşakirina vegotîneke gelêrî bi rêya tesbîtîkirina serencama wê ya belavbûnê, hewldaneke bêkêr e û faydeyê wê tune ye jî. Li şûna vê, divê folklor nas bala xwe bidin ser wê nuqtayê ku di zanînên gel de guherîn bi çî rengî pêktên. Asta redkirin û qebûlkirina hêmaneke çandî-folklorî di nava civakê de bi çî rengî ye?

Bi rastî ev pirseke girîng e ku, çawa dibe ku di nava heman çandê de, ji alî hêmanên folklorê ve, hin nîrxên berevajî hev derdikevin pêş me? Ev rewş liderçûneke xwezayî ya çanda wê herêmê ye an jî bi mudaxeleyeke derveyîn dikare bê şîrovekirin?

Vekolîna li ser berhemek folklorî ji du aliyan ve girîng e. Yek jê; ew berhema folklorî çiqasa bi çanda civakê re hevterîb e, bi hêmanên dî yên çandî re di nava tevdehiyek de ye an jî bi wan re jêknegir e? Ya duyem, cudahiyên aşkera yên di navbera çanda civakê û fenomenên folklorî de ye. Wekî mînak, di çîrokek de çawa dibe ku nîrxêke bi rengê aşkera li dijî exlaqê civakê, cih digire? Ev yek nîşaneyê çî ye? Çawa dikare bê şîrovekirin? Gelo ev taybetmendiyên aydên dewrên kevnar in ku di nava vegotinên gelêrî de mane, ne ku ew jî digel 'exlaqê giştî' yê civakî jî wehekî cuda yê çanda civakê didin der? Bascom jî îşaret bi vê yekê dike û mînaka çîroka 'Coyoteyê Extiyar' dide ku di vê çîrokê de Coyote bi xesîya xwe re ketiya têkiliya cînsî. Ev çîrok her çendî ku bi rengê aşkera li dijî exlaqê civaka amerîkî be jî, di vegotinê de xwe parastîye. Lewre Bascom wiha dibêje:

*"Ji Euhemerus û vir ve, zanyar li ser cudahiyên heta dîrketinên di navbera berhemên folklorî û jiyana rastîn de fikirîne."*⁸³

William S. Fox, di biwara folklor û nîzama civakî de, îfade dike ku folklor pîrî caran hem ji aliyê formî ve hem jî ji aliyê naverokî ve li hember nîzama civakî

⁸² W. R. Bascom, 'Halk Bilimi ve Antropoloji', *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar I*, r. 58.

⁸³ H.b., r. 61.

serî radike.⁸⁴ Ji xwe eger ku ne wiha be em ê çawa bikaribin behsa lehengên mezin yên destanên civakê bikin. Bi rastî piraniya van lehengan ne mirovên îdeal in. Wekî mînak, Memê Alan. Ew ji welatek tê welatek dî û li dergistiya mirovek dî aşiq dibe. Digel ku hay ji vê rewşê heye jî. Ev yek li dijî qaîdeyên exlaqî yên civakê ye. Dîsa Siyabend di temamî jiyana xwe de her tim neheqî li mirovan kiriye. Ev yek di destanê de bi rengê aşkera tê gotin

Di her dema dîrokê de hin nêrînên dînî, bawerî, felsefî, îdeolojîk wekî temsîla nasnameya civakê, di bin navê nîrxên civakî de li ser civakê bi xwe hatine ferzkirin. Hin nêrîn an jî meylên ku bi rastî jî di nava civakê de hene lê nakevin nava çarçoveya vê nêrîna fermî, wekî nîrxên der-civakî an jî der-exlaqî hatine dîtin. Her wiha folklor di vê çarçoveyê de hatiye organîzekirin jî. Ev mudaxeleyeke polîtîk e li folklorê.

“Faraziyea giştî ev e ku folklorê civakê, hin wesfîyetên derbarê wê civakê de di hundirîne, lewre ku aydê wê civakê ye an jî ji aliyê wê civakê ve hatiye durustkirin. Wesfîyetên taybet yên civakê ku di nava berhema folklorê de derdixin, esasen mijarên veşarî ne.”⁸⁵

Ev taybetmendî bi piranî wekî taybetmendiyên komînîkasyona civakî derdikevin pêş me. Civak bi hev re an jî tebeqeyên civakî bi hev re bi rêya folklorê di nava komînîkasyonê de. Ev di heman demê de nîqaşeke civakî ye ku folklor an jî cureyên cuda yên vegotinê têne bikaranîn. Carina tê dîtin ku ev dibe komînîksyoneke navber-çandî an jî herêmî. Her guherîna di metna folklorê de ku li gorî herêm an jî çandên cuda derdikevin pêş me, di heman demê de bersivê in, ji bo ya ku jê hatiye wergirtin. Lewre ew mohra xwe ya çandî tevî nêrîna xwe ya dinyayê li wê vegotinê dixin.

Li gorî Bauman, folklor, gelek taybetiyên ji hev cuda di nava xwe de di hewîne ku ev yek bi ser aîdiyetên etnîk, dînî, çînî û zimanî ve ne. Û folklor dibe alîkar ku temsîla kolektîf ya civakên homojen derkeve. Berhemên folklorî di nava sîrkulasyoneke bi vî rengî de ne.⁸⁶

⁸⁴ Vgz., Bedran Hikmet, *Teoriyên Folklorê*, Weş. Lîs, Ç. 1. 2016, Diyarbakır, r. 55-56.

⁸⁵ Richard Bauman, ‘Halk Biliminin Farklı Kimliği ve Sosyal Tabanı’, *Halk Biliminde Kuramlar Ve Yaklaşımlar II*, Geleneksel Yayınları, Çev. Feridun Çotire, r. 41.

⁸⁶ H.b., r. 41.

Bi ya me li vê derê têgiha Bauman ya ‘temsîla kolektîf’ girîng e. Helbet di vegotinên gelêrî de temsîlek heye. Ev temsîl hîç guman nîne ku bi aîdiyetên fikrî, çandî, çînî û herêmî yên folklorê ve girêdayî ye. Dema ku em ji nuqteyî nêrîna komînîkasyona civakî ve li fenomena folklorê binihêrin, ev yek di heman demê de wekî teknîkeke gelekî karîger jî derdikeve pêş me. Yanê mesajên navber-fikrî, navber-çandî, navber-çînî û navber-herêmî bi rêya fenomena folklorê tên û diçin. Çawa ku me di mijara dîn û baweriyên de îfade kiribû ku dînen emperyal di heman demê de neteweyê gerdûnî li seranserê cîhanê afirandine ku ew network bi rêya mîsyonerên dînî, mesaj û prensîbên wî dînî, li cîhanê digêrin; her civak an jî herêm jî bi bersivdayina xwe ya taybet, yanê bi adaptekirina taybet ya wê mesajê, li herêma xwe bersiva xwe didin. Di folklor û vegotinên gelêrî de jî ev yek bi heman rengî kar dike.

“Tê ditin ku folklor di nava tîkîliyên hem sîmetrîk hem jî asîmetrîk de ye. Endamên hin koman an jî endamên hin kategoriyên civakî, li ser bîngeha nasnameya ku parve dikin, dikarin bi hinên din re bikevin dan û stendina folklorî.”⁸⁷

Di sedsalên 19 û 20an de di xebatên folklorê de, tema an jî motîfên ku nûneriya nasnameya hevpar dikin, bêtir girîng hatine dîtin. Yek ji fikra ku bandoreke mezin li folklorê kiriye, netewetî ye. Her çendî ku di mijara etnîstîyê de me vî aliyê temsîliyeta herêmî û çandî nîqaş kiribû jî, bikaranîna folklorê ji bo nasnameyên konjektîrî û demî yên polîtîk, carina lêkolerên folklorê jî ber bi tesewîrên xelet ve biriye. Li vê derê em behsa folklorê xwezayî ya civakê nakin. Helbet di wir de hîsên etnîk û çandî hene. Li vê derê em behsa folklorê tenzîmkirî an jî bikaranîna wê li dû hin mebestên serdemî û konjektîrî dikin ku vê yekê di heman demê de di xebatên folklorê de xitimandinekê pêkaniye.

“Mixabin carina folklor li şûna gerdûnîbûnê bêtir, wekî reklama neteweperestiyê hatiye îstîsmarkirin. Mînakê Brayên Grimm vê yekê nîşan dide. Bi rastî pir tiştên ku wan li mîletê alman kirine mal, di nava gelekî mîletên dî de jî hene.”⁸⁸

Li gorî Dundes, di dema îro de, ji problema esliyeta vegotîneke gelêrî bêtir, karîgeriya wê li pêş e. Ev yek jî nêrîna antropolojîk derdixe pêş me. Helbet

⁸⁷ H.b., r. 46.

⁸⁸ A. Dundes, ‘Halk Bilimi Çalışma Yöntemleri’, *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar II*, Geleneksel Yayınları, Çev. Ayşenur Nazlı, r. 58.

temsîliyetên kolektif di nava fenomena folklorê de derdikevin pêş me. Bi rêya folklorê grûb an jî komên etnîk xwe pênase dikin û her wiha “yên dî” jî pênase dikin. Grûbek bi rêya folklorê ji bo xwepênasekirin û afirandina hîsiyatên nasnameya komî, rêyeke ku diceribîne jî; referekirina “yên dî” ye. Di folklorê etnîk de ev yek tê dîtin.⁸⁹

Vladimir Propp balê dikêşe ser taybetmendiya îdeolojîkbûn û konjektorîbûna fenomena folklorê.

“Folklor, dîsîplîneke îdeolojîk e. Armanc û rêbazên wê, li dû nêrînên giştî yên wê heyamê têne diyarkirin. Dema ku nêrîneke total ji holê radibe, prensîbên vekolîne ku ji aliyê wê nêrîna total ve hatine diyarkirin jî hunda dibin.”⁹⁰

Propp vê rewşa konjektorî ya folklorê bi mînakeke balkêş îzah dike. Li gorî wî dema ku civakêk organîzmaya siyasî dadimezrîne, di helbesta epîk ya wê civakê de guherîneke berbiçav derdikeve meydanê. Lewre ew organîzmaya siyasî ji bo ku civakê li dû îdealên xwe yên ‘nûh’ organîze bike, divê atmosfereke nûh ya manewî biafirîne. Propp di vê nuqteyê de ji helbesta epîk ya rûsî mînak dide: “Mesela ejderhayên ku berê jin direvandin, êdî rûsan direvîne.” Di vê nuqteyê de guhertina peyva ‘jin’ bi ya ‘rûs’ gelekî girîng e. Lewre li vê derê tê aşkerakirin ku fokusa ‘dijmin’ li ser çî ye. Eger fokusa dijmin li ser ‘rûs’ be divê yekbûn jî li dora vê têgihê bê avakirin. Her wiha çand û folklorê vê diyardeyê wekî bîngehê girtin. Ew ejderhayê ku berê jin direvand, paşê rûs revand, dibe ku bi dû re li gorî karaktera sîstema ku tê afirandin, xirîstiyaneke birevîne, an jî xirîstiyaneke ortodoks birevîne, dibe ku paşê karkerek birevîne. Ev hemî mînak, peydabûna folklorê li gorî armancên reel-polîtîk nîşan didin.⁹¹

William S. Fox vê rewşê wekî polîtîkaya folklorê îfade dike. Li gorî wî ji Almanya Nazî û Rûsyaya Sovyet bêtir, bikaranîna folklorê bi armancên polîtîk, li welatên mîna Fransa, Înglîstan û Amerîkayê berbelav e.⁹²

⁸⁹ H.b., r. 60.

⁹⁰ Vladimir Propp, *Folklor, Teori ve Tarih*, Avesta Yayınları, Çeviren, Necdet Hasgül-Tolga Tanyel, 1. Baskı, 1998, İstanbul, r. 9-10.

⁹¹ B. Hikmet, *Teoriyên Folklorê*, r. 11.

⁹² Vgz. A. Dundes, ‘Fakelore Fabrikasyonu’ *William S. Fox*, ‘*Folklor ve Fakelore*’, Milli Folklor Dergisi, 2006, Ankara, Hejmar, 70, r. 92-101.

Yek ji mînaka girîng ya bikaranîna folklorê ji bo armancên îdeolojiya netewîtiyê, mînaka Skandînavya ye. Bi taybetî di mînaka fîniyan de ev rewş gelekî berbiçav e. Di vê nuqteyê de Elias Lönrot navê herî girîng e ku bi berhevkirina Destana Kalevala bandoreke pir mezin li ser netewîtiya fînî kiriye. Wiliam Wilson, girîngiya Destana Kalevala ji bo neteweyê fînî bi vî rengî îfade dike:

“Roja ku Kalevala derkete meydanê, hemî cîhana şareza berê xwe da Fînladiyaya jibîrbûyî. Kalevala di jiyana me ya neteweyî de xaçerêyeke şikestinê îfade dike, ya rast wek neteweyekê peydabûna me bi peydabûna Destana Kalevalayê ve girêdayî ye. Fînî bi Kalevalayê fêrî xwe bûne, ji xwe bawer kirine. Di nava gel de hişmendiya neteweyî bi Kalevalayê hişyar bûye.”⁹³

Ev folklorê ku ji nû ve tê tenzîmkirin, carina bi rêya polîtîkayên netewiyetê ew çend bandorê li ser civakê dike ku ya rastîn tê jibîrkirin û ya ku hatiye tenzîmkirin cihê wê digire. Alan Dundes li ser mînaka Kalevalayê wiha dibêje:

“Li Fînladiyayê romantîzm û netewîti ew çend bi hêz bû, -bi hêz e ku, tiştê ku mirovan jê bawer dikir ji rastiyê girîngtir bû, -girîngtir e. Ji ber vê yekê, eger ku folklorzanên fînî wilo bawer dikin ku Destana Kalevala destaneke gelêrî ye, mirov rabe bibêje ku ew ne gelêrî ye lê fakelore ye, wê tu feydeya vê yekê ji folklorzanên fînî re çênebûya.”⁹⁴

Mînakên bi vî rengî wekî ku Richard Dorson jî îfade dike, hê di destpêkê de, bi xebatên Brayên Grimm derketine meydanê. Li gorî Dorson, çîrokên almanî ku Brayên Grimm bi navê *Kinder Und Hausmarchen* (Çîrokên Zarok û Malan) berhev kirine û weşandine, mînaka pêşîn ya fakeloreyê an jî tenzîmkirina folklorê li dû armancên netewî ne.

“Ev berhemên ku tînan îdiakirin ku otantik û gelêrî ne bi rastî ji bo ku girseyên mezin ji aliyê hişmendî û exlaqî ve bêne birêxistin, hatine lihevanîn û berhemên sentetîk in.”⁹⁵

Li vê derê yek dikare îtiraz bike ku; di xwezaya folklorê de ji berê de ev heye. Çawa ku em ji nivîsarên kevin, berhemên folklorî yên li ser kralên antîk

⁹³ Vgz., Özkul Çobanoğlu, *Halkbilimi Kuramları ve Araştırma Yöntemleri Tarihine Giriş*, Akçağ Yayınları, 6. Baskı., 2012, Ankara, r. 121.

⁹⁴ A. Dundes, ‘Fakelore Fabrikasyonu’, *Milli Folklor Dergisi*, 2006, Ankara, Hejmar: 70, r. 92

⁹⁵ H.g., r. 92.

(Gilgamêş, Sargon, Fire'wn) dibînin dîsa li ser gelek xanedanên ku împaratoriyan birêvebirine dibînin, wisa jî pir asayî ye ku heman tişt, yanê bikaranîna folklorê ji bo îdeolojiya netewîtiyê, di vir de jî pêk were. Bi ya me jî ev yek heya dereceyekê asayî ye. Eger li herêmek li derdora jiyana kesek dîrokî, hin efsaneyên dînî-mîtolojîk hatibin afirandin ev nayê wê wateyê ku destkarî li ser folklorê hatiye kirin. Lewre ew jî proseseke xwezayî ye ku ji alî gel tê afirandin û di encamê de ew jî folklor e. Ya xetere ew e ku lêkolerên folklorê, di nava berhemên folklorê de hinan hilbijêrin û wan li dû armancên xwe yê polîtîk ji nû ve tenzîm bikin û hin hêmanên folklorê ku dijberê armancên wan yê polîtîk in, wekî ku tune bin nebînin an jî hebûna wan bi zanebûn veşêrin.

Îdelolojiya netewiyetê mecbûr e ku nasnameyê çandî ji xwe re bike bingeh û ji wê nasnameya çandî nasnameyê polîtîk însa bike. Ji ber vê yekê ew di encamê de xwe dispêre hin hêmanên ku bi rastî jî aydê gel in. Lê ji bo ku di nasnameya îdealîzekirî de zêafiyet peyda nebe, di heman demê de mecbûr e diyardeyên ku di nava çandê de wekî dijberiyek li hember wê nasnameya siyasî ya ku ew dixwaze însa bike hene jî, tune bike, asîmîle bike, berovajî bike an jî qedexe bike. Ev keyfîyet, di heman demê de çavê xwe ji realîteya objektîf ya civakê re digire û li dû armancên xwe dixwaze realîteyê nûh biafirîne. Di gelek mînakên de bi ser dikeve jî. Hingê ev yek di heman demê de tê wê wateyê ku civak ji çanda xwe ya rastîn tê qutkirin.

BEŞA YEKEM

1. WEKÎ DU KOMÊN ETNO-DÎNÎ ELEWÎ Û ÊZÎDIYÊN KURD

Kurdistan di nava hemî erdnîgariyên rojhilata navîn de, ji gelek aliyan ve erdnîgariya herî kozmopolît e. Bêguman li seranserê vê erdnîgariyê ji aliye demografyayê ve, nasnameya herî berbelav, kurdbûn e. Lê em dikarin bibêjin ku hem di nava kurdan bi xwe de hem jî li derveyê kurdan gelekî nasnameyên cuda yên dînî, zimani, çandî û mezhebî hene. Wekî mînak endamên her sê dînen mezin; xirîstiyani, îslamiyet û cihûtî li Kurdistanê, ne bi rengekî simbolîk lê bi rengekî kategorîk hebûn. Dîsa di nava îslamiyetê de mezhebên mîna şîe-elewî, sunî, yarsanî hene. Her wiha di nava civaka kurdan de, peyrewên dînê êzdiyatîyê hene.

Di nava vê pirrengiya dînî û mezhebî de, kurdên elewî û kurdên êzîdî du kategoriyên girîng in ku bi erdnîgarî, dîrok û baweriya xwe xwedî taybetmendiyên xwerû ne. Nasnameya van her du komên civakî hem li du baweriya wan û hem jî li du bingehe wan yên etnîk şekil girtiye. Girîngiya dîn û bingehe etnîk ya di nasnameya wan de rê lê vekiriye ku hem ew xwe wekî komeke cuda pênasê bikin û hem jî ji derveyî wan ve jî ew bi vî rengî bêne pênasêkirin. Her wiha di nava van her du diyardeyên sereke de yanê di nava dîn û bingehe etnîk de jî her tim reqabet an jî hevsengiyek çêbûye ku bi vê yekê hesasiyeteke di heqê nasnameya van her du civakan de çêbûye. Xwerûbûna nasnameyî ya van her du komên civakî ji gelek aliyan ve şayanî vekolînê ye.

1.1. Nêrîneke Giştî Li Ser Komên Etno-Dînî Yên Nava Civaka Kurd

Di nava her miletî de ji ber curbêcur rewşên dîrokî, erdnîgarî, dînî û çandî, dibe ku hin kêmar an jî etnîsîteyên cuda hebin. Ev rewş di dewra navîn de gelekî berbelav bû. Li du pêşketina çand û teknolojiyê, bi du re şoreşa sanayîyê û herî dawî geşbûna fikrên nasyonalîst û bi van sedeman ve girêdayî avabûna dewletên neteweyî; her ku çû girîngiya nasnameyên etnîk kêmbû an jî bi zanîn li gorî polîtîkayên dewletên navendî yên neteweyî, ev kêmar an jî nasnameyên herêmi hatin asîmîlekirin û neslên nûh yên van civakan entegreyî nasnameya ku dewletên navendî pêşkêşî wan kiribûn bûn. Ev rewş ji du aliyan ve trajîk e. Yek; hundabûna hin çandên taybet e ku di şaristaniya mirovahiyê de cihekî wan yê qedîm hebû.


Du; nerazîbûnên li hember van polîtîkayên asîmîlasyonê û peydabûna jêknegirî û dijderketinên etnîk.

Li rojhilata navîn, ev yek hê jî konjektora vê serdemê ye. Her çendî ku gelek civak êdî di rêjeyeke watedar de mewcûdiyeta xwe naparêzin jî, bereksê vê gelekî civak hê jî li hember van polîtîkayên navendî bi rengekî îtirazên xwe îfade dikin û dev ji çanda xwe zimanên xwe dîroka xwe ya yekane bernadin. Kakila gelek problemên aborî, çandî û civakî di vê girêkê de veşarî ye.

Di nava civaka kurd de jî ev curbecuriya dînî û mezhebî bi rengekî aşkera tê dîtîn. Digel ku di navenda nexşeya Kurdistanê de hem wekî demografya hem jî wekî erdnîgarî piraniya îslamiya sunî tê dîtîn jî bi taybetî li ser sînoran, li herêmên çiyayî ku sînorên civaka kurd digihîje civakeke dî, tê dîtîn ku mezhebên elewî û yaresanî û baweriya êzdiyatîyê ji xwe re cih dîtine.

Bêguman sedema bicihbûna van mezheb û dînên cuda, ne li herêmên navendî lê li ser sînoran, mijareke derveyî vê xebatê ye. Lê ji xwendinên dîrokê em dizanin ku ev rewş her tim ne wekî nexşeya îroyîn bû. Bi taybetî baweriya êzdiyatîyê di dewrên navîn de, di sedsalên 13 û 14an de li gelek herêmên navendî yên wekî Cizîr û Bilîsê bi berbelavî dihate dîtîn. Her ku peyrewên vê baweriyê kêm bûn, ew ji herêmên navendî vekişiyên herêmên sersînorî an jî bi tevahî ji nava civaka kurd koçber bûn ber bi herêmên wekî Kafkasyayê ve. Lê ji bo civaka elewî û yaresanî heman dane li ber destê me tune ne. Kurdên elewî ji peydabûna vê mezheb an jî baweriyê vir ve, di xeta bakûr û rojavayê Kurdistanê de cih giritne û ji aliyê dî ve bi piranî cîranê elewiyên tirk in. Her wiha yaresan an jî ehlê heq jî bi piranî li herêmên Rojhilatê Kurdistanê, li herêmên çiyayî bi cih in. Di vê nexşeya jêrîn de ev rewş bi zelalî tê dîtîn.

Harita 43: Kürdistan'ın Dinsel Bileşimi



Ji vê nexşeya jorîn, ku me ji pirtûka Mehrdad R. İzady ya bi navê *Kürtler girtiye*⁹⁶, xuya dibe ku di nava civaka kurdan de rewşa dînî û bawerî/mezhebî çendî cihêreng e. Digel ku di asta major de yek dikare vê xerîteyê wekî serdestiya

⁹⁶ Mehrdad R. İzady, *Kürtler*, Doz Yayınları, Çev. Cemal Atilla, 4. Baskı, 2013, İstanbul, r. 249.

kurdên misliman bibîne jî dema ku em bi detay dinihêrin pirrengiya di nava civaka kurdan de derdikeve meydana. Şerefxanê Bedlîsî di heqê erdnîgariya civaka kurdan de wiha agahî dide:

“Sînor û kewşenê welatê kurdan ku navê wê Kurdistan e, li ser qeraxên Behra Hurmuzê –ku dikeve ser Okyanûsa Hindî- dest pê dike û ji wir xetê rast dike û tê digihîje herêma Meletye û Mereşê. Welatê Faris, Iraqa ‘Ecem, Azerbeycan, Ermenistana Piçûk û Ermenistana Mezin dikevin milê bakûrê vê xeta han. Iraqa ‘Ereb, Mûsil û Diyarbekir dibin başûrê vî sînorê han. Ji derveyê vê jî, gelek eşîret û qebîlên kurd ber bi aliyê herêmên rojhilatê ve belav bûne û serên wan çûye gihîştîye herêmên rojavayê.”⁹⁷

Bedlîsî, di heqê civaka kurd de jî agahiyên girîng dide. Li gorî wî civaka kurd bi piranî sunî û şafî ne. Hinek eşîret û qebîlên kurdan ku ketine aliyê Mûsil û Şamê, ên wekî Dasnî, Xaldî, Besyanî, birek ji Mehmûdî û Dunbuliyan, êzîdî ne û murîdê Şêx ‘Adiyê kurê Misafir in ku ew jî li ser zencîra Xelîfeyên Merwanî bûye. Ev êzîdiyên han, baweriya wan ew e ku: Şêx ‘Adî yê gora wî li Geliyê Laleşê ye, wezîfeya nimêj û rojiya êzîdiyan girtiye ser milê xwe û soz daye wan, roja rabûnê ya dinya dîn, bi bê pirs û sual wan bibe cennetê. Êzîdî ji mela û zanayên zahîrî yê mislimanan gelek dudil in û rikê wan ji wan vedibin.⁹⁸

Bedlîsî qet behsa kurdên elewî nake ku hingê jî beşeke girîng ya civaka kurd pêk dianîn. Mîmkun e ku ew bi saîkeke mezhebî tevgeriyabe û elewiyan li derveyê kurdan dîtibe. Lewre di wê serdemê de, tê zanîn ku di navbera Dewleta Osmanî û Safewiyan de şerên dijwar rûdîdan û ev şer li hin deveran wekî şerekî mezhebî dihate dîtin.

Mehmed Emîn Zekî Beg jî balê dikêşe ser vê helwesta Bedlîsî ku kurdên elewî tune dibîne û behsa hebûna vê kategoriya civakî dike.

“Her çend xwediyê Şerefnameyê dibêje, qewmê kurd hemî girêdayî mezhebê şafî’î ye û Ewliya Çelebî jî wî teyîd dike, lê nayê înkarkirin ku beşeke wê ya munasib jî, çî di hundirê Tirkiyê de û çî jî di Îranê de mezhebê Ce’ferî qebûl kirine û heta hinek firqiyetên mufrît jî (Ehlê Heq, ‘Elî Ellahî) nav de peyda dibin. Heta jî

⁹⁷ Şerefxanê Bedlîsî, *Şerefname*, Weş. Avesta, Werg. Ziya Avcı, Ç. 3. 2007, Stenbol, r. 101-102.

⁹⁸ H.b., r. 102-103.

bilî van hinek jî hene (li wîlayeta Mûsil û Rûsyayê) xwediyê baweriyek din in ku jê re êzdîti tê gotin.”⁹⁹

Xala dî ya girîng ew e ku, Bedlîsî, her çendî wan wekî kategoriyeke cuda bi nav kiribe jî, êzîdiyan di nava îslamiyetê de dibîne. Wan, wekî mislimanên ku erkên xwe yên dînî bi cih nayinin, dinirxîne. Lê wekî ku di pasaja jorîn de diyar e, Zekî Beg, êzdiyatîyê wekî dînekî cuda dibîne.

Bedlîsî, beriya van tesbîtan di heqê eşîretên kurd û teşekulên cuda yên nava civaka kurdan de wiha dinivîse.

“Eşîretên sereke yên kurdan, di warên ziman, urf û edet û rewşên xwe yên civakî de dibin çar beş:

*Beşa yekan: Kirmanc (kurmanc)*¹⁰⁰

Beşa duduyan: Lor

Beşa sisiyan: Kelhûr

Beşa çaran: Goran”¹⁰¹

Di vê tesbîta Bedlîsî de xala girîng ew e ku ew binbeşên civaka kurd, ne tenê li gorî ziman diyar dike. Li gorî ziman, urf û edet û rewşên wan yên civakî wan ji hev vediqetîne. Her wiha mihtemel e ku bi têgiha kirmanc mebesta Bedlîsî, hem kirmanc hem jî kirmanc be. Her wiha soranîaxêvên ku îro di dabeşkirina civaka kurd de cihekî girîng digirin, di tesnîfa Bedlîsî de cih nagirin. Lê behsa Goran û Kelhûran tê kirin.

Di vê nuqteyê de ji ber ku di hin metnên dînî û folklorî yên êzîdiyan de behs tê kirin, em ê agahiyên Bedlîsî yên di heqê kurdên kelhûr de neqil bikin.

“(Kurdên Kelhûr) ji sê şaxan pêk tên: Nesla wan diçe digihîje Guhderzê kurê Keyo. Keyo di dema Qralên Keyaniyan de waliyê bajarê Babîlê bû. Babîl ew bajar e ku paşê bi navê Kufe tê nasîn. Kurekî Keyo yê navê wî Ruham hebû. Pişt re Ruham bû fermandarê leşkerekî mezin û ji aliyê Qralê Keyanî Behmen ve wezîfeya meşa ser Şam, Quds û Misrê jê re hate sipartin. Ew jî çû ew der sitand, şewitand û wêran kir, qetlî’am û xwînrejîyek mezin kir nava Benîsrailan. Ev qetlî’ama han bi

⁹⁹ Mihemmed Emîn Zekî Beg, *Dîroka Kurd û Kurdistanê*, Weş. Avesta, Werg., Ziya Avcı, Ç. 1., 2002, Stenbol, r. 198.

¹⁰⁰ Hejar Mukriyanî, di heqê etîmolojiya têgiha kirmanc/kurmanc de, di dawiya Şerefnameyê di nota bi jimara 40î de vê yekê wiha îzah kiriye: Xizmên Zerdeşt ji ‘Maj’ navê xwe girtine. ‘Manc’ mimkun e ev ‘Maj’ a han be. (Şerefname, r. 561.)

¹⁰¹ H.b., r. 101.

awa û çeşnek wisa bûye ku, tê gotin ji ber xwîna kuştî û birîndaran di bajêr de aş hatine gerandin. Ji ber vê, dîroknivîsan navê wî danîne Buxtunnasr (Bextu'l-nesr). Pişt re bi xwe bûye fermanrewayê seranserê welêt. Ji wê rojê pê ve zarokên wî û nesla wî di welatê wî de hukum dimeşînin û ji eşîreta wan re jî Goran tê gotin.”¹⁰²

Li dû van tesbîtên Bedlîsî, Buxtulnesir an jî bi navê ku ji aliyê rojavayîyan tê zanîn Nabuqednasir, kurdekî kelhûr e û ji eşîra goran e. Sedemê ku me li jor îfade kir ku ji aliyê êzîdiyên kurd ve jî girîng e ev e ku; di hin metnên dînî û folklorî yê êzîdîyan de tê gotin ku Buxtulnesir kurdekî êzîdî bûye.¹⁰³

Di kategoriya duyem de Bedlîsî behsa kurdên lor dike. Her çendî ku ji bo roja îroyîn di vê mijarê de, yanê di kurdbûna loran de nîqaş hebin jî, piraniya çavkaniyên berê, dema ku behsa loran û Loristanê kirine wan li ser kurdan hesabandine. Bedlîsî jî li ser wê fikrê ye ku ew kurd in.

“Li gor di kitêba Zûbdetu’l- Tewarîx de hatiye nivîsandin, sebebê danîna navê vi qewmî bi lor ev bûye: Di wîlayeta Manrûdê de gundek heye navê wî kurd e. Di wê herêmê de geliyek (Geliyê Derbendê) heye bi lorî jê re Kol dibêjin. Li geliyê Kolê jî çiyek heye jê re Lor dibêjin. Vêca ji bo ku vî xelqê han ji wê koç kiriye, ji wan re lor hatiye gotin. Di derheqê navê Lor de çend rîwayet û gotinên din jî hene, lê li gor qeneeta min ev ne zêde girîng in, ez dev ji nivîsandina wan berdidim. Çunkî li gor baweriya min ew gotinên pûç û vala ne û ne bi kêrî li ser sekinandinê ne.”¹⁰⁴

Hassanpour jî balê dikêşe ser nîqaşa ku lor kurd in an ne kurd in û li gorî wî feyliyên Iraqê ku lor in, xwe kurd dibînin. Lê ew ne bi lorî, bi soranî diaxivin.¹⁰⁵

Kategoriyeke dî ku Bedlîsî jê behs dike, kurdên goran in. Li ser sînore Îran û Îraqê li deverên çiyayên Hewraman dijîn û zimanê wan gelekî kevnar e. Her çiqas ku gelek fikrên cuda hebin jî, bi piranî lêkoler zimanê goranî wekî zaravayeke kurdî dihesibînin. Her çendî ku îro ev binbeş bi piranî bi zaravayê soranî diaxivin jî, bi dîroka xwe yek ji herêm û zaravayê qedîm yê kurdan û kurdî ye. Heta em dikarin bibêjin ku gelek nimûneyên pêşîn yên wêjeya kurdî bi vî zaravayî hatine dayin. Bessam kurdî (Sedsala 9.), Perîşan Dînewerî (Sedsala 14.),

¹⁰² H.b., r. 409.

¹⁰³ Xeyrî Şengalî, *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre*, Bergî Yekem., Weş. Enstîtuya Kelepûrî Kurdî-Senterî Duhok, Ç. 1. 2011, Duhok, r. 41.

¹⁰⁴ Ş. Bedlîsî, *Şerefname*, r. 115.

¹⁰⁵ Amir Hassanpour, *Kürdistan’da Milliyetçilik ve Dil*, Avesta Yay., Çev. İbrahim Bingöl, Cemil Gündoğan, 1. Baskı, 2005, İstanbul, r. 79.

Mistefa Baseranî (1642-1701), Mihemmed Kendûleyî (Sedsala 17.), Xanay Qubadî (1700-1759), Mestûre Erdelanî (1805-1848), Mewlewî (1806-1882) hin mînak in. Her wiha di vê herêmê de yek ji kevintirîn bawermendên civaka kurd bi navê yaresan jî dijîn. Gelek dîrokzanan di navbera goranî û kirmanckî/zazakî têkilî danîne. Digel ku di demên kevnar de hejmara vê binbeşa civaka kurd zêde bû îro gelek kêr bûne. Zimanzan Joyce Blau dibêje ku bi ihtîmale mezin dîroka goranî û zazakî ji ya kurmanckî kevintir e. Kurdan, bi berfirehî goranî û zazakî asîmîle kirin. Îro goranî bi piranî di binê bandora soranî de ye û piraniya goranan bi soranî diaxivin. Goranî li başûrê Îranê û bakûrê Kirmanşahê tê axaftin.

Goranî, zimanê fermî yê mîrektiya Erdelanê jî bû. Lê di vê nuqteyê de Bedlîsî, di Şerefnameyê de agahiyên girîng dide.

“Fermanrewayên Erdelanê, ji zarok û nesla Fermanrewayên Diyarbekirê yên neviyên Ehmedê Kurê Merwan in. Ji van yekî navê wî Baba Erdelan, demekê di nava eşîreta Goran de jiyana xwe domandiye, di dawîya dewra Dewleta Cengiz de, dest daniye ser wîlayeta Şehrezolê. Kar û barên vê wîlayeta han gelek bi başî û bi rêk û pêk meşandiye, nifûza wî gelek pêş de çûye, berfireh bûye û bûye fermanrewayê serbixwe.”¹⁰⁶

Goranî û Hewramî îşaret bi heman civakê dikin. Lewre ku Hewramî devokeke vê zarvayê ye.

Her çendî ku di nava civaka kurdan de behsa gelek dînan, wekî îslamiyet, xirîstiyani, cihûtî heta zerdeştî tê kirin jî dîsa behsa gelek bawerî an jî mezhebên heterodoks wekî yarsanî, êzdiyatî û elewîtî tê kirin jî, dîsa di nava mezhebên sereke yên îslamiyetê de behsa sunîtî û şîetî bê kirin jî dema ku em bala xwe bidin dîmena giştî ya civaka kurd, tê dîtîn ku piraniya civaka kurd di nava koma sunîtîyê de û bi giranî jî girêdayî mezhebê şafî'î ne. Ev piraniya ku di warê dînî de xwe dide der, di warê zimanî de an jî zaravayî de jî bi piranî di binê banê ‘kurmancbûn’ an jî ‘kirmancbûnê’ de teşekul dike. Wekî ku di nexşeya jorîn de jî xwe dide der; gewdeya esasî ya milletê kurd bi ser mislimantiya sunî ve ye. Ji aliyê zaravayî ve jî piranî bi kurmanckî diaxivin.

“Kurdên ku li bakûr dijîn ji xwe re kurmanckî û ji zimanê xwe re kurmanckî dibêjin. Lê kurdên ku bi soranî diaxivin ji xwe re kurd û ji zimanê xwe re kurdî dibêjin. Lê

¹⁰⁶ Ş. Bedlîsî, *Şerefname*, r. 177-178.

*li cem kurmancan kurd/kurmanc û kurdî/kurmancî cihê hev girtine... Di nava kurdan de rêjeya axaftina kurmancî li derdora %60-64an diguhere. Di hemî texmînan de li ser %50 ye.*¹⁰⁷

Martin van Bruinessen piraniya kurdan wekî sunî tesbît dike lê balê dikêşe ser vê xalê ku; civaka kurdan, di nava sunîtiyê de jî bi hîlbijartina mezhebeke cuda; şafî'îtiyê, cudahiya xwe ya etnîk diyar kirine.

*“Ji sisêya duduyê heta belkî ji çaran sisêyê gelê kurd, qet nebe bi nav, mislimanên sunî ne. Piraniya wan peyrewên mezhebê şafî'î ne an jî peyrewên ekola fiqiha îslamî ne. Ev rewş, wan bi piranî ji cîranên wan yên tirk ku girêdayî mezhebê henefî û cîranên wan yên erebên sunî cuda dike. Lewre, mezhebê şafî'î, ji bo hin kurdan bûye wekî sîmgeyeke ku di navê de nasnameya xwe ya etnîk bi aşkerayî diyar dikin”*¹⁰⁸

Bruinessen, qeyd dike ku li Îranê jî di navbera kurdên sunî Îraniyên şîe û Azerbeycaniyan de cudahiyan aşkera hene. Piraniya kurdên Îranê li hember rejîma Cumhûrê Îslamî derketine. Di vir de dijberiya sunîti û şîetiyê roleke sereke lîstiyê. Lê li herî başûrên Kurdistanê, li Bexterana Îranê (Kermanşah) û Xaneqîn û Mendeliya Iraqê kurd bi piranî şîe ne. Li gorî Bruinessen, şîeyên Îranê yên kurd tu car tevî nava tevgera netewî ya kurd nebûn¹⁰⁹.

Girîngiya curbecuriya dînî-mezhebî ya di nava kurdan de ji van her du milên esasî yên îslamiyetê bêhtir, di hebûna hin mezhebên dî de ye ku ew carina di nava sînoren îslamiyetê de hatine dîtin û carina jî li derveyê sînoren îslamiyetê hatine dîtin û ji ber vê rewşê wekî heterodoks hatine binavkirin.

Bruinessen jî di berdewama nivîsa xwe de balê dikêşe ser vê taybetmendiya civaka kurd. Li gorî wî; di nava kurdan de hin mezhebên heterodoks, bawerî û ayîn hene ku bi rengê aşkera di binê bandora îslamiyetê de mane lê bi piranî ji dînen din û bi taybetî jî ji dînen kevin yên îranî bandor girtine. Yezîdiyên ku pirî çaran bi xeletî wekî ‘şeytanperest’ tên binavkirin yên herî navdar in di nava vanan de. Peyrewên yezîdîtiyê bi tenê di nava milletê kurd de hene. Yek ji dînekî dî yê taybet yê kurdan, ehlî heq e ku bi piranî li herêma Gûran ya Herêma Kurdistanê

¹⁰⁷ A. Hassanpour, *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil*, r. 78,80.

¹⁰⁸ Martin van Bruinessen, *Kürdistan Üzerinen Yazılar*, İletişim Yayınları, Çev., Nevzat Kırac, 4. Baskı, 2002, İstanbul, r. 20.

¹⁰⁹ H.b., r., 20

heye û ji wir jî li nava azeriyan, îraniyan û tirkmenên Iraqê belav bûye. Mezhebê heterodoks yê sêyemîn yê Kurdistanê wekî ‘qizilbaşî’ hatiye binavkirin, ku îro bi piranî bi îfadeyeke cuda jê re elewîti tê gotin. Kurdên elewî, li herêmên bakûrê rojavayê Kurdistanê dijîn û hejmara wan herî kêr bi sedhezaran e belkî ji milyonek zêdetir e.”¹¹⁰

Di nava civaka goran de kategoriyeke girîng ya civakî an jî etnîk kurdên yaresan in. Her çendî ku ev civaka etnîk bi piranî di nava baweriya şîetiyê de hatibe dîtin jî, hin taybetmendiyên wan yêr cuda hene ku nabe mirov wan wekî kurdên şîe bi nav bike. Heman taybetî jî bo kurdên Dêrsimê jî derbasdar e. Her çendî ku hin navên wekî elî-ellahî, nuseyrî an jî qulat/xulat (Li gorî Minorsky, qulat di wateya tundrewtiya şîetiyê de ye) hatine bikaranîn jî, bi giranî di navbera lêkoleran de navê ehlî heq hatiye qebûlkirin û bi berbelavî tê bikaranîn. Lê civaka yarsan dîne xwe bêtir bi rengê yarsan, yarestan, kakeî û dîne yarî bi nav dike. Li vê derê peyva ‘yar’ di wateya dost, heval de ye.¹¹¹

Lê li gorî Mihemed Mukrî, wan bi xwe navê ehlî heq li xwe kirine:

“Ehlî heq, bawermend û peyrewên vê rêbazê bi xwe ev nav li xwe kirine û dixwazin ku pê jî bîn nasîn. Hebûna ehlî heq, bi taybetî li herêma Goran e. Goran navenda komelgeha wan e û jê belav bûne. Bîr û baweriyên vê rêbazê dîrî baweriyên îslama îranî ne. Hindek ji wan baweriyên di bin bandora rêbaza gnosîzmê de diyar dibin û hin ji wan jî berdewamiya hin baweriyên ola mezdek, manî û hinên dîtir ji yêr îraniya kevnar in.”¹¹²

Li gorî Thomas Bois jî ew dîne xwe wekî ehlî heq bi nav dikin. Carinan cîranên wan yêr şîe navê dîne wan wekî elî-îlahî bi nav dikin. Ew bi xwe dibêjin em ehlî heq in, peyrewên ronahiya rastiyê ne, ew rastiya heyîna Xwedayê yekta û bêhempa ne. Ev rêbaza batinî, li Îranê, parêzgeha Kirmnşahê, li herêma kurdan belav bûye, bi taybetî li herêmên Zuhab, Mahîdeşt û Holîlanê. Ev rêbaz derbasî nav êl û hozên Goran, Sincabî, Kelhor û Zengene jî bûye. Tevaya xelkên wan herêman, yan jî hin ji wan, baweriya xwe bi vê rêbazê anîne.¹¹³

¹¹⁰ H.b., r. 21-22.

¹¹¹ Shahab Valî, *Kurdên Yarsan*, Weş. Avesta, Werg. Sevda Orak Reşitoğlu, Ç. I, 2018, Stenbol, r. 15.

¹¹² Deham Ebdulfettah, *Yarsan An Ji Ehlê Heq*, Weş. Lîs, Ç. I., 2017, Diyarbakir, r. 48.

¹¹³ H.b., r. 18-19.

Mehrdad R. Izady, bi vî rengî behsa vê kategoriya civakî dîke:

“Peyrewên vê baweriyê wekî, elîullahî, elî-îlahî, elîheq, ehl-î heq, şeytanperest, nuseyrî (nazerenî, wate xirîstiyân) hatine binavkirin. Yarisanî jî alî kesafeta nîfûsê ve li Başûrê Kurdistanê, li Îran û Iraqê bicih in. Ji bilî hin îstîsnayên biçûk, sînorê vê baweriyê û sînorê zaravayê goraniya kurdî (tevî lekî) li hev tîn.”¹¹⁴

Izady jî wekî gelekî lêkoleran qeyd dîke ku; digel ku hin kes vê baweriyê di nava cîhana şetiyê de dibînin jî, gelek taybetmendiyên wê hene ku mirov kare wê bi dînen kevin yê îranî-kurdî ve girê bide. Bi taybetî digel ku di hin baweriyên de li hev nekin jî, di navbera yarsanî, êzdiyâtî û elewîtiyê de têkiliyeke balkêş heye. Hem di sîstema dînî û tebeqeyên çînî de hem jî di mîtolojiya wan de lihevçûn hene.¹¹⁵

Mihemed Emîn Zekî Beg, baweriyaya yaresaniyê hem li derveyî îslamiyetê dibîne hem jî bi baweriyên kevin yê îranî ve girê dide.

“Baweriyaya elî ullahî: Xelkê Kurdistanê Rojhilat (rojavayê Heratê), beriya derketina îslamiyetê, xwediyê baweriyên ecêb bûn û piştî ku dîne îslamiyetê jî qebûl kirin, cardin dev ji wan baweriyên xwe bernedan û bi guhertineke kêr cardin ew parastin... Xelkê Ernêlê an jî Remalê, ku ji Kurdistanê Rojhilatê bûn, xwediyê baweriyaya tenasuhiyê bûn û roj diparastin. Piştê ku bûn misliman, baweriyaya wan ku bi Hezretî Elî dihat, xwestin vê baweriyaya xwe ya berê îhya bikin. Li gorî wan rûhê xweda di zatê Elî de cismanî bûye.”¹¹⁶

Lêkoler Shahab Vali, civaka yarsan li derveyî dînî îslamiyetê, wekî dînekî serbixwe dibîne.

“Civaka kurdan bi piranî sunî ne û yê şîe jî hene. Ji xeynî van her du komên misliman, dînen din ên ji aliyê kêr kesan ve tîn parastin jî hene ku di nava wan de ewil êzîdî û yarsanî tîn. Bi texmînî di nava kurdên Îranê de nêzî du milyon yarsan hene û xwedî dîrokek dûdirêj in ku ji aliyê mislimanan ve hatine çewisandin. Îro yarsan bi piranî li rojavayê Îranê li bajarên Kirmanşan, Îlam û herêma Loristanê di nav hev de dijîn. Çend civatên yarsanan jî li Başûrê Kurdistanê li bajarên wek

¹¹⁴ M. R. Izady, *Kürtler*, r. 265.

¹¹⁵ H.b., r. 267.

¹¹⁶ M. E. Zekî Beg, *Dîroka Kurd û Kurdistanê*, r. 198-199.

Kerkûk, Xaneqîn û Silêmaniyê dijîn. Piraniya yarsanan kurd in. Lê li Azerbeycan û li derên din ên Îranê jî çend civatên yarsanî hene ku ne kurd in."¹¹⁷

Li kêleka gelek navên ku li wan hatine kirin, M. J. Meşkûr navekî balkêş bi kar tîne: Ehl-î Serr (Mirovên Sirrê).¹¹⁸ Di nava civakên kurd de bikaranîna têgiha "sirr" di nava metnên dînî de, bi taybetî di mînaka elewî û êzîdiyan de gelek li pêş e. Ev taybetmendî di heman demê de taybetmendiya baweriyên batînî ye jî.

*"Wekî hemû doktrînen îrfanî yên ku li ser sirrekê hatine avakirin, yarsanan jî doktrîna xwe li ser sirekê ava kirine. Ev aliyê batînî yê dînê yarsan, yê ku li ser 'nepenîya ku nikare bê gotin' hatiye avakirin, her dem di hişê lêkoleran de weke pirs maye."*¹¹⁹

Li ser kok û bingehên vê bawerîya taybet, di nava lêkoleran de fikrên cuda peyda bûne. Li gorî hin lêkoleran ew beşek ji mezheba şîetiyê ne û şîeyên tundrew in. Lê hin lêkolerên dî wan bi dînen kevnar yên îranî wekî, manîheîzm, mazdekîzmê û zerduştîyê ve girêdane. Lêkoler Philip Kreyenbroek jî balê dikêşe ser hêmanên hevpar yên di navbera yarsanî, elewîti û êzîdiyatîyê de. Heta hinek dî jî bi pêş de diçe û têkiliya pratîkên van her sê bawerîyan bi zerdeştîyê re çê dike.

*"Kevneşopiya herî bingehîn ya dînî ya peyrewên ehlî heq, cem e. Di merasîma cemê de dua û kilam roleke sereke dilîzin, mirov kom dibin, heywanek tê qurbankirin, goştê wê heywanê bi rengê merasîmî tê amadekirin û ji alî bawermendan ve tê xwarin... Heman kevneşopa dînî di nava elewîyan de jî heye. Her çendî ku hin êzîdî dibêjin ku kevneşopek wan ya bi vî rengî hebûye jî, ev nehatiye îspatkirin. Li ser bingehên cemê di navbera zanyaran de konsensusek tune ye. Tê zanîn ku kevneşopek bi vî rengî di nava zerduştîyan de jî hebû."*¹²⁰

Li dû fikra Kreyenbroek, yarsaniya ku bi rengê xwe yê îroyîn tê zanîn, bingehên wê diçe sedsala 15. Di vê sedsalê de Sultan Sehaq pêşewayê vê koma civakî ye û di nava vê baweriyê de gelekî hêmanên qedîm yên îranî parastîye. Ji ber ku ev bawerî hem ji aliyê şîeyan ve hem jî ji aliyê sunîyan ve rastî gelek çewisandinan hatiye, ew bi îtîna xwe û bawerîya xwe vedişêrin. Bi taybetî di nava

¹¹⁷ S. Vali, *Kurdên Yarsan*, r. 13-14.

¹¹⁸ H.b., r. 16.

¹¹⁹ H.b., r. 18.

¹²⁰ Philip G. Kreyenbroek, *Kürt Kimliği ve Kültürü*, Avesta Yayınları, Çev., Ümit Aydoğmuş, 1. Baskı, 2008, İstanbul, r. 160-161.

kakeiyên herêma Iraqê de eger ku endamek vê baweriyê sira komê bide derve ev yek di dereceya îxanetê de tê dîtin.¹²¹

Ev pirrengiya dînî û etnîk ya li nava civaka kurd, çawa ku gelek sedemên wê hebin, bêguman gelek encamên wê jî hene. Ji van encaman yek jê jî, geşedana gelek nasnameyên cuda û pirtebeqeyîbûna nasnameya kurdî ye. Her çendî ku di sedsala dawîn de hewla gelek rewşenbîrên kurd ew bûye ku, vê pirrengiya etno-dînî û pirtebeqeyîbûna nasnameya kurdî di binê yek nasnameyê de bînin cem hev jî, em nikarin bibêjin ku ev armanc bi ser ketiye. Bi piranî tê qebûlkirin ku bi vî rengî formgirtina dînî di sedsala 16an de pêk hatiye û heya îro wiha maye. Omarkhali bi vî rengî balê dikişîne ser curbecuriya dînî ya li Kurdistanê:

“Her çiqas ku civaka kurd bi piranî dînê îslamê qebûl kirine û îro ev civak bi piranî bi dînê îslamê re hemaheng xuya dike jî, li Kurdistanê gelek kêmarên dînî bi hev re jiyane û ji ber vê yekê em dikarin bibêjin ku Kurdistan çavkaniya dînan e.”¹²²

Dema ku em behsa curbecuriya dînî (heterojenîtî) ya di nava kurdan de dikin, li bakûrê xaka kurdan civakên ku pêşî tîna bîra me elewiyên ku li bakûrê rojavayê bi cih in û êzîdiyên ku li seranserê bakûr belave dijîn lê herêmên wan yên diyar wekî Şêxan û Sincar hene, tîna bîra me. Di beşên jêrîn de, ji ber ku fokûsa xebata me li ser van her du komên etno-dînî ye, em ê bi hûrgilî li ser taybetmendiyên dînî-dîrokî û civakî yên van her du koman bisekinin.

1.2. Êzîdiyati

Ev koma civakî ku bi sedsalan e bala gelek lêkoleraan kişandiye, belkî koma herî taybet e di nava nasnameya giştî ya kurdan de. Têkilî û hîsên li hember wan her tim bi dijminahiyeke mezin hatine rapêçan ku ne pêkan bû ku ew û civakên cîran bi hev re li ser tîkiliyeke durust bijîn. Ev yek di asteke wilo de bû ku, tevî tîcariyê jî, tabûyên mezin hebûn di navbera wan û civakên cîran yên wekî kurdên misliman û erebên misliman de. Li aliyê din civaka êzîdî di hundurê xwe de xwedî ew çend qaîde û sistemeke tûj û hişk e ku ne pêkan e ku ji derve yek ji bo

¹²¹ Philip G. Kreyenbroek, ‘Ehli Hak, Kurdistanlı Yaresanlar’, *Kürdistan'da Dini Azınlıklar* (Ed. Khana Omarkhali), Çev. İbrahim Bingöl, Avesta Yayınları, 1. Baskı, 2014, İstanbul, r. 46-47.

¹²² Khanna Omarkhali (ed.), *Kürdistan'da Dini Azınlıklar*, Avesta Yayınları, Çev. İbrahim Bingöl, 1. Baskı, 2014, İstanbul, r. 15.

vê civakê bê qebûlkerin. Êzîdî her çendî di parastina dînê xwe de bi îsrar in ew çend jî qebûl nakin ku bêyî girêdayina xwînê, kesek ji baweriyeyeke dî were ser dîn û baweriya wan. Taybetmendiyên vê civakê û vî dînê ji sedsalên 18an vir ve bala gelek lêkolerên derveyîn jî kişandiye û bûye mijara vekolînên zanistî.

1.2.1. Demografya û Erdnîgarî

Herêmên ku ev civak lê dijî her çendî ku ji ber koçberbûna eşîrên kurdên êzîdî ne ew çend statîk e jî di gelek vekolînên dîrokî de bi detay hatine nivîsîn. Mehmed Emîn Zekî Beg di vê mijarê de wiha neqil dîke:

“Ev beşa kurdên ku di vê baweriyê de ne; li aliyê Helebê, Wanê û Erzîrûmê û beşa piraniya wan jî li wîlayeta Mûsilê, li Sencarê û qezaya Şêxan de ne. Nufûsa wan nêzîkî 300 hezaran e (Tarîxa Mûsilê). Hinek jî dibêjin ku li Çiyayên Qafqasyayê, li qeraxê Behra Qezwînê (Hezarê), li Çiyayên Altayê û Qamçasqayê û Çînê jî êzîdî hene lê navê wan awakî din e.”¹²³

Lêkoler Christine Allison, herêmên ku ew lê dijîn wiha tarîf dîke:


“Li Başûrê Kurdistanê herêmên ku êzîdî lê dijîn hinek jê di jêr kontrola hikûmeta navendî ya Iraqê de ne. Tevî ‘Eyn Sifnî, piraniya herêma Şêxan û temamê Cebel Sîncar di jêr kontrola hikûmeta Iraqê de ye. Yezîdiyên ku li jêr kontrola herêmên otonomiya kurdan de dijîin bi piranî li Duhokê, li Xanek û Şari’eyê, li nêzîkên Zaxoyê li Dêrebûnê û li qezayek biçûk bi navê Ba’edrê ku nêzî herêma Şêxanê ye dijîn. Gundê Laleşê ku herêma herî pîroz ya yezîdîyan e, digel ku di navbera wê û ‘Eyn Sifnî de bi tenê çend kîlometre hene jî di nava herêma jêr kontrola kurdan de ye.”¹²⁴

Di vê nexşeya jêrîn de ku rewşa etno-dînî ya li Kurdistana Iraqê nîşan dide, tê dîtîn ku êzîdî li du herêmên ji hev cuda dijîn û ji van herêman Sîncar di nava terîtoryaya fermî ya Iraqê de û beşek herêma Şêxan û Laleş jî di nava terîtoryaya Îdareya Kurdistanê de maye.

¹²³ M. E. Zekî Beg, *Dîroka Kurd û Kurdistanê*, r. 200.

¹²⁴ Christine Allison, *Yezidi Sözlü Kültürü*, Avesta Yayınları, Çev. Fahriye Adsay, 1. Baskı, 2007, İstanbul, r. 62.

Ethnoreligious Groups in the Kurdistan Region of Iraq and Surrounding Territory



125

¹²⁵ Me ev nexşe di dîroka 20/08/2019an de di saet 17:00 de ji malpera, <https://alepholicy.org/mapping-northern-iraq/> hilgirt.

Dr. Arşad Poladyan û G. S. Asatryan, di gotara xwe ya bi navê Dînê Êzîdî de, herêmên ku êzîdî lê dijîn wiha tarîf dikin:

“Êzîdî (bi îfadeya wan bi xwe êzîd) bi giranî li Sîncara Iraqê, li herêma Şêxanê, li Tirkîyê li Tûr Abidîn, Niseybîn, Diyarbekir û li newalên bakûrê Pîranê, li Mûş, Sason, Bilîs û Wanê dijîn. Li deverên mîna Sirûc, Bêlecûk, Kilîs, Amûdê û Qamişlo jî hin êzîdî hene. Beşek ji êzîdiyan di navbera salên 1830-1840î de ji van herêmên Iraqê ji zulma kurd û tirkan reviyane hatine Ermenistanê û ji wir jî li cûrbecûr herêmên başûrê Kafkasyayê bi cih bûne. Digel vê jî navenda herî mezin ya diyasporaya êzîdiyan, Ermenistana Sovyet e ku nêzîkî 50 hezar êzîdî li vir dijîn. Li gorî daneyên dawîn nifûsa êzîdiyan 200 hezar e.”¹²⁶

Omarkhali jî û bi giranî hemî lêkolera li ser herêmên ku êzîdî lê dijîn agahiyên hevpar didin lê li ser nifûsa êzîdiyên ku li seranserê dinyayê dijîn Omarkhali hejmarên cuda dide.

“Li gorî texmînen ne fermî, nifûsa yezîdiyan ya li seranserê cîhanê, hinekî di ser 550 hezarî de ye. Ev hejmar nêzîkî ji sedî 2.3 yê nifûsa kurdan e. Yezîdî bi giranî li Kurdistanê Iraqê, Tirkîye, Îran û Suriyê dijîn lê li Ermenistan û Gurcistanê jî yezîdî hene ku vana bi piranî ji ber çewisandinên dînî ji Împaratoriya Osmanî, di destpêka sedsala 20an de li van deran bicih bûne. Ji salên 1980yî vir ve yezîdî ji welatê xwe ber bi Ewropayê herî kêr bi sê pêlan koç kirine. Di salên 1980yî de yezîdiyên Tirkîyê ber bi Almanyayê koç kirine. Bi dû re di dawiya salên 1980yî û destpêka salên 1990î de yezîdiyên Iraqê ber bi Ewropayê çûne.”¹²⁷

Sebastian Maisel jî, ku li ser êzîdiyên li nava sînorê dewleta suriyê dijîn xebat kiriye, li ser nifûsa kurdên êzîdî hejmarên cuda û spekulatîf dide.

“Yezîdî, komeke dînî ne ku bi zaravayê kurmancî ya kurdî diaxivin. Şûnewarê wan yê bingehîn Bakûrê Iraqê ye. Bi rengê hin komên biçûk li Ermenistan, Gurcistan, Almaniya û Suriyê jî dijîn. Li gorî texmînan nifûsa wan di navbera 150 û 800 hezarî de ye û piraniya vanan li Iraqê dimînin.”¹²⁸

Martin Van Bruinessen, ji John Guest ê ku di mijara êzîdiyan de lêkolerekî gelekî girîng e, wiha neqil dike:

¹²⁶ Arşad Poladyan-G. S. Astaryan, ‘Yezidi Dini’, *Kürt Batıniliğinde Kutsal Metinler (M. Bayrak)*, Özge Yayınları, Çev. Melisa Taşçıyan, 1. Baskı, 2016, Ankara, r. 645.

¹²⁷ K. Omarkhali, *Kürdistan’da Dini Azınlıklar*, r. 128.

¹²⁸ Sebastian Maisel, ‘Bir Toplum İki Kimlik’, *Kürdistan’da Dini Azınlıklar*, r. 144.

“Di xebata bi dîqet ya John Guest de, ku di demeke nêz de hatiye kirin, hejmara nifûsa êzîdîyan wekî 150 hezar tê hesabkirin ku piraniya wan li Iraqê bi cih in. Ji vanan nêzî 40 hezar li Ermenistan û Gurcistanê dijîn. 5 hezar ji vanan li Sûriyê û 10 hezar ji vanan jî li Tirkiyê dijîn.”¹²⁹

Bêguman ji bo komeke civakî ya bi vî rengî girtî, biçûk û belawela ku di nava sînorên çendîn dewletan de dijîn, derxistina hejmareke rast ya ji bo nifûsa wan gelekî zehmet e. Loma jî hejmarên ku têne dayin bi piranî spekulatîf in.

1.2.2. Dîrok û Taybetmendiya Baweriya Êzîdiyê

Ev grûba etno dînî, her çendî ku îro li deverên mîna Laleş, Şêxan û Sîncarê bi cih in jî, ji xwendinên dîrokê em dizanin ku demekê ew li seranserê Kurdistanê bi rengekî berbelav dijiyan. Heta hin eşîr an jî konfederasyonên kurdan hebûn ku milekî wan kurdên misliman û milekî wan jî kurdên êzîdî bûn. Di hin pasajên Destana Derwêşê Evdî û Edûlê de, tê gotin ku hin binbeşên an jî milên eşîra Millî êzîdî bûn. Wekî *Şerqiya* û *Dina*. Malbata Derwêş jî ji vî milê êzîdî bû. Her wiha dîsa ji xwendinên dîrokê em têdigihên ku di sedsalê 13 û 14an de hin eşîrên kurdan, êzîdî bûn lê bi dû re vegeyriyane ser riya îslamiyetê. Ev realîte di Şerefnameyê de bi mînaka Eşîra Dunbuliyan wiha tê neqilkirin.

“Di destpêkê de mîrê eşîretên Dinbilî girêdayî dîne batîni yê êzîdîti bûne, pişt re mîrekî wan yê bi navê Îsabegî tê naskirin, bi hinekî qebileyên wan ên din re vegeyriyane ser riya ehlê sunetê û mezhebê cema’etê. Lê li wir hinek kes hene ku li ser bîr û baweriya xwe ya berê rikoyî ne.”¹³⁰

Bedlîsî dema ku behsa fermanrewayên Cizîrê dike, balê dikêşe serê ku pêşên wan êzîdî bûne lê bi dû re ew ji êzîdîbûnê vegeyriyane dîne îslamê.

“Di destpêkê de kesên vê xanedana han ên xwedî paye, li ser rêça dîne êzîdîti de dimeşîyan, piştta xwe bi exlaq û adetên wan ve girêdabûn û ji rê derketibûn. Lê pişt re Xwedayê bendeperwer bû rêberê wan û ew xistin ser rêya mezhebê ehlê heq û sunet. Gelek mizgeft û mederese ava kirin.”¹³¹

¹²⁹ M. Van Bruinessen, *Kürdistan Üzerine Yazılar*, r. 25.

¹³⁰ Ş. Bedlîsî, *Şerefname*, r. 401.

¹³¹ H.b., r. 209.

Bedlîsî, dema ku behsa civaka êzîdî dike, dînê wan qismî be jî di nava îslamiyetê de dibîne. Her çendî di pasaja jorîn de vê baweriyê wekî dînekî batînî bi nav kiribe jî, di pênaseya jêrîn de bi piranî wekî terîqetek di nava îslamiyetê de dibîne.

“Hinek eşîret û qebîlên kurdan ku ketine aliyê Mûsil û Şamê, ên wekî Dasnî, Xaldî, Besyanî, birek ji Mehmûdî û Dunbuliyan, êzîdî ne û murîdê Şêx ‘Adiyê kurê Misafîr in ku ew jî li ser zencîra xelîfeyên Merwanî bûye. Ev êzidiyên han, baweriya wan ew e ku: Şêx ‘Adî yê gora wî li Geliyê Laleşê ye, wezîfeya nimêj û rojiya êzdiyan girtiye ser milê xwe û soz daye wan, roja rabûnê ya dinya dîn, bi bê pîrs û sual wan bibe cennetê. Êzîdî ji mela û zanayên zahirî yên musulmaman gelek dudil in û rikê wan ji wan vedibin.”¹³²

Mehemed Emîn Zekî Beg, di vê mijarê de hinekî ji Bedlîsî vediqete. Li gorî wî bingehên êzdiyatîyê digihîjin dînê manî.

“Xwediyê dîroka Mûsilê wiha dibêje: Divê sebebê navê vê baweriya han, îlahiyekî vî qewmê êzîdî be, ku navê wî Yezîd an jî Yezdan bûye. Pêwendîya navê êzîdî wekî hinek nivîskarên îdîa kirine bi Yezîd bîn Selehmî an jî sê Yezîdên xelîfeyên Emewî ve ji eqîl û mantiqê dûr e. Li milekî din jî, nivîskarê yewnanî Teyafoyanos, ku di sedsala 7an beriya zayînî de jiyaye, dibêje împrator Herakliyus li nêzîkê bajarê Yezdemê leşkergeha xwe danî, li gor nêrîna Major Rolinson, ev bajarê Yezdemê, îhtîmal e nêzîkê Hedeyabê (Mûsilê) bûbe û mimkûn e tayîfeya êzîdî ji vî bajarî belav bûbe.”¹³³

Zekî Beg neqil dike ku beşa kurdên ku di vê baweriyê de ne, li aliyê Helebê, Wanê û Erzîromê û beşa piraniya wan jî li wîlayeta Mûsilê, li Sencarê û qezaya Şêxanê ne. Nifûsa wan nêzîkê 300 hezaran e. Li gorî Zekî Beg, esasê diyaneta êzîdîtiyê, mezhebê Manî ye, hinek dibêjin diçe digihîje mezhebê zerdeştî, ku bawerî bi wicûda du xwedayan kirine. Li gorî baweriya wan divê îbadet ji bo rojê û şeytên bê kirin. Wekî çawan di mezhebê zerdeştî de bawerî bi xwedayê xêrê Hurmuz û xwedayê şer Ehrîman hatiye kirin. Baweriya vê taîfeya han jî bi xwedayê xêrê heye ku xwedî rehmeteke bê sînor e û ji tevan bilindtir e. Baweriya wan bi şeytên jî ku ew sebebê şer û zerarê ye û ne ji bo îhtîramê lê ji tîrsa şer jê re îbadet dikin... Yezîdî ji pûtekî re secde dikin ku di şiklê teyrekî de ye û jê re

¹³² Ş. Bedlîsî, *Şerefname*, r. 102-103.

¹³³ M. E. Zekî Beg, *Dîroka Kurd û Kurdistanê*, r. 199.

Melekê Tawûs dibêjin. Li ba wan wisan e ku ev xwedayê han beriya hemî mexlûqatan hebûye û li hemî ciyekî hazir e. Şêx ‘Adî wekî Melekê Tawûs dihesibînin.¹³⁴

Li gorî Zekî Beg, Şêx ‘Adî ji gundekî nêzîkê Be’albekê hatiye çiyayên Hekariyê û li wir tekyayekê vekiriyê û gelek xelk li dora wî berhev bûye û di sala 1160î de wefat kiriyê. Lê kitêba keşeyê nestûrî Ramîşû, (1452) û birêz Nû dibêjin, Şêx ‘Adî di warê qewmî de kurd û di hêla baweriyê de jî Serahî (Zerdeştî) bû.¹³⁵

Lêkoler Nelida Fuccaro ji Îbnî Teymiye neqil dike ku; peydabûna dînê êzdiyatîyê bi Şêx Adî ve girêdayî ye û her wiha êzîdî ji Yezîd bîn Muawiye re îbadetê dikin.

“Îbnî Teymiye, derketin û pêşketina dînê êzdiyatîyê bi Şêx Adî ye li ser silsileya emewiyan ve girê dide. Li gorî Teymiye piştî du nesil li ser mirina Şêx Adî, murîdên wî wesfîyetên îlahî lê bar dikin û îbadetjî Yezîd bîn Muawiye re dikin. Ev taybetî wan ji nava xeta îslamî derdixe... Li gorî hin çavkaniyên suryanî gelek hêmanên bawerîya zerduştîyê di nava vî dînî de bicih bûne.”¹³⁶

Tosinê Reşîd, ku bi xwe êzîdiyekî Kafkasyayê, bi hesasiyet li hember vê îdîayê dertê ku bingehên dînê êzdiyatîyê bi Şêx Adî dest pê dike.

“Hinek zanyarên ku bi salên dirêj bi pirsên dîrok, ziman, çand û ola kurdan re mijûl bûne, wekî kurdnasên rûs N. Ya. Mar û Bazil Nikitin, ola êzdiyan wekî oleke ji îslamê der, oleke serbixwe dibînin û bawer dikin ku ola kurdan a beriya îslamiyetê êzdiyatî bûye. Hinek zanyarên mayin, bi taybetî yên ku pirsê kurdan baş nizanin, zanayên ola îslamê, bi sivikayî bi pirsê re nas in, dîroka ola êzdiyan ji Şêx Adî dest pê dikin û wê olê wekî tekiya sofîyên misliman raber dikin.”¹³⁷

Ne bi tenê Reşîd, her wiha gelekî lêkolerên ku bi xwe esil-êzîdî ne, red dikin ku êzdiyatî wekî dîn ji nava îslamiyetê derketiye. Lekolînerên mîna Celîlê Celîl, Dawid Mirad Xetarî, Arshad Hamid Miho, Kovan Xankî û Xeyrî Bozanî ku me di çarçoveya vê xebatê de bi wan re hevpeyvînan kiriyê, bi hesasiyet dupat dikin ku

¹³⁴H.b., r. 201.

¹³⁵ H.b., r. 201.

¹³⁶ Nelida Fuccaro, *Öteki Kürtler, Sömürge Irak'ında Ezidiler*, bgst yay., Çev., Şerif Derince (vd.), 1. Baskı, 2010, İstanbul, r. 33.

¹³⁷ Tosinê Reşîd, *Êzdiyatî, Oleke Hê Jî Nenaskirî*, Weş. Lîs, Ç. 1., 2010, Stenbol, r. 21.

êzdiyatî tu eleqeya xwe bi îslamiyetê re nîn e. Ew bermaya dînê kevnar yê bi navê mîtraîzim anko şemsanî ye.

Li gorî ku Celîlê Celîl neqil dike; êzîdîyan, ji bo ku xwe ji êrîşên derdorê biparêzin, navê xwe guhartine û navê êzîdî li xwe kirine ku ev yek tê wateya xwedênasiyê. Celîl qeyd dike ku navê Tawisê Melek anko Şeytan di nava dînên derdora êzîdîyan de bi rengekî nebaş dihate pêşwazîkirin û vê yekê li ser jiyana û berdewamiya civaka êzîdîyan xetereyê çê dikir. Lewma jî wan dev ji van navan berda û ji bo xwe êzîdî gotin. Wan bi vê yekê dixwest nîşan bidin ku ew jî wekî cîranên xwe, peyrewên dînekî xwedênas in.¹³⁸

Dawid Mirad Xetarî jî bi heman rengî difikire. Li gorî Xetarî; êzdiyatî bê şik li derveyê dînê îslamiyetê ye. Sedema ku di hin hêmanên wan yên baweriyê de li hevçûn hene jî ew e ku ew du baweriyên cîranê hev in. Wan li hev û du bandorê kiriye. Lê êzdiyatî beriya îslamiyetê heye. Ew ji dînê şemsanî tê. Heta Xetarî îdîa dike ku Şêx Hadî bi xwe jî bi malbata xwe ve êzîdî bûye. Wî di dînê êzîdîyan de reformek, nûjeniyek pêk aniye û bi vî rengî êzîdîyan di qonaxeke zehmet de derbas kiriye.¹³⁹

Lêkoler Arshad Hamid Miho jî bi heman rengî difikire ku dînê êzdiyatî paşmaweya dînên kevnar yên berî îslamê ye. Lê ew bi dîqet îfade dike ku; digel ku êzîdî û hin lêkolerên di jî wisa îdîa dikin ku êzdiyatî beriya îslamiyetê jî hebûye, dîsa jî li ber me tu dokumentên pêbawer nîn in ku em durust diyar bikin ku êzîdî berê îslamiyetê çawa bûn, kî bûn, navê wan çi bû. Ev jî arîşeyek e.¹⁴⁰ Hamid Miho li ser wê baweriyê ye ku lêkoler li taybetmendiyan sîstema dînî ya êzdiyatîyê dinihêrin û digihîjin wê encamê ku ev taybetmendî aydê dewrên beriya îslamiyetê ne.

Fuccaro, êzdiyatîyê wekî doktrîneke têkel û rîtuêlên wê wekî senkretîzma rîtuêl bi nav dike. Li dû fikra wî; êzdiyatîyê, pêkanîn û prensîbên cuda ji dîn û doktrînen cuda girtine û di binê yek sîstema baweriyê de bi hev ve kelijandine.¹⁴¹

“Êzîdî, cemaetê kurdan ya heterodoks e ku bingehên wê digihîjin sedsalên 12 û 13an... Gelek hêmanên doktrînî yên êzdiyatîyê bi dînên kitabî yên wekî îslamiyet,

¹³⁸ J.7. Pêvek 3.

¹³⁹ J.8., Pêvek 3.

¹⁴⁰ J.10., Pêvek 3.

¹⁴¹ N. Fuccaro, *Öteki Kürtler, Sömürge Irak'ında Ezidiler*, r. 21.

xirîstiyani û zerduştîyê re têkildar in. Lê zêdetiya senkretîzmê nişan dide ku ew bi hêmanên çanda populer re jî girêdayî ye... Êzdiyatî dînekî li ser esasê ednogamiyê ye. Ji dîn derketin, dîn guhartin, zewaca bi mensûbên dînekî re qedexe ye... Êzdiyatî di sedsalên 13 û 15an de li nava eşîrên kurd belav bû. Di sedsala çardan de dîne resmî yê Mîrektiya Cizîrê bû. Di heman demê de heft eşîrên herî bi hêz yê kurdan êzîdî bûn."¹⁴²

Kreyenbroek jî li ser heman fikrê ye ku di destpêkê de gelekî eşîrên kurdan yê navdar li ser vê baweriyê bûn. Lê ji 1415an vir ve di navbera vê baweriyê û xelkên cîran de dubendî ew çend zêdebûn, ku cîranên wan bi artêşeke giran hatin ser wan û gelekî bawermendên vî dînî kuştin û Lalişa pîroz rûxandin.

*"Di sedsalên destpêkê yê vê baweriyê de gelekî eşîrên navdar yê kurdan yezîdî bûn û yezîdî li herêmê hêzeke girîng bûn. Paşê di sedsalên 16. û 17. de di encama reqabeta di navbera Împaratoriya Osmanî û Împaratoriya Sefewî de eşîrên kurd yê yezîdî ku li ser sînorê van her du hêzan bicih bûn, ji ber hin "firsendên baş", dev ji "fihêta kafîrbûnê" berdan û bûn misliman û her ku çû hêza yezîdîtiyê kêmbû. Her ku hêza yezîdîtiyê kêmbû, zulm û zora li ser wan jî zêde bû."*¹⁴³

Izady vê grûba etnîk di nava bawerîya mezin ya bi navê 'yezdanî' de dibîne. Li dû fikra wî ev têgeh tê wateya 'melekvan' an jî 'melekperest'. Li gorî wî êzdiyatîya îroyîn milekî vê bawerîya fireh e ku navê wê yezdanî bû. Li dû fikra Izady, her çendî ku Bedlîsî, îdfîa dike ku piraniya kurdan sunî ne jî, di dewra Bedlîsî de piraniya kurdan êzîdî bûn. Izady, vê îdfîaya xwe wiha bi delîl dike:

*"Ev dîne ku Bedlîsî wekî 'Yezîdî' bi nav dike, li her aliyê Kurdistanê belav bûbû û di dewra wî de piraniya kurdan peyrewên vî dînî bûn. Bedlîsî, di destpêkê de bi rengê empatîk hemî kurdan wekî sunî pêname dike. Lê dema ku bi detay behsa klan, eşîr û mîrektiyên kurdan dike, neqil dike ku piraniya ji wan yan di dema wî de yan jî di demeke nêz a borî de 'yezîdî' bûne."*¹⁴⁴

Bêguman ev nîqaşeke zanistî ye lê di tu jêdereke de em lê rast nehatine ku di demeke dîrokê de, piraniya kurdan li ser bawerîya êzdiyatîyê bin. Her wiha ne hêsan e ku civakek dev ji baweriyên xwe bi yekcarî berde û bibe peyrewê bawerîyêke dî. Di seyhethnameya Ewliya Çelebî de jî her çendî ku behsa kurdên

¹⁴² H.b., r. 29-30.

¹⁴³ Philip G. Kreyenbroek-Xelîl Cindî Reşow, *Tanrı Ve Şeyh Adî Kusursuzdur*, Avesta Yayınları, Çev. İbrahim Bingöl, 1. Baskı, 2011, İstanbul, r. 26.

¹⁴⁴ M. R. Izady, *Kürtler*, r. 253.

êzîdî tê kirin jî piraniya kurdan wekî sunî tîn nirxandin. Ji xwe konjektora Şerê Çaldêranê jî, yanê dubendiya navbera şîe û suniyan jî vê rastiyê radixe pêş çavan. Kurd di wê demê de ji ber ku bi piranî sunî bûn, alîkariya Osmaniyan kiribûn. Lê ev jî diyar e ku hejmara bawermendên vî dînî, li gorî berê her ku çûye kêr bûye. Yanê di dewra destpêkê ya vî dînî de, bi îhtîmaleke mezin rêjeya wan ya nava civaka kurdan ji ya îroyîn gelekî zêdetir bû. Hem sîstema girtî ya dînê êzdiyatîyê û hem jî êrîşên derveyîn bûn sedem ku gelek eşîrên ku demekê êzîdî bûn, dev ji dînê xwe berdîn.

Çavkaniyên êzîdî bi xwe neqil dikin ku di êzdiyatîyê de ne pêkan e ku yek bi dû re bibe êzîdî. Êzîdîbûn bi tenê bi rêya dê û bavekî êzîdî pêktê. Di hevpeyvîna xwe ya bi Celîlê Celîl re wî ji bi heman rengî qeyd kir ku êzîdî tu car qebûl nakin ku yek bê ser dînê wan. Celîl, îdia dike ku hin dîn hene di tebîeta xwe de agresîv in û hin dîn jî hene ev tebîet li gel wan tune ye. Li gorî Celîl, êzîdî tu car bi mebesta ku hin kes û civakên di bixin ser rêya dînê xwe êrîşan nakin, tu kes û civakan mecbûr nakir ku bêne ser dînê wan. Di êzdiyatîyê de, bi gotina Celîl; ‘tu zêr jî bî’ ew ê bi tenê ji te re spasdar in. Ew ne mirovan mecbûr dikin ku bêne ser dînê wan û ne jî li ser xwe mecbûriyeteke bi wî rengî qebûl dikin.¹⁴⁵

Êzîdî di vê wateyê de civakeke girtî ne. Ev taybetmendiya girtîbûna ji derve re, dema ku bi êrîşên derveyîn re jî bê fikirîn, bêguman li ser populasyona vê beşa civakî bandorê dike. Dawid Mirad Xetarî balê dikêşe ser taybetmendiya ‘xezwetê’ ya di dînê îslamiyetê de û li gorî wî ji ber vê yekê her ku çûye hejmara êzîdiyan kêr bûye. Xetarî wiha dibêje:

“Dîne îslamiyetê bo bawermendên xwe dibêjite here xezweta bike, here cîhadê bike, erdî bo mislimantiyê vebike. Mêran bikuje jin ji te ra. Mal û helalên wan ji te ra. Ê bê şik dê wisa bit (nifûsa êzdiyan kêr bibit) û di wê wextê de alemeke bê aqil jî hebû.”¹⁴⁶

Bruinessen jî wekî lêkolerên êzîdî balê dikêşe ser wê nuqteyê ku êzîdî, ji ber zextên li ser wan, mecbûr man ku dînen xwe biguhêrin.

“Li gorî qeydên sedsala 19. yê tirkan; yezîdî, li bakûrê rojava, heya Sêwasê û Diyarbekir, li herêmên Mêrdîn û Sêrtê dijiyan. Zulm û çewisandinên dînî hejmara

¹⁴⁵ J.7., Pêvek 3.

¹⁴⁶ J.8., Pêvek 3.

wan gelekî kêr kir. Gelek ji wan hatin kuştin û yên mayî yan veşeriyên ser xirîstiyaniyê yan jî îslamiyetê. Ji ber ku klîseyên xirîstiyaniyê li hember yezîdîyan bêtir xwedî tolerans bûn, gelekî yezîdîyan xirîstiyaniyê helbijart. Beşeke girîng ya xirîstiyaniyê rojavayê suriyê bi ihtîmaleke mezin ji nesla wan yezîdîyan in ku dîne xwe guhertine. Di demeke nêz de jî ji xirîstiyaniyê derbasî îslamiyetê bûne. Eşîrên wekî Millî, Berazî û Hevêrkan, ku heya sed sal berê jî ya bi temamî yezîdî bûn yan jî qismen yezîdî bûn, niha qet nebe di zahîrî de misliman in.”¹⁴⁷

Dr. Arşad Poladyan ne li ser wê fikrê ye ku êzîdîtî di demên beriya îslamiyetê an jî di demên destpêka îslamiyetê de dînekî hevpar yê miletê kurd be. Li dû fikra wî, bi delîlan dikare bê ispatkirin ku dîne êzîdîyatî di dewra navîn de şekil girtiye, li ser bingeha sûfîzma îslamî geş bûye û lewma jî ne pêkan e ku dîne hevpar yê kurdan yê beriya îslamiyetê be.¹⁴⁸

Her çendî ku ne bi rengê ku Poladyan îdîa dike be jî, lêkolerên êzîdî jî balê dikêşin ser taybetmendiya bingehên tesewîfî yên vî dîni. Lewre dema ku em bala xwe bidin tekstên dîni yên êzîdîyatîyê, tê dîtîn ku ji Hellacê Mensûr heya bi Rebîa Eddawî, ji Hz. Ebûbekir heya bi Yezîd bîn Muawiye û Bazîdê Bestamî û gelek kesayetên dîrokî û dîni di nava qewl û beytên êzîdîyan de cih digirin. Heta di hin efsaneyên wan yên dîni de behsa kesên ne misliman yên wekî Hamûrabî wekî Nebûqednazer tê kirin ku ew jî êzîdî bûne. Ev têkilheviya di nava termînolojiya dîni ya êzîdîyan de hem bala lêkoleran kêşaye hem jî bûye sedem ku ev dîni wekî dînekî senkretîk bê dîtin.

Poladyan jî balê dikêşe ser taybetmendiya senkretîk ya vî dîni û îdîa dike ku di çêbûna têgihên dîni yên vê baweriyê de, ji gelek dînen din sûd hatiye wergirtin.

“Di hemî vekolînan de ku li ser êzîdîyan hatine kirin, teqez hatiye binxêzkirin ku taybetiya sereke ya vî dîni, senkretîk bûna wî ye. Li gorî van vekolînan êzîdîtî, ji anîna cem hev ya zerduştî, xirîstiyaniyê, mislimaniyê û heta bûdîzîm û mûsewîtiyê, derketiye. Di baweriyê êzîdîyê de ji gelek dînan hêman hatine wergirtin û divê bandora vê zêde neyê mezinkirin. Wekî mînak girîngiya roj, hîv û agir ya ku di baweriyê êzîdîyê de derdikeve pêş me ji zerduştîyê hatiye wergirtin. Ev hêman ew çend berbelav in ku em dikarin di nav pers, ermeni û tacîkan de jî bibînin.”¹⁴⁹

¹⁴⁷M. Van Bruinessen, *Kürdistan Üzerine Yazılar*, r. 25-26.

¹⁴⁸ A. Poladyan-G. S. Astaryan, ‘Ezidi Dini’, *Kürt Batınlılığında Kutsal Metinler*, r. 648.

¹⁴⁹ H.b., r. 648.

Li gorî Celîlê Celîl; heta ku sûfîzim neyê têgihîştin, ne mimkun e ku êzdiyatî jî bê têgihîştin. Celîl, qeyd dike ku çiqas sûfîyên îslamî hebin ew di qewl û beytên êzîdiyan de bi rengekî cih digirin.¹⁵⁰

“Abdulqadirê Geylanî heye, Şêx ‘Adî heye. Vana tev digihîjin hev. Tev ekolek bûne. Evana ekola sûfîzmê ne. Di bingeha xwe da dijî îslamiyeta ortodoks in.”¹⁵¹

Ev yek her çendî ku ji aliyek ve nêrîna ku dibêje êzdiyatî ji nava sûfîzma îslamî derketiye bi hêz dike jî, hin lêkolerên êzîdî vê wekî cureyek taqîyye, dibînin. Li dû fikra lêkolerên mîna Arshad Hamid Miho û Xeyrî Bozanî, sedema ku gelek nuweyên aydê dîne îslamiyete ketine nava êzdiyatîyê ew e ku, êzîdiyan bi vî rengî xwestine xwe ji qetlîam û fermanan rizgar bikin.¹⁵² Arshad Hamid Miho, îdîa dike ku êzîdîtî di dewra Ebbasiyan de bi bandora sûfîzmê nêzî îslamiyete bûye. Êzîdiyan bi vê rêyê xwestine xwe ji êrîşên derveyî biparêzin.¹⁵³

Lê wekî şîrove mirov dikare bibêje, mimkun e ku di destpêkê de ev dîn, di nava civaka kurdan de wekî terîqetek di nava sûfîzma îslamî de derketiye meydanê. Lewma ji bo kurdan ne zehmet bû ku di nava dîne îslamiyete de bibin peyrewên terîqetekê. Lê her ku di nava vê terîqete de tundrewî an jî aliyê wê yê batinî zêde bû û taybetmendiyên derveyê dîn derketin meydanê, hingê bawermendên vê terîqete wekî kafir hatin dîtin, gelek eşîrên kurdan jî ji ber hin berjewendiyên xwe, dev ji rêya vê terîqete berdan.

Her wiha girîng e ku di gelekî metnên êzîdiyan de, ew di navbera şîetî û sunîtiyê de xwe nêzî sunîtiyê dibînin, heta xwe wekî ehlî sunet didin nasîn. Rêz û îhtîrama wan ya li hember, xelîfeyên mîna Hz. Ebûbekir, Hz. Umer, Hz. Osman û dîsa rêz û îhtîrama wan ya li hember xelîfeyê Emewî Mûawiye û binavkirina wan ya Yezîd Bîn Merwan, wekî ‘Sultan ‘Ezî’ û pîrozdîtina şexsiyeta wî, nîşaneyên vê yekê ne. Di heman demê de di metnên wan yê dînî û folklorî de tê dîtin ku rediyeyeke wan ya aşkera li hember ‘qizilbaşiyê’ heye. Wekî mînak di van qewlên jêrîn de, *Qewlê Mela Ebû Bekir* de, em dibînin ku êzîdî, şîe-qizilbaşan wekî rafîzî anko ji rê derketî bi nav dikin û şukur dikin ku ew yanê êzîdî wekî wan ji rêya ehlê sunetê veneqetiyane:

¹⁵⁰ J.7., Pêvek 3.

¹⁵¹ J.7., Pêvek 3.

¹⁵² J.11., Pêvek 3.

¹⁵³ J.10., Pêvek 3.

“Minetkarim ji minetê

Vavartim ji şîr’etê

Hemdilla û şikir

Havêtime ser pişka Şêxê Sunetê

Minetkarim ji mîra

Vavartim ji xenzîra

Hemdila û şikrî

Havêtime ser pişka şêxan û pîra

Minetkarim ji ‘Adiya

Vavartim ji Rafîdiya

Hemdila û şikrî

Havêtime ser pişka Mala ‘Adiya”¹⁵⁴

Li gorî Kreyenbroek her çendî ku pêwendiyê xurt di navbera êzdiyatî û îslamiyetê de hebe jî û îslamiyet di dîroka wan de xwedî cihekî girîng be jî ew xwe wekî misliman nabînin. Kreyenbroek têkiliya di navbera êzdiyatî û îslamiyetê de wiha rave dike:

“Di dîroka dînan de, ne tiştekî xerîb e ku mirov bibîne, dînek ji nava dînekî di derbikeve. Têkiliya di navbera êzdiyatî û îslamiyetê de, hem ji aliyê dostanî hem jî ji aliyê dijminahiyên wan ve têkiliyêke derasa ye. Di kevneşopa metnî ya dînê êzdiyatî de em bi rihetî vê dikarin bibînin. Li aliyekê termînolojiya dînî ku ew bi kar tînin û hin teswîr û bûyer ji çanda îslamî ku cîranê wan e tê. Gelek hêmanên sûfîzmê û ehlê sunetê di nava dînê êzdiyatî de jî wekî rast hatine qebûlkin... Têgihên mîna şerîet, heqîqet û terîqet ji kevneşopa sûfîzmê ketine nava dînê êzdiyatîyê”¹⁵⁵

Izady, îdîa dike ku yezdanî dînekî mezin yê kevin e ku navekî wî jî Heq e. Êzîdîtiya îroyîn, elewîti û yarsanî sê milên vê baweriya mezin in ku gihîştine roja îroyîn. Li gorî wî elewiyên turkmen û nuseyriyên ereb jî ji vê bingehe tîn.¹⁵⁶

¹⁵⁴ P. G. Kreyenbroek-X. C. Reşow, *Tanrı Ve Şeyh Adî Kusursuzdur*, r. 300.

¹⁵⁵ H.b., r. 68.

¹⁵⁶ M. R. Izady, *Kürtler*, r. 253.

Lê di vê nuqteyê de Bruinessen bi Izady re hemfikir nîne. Li gorî Bruinessen, dibe ku êzdiyatî ji bingeh de dijberê mezhebên ku ji nava şîetiyê derketine be.

“Ehlî heq û êzdiyatî, hem ji navê pêşewa û rêberên wan ên dînî, hem jî ji gotinên wan yên ku fikrên wan ên dînî bi wan tên îfadekirin diyar e ku her du mezheb jî di çarçoveyêke îslamî de derketine meydanê. Digel vê jî, mezhebê ehlî heq bi piranî daxilê nava şîetiyê mufrît hatiye kirin lê dibe ku yezîdîtî mezhebeke misliman yê ku di bingehê xwe de dijberê şîetiyê mufrît be. Lihevçûnên wan ji ber hevpariya kokên wan yên beriya îslamîyê ne.”¹⁵⁷

Mirov vê fikra Bruinessen dikare bi rêya metnên dînî û folklorî yên êzîdiyan bi rihetî bipeyitîne. Lewre di dema vekolîna xwe de, di gelek cihan de me tesbît kir ku di metnên wan yên dînî û folklorî de, dijberiyê wan ya aşkera li hember ‘qizilbaşan’ heye. Dijberiyê wan ya dî jî li hember cihûyan e ku ev jî şayanê vekolînên zanistî ye.

Di dawiyên sedsala 19an û destpêka sedsala 20an ji aliyê rojavayîyan ve li ser êzîdîtî û kitêbên dînî yên êzîdiyan; Mishefa Reş û Kîtaba Cilwe, gelek vekolîn hatine kirin. Lêkolerên wekî Edward Granville Browne û bi dû re P. Anastase îdîa kirine ku wan ev her du kitêbên dînî keşif kirine. Nivîskarên van pirtûkan diyar nîn in lê Mishefa Reş li Hesênê Besrî û Kîtaba Cilwe jî li Şêx Fexreddîn tê nîsbetkirin.¹⁵⁸ Lê Lêkolerên çand û dîroka êzîdiyan yên wekî Dawid Mirad Xetarî¹⁵⁹, Kovan Xankî¹⁶⁰, Arshad Hamid Miho¹⁶¹ û Xeyrî Bozanî¹⁶² ku me bi wan re hevpeyvîn çêkirin, li hember van îdîayan derdikevin û dibêjin ku ev her du kitêbên dînî di sedsala 12 û 13an de ji ber ferman û talankirinên li ser êzîdiyan, bi rengekî fîzîkî hunda bûne.¹⁶³ Ev her du kitêbên ku lêkolerên rojavayî îdîa dikin ku Mishefa Reş û Kîtaba Cilwe ne, bi rastiyê re tu eleqeya wan nîn e. Li gorî van lêkoleran; êzîdiyan, qewl û beytên di van kitêban de, bi rengekî devkî neqil kirine.

¹⁵⁷ M. Van Bruinessen, *Kürdistan Üzerine Yazılar*, r. 28-29.

¹⁵⁸ Ahmet Taşgîn, <https://islamansiklopedisi.org.tr/yezidiyye>, Dîroka Pêwendiyê: 01/07/2020

¹⁵⁹ J.8., Pêvek 3.

¹⁶⁰ J.9., Pêvek 3.

¹⁶¹ J.10., Pêvek 3.

¹⁶² J.11., Pêvek 3.

¹⁶³ J.8., Pêvek 3.

1.2.3. Di Nava Civaka Êzîdî De Nasnameya Etno-Dînî

Her çendî ku ji aliyê gelek lêkolerên derveyî ve bi piranî wekî ‘yezîdî’ hatibin binavkirin jî êzîdî xwe wekî ‘yezîdî’ bi nav nakin. Ew bi piranî xwe wekî ‘êzîdî’, ‘êzîdî’, ‘êzdî’ bi nav dikin û dîne xwe jî wekî ‘êzdîtî’ an jî ‘êzdiyâtî’ bi nav dikin. Li ser etîmolojiya vê peyvê nîqaş çêbûna. Hin lêkoleran îdîa kirine ku ev peyv ji her du peyvên kurdî yê ‘ez’ û ‘da’ yê pêk hatiye.¹⁶⁴ Lêkoler M. Emîn Zekî Beg ku wan wekî yezîdî bi nav kiriye jî hem refere bi ‘yezdan’ a kurdî ku tê wateya xweda kiriye hem jî refere bi bajarê ‘Yezdem’ê kiriye ku di nivîsên kevnar de derbas dibe.

Lêkolerê êzîdî, Xeyrî Bozanî ji bo bingeha têgiha ‘êzîdî’, îşaret bi têgiha ‘îzed’ dike ku li gorî wî ev têgih di zimanên kurdî û îranî de tê wateya melek an jî xweda.¹⁶⁵ Celîlê Celîl jî îfade dike ku êzîdîyan navê ‘êzîdî’ paşê, di dewrên navîn de bi kar aniye. Ji ber ku civakên misliman yê derdorê, ew bi xwedênenasiyê an jî ‘şeytanperestiyê’ tawanbar kirine, wan jî vî navî yanê navê êzîdî li xwe kirine da ku nîşanê civakên derdorê bidin ku ew xwedênas in.

“Ez te ra bibêjim, eva nava teze ye. Yanê navê êzdiyâtî teze ye. Eva paşê çêbûye. Em bibêjin di edebiyata berê de navê êzdiyâtî tune. Êzdî dûre ji xwe ra gotine em êzdî ne. Ji wan re gotine ku evana şeytanperest in. Evana jî ji wî navî xwe dûr dixin. Çunkî kirêt e. Çunkî nalet dikin. Te di navê şeytan Quranê da tê naletkirin. Êzdî ew nalet nakin. Êzdî jî di dîne xwe da lê nalet nakin. Navê şeytan hilnadin. Çunkî tune jî. Loma navê Xweda li xwe kirine. Evana jî ji wî navî xwe dûr kirine. Tu dizanî Tawis, beriya îslamî heye. Ji Fînîke wan deran heta li Iraqê hebûye.”¹⁶⁶

Lêkoler Khana Omarkhalî behs dike ku êzîdî carina ji bo xwedê, ‘heq’ dibêjin. Khana balê dikêşe ser pîroziya agir, av, hewa û axê di dîne êzîdîtiyê de ku ev hêman di zerduştîyê de jî pîroz tînin. Di demên îbadetê de ew berê xwe didin rojê û ji ber vê yekê ye ku pirî caran ji wan re ‘agirperest’ hatiye gotin.¹⁶⁷ Li dû fikra Khana êzîdî, kurdên ku nebûne misliman in an jî dîne xwe yê berê bi hatina îslamiyetê neguhertine.

“Yezîdî ji dîne xwe re ‘êzdiyâtî’ an jî ‘êzdîtî’ dibêjin ku ev dîn beriya îslamiyetê hebûye û wan dîne xwe neguhertiye. Yezîdî (bi pênasekirina wan bi xwe êzdî) her li

¹⁶⁴Amed Gökçen, *Ezidi Ağutları*, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, 1. Baskı, 2015, İstanbul, r.7.

¹⁶⁵ J.11., Pêvek 3.

¹⁶⁶ J.7., Pêvek 3.

¹⁶⁷ K. Omarkhalî (Ed.), *Kürdistanda Dini Azınlıklar*, r. 129.

ku derê bijîn, bi zaravayê kurmanciya kurdî diaxivin. Hemî metnên wan yên dînî bi vê zaravayê hatine berhevkirin. Di pratîkê de piraniya êzîdîyan xwe wekî kurd pênase dikin jî, hin êzîdîyên Kafkasyayê îdîa dikin ku ew ji etnîsîteyê cuda ya bi navê 'êzdî' ne û ji herêma xwe re jî Şerefdîn dibêjin."¹⁶⁸

Problema pênasekirina civakê, bêguman di heman demê de mijareke sosyopolîtîk û antropolojîk e ku me di beşa destpêkê de vê nîqaşê kiribû. Li ser nasnameya etnîk ya êzîdîyan jî di vê çarçoveyê de hem di nava wan bi xwe de hem jî di cîhana akademyayê de gelekî nîqaş çêbûne. Christine Allison jî ji Fuccaro û Millingen neqil dike ku egerên nûjen û polîtîk di xwepênasekirina etnîk de derdikevin pêş me:

"Awayê ku yezîdî ji derve de hatine pênasekirin û hewldana yezîdîyan bi xwe ku xwe bi nasnameyê etnîk û dînî ve girêdidin bi piranî têkildarê hêmanên polîtîk yên nûjen e. Ev kom, ji dîrokeke pir zû û vir ve wekî kurd hatiye pênasekirin; di sedsala 14. de heft eşîretên herî girîng yên kurdan yezîdî bûn û yezîdîtî dîne Mîrektiya Cizîrê bû. Di sedsala 17. de Ewliya Çelebî, leşkerên Evdal Xanê Bedlîsî wekî 'kurdên yezîdî' tarîf dike. Ji aliyê ziman ve, piraniya wan wekî zimanê bingehîn bi kurmançî diaxivin û îdîa dikin ku bi sedsalan e ew vî zimanê bi kar tînin."¹⁶⁹

Li ser bingehên etnîk yê vê koma civakî nîqaşên ku hatine kirin bi piranî di binê bandora nasnameya wan ya dînî de mane. Taybetiyê sereke ya vê komê ew e ku di her şertî de zimanê wan kurdiya kurmançî ye. Her wiha digel ku piraniya lêkolanan wan wekî kurd pênase kiribe jî, êzîdî bi xwe carina ji vê pênaseyê îmtîna dikin û xwe wekî kurd nabînin. Bi taybetî hin herêmên êzîdîyên Sîncarê û êzîdîyên Kafkasyayê.

Poladyan, bi baldarî kurd û êzîdîyan wekî du kategoriyên cuda bi nav dike. Poladyan, ji hev cudabûna kurd û êzîdîyan bi xwezaya agresîf ya îslamiyetê ve girê dide:

"Avaniya agresîf ya mislimantiyê, tunebûna toleransa dînî bûye sebeb ku pîrî caran di navbera kurd û êzîdîyan de şer û bûyerên xwînî biqewimin û dijîminahiyên bi sedsalan encam bidin. Êzîdîyan pîrî caran ji gelên misliman û bi taybetî jî ji alî tirkan ve gelek zilm dîtine... Ev yek bûye sebeb ku êzîdî ji

¹⁶⁸ H.b., r. 128.

¹⁶⁹ Vgz., C. Allison, *Yezidi Sözlü Kültürü*, r. 80.

mislimanan dūrkevin îzole bibin û xwe nêzî xirîstiyanan bi taybetî ermeniyana bidin... Êzîdî bi kurmançiya bakûrê diaxivin ku ew bi xwe vê wekî zimanê êzdî an jî êzdîkî bi nav dikan.”¹⁷⁰

Ev nîqaş di nava êzîdîyan de û di nava lêkolerên êzîdî de jî nîqaşeke zindî ye. Celîlê Celîl red dike ku êzîdî etnîsteyeke cuda ne. Li gorî nêrîna wî ew bi ziman û bingehên xwe yê etnîk kurd in lê bi tenê baweriya wan ji ya piraniya kurdan cuda ye.

“Hin zanayên êzdiyatiyê hene li ewropayê û ne kurd in. Hevalên min bûn paşê min wana re şer kir. Min got hûn zanyar in lê tu tişt nizanin. Çimkî êzîdîyan wekî etnîk grûp dîtin. Çawa etnîk grûp e? Dîn diguhêzin dibin etnîk grûp? Erebeke dîne xwe biguhêzîne bibe xaçparêz, katolîk qey ew êdî ereb nîn e? Erebe! Dîne xwe berdaye. Lê nabêjin bûye fransîz yan jî ermen.... Li ser Ansîklopediya Îslamî, dinivîsin ku êzîdî kurdîziman in. Lê kurê kê ne? Ji çi eslî ne? Yanî ji kurdan diqetînin. Veke li Ansîklopediya Îslamî binihêre. Tiştên wisa Kreyenbroek nivîsî, şagirta wê jî nivîsî, Allison. Lê ev ne rast in.”¹⁷¹

Her çendî ku Celîl wiha dibêje jî hem di nava beşeke xelkê êzîdî de hem jî di nava hin lêkolerên êzîdî de, êzîdîbûn wekî aîdiyeteke etnîk an jî etno-dînî hatiye hêlsengandin. Lêkoler Arshad Hamid Miho, di heqê vê mijarê de wiha dibêje:

“Nasnama êzdiyana kêşe li ser hebûye. Kevin de jî û niha jî. Bi rastî wekî ku min ji dîrokê xwendiyê, yanî nasnama ayînî ya êzdiyana li pêş nasnama wan ya netewî hatiye. Yanî di dema Dewleta Osmanî, dîsa Dewleta Safewî, berê hingê heya Ebbasî û Emewîyan jî, serederî gel êzdiyana kirine yanî li gor nasnama wan ya ayînî ne ku ya netewî. Ber hindê êzîdî gelek tûşî kêşa û girifta û fermana, qirkirina bûne li ser vê nasnamê. Îca ji ber hindê jî êzîdî bi kurdî diaxivî û belê li Kurdistanê dijîn lê serederî gel wan hatiye kirin wekî hindek kesên ciyawaz wekî grûpeke ayînî yê ciyawaz. Ber hindê nasnameyek etnîk bi wan ra çêbûye. Wekî grûpeke etno-dînî çêbûye.”¹⁷²

Tosinê Reşîd, li ser wateya peyva kurd ya di nava civaka êzîdîyên Kafkasyayê de dibêje ku; li cem wan peyvên kurd û kurmanc sînonîm bûn. Dema

¹⁷⁰A. Poladyan-G. S. Astaryan, ‘Ezidi Dini’, *Kürt Batıniliğinde Kutsal Metinler*, (M. Bayrak), r. 646.

¹⁷¹J. 7., Pêvek 3.

¹⁷²J.10., Pêvek 3.

ku di deqeke kurdî de peyva kurmancî an kurmanc hebûya, bi zimanên biyanî, ew wek kurd, kurdî werdigerandin û ew tiştêkî normal bû. Wisa derdiket, wekî ji kurdî re digotin kurmancî. Lê Reşîd bi xwe jî neqil dike ku di nava civaka êzîdî de li hember peyva kurd hin refleks hebûn.¹⁷³

“Lê ji peyva kurd hez nedikirin û heta niha jî gelek kes jê hez nakin. Nizanim ji ku hatiye lê ji bo piraniya êzdiyên aliyê me peyva kurd wateya kurdên misliman dide. Gelek caran gava ku me digot: ‘Em kurd in’, digotin: ‘Na, em ne misliman in!’ ... Ji ber ku me digot em kurd in, em tawanbar dikirin digotin, wekî me ola xwe firotiye, wekî kal û bavên me bi hezar salan ew qas xwîn rêtine, ew qas zilm û zor dîtine lê ola xwe parastine lê em jî ji bo navê xwe ola xwe difiroşin. Bi raya wan gava ku me digot em kurd in, wisa ye me ola xwe difiro, em ji dînê xwe derdiketin... Lewma jî ew êzdiyên ku dibêjin, em ne kurd in, ez wan fam dikim û wan di vê pirsê de gunehkar nakim.”¹⁷⁴

Lêkoler û folklornasê êzîdî Dawid Mirad Xetarî, balê dikêşe pirtebeqeybûna nasnameyê û ji bo civaka êzîdî, êzîdîbûn û kurdbûnê wiha rave dike:

“Ez dibînim, her yek ji me komeke nasnameyan heye. Dema yekê ji vana ji dest det, lê aciz dibe, radibit berevaniyê jê dike. Mesela ez bi xwe weke kesek, ez ji binemala Xudêdayê Eysê me. Demê yek bê li binemala Xudêdayê Eysê te’de bike, wek nasnava min ez ji binemala wan im, ez aciz dibim, ez raperîne dikim, ez ê berxwedanê bikim. Ez weke kesek ez ji êla Xetariya me. Demê hindê kes bê, êlên dî bê te’de li êla min bike, ew nasnama min ya ku bi navê êlê, ez dê berxwedanê bikim. Ez wekî dîn êzîdî me. Demê êrişek bê û te’deyek zulmek bê ser nasnama min ya êzdiyati, ez ê berevani bikim ji wê nasnama min ya êzdiyatiyê. Ez wekî netew kurd im, demê êk bê te’de li miletê kurd bike, hingî nasnama min ya kurdewariyê têk diçe, ez ê berevaniyê ji wê nasnama xwe bikim.”¹⁷⁵

Her çendî ku em li vê derê behsa nanameya etnîk ya êzîdîyan dikin jî, divê neyê jibîrkirin ku, ji bo civakê jî ne pêkan e ku mirov behsa tesewireke nasnameyî ya yekgirtî bike. Êzîdî ku li herêmên curbecur û di nava eşîrên mezin yên kurdan de dijîyan, li gorî herêmên ku lê dijîyan xwedî tesewirên cuda yên nasnameyî ne.

¹⁷³ T. Reşîd, *Êzdiyati*, r. 118.

¹⁷⁴ H.b., r. 118.

¹⁷⁵ J.8., Pêvek 3.

Bêguman ev yek li ser nasnameya wan ya herî bingehîn, yanê ‘êzdiyatî’yê zeafekê çenekiriye. Li ku derê dijî bila bijîn ev ji bo wan hevpariyeke gelekî girîng bû.

“Ji ber ku cemaeta êzîdiyan cîranên çandên cuda ne; ew xwedî avaniyên cuda yên çandî ne. Êzîdiyên li Tirkîyê dijîn bi kurdên mîsliman re, yên ku li Erîwanê dijîn bi ermenîyan re, yên ku li Iraqê dijîn bi erebên mîsliman re, yên ku li Sûriyê dijîn bi ereb û kurdên mîsliman re xwedî hevpariyeke çandî ne. Wekî mînak di nava êzîdiyên Iraqê de bandoreke giran ya urf û edetên kurd û erebên mîsliman heye. Ev yek hem di merasîmên şînê û hem jî di merasîmên dawetan de xwe dide der. Ji bo êzîdiyên Ermenistanê jî heman rewş heye. Her çendî ku ji bo êzîdiyên Iraqê cenaze wekî kêliyeke ‘kederê’ ye, ji bo êzîdiyên Ermenistanê ev pêvajoyeke ‘eliminê ye. Dîsa li nava êzîdiyên Ermenistanê di merasîmên şînê de alkol pir tê vexwarin, maseyên dirêj têne amadekirin û ‘kasa êzî’ bi alkolê tê tijekirin û vexwarin.”¹⁷⁶

Allison jî balê dikêşe ser vê cudahiya di navbera êzîdiyên Kafkasya û êzîdiyên Iraqê de. Wekî ku tê zanîn piraniya êzîdiyên Kafkasyayê li Serheda Kurdistanê dijiyan. Hem ew xwedî eşîretên mezin bûn wekî Hesenan, Heyderan hem jî di nava eşîrên mezin yên kurdan de wekî milekî eşîrê cih digirtin. Li gorî Allison ji Fuccaro neqil dike; êzîdî wekî ku aniha di mînaka Şêxan û Sîncarê de derdikeve pêş me ew çend jî îzole nebûn. Di nava eşîrên mezin yên wekî Milan û Hevêrkan de dijiyan. Ev eşîrên mezin konfederasyon bûn û êzîdî jî milek ji wan bûn.

“Di navbera yezîdiyên Iraqê û yên Transkafkasyayê de pêwendî gelek zeîf bûn. Wekî mînak her çendî ku mîrîtiya Ba’edrê ji aliyê qîdemê ve ji şêxên ku di nava eşîrên Millî û Hevêrkan de dijiyan bêtir bi qîdem bûn jî, van êzîdiyan emir û fermanên xwe ji Ba’edrê nedigirtin. Ji ber vê yekê sîstema kontrolê ya şêxên Şeyxanê li her derî nedihat bicihanîn lewma jî li gorî herêman cudahî çêdibûn. Yezîdîtiya Tûr Abidîna herêma Mêrdînê û ya Transkafkasyayê ne mimkun bû ku yek be. Her wiha hiyerarşiya dînî ya êzîdiyên Suriyê jî ji ya Şêxanê gelek cuda xuya dikir.”¹⁷⁷

Allison her wiha balê dikêşe nîqaşên li ser nasnameya etnîk ya êzîdiyan jî. Li gorî wê di vê nuqteyê de di navbera êzîdiyan bi xwe de jî gelek nîqaş hene ku bingehên xwe digihîjînin cihên cuda.

¹⁷⁶ A. Gökçen, *Ezidi Ağutları*, r. 47.

¹⁷⁷ C. Allison, *Yezidi Sözlü Kültürü*, r. 60-61.

“Bi pêşketina têgihên nûjen yên sedsala 19 û 20an, di heqê nasnameya irqî de atmosfereke têra xwe seza çêkir ku nasnameya etnîk ya yezîdîyan bi armancên cuda bê bikaranîn. Şahideke dewrên dawî yên Împaratoriya Osmaniyan, lê rast hatiye ku hin êzîdîyan îdîa kirine ku ew jî wekî nestûriyan ji asûriyên antîk hatine. Di vê dewrê de di rêvebiriya Osmanî de politikayêke wisa hebû ku dîn di pênasikirina nasnameya etnîk de hêmana sereke bû û di vê dewrê de yezîdî û xirîstîyan rastî çewisandinên ji civakên mislimanên kurd û tirk hatibûn. Her wiha ji ber ku Şêx ‘Adî bîn Misafîr sûfiyêke sunî bû, di sedsala 19 û 20an de fikrên wisa pêşketin ku êzîdî ji bingeheke îslamî tên.”¹⁷⁸

Lêkoler Arshad Hamid Miho neqil dike ku nîqaşên li ser nasnameya etnîk ya êzîdîyan, di nava êzîdîyan de hem li gorî konjektora demê û hem jî li gorî herêman diguhere. Li gorî Hamid Miho, îro di nava neslên nûh yên êzîdîyan de êzîdîbûn wekî nasname ji kurdbûnê bêtir li pêş e.¹⁷⁹ Her wiha ev hîsiyat li gorî herêman jî diguhere. Di vê nuqtayê de ew balê dikêşe ser cudahiya di navbera êzîdîyên Şengal û yên Şêxanê de.

“Li Başûrê Kurdistanê jî niha du boçûn hene. Boçûna xelkê Şingalê bêtir ber bi êzîdîyatiyê ve ye. Boçûna xelkê Dasin, dewr û berê Duhokê heta Zaxo, heta nêzikî Hewlêre, ew boçûna wan bêtir bi kurdayetiye ve girêdayî ye. Lê ya bêtir, bi rastî Herêm Şengalê mezintir e. Xelkê me yê êzîdîyê Şengalê pirtir e ji xelkê Duhok û dewr û ber jî.”¹⁸⁰

Maisel, di çarçoveya mînaka êzîdîyên Suriyê de, li ser nasnameya etnîk ya êzîdîyan tesbîtên balkêş dike. Di destpêkê de neqil dike ku êzîdî, bi piranî xwe wekî kurd dibînin.

“Piraniya yezîdîyan xwe kurd dibînin. (Beşeke biçûk ya yezîdîyan bi nasnameya kurdbûnê re di nava jêknegiriyê de ne. Wekî mînak yezîdîyê Ermensitanê. Heta hin ji van îdîa dikin ku ew ereb in). Yezîdî xwe di nava nasnameya netewî ya dewleta ku di nava sînorê wan de dijîn de nabînin (ereb, turk, ermenî)... Esasen yezîdî bi temamî cot-kêmar in. Di nava civakên ereb de wekî kurd, di nava civakên misliman de wekî yezîdî ew kêmar in.”¹⁸¹

¹⁷⁸ C. Allison, *Yezidi Sözlü Kültürü*, r. 82-83.

¹⁷⁹ J.10., Pêvek 3.

¹⁸⁰ J.10., Pêvek 3.

¹⁸¹ S. Maisel, ‘Bir Toplum İki Kimlik’, *Kürdistanda Dini Azınlıklar*, r. 145-146.

Maisel di vê gotara xwe de, bi pênaseya nasnameyî ve têkildar balê dikêşe ser dînamîkên cuda yên ku di avakirina etnîsîteyê de diyarker in. Li gorî wî di navbera êzîdiyan de cudahiya dîn û etnîsîteyê di înaşakirina nasnameya vê civakê de xwedî par e. Ev yek yanê rewşa cot-kêmariyê, bi tansiyona navbera dîn û etnîsîteyê ve girêdayî, di mînaka êzîdiyan de rewşeke taybet derdixîne meydanê. Her du jî yanê dîn û etnîsîte, di avakirina nasnameyê de bi hev re di nava reqabetê de ne.

“Li gorî nêrîna post-avanî, nasname û sêdaqet, ne monolîtîk in. Berevajî vê, ev guherbar in ku derdikevin û dadikevin û carina jî bi navgîniya dîrok, rabirdû û bîranînên takekesî û faktorên derveyî ji nû ve têne şîrovekirin. Yezîdiyên Sûriyê, ji bo ku di demên seza de bi kar bînin, nasnameyên pirtebeqeyî pêşxistine û di rewşên seza de kîjan tebeqe ji bo wan bêtir seza be serî li wê didin... Ev rewş, nîqaşên li ser nasnameya yezîdiyan her ku diçe gurtir dike.”¹⁸²

Fuccaro jî destnîşan dike ku civaka êzîdî di hin rewşan de nasnameya xwe ya dînî zêdetir derdixin pêş. Li dû agahiyên ku Fuccaro dide; êzîdiyan, tevlêbûna xwe ya dewleta nûh ya Iraqê li ser esasê nasnameya xwe ya dînî û eşîrî pêk anîne.¹⁸³

“Aliyê piştewan yê dînê êzdîtiyê, baweriyên hevpar, awayê îbadetkirinê û saziyên wan yên dînî di navbera ferdên vê cemaetê de pevgerêdanê çê dike û ev yek hîmên bingehîn yên nasnameya êzdiyatiyê pêk tîne.”¹⁸⁴

Vê nêrîna ku li jorê Maisel îfade kiribû, em dikarin di heman demê de li kurdên elewî jî tetbîq bikin. Bi ya me jî, wekî ku pêş de Anthony Smith jî amaje pê kiribû û niha Sebastian Maisel jî îfade dike, nasnameya etnîk ya civakan ne rewşekî statîk an jî neguhêrbar e. Bêguman dema ku em dibêjin ev ne statîk e, ev nayê wê wateyê ku di nava rojan an jî salan de tesewira wan ya nasnameyî diguhere. Ev proseseke sedsalan e. Tu civak ji aliyê nasnameyî ve di nava sedsalan de bi heman rengî namîne. Ew di her demê de, nasnameya xwe ya etnîk ji nûh ve înaş dike, hin tiştê ku li gorî konjektora wê demê kenvinbûyî an jî êdî bêkêr jê davêje û hin tiştên ku di nava pêdiviyên konjektora nûjen de ne lê zêde

¹⁸² H.b., r. 147-148.

¹⁸³ N. Fuccaro, *Öteki Kürtler*, r. 22.

¹⁸⁴ H.b., r. 21.

dike. Ji xwe eger ku civakek ji vê şîyanê an jî ji vê dînamîzmê mehrûm mabe, ne pêkan e ku ew di nava demê de nasnameya xwe biparêze.

Ev nîqaş di nava rewşenbîrên kurd yê nûjen de gelekî populer e. Lewre li gorî nosyonên nûjen, ne pêkan e ku cudahiya dînî, rê li pênaseyeke cuda ya nasnameyî vebike. Ev nêrîna ku bingehên xwe ji neteweperweriya sedsala 19 û 20an digire, bi piranî dixwaze hemî beşên civakî an jî binbeşên civakî di binê yek nasnameyê de asîmîle bike. Lewre hem di meseleya zaravayên zimanê kurdî de hem jî di meseleya baweriyên cuda yê di nava civaka kurd de, nîqaşa li ser nasnameya etnîk her ku diçe gurtir dibe. Ji xwe yek ji mijara vê tezê jî ev e ku, gelo tesewira etnîk ya van binbeşên civakî, di metnên folklorê de bi çi rengî derdikeve pêş me. Lewre ev yek, nîşanî me dide ku civak bi xwe, xwe bi çi rengî pênase dike, ne ku yê derveyê wan, wan çawa pênase dikin.

1.3. Elewîfî

Her çendî ku baweriya êzdiyatîyê bi tenê di nava civaka kurd de tê dîtin jî elewîfî ji vî aliyê ve ji êzdiyatîyê cuda ye. Wekî ku em ê di nexşeyên jêrîn de jî nîşan bidin, peyrewên vê baweriyê hem di nava civaka kurd de û hem jî di nava civaka tirk de têne dîtin. Her wiha li Sûriyê û Tirkiyê jî hejmareke girîng ya erebên elewî hene. Digel ku ji aliyê îtîqadî ve cudahiyên girîng di navbera wan de hebin jî ew wekî elewî hatine binavkirin. Lê em ê di teza xwe de bi tenê bala xwe bidin elewiyên kurd ku ew di nava nasnameya giştî ya kurdî de cihekî girîng digirin lê israra wan ya li ser nasnameya wan ya dînî rê li hin nêrînan cuda vekirîye.

1.3.1. Demgorafya û Erdnîgarî

Bedlîsî di Şerefnameyê de wekî kategoriyeke civakî hîç behsa kurdên elewî nake. Ev xaleke balkêş e bêguman ku rexneya vê ji alî Mehmed Emîn Zekî Beg ve jî hatiye kirin. Lê di beşa Mîrektiya Çemîşgezê de gelek behsa ‘qizilbaşan’ dike. Bi qandî ku em ji vegotina Bedlîsî têdigihên ew dema ku behsa qizilbaşan dike, ji kategoriyeke civakî an jî mezhebeke ku kurd peyrewên wê ne bêtir, di asta fermanrewayên ku girêdayî dewleta Safewîyan û leşkerên wan de dike. Li gorî Bedlîsî, Çemîşgezê mîrektiyeke wilo bû ku navê wê bi Kurdistanê re hempa bû.

Gelek kes, dema ku Kurdistan dihate gotin, bi tenê Mîrektiya Çemîşgezêkê têdigihîştin.

“Melkişî (navê nesla fermanrewayên Çemîşgezêkê) sê beş in û bi ihtîşama xwe, bi boşahiya xizmetkarên xwe û bi dest û pêwend û terefdarên xwe ve di nava Kurdistanê de bi nav û deng in. Nêzîkî hezar mal ji wan di bin xizmeta Fermanrewayên Îranê de ne. Grûbek din ji wan jî ketin nav zabîten parêzgerî yên Şah. Qismek ji wan di eyaletan de bûn berpirsiyarên serbixwe. Heçî welatê wan e, di hêla firehî û girîngiyê de, ji aliyê hemî kesên dûr an nêzîk ve bi navê taybetî yê “Kurdistan”ê dihat naskirin. Heta dema ku di berat û emirnameyan û hinek belgeyên saltanatê de navê wan derbas dibe, tenê ev wîlayeta han a girîng tê fahmkirin. Ji bilî vê dema ku di nav kurdan de gotina Kurdistanê derbas bibe, ji vê qesit tenê wîlayeta Çemîşgezêkê ye.”¹⁸⁵

Lê di berdewama vê beşê de Şerefxan bi rengekî wisa behsa qizilbaşan dike ku mirov hizra wî ya mezhebî ya konteksta wê demê têdighîje û hîsên wî yên dijminane yên li hember qizilbaşan baş fêhm dike. Li gorî ku Şerefxan neqil dike, Sultan, fermanek padişahiyê derdixe ku *Biyikli Mehmed Paşa* alîkariya *Pîr Huseyin Beg* bike da ku mîrektiya Çemîşgezêkê ji destê qizilbaşan rizgar bike.

“Lê, Pîr Huseyin Beg lezand û li hêviya leşkerê Mehmed Paşa nesekînî, ji eşîretên xwe leşker û terefbaran berhev kirin û bi wan re meşîya ser wan kesên welatê wî dagir kirine. Li ciyekî navê wî Tekir Yaylagi bi Nûr ‘Elî Xelîfe re ket nav şerekî giran. Piştî şerekî xwînavî û bi şîdet, şer bi serkeftina mêrxasên kurdan û mexlûbiyeta qizilbaşan bi dawî hat. Kurdan di cî de serê Nûr ‘Elî Xelîfe lê dan... Bi vî awayî Pîr Huseyin karê paqîjiya welatê xwe yên cennet-mekan ji sitriyên qizilbaşan tamam kir.”¹⁸⁶

Her çendî ku li vê derê Şerefxan behs nake ku di asta gel de rewşa mezhebî çawa bû jî, em ji awayê vegotina wî têdigihîjin ku ew qizilbaşan teqez li derveyî nasnameya kurd, civaka kurd dibîne.

Li gorî Bruinessen; mezhebê heterodoks yê herî pir peyrewên wî hene ku di nava sînorên kurdan de dijîn, elewîtî ye. Ew ji herêma Entabê heta bi Çewlikê

¹⁸⁵ Ş. Bedlîsî, *Şerefname*, r. 260.

¹⁸⁶ H.b., r. 265.

wekî kevanek dijîn û navenda wan herêma Dêrsimê ye ku hin beşên Sêwaz, Erzîngan û Elezîzê jî di nava vê herêmê de divê bê dîtin.¹⁸⁷

Ji bo elewiyên îro, bikaranîna navê elewî têgiheke gelekî nûh e. Di dewrên berê de ji bo vê grûba etno-dînî bi piranî têgiha qizilbaş dihat bikaranîn ku îro jî li gelekî herêman elewî bi vî rengî têne binavkirin. Ev yek di Şerefnameya Şerefxan de jî bi vî rengî ye. Lê li gorî Bruinessen, ji ber ku têgiha qizilbaş êdî bêtir wateyeke heqaretî tîne bîra mirovan, li şûna wê têgiha elewî tê bikaranîn.

Lêkoler Khanna Omarkhalli di vê mijarê de wiha dibêje:

“Elewî li Kurdistanê, kêmara dînî ya herî qelebalix in. Gelek komên ku wekî elewî têne binavkirin hene ku ev hemî kom di dîrokê de bi piranî bi navê qizilbaş têne naskirin... Elewî bi piranî li Tirkîyê dijîn û piraniya wan jî bi tirkî diaxivin lê hin ji wan bi zazakî û hin jî bi kurmançî diaxivin. Zazakî û bi heman rengî kurmançî jî pirî caran ji aliyê zimanzanên rojavayî ve wekî zimanên rojavayê Îranê tên dîtin.”¹⁸⁸

Li dû fikra Izady, di sedsalên 15 û 16an de di hejmara elewîyan de zêdebûneke berbiçav peyda bûye. Izady vê rewşê bi destkeftiyên demografîk yê kurdan yê di navbera salên 1400 û 1520î ve girê dide. Lê ji bo hejmara îroyîn ya elewîyan Izady hejmareke gelek zêde dide ku di vê mijarê de vekolînên kûrtir pêwîst in.

“Her çendî ku piştî 1514an rojhilatê Anatolyayê ji alî Sultan Selîm ve ji farsan hate girtin û gelekî qetlîam li ser elewîyan pêkhatin jî, li gorî yezîdiyan, elewî hindiktir rastî qetlîaman hatine. Belkî sebebê vê ew e ku ew ji alî demografîyê ve ji yezîdiyan bêtir in. Îro jî peyrewên vî dînî di nava kurdan de nêzikê ji sedî 20ê nifûsê ne.”¹⁸⁹

Ev hejmara ku Izady dide bêguman gelek zêde xuya dike. Lewre ku em nifûsa kurdan 40 milyon qebûl bikin¹⁹⁰ ev tê wê wateyê ku herî kê 8 milyonê wê elewî ne. Eger ku Izady, mezhebê yaresanî jî di nava vê hejmarê de hesab nekiribe ev tê wê wateyê ku li nava kurdên Tirkîyê nêzikê 8 milyon elewî hene. Dema ku em nifûsa kurdên bakûr bigrin ber çavan, bi piranî hejmara wan di navbera 20-25

¹⁸⁷ M. Van Bruinessen, *Kürdistan Üzerine Yazılar*, r. 29.

¹⁸⁸ K. Omarkhali, *Kürdistanda Dini Azınlıklar*, r. 28.

¹⁸⁹ M. Izady, *Kürtler*, r. 272.

¹⁹⁰ Bnr., A. Hassanpour, *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil*, r.72, Tablo:3.

milyonan de tê telafûzkirin. Hin kes vê wekî 15-20 milyon an jî 20-25 milyon jî qebûl dikin.¹⁹¹ Eger ku em wekî 20 milyon qebûl bikin hingê tê vê wateyê ku ji sedî 40ê kurdên bakûr elewî ne ku ev hejmar bê mantiq xuya dike. Lewre li Kurdistana Tirkiyê li nêzîkê 20 wîlayetan kurd dijîn û di hemî vekolînan de jî aşkera ye ku kurdên elewî çî kurmanç çî jî kirmanç bi tenê li wîlayeta Dêrsimê piranî û li wîlayeta Elezîzê beşeke girîng ya nifûsê ji wan pêk tê lê ne piranî ne û li kêleka van her du wîlayetan li Entabê beşeke pir kêr, li Mereşê dîsa bi kêrî û li Semsûr, Meletye û Sêwazê jî wekî beşeke kêr dijîn. Lewma ne pêkan e ku elewiyên kurd ji sedî 40ê nifûsa kurdên Tirkiyeyê pêk bînin.

Li gorî ku Mehmet Bayrak neqil dike, di gotareke rûsî de (1911) ku ji aliyê M. Demir ve hatiye wergerandin herêman ku elewiyên kurd û tirk lê dijîn û hejmara wan wiha hatiye tesbîtkirin:


“Nifûsa qizilbaşan teqrîben di seriya milyonek de ye. Hema bêje hemî kurdên rojava peyrewên vê mezhebê ne. Temamê kurdên Dêrsimê û piraniya kurdên ku li sencaxa Meletiyê niştecih in (Mamuret’ul Aziz (Elazîgi M.B) Wîlayeta Xerpêtê), Qezaya Tercanê ya Sencaxa Erzînganê, qezayên Zeha û Kixî yên wîlayeta Erzeromê û beşeke biçûk ya qezaya Vartoya bi ser wîlayeta Bedlîsê û kurdên ku li hin herêman wîlayeta Sêwazê dijîn hemî peyrewên vê baweriyê.... Piraniya tirkên ku li wîlayeta Xerpêtê dijîn jî li ser vê mezhebê ne. tirkên qizilbaş bi piranî li qezaya Baybûrtê ya bi ser wîlayeta Erzeromê, li wîlayeta Sêwasê û van qezayên vê wîlayetê niştecih in: Sêwas, Divriği, Topus, Yıldızeli, Hasrik, Zile, Mecidözü, û Hacı Köy. Ji bilî vanan hin kurdên qizilbaş li wîlayeta Samsûn û wîlayeta Ankarayê dijîn.”¹⁹²

Ji bilî van herêman, lêkoler Munzur Çem balê dikêşe ser herêman Heleb, Hetay û Tartûsê. Li gorî Çem li van herêman hejmarek girîng ya elewiyên kurd dijîn. Çem, neqil dike ku elewîti ji sedsala 12an vir ve li van herêman belav bûye. Yê ku li vê derê baweriyê elewîtiyê belav kirine kurd in. Elewiyên ku îro ji xwe re ereb dibêjin jî, qîsmeke wan ya mezin bi eslê xwe kurd in.¹⁹³

¹⁹¹ H.b., r. 71, Tablo:2.

¹⁹² Mehmet Bayrak, *Êzîdî-Kızılbaş-Yaresan Kürtler*, Özge Yayınları, 1. Baskı, 2014, Ankara, r. 254.

¹⁹³ Munzur Çem, *Dêrsim Merkezli Kürt Aleviliği/Etnisite, Dini İnanç, Kültür ve Direniş*, Vate Yay., 2. Baskı, 2011, İstanbul, r. 176-177.




194

Di vê nexşeya jorîn de ku ji aliyê Sevan Nişanyan ve hatiye amadekirin, herêmên ku elewiyên kurd û tirk lê dijîn hatiye nîşandan. Dema ku em bala xwe didin nexşeyê, navendbûna Dêrsimê bi rengêkî aşkera xuya dike. Her wiha tê dîtin ku elewî, di navbera civaka kurdên sunî û tirkên sunî de wekî xetekî cih girtine ku ev yek xaleke balkêş e. Di nexşeya jêrîn de ku me ji Izady girtiye, bi heman rengî tê dîtin ku herêmên bakûr û bakûrê rojavayê erdnîgariya kurdan bi elewiyên kurd (kurmanc û kirmanc) bicih e.

¹⁹⁴ Sevan Nişanyan, <http://nisanyan1.blogspot.com/2018/03/alevi-koyleri.html>, Dîroka Pêwendiyê: 20/08/2019.

Harita 43: Kürdistan'ın Dinsel Bileşimi

KÜRTLER • 249



¹⁹⁵ M. R. Izady, *Kürtler*, s. 249.

1.3.2. Dîrok û Taybetmendiyên Baweriya Elewîtiyê

Di gelekî vekolînên li ser elewîyên kurd de, yek ji xala hevpar ku derdikeve meydanê ev e ku, ehlê heq ên herêma Goran û elewîtiya bakûr wekî yek mezheb hatine nirxandin. Heta Izady, elewîti, ehlê heq û êzdiyatîyê hemî wekî milên heman baweriyê ku ew wekî yezdanî bi nav dike dinirxîne. Lê wekî ku me li jorê jî qeyd kir, digel ku di hin hêmanan de hevpariya êzdiyatîyê bi van her du baweriyên di re hebe jî, ku ev yek ji rabirdûya wan ya hevpar ya kurdî-îranî tê, di baweriya êzdiyatîyê de gelek xalên hevpar bi mislimantiya sunî re jî hene. Mirov dikare ji termînolojî û sîstema wê ya dînî-mîtolojîk jî vê yekê bibîne. Her wiha di gelek metnên êzîdîyan de dijberiyêke aşkera li hember qizilbaşiyê xuya dike. Lê ji bo hevpariya di navbera mezhebê ehlê heq û elewîtiyê de, bi taybetî elewîtiya kurd, gelek dane li ber dest hene.

Ev her du bawerî jî wekî şetîya tundrew hatine dîtin. Heta gelek lêkoleran her duyan wekî elî-îlahî bi nav kirine ku ev tê wê wateyê ku Hz. Elî wekî Xweda dibînin. Di vê mijarê de Erdal Gezik, di konteksta elewîtiya Dêrsimê de agahiyên balkêş dide. Li gorî wî di gelekî tekstên nivîskarên tirkan de jî ev rastî hatiye îfadekirin. Wekî mînak Hasan Reşîr Tankut di rapora xwe ya Dêrsimê de ku di sala 1928an de nivîsiye, dîsa Hançerlioğlu di ferhenga baweriyên de vê mezhebê ji bektaşîti û melamîtiyê cuda nirxandine. Li gorî van nivîskaran; bektaşîti û melamîti terîqetên felsefî ne lê ehlê heq dînekî cuda ye.¹⁹⁶

“Keza hin nivîskarên biyanî jî balê kişandine ser nêzîktîya di navbera Dêrsimê û Ehlê Heq de. Wekî mînak, Dr. Blau neqil dike ku li herêma Dêrsimê gelek eşîr Elî Îlahî ne. Nivîskarê Rûs Fronze neqil dike ku kurdên Dêrsimê Elî Îlahî ne û wekî qizilbaş tene binavkirin. Dîsa Nikitin, qeyd dike ku qizilbaşên Dêrsimê milekî Elî Îlahî ne. Melikoffê ku bi vekolînên xwe yê li ser qizilbaş û bektaşîyan tê naskirin, dibêje ku elewîyên li Rojhilatê Anatoloyayê xwedî gelek hevparî ne bi doktrîna Ehlî Heq re. Moosa yê ku bi vekolîna xwe ya berfireh ya li ser şeyên heterodoks tê naskirin dibêje ku kurdên qizilbaş ne bi tenê li herêma Dêrsimê hene, her wiha li Îranê li herêmên Kirmanşah û Kirind jî hene ku ji wan re Ehlî Heq tê gotin. Ji bilî van Martin Van Bruinessen jî di curbecur xebatên xwe de îşaret bi nêzîkbûna di navbera Ehlî Heq û elewîtiya Dêrsimê de kiriye.”¹⁹⁷

¹⁹⁶ Erdal Gezik, *Alevi Kürtler*, Kalan Yayınları, 1. Baskı, 2000, Ankara, r. 20.

¹⁹⁷ H.b., r. 21.

Kreyenbroek jî di gotara xwe ya bi navê *Kurdistan'da Din ve Mezheb* (Li Kurdistanê Dîn û Mezheb) de balê dikêşe ser heman hevpariyê. Li gorî wî ev her du sîstemên dînî, baweriyên beriya îslamiyetê di nava şîetiyê de îfade kirine an jî van her du doktrînan di bawerîya xwe de bi hev kelijandine.

“Ev bawerî carina wekî şîetîya tundrew hatiye binavkirin. Di nava erdnîgariya kurdan de, yên herî girîng; elewîyên tirkîyeyê û ehlê heq, yaresan an jî kakeiyên ku li Kurdistanê Îran û Îraqê dijîn... Di konteksta xebatên li ser dînên kurdan de girîng e ku mirov li ser şîetîya tundrew, bi taybetî li ser ehlî heq û elewîyan û grûbeke dî ku hurmetê nîşanê kujerên Hz. Hüseyîn dide û di sêdaqeta bawerîya îslamî de tam li aliyekî dijber e, yanê yezîdîtiyê bixebite û balê bikêşe ser hêmanên hevpar yên di navbera van hersê bawerîyan de.”¹⁹⁸

Di gelek vekolînên li ser elewîyan de, bi piranî vekolîn û nîqaşa zanistî di çarçoveya bingehên etnîk yên peyrewên vê baweriyê de hatiye kirin. Ev yek ji aliyek ve rewşeke asayî ye û ji aliyekê dî ve jî nîqaşên îlmî di çarçoveyê de teng de xitimandiyê. Bi ya me; ya girîng ew e ku peyrewên vê baweriyê xwe bi çî awayî pênasê dikin. Erdal Gezik jî di xebata xwe ya bi navê *Alevî Kürtler* (Kurdên Elewî) de balê kêşaye ser vê nuqtayê. Li gorî Gezik, di xebatên ku li ser elewîyan hatine kirin de, bi rengekî hevpar xeletiyên metodî hene û di nêrîna li meseleyê de jî xeletî hene.

“Elewîti bingehên xwe ji tevgerên tesewûfî yên rojhilata navîn digire ku ev tevger derçûnên kolektîf yên dînî-ramyarî yên rojhilata navîn in. Dema ku em ji aliyê teolojîk ve binihêrin têgihên ku di sîstema dînî ya elewîtiyê de tene bikaranîn, wekî berdewama êkolên tesewûfî ne ku di navbera sedsala 8. û 13an de li Îran û Iraqê derketine. Eger ku ji xwediyên van raman û têgihan re, li bingehê etnîk bê gerîn, divê ev bi îranî û ereban bê bisînorkirin. Lewre ne zêdekirineke fikrî ya kurdan ne jî ya tirkan ku hê di sedsala 10. de hatine herêmê li ser van têgihan û ramanan heye. Van her du grûban bi tenê nîrxên xwe yên folklorî û dînî li van ramanan zêde kirine û bi vî rengî rê lê vekirine ku ev tevgerên dînî-ramyarî di nava girseyên wan de jî belav bibin.”¹⁹⁹

Her çendî ku Gezik balê dikêşe ser nuqtayê mafdar jî, nêrîneke bi vî rengî, yanê elewîtiyê li derveyê kurdan û tirkan bi fars/îranî û ereban ve girêdana

¹⁹⁸ P. G. Kreyenbroek, *Kürt Kimliği ve Kültürü*, r. 157.

¹⁹⁹ E. Gezik, *Alevî Kürtler*, r. 13-14.

wî, bi rastî jî gelekî xerîb e. Gezik, wekî ku bibêje tu kapasîteya kurd û tirkan tunebû an jî tune ye ku sistemeke dînî-ramyarî wekî elewîtiyê biafirînin. Her wiha nivîskar dema ku behsa kategoriya îranî dike, kurdan wekî ku li derveyê vê kategoriye bin dinirxîne. Kurd, wekî ku hemî lêkolerên kurdnasiyê jî îfade dikin, miletekî îranî ne lê îranîbûn nayê wateya farisbûnê.

Kurdên elewî, ne bi tenê bi zaravayê kirmancî diaxivin. Her du zaravayên bakûr yê kurmançî û kirmancî jî di nava elewiyan de tene axaftin. Her çendî ku heya niha elewîtiya ku bi Dêrsimê re bi rengekî hevterîb hatiye dîtin, hatiye vekolîn jî elewîti di xetê de ji xwe re cih dîtiye. Ev xet ji Entabê dest pê dike heta bi Erzeromê diçe. Di vê xetê de wekî ku di nexşeyan de jî diyar e, hem kurdiya kurmançî hem jî kurdiya kirmanckî tê axaftin. Û divê di vekolînên li ser elewiyan de ev her du heman wekî bingeh bêne girtin. Çem jî balê dikêşe ser vê realîteyê û neqil dike ku elewiyan kurmanç bi hejmarê xwe ji elewiyan kirmanç zêdetir in.²⁰⁰

Erdal Gezik di heqê vê mijarê de wiha dibêje:

“Berî her tiştî dema ku em li ser elewîtiyê vekolînê bikin, divê em hemî elewiyan ku li herêmên Dêrsim, Erzîngan, Çewlik, Mûş, Meletî, Mereş û Erzeromê dijîn û hem bi kirmanckî (Zazakî-Dimilkî) hem jî bi kurmançî (kirdaşkî) diaxivin, di binê heman navî de binirxînin.”²⁰¹

Lê Gezik di berdewama nivîsa xwe de diyar dike ku ev her du kom, ji alî zimanî ve, bi qandî ku ji hev fêr nakin dîrê hev in û ji bo navenda vekolînan têgiha ‘etnîzma kirmançî’ bi kar tîne ku li gorî wî bingeha gelek eşîrên ku ji vê baweriyê tînin ev der e. Li gorî Gezik, her çendî ku di asta civakî de rewş wiha bû jî bi piranî pêşewayên dînî û beşeke girîng ya miletê, van her du zaravayan an jî zimanan dizanibûn û ev nedibû problem. Lê Gezik, bi dîqet ji bo her du koman jî wekî mensûbiyeta netewî, têgiha kurd bi kar tîne.²⁰²

1.3.3. Di Nava Civaka Kurdên Elewî De Nasnameya Etno-Dînî

²⁰⁰ M. Çem, *Dêrsim Merkezli Kürt Aleviliği*, r. 50.

²⁰¹ E. Gezik, *Alevi Kürtler*, r. 16.

²⁰² H.b., r. 16-17.

Li ser xwepênasekirinên etnîk an jî nasnameyî, konjektora demê/dîrokê û faktorên terîtorya/xakê gelek girîng in. Komeke etnîk, ku ji aliyê civakî ve xwediyê çend tebeqeyan e, carina dibe ku di hin deman de li gorî berjewendiyên xwe yê wê heyamê, ji van tebeqeyên xwe yê civakî, yekê derbixe pêş û ya dî bi kar neyne. Bêguman ev tebeqeyên civakî di serî de irqî, dînî, zimanî, çandî û erdnîgarî ne. Di mînaka elewiyan de ev diyardeya nasnameya konjektorî bi temamî li ber çavan e.

Li gorî Munzur Çem, li Dêrsimê elewîti û kurdbûn ew çend bi hev ve kelijî ne ku ew ji kurdên ne elewî re jî dibêjin: Ew sunî ne, tirk in. Li gorî Çem, di nava elewiyan Dêrsimê de têgihên kurmanc/kirmanc û kurd sînonîm in.²⁰³

“Xelkê me yê elewî yê ku bi kirmancî diaxivin, ji xwe re ‘kirmanc’, yê ku bi kurmancî diaxivin ji xwe re ‘kurmanc’ dibêjin. Dema ku bi tirkî an jî bi zimanek dî behsa nasnameya xwe ya netewî dikin, ji xwe re ‘kurd’ dibêjin. Yanê têgihên ‘kurmanc’ û ‘kirmanc’ bi wateya kurd in. Di dokumentên fermî û taybet de jî bi vî rengî ye.”²⁰⁴

Çem li hember hin hewldanên ku Dêrsimê wekî terîtoryayeke cuda û Dêrsimiyan wekî etnîsîteyeke cuda dibînin derdikeve û îfade dike ku zimanê ku li Dêrsimê tê axaftin ne bi tenê li Dêrsimê, li gelek deverên Kurdistanê tê axaftin û baweriya elewîtiyê jî her wisa li gelek herêmên dî jî heye.²⁰⁵

Gürdal Aksoy di vê mijarê de wiha dinivîse:

“Îro dema ku em pirs bikin elewiyan kurd yê Dêrsimî kî ne, bi şertê ku em hin faktorên dî bidin aliyekî, bersiva vê girêdayî pirsê çibûna cudahiyan di navbera kurd û Kurdistanê de û dîkeyên di nava sînorên fermî yê Dewleta Tirkiyê de ye. Herikbariya cudahî û dîkeyan di nava jiyana rojane de jî carina rê li ber nasnameyên cuda vedike. Wekî mînak elewiyan Dêrsimî xwe li hember neteweperstekî tirk dikarin yek ji kategoriyên xwe yê dîrokî wekî Dêrsimî, kurd û elewî tercîh bikin lê li hember têkilheviyan navxweyî yê di nava Kurdistanê de tabloyeke wiha derdikeve pêş me: Li hember kurmancên sunî xwe wekî elewî, Dêrsimî, kirmanc, kurdê elewî, zaza heta tirk bi nav dikin. Lê li hember zazayan

²⁰³ M. Çem, *Dêrsim Merkezli Kürt Alevliği*, r. 285.

²⁰⁴ H.b., r. 250.

²⁰⁵ H.b., r. 533.

*sunî xwe wekî kirmanc bi nav dikin. Ev xwebicîhkirin girêdayî şertên dîrokî û hafîzeyaya kolektîf e.*²⁰⁶

Erdal Gezik jî balê dikêşe ser heman konjektorîbûna xwepênasekirina etnîk. Gezik balê dikêşe ser têgiha kirmanc û îdîa dike ku her çendî li gorî herêman di xwepênasekirineke bi vî rengî de hin problem derdikevin meydanê jî, dîsa jî ev têgih ji hemî yên din firehtir e. Li gorî Gezik li herêmên ku tirk sunî ne û kurd elewî ne, têgiha kirmanc hem xwedî karaktereke dînî û hem jî xwedî karaktereke etnîk e.

*“Têgiha kirmanc, li herêmên Erzîngan, Bakûr û Rojavayê Dêrsimê, Sêwaz, Meletî û Mereşê her du kategoriyan jî yanê nasnameya etnîk û ya dînî bi hev re di nava xwe de dihewîne. Li van herêman têgiha kirmanc an jî kurmanc tê wateya kurd û elewî û ji alî herkesê ve wisa tê qebûlkirin. Lê dema ku em ber bi herêmên hundurîn ve diçin rewş diguhere û wateya têgihê teng dibe; bi taybetî herêmên ku heman ziman tê axaftin lê peyrewên baweriyên cuda ne an jî hem ziman cuda ye hem jî bawerî cuda ne.”*²⁰⁷

Li gorî Gezik; li herêma Qereqoçana ku tê de suniyên kurmanc jî hene, nabe ku têgiha kurmanc ji bo wan bê wateya kurd û elewî. Li herêma Vartoyê ku tê de elewiyên kirmanc û suniyên kurmanc hene pênaseya etnîk diguhere. Li vê derê elewî ji bo kurdên sunî di wateya heqaretê de peyva ‘kurr’ bi kar tînin keza Dêrsimî jî ji bo suniyên Paloyê di wateya heqaretê de ‘zaza’ dibêjin. Li hember vê kurdên sunî ji xwe re kurmanc dibêjin û ji bo elewiyên herêmê jî di wateya heqaretê de ‘qizilbaş’ an jî ‘zindiq’ dibêjin. Lewre jî elewiyên vê herêmê li şûna kirmanc, ji xwe re elewî an jî qizilbaş dibêjin.²⁰⁸

Herwekî ku me jî li jorê îfade kir û di fikrên Gezik û Aksoy de jî diyar e, pênseyên etnîk an jî nasnameyên civakî mijareke gelekî konflîkt e. Li şûna ku ji derve de navek li vê koma civakî bê kirin, divê li metnên wan li folklorê wan bê nihêrîn da ku bê dîtîna ka ew ji bo xwe çi dibêjin.

Di vê çarçoveyê de di nava civakên kurd de, grûba etno-dînî ku herî zêde li ser nasnameya wan nîqaş hatine kirin kurdên elewî ne. Lê dema ku em dibêjin

²⁰⁶ Gürdal Aksoy, *Dersim Alevi Kürt Mitolojisi*, Komal Yayınları, I. Baskı, 2006, İstanbul, r. 31-32.

²⁰⁷ E. Gezik, *Alevi Kürtler*, r. 18-19.

²⁰⁸ H.b., r. 18-19/

kurdên elewî, divê ew bi şaşî wekî Dêrsima îroyin bi tenê neyê têgihîştin. Her wiha Dêrsim bi xwe jî ji aliyê zimanî ve ne yekgirtî ye. Wekî mînak li herêmên Dêrsim yên wekî Pertek, Mazgîrd û hin herêmên Ovacixê kurancên elewî hene. Ew wekî pirek di navbera kirmancên elewî û kurancên sunî de ne. Lewre bi kurancbûna xwe, xwe nêzî kurancên sunî dibînin û bi elewîtiya xwe, xwe nêzî kirmancên elewî dibînin.

Lêkoler Daimi Cengiz, li ser teşekula demografîk ya Dêrsimê dibêje ku; digel ku di dest de agahiyên îstatîstîk tune ne jî li Dêrsimê ji sedî 70 bi kirmancî (dimilkî/zazakî) ji sedî 25 bi kurancî (kurdî) ji sedî 5 jî bi tirkî diaxivin. Ji bo nasnameya wan ya dînî û etnîk, Cengiz balê dikêşe ser hevpariya di navbera van her du koman de yanê kirmanc û kurancan de ku ev hevparî elewîtiya Dêrsimê ye.²⁰⁹ Li gorî Cengiz, di nava elewiyên Dêrsimê de çî kirmanc, çî kuranc û çî jî tirk, nasnameya dînî beriya nasnameya netewî tê.

“Di avabûna nasname û çandê ya Dêrsimê de rola baweriyê gelekî girîng e. Di elewîtiya Dêrsimê an jî bi navekî di yê vê baweriyê; ‘Yitiqatê (îtiqadê) kirmanciye’ de, heşt ocax hene ku zimanê wan yê îbadetê kirmancî, pênc ocax zimanê wan yê îbadetê kurdî û du ocax zimanê wan yê îbadetê tirkî ye.”²¹⁰

Li erdnîgariyeke ku ji çûn û hatinê re qismî be jî girtî, dema ku faktorên dînî û zimanî li gorî hin herêmên di cudahiyan nîşan bidin, ev cudahî dibe ku di asta mezhebî û zaravayî de bin, hingê wekî ku di mînaka Dêrsimê de jî derdikeve pêş me; dibe ku civak di nava şertên xwe yên navxweyî de, ji bo xwe nasnameyên cuda însa bike. Wekî mînak di nava zazayên herêma Pîranê de em di aîdiyeta nasnameya kurdî de li gorî kurancê sunî tu zeafek nabînin lê li vê derê faktora mezhebî û erdnîgarî nayê dîtin. Lewre di însaya nasnameyê de cografya, ziman û dîn diyarkerên bingehîn in. Dema ku ev her sê faktor di komeke civakî de rû bidin, peyda bibin, hingê dibe ku ew ji pîraniya civakê veqetin û ji xwe re nasnameyeke nûh ava bikin. Û eger ku di navbera wan û parçeyê mezin yê civakê de ji aliyê van faktorên ve dijberiyek, dijminahiyek an jî reqabetek hebe hingê ev pêvajoyên bileztir û hêsantir dibe. Yanê her du alî jî ji vê nasnameya nûh re amade dibin.

²⁰⁹ Daimi Cengiz, *Dizeleriyle Tarihe Tanık Dersim Şairi Sey Qajî*, Horasan Yayınları, 1. Baskı, 2010, İstanbul, r. 30-31.

²¹⁰ H.b., r. 28.

Vali jî balê dikêşe ser vê heqîqetê ku nasnameya civaka kurd ne nasnameyeke yekpare ye. Li gorî wî tesewira netewîtiya kurd bi rengekî xelet nasnameya kurdî monolîtîk dibîne û ev şaşiyek e.²¹¹

“Lê ev tesewirek hêsan e û di têgihîştina taybetmendiyên dîrokî û cudahiyên siyasî-îdeolojîk yê civaka kurd de têrî nake. Di vê mijarê de dîskûrsa netewetîya kurd, cudahiyên di nava civakê de piştguh dike. Ev cudahî ew in ku di nava vê dîskûrsa netewetiyê de tesewirên cuda yê etnîk(köken) hene û di navbera van tesewirên cuda de jî ji aliyê têgihîştina dîroka kurda, civak û mefhûma nasnameyê ve cudahî û jêknegirî hene.”²¹²

Di vê mijarê de her çendî ku ne ferqeke mezin be jî di navbera fikrên Vali û Hassanpour de nuansê heye. Hassanpour jî wekî Vali, îfade dike ku civaka kurd di konteksta civakî, aborî, siyasî û çandî de civakeke gelek kompleks e. Lê dîsa jî nasnameya kurdbûnê wekî baneke li ser hemî binbeşên civaka kurd.²¹³

“Aîdiyeta nasnameya kurdî, her çendî ku red nekin jî dikeve pêşîya girêdayînen malbatî, eşîrî, gundî, bajarî, herêmî, dînî û zimanî. Bi rastî ev komên biçûk an jî şexsî hêmanên bingehîn yê nasnameya gerdûnî ya jî nasnameya mezintir ya kurdî ne. Kurdbûn îro ji zincîreke nasnameyan pêk tê ku ev nasname zimanî, siyasî, çandî, terîtoriyal û ji bo hin kurdên sedsala 20an îraqî ye.”²¹⁴

Di vekolînên xwe de ku me li sehayên mîna Pertek, Mazgîrd û Dêrsimê kir, em lê rast hatin ku kurmacên elewî, wekî nasnameya etnîk, her çendî ku elewîtiya ji bo wan diyardeyeke pir girîng e jî, xwe pêşî wekî kurd-kurmac pênase dikin û her wiha li gorî wan kurmacên elewî jî parçeyeke vê nasnameya etnîk in yanê kurd in. Lê di nava kurmacên elewî de ev aîdîyet ne bi heman rengî ye. Ew di desteya pêşîn de xwe wekî kurd pênase nakin. Nasnameya Dêrsimîbûnê û elewîbûnê ji bo wan, ji nasnameya kurdbûnê bêtir li pêş bû. Dîsa digel ku kurmacên elewî, kurmacên elewî di nava nasnameya kurdî de dibînin jî; kurmacên elewî pirî caran kurmacên elewî wekî suniyên ku asîmîle bûne dibînin û wan wekî niştecihên otantîk yê Dêrsimê nabînin. Li gorî wan kurmacbûnê û Dêrsim bi hev re hevterîb in û kurmacên Dêrsimê koçber in ku hatine xwe

²¹¹ A Vali, *Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri*, r. 83-84.

²¹² H.b., r. 83-84.

²¹³ A. Hassanpour, ‘Kürt Kimliğinin İnşası’, *Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri* (Ed. Abbas Vali), r. 138.

²¹⁴ H.b., r. 139.

spartine Dêrsimê. Her wiha hem di folkloran wan de hem jî di roja îroyîn de jî, têgiha 'kirmanciyê' wekî pênaseyeke etno-dînî derdikeve pêş. Heta ew di folkloran xwe de, welat jî wekî '*welatê kirmanciyê*' pênase dikin. Di vê têgiha *kirmanciyê* de ji bo wan ne tenê ekoyeke zimanî heye; ew di heman demê de xwedî dengvedaneke çînî, dînî û erdnîgarî ye jî.



BEŞA DUYEM

2. DI VEGOTINÊN GELÊRÎ YÊN KURDÊN ELEWÎ Û ÊZÎDÎ DE DERÇÛNÊN NASNAMEYÎ Û DÎNÎ

Di vê beşa tezê de, em ê hewil bidin di berhemên folklorî yên civakên kurdên elewî û kurdên êzîdî de, nîşaneyên nasnameyî û dînî tesbît bikin ku ev her du taybetî bi hev re bingeha nasnameya etno-dînî pêktînin. Ji bilî materyalên ku me ji sehaya Dêrsimê berhevkirine, ji herêmên mîna Meletî, Mereş û Dêrsima jorîn jî hin materyal hene ku em ê di xebata xwe de cih bidin wan. Materyalên di heqê êzîdiyan de, hinek jê berhevkirinên Enstîtuya Kelepûra Kurdî ne. Ji bilî vanan du xebatên girîng hene bi navê *Hikayetêd Cimaeta Kurda û Zargotina Kurda* ku ji aliyê Heciyê Cindî û Ordîxanê Celîl-Celîlê Celîl ve hatine kirin. Wekî ku wan bixwe jî di beşên nivîsarnasiyê yên pirtûkên xwe de diyar kirine, materyal ji nava êzîdiyên Kafkasyayê hatine berhevkirin.²¹⁵ Tevî girîngiya baweriya êzîdiyatîyê, ji aliyê taybetiyên herêma Kafkasyayê ve jî cihekî wan yê girîng di nava folklorê kurdan de heye.

Di destpêkê û beşa yekem a vê tezê de me li dû hin nêrîn û fikrên li ser civak û dîrokê, di heqê nasnameyên etno-dînî de agahî dan. Ji ber van sedemên ku me li wê derê nîşan dan, em ê wilo tercîh bikin ku elewîyên kurd û êzîdiyan wekî du civakên etno-dînî binirxînin. Bêguman ji ber gelek sedemên curbecur hin kes dikarin rexne li vê yekê bikin û elewîyên û êzîdiyatîyê wekî nasnameyek etno-dînî nebînin an jî wan bi tenê wekî tezahureke dînî-mezhebî bibînin ku ev yek bi ti awayî li nasnameya wan ya etnîk bandorê nake. Ji xwe armanca vê tezê jî ev e ku, vê rewşê bi rêya metnên folklorê bide nîşandan û di dawiyê de bigihîje hin encaman.

Berî her tiştî divê em vê yekê qeyd bikin ku derçûnên nasnameyî, çi dînî çi jî etnîk di hemî cureyên vegotinên gelêrî de bi heman astê dernakevin pêş me. Dema ku metin, çîrok an jî fabel bin, tezahurên aşkera yên nasnameyî pir kêmtir in. Lê bêguman em bi hin rêyên dî dikarin di heqê nasnameya wan ya dînî û etnîk de bigihîjin agahiyan.

²¹⁵ Bnr. Celîlê Celîl-Ordîxanê Celîl, *Zargotina Kurda I*, Weşanên Aram, Ç. 3, Amed, 2013, r. 18.

2.1. Di Vegotinên Gelêrî Yên Kurdên Elewî De Nîşaneyên Nasnameya Etno-Dînî

Di vegotinên gelêrî yên herêmên kurmancên elewî de, tezahura herî aşkera ya di heqê nasnameya etnîk de, kurmancbûn û elewîbûna wan e. Elewiyên ku li bakûrê Dêrsimê li herêmên çiyayî dijîn û bi zaravayê kirmancî diaxivin, xwe wekî kirmanc bi nav dikin. Herêma xwe jî wekî; *Welatê Kirmanciyê* bi nav dikin. Bikaranîna têgiha kirmanc di piraniya mînakên de wekî nasnameyek etno-dînî derdikeve pêş me.

Li gorî Munzur Çem, li ser kuştina kurê xwe yê bi navê Bava Îvrayîm(1933), Seyid Riza vê zêmarê gotiye:

Kirmancî

*“Pîr Bavayê mi
Tekito şiyoyê Xozato vêsaye
Cêno **Begliğêna Kirmancî**”²¹⁶*

Kurmancî

*Pîr Bavayê min
Çûye Xozata şewitî
Begîtiya Kirmancan digire*

Dengbêja navdar ya Dêrsimê ya bi navê Wakilê, di navbera salên 1900 û 1980yê de jiyaye.²¹⁷ Di kilameke xwe de ku li ser Seyid Riza û Sey Qajî gotiye, têgiha ‘Welatê Kirmanciyê’ wiha bi kar aniye:

Kirmancî

*“Dêsim, **welatê kirmanciyo**
Tenga Sey Riza û seda Sey Qajiyo”²¹⁹*

Kurmancî²¹⁸

*Dêsim **welatê kirmancan** e
Êşa Seyid Riza û sewta Sey Qajî ye*

Di heqê vê mijarê de qeydên herî kevin yên li ser ozanê navdar, *Sey Qajî* ne. Sey Qajî ku di sala 1936an de, yanî beriya Qetlîama Dêrsimê wefat kiriye, di gelek kilam û dûrikên (manî) xwe de xelqê wê cîwarê wekî kirmanc bi nav kiriye.²²⁰

²¹⁶ M. Çem, *Dêrsim Merkezli Kürt Aleviliği*, r. 574.

²¹⁷ D. Cengiz, *Dizeleriyle Tarihe Tanık Dersim Şairi Sey Qajî*, r. 94.

²¹⁸ Wergera jî kirmancî bo kurmancî ya van kilam û helbestên ku me ji xebatên Daimi Cengiz girtiye, ji alî me ve hatine kirin. Di cihê ku zanîna me têr nekiriye, me ji alîkariya nivîskarê pirtûkê sûd wergirtiye û her wiha jî bo ku xeletî çênebin me wergera xwe bi wergera wan ya tirkî re jî miqayese kiriye ku nivîskar bi xwe di pirtûka xwe de hem orjînalê wan ya kirmancî û hem jî wergera tirkî daye.

²¹⁹ D. Cengiz, *Dizeleriyle Tarihe Tanık Dersim Şairi Sey Qajî*, r. 94.

²²⁰ H.b., r. 35.

Di vegotinên gelêrî yên herêma Dêrsimê de, hêmanên erdnîgarî û dînî gelek çalak in. Dêrsimîbûn û elewîbûn wekî du hêmanên sereke yên vê nasnameyê derdikevin pêş me. Li kêleka van her du xalan girîngiya xala ziman û dîrok an jî hafizeya kolektîf jî heye. Ev rewşa yekbûna bawerî û erdnîgariyê di kilamên Sey Qajî de bi vî rengî derdikevin pêş me:

Kirmancî

*“Roze ama disemiye
Wûris koto Anadolîye
Lawo pêrodê, ma pêrodime
Padisî kerdo qehpên û yintizar û babaxiye
Bixeleşnime şerefê **Dêsim û kirmanciye**”²²¹*

Kurmancî

*Ji rojan duşemî ye
Ûris ketye Anadolîye
Lawo şer bikin, em ê şer bikin
Padşah qehpetî, întîzar û muxbîrtî kiriye
Xelas bikin em şerefa **Dêsim û kirmanciyê***

Wekî ku em di vê kilama Sey Qajî de dibînin, Dêrsim û kirmanciyê wekî du parçeyên ku ji hev nayên veqetandin li kêleka hev in. Di hin mînakên dî de ev wiha derdikeve pêş me:

Kirmancî

*“Pêrodê, ma pêrodime
Na qewxa **Dêsim û kirmancuna**
Aylîxa dewlete fîncanên axûyo
Nê werîna nê simîna”²²²*

Kurmancî

*Şer bikin, em şer bikin
Ev şer şerê **Dêrsim û kirmancan e**
Meaşê dewletê fîncana bi jehr e
Ne tê xwarin ne tê vexwarin*

Di vê kilama xwe ya jêrîn de Sey Qajî lome li kesekî dike (Bertê Alê Gulavî) ku meseleyeke xwe biriye pêş dadgeha dewletê. Di vê mînakê de têgiha kirmanciyê bêtir bi wateya nasnameya civakî derdikeve pêş.

²²¹ H.b., r. 88.

²²² H.b., r. 88.

Kirmancî

“Ero Bertê Alê Gulavî

*To virno **torê kirmanciye***

Mi va dewa xo ra pîr û ravyerê xo ver fiye

Minê kokimî era ra û welaxû mefiye²²³

Kurmancî

Erê Bertê Alê Gulavî

*Te **torê kirmanciyê** guherand*

Min got: Dewa xwe bîne pîr û rehberê xwe

Min ê pîr ê kokim nexîne serê rêyan

Sey Qajî di kilamên xwe de rewşa civakî û siyasî ya dema xwe dide der. Li hember dagirkeriya rûsan û hevkarîya ermenîyan ku gelek kurdan ji cihê wan kirine û sirgûn kirine, helwesteke aşkera nîşan dide:

Kirmancî

“Dota ver va ma yeno dismeno

Payê ma thaf û dûmano

***Haqî** nîano ra xo vîrî*

Nê haqo, ti vê xezevo giran nêrê

***Teresê hermenî** kot ora ver, fetelîno wertede*

*Werte ra vetê, berdê rejûnê **Dêsimî***

Vore sero ginê waro, serdê vaê pakayî sor kerdo

Leminê! Dirvetûnê rezûnê mi ra gonî cemedna, nalenê

Vengê ho sono ve roê jûminî

***Seyidê îslamiyê** ginê waro*

Werte de selexaneyî wenê

***Meyitê xiristiyanî** dane we benê*

Mezelxane de niştê ro kêmer birnenê

*Neqis nanê ro ci **zalimê xurumî***

De way way merdene, xerîviye²²⁴

Kurmancî

²²³ H.b., r. 244.

²²⁴ H.b., r. 320.

Dijmin ji hember tê bi ser me de
 Li pey me mij û moran
Heq (Xwedê) nas nakin,
 Xwedê tu xezebeke giran nedî
Teresên ermenî ketine pêş (Rûsan)
 Li meydanê digerin, ji nav artêşê girtine xortên **Dêrsimê**
 Li ser berfê dirêjkirine
 Serma pûkê zorê dide wan
 Wey li minê! Xwîna birîna wan xortan qerisiye, dinalin
 Dengê wan diçe rûhê hev
 Cesedên **şehîdên îslamê** li erdê dirêjkirî ne
 Li wê derê heywanên dirinde cendekên wan dixwin
Cendekên xirîstiyanan radikin dibin
 Li goristanê li ser kevirê wan nexşan dikin
Zalimên rûm nexşan dikin
 De way way, mirinê, xerîbiyê

Li aliyê dî, ji klamên wî em têdigihîjin ku di têngihîştina wî ya kirmanciyê an jî welatê kirmanciyê de kurdên sunî tune ne. Digel ku di vê klama xwe ya jorîn de Sey Qajî pesnê ‘mislîmanên’ ku li hember dagirkeriya rûsan û hevkarîya ermenîyan şer dikin, dide jî û her wiha tabîra “şehîdên îslamê” bi kar tîne jî, hîsiyata wî li hember Serhildana Şêx Seîd ne bi heman rengî ye. Ew bi tundî li hember vê serhildanê derdikeve û bi perspektîfa dînî-mezhebî lê dinihêre.

Kirmancî

“Vanê paytaxtê padişî rîjiyo
 Dewr dewrê Cumratî û Qajîyo
Hêfê Şêx Sayîd û zazawuno ke yeno
Vanê: Mor û dînê îslamiye dest şîyo
 Qeda Estemol ra dariyo we
 Amo bertengê Dêsim de nîjiyo²²⁵

Kurmancî

Dibêjin ku paytexta padşah hilweşîya ye
 Dewr dewra Cumhûriyet û Gazî ye
Tu binêre li Şêx Seîd û van zazayan
Dibêjin eywax! Mora îslamê ji dest çûye
 Bela ji Stenbolê rabûye
 Hatiye li ber sînoren Dêrsimê sekiniye

Balkêş e ku di vê kilamê de û di hin metnên dî yên herêmê de, digel zazakî û kirmancî heman ziman/zarava ne jî, Sey Qajî an jî kirmancên Dêrsimê xwe wekî zaza bi nav nekirine. Li vê derê ev îşaret bi vê yekê dike ku kirmancbûn ne

²²⁵ H.b., r. 269.

tenê têgiheke zimanî-zaravayî ye di heman demê de wekî ku me li jorê jî destnîşan kir, wateya wê ya dînî û terîtoryal jî heye.

Di kilameke xwe ya dî de Sey Qajî bi rengê aşkera kurdên sunî tawanbar dike û weke civakeke reqîb ji bo civaka Dêrsimê/kirmanciyê dibîne:

Kirmancî

“*Cer sade ma hardo dewreso*
Mîrê mi, cor asmeno de ke wo
*Carû **kirmanciyê** de kês nêkoto*
Binê dest û pawû

Mîrê zalimî do kistene

Xelîl Begê minê Yelaldiye

*Eve destê **K’urûnê Qereyajiye***

*Mîrê to woncenê soxirkenê **duskinê***

***Cem û Cematê kirmanciye**”²²⁶*

Kurmancî

Li jêr axa pîroz

Li jor ezmanê şîn şahidê me ye ku

***Di kirmanciyê de** tu kesê*

Qebûl nekir ku bijî di nav dest û piyan de

Bi mîrê zalim daye kuştin

Xelîl Begê min ê Yelaldiye

*Bi destê **K’uroyên (kurd) Qereyaziyê***

*Mîro! Dê di **cem û cemata kirmanciyê** de*

*Te **‘duşkun’** îlan bikin*

Di vê kilamê de mebesta Sey Qajî ji *K’urûnê Qereyajiye* kurdên sunî ne. Çawa ku di mînaka jorîn de Sey Qajî zazayên sunî wekî kategoriyeke cuda bi nav dike û wan ji xwe nabîne wisa jî di vê kilamê de kurmacên sunî wekî *k’urû* bi nav kiriye ku ev îfade jî di eslê xwe de dîkekirineke etno-dînî ye. Lewre *k’urû* ji bo civaka kirmancên Dêrsimê tê wateya kurmacên sunî.

Têgihîştina civaka kirmanciyê ya nasnameyî bingeha xwe ji baweriya wan û terîtoryayê distîne. Li vê derê bawerî bi hêmana erdnîgariyê ve kelijiyê û bi vî rengî wekî kategoriyeke cuda di nava erdnîgariya kurdan de ji xwe re hawzayeke çandî-dîrokî afirandiye. Di vê helbesta jêrîn ya Sey Qajî de em têgihîştina vê koma etno-dînî ya *welat* dibînin:

Kirmancî

“Welat welat

Welatê xerî/cerî

Celvî marê amê

Celvê Mazxerî

....

Kurmancî

Welat welat

Welatê jêrîn

Li dû min celb hatiye

Celba Mazgîrê

²²⁶ H.b., r. 438.

Welat welat

Welat genîso

Qanûn rindo

Chetin hepiso

Merkeza parsena

Qizilkîlîso

.....

Xarpêt rindo bira

Wondêr dizo phono

Amnono waxtê aşirûno, nê warano

Çefê cinikono, peê dowano

.....

Ho çarna Duzgîn Baba

Wertê Kuresano

Sorî Baba

Wertê Sadizano

Qozî Baba

Serê Qozano

Ho çarna kara Melatîa

Qonaxê hîre rozano

.....

Sû Hewsê Goleke

Hewsê Dewres Chemalano

Ho çarna kara Dewe

Hewsê Dewe wayirê Kuresano

Kêmerê Dûzgînî, basê serê jarano

Ho çarna bonê K'alferatî

Wayirê Arezano

Amû Hewsê Dêrûye

Hewsê Sey Sovinano

Şû Hewsê Dewres Yilaşî

Pîrê Moskano

Çewres Osporê Çelkaniye

Wertê Sa Weylano

Moro Şîa Persena

Welat welat

Welatê mezin

Qanûn baş e

Zindan zor e

Tu bipirsî navenda wê

Nazimiye ye

Xarpêt rinde bira

Deşta dûz e

Havîn e, wexta zozanên eşîra ne

Kêfa jina ye, di nava dewkulan de

Min berê xwe da Duzgîn Baba

Navenda Kurêşan e

Sorî Baba

Navenda Şadiliyan e

Qozî Baba

Li seriya Qozaniyan e

Min berê xwe da Meletiyê

Qonaxa sê rojan e

Çûme Hewsê(Goristana) Golekê

Gora pîroz ya Dewrêş Cemal e

Min berê xwe da gund (Dewa Kuresû)

Hewsê Dewe xwediyê Kurêşan e

Dûzgîn Baba, serkêşê ziyaretên pîroz e

Min berê xwe da mala K'alferat

Xwediyê Arezana ye

Hatim Hewsê Dêrûyê

Hewsê Sey Sovinan e

Çûm Hewsê Dewrêş Îlyas

Pîrê Moskan e

Çil hespên Çelkaniyê

Navenda Şah Welî ye

Eger pirs bikî Moro Şîa (Marê Reş)

<i>Wayirê Kêmano</i>	<i>Navenda Kêmana ye</i>
<i>Sultan Seyidê serê Baxira Sipiye</i>	<i>Sultan Seyidê li ser Baxirê Sipi</i>
<i>Nari Qeregolo dori çewres çe toliv û yel/ Alîkî Qeregol aliyê dî çil talib yel?</i>	
<i>Werte Bolevanano</i>	<i>Navenda Balabanan e</i>
<i>Ho çarna kara Erzinganî</i>	<i>Min berê xwe da Erzinganê</i>
<i>Kistim wertê tirkano</i>	<i>Kistim, navenda tirkan e</i>
<i>Şû Ewliyaê Bûkî</i>	<i>Çûm Ewliyayê Bûk</i>
<i>Mekanê wûzaxano</i>	<i>Mekanê Ocaxan e</i>
....	
<i>Ho çarna na ri</i>	<i>Min berê xwe da vî alî</i>
<i>Sûlvîsê Çirixano</i>	<i>Sûlvîsê Çirixan e</i>
<i>Şû Sûlvîso bovere</i>	<i>Çûm Sûlvîsa alî din</i>
<i>Serê Pîrnîkano</i>	<i>Li serê Pîrnîkan e</i>
<i>Amû bonê Wûzaxî</i>	<i>Hatim mala Ocaxan</i>
<i>Bonê Pîrbavano</i>	<i>Mala Pîrbavan e</i>
<i>Şû Xizirê peê Pirdê Sûrî</i>	<i>Çûm Xizira li pişt Pirda Sor</i>
<i>Wertê Arezano</i>	<i>Navenda Arezan e</i>
<i>Şû Gola Bûyere</i>	<i>Çûm Gola Bûyerê</i>
<i>Semtê K'alano</i>	<i>Semta Kalano</i>
<i>Şû Golê Xizirî</i>	<i>Çûm Gola Xizirî</i>
<i>Wertê Heyderano</i>	<i>Navenda Heyderan e</i>
<i>Ho çarna Hewsê Merxe</i>	<i>Min berê xwe da Hewsê Merxê</i>
<i>Hewsê Yivraymano</i>	<i>Hewsê Îbrahîman e</i>
<i>Toliv-muhîb vengê chi dano</i>	<i>Talib-muhîb bangî wî dikan</i>
<i>Şûne Warê Mîrî</i>	<i>Çûm Warê Mîrî</i>
<i>Ewliyaê K'alikano</i>	<i>Ewliyayê Pîr û Kalan</i>
<i>Werte ro vejûne ser, şûnê Koê Serî</i>	<i>Ji wir derketim rê çûm Koê Serî</i>
<i>Rûs û rûsnalê Xizirî</i>	<i>Sûretê Xizir e</i>
<i>Mi vana bêbext mira sa vano</i>	<i>Min got hela ev bedbext çi dibê ji min ra</i>
<i>Mi niadake Heso Bira</i>	<i>Min dît Hesoyê Bira sekiniye</i>
<i>Vineto, binê çimû ra tey niadano</i>	<i>Di bin çavan de dinihêre</i>
<i>Mi va Heso! No waxtê şene û postû niyo/Min go Heso ne waxtê şan û posta ye</i>	
<i>Qêretê wûzaxano</i> ²²⁷	<i>Wextê piştgiriya ocaxên pîroz e</i>

²²⁷ H.b., r. 404-408.

Herwekî ku em di vê kilama jorîn ya Sey Qajî de dibînin, tesewira wî ya welat bi tevahî bi herêma Dêrsimê û sînorên wê yên derveyî wekî Erzîngan, Meletî û Xarpêtê bi sînor e. Bêguman Dêrsima dewra Sey Qajî û ya îro ne xwedî heman sînor in. Ji vegotina kilamê jî em têdigihîjin ku ew qismî be jî Erzîngan, Meletî û Xarpêtê jî di nava vê hawzaya çandî-dînî de dibîne.

Di vê vegotinê de welat, bi hîsên xurt yên herêmên cografîk, bi jiyana eşîrî û feodalîteyê ve girêdayî û di navbera vanan de wekî xerçekî xurt, xerca baweriya taybet ya elewîtiya Dêrsimê heye. Ziman kirmancî ye lê em tu nîşanê nabînin ku xwe bi kirmanc an jî zazayên dî yên sunî ve girêbidin an jî tesewira xwe ya nasnameyî û welat di nava tevdehiya civaka kurd de bibînin.

Lê dema ku em bala xwe didin elewiyên kurmanç di hîsiyata welat de li gorî elewiyên kirmanc cudahî xuya dike. Wekî mînak ev kilama jêrîn ji aliyê dengbêjek/aşîqek herêma Mereşê, yê bi navê Aşîq Fedâî hatiye gotin.

*“Welatê me **Kurdistan** e, **kurd** kole ne bindestan e
Welatê me **Kurdistan** e, **kurd** kole ne bindestan e
Hêlê xelkê bar(bihar) havîn e, tim ji me re zivistan e
Here lo xelkî rezîlo, tu neçar o tu sefîlo
Ji bin şerê zulimkaran ez le serî tu menzîlo*

***Dêrsim** ji **Meletyê** wê da, her nalekê çend **tirk** tê da
Dêrsim ji **Meletyê** wê da, her nalekê çend **tirk** tê da
Hûrê giran pir şûn xwarin, ê derizîn bin erdê da
Here lo xelkî rezîlo, tu neçar o tu sefîlo
Ji bin şerê zulumkaran ez le serî tu menzîlo”²²⁸*

Di vê kilamê de tê dîtîn ku vebêj, di pênasekirina xwe ya etnîk û tesewira xwe ya welat de, li gorî elewiyên kirmanc helwesteke cuda nîşan daye. Heman vebêj, di kilameke xwe ya dî de (di rûpela 93yan ya vê tezê de) xwe wekî kurmanç bi nav dike. Ji vê yekê tê dîtîn ku ew kurmanç û kurdbûnê wekî têgihên sînonîm/hemwate dibîne. Lê di berhemên kirmancên elewî de, ne diyar e ku kirmancbûn û kurdnûn sînonîm in an na.

²²⁸ Alî Alxasî, *Ji Meraşê Xeberek Hat*, Weşanên Pêrî, Ç. 1, Stenbol, 2003, r. 86.

Her çendî ku di mînaka Sey Qajî de kirmancên elewî di xwepênasekirina etnîk de xwedî helwesteke cuda bin jî di gelek kilamên Sey Qajî de li hember îktîdara Osmanî an jî Cûmhûriyetê, heta wekî nasname li hember desthilatdariya tirkan jî refleksên wî hene.

Kirmancî

“Lawo Aşîrene

Sima gilê tifongû çharno ra jumînî

Ewro wertê sima de lezo

Meste biro deweyî benê giranî

Sima rê xeyle sare dezo

Nat û dota ginêne waro

Pêro cenco chayil û razo

No nê dowilo nê sazo ne kî cezo

*Sima weşenenê **Sey Qajî***

Vanê: Bêro şuare vazo

Ala şuare haza vinderô

Wazanê ke tirk bêro

Sima Dêsim kaniye ra vezo

Mazûriye de binê suxru û sepetûnê silû erzo”²²⁹ Bixe bin sepeta rêxê

Kurmancî

Law Eşîrno

We berê tivingan daye hev û du

Îro ev e mesele di nava we de

Lê sibêro mesele mezin dibin

Wê pir serê we biêşe di vir de

Ji her du aliyan jî yên ku dikevin ser axê

Hemî gênc û cahil û nûciwan in

Na ev ne dehol e ne saz e ne cihêz e

*Hûn gazî **Sey Qajî** dikin*

Dibêjin, bila bê kilaman bixwîne

Hela van kilaman bidin alîkî

Hûn dixwazin ku tirk bènê

We ji Dêsimê derxe, li sirgûnê

Di vê klama xwe ya jêrîn de Sey Qajî, lome li serekeşîr û begên Dêsimê dike ku axa berhemdar ya Dêsimê; Çarşancaqê, ji tirkan re berdane. Ev herêma herêmên Perteg, Mazgîrd, Pêrî û Çemîşgezê in.

Kirmancî

“Xeylê seriyê fetelinû wertê aşîr û dewû ra

Sima milkê Çarşancaqî tirkû rê cha verdo

Amê niştê gilê na kowû ra”²³⁰

Kurmancî:

Gelek wext e ez digirim li nav gund û eşîretan

We axa Çarşancaqê berdaye ji tirkan re

Û hatine xwe sipartine van çiyayên bilind

²²⁹ D. Cengiz, *Dizeleriyle Tarihe Tanık Dersim Şairi Sey Qajî*, r. 209.

²³⁰ H.b., r. 211.

Dîsa di kilameke xwe ya dî de Sey Qajî pesnê Elîşêr dide ku ew weke rêbereke Serhildana Dêrsimê tê nasîn. Her çendî ku Elîşêr ji kurmancên Qoçgiriye ye jî tê dîtin ku ew li herêma Dêrsimê ji aliyê gel û ozanan ve bi hîsên welatperwerî hatiye pêşwazîkirin. Di vê klama xwe de Sey Qajî wiha behsa Elîşêr kiriye:

Kirmancî

“Zerevêsayeniya welatê xo

*Vera **dismenî** qar û yinatê xo*

Sare bide, mede sir û binatê xo

De çip bikûyê per û qeynatê xo”²³¹

Kurmancî

Bi hemî welatperweriya xwe

***Dijmin** qehr bike bi îlada xwe*

Serê xwe bide, mede sir û binatê xwe

Rabe xwe kar ke bi bask û qenadê xwe

Ji vegotinên gelêrî yên kurdên elewî em têdigihên ku ew bi pênaseya kurmanc an jî kirmanc xwe ji tirkan vediqetînin yanê ji bo wan kurmanc an jî kirmanc tê wateya nasnameya etnîk an jî netewî lê li aliyê dî bi pênaseya elewî jî xwe ji kurdên sunî vediqetînin. Di vê kilama jêrîn de kirmancbûn û tirkbûn wekî du nasnameyên etnîk û dîkeyên hev hatine dîtin.

Kirmancî

“Derê Laçî bivêso

Yivisê me gavano

Bira pêrodê, na qewxa eşîra niya

Merevê kirmanc û zalimanê tirkan

Destê xo ra xo mecêrê

Sar ma rê qolaye vano

Pepêug bêro binîso

Cêncûnê ma rê biwano”²³²

Kurmancî

Bila bişewite Çemê Laçê

Yivisê min gavan e

Lêdin birano, ev ne şerê eşîran e

Şerê merivê kirmanc û zalimê tirkan e

Xo paş ve nekêşin

Bila navê me derneyê

Bila çûka pepûg bê venise li vir

Bila li ser xortê me bixwîne

Wekî ku di vê mînakê de û kilama jorîn ya li ser Şêx Seîd de xuya dike, kurdên elewî, nasnameya xwe bi rengekî pragmatîk, li dû konjektora heyamê diyar dikin. Di vê mînakê de ew li hember tirkan xwe wekî kirmanc bi nav dikin lê di mînaka Şêx Seîd de, elewîbûna xwe derdixin pêş. Bêguman ev rewşek xerîb

²³¹ H.b., r. 228.

²³²Mustafa Düzgün, *Tayê Lawikê Dêrsimî*, Weş., Berhem, Çap. I., 1992, Ankara, r. 83.

nîne û wekî ku me di beşa destpêkê de jî diyar kiribû, tişta ku nasnameya civakan diyar dike lê kêleka dîrok û erdnîgariyê di heman demê de konjektora demê ye.

Di vê kilama jêrîn de ev rewşa konjektorîbûna nasnameyê bêtir vekirî xuya dike.

Kirmancî

“Wûsiv vano: Lawo pêrode ma pêrodime

Dînê me dînê îslamî ye

Qenterê me Mihemedê hometo

Daê mewrano çe vesae kêwto ve ci

Hermeñî kêwto ra ver fetelîno

Vengê rezûnê Dêsimkaniyê cira veto

Nê haqo to ve xezevê giranî nêrê

Eskerê îslamiyê serê meterîşî de kêwto

Eskerê xiristanê mewranî

Cirê sondê qeydê dolamiye veto

Way way merdene xerîviyê”²³³

Kurmancî

Ûsiv dibê: Şer bike em şer bikin!

Dînê me dînê îslamê ye

Qenterê me Mihemedê ummetê

Dayê, Merwan e (Rûs) hatiye

Ermenî jî ketine pêş digerin

Dengê xortên Dêsimê birîne

Xwedê xezebên giran neyên

Eskerên îslamiyê bê taqet ketine

Eskerên xirîstiyên yên merwanî

Ji xwe re di kêf û şahiyê de ne

Way way mirinê, xerîbiyê

Di vê mînakê de em têgihên kurmanc û elewî nabînin. Pênaseya nasnameyî bi tenê li ser esasê dînî hatiye kirin û ew jî di wateya herî fireh de hatiye kirin. Lewre di vê mînakê de ermenî û rûs bi hev re êrîşê herêmên kurdên elewî dikin. Ew xirîstiyên in. Hevkariya wan di çarçove an jî wecheke dînî de ye. Hingê bersiva li vê rewşê jî li gorî faktora dîkeyê peyda dibe. Li hember nasnameya xirîstiyaniyê, ne nasnameya kurmancbûn an jî elewîbûnê lê nasnameya ‘îslamiyê’ peyda dibe. Rewşa konjektorîbûn û pirtebeqeyîbûna nasnameyê jî di vê kontekstê de encam dide.

Li herêma kurmancên elewî yên Mereşê, Kilama Mamedalî an jî Qasimoxlû Mamedalî navdar e. Qasimoxlû Mamedalî xortekî bîst û pênc salî ye, serekê eşîrê ye û li hember dewletê serî rakiriye. Di navenda nasnameya wî de kurmancbûn û elewî bûn heye. Gelê vê herêmê dema ku vê bûyerê bi bîr tîne, vê taybetiya dînî û etnîk ya nasnameyî derdixe pêş.

“Demê demê dem Elî ye

Demê demê dem Elî ye

²³³ D. Cengiz, *Sey Qajî*, r. 317-318.

Serê çavan ser kanî ye
Goçan le ser rê daniye
Elî dem e dem Elî ye
Deştê Kirbe ê be ber e
Tofanekê girtiye ser e
Lawkê min dixwaze were
Tornê hezretî Pêxember e

Le Enqerê têlê xistin
Le Meletî fener vêxistin
Xeber kete eşîretê
Gotin Memedalî bi darê xistin
Here lawo lawo lawo”²³⁴

Di nava gel de tê gotin ku, Mamedalî di destpêkê de naxwaze li hember dewletê serî hilde lê hevsera wî ya bi navê Hûrî jê re wiha dibêje:

“Tu Qasimoğlu Memedalî bî, **elewî û kurmanc** bî û alikariya Osmaniyan bikî! Ev dibe?”²³⁵

Li vê herêmê wekî herêma kirmancên elewî, li şûna dengbêjan, bêtir aşiq an jî ozan derdikevin pêş. Ew, wekî ku di mînaka dengbêjan de jî diyar e, guh û dilê wan ji wan bûyeran re vekiriyê ku bandorê li gel dikin û di kilamên xwe de van hîsiyatan tînin ziman. Li herêma Meraşê, aşiqê navdar Aşiq Fedaî, di kilama xwe ya bi navê *Ez Kurmanc im* de wiha nasnameya xwe ya etnîk dide der:

“Ez kurmanc im qurban heyran ez qe tirkî nizamim

Berê vir de birîn im, dilê min girtiye sizî

Ez kurmanc im qurban heyran ez qe tirkî nizamim

....

Bi min dikenin tirk û çete sankî ez ne însan im

Tu bê çi hatime dinyê je canê xwe osang im

Dîn nebûme çi be çi ye her halekî dizanim

Ez kurmanc im qurba heyran ez qe tirkî nizamim

²³⁴ A. Alxasî, *Ji Meraşê Xeberek Hat*, r. 56.

²³⁵ H.b., r. 55.

.....

Li axa axan gir bûm mekteba min tunebû

Ez şivan bûm le zozanan hevalê min pez hebû

Negerim le tu welatan zimanê min ev hebû

Ez kurmanc im qurban heyran ez qe tirkî nizanim

.....

Ya Heso ye ya Huso ye ya Memo ye navê min

Ya Elo ye ya Heydo ye ya Misto ye bavê min

Ez dixwazim rizgariyê belkî çavê min nabînin

Ez kurmanc im qurban heyran ez qe tirkî nizanim ^{”236}

Wekî ku em di vê kilamê de jî dibînin, kurmancên elewî di aşkerakirina nasnameya xwe ya etnîk de, ku ew vê wekî ‘kurmanc’ bi nav dikin, li gorî kirmancên elewî bêtir zelal in. Lê di aşkerakirina nîşaneyên ku girêdayî nasnameya dînî ne, her çendî ku hin nîşane hene jî, wekî ku di risteya dawîn de, ji navên ku dertêne pêş diyar e ku ew di hînterlandeke elewî de dijîn, dîsa jî ew çend vekirî nînin. Dibe ku sedema vê yekê ew be ku; cînarê kirmancên Dêrsimê bêtir kurmanc in in lê kurmancên Meraşê ji aliyê rojava de cîranên wan tirk in. Her wiha li rojhelat jî ew bi piranî cîranê kurmancên sunî ne. Lewma ji bo wan, ya ku wan ji her du civakên cîran yanê ji tirk û kurmancên sunî cuda dike kurmancbûn û elewîbûna wan e. Yanê ew bi kurmancbûnê xwe ji tirkan û bi elewîbûnên xwe ji kurmancên sunî cuda dikin. Ev yek nîşanê me dide ku di teşekula nasnameyê de rola civakên dîke çendî karîger e.

2.2. Di Vegotinên Gelêrî Yên Kurdên Elewî De Motîfên Dînî

Di binê vê sernavê de, em ê li ser hin têgih an jî motîfên dînî bisekinin ku di nava termînolojiya dînî ya elewîtiyê de girîng in. Em ê di destpêkê de wateya van motîfan di nava termînolojiya dînî de bidin û bi dû re nîşan bidin ku ew di vegotinên gelêrî de çawa derdikevin pêş me. Bi vê yekê em ê hewl bidin tesbît bikin ku, bi taybetî di vegotinên hevpar de, civaka kurdên elewî bi çi rengî mohra xwe ya dînî li berhema folkorê dixê. Ev yek di heman demê de îdfaya wan ya

²³⁶ H.b., r. 84-85.

nasnameyî jî nîşan dide ku ew bi vî rengî mohra xwe ya etno-dînî li berhema folklorê dixin.

Di vê binbeşê de em ê li ser sê têgihên ku ji bo baweriya elewîtiyê girîng in bisekinin. Ev têgih bi vî rengî ne: *Xizir, Sir, Heq*. Her çendî ku ev hersê têgih di nava civakên dî yên kurdan de hene jî, wekî ku di civaka kurdên elewî de derdikeve pêş me hem ne berbelav in û hem jî ne xwedî wateyê taybet ya dînî-bawerî ne. Em ê di her têgihê de, di heman demê de balê bikêşin ser girîngiya wê ya dînî-bawerî jî.

2.2.1. Xizir/Xidir

Di dîroka gelek dînan û baweriyên kevnar de, bi navên curbecur wekî *kothar, chusor, xizir* derdikeve pêş me.²³⁷ Di nava dînê îslamiyetê de ew bi piranî wekî ewliyayek Xwedê ku qabiliyeteke girîng bo wî hatiye bexşandin tê zanîn. Di Qura'nê de, di sûreyê *Kehfê* (18/65) de her çendî ku bi navê Xizir nehatibe binavkirin jî behsa kesek ku ji aliyê Xweda ve merhemet û îlim bo wî hatiye bexşandin tê kirin û ev şexsiyet di nava cîhana îslamî de bi piranî wekî Xizir hatiye telaqîkirin. Lewre ev şexsiyetê dînî, hem girîngiyeke wî ya dînî û hem jî ji ber ku bûye mijara gelek çîrok, hîkaye û vegotinên gelêrî girîngiyeke xwe ya folklorî heye

2.2.1.1. Di Nava Termînolojiya Dînî Ya Kurdên Elewî De Xizir/Xidir

Di vegotinên gelêrî yên kurdan de ew bi piranî bi rola xwe ya alîkar ku lehengan ji sergêjiyê an jî ji tengahiyê xelas dike derdikeve pêş me. Wekî mînak dema ku Memê Alan ji bo bajarê Cizîrê derdikeve rê û rêya xwe hunda dike, hingê Xizir derdikeve pêş wî û rêya rast nîşanê wî dide. Lê di folklorê kurmanc û kirmancên elewî de Xizir bi roleke pir berfireh derdikeve pêş. Gürdal Aksoy di heqê girîngiya Xizir ya di nava sîstema dînî ya elewîyên Dêrsimê de wiha dibêje:

“Li Dêrsimê Xizir, motîfek wisa ye ku carina ji Heq bêtir li ser navê wî sond tê xwarin, li ser navê wî tobe tê kirin (Xizir bo, tobe Xizirî bo ke), ji bo wî rojî tê girtin (Rocê Xizirî), qurban bo wî tê pêşkêşkirin (Qirvanê Xizirî), li ser navê wî loqme tê belavkirin. Nîdaya ‘Ya Xizir’ nîdayeke tîpîk ya destpêka duayên vê herêmê ye ku ev li gelek deverên dî yên misliman wekî ‘Ya Xwedê’ tê gotin. Li

²³⁷ G. Aksoy, *Dersim Alevi Kürt Mitolojisi*, r. 240-241.

Dêrsimê gelek dever û golên bi navê wî hene (Gola Xizirî). Li ser navê Xizir, Cem tê çêkirin û ji bo darê di destê wî de ku pîroz e, Darê Xizirî tê gotin. Li herêma biwêja 'Tuskê Xizirî' heye ku ji bo zarokên ku di şerê eşîr an jî felaketên xwezayî de bêkes mane tê gotin ku ew bo hin kesan têne dayin."²³⁸

Herwekî ku em ji vê îzahata Aksoy jî têdigihîjin, têgiha Xizir, di nava civaka kurdên elewî de xwedî wateyên gelek berfireh e. Bi taybetî tê fêmkirin ku ew di nava sîstema dînî ya elewîyan de, wekî ku di mînakên *Cema Xizir, Rojiya Xizir, Qurbana Xizir, Loqmeya Xizir* de derdikeve pêş me, ji civakên dî yên kurdan cudatir, xwedî wateyeke dînî-bawerî ye. Li gorî Aksoy, di nava elewiyên Dêrsimê de Xizir wekî cureyek Xweda ye:

*"Li herêma Dêrsimê, carina ji bo Xizir, Xizir Pêxember tê gotin. Lê ew carina di şûna Xweda de hatiye dîtin. Eger ku em cudahiyeke di navbera Xizir û Xweda de çêbikin, em dikarin bibêjin ku Xwedayê li esmanan Heq e, yê li erdê jî Xizir e."*²³⁹

Li gorî Munzur Çem; rola ku êzîdî li Melekê Tawis bar dîkin û rola ku elewî li Xizir bar dîkin heman rol e. Di her duyan de jî ew wekî pîroziya herî mezin hemem li dû Xweda tê.²⁴⁰

"Xizir li Dêrsimê di nava pîroziyan de yê li herî jorê nîn e. Ew ji vî alî ve li dû Xweda tê. Lê di pratîkê de yê ku herî pir pê bawerî heye, yê ku herî pir bang lê tê kirin, yê ku mirov herî pir wî nêzî xwe dibînin ew e. Dereceya pîroziyên elewiyên kurd bi vî rengî ye:

1. *Xweda*
2. *Xizir*
3. *Roj*
4. *Çar Melek*
5. *Hz. Muhemmed, Hz Elî, 12 Îmam û Fatima*
6. *Hemî Pêxember*
7. *Ziyaret, Ewliya û Serkirdeyên Dînî*"²⁴¹

²³⁸ H.b., r. 270.

²³⁹ H.b., r. 272.

²⁴⁰ M. Çem, *Dêrsim Merkezli Kürt Aleviliği*, r. 206.

²⁴¹ H.b., r. 42.

Di vê metna jêrîn de ku ji herêma kurmancên elewî yê Pertegê, ji gundê *Coravanê* hatiye berhevkirin, tê dîtin ku Xizir di nava baweriya elewîtiyê de karaktereke çendî girîng e:

“Ya Xizir

*Wayirê çerx û perveza **Şah Huseynî Kerbela***

***Xizir Elesselam** serê gemî û geçîdan*

Wexta saeta teng da me ra xadaniyê dike

Xudanê her du sultanê cilm û cîhanê

Qeze û beçaxê derê me û talibê hublekê

*Me ji riyê rastiyê û **riyê Ehlibeytê** nekî*

Xadiyê xudyanê ra keremê şehîdê şuhedan

Hespê bozê gerden girî

Me destê şimila terbiye nekî

*Me ji defterê **Şah Huseynî Kerbela** merûm nekî*

Risqê me û heval û hogir ji navê xwe da bidî ya Rebî

Qeze û becaxe derê me û xêr xazî talibo hubnekî

*Destê kesî negirî ji **Cema Heqê** navê der*

Ya Rebî rama te pîr e tû ku star bikî

Fersendê dijminê me nedî

Ya Xizir

Hatim li te û ketime destê te recayê te dikim

Ji comerdiya rama xwe gunekariya mede îlahî ya Rebî

***Loqme** ku min da deftera **Şah Huseynî Kerbela** binivîse*

***Ya Xizir**”²⁴²*

Di vê berhevoka jorîn de tê dîtin ku li vê herêmê yanê li herêmên ku kurdên elewî lê dijîn, Xidir an jî Xizir ji wateya xwe ya herêmên dî bêtir xwedî wate û fonksiyoneke berfireh e. Kurmancên elewî, girîngiya Xizir ji bo xwe wiha rave dikin:

“Xizir ewliyayê ewliyan e. Murşît, pîr, rêber, taliv herkes yanê merivê bawer dikin, her tim banê Xizir dikin. Va meha meha Xizir e. Em vê meha pîr hez dikin. Sê roj rojî digirin. Rojiyê me wekî rojiye tirkan nînin. Sata dev dudiyar rabirt em qe tişteke navijîn devê xa. Ji me sawûr tune. Di bawerî me da ziyafet ne rast e. Em

²⁴² Hakan Aday, *Foklora Herêma Pêrtégê*, Metna Neçapkirî, Gundê Coravan, Pertek/Dêrsim, r. 2.

di nav rojan de, roja sêşem rojiya yekî ye, roja çarşemê ya duduyan û pêncşemê jî roja sisîyan e.”²⁴³

Daimi Cengiz, girîngiya Xizir ji bo herêmên elewiyan Dêrsimê wiha dinirxîne:

“Di tesewira Dêrsimê de, Xizir cureyek Xweda an jî însanê kamil e.”²⁴⁴

Lê Munzur Çem digel ku ew jî îfade dike ku Xizir motîfeke pir girîng ya dînî ye jî red dike ku li Dêrsimê Xizir wekî Xweda tê tesewirkirin. Li gorî wî civaka elewiyan Dêrsimê ji aliyê baweriya xwe ve yek Xwedayî ne.²⁴⁵

Sey Qajî di gotinek xwe de wiha behsa Xizir kiriye:

Kirmancî

“Zonê me zonê **Xizirî**
Donê me donê **Xizirî**”²⁴⁶

Kurmancî

Zimanê me zimanê **Xizirî** ye
Sûretê me ji sûretê **Xizirî** ye

Di van risteyên jorîn de diyar dibe ku tesewira Xizir ya di nava kurdên elewî de, gelekî cuda û xwerû ye. Ew ne tenê karakterekî dînî an jî folklorî ye ku di roleke teng û diyar de derdikeve pêş me. Ew di heman demê de wekî temsîla jiyan û baweriya hemî civakê ye.

Yek ji mînaka girîng ku nîşanê me dide ku Xizir, ji bo kirmanc û kurmancên elewî ne tenê motîfeke ji rêzê ye lê ew di heman demê de motîfeke girîng yê dînî ye û belkî yek ji sitûnê esas yê baweriya wan e, vê kilama jêrîn ya Sey Qajî ye:

Kirmancî

“Wertê ma de **îqrarê Eliyo**
Sirrê Xizirê K’aliyo
Sondê Haqî weriyo
Qalê yiqrarî ke bî
De rû de wûye, asme ra roz ceriyo.”²⁴⁷

Kurmancî

Di navbera me de **îqrara Elî**
Sirra Xizirê Kal
Sonda Heq heye
Qala îqrarê ku bû
Di çem de av, li ezmana roj disekine

²⁴³ H. b. r. 1.

²⁴⁴ D. Cengiz, *Sey Qajî*, r. 216.

²⁴⁵ M. Çem, *Dêrsim Merkezli Kürt Aleviliği*, r. 48.

²⁴⁶ H.b., r. 216.

²⁴⁷ D. Cengiz, *Sey Qajî*, r. 253.

Di vê kilama jorîn de em dibînin ku Xizir, li kêleka çend motîfên pir bi hêz yên elewîtiyê hatiye bikaranîn. Li gorî berhevkar, *Sey Qajî* vê beyta xwe di *Cema Îqrarê* de gotiye. *Hz. Elî, Sonda Heq û Xizir* wekî pêkhateyên bingehîn yên *îqrarê* hatine vegotin. Îqrar, di îtiqada elewîtiyê de wekî sozdayin an jî bîatkirinê hatiye dîtin. Ji xwe eger ku kesek îqrar nede, ew nabe elewî jî. Yanê di cemeke wiha girîng de ku gav avêtina nav wê baweriyê temsîl dike, Xizir, li kêleka Elî û Heq wekî stûneke bingehîn ya baweriyê elewîtiya kurmanç û kirmançan derdikeve meydanê.

2.2.1.2. Di Vegotinên Gelêrî Yên Kurdên Elewî De Motîfa Xizir/Xidir

Yek ji çîrokên ku me ji herêma Pertegê berhev kiriye, bi navê *Xizir û Sê Bira* ye²⁴⁸. Di vê çîrokê de Xizir lehengê sereke yê çîrokê ye. Cudahiya vê rewşê ji herêmên di ew e ku di çîrokên aliyê kurmançên sunî de Xizir bi piranî wekî lehengê sereke na lê wekî lehengekî alîkar derdikeve pêş me. Di hin xaçerêyên girîng de derdikeve, rola xwe dilîze, lehengan ji tengahiyan xelas dike û bi dû re hunda dibe. Lê di vê çîrokê de ji destpêkê heya dawî Xizir lehengê sereke ye. Bêguman di vê çîrokê de jî wekî çîrokên di yên civaka kurdan, lehengên di yên çîrokê hay jê tunene ku ew Xizir e. Bi piranî ew wekî kalemêrek, rûspiyekek li pêş lehengan peyda dibe.

Di vê çîrokê de li kêleka girîngiya kesayeta Xizir, behsa ‘*ton veguhartinê*’ jî tê kirin ku ew taybet e bi baweriyê elewîtiyê. Li dû vê yekê ton/don veguhartin, di reng û sûreteke nûh de tezahurkirin e. Yanê cewherê wî naguhere lê ew di reng û sûreteke nûh de derdikeve meydanê. Ev di heman demê de di asta wî kes an jî tiştê ku vediguhere de jî bilindbûnekê nîşan dide.

“Ew li wê bimînî, **Xizir** tere li ber deriy biray ortê derdikevî. Avîne, germa beroy, sêr dike ku şivanan mî kirine garê, miyan didoşin. Dîsa tonê xa vedigorî, xa dide nexaşî, kurtik pirtikan bi ser xa va dike, tere diwê mal bi xêrdî şivanino, Xadê bereketê bide. Ez pir nexaşim, li doxtorêni heyî tune yî gerîm mi ra gotin ki çareyê va nexaşiya te şîrê miya reş e. Xêra bavê xa dikin li şîrê miya reş bardaxik şîr bidin ez vexum. Şivan diwên wele apo em emir qulî nê, biskin xewerê bidinê axay xa, tu derdê xa wî ra biwê, belkî ew bardaxik şîr dide te. Terin xewerê didin axê, tek û biray ortê ye. **Tawî Xizir ton vegortiyê**, nas nake. Diwê çike kokimê jar, te çima

²⁴⁸ J.1., Pêvek 1.

bani min kir? **Xizir** diwê oxil tu li qisûrê min nemînî. *Qe pirs meke, ez rasti derdikî bêderman hatime, ku çûm kujan doktorî mi ra gotin ku îlacê derdê te şîrê miya reş e, tu ku şîrê miya reş vexoy, nexaşiya te radiwirî. Li şîrê miya reş bardaxik şîr didê min? **Loqmey Xizir bî, ez vexum derdê mi ra biwî derman.** Risqê te jî ku yêk bû biwî hezar. Biray ortê pustumekî dide **Xizir**. Diwê hiş, duwayni xa xa ra bike. Parsaciyê pîs, şîrê miya sipî bi dest ketiye ca şîrê miya reş dixazî. Şîr mîrê ku bidim te tunun, here qotikê vexe. Bikiş, siktir we here, cariki din jî mê van dorana. Şivanan ra jî diwê pê pîst bigirin bavijin der, cariki din jî êni tora vî nêziki deriy min mekin. **Xizir** diwê oxil tu jî? Bila wer bî, madam ku wêtirêye, wê vextê eskî yerine diwê **sir diwî tere**. Biray ortê sêr dike ku şûnda xa yê berênî ye. Ew dera ku ax kişandiwû li wê derê ye. Biray mezind jî li cem e. Her du bira hevdu hemêz dikin. Diwên me nezanî ku ew **Xizir** bû, poşman diwin ema pere nake, tiştê ku rawurî şûva nê.*

Neyse ew li wê bimînin, **Xizir** tere ziyareta biray qicik, li nêzika xaniy wan derdikevî. Avîne, germa beroy. **Dîsa tonê xa vedigorî, xa dide nexaşi, xûn û nêmi di kul û birînan da tere.** Kurtik pirtikan bi ser xa va dike, Dike nal û nal, giran giran ber vi mala biray qicik va tere. Jinika biray qicik jî sîntil bi xa da kirine tere avê. Sêr dike ku kokimik wê va tê, dinalê, dizîwê. Kincî kol di nav xûn û nêmi da mane. Sîntilan datînî kanî, dipekê, ber vi rû sipiyê kokim tere. Diwê wûy kalo kalo va çi halê te ye? Zû were pişta min, te bemi mal. **Xizir** diwê na qîza min, ser û guy min kulî xûn û nêmi e, qilêr e, va qutnî wû qumaşê ser te ra gune ninin tu min piştikê? Kincêni te qilêr newin, ez bi xa tîm ku diwê, jînik **Xizir** davijî ser pişta xa, digirî diwe mal, qatik cil vê ra datînî, kincêni ser vedigorî, kul û birinan pak dike, bi azet û xizmetê êvar dike.”²⁴⁹

Wekî ku em di vê pasaja çîroka ku me berhev kiriye de dibînin Xizir di çîrokê de hem di roleke sereke de ye hem jî di van rolan de; tevî baweriya elewîtiyê derdikeve pêş me. Di du cihan de behsa Xizir û “ton veguhartina” wî tê kirin û her wiha di derekê de behsa ‘loqmey Xizir’ tê kirin.

Ev yek di çîrokên kurdên herêma Mereş/Elbîstanê de jî derdikeve pêş me. Ev herêm jî bi piranî bi kurmancên elewî cîwar e. Di berhevoka ku Besê Aslan jî herêmên Elbîstanê berhev kiriye de²⁵⁰, wekî mînaka ku me ji herêma Pertegê da,

²⁴⁹ J.I., Pêvek 1.

²⁵⁰ Berhevkar Besê Aslan van çîrokan bi zimanê orjînal qeyd kiriye lê bi tirkî çap kiriye. Wergerên ku li vê derê bi kurdî hatine kirin aydê me ne.

çîrok bi tamamî li ser Xizir e.²⁵¹ Di çîrokê de padîşahê zordar ji Ozan dixwaze ku Xizir bibîne. Lê Ozan wiha bersiv dide padîşah:

*“Padîşahê min, **Xizir** di dilê pak de ye, di çavên ronî de ye...”²⁵²*

Ji van îfadeyan jî em têdigihên ku Xizir, xwedî roleke manewî ye, di jiyana derûnî ya kurdên elewî de. Her çendî ku Ozan, ji Padîşah re bi vî rengî dibêje jî, Padîşah qebûl nake û Ozan neçar radibe li Xizir digere. Di vê kêliyê de em dibînin ku Xizirê ku di piraniya çîrokên kurdan de wekî kalemêr derdikeve pêş lehengan vê carê li gorî baweriya elewîtiyê bi rengekî cuda ‘*ton veguhartiye*’ û di reng û sîfetê zarokekî de derdikeve pêş lehengan. Zarok ji Ozan dixwaze ku wî jî bi xwe re bibe cem Padîşah. Her çendî ku Ozan êdî wilo bawer dike ku dê ji aliyê Padîşah ve bê kuştin jî, zarok jî bi xwe re dibe. Li wê derê ji Padîşah û Ozan ve aşkera dibe ku zarok di rastî de Xizir e. Zarok ji Padîşah re wiha dibêje:

*“Padîşahê min! Xwezî te destûr bida ku Ozan, ozantiya xwe bikira. Xwezî te ji gotina Ozan bawer bikira û fêhm bikira ku **Xizir di dilê mirov de ye**. Li ku derê tu dixwazî wî bibîn **Xizir** li wê derê ye. **Xizir zarok e, Xizir ozan e, Xizir li cem mirovên dilpak e.**”²⁵³*

Wekî ku em ji ravekirina bi vî rengî têdigihîjin, tesewira Xizir ya elewîtiyê bi tevahî cuda ye. Ew li kêleka girîngiya xwe ya dînî wekî temsîla hîs û ramanên baş yên mirovan rû dide.

Di xebata bi navê Kilamên Dêrsimê de, ku ji aliyê Mustafa Düzgün hatine berhevkirin, em rastî heman motîfê tênê ku vê tesbîta me ya jorîn piştrast dike.

Kirmancî

“Na dawa ma dawa çêverê tu ya

Xizirê serê dengiz û deryayî

Na dawa ma dawa çêverê tu ya

To nêzû zona Tûzik Bava yî

Bava na qeşî rê kotî menda

²⁵¹ Besê Aslan, *Nar Ağacının Gölgesi Yoktur*, Elma Yayınları, 1. Baskı, 2005, İstanbul, r, 138-139.

²⁵² H.b., r. 138.

²⁵³ H.b., r. 139.

*To çayê serê xo kerdo binê cilê şiyayî*²⁵⁴

Kurmancî:

Ev doza me bo te ye, li ber dergehê te ya Xizir

Serwerê behr û deryayan

Ev doza me li ber dergehê te

Nizanim gelo, hûn dîzanin Tûzik Bavayê

Li ku mayî tu Bava li hember van tiştê ku hatin serê me

Çima te serê xwe xistiye binê cilika reş?

Ji van risteyên jorîn diyar e ku elewiyên Dêrsimê dema ku tên qetilkirin, ji Xizir û pîroziyên xwe yên dî wekî *Tûzik Bava* daxwaz dikin ku bêne wan xelas bikin. Dîsa di heman kitêbê de em rastî îfadeya ‘*Qurbana Xizirî*’ tên. Li gorî berhevkar, beriya ku bûyerên Dêrsimê biqewimin, serekeşîr û begên Dêrsimê li hev dicivin, bi minasebeta *Qurbana Xizir* ku ev yek ji bo wan tê wê wateyê ku dê li hev îxanetê nekin.

Kirmancî

“Sahanê min qolê de xo gureto

Şiyo geçê Koyê Mûzirî

Vano ‘Lao bêbextênî mekerê

*Ma piya werdo Qirbanên Xizirî*²⁵⁵

Kurmancî

“Şahan komekê girtiye cem xwe

Derbas bûye wî alî Mûnzûrê

‘Lawo bêbextiyê mekin

Me bi hev re xwariye Qurbana Xizirî

Baweriya taybet ya bi Xizir li herêmên kurdên elewî ew çend berbelav e ku ne bi tenê di metnên dînî û destanî de lê di çîrokên wan de jî berbelav e. Wekî mînak *Çîroka Pepûg* ku li gelek deverên Kurdistanê tê zanîn, li vê herêmê jî bi berbelavî tê zanîn. Lê di varyanta vê herêmê de em wê mohra dînî-bawerî tê de dibînin ku ev yek palpişteke girîng e ji bo vê xebatê jî. Di varyantên dî de bi piranî

²⁵⁴M. Düzgün, *Taye Lawikê Dêrsimî*, r. 64.

²⁵⁵H.b., r. 76.

ji her du xuşk û birayan, xuşk ji bira bawer nake û wî sûcdar dike ku kereng xwarine lê di vê varyantê de bira ji xuşkê bawer nake û wê sûcdar dike ku kereng xwarine û ji bo ku vê ispat bike bi kêrê zikê wê diqelêşe da ku kerengan bibîne. Lê di dawî de dibîne ku kereng tunene lê xuşk miriye.²⁵⁶ Û ew jî wiha bang dike:

Kirmancî

“Haqo! Xizir! Dûzgi!... Ez bine guna waa hora dinalixê de nêvejînu. Werte homete de nêfetelinû. Kes silamê haqî ro mi nêkeno. Mi tayro de heneke ke, dare ve dare, kemer ve kemer, ko ve ko raperî, eve derde waa xo binalî. Dinalixê de hervet vo ke, seweta têlîe kêngerî biray wa kista.”²⁵⁷

Kurmancî:

“Ya Xwedê! Ya Xizir! Ya Dûzgi!... Ez êdî di vê dinyalixê de nikarim bijîm. Nikarim li rûyê kesê binêrim, derkevim hizûra tu kesê. Kes silava heq li min nake êdî. Min bike çivîkekî. Dar bi dar bifîrim, xwe ji vî çiyaî bavêjim wî çiyayî, serê xwe li wî kevirî bixim li vî kevirî bixim, bi vî derdî her binalim ku min ji bo kerengekê birayê xwe kuştiye.”

Di vê varyantê de, digel ku di nava çîrokê de tê gotin ku bira zikê xuşkê diqelêşe jî, di pasaja jorîn de tê gotin ku “seweta têlîa kêngerî biray wa kista” yanê keçikê birayê xwe kuştiye. Di çîrokan de hin epîzot, pasaj an jî leheng dibe ku li gorî herêman biguherin an jî vebêj wan jibîr bikin û formeke nûh bidinê lê epîzot an jî kêliyên ku girîfta çîrokê di wir de ye zû bi zû naguherin. Ew carina wekî ku di vê mînaka jorîn de jî xuya dike dibin qalib an jî dikevin forma helbestî. Lewma jî temayên herî sabît in.

Di vê pasajê de sê motîfên girîng yên bawerî-mezhebî hene ku ji bo mijara me gelekî girîng in: *Heq, Xizir, Dûzgi*. Ev her sê têgih bi temamî taybet in bo elewîtiya kurdan. Heq/Haq navê Xwedê ye ku bêtir li herêmên kurdên elewî tê bikaranîn. Her çendî ku di nava hemî cîhana îslamî de Heq yek ji 99 navên Xwedê yê jî, ev nav li herêmên kurdên elewî ji hemî navên di yên Xwedê berbelavtir tê bikaranîn. Xizir jî wekî ku me li jorê jî îzah kir, ne bi tenê lehengekî folklorî ye lê ew wekî cureyek ‘Xweda’ an jî mirovek pîroz e ku di baweriya elewîtiyê de cihekî wî yê girîng heye. Di dawiyê de Dûzgi an jî hin caran wekî Dûzgin jî tê

²⁵⁶ Daimi Cengiz, *Dersim Fabilları-1*, Kalan Yayınları, 1. Baskı, 2001, Ankara, r. 129-132.

²⁵⁷ H.b., r. 132.

îfadekirin, şexsiyetek gelek pîroz e bo elewiyan ku li serê efsane hene. Di vê mînaka jorîn de jî mohra bawerî û dînî ya li ser berhemeke folklorî bi tevahî aşkera ye.

Di heman berhevokê de, di varyanteke çîroka navdar ya *Gur û Rûvî* de dîsa motîfa Xizir derdikeve pêş me. Di çîrokê de roviyê hîlebaz, hirçê ku her tim wî di nava tirs û xofê de dihêle, di tengahiyekê de diqefêle. Rovî, hirç dixê nava xefikekê û *‘îşê xwe pê diqedîne.’* Gur, hirçî ji vê rewşê xelas dike lê ev rewş ji bo hirç şermeke mezin e. Eger ku bê zanîn li daristanê tu îtibarek bi wî namîne. Li ser vê hirç û gur wiha ji hev re dibêjin:

“Bila ev sira Xizir be di navbera me de.”²⁵⁸

Di çîrokên ku Caner Canerik ji herêmên kurmanç û kirmancên Dêrsimê berhev kiriye de²⁵⁹, motîfa Xizir bi berbelavî derdikeve pêş me. Di van çîrokan de jî, bi taybetî di çîrokên bi herêmên dî yên civakên kurdan re hevpar, motîfa Xizir dîsa di wateyê berfireh ya taybet bi baweriya elewîtiyê de derdikeve pêş me. Di vê berhevoka bi navê Çîrokên Dêrsimê de, çîroka bi navê Şengê û Pengê ku li nava civakên kurd berbelav e, li vê derê bi navên Evlinge û Şevlinge an jî Sewling û Hewling tê zanîn. Di vê mînakê de behsa *Bizinên Xidir* tê kirin ku ev motîf, di varyantên vê çîrokê yên herêmên dî yên kurdan de hîç dernakeve pêş me:

*“Roja dawî, bizina bi navê Biza Kole, kulîlka ku di serê latekê de şîn bûbû xwar. Li gorî gotinan ev kulîlk ji hezar salê carekê vedikir û kî ji wê bixwarana, quloçên wê bi qandî quloçên **bizinên Xizir** mezin dibûn.”²⁶⁰*

Di heman xebatê de çîrokeke dî ya navdar ku varyantên wê li gelekî deverên civaka kurd hene, derdikeve pêş me. Ev çîroka *Pîrê û Rûvî* ye. Di vê varyantê de jî û di hemî varyantên dî yên vê çîrokê de, Pîrê, ji ber ku şîrê wê vexwariye, dûvika rûvî jê dike û rûvî lava li Pîrê dike ku cardî dûvika wî bidê. Lê Pîrê şert dide pêş Rûvî ku ew şîrê wê jê re bîne. Li ser vê, serboriya Rûvî dest pê dike. Di vê

²⁵⁸ H.b., r. 52.

²⁵⁹ Ev xebata ku ji aliyê berhevkar Caner Canerik ve hatiye kirin, digel ku qeyd bi kirmancî û kurmançî hatine kirin jî, pirtûk bi tirkî hatiye çapkirin. Di hevdiîna xwe de me ji berhevkar pirsî ku di navbera qeydên orjînal û yên çapkirî de ferq hene an na? Wî wekî bersiv ji me re got ku bi tenê cî bi cî li hevokasî û hin tiştên şeklî mudaxele kiriye. Ji ber ku di pirtûkê de ne kurmançî û ne jî kirmanciya wan heye, wergera wan ya ji tirkî me bi xwe kiriye.

²⁶⁰ Caner Canerik, *Dersim Masalları*, Dönüş Yayınları, I. Baskı, 2019, İstanbul, r. 84.

varyantê de motîfa Xizir derdikeve pêş me ku ev di tu varyantên dî de xwe nîşan nade. Li gorî vê çîrokê, Pîrê jî wekî her kesî di roja *Qere Çarşema Martê* de dadikeve *Gola Xizir* da ku li wê derê xwe bi ava *Gola Xizir* bişo û ji gunehên xwe pak bibe. Lê Roviye ku vê xalîbûna gund ji xwe re wekî fersend dibîne, diçe mala pîrê û şîrê wê ye di kodikê de vedixwe²⁶¹. Pasaja ku motîfa Xizir tê de derbas dibe bi vî rengî ye.

*“Li gorî baweriya xwe, hemû gundî di çarşema duyemîn ya meha adarê de, dadiketî **Gola Xizir**. Li wê derê xwe dişuştin û ji bo ku gunehên wan bêne bexşandin dua dikirin û vedigeriyan. Ev roja ku jê re digotin **Qere Çarşema Martê**, di heman demê de, xelasbûna zivistanê û hatina biharê bû.”*²⁶²

Di heman xebatê de *Çîroka Eşqa Hirçê* heye ku bi tevahî bi motîfên dînî-bawerî yên civaka kurdên elewî hatiye honandin. Destpêk bi vî rengî ye:

*“Di **Meha Xizir** de, **Pîr** hatibû gundekî dûr yê çiya. Êvara pêncşemê li **Mala Ocaxê** gundî hatibûn cem hev û **Ayîna Cemê** dikirin. Ji ber ku wê salê pir berf bariyabû, kesî dananîbûn ber derî wek nobedar û di halê xwe de îbadetê xwe dikirin û **bang li Heq dikirin**.”*²⁶³

Di vê pasaja jorîn de em dibînin ku di çîrokeke folklorî de, hêmanên baweriya elewîtiyê yên wekî; *Xizir*, *Pîr*, *Ayîna Cemê*, *Mala Ocaxê* û *Heq* cih digirin û mohra dînî-bawerî, ku yek ji hêmana bingeîn ya nasnameya etno-dînî ye, li çîrokê dixin.

Di heman berhevokê de, çîrokek bi navê *Qîza Dêw* heye. Di vê çîrokê de jî motîfa *Xizir*, wekî çîroka jorîn, tevî bawerî û pîroziyên herêma kurdên elewî, bi rengekî xwerû derdikeve pêş me. Di vê çîrokê de, dêwek heye ku bi tena serê xwe dijî lê her tim neheqî kirine, neketiye *rêya heq* û qîzek wî heye ku yekcar hunda bûye. Ew ji bo ku qîza xwe bibîne, ji her du birayên xwe alîkarî dixwaze ku van birayên wî ne li ser rêya wî û baweriya wî ne.²⁶⁴ Pasaja ku motîfa Xizir tê de derbas dibe bi vî rengî ye:

²⁶¹ H.b., r. 201-208.

²⁶² H.b., r. 201.

²⁶³ H.b., r. 293.

²⁶⁴ Bnr. C. Canerik, *Dersim Masalları*, r. 471-482.

“Du birayên dêw hebûn. Lê ew li bajêr dijiyan, dervediketin nava mirovan, **Rojîya Xizir digirtin** û niyaz belav dikirin. Her sal di roja **Qere Çarşemê** de, ji bo ku ji gunehên xwe pak bibin, diketin **Ava Mûnzirê**. Her du dêwan ji birayên xwe re gotin: ‘Tu, tu car nehatî îmanê. Her tim bi serê xwe jiyayî. Te mirov kuştin, karikên biçûk xwar, ji hêlînan hêkên çûkan girt. Eger te **îman bi Olî bianiya**, te yê bi destûra wî qîza xwe sax salim bidîtaya.’”²⁶⁵

Di vê pasajê de em dibînin ku di çîrokek de propagandaya dînî hatiye kirin ku ev yek pir kêmtir dîtin. Di çîrokan de reng û motîfên dînî, wekî ku me li jorê nîşan dan, hene lê bi vî rengî propagandaya dînî-bawerî pir kêmtir e. Lê ev yek di vegotinên komên etno-dînî de wek taybetiyekê derdikeve pêş me. Di vê pasaja jorîn de wekî ku di mînakeke jorîn de jî derketibû pêş me behsa *Rojîya Xizir* tê kirin û *Qere Çarşem*²⁶⁶, ketina *Ava Mûnzirê* û ji gunehê xwe پاکبûn, motîfên girîng yên dînî-bawerî yên kurdên elewî ne. Di heman demê de em di vê mînakê de jî dibînin ku hêmanên dînî û taybetiyên herêma fîzîkî an jî terîtorya, çawa bi hev ve dikelîjin ku ev yek ji bo komên etno-dînî taybetmendiyekê gelek girîng e.

Di pasaja jorîn de ya herî girîng ev e ku behsa Xwedayek bi navê *Olî* tê kirin ku di vê berhevokê de bi berbelavî derdikeve pêş me. Li gorî lêkolera Daimi Cengiz; ev nav, telafûzeke herêmî ya navê Elî/Alî ye ku li vê derê mebest jê Hz. Elî ye. Berhevkarê çîrokan Canerik îdîa dike ku; eleqeya Olî bi Hz. Elî tune û her wiha ew wekî ku hin kes îdîa dikin ne di encama xerabûna her du peyvên ‘*Ûlî Dîwan/Ûlû Dîwan*’ de çê bûye ku di îtîqada elewîtiya Dêrsimê de, ev meqameke girîng ya pîroz e. Li gorî Canerik; ew cureyek ‘Xweda’ ye e ku ji baweriyên kevnan yên vê herêmê maye. Heta wekî *Xwedayê Rojê* tê tesewirkirin. Her kîjan îdîa rast be jî, wilo xuya ye ku motîfeke dînî ya taybet bi vê herêmê di nava çîrokên wan de cih girtiye.

2.2.2. Sir

Sir, her çendî ku di elewîtyê de ne stûneke esas ya dînî be jî, wekî têgiheki di heqê manewiyata vê baweriyê de nîşaneyekê girîng e. Elewîti û bi taybetî elewîtiya kurdan, ji alî îtîqadî ve mijareke berfireh e ku ji çarçoveya vê tezê

²⁶⁵ H.b., r. 475.

²⁶⁶ Bnr. Munzur Çem, *Dêrsim Merkezli Kürt Aleviliği*, r. 60-61. Li gorî Munzur Çem, *Qere Çarşema Martî û Newroza Martî* heman cejn in. Di 9ê Adarê de agir tê vêxistin ku di teqwîma miladî de ev teqabulê 21-22 Adarê dike.

derdikeve. Ew hin caran di nava şîetiyê de û hin caran jî di nava tesewifa îslamiyetê de û hin caran jî bi taybetî li herêmên wekî Dêrsim û Hewramanê bi navên Ehlî Heq, Rêya Heq wekî baweriyeye xwerû li pêş me ye. Di vê baweriyê de, bi taybetî di kilam û gulbangên wan de heqîqeta zahîrî û heqîqeta batînî du têgihên sereke ne. Heqîqeta batînî jî her tim wekî sirek hatiye dîtin. Lewma jî em hem di metnên dînî yê civaka elewî de û hem jî di metnên folklorî de rastî vê têgihê tîn.

2.2.2.1. Di Nava Termînolojiya Dînî Ya Kurdên Elewî De Sir

Ev têgiha ku wateya xwe ya bingehîn ji baweriya vê civakê girtiye, hem di jiyana wan ya dînî de û hem jî di jiyana wan ya civakî de xwedî bandoreke mezin e. Li gorî baweriya elewîtiyê, di cewherê her heyinê de sirek heye. Ev yek di heman demê de aliyê batînî yê vê baweriyê dide nîşan. Heta di elewîtiyê û şîetiyê de, hin caran Hz. Muhemmed wekî nûnerê heqîqeta zahîrî û şerîeta îslamê û Hz. Elî jî wekî heqîqeta batînî ya îslamê hatiye dîtin.²⁶⁷ Di heman demê de tê gotin Hz. Muhemmed, Hz. Elî wekî *Qur'ana Natiq* îlan kiriye ku ev tê wateya Qur'ana ku diaxive.²⁶⁸

“Wekî hemî komên dî ku ji derve re girtî ne û di baweriya wan de hemanên batînî hene, elewî jî bawerî û çanda xwe ji yê ku ‘ne ji wan’ in vedişêrin û vê wekî îfşanekirina sirê sombolîze dikin. Di nava vê civakê de wilo tê bawerkirin ku zanînen aydê elewîtiyê sir in û ji yê derveyî re nayêne gotin. Ev tegihîştina sirê bûye wekî qalîkek ku civaka elewî ji faktorên derveyî parastîye û avaniya wê ya hundurîn jî diyar kiriye.”²⁶⁹

Li gorî baweriya elewîtiyê ji donzde îmamên heq, îmamê dawîn yê bi navê *Muhemmed Mehdî*, vekîşiyaye *alema sirê* û roj wê bê, wê dîsa derkeve meydanê.²⁷⁰ Jixwe têgiha batînî bi xwe jî tê wateya; yê veşarî yê bi heqîqeta hundirîn ve têkildar. Lewre di vê çarçoveya dînî-bawerî de watedarbûna têgiha sirê ji bo elewiyan ne mijareke kompleks e.

²⁶⁷ Fuat Bozkurt, *İmam Cafer Sadık Buyruğu*, Kapı Yayınları, 2004, İstanbul, r. 18.

²⁶⁸ M. Çem, *Dêrsim Merkezli Kürt Aleviliği*, r. 230,233.

²⁶⁹ Hacı Yılmaz, *Anadolu Aleviliğinde Sir Kavramı*, Journal of Human Sciences Dergisi, ISSN:2458-9489 Sayı:14, 2017, r. 2201-2205.

²⁷⁰ Mustafa Öz, <https://islamansiklopedisi.org.tr/mehdi-el-muntazar>, Dîrok: 24/06/2020, Saet: 15:00.

Munzur Çem, di nava elewiyên Dêrsimê de behsa cemek bi navê Cemê Tazî, Sîrrê Heqîqetê dike:

“Cemê Tazî, Sîrrê Heqîqetê: Deriyê sirra heqîqetê ji bo ocaxên elewîyan pêlika herî dawî û jorîn e. Yên ku gihîştine vê mertebeyê divê di nava xizmetên ocaxê de kemilîbin, xwe dabin rêya heq, destê xwe ji malê dinyayê kişandibin, hatibin ezmûnkirin. Divê karibin sirran hilgirin, ji sirran vexwin û bigihên sirran, ehlê kamil, xwedan ilm û îrfan bin.”²⁷¹

Her wiha Çem ji *Pîr Alî Balî* (herêma Meletiyê) neqil dike ku; elewî bi rêya ceman di gelek ezmûnan de derbas dibin. Cema dawîn ya Sirra Heqîqetê ye. Yê ku karibe di Cema Sirra Heqîqetê de derbas bibe, êdî sîrrên hemî kaînatê di hebûna wî de mewcûd dibin.²⁷²

Aliyekî dî yê girîng ji bo têgiha sirê ew e ku elewiyên kurd ji ber ku di dîrokê de bi piranî tûşî qetlîaman bûne, her tim baweriya xwe ji derve veşartine. Baweriya wan ji bo wan sîrek e di navbera wan de. Heta, cema wan jî di nava nehênî û tedbîrên ewlehiyê de tê kirin û wekî suniyan an jî wekî elewîtiya van demên dawîn, tu mekanekî wan yê sabît ji bo cemê tunebûye. Lewre ev jî sir e ji bo wan. Baweriya wan, pîroziyên wan, mekanên wan yên pîroz tev, ji dunyaya derveyê wan re girtî ne û sîrek e di navbera wan de.

“Di nava elewîyan de gotinek wiha heye: Perê xwe, mezhebê xwe û îbadetê xwe veşêre.”²⁷³

Sir, ji bo wan têgiheke ew çend xurt e ku ew di nêrfîna wan ya jiyana civakî, jiyana xwezayî û di têkiliyên wan yên hevberî de wekî pîvaneke saxlemiyê ye. Yê ku li gorî egerên vê pîvanê tevnegerin, li derveyê jiyana wan ya bawerî û civakî dimînin.

Di çîrok, efsane û vegotinên gelêrî yên vê herêmê de, yek ji berbelavtirîn hêmana ku derdikeve pêş me, ev hêman sîrrê ye. Bêguman di hemî kontekstan de ew bi wateya xwe ya dînî-bawerî rû nade. Ew carina di vê wateyê de û pîrî caran di wateyê jîyanî de derdikeve pêş me lê teqez ji vê baweriya batinîbûnê tê.

²⁷¹ M. Çem, *Dêrsim Merkezli Kürt Aleviliği*, r. 30.

²⁷² H.b., r. 31.

²⁷³ H.b., r. 219.

Lewre di tu vegotinên dî yên civaka kurdan de, bi qandî ku li van herêmên kurdên elewî lê dijîn, bi berbelavî dernakeve pêş me.

2.2.2.2. Di Vegotinên Gelêrî Yên Kurdên Elewî De Motîfa Sirê

Di çîrokên herêma Pertegê û herêma Mazgîrdê de, di gelek cihan de têgiha ‘sir’ê derdikeve pêş me. Di van mînakên de sir, carina di wateya dînî de û carina jî ne di wateyeke dînî-bawerî de ye lê bingeha xwe ji wê derê digire.

Di çîrok û efsaneyên ku me ji herêma Mazgîrdê berhev kirine de, di efsaneya Dewrêşê Gewr û berdewama wê Kerameta Seyit Memed de, ku Huseyin Bayir neqil dike; kesek bi navê Yûsîfê Berber, ji ber ku li nava zeviyê ga pê re axiviye ji tîrsa lal dibe, nexweş dikeve. Vebêj, di dawîya efsaneyê de wiha têgiha sirê bi kar tîne:

*“Ê tabî rojek wiha, pênc roj wiha, deh roj wiha nexweş dimîne. Hinek dibêjin; yaw rêberê me Seyid Memed heye, em bibin ocaxa wî. Dibin ba Seyid Memed. Seyid Memed, wiha lê dinihêre, dinihêre. Dibê: Kurê min, ga ji te re çi got te ji gayî çi got? Hela lê dibînî!... Kesê ji Seyid Memed re behsa ga nekiriye lê ew dizane. Ê ev Yûsîfê berber, hingê tê ziman. Heya wê wextê nikare xeber bide ha. Li wê derê zimanê wî vedibe. Ê tabî kes nabêje ku gayî jê re çi gotiye. **Ev sir e. Herkes nikare sirê bibêje kî!... Aşkerakirina sirê ne baş e.** Mesela Seyid Memed dikaribû bigota ku gayî jê re çi gotiye. Ew xwedan keramet bû, dizanibû. Karibû bigotana ku; wî ji te re viya got û te jî jê re viya got. Lê negotiye. **Ev sir in, nayêne gotin.** Hihh... Însan e yanê, her tişt di însan de ye. De însan ehem Nûra Xuda jî heye û hem jî ji Heq cuda ye. Ya... Wisa yanê...”²⁷⁴*

Di çîroka *Bejin Bostik* de ku me ji herêma Pertegê berhev kiriye û di heman demê de li herêmên kirmancên elewî jî tê zanîn û versiyonên wê carina bi navê *Mîrze Miheme* an jî *Mîrze Memûd*, li gelek deverên dî yên civakên kurd tînan, têgiha *sirê* wiha derdikeve pêş me.

“Siwe da radiwî, dêrî kilît dike li paş dêrî xa vêdişêrî, kuna dêrî da hundur teqîw dike. Sêr dike ku ew beqa postê xa li ser xa da kir, bu qîziki azew, merû qîmîşê nawî ku lê sêrke. Keçik der û beran pak dike, destê xa herdê ra dike turlu turlu

²⁷⁴ J.4., Pêvek 2.

*yêmeg derdikevin, sofrê hazir dike, postê xa digirî ku dîsa biwî beq, lawê padişê dikevi hundur guliyan da digirî, diwê keçê va rindikiya te va hunerêni te ku hene tu çima diwî beq? Rawerê digirî, diwê wî postê xa wermegir. Vê tora bimîn, em postê te veşêrinê. Kesikî yawancî, ku hat wê **sirê** werdigirî. Keçik qewûl dike, hev ra êpêyî zeman yaşamiş diwin terin.*”²⁷⁵

Di vê mînakê de keçik wekî beqekê dijî lê dema ku postê beq ji ser xwe diavêje gelek hunerên wê derdikevin meydanê. Lewre postê wê yê beqiyê ji bo wê *sir* e û divê kes pê nizanibe.

Di çîroka *Kerika Xalînî* de ku me ji herêma Pertegê berhev kiriye û li hin deveran wekî *Kerê Çamûr* jî tê zanîn, xuşk li heft birayên xwe digere û digihîje wan lê di vê navberê de, qîzên dêwan ku birayan ew li xwe mahr kirine, ji keçikê hez nakin û marekî biçûk dixin nav ava wê û ew avê vedixwe û roj bi roj zikê wê mezin dibe. Ev ji bo keçikê *sir* e. Nikare nîşanê kesê bide, ji kesekê re aşkera bike. Keçikên dêwan lê îftîra dikin û dibêjin ew bi hemle ye.

*“Neyse terin mal, sê çar mehe ku radiwirin, zikê vê keçikê ro bi ro diperçiftî, ro bi ro qalind diwî. Amojinêni keçikê biran ra diwên, sêrkin xanga we kî çî zanî kê ra rabûye runiştîye, duganan ma ye. Navê we kiriye herdê. Zemanikî şûvatir zik tê ber poz. Wê **sirê** unê çiton derkevin nav millet? Çarekî ji vê duruma ra biwînin.*”²⁷⁶

Di çîroka *Xizir û Sê Bira* de, ku me ji herêma Pertegê berhev kiriye, Xizir û birayê biçûk diçin ji bo birayê biçûk qîzê bînin. Lê divê neyên dîtin.

*“Biray qicik diwê kalo çî dikî bike. Rûsipî diwê oxil çavêni xa bide hev, lawik çavan dide hev; diwê oxil çavêni xa veke, lawik çavan vedike ku li diyarikî xam in, li gundikî ne. Milletê gund, bûy dagirtine dilîzin, ketine gowendê. Rûsipî diwê oxil qaytê ew keçika şîr helal ewe, ew pêringa ku darxistine, li paş wê pêringê ye. Em ê kesiyar ra nexangênê, herinê wî birevîninê. **Sir diwin, terin** bûkikê li paş pêringê digirin yala... Wext li wê wextê, sat li wê satê, terin şûnda ku biray qicik mirad xastiwû li wê derdikevin. Biray qicik sêr dike ku xanikî qicik li wê hatiye çêkirin, cutik ga li ber dêrî girêdayî ye, dunya diwî ê xa.*”²⁷⁷

Di heman çîrokê de piştî ku bira, ji bilî birayê biçûk, tevgerên wan ne li gorî dilê Xizir e, Xizir her tiştê ku dide wan, dîsa ji wan distîne.

²⁷⁵ J.1., Pêvek 1.

²⁷⁶ J.1., Pêvek 1.

²⁷⁷ J.1., Pêvek 1..

“Xizir diwê bila wer bî, madam ku witrêye, wê vextê eskî yerine diwê **sir diwê tere**. Biray mezind sêr dike ku şûnda xa yê berênî ye. Ew dera ku ax kişandiwû li wê derê tek û tenê maye. Dike ax û wax. Diwê min nezanî ku ew Xizir bu, poşman diwî ema pere nake.”²⁷⁸

Di heman xebata me ya berhevkarîyê de, çîroka bi navê *Dapîr û Rûvî/Pîrê û Rûvî* heye. Di vê çîrokê de rûvî, piştî ku li dû gelek zehmetiyan dûvika xwe ji pîrê distîne û dûvika wî ya nûh rengîn e, hevalên wî dixwazin *sira* wî hîn bikin.

“Diwên biray rivî, te çiton kir ku va doça te vê tora bû? Va çi rindikiya doça tey? **Sirê xa** mera jî biwê. Em jî tora gotina te bikinê, doçikêni me jî weki doçika te biwî xampul û rindik. Riviy derewçîn wan riviyîni din kuliyan topî dora xa dike, diwê werin ku ez **sirê doçika xa** we ra biwê.”²⁷⁹

Di xebata berhevkarî ya Daimi Cengiz ya bi navê *Fablên Dêrsimê-I* de, di çîroka *Hirç û Rûvî* de dîsa motîfa *sirê* derdikeve pêş me. Di çîrokê de roviyê fenek, hirçê ku her tim wî di nava tirs û xofê de dihêle, di tengahiyekê de diqefêle. Rovî, hirç dixê nava xefîkekê û ‘îşê xwe pê diqedîne.’ Gur, hirçî ji vê rewşê xelas dike lê ev rewş ji bo hirç şermeke mezin e. Eger ku bê zanîn li daristanê tu îtibarek wî namîne. Li ser vê hirç û gur wiha ji hev re dibêjin:

“Bila ev **sira Xizir** be di navbera me de.”²⁸⁰

Di çîrokên herêma *Mereşê* ku ji aliyê *Besê Aslan* ve hatine berhevkirin, têgiha *sirê* gelek bi berbelavî tê dîtin. Di çîroka bi navê *Gotina Zêrîn* de, *Erebê Uşaq*, lawê qiral bi hîle dixê bîrê û jê dixwaze ku ew bikeve şûna wî û bibe lawê qiral û lawik jî bibe *erebê uşaq*. Lawê qiral mecbûr dimîne qebûl dike lê *erebê uşaq* jê dixwaze ku ev *sir* heya mirinê di navbera wan de bimîne:

“*Erebê Uşaq*: ‘Em ê bi hev re peymanek çê bikin, ancax wisa ez ê te ji bîrê derbixim. Ez ê bibim lawê padişah tê jî bibî ûşaxê min. Ancax wilo te ji bîrê derdixim. Lawik dibêje: ‘Çawa dibe ev? Tê çawa bikevî şûna min?’ Lê dema ku dibîne uşax pir bi biryar e, mecbûr qebûl dike. Uşax dibêje; ku ez te ji bîrê derxim, tê peymanê me xera bikî. Loma divê tu ji min re sond bixwî. Bêje; heya ez nemirim

²⁷⁸ J.1., Pêvek 1.

²⁷⁹ J.1., Pêvek 1.

²⁸⁰ D. Cengiz, *Dersim Fablları*, r. 52.

û sax nebim ez vê **sirê** ji tu kesê re nabêjim. Xortê naçar, sond xwariye ku heya nemire û dîsa sax nebe vê **sirê** ji tu kesê re nabêje.”²⁸¹

Di heman berhevokê de, di çîroka *Lîstika Ecayîb* de, keçik, *sira* bavê xwe yê ku westayê lîstika ecayîb e hînî yekî din dike û bavê wê bi vê rewşê dihise.

“Westa ji xwe re got, dême qîza min **sira** vê lîstikê hînê yekê kir. Ji qîza xwe re dibêje: ‘Balteyek bîne. Te **sira** min hînî vî xortî kir. **Sirê** dîsa tê jê bistînî. Vî hespî bikuje û **sira** min jê bigire... Keçik wextê ku radike balte ku li hespê bixe, hesp zîtiyek lê dixê û dibe teyrek difîre diçe.”²⁸²

Di heman berhemê de, di çîroka bi navê *Dawiya Sebrê* de, çivîk ji keçikê re dibêje ku ew ê li ser cenazeyek heft sal nobetê bigire.

“Keçik, cilê xwe li xwe kir û derket baxçe. Çivîk dîsa hat û jê re got: ‘Keçika xweşik.’ Keçikê got, ‘Tu yê çi bibêjî ji min re?’ Çivîkê got: ‘Tu yê heft sal li ber serê miriyek bisekinî’ û **sir bû** firiya.”²⁸³

Di heman berhevokê de, di çîroka bi navê *Aşvan* de, jinik û mêrikê extiyar ku bi salan e dixwazin *Heq* zarokekê bide wan, rojekê dibînin ku sindoqek bi avê re hat ber derê wan û tê de zarokek heye.

“Jinikê got: ‘Mêrik, tê dît! **Heq** vî ji me re şand. Zarokê me jî tunebû. Em li vî zarokî binihêrin.’ Mêrik jî ji vî zarokî gelek hez kiriye û vê **sira** xwe ji tu kesî re negotine.”²⁸⁴

Di van îfadeyên jorîn de li kêleka têgiha *sirê*, bikaranîna têgiha *Heq* li şûna navê *Xweda*, nîşaneyek e ku ev çîrok aydê herêmên elewî ye. Lewre digel ku li deverên dî yên ku kurd lê dijîn di hin rêjeyan de ev bikaranîna hebe jî, bi qandî herêmên ku kurdên elewî lê dijîn tune ye. Heta di sêyeka girîng ya elewîyan de wiha tê gotin: *Heq, Muhammed, Elî*. Ev her sê nav, tevî manewiyata li derdora wan, sê hêmanên girîng yên baweriya elewîtiyê ne.

²⁸¹ B. Aslan, *Nar Ağacının Gölgesi Yoktur*, r. 48.

²⁸² H. b., r. 102.

²⁸³ H.b., r. 160.

²⁸⁴ H.b., r. 164.

Di heman berhevokê de, di çîroka bi navê *Pîr Ahmed* de, Ahmed dêw dikuje lê dêw sir dibe difire.

*“Pîr Ahmed xwe li pişt derî vedişêre. Dêw dîsa dikeve hundir. Pîr Ahmed bi kêrika xwe qirika wî jê dike dêw dikeve erdê lê li şûna xwînê sê mufta dikevin erdê ji qirika wî. Pîr Ahmed radike hersê mufteyan û dêw dîsa **sir dibe difire.**”²⁸⁵*

Di vê çîrokê de li kêleka têgiha *sirê*, navê lehengê çîrokê jî; Pîr Ahmed, nîşaneyekî ye ji bandora dînî-bawerî ya herêma. Di elewîtiyê de, *talib*, *seyid/dede*, *pîr*, *murşîd* mertebeyên girîng in di statuya civakî de.

Di çîrokên herêma Dêrsimê yên kurmanç û kirmancên elewî de jî rûdana têgiha *sirê* gelek berbelav e. Di berhevoka Caner Canerik de em dibînin ku têgiha *sirê* di gelek wateyan de derdikeve pêş me. Yek ji van çîrokan, çîroka *Kundirikê* ye. Ev çîrok jî wekî gelek çîrokên herêma Dêrsimê, hevpar e bi çîrokên civakên di yên kurd re. Dema ku zaroka jinika feqîr di reng û sûretê kundirekê de tê dunyayê, ew wilo bawer dikan ku ew *keçikek sirê* ye.

*“Jinika feqîr wilo bawer dikan ku **ronahiya pîroz** ji qûleke weka wê re kundirekê wê nede, wilo bawer dikan ku ew **keçikek sirê** ye.”²⁸⁶*

Li vê derê sir, ne tenê di wateya veşartîbûna tiştê de ye lê behsa alema *sirê*, alema ku bi çavê xas nayê dîtin tê kirin. Ku ev yek di baweriya elewîtiyê de îşaret bi *heqîqeta zahirî* û *heqîqeta batînî* dike. Heqîqeta zahirî bi çavê xas tê dîtin lê heqîqeta batînî bi çavê dil tê dîtin. Ji bo têgihîştina wê pêdivî bi hîskirinê, hezkirinê heye.

Di heman çîrokê de sir dîsa derdikeve pêş me lê vê carê di wateya veşartina heqîqetekê de. *Kundirikê* dema ku bixwaze postê kundir ji ser xwe diavêje û wekî *keçikek xweşik* peyda dibe. Piştî ku lawê paşê wê wisa dibîne û aşiqê wê dibe, *Kundirikê* ji lawê paşê dixwaze ku sira wê ji kesê re aşkera neke.

*“Eger tu vê **sira** min rojekê ji kesê re bibêji, wê sêhra min xera bibe û ez ê hunda bibim. Ne ji dayika xwe re, ne ji bavê xwe re ne ji birayên xwe re û ne ji ji tu kesê re divê tu nebêji.”²⁸⁷*

²⁸⁵ H.b., r. 199.

²⁸⁶ C. Canerik, *Dersim Masalları*, r. 10.

Dîsa di heman çîrokê de têgiha sirê wiha derbas dibe:

*“Kundirkê bi tenê di odeya xwe de û bi tenê dema ku mêrê wê dihat ji nava kundirê xwe derdiket. Dema ku mêrê wê diçû, dîsa dikete nava kundirê û di **alema xwe ya bi sir** de dijiya.”²⁸⁸*

Di dawiyê de ji ber ku tu kes xwedî li soza xwe derneketiye, sêhr xera dibe û Kundirikê hunda dibe. Diya lawikê paşa, li kurê xwe pir lava dike ku ew jî Kundirikê bibîne û lawik tevê diya xwe diçe odeya xwe û bang li Kundirikê dike

*“ ‘Kundirika min, Kundirika min. **Derkeve ji sirê were cem min.** Kesê xerîb tun e li ba min.’ Kundirikê van gotinên mêrê xwe bihîst û kundir bu du şeq û ew derket meydanê. Dît ku dayika mêrê wê jî li cem e. Hingê ji çavên wê hêsir hatin û sê dilop jê ketin xwarê. Sêhr xera bûbû. Wê heya bi heya ji mêrê xwe veqetiyana.... Kundirikê hunda bû. **Ji sirê hatibû û dîsa gihîşte sirê.**”²⁸⁹*

Di vê pasajê de em dibînin ku sir di wateyên alema sirê, dinyaya bi sir de hatine bikaranîn. Bi taybetî di mînaka dawîn de; *ji sirê hatibû û dîsa gihîşt sirê* bi tevahî bi baweriya elewîtiyê ya batinî ve girêdayî ye.

Di berhevako Canerik de, di çîroka *Keçika Beq* de ku ev çîrok varyanteke çîrokên Mîrze Miheme û Beq e, leheng aşiqê keçikek di dilqê beq de ye. Keçik û lawê axê li hev dikin ku vê wekî sir muhafîze bikin û ji kesê re nebêjin lê di dawî de wekî çîroka Kundirikê, sira wan aşkera dibe û sêhr xera dibe Keçik ji lawik re dibêje:

*“Min ji te re negot, **sira min ji kesê re aşkera neke.** Niha tê bibînî ku dê çendîn bela bêne serê te. Te dît ku bavê te jî bû dijminê te.”²⁹⁰*

Aşkerakirina sirê di hemî çîrokan de li dû xwe belayê tîne. Ev di heman demê de îşaret bi doktrîna tûj ya elewîtiyê dike. Sir divê ji kesên herî nêz re jî neyê aşkerakirin. Ev kes dibe ku bav be, dibe ku dê be dibe ku bira bin jî. Di

²⁸⁷ H.b., r. 13.

²⁸⁸ H.b., r. 13.

²⁸⁹ H.b., r. 20.

²⁹⁰ H.b., r. 47.

çîroka *Kundirikê* de sir ji dê re tê aşkera kirin û bela li dû wê tîn û di çîroka *Keçika Beq* de sir ji bav re tê aşkerakirin û bi dû re bela tîn. Ev yek di heman demê de nîşaneyê girîng e bo haletî rûhiyeya civaka elewî jî ku ew bi demên dirêj mecbûr mane baweriya xwe veşêrin, îbadetên xwe veşarî bikin.

Her çendî ku di piraniya çîrokan de aşkerakirina sirê rewşeke nebaş be jî, di hin çîrokan de aşkerakirina sirê, an jî bi çavek di dîtina wî tiştê ku tu kes wateyê nadê, meziyetek e. Lewra heqîqet ji her nêrînê re ne vekirî ye. Ji bo ku *sira heqîqetê* bê têgihîştin, divê bi awayek di bê nihêrîn.

Di çîroka *Masiyê Devliken*²⁹¹ de jî rewşeke bi vî rengî heye. Masîgîrek masiyek diqefêle ji behrê lê masî devliken e. Padîşah xeberê belav dike ku kî sira di kena masî de aşkera bike, dê bê xelatkirin. Xortek feqîr heye ku dibe talibê aşkerakirina sira di kena masî de. Lê ji bo vê şert dide ber padîşah û dibêje ku divê ez li koşka te çend rojan bimînim, ez ê bi dû re sirê aşkera bikim. Padîşah qebûl dike. Xort, piştî ku çend rojan li koşka padîşah dimîne, ferq dike ku di rastî de hemî cariyeyên jina padîşah digel ku cilê jinan li wan in jî di rastiyê de mên in. Haya padîşah ji vê yekê tine û jina padîşah bi wan xortan re di zewq û sefayê de ye.

*“Padîşah ji zarok pirsî: Te **sirê** fêm kir*

Zarok got: Belê padîşahê min

Padîşah: Bêje wisa be ji me re.

*Zarok: Ez bêjim tu yê bawer nekî. Lê ez dixwazim **sirê** nîşanê te bidim. Lewma kengê ku tu bibînî encax tu bawer dikî.”*²⁹²

Bêguman hê di gelek çîrok û vegotinên ji cureyên di yên folklorê kurmanc û kirmancên elewî de, bikaranîna têgiha sirê derdikeve pêş me. Ev bikaranîna di rêjeyêke wisa zêde de ye ku ne pêkan e ku ev wekî rewşekî asayî ya bi nehênîbûna tiştê ve bê girêdan. Lewre di çîrokên herêmên di de tu car ev di vê radeyê de dernakeve pêş me. Ev yek nîşan dide ku, ev rewş bi wateya sirê ya baweriya elewîtiyê ve girêdayî ye.

Hozanê navdar Sey Qajî piştê ku rastî Elîşêr tê ji bo wî vê helbestê gotiye:

Kirmancî

Kurmancî

²⁹¹ Bnr. C. Canerik, *Dersim Masalları*, r. 347-358.

²⁹² H.b., r. 357.

“Zerevêsayeniya welatê xo

Vera dismenî qar û yinatê xo

Sare bide, mede sir û binatê xo

De çip bikûyê per û qeynatê xo”²⁹³

Bi hemî welatperweriya xwe

Dijmin qehr bike bi îndada xwe

Serê xwe bide, nede sir û binatê xwe

Rabe xwe kar ke bi bask û qenadê xwe

Ev gotina, serê xwe bide sira xwe mede, di dîroka nêz û dûr ya elewîtiyê de, xwedî wateyê berfireh e ku ji wateya xwe ya lefzî derdikeve û dîroka elewîyan dide der.

Em ê vê behsê bi helbesteke dî ya Sey Qajî biqedînin ku ev helbest nîşanê me dide sir di baweriya elewîtiyê de xwedî girîngiyê çawa ye.

Kirmancî

“Wertê ma de **Îqrarê Eliyo**

Sirrê Xizirê Xaliyo

Sondê Haqî weriyo

Qalê **Yiqrarî** ke bî

Derûde wûye, asme ra roz ceriyo.”²⁹⁴

Kurmancî:

Di navbera me de **Îqrara Elî**

Sirra Xizir

Sonda Heq heye

Qala **Îqrarê** ku bû

Di çem de av, li ezmana roj disekine

Wekî ku ji ev reng bikaranîn jî xuya ye, sir, wekî *sira Xizir*, hatiye bikaranîn û bi têgihên mîna *Îqrara Elî*, *Sonda Heq* re hemaheng hatiye bikaranîn. Îqrar û Heq stûnên girîng in di baweriya elewîtiyê de. Lê bêyî sirê, yanî bêyî parastina van heqîqetan, wateya wan nîn e. Ji ber vê sedemê ye ku di hemî çîrokên elewîyên kurmanc û kirmanc de, têgiha sirê bi berbelavî derdikeve pêş me.

2.2.3. Heq

Bikaranîna têgiha Heq wekî navekî Xwedê, ne tenê taybet e bi baweriya elewîtiyê. Di baweriya îslamî de Heq yek ji 99 navên Xwedê ye. Lê ji bo navê Xwedê bikaranîna têgiha Heq herî zêde di nava elewîyan de berbelav e.

2.2.3.1. Di Nava Termînolojiya Dînî Ya Kurdên Elewî De Heq

Bi qandî van hêmanên ku me li jorê nîşan dan berbelav nîn be jî, di hin çîrokan de em dibînin ku *Heq* an jî *Haq* hatiye bikaranîn. Her çendî ku ev têgiha

²⁹³ D. Cengiz, *Sey Qajî*, r. 228.

²⁹⁴ H.b., r. 253.

ku tê wateya Xweda li herêmên dî yên ku civakên kurd lê dijîn tê bikaranîn jî, rengê bikaranîna vê têgihê ya li herêmên kurmanç û kirmancên elewî, bi sêyînaya girîng ya elewîtiyê ve girêdayî ye. Yanê: Heq-Muhammed-Elî.²⁹⁵ Heta di hin fraksiyonên vê baweriyê de, nêrînek heye ku di vê gotinê de wiha der diçe: *Heq Elî ye Elî Heq*. Ji ber vê rewşê ye ku carina ev bawerî wekî *Ehlî Heq* hatiye binavkirin. *Ehlî Heq* di heman demê de navê baweriya kurdên yaresan e.

*“Di baweriya elewîtiyê de wekî navekî taybet ji bo Xweda herî zêde têgiha ‘Heq’ hatiye bikaranîn.”*²⁹⁶

Wekî ku em ji vê tesbîta Üzüm jî dibînin, di nava baweriya elewîtiyê de girîngiyeke taybet ya têgiha Heq heye.

Munzur Çem derbarê girîngiya têgiha Heq ya ji bo elewiyên Dêrsimê wiha dibêje:

*“Dêrsimî dema ku bang li Xweda dikin, ‘Ya Heqo! Wayirê çar koşê dinya’, ‘Ya Heqo comerd! Ti ya ke hijde hezar alemê îcad kerdê’, ‘Ya Heq! Ti ya ke asmênê hewtîne de nişta ro’, ‘Ya Heq! Ya Rebbî alem!’ dibêjin.”*²⁹⁷

2.2.3.2. Di Vegotinên Gelêrî Yên Kurdên Elewî De Motîfa Heq

Ev motîf di nava vegotinên herêmên kurdên elewî de, pir bi berbelavî derdikeve pêş me. Di çîroka *Alik û Fatik* ku me ji herêma Pertegê berhev kiriyê de, dema ku Alik û Fatik ji ber kirinên amojîna xwe diçin axurê û digirî, Manga Zer bang li Heq dike.

*“Rokî amojîne, Alik û Fatikê ra hêrs ketiye, lê xistiye, tî wû birçî avêtiye der. Gotiye, carikî din mênê vê mala, herin êxur li cem manga zer rakevin. Çûne nav axurê dane girî, gîrane, gîrane, gîrane. Eman û gumanê manga zer hatiye birandin. Gotiye, **ya Heq û tala**, yan canê min bigir yan jî zimanikî bide min, ez derdê van zarûkan ra çarekî biwînim. Xadê da nida diwî, mange tê bi ziman. Diwê,*

²⁹⁵ M. Çem, *Dêrsim Mekezli Kürt Aleviliği*, r. 223.

²⁹⁶ İlyas Üzüm, *Kültürel Kaynaklarına Göre Alevilik*, Horasan Yayınları, 2002, İstanbul, r. 90-91.

²⁹⁷ M. Çem, *Dêrsim Merkezli Kürt Aleviliği*, r. 48.

Alik, Fatik va çi zî wû zîwa weye. We heş û aqil li serê min girt. Alik û Fatik diwên, amojina me xêrê bi me nake, em tî wû birçînê, bê xudî wû bê andêr mane.”²⁹⁸

Di versiyoneke dî ya Alik û Fatik de ku me ji herêma Mazgîrdê berhev kiriye, di gelek derên çîrokê de têgiha Heq derbas dibe. Damarî dema ku hîn dike ku Mange, Alik û Fatik xwedî dike, ji mêrê xwe dixwaze ku ew mangê şerjê bike:

*“Damarî tê mêrik re diwê, mêrê xwe re diwê, diwê mêrik mangê şerjê bike. Mêrik diwê: Lê lê **Heq lê xistê**, manga qey şerjêkim. Diwê: Mangê şerjêkî risqê me tê birandinê... Tişkî wisa, mane, manek li vir tînî yekî li wir tînî, diwî îlla şerjêke. Mêrik diwê: Yaw **Heq li vê xe**, vêya diwê mangê şerjêke!”*²⁹⁹

Di heman çîrokê de zewiyê herkesê baş hêşîn dibe lê yê mêrik baş hêşîn nabe. Damarî, ji ber ku dixwaze Alik û Fatik bikuje, mêrê xwe dişîne ser ziyaretê, kulor û çira didê, dibê here ji ziyaretê bipirse ku em çawa bikin. Lê beriya ku ew bigihîje ziyaretê, damarî diçe xwe di ziyaretê de di cihekî de vedişêre û li benda hatina mêrê xwe disekine. Dema ku mêrik ji ziyaretê dipirse ku genimê her kesê şîn bûye û yê wî şîn nebûye, divê ew çi bike, jînik ji cihê xwe yê veşarî bang dike ku divê ew Elik û Fatik li ser zewiyê şerjê bike:

*“Mêrê xwe re dibê, mêrik zewiyê xelkê kulî hêşîn bûye yê me qey hêşîn nebûye. Dibê qey, dibê nizam. Dibê hela hela em çer bikin. Hela biskin dibê ez du dor kulor lê dixêmbê dibê, here ser ziyaretê. Hele bankê bê; ziyaret, bê; cîranan zewiyê xwe kulî hêşîn bûye yê me hêşîn nebûye. Qey ê me hêşîn nebûye ka acaba? Hela te ra çi dibê ziyaret. Dibê herê. Fam nake mêrik. Dere tîne kuloran dipêji. Dere çixinê tije kulor dike, **çira mira dide dest mêrik.... Mêrik dere ser ziyaretê, çira xwe vêdixînî...** (Mêrik û jînik xwe hazir dikin ku Alik û Fatik şerjê bikin lê çûk xeberê dide wan. Alik radike kumê Fatikê û direve û Fatik li dû diçe û wisa xilas dibin.) Mêrik tê dibê nizamî min nedî, nizamî hunda bûn bi ku ve çûn. Damarî dibê te nedî? Dibê, na. Dibê **Heq li te xe!**”*³⁰⁰

Di vê pasajê de li kêleka bikaranîna têgiha heq, wekî ku me nîşan daye, li ser ziyaretê vexistina çirayê kevneşopeke girîng ya elewîtiyê ye ku li herêmên dî

²⁹⁸ J.1., Pêvek 1.

²⁹⁹ J.2., Pêvek 2.

³⁰⁰ J.2., Pêvek 2.

yên kurdan adetek an jî baweriyek bi vî rengî tune ye. Li vê derê, ev rewş wekî mohreke girîng ya dînî-bawerî li ser çîrokê derdikeve pêş me.

Di berhevoka Besê Aslan de ku ji herêma kurmancên elewî yên Mereşê hatiye berhevkirin, di çîroka *Dilbera Bi Mirad* de têgiha *heq* wiha derdikeve pêş me:

*“Rojekî zarok bi dizî ji odeya xwe derketiye û ketiye odeya lawê padîşah. Li odeya lawê padîşah keçika xizmetkar ku radizê dîtiye. Dîtiye ku di histûyê keçikê lê nivîstek hebûye. **Dengek ji heq** jê re gotiye; ‘Wê nivîstê bigire!’ Zarok nivîstê girtiye û hatiye cem dayika xwe. Xwe avêtiye ser dayika xwe ya ku wek miriyan radizê û giriyaye. Dîsa **dengek ji heq** jê re gotiye: ‘Nivîstê bixe histûyê dayika xwe!’ Wî jî wisa kiriye û nîhayet dayika wî ji xewa xwe ya giran hişyar bûye.”³⁰¹*

Di heman berhevokê de, di çîroka *Aşvan* de, padîşah, aşvan biçûk dîtiye lê bi dû re ji vê poşman bûye. Jê dixwaze ku wî efû bike lê Aşvan jê re dibêje ku bila Heq te efû bike:

*“Padîşah bi destê Aşvan digire û dibêje: ‘Min kir tu meke! Min cahilî kir. Dême mirov nikare bikeve pêş qederê.’ Aşvan jê re dibêje: ‘Ez, te efû dikim lê **bila Heq te efû bike.**’”³⁰²*

Di çîroka Tali’ê Baş de, her du xwişkên mezin hesûdiya xwişka biçûk dikin û dikin ku lawê padîşah zarokê wê jê bistîne û bi çem re berde.

*“Bebik di çem de li şewka masîgeirekî dialiqe. Masîgir radike bebikê û dibêje: ‘Ev **diyariya Heq** e bo min.’ Û zarok dibe malê tevî jina xwe wî xweyî dikin.”³⁰³*

Di xebata berhevkarî ya Alî Alxasî ku li herêma Mereşê hatiye kirin, di kilama Dengbêj/Aşiq Turabî de têgiha *heq* wiha derdikeve pêş me:

*“T’ez çir kırım t’ez çir kırım
Oy te bi girî ez çûr kırım
Lê lê tu vê biterikîne, ker biyê tu vê biterikîne
Oy mîna Kerem ez ar kırım*

³⁰¹ B. Aslan, *Nar Ağacının Gölgesi Yoktur*, r. 94.

³⁰² H.b., r. 166.

³⁰³ H.b., r. 202.

Here ker biyê le te namîne, here çûr biyê le te namîne

Tu belê xwe le Heq bibîne oy”³⁰⁴

Di çîrokên ku Caner Canerik berhev kiriye de, di wateya Xweda de li kêleka têgiha Heq/Haq, têgiha *Oli* heye ku bi wateya Xweda hatiye bikaranîn. Me vê rewşê ji berhevkar pirsî û wî wisa îdfîa kir ku ev nav taybet e bo herêma Dêrsimê ku di şûna Xweda an jî Xwedayê Rojê de tê bikaranîn. Lê lêkoler Daimi Cengîz, îdfîa dike ku ew rengêkî telafûza navê Hz. Elî ye. Em ê li jêrê çend mînakên ji bikaranîna têgiha *Oli* ji çîrokên ku Caner Canerik berhev kiriye bidin.

Di çîroka *Xanê û Sosin* de, *Xanê* jinbira *Sosinê* ye û ji ber hesûdiya *Sosinê*, zarokê xwe dikuje û hestiyên wî davê ber derê *Sosinê* û ji mêrê xwe re dibêje ku xuşka te zarokê te kuştiye. Li ser vê bira, xuşkê nakuje û destên wê jê dike wê berdide çolê. Li çolê *Lawê Padîşah* rastî *Sosinê* tê.

*“Lawê Paşa li derdorê nihêrî û dît ku li pişt daran tişteki tevdi gere. Hespa xwe girêda û ber bi wê derê ve çû. Sosinê ji cihê ku xwe veşartibû bang kir: ‘Tu bidî xatirê *Oli* neyê alî min de. Ez jî neke seqet im. Her du destên min nîn in. Tazî me. Li ser min kincek tune. Eger tu ji Xwedê ditirsî, kincek bîne ez li xwe bikim.’”*³⁰⁵

Ev biwêja ku li herêmên kurdên sunî bi piranî wekî ‘*tu bidî xatirê Xwedê*’ an jî ‘*tu bidî xatirê Xwedê û Pêxember*’ tê zanîn, li vê herêmê bûye wekî ‘*tu bidî xatirê *Oli**’. Li vê derê *Oli* wekî *Xwedê* hatiye tesewirkirin.

Di çîroka *Derwêş û Ejderha* de, ejderhayek li daristanê di nava agir de dimîne û ji derdora xwe dixwaze ku wî xelas bikin.

*“Ejderhayek jî di nava agir de mabû. Canê xwe bi zorê xelas kiribû û li ser tahtekê sekinibû. Tu dereke ku pê de bireve tunebû. Bi dengêkî naçar; ‘Ji bo xatirê *Oli*, kes tune min xelas bike!’ digot.”*³⁰⁶

Di vê mînakê de, li şûna biwêje; *ji bona Xwedê, ji bo xatirê Xwedê*, biwêja, *ji bo xatirê *Oli** hatiye bikaranîn. *Oli* carekî dî wekî *Xwedê* hatiye tesewirkirin.

³⁰⁴ A. Alxasî, *Xeberek Hat ji Meraşê*, r. 96.

³⁰⁵ C. Canerik, *Dersim Masalları*, r. 152.

³⁰⁶ H.b., r. 301.

Di çîroka *Xortê Feqîr û Qîza Paşa* de keçika ku ji behrê derdikeve wiha dibêje ji Paşa re:

*“Tu paşa yî. Hemî bajarî canê xwe didin û dixebitin lê tu jî rûdinêy û dixwî. Ev gas wext e tu dixwî lê te qet **Loqmeya Xwedê** da? Lê binêre jina mêrikê feqîr, li ser rê nan dipêje û bela dike û yê ku nan digirin **Loqmeya Xwedê** belav dikin. Yê ku vî zarokê xelas kir jî ew **Loqmeya Xwedê** bûn. Qey qet kitêba te tune? Kitêba te û îmana te tunebe jî îmana **Olî** heye. **Olî** vî zarokî xelas kir.”³⁰⁷*

Di vê pasajê de Olî ji Xweda bêtir wekî kesekî pîroz an jî rûhanî hatiye tesewirkirin. Ji bilî Olî, di vê pasajê de behsa *Loqmeya Xwedê* hatiye kirin ku ev yek jî taybet e bo baweriya elewîtiyê. Carina wekî *Loqmeya Xizir* jî tê telafûzkirin.

Di çîroka *Sê Qizên Axê* de, parseka ku ji qîza axê parsekî dixwaze lê qîza axê nadê, wiha nifir lê dike:

*“**Hêviya min ji Olî**, ji **roja pîroz** ku ronî dide dinyayê, wê dêlika ber derî jî, wê kera li axwirê jî eynî bibin wekî te. Û bila tu kes nizanibe kîjan jê tu yî!”³⁰⁸*

Di vê mînakê de Olî wekî *Xwedayê Rojê* hatiye tesewirkirin. Di vê nuqteyê de divê em destnîşan bikin ku di elewîtiya herêma Dêrsimê de, baweriya bi rojê balkêş e. Li gorî lêkoler Munzur Çem; baweriya bi rojê ew çend bi hêz e ku elewiyên herêma Dêrsimê dema ku Muhemmed dibêjin, qesta wan ne Hz. Muhemmed e lê roj e.

“Li herêma Dêrsimê roj pîroz e. Heta ew carina bi navê Hz. Muhemmed re hemta ye. Navekî rojê Mihemmed e. Roj, nûra Elî Mihemmedî ye. Lewre dema ku elewiyên Dêrsimê berê xwe didin rojê, li şûna navê rojê, dibêjin: ‘Ya Mihemmed!’ an jî dibêjin: ‘Ya nûrê Elî Mihemmedî!’ Carina ji bo derketina rojê dibêjin: ‘Mihemmed vejîyo.’”³⁰⁹

Di çîroka *Qîza Dêw* de, dêwek qîza wî hunda dibe û ji her du birayên xwe alîkarî dixwaze. Her du bira jê re wiha dibêjin:

³⁰⁷ H.b., r. 335.

³⁰⁸ H.b., r. 367.

³⁰⁹ M. Çem, *Dêrsim Merkezli Kürt Aleviliği*, r. 101-102.

“Du birayên dêw hebûn. Lê ew li bajêr dijiyan, dervediketîn nava mirovan, **Rojîya Xizir** digirtin û niyaz belav dikirin. Her sal di **roja Qere Çarşemê** de, ji bo ku ji gunehên xwe pak bibin, diketîn **Ava Mûnzirê**. Her du dêwan ji birayên xwe re gotin: “Tu tu car nehatî îmanê. Her tim bi serê xwe jiyayî. Te mirov kuştin, karikên biçûk xwarin, ji hêlînan hêkên çûkan girtin. **Eger te îman bi Olî bianiya**, te yê bi destûra wî qîza xwe sax salim bidîtaya.”³¹⁰

Di vê mînakê de Olî bi tevahî wekî Xweda hatiye tesewirkirin. Lewre îman ancax bi Xweda tê anîn. Li kêleka têgiha Olî, wekî ku me li jorê jî nîşan daye, Rojîya Xizir, Ava Mûnzirê, Roja Qere Çarşemê, derbas dibin ku ev hemî bi bawerîya elewîtiyê re têkildar in.

Ji bilî van têgihên sereke gelek tema û têgihên bi elewîtiyê re têkildar di çîrokên herêmên kurdên elewî de derbas dibin. Ne di rêjeya van têgihên ku me nîşan dan de bin jî, têgihên mîna *îqrar*, *cem*, *misahib* ku taybet in bi vê baweriyê derdikevin pêş me.

2.3. Di Vegotinên Gelêrî Yên Kurdên Êzîdî De Nasnameya Etno-Dînî

Di nava civaka kurdan de, yek ji koma girîng ya etno-dînî ku xwedî endîşeyeke kûr ya nasnameyî ne; êzîdî ne. Bêguman sedema vê endîşeya kûr ev e ku her ku diçe hejmara wan kêmtir dibe. Ev koma etno-dînî ji ber ku di nava civaka kurd de bi rengekî belavbûyî dijî/dijîya (her çendî ku xwedî navendên wekî Şengal, Şêxan, Baedrê bin jî) hem ji ber êrîşên kurd, ereb û tirkên misliman/sunî hem jî ji ber guhertinên dînî, di nava demajoya dîrokê de, her ku çûye hejmara wan kêmtir bû.

Wekî ku me di beşa yekem de jî neqil kir bi qandî ku em ji Şerefnameya Şerefxan û lêkolerên mîna Izady, Bruinessen û Tosinê Reşîd jî têdighîjin, di serdema navîn de (ss. 13 û 14.) hejmareke girîng ya kurdan endamên, peyrewên vê terîqetê an jî baweriyê bûn. Lê her ku terîqet/bawerî radîkalîze bû, her ku derket derveyê cîhana îslamî, hem êrîşên li ser vê baweriyê zêde bûn hem jî gelek

³¹⁰ C. Canerik, *Dersim Masalları*, r. 475.

bawermendên wê, baweriya xwe guhartin û li ser rêça mislimantiyê berdewam kirin. Yên mayî jî bi tevahî xetêke der-îslamî şopandin.³¹¹

Di vê mijarê de lêkolerên mîna Fuccaro³¹², Kreyenbroek û Bruinessen³¹³ bi heman rengî difikirin. Ji ber van sedeman e ku wan dîwarekî stûr li derdora xwe rapêçaye û xwe ji civakên derve re girtine. Baweriya xwe, wekî hêmana bingehîn ya nasnameya xwe organîze kirine û bi tundî li hember têkilî û zewaca bi civakên misliman yên dora xwe re rawestiyane. Ev helwesta wan di vegotinên wan de bi rengekî aşkera derdikeve meydanê.

Allison li ser vegotinên gelêrî yên civaka êzîdî wiha dinivîse:

“Bêguman çîrok û stranên evîne yên ku di nava civaka êzîdîyan de têne îcrakirin bi yên Kurdistanê re hevpar in. Lê hîlbijartina mijarê û awayên vegotinê yên di nava êzîdîyan de, endîşe û gumanên taybet yên vê civakê ji nêz ve didin der.”³¹⁴

Di vê nuqteyê de wekî ku Allison jî neqil dike; folklor lazim e xizmet li wê civaka ku wan bi kar tîne bike. Di vê kontekstê de, vegotinên sereke yên êzîdîyan jî endîşeyên wan yên hemdem didin der. Her wiha vê têgihîştina wan ya nasnameyî bandorê li hîlbijartina wan ya çîrok û stranên dike. Pîrî caran ew van cureyan di vê çarçoveyê de ji nû ve însa dikin.

“Dema ku mirov ji aliyek ve dinihêre, tê dîtîn ku êzîdî di nexşeya folklorî de (ji aliyê cografîk ve) hevpariyêke pîr berbelav bi kurdên dî re parve dikin. Lê vegotinên wan yên gelêrî, bi rêya bibîranîna rabirdûya eşîrî, derheqê hay jixwe hebûna êzîdîyatîyê de, derheqê cudahiya di navbera êzîdîbûn û ne êzîdîbûnê de gelek daneyan didin me.”³¹⁵

Lêkoler û folklornasê êzîdî Kovan Xankî jî folklorên kurdên êzîdî û kurdên misliman di heman çarçoveyê de dibîne lê qeyd dike ku folklorên êzîdîyan ji bo wan di heman demê de wekî hewldaneke parastina hafîzeyê kolektîf ya vê civakê ye.

³¹¹P. G. Kreyenbroek-X. C. Reşow, *Tanrı Ve Şeyh Adi Kusursuzdur*, r. 26.

³¹²N. Fuccaro, *Öteki Kürtler*, r. 33.

³¹³M. Van Bruinessen, *Kürdistan Üzerine Yazılar*, r. 28-29.

³¹⁴C. Allison, *Yezidi Sözlü Kültürü*, r. 233-234.

³¹⁵H.b., r. 335-336.

“Bi ya min folklor a kurdên êzîdî û kurdên misliman di çarçoveya yek sînori de ne. Ew gotinê mezinana, ew serhatîna, ew stran gelek wek hev in. Bo nimûne Destana Rostemê Zal yan jî Xanê Lepzêrin yan jî gelek stran hene wiha. Eva hevpar in. Mulke hemû civakên kurdî ye. Lê dîsa jî êzîdî edebiyata xwe ya taybet hene çûnkî sîmayên wan ên dînî û civakî tê de diyar e. Yanê gotinê mezinan me heye, behsî tiştê êzîdiya dike. Behsê şêxa dike, behsê pîra dike. Hin stran jî hene ku taybet in bi civaka êzîdî. Evana bi ferman û jenosîda re eleqedar in. Em bi rêya van stranên dizanin ku ka çi hatine serê civaka êzidiyan. Evana taybet in bi dîroka kurdên êzîdî re.”³¹⁶

Xankî, edebiyata civaka êzîdî li sê beşan vediqetîne. Li gorî wî beşek jê edebiyata dînî ye û beşek jê edebiyata gelêrî ye û beşek jî hin cureyên di navbera van her du beşan de ne. Xankî qeyd dike ku di van her sê beşan de jî taybetiya herî girîng sîmaya êzidiyatîyê ye.³¹⁷

“Bo nimûne ya dînî; qewl, beyt, qesîde, dua, dirûze, mishabet, keramet, serhatî. Eva her yek janrekî serbixwe ye. Di nava edebiyata folklorî de jî wisa ye. Serhatî ne, efsane ne, destan in, gotinên mezina ye, pêkenîn in gelek gelek hene. Û di edebiyata di nava wan de jî, xizemok in, payizok in, xerîbok û lavijok in. Îca her yekî jî sîmayên xwe hene, taybetmendiyên xwe hene. Tiştê here diyar yê vê edebiyatê, sîmayê êzidiyatîyê ye. Çi dînî be çi civakî be.”³¹⁸

Yek ji cudahiya girîng ya di navbera elewî û êzîdiyan de ev e ku, êzîdî li gorî elewiyên kurd, bêtir li seranserê erdnîgariya civaka kurd belav bûne. Ew ji Serhedê bigire heya bi Efrînê ji wir jî heya Şengal û Şêxanê li her deverê, di nava kurdên misliman de dijiyan. Ji ber ku ev civaka etno-dînî her tim bi cîranên xwe re di nava konfliktê dînî de bû û li kêleka vê jî xwedî taybetiyên jiyana eşîrî û koçerî bûn; ew di heman demê de wekî veguhêzên folklor a civaka kurdan bûn. Her wiha çanda dengbêjiyê jî di nava wan de gelek dewlemend bû. Di nava kurmanç û kirmancên elewî de ev çand hema bêje hunda bûye. Heta em dikarin bibêjin ku di sedsala dawîn de, xebatên li ser folklor a kurdan ji ber ku bi piranî ji aliyê kurdên êzîdî (yên Kafkasyayê) ve hatine kirin û çavkaniyên wan jî bi piranî

³¹⁶ J.9., Pêvek 3.

³¹⁷ J.9., Pêvek 3.

³¹⁸ J.9., Pêvek 3.

kurdên êzîdî bûne, mohreke diyar ya baweriya êzdiyatîyê di xwe de dihewînin ku em ê di vê beşa teza xwe de vê rewşê vekolin.

Êzîdiyên kurd, li gorî elewiyên kurd, di heqê nasnameya xwe de bêtir vekirî ne û ev yek di metnên wan de bi aşkerayî xuya dike. Her çendî di vegotinên kurdên elewî de, têgihîştinên nasnameyî bêtir li derdora hîsên mexdûriyetê têne însakirin jî û her wiha pîrî caran nasnameya wan ji bo wan ‘sir’ be jî, di kurdên êzîdî de jî ev hîs hene lê li kêleka van hîsan, civaka xwe û dînê xwe bilind an jî yekane dibînin ku ev yek rewşeke balkêş e. Li gorî êzîdiyan, demekê hemî Kurdistan û Îran li ser rêça dînê wan bûye.

*‘Kevintirîn dîne dinyayê şemsanî bûye. Îranî û ecem hemî şemsanî bûn’.*³¹⁹

Li vê derê, ji şemsaniyê mebest; êzdiyatî ye³²⁰. Şemsanî tê wateya perestina li rojê an jî pîrozdîtina rojê. Şêx Şems, şexsiyetekî girîng yê mîtolojiya êzdiyatîyê ye. Li gorî lêkolerên êzîdî yên wekî Celîlê Celîl³²¹, Dawid Mirad Xetarî³²² û Xeyrî Bozanî³²³, şemsanî û mîtraîzîm heman dîn in û êzdîtî paşmaweya dîne şemsanî ye.

Digel ku kurdên elewî xwe di nava îslamiyetê de dibînin jî, kurdên êzîdî, bi tu rengî xwe di nava îslamiyetê de nabînin. Her çendî ku di mîtolojiya wan de xalên bi îslamiyetê re hevpar gelek bin jî ew xwe bi tu awayî wekî misliman pênase nakin. Di vê mînaka jêrîn de ku me ji pirtûka Xeyrî Şengalî ya bi navê ‘*Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêr, Komeke Tekstên Folklorî Êzdiyan*’³²⁴ ji *Hîkayeta Xidirê Hebabî û Koçek Birahîm* vegirtiye³²⁵, ev têgihîştina nasnameyî aşkera xuya dike. Di vê hîkayetê de Koçek Birahîm û Xidirê Hebabî her tim henekê xwe bi hevalê xwe yê belengaz yê bi navê Şêx Hecî dikin. Şêx Hecî gelek ji vê rewşê bêzar dibe û nifir li Xidir dike.

“Şêx hevî ji Xudanê xwe kir, go: Tu Xidirê mezinê Gabara bikujî. Xidir emrê Xwedê kir. Rebilalemîn wisa kir, li bedena yekî Xatûnî li Behra Xatûniyê li holê li

³¹⁹ Xeyrî Şengalî, *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nê e (Bergî Yekem)*, Weş. Enstîtuya Kelepûrî Kurdî, Çap. I, 2011, Duhok, r. 50.

³²⁰ H.b., r. 50-54.

³²¹ J.7., Pêvek 3..

³²² J.8., Pêvek 3..

³²³ J.11., Pêvek 3.

³²⁴ Ev pirtûka du berg ku ji aliyê Enstîtûya Kelepûra Kurdî, li Kurdistana Iraqê hatiye çapkirin bi tîpên erebî û kurmançî ye. Tranaskrîpsiyona ji alfabeya erebî bo alfabeya latînî ji alî me ve hatiye kirin.

³²⁵ Bnr. X. Şengalî, *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre (Bergî Yekem)*, r. 74-78.

*Sûriya dehr bû (dîsa hate dunyayê). Wextî emrê wî tîfalî bûye heft salî, dît ê li kirasekî **bisilman** de ye. Hîvî ji Xudê kir got: Mi bikuje. Vêca mir. Piştî emrê Xwedê kir, ruhê wî kete ber bedena jineke **Bebî bisilman**. (Bebî eşîreteke kurdê bisilman li ser mezhebî şîe ne û li Şengalê de akincî ne) Dîsa emrê wî bûwe heft salî, xwe nas kir ke li kirasekî **bisilman de ye û şîe ye**. Hîvî ji Rebê xwe kir, dîsa bimiri. Piştî emrê Xwedê kir, Rebilalemîn, wî kir li bedena jineke Hebabî **êzîdî**. (Eşîreteka Êzdî ye li devera Şengalê) Li Çiyayê Şengalê dehr bû. Li bajarê Şengalê piştî emrê wî bûwe heft salî, xwe nas kir, got: **Xudêyo elhemdûlillah. Ez êzîdî me.**”³²⁶*

Di vê pasaja jorîn de tê dîtin ku êzîdî, nasnameya xwe li hember nasnameya mislimanên şîe (kurd) û mislimanên sunî (kurd) wekî nasnameyeke cuda bi cih dîkin. Her wiha neqayiliya xwe ya li hember her du nasnameyan û yekanebûna nasnameya xwe bi rengekî aşkera tînin ziman. Heta ew di qewlên xwe yên dînî de vê yekanebûna baweriya xwe di asteke pir bilind de, li ser hemû baweriyên dinirxînin.

“Here tirk e, here teter e

Ew xafilêt bê neder e (Ew cahil in, nêrînek wan tune

*Ewan jî **Şêşims** mefer e (Şêşims ji bo wan jî parêzvan e)*

Here ‘ereb e, here ‘ecem e

Ew in xafilêt bê kerem e (Ew cahil in kerametek wan tune)

*Ewan jî **Şêşims** pêşqedem e*

File ku file ne

Bi keşîş û abûne ne

*Ew jî li dû **Şêşims** diherine*

Cihû ku cihû ne

Di selefxor û buxtan û nebûne (Tefecî, îftîracî û derewkar in)

*Ew jî bi **Şêşims** bi recû ne” (Ew jî ji Şêşims bi hêvî ne)³²⁷*

³²⁶ H.b., r. 74-75.

³²⁷ P. G. Kreyenbroek-X. C. Reşow, *Tanrı ve Şeyh Adî Kusursuzdur*, r. 358.

Şêşims, an jî Şêxşem, hem wekî şexsiyeteke pîroz yê êzîdiyan û hem jî wekî temsîla xwedayê rojê, di baweriya êzîdiyan de tezahur dike. Ev cure qewl di heman demê de wekî nîşaneyên baweriyên arkaîk yên îranî, di nava baweriya êzdiyatîyê de têne dîtin. Ji van aliyan ve xuya dike ku baweriya êzdiyatîyê, ji gelek bawerî û mîtolojiyên dî sûd wergirtiye û ji xwe re sîstemek taybet ava kiriye.

Di vê mînakê de û di gelek mînakên dî de xuya ye ku êzîdî bi nêrînek gelek tûj û antî-semîtîk li cihûyan dinihêrin. Ev yek di gelek vegotinên êzîdiyan de xwe dide der. Karakterên cihû, her tim di çîrokên wan de bi ‘nebaşî’ û ‘dexesiya’ xwe derdikevin pêş. Heta ev ‘nefreta’ êzîdiyan ya li hember cihûyan di mîtolojiya wan de gelek berbelav e. Êzîdî, Buxtulnesir an jî Nebûqednezer ê ku qralê Babilê ye û yekem car qetlîfama mezin li ser cihûyan dike, wekî êzîdî û mirovekî qencî pîroz dibinîn.³²⁸

Destana navdar ya *Derwêşê Evdî û Edûlê* ji aliyê fêmkirina nasnameya etno-dînî ya êzdiyatîyê gelek girîng e. Her wiha em bi rêya vê destanê, derbarê derûniya nasnameyî ya vê civaka mînor de jî gelek tiştan fêr dibin. Di mînakên jorîn de, her çendî ku hîkaye bin jî, bi piranî ji metnên wan yên dînî mînak hatin dayin. Lê di metnên folklorî de carina rewş diguhere. Bêguman dîsa li ser nasnameya êzdiyatîyê israrek aşkera heye lê di vê mînakê de ew xwe bêtir di nava civaka kurd de li ser erdnîgariya Kurdistanê wekî civakek cuda dibînin.

Di vê versiyona *Derwêşê Evdî û Edûlê* de ku Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl ji zarê êzîdiyên Kafkasyayê berhev kirine, atmosfera netewî ya destanê hê di destpêkê de wiha tê neqîlkin:

“*Kîka û Mila **kurd** bûn, Gêsa **ereb** bûn.*”³²⁹

Piştî ku Evdî biryar dide ku li hember ereban şer bike, Şêxê ereba ku dostê bavê wî ye, wî hişyar dike û jê re dibêje: *Tu vegere nekeve nava me! Em busulman in tu êzîdî ye!* Lê *Derwêş* wiha bersiv dide:

“*Apo erê bira ez **êzîdî** me. Bes ez eşîra Zor Temir Paşayê Millî me.*”³³⁰

³²⁸ Bnr. X. Şengalî, *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre*, Bergî I., r. 41.

³²⁹ Celîlê Celîl, -Ordîxanê Celîl, *Zargotîna Kurda*, Weş. Aram, Ç. 3., 2013, Amed, r. 279.

³³⁰ H.b., r. 286.

Dîsa jî dema ku mesele tê nav kurdan hingê êzîdî li ser nasnameya xwe ya dînî bêtir bi israr in. Wekî mînak di destanê de, Evdî demekê ji warê xwe dûr dikeve û diçe herêma Serhedê. Diçe bin konê Heyderan û Zilan û dibe mêvanê Ehmed Begê:

*“Derwêş rûnişt. Go: Çaxê we bi xêr. Gotin: Bi xêr û silamet. Ew jî li ba êt ber derî rûnişt, li binê kon de. Pirs jê kirin, gotin: Ti ji ku yî? Go: Welle ji vê xerbê. **Tu çi miletî? Go: Welle ezî êzdî me.** Ti êzdiyî. Go: Arê wella.....(Gotin çûn gihîştin Ehmed Begê. Wî ban Derwêş kir) Go: Tu êzdî yî. Go: Arê wella. Go: Pa ne eyb e ji Derwêşê Evdî re, Derwêş êzdî ye û Edûlê bisilman e û dibêje ezê Edûlê bim.”³³¹*

Her çendî ku di vê mînakê de diyar e ku êzîdî dîsa xwe wekî miletek cuda dibînin jî, dema ku em li tevahiya destanê dinihêrin, tê dîtî ku ew li hember erebên êrîşkar, xwe li kêleka kurdên misliman bi cih dikin. Lê di nava vê rewşa konfliktê de jî ew her tim xwerûbûna baweriya xwe ya dînî nîşan didin û car caran sîtem li birayên xwe yê kurdên misliman dikin.

Di strana *Dawidê Dawid* de, bêjara netewî li gorî vegotinên herêmên dî, bêtir li pêş e.

*“Ezê hawar dikim hawar heye lê hîndad ji me ra nayê
Heyfa mi tê wê yekê destê xortê cana li darê kelemçe dan
Ferza êzdî na lê ew jî qismek ji me kurdan e”³³²*

Di vê mînaka jorîn de tê dîtî ku êzîdî, wekî civak, xwe di nava civaka kurdan de dibînin. Lê ev xaleke balkêş e ku her tim, nasnameya xwe ya etno-dînî jî diyar dikin.

Di strana *Ferîq Paşa* de, ku ji heman herêmê hatiye berhevkirin, bêjara dij-tirkî xuya dike. *Ferîq Paşa* straneke navdar ya êzîdîyan e ku temsîla dijderketina wan ya li desthilatdariya tirk û osmaniyan dike.

*“Osê Mecdî sê denga gazî dike Sifûqê
Meto bavê Berces, Mihemê Evdo bavê
Saleh, Hemo Şêro bavê Seydo, Gelî*

³³¹X. Şengalî, *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre*, r. 321.

³³²C. Allison, *Yezidi Sözlü Kültürü*, r. 398.

Bav û bira mêrî çêbin destî xebatekî mêra bikin

Çavê xwe ji eskerê tirka neşkenînin

Destê xwe li çeqmaqî bipelînin

Îzna Xodê em ê weke dem û heywanê

Berî eskerê Ferîq Paşa bidine xopana Kerkûkê”³³³

Wekî ku di vê mînaka jorîn û gelekî mînakên dî de jî derdikeve pêş me, di folklorê kurdan de tirk bi piranî bi temsîla desthilatdariyê derdikevin pêş. Digel ku di folklorê kurdan de ereb, ecem, xirîstiyane suryanî, keldanî, ermenî, cihû li gorî taybetmendiyên xwe yê çîmî-civakî di gelek rolan de derdikevin jî, tirk bi piranî ji bilî rola xwe ya desthilatdariyê di folklorê kurdan de pir kêr xuya dikin.

Di *Destana Kela Dimdim* de ku ji zarê êzîdiyan hatiye gotin heman rewş derdikeve pêş me. Li gorî vê varyanta ku di sala 1931an de, ji aliyê Heciyê Cindî, ji nava kurdên êzîdî yê Ermenistanê hatiye berhevkerin, dema ku Xan dikeve tengahiye alîkarî ji mîr û eşîrên kurdan dixwaze. Gelek mîr û eşîr bi hawara Dimdimê ve tên û yek ji vanan jî êzîdî ne.

“Dor hate lawê Hekarî

Li sêrî tora tarî

Ewî nig da hezarî

Dor hate lawê hertoşî

Te li sêrî qerepoşî

Ewî nig da koma berjojî

Dor hate lawê Divînî

Xudanê şeşxana mezin î

Tu şerad î, kesê min î

Dor hate lawê Êzdî

Şer xweş kiriye li çadira spî”³³⁴

³³³ H.b., r. 387.

³³⁴ Heciyê Cindî, *Folklorê Kurmanciyê*, Weş. Lîs, Ç. 2., 2016, Amed, r. 178.

Di vê pasaja ji Destana Kela Dimdim de jî xuya dibe ku civaka kurdên êzîdî, li hember xetereyên derveyîn xwe li kêleka civaka kurdên misliman bi cih dikin. Her wiha di vê mînakê de diyar e ku ‘dijmin’ dema ku ‘qizilbaş’ bin, êzîdî xwe bêtir motive dikin. Dibe ku ev ji saîkên netewî nîn be lê ji saîkên dînî-mezhebî be. Lewre wekî ku tê zanîn hin lêkoler, êzdiyatiyê wekî mezhebeke hişk ya îslamiya sunî dibînin û tê zanîn ku kesên wekî Muawiye û Yezîd li cem êzîdiyan şexsiyetên pîroz in.³³⁵

Di *Destana Mîrza Kendalî* de jî têgihîştinên nasnameyî, bi cureyên wekî ku di *Destana Derwêşê Evdî û Edûlê* de derdikevin pêş me xuya dikin. Wekî mînak, sê zarokên bira ji ber ku birçîne, dikevin zeviyê pîvaza û xwediyê zeviyê wan diqefêle.

“Her sêya da cem yek kr ketine nêv pîvaza û xudanê pîvaza pêgirtin.

-Kuro hûn ji ku ne?

-Walla em êzdî ne.”³³⁶

Di vê mînakê de nasnameya êzdiyatiyê ew çend li pêş e ku, digel ku pîrsa ji wan di heqê ji ku derê bûyina wan de ye jî, ew ji vê pîrsê re, bersiva êzdîbûna xwe didin. Li vê derê, nasnameya dînî ne tenê li pêş nasnameya etnîk hatiye dîtin her wiha li pêşiya nasnameyên cografîk jî hatiye dîtin ku ev yek, yek ji xurtirîn hêmana ku nasnameyê ava dike ye. Bi awayek dî, eger ku yek êzîdî be êdî ne girîng e ku ew ji kîjan herêmê ye. Ya girîng êzdîbûna wî/wê ye.

Di heman vegotinê de, Mîrza Kendalî ji aliyê Melek Cebraîl ve tê ziyaretkirin. Lewre Xuda jê xwestiye ku ew li kêleka Dewleta Osmanî, li hember Qizilbaşan şer bike. Li vê derê Cebraîl, temsîla Melekê Tawis e. Êzîdî pirî caran li şûna Melekê Tawis dibêjin Cebraîl an jî Emîn Cebraîl.

“Cebraîl hat, bin serî sekinî. Got: Mîrza!

Go: Çi ye?

Go: Kurê min tu nebêjî xewn e. Ez Emînê Xudê me û Rebê te ez şandime, Melek Şêxsin nivîsiye, û Şêşem mohr kiriye, qetla gawiristaniyê avêtiye destê te Xanê Xencerxan û gawirê qizilbaş bikuje û ti li feze’a Sultan Mirad çî, li feze’a îslamî.

³³⁵ Bnr. P. G. Kreyenbroek-X. C. Reşow, *Tanrı ve Şeyh Adi Kusursuzdur*, r. 133-139.

³³⁶ X. Şengalî, *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre*, r. 150.

*Lazim e li feze'a Îraqê çî. Lê nêrî... Eynen ew zilam e. Dîsanê her ji xwe fêrî nekir, **Cebraîl** hinekî sivik bû û xwe unda kir.*”³³⁷

Di vê mînakê de tê dîtin ku êzîdî şîeyan wekî kafir dibînin. Digel ku lêkolerên wekî Izady,³³⁸ M. Emîn Zekî Beg³³⁹ êzdîtî û elewîtiyê yan jî baweriya Ehlê Heq nêzî hev dibînin, heta wisa îdîa dikin ku êzîdîtî, ji îslamiyetê bêtir, bermaya dînê kevînar yê îranî ye jî, hem di termînolojîya êzîdîtiyê de û hem jî di vê pasajê de em dibînin ku ji aliyê motif û têgihên dînî ve êzîdîtî û îslamiyeta sunî bêtir nêzî hev in. Di hevpeyvînên ku me ji herêmen kurdên êzîdî kiriye de, folklorên û lêkolerên mîna Arshad Hamid Miho û Dawid Mirad Xetarî jî bi heman rengî dupat dikin ku di nava kurdên êzîdî de, qizilbaşî bi îmajê nebaş tê zanîn. Arshad Hamid Miho li ser îmajê nebaş ya qizilbaşan wiha dibêje:

*“Ma qizilbaş, ceşê kê bûn? Ma ne leşkerê Sefewîyan bûn? Ê Sefewîyan gelek ferman înanê ser êzîdîyan. Heta berî Osmanîyan. Dewr û dorê Hewlêrê, dewr û dorê Kerkûkê... Jêderên farîsan dibêjin ku êzîdî li wir hebûn. Serdema Ismailê Sefewî de, ewan gelek mîrên êzîdîyan kuştin û xelkê êzîdî li dewr û berê Erbilê qir kirine. Her çawa êzîdî ji qizilbaşan ditirsin ji romîyan jî ditirsin. Leşkerên Osmanîyan. Ew ji wê çaxê de hatiye ez dibêm.”*³⁴⁰

Li gorî Dawid Mirad Xetarî jî qizilbaşî di nava kurdên êzîdî de wekî cureyek redkirina eslê xwe tê zanîn.

*“Qizilbaş zanî, di hindik wextan de, di dewleta Osmanî de, rolekî wan yê nebaş hebû. Li cem me peyva qizilbaş wateya wê gelek nebaş e. Dijminê milletê xwe ye. Vêca me ji elewîyan re digot qizilbaş ma ne? Eva em dibêjine kewa xwelîser, dijminê serê xwe ye. Ev e qizilbaş ku bigotina ev tiştê ne baş e. Eva hanê xwe hesêb dikirin turk. Xwe hesêb dikirin xasên tirka. Dijî milletê xwe radibûn. Îca xelkê jî digot e, eva qizilbaş e, qizilbaşî ye. Yanê wateya wê ne xoş bû.”*³⁴¹

³³⁷ H.b., r. 154-155.

³³⁸ M. R. Izady, *Kürtler*, r. 253.

³³⁹ M. E. Zekî Beg, *Dîroka Kurd û Kurdistanê*, r. 201.

³⁴⁰ J.10., Pêvek 3.

³⁴¹ J.8., Pêvek 3.

Êzîdî, dema ku xwe di cografyaya civakî ya derdora xwe de bi cih dikin, xwe tu car ji nuqteyî nêrîna ırqî an jî etnîk ve nabînin. Ew xwe li gorî baweriya xwe tesnîf dikin ne ku li gorî rehên xwe yên etnîk. Lewre dema ku ew tesnîfê li gorî baweriyên dikin, hingê ew jî xwe bi wan kutleyên dî yên mezin re wekhev dibînin. Li jêrê em ê di vê çarçoveyê de gelek mînakên bidin.

Di berhevoka Îdrîs Farqînî de ku ji herêmên Xankê û Baedrê hatine berhevkerin, di çîroka Mîskê (Mîrze) Zaza de ev yek bi vî rengî derdikeve pêş me:

*“Axayek hebû li axa tirka jê re digotin Zaza. Zaza, axa bû, axayê Koçka Ridwanê bû. Ew î Zazayî li cihê xwe hikim li **êzdiya û bisilmana û li fila dikir**. Hingê eşîr û axa hebûn, ew î hikim li xira dikir. Hege çend sal hatin û çûn dinya milkê Xwedê ye ji kesî ra namînit. Zaza emrê Xwedê kir. Wextê emrê Xwedê kir, axa û eşîrên mintiqê, **ê fila, ê bisilmana û ê êzdiya** derê Koçka Ridwanê girtin. Heta em axayek bo xwe danin, derê koçkê dê girtîbit.”³⁴²*

Di vê pasajê de tê dîtin ku deshilatdarî ji aliyê etnîk ve hatiye pênasekirin lê vebêj, êzîdîyan di nava kategoriyên dînî de hêlsengandiye û bi xirîstîyan û mislimanan re bi hev re telafûz kiriye. Her wiha ev yek daxwaza wan ya wekhevîyê jî ji aliyên nasnameya dînî ve dide der. Lêkolerê êzîdî Arshad Hamid Miho jî vê yekê piştrast dike ku êzîdî bêtir xwe li gorî baweriya xwe tesnîf dikin lewre ku yên derveyê wan jî her tim wan li gorî baweriya wan tesnîf kirine.³⁴³

2.3.1. Di Vegotinên Gelêrî Yên Kurdên Êzîdî De Motîfên Dînî

Di vê beşê de em ê hewil bidin tesbît bikin ku di metnên folklorî yên sekuler de, tema û têgehên dînî, bi çî rengî derdikevin pêş me. Em ê vekolîna xwe bi çend têgihan bi sînor bikin ku ev bi vî rengî ne: *Melekê Tawis/Melekê Cebâr, Ferwar/Firwar, Xidir-Ilyas/Xidilyas, Sur*. Ev her çar têgih jî di nava termînolojiya dînî ya êzîdîyan de gelekî girîng in. Em ê di her sernavê de, pêşî wê têgihê di nava konteksta dînî de û di metnên dînî de bidin da ku wateya wê bê têgihîştin û bi dû re em ê heman têgihê di konteksta metnên folklorî de nîşan bidin.

³⁴² Îdrîs Farqînî, *Bi Zarê Êzîdîyan Çîrokên Gelêrî (Deverên Xankê û Baedrê)*, Weş. J&J, Çap I, 2011, Stenbol, r. 11.

³⁴³ J.10., Pêvek 3.

2.3.1.1. Melekê Tawis/Melekê Cebbar

Ev têgih hem di nava termînolojiya dînî ya êzîdiyan de û hem jî di nava jiyana wan ya civakî de xwedî cihekî gelekî girîng e. Ew di nava hemî melekên dî de yê herî payebilind e. Li gorî hin baweriyên êzîdî ji bo ku xwe ji xerabiya wî biparêzin jê re îbadet dikin.³⁴⁴ Ji ber ku êzîdî ji hemî melekên dî ku ew jê bawer dikin bêtir bi baweriyaya wan ya bi vî melekî têne nasîn, di heman demê de ev heyin an jî bawerî ji bo wan dibe semboleke nasnameyî.

2.3.1.1.1. Di Nava Termînolojiya Dînî Ya Êzîdiyatîyê De Melekê Tawis

Di termînolojiya dînî ya êzîdiyan de û di qewlên wan de wekî Melekê Tawis derdikeve pêş me lê di vegotinên gelêrî yê civaka êzîdî de bi piranî wekî Melekê Cebbar lê carina jî wekî Melekê Tawis derdikeve pêş me. Ev her du jî ji bo êzîdiyan tên heman wateyê.³⁴⁵ Carina jî wekî Melek Cebraîl an jî Emîn Cebraîl hatiye telafuzkirin lê di van hemiyan de jî mebest, Melekê Tawis e.³⁴⁶

“Di çanda devkî ya êzîdiyan de, Xwedê, Melekê Tawisê ku wekî Emîn Cebraîl jî tê binavkirin, ji cewherê xwe, ji nûra xwe afirandiye.”³⁴⁷

Ji ber ku di nava êzîdiyan de di navbera Melekê Tawis û ‘Şeytan’ de hevterîbiyek heye, ev yek rê lê vekiriye ku civakên derdorê, êzîdiyan wekî ‘şeytanperest’ bi nav bikin û vê taybetmendiya dînî ji bo êrîşên xwe yê li ser civaka êzîdî bikin hêncet. Lescot di vê mijarê de wiha dibêje:

“Di nava pîroziyên ku endamê vê terîqetê lê diperistin, ya herî problematîk Tawûsê Melek e. Li gorî nêrînên berbelav yê rojhelatê; Tawûsê Melek û Şeytanê ku di îslamiyet û xirîstiyaniyê de heye heman kesayet in. Bi rastî jî ev melek, di nava êzîdiyan de jî melekê xerab e. Ji ber baweriyaya wan ya bi vî melekî ew biçûk hatin dîtin û heqaret li wan hate kirin.”³⁴⁸

³⁴⁴ Roger Lescot, *Yezidiler*, Avesta Yayınları, Çev. Ayşe Meral, 3. Baskı, 2014, İstanbul, r. 44.

³⁴⁵ Bnr. X. Şengalî, *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre*, r. 133.

³⁴⁶ R. Lescot, *Yezidiler*, r. 51.

³⁴⁷ A. Gökçen, *Ezidi Ağutları*, r. 7.

³⁴⁸ R. Lescot, *Yezidiler*, r. 44.

Li gorî gelek lêkoleran li kêleka Xweda hebûna pîroziyek wiha di asta jorîn de, di heman demê de îşaret bi karaktera dualîstîk ya vê baweriyê dike ku ev yek rehên xwe ji baweriyên arkaîk yên îranî digire. Digel ku Xweda û Melekê Tawis du heyinên cuda ne jî, hebûna wan jî bi hev ve girêdayî ye. Ji xwe di termînolojiya dînê îslamê de jî, dijberiya Şeytan ya li hember Xweda, vê karaktera dualîstîk nîşan dide.

Celîlê Celîl neqil dike ku baweriya bi Tawisê Melek pir beriya îslamiyetê di nava kurdên êzîdî de hebûye û vê wekî baweriya Tawûsî bi nav dike. Lê li gorî Celîl, ji ber ku navê Melekê Tawis ji aliyê civakên derdorê ve bi navê ‘şeytan’ re hemta hatiye dîtin û bi vî rengî êzîdî wekî civakê ‘şeytanperest’ hatine tawanbarkirin; êzîdiyan jî dev jê berdane ku ji xwe re bibêjin Tawisî û navê êzîdî li xwe kirine ku ev yek tê wateya xwedênasiyê.³⁴⁹

Di qewl û duayên êzîdiyan de jî Melekê Tawis derdikeve pêş me. Wekî mînak di *Qewlê Qere Ferqan* de wiha derdikeve pêş me:

*“Pedşa dibêjitê: Fexrê mino yî faxir e
Cewaba te li min lêzim û fer e
Min ev doje bo wan ava dikire
Ê bi rojê sê cara bi navê **Tawî Melek** difikire.”³⁵⁰*

Di vê qewlê de ji Pedşa (padîşah) mebest Xwedê ye. Lêkolerên êzîdî Dawid Mirad Xetarî³⁵¹ û Tosinê Reşîd jî neqil dikin ku êzîdî pîrî caran ji Xwedê re Padîşah dibêjin.³⁵² Xwedê û Melekê Tawis di heman qewlê de bi hev re derdikevin pêş me. Di *Qewlê Pîr Dawid* de em dibînin ku Melekê Tawis bi navê Melekê Cebare li pêş me ye:

*“Malxoyê wî deng diket bi zare
Mîro, zigê Dotê behre, dinê û alemê pê nîne çare
Ji xêrî **Melikê Cebare**”³⁵³*

³⁴⁹ J.7., Pêvek 3.

³⁵⁰ P. G. Kreyenbroek-X. C. Reşow, *Tanrı ve Şeyh Adi Kusursuzdur*, r. 174.

³⁵¹ J.8., Pêvek 3.

³⁵² T. Reşîd, *Êzdiyatî*, r. 64.

³⁵³ P. G. Kreyenbroek-X. C. Reşow, *Tanrı ve Şeyh Adi Kusursuzdur* r. 227.

Di jêrenota vê qewlê de, Kreyenbroek, îşaret pê kiriye ku ji Melekê Cebar mebest, Melekê Tawis e.³⁵⁴

Di hîkayeta dînî de ya bi navê *Mişabet: Derwêşê Bajarê Besrayê*, Melekê Cebar (Melekê Tawis) wiha derdikeve pêş me:

“Çû ber deriyê çara

Mehbûbeke a bi xêlî û spî çare

Go: Ya Rebî, me xêrek rêya navê te wa kirî

*Îro tu li banga me û hazira bişîne **Melekê Cebare**”³⁵⁵*

Di *Çîroka Pêdabûna Sura Êzî* de, Sultan Êzî, an jî bi navê dî, Yezîd bîn Muawiye, ji aliyê diya xwe ve tê veşartin û heya ku wextê wî tê ew derdikeve meydanê û sura xwe aşkera dike. Di vê mînakê de têgihên mîna sur, keramet û batin û Tawisê Melek di heman qewlê de hatine bikaranîn.

“Gotê: *Ezîzê min çî muqdare*

Wekî sura heqî hate diyare

Min nekarî serî xo di bangî nekire

*Got: Heke min **keramet û batin** dit, hola **Tawusî Melek** e”³⁵⁶*

2.3.1.1.2. Di Vegotinê Gelêrî Yên Êzîdiyan De Motîfa Melekê Tawis/Melekê Cebar

Di berhevoka Dawid Mirad Xetarî, bi navê *Mem û Zîn, Sê Versiyonên Wê Ji Deverên Êzîdiyan*, di versiyona pêşîn de, dema ku Mîr bi mahiyeta xwe ji nêçîrê vedigere û tê baxê torkirî, *Badîn Çawiş*, beriya wî tê û dibîne ku Mem û Zîn li cem hev in.

“Memo dibêjit:

*Badîn Çawiş, **sur** li balo*

*Tu li min û vê **surê** bike sitaro*

Dê minetekê li min key

³⁵⁴ Bnr. H.b., r. 230, Jêrenot: 409

³⁵⁵ H.b., r. 467.

³⁵⁶ H.b., r. 242.

Li ba **Melekê Cebaro**

Li min û vê **surê** bike sexbîr

Dê minetekê li min key li ba **Melekê Cebaro** ”³⁵⁷

Di heman berhevokê de, di versiyona duyemîn de ku ji herêma Xetarê hatiye berhevkirin, dema ku Al Paşa di nava xeman de bi serê xwe rûdinê, Emîn Cebrail tê balê:

“**Emîn Cebrail** ji asmana nazil bû erdane

Sêvek dabû Al Paşane

Her vê sêvê bike du ciyane

Qetekê bixwe êkê bide Melekvane ”³⁵⁸

Di heman berhevokê de di versiyona sêyem de, ku ji herêma Şengalê hatiye berhevkirin, dîsa bi rengê mînaka jorîn Emîn Cebrail tê ba Al Paşa.

“**Emîn Cebrail** elqadir Rebbê rehman e

Sêvek nazil kir erdane

Ê dibê ya Al Paşa bike du ciyane

Vê sêvê qetekê bixwe yê dî bide Melekvane ”³⁵⁹

Destana Zembîlfiroş, li cem êzîdiyan xwedî girîngiyek taybet e. Lewre civaka êzîdiyan, Zembilfiroş wekî êzdiyekî bawermend tesewir kirine. Heta binavkirina wî ya wek lawikê feqîr/rewal, dibe ku bi çîna feqîran ya statuyên civakî-dînî yên êzîdiyan ve têkildar be. Di varyanta ku Celîlê Celîl û Ordîxanê Celîl berhevkirine de, ev yek wiha derdikeve pêş me:

“Zembilfiroş serê xwe datîne

Xewka şîrîn hiltîne

Xatûn Perî li ser serê xwe dibîne

Dibê: Dûrî min here, dûrî min here

Ez êzdîme, tu surmanî(misliman)

Me'ra me hev nabire. ”³⁶⁰

³⁵⁷ Dawid Mirad Xetarî, *Mem û Zîn*, Weşanên Enstîtuya Kelepûrî Kurdî, 2011, Duhok, r. 49.

³⁵⁸ H.b., r. 60.

³⁵⁹ H.b., r. 97-98.

Di vê destanê de em rastî gelek motîfên ji baweriya êzdiyatiyê tên. Zembilfiroş dema ku li ser banga Xatûnê derdikeve kelehê, bi îmtîhaneke girîng re rû bi rû ye. Lewma di vê beşê de Melekê Cebbar û Cebrail gelek hatine referekirin.

“Ti mi xelas bikî ji bircêt heyli(?)

Ji destê Xatûnê

*Îlahiyo **Melekê Cebbar***

*Îlahiyo **Melekê bi tenê***

Wextî ava tofanê çil gaz rabû li dinê

Wextî sefîne Nebî Nûh digirî li ser rûyê dinê

Qulpê sefîne tavêtine ser serguhya berî Cûdî bi tenê

Te ew xelas kirin ji wî ezabî

Ti mi xelas bikî ji destê Xatûnê

***Cebraîlo** teyrê sivik*

Ti keremke carekî here li nik...

*Banga min ji **Cebraîlo** teyrê bayê*

***Cebraîlo** teyrê bayê*

Ti carekî bifire here deyne li balê...

Eypa(?) bi derwêşê min bigire

Deyne ser erdê bêzewal

***Cebraîlo** teyrê sipî*

Ti carekî keremek here deyne li ba wî...

Eypa bi derwêşê min bigire

Deyne ser erdê hêdî

Keleha mermerê hezare

Zembilfiroş jî tê de dihat xware

*Bi îzna Xudê û **Melekê Cebbare**”³⁶¹*

Di vê pasaja jorîn de, Cebrail û Melekê Cebbar, her du bi hev re li şûna Melekê Tawis hatine bikaranîn.

Di varyanta Zembilfiroş ya ku Celîlê Celîl berhev kiriye de, Emîn Cebrail di wateya Melekê Tawis de derdikeve pêş me:

³⁶⁰ C. Celîl-O. Celîl, *Zargotina Kurda I*, r. 190.

³⁶¹ X. Şengalî, *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre, Bergî Yekem*, r. 130-131-132-133.

“Kelek hatê, lezkê girî

Go: Xudê tu hadirî tu qadirî

Tu min xilas kî vî agirî

Emîn Cibrahîl teyrê perbeleke

Tu here wî bendeyî peya ke

Yek dereme neke şike

Datîne erdê nermike”³⁶²

Di vê mînakê de aşkera tê dîtin ku *Emîn Cibrahîl* wekî *Teyrê Tawis* hatiye tesewirkirin.

2.3.1.2. Ferwar/Firwar

Ev têgih taybet e bi baweriya êzdiyatîyê û îşaret bi emrên îlahî an jî dînî dike. Digel ku ji aliyê etîmolojîk ev têgih û têgiha fermanê ji heman bingehê tên jî, êzîdî nuanseke girîng dixin navbera van her du têgihan. Ferwar an jî firwan emrên îlahî û dînî ne lê ferman bi piranî emrên dunyewî ne lê êzîdî pirî caran têgiha fermanê jî di şûna jenosîdê de bi kar tînin. Her çendî ku têgiha ferwarê bi piranî di nava metnên dînî de derdikeve pêş me jî tê dîtin ku di gelek berhemên folklorî de jî ev têgih tê bikaranîn. Ev yek nîşanê me dide ku di wê berhemê de bandora vegotina êzîdîtiyê heye.

2.3.1.2.1. Di Nava Termînolojiya Dînî Ya Êzîdîyan De Ferwar/Firwar

Di êzdiyatîyê de *ferwar* têgiheke girîng ya dînî ye. Ferwar, telafuzeke cuda ya têgiha fermanê ye lê di metnên êzîdîyan de cudahiyeke an jî nuansêke biçûk di navbera van her du têgihan de heye. Wekî ku li jêrê Kreyenbroek îfade dike û bi qandî ku me jî di metnên êzîdîyan de vekola, *ferman* bi piranî di mijarên dunyewî de û *ferwar* jî bi piranî di mijarên dînî de derdikeve pêş me.

“*Firwar: Ev ferman in ku ji Xwedê an jî ji Melekan û ji şexsiyetên wekî Şêx Adî, Şêx Hesên tên. Wilo tê zenkirin ku ev di sîstema dînî ya êzdiyatîyê de wekî zincîrekê ye ku dunyaya madî bi dunyaya manewî/rûhanî ve girê dide.*”³⁶³

³⁶² C. Celîl-O. Celîl, *Zargotina Kurda I*, r. 191.

Herwekî ku Kreyenbroek jî difikire, firwar di sîstema dînî ya êzîdîyan de, xwedî cihekî taybet e. Ew ferqê dixin navbera ferman û firwarê. Wekî mînak eger ku ji paşa an padîşahê Osmanî fermanek hatibe ew ji vê re nabêjin firwar. Wê, wekî ferman bi nav dikin. Lê hem di metnên folklorî û hem jî di qewlên êzîdîyan de em di gelek cihan de rastî vê têgihê tîn. Sedema ku me li vê derê jê re serenavek taybet vekir ev e ku, ew di berhemên folklorî de, nîşaneyê bandora vegotina êzdîkî ye. Yanê dema ku em di metnekê de rastî vê têgihê tîn, ew di heman demê de tê vê wateyê ku ev metin yan ji zarê êzîdîyan hatiye gotin yan jî bi bandora vegotina êzdîkî hatiye meşandin.

Lêkoler û folklornasên êzîdî, Arshad Hamid Miho û Kovan Xankî jî îfade dikin ku têgihên ferman û firwar eger ku ji yek bingehe hatibin jî ferwar/firwar bi wateya emrê îlahî ye û ferman jî bêtir ji emrên padîşahan ra tê gotin ku xelkê êzîdî bi piranî ji vêya wateya jenosîd û qelîamê fêm dike.

“Ferman ew e ya ku em bêjine ji aliyê dewleta Osmanî ve hatine. Ferman di nava êzîdîyan de bi wateya jenosîdê tete. Bes di êzîdîyatîyê de wisa ye. Yanê ferman an ku jenosîd. Bes firwar ew biryar e ku ya ku ji alî Xweda ve tete ji bo tiştek. Bo nimûne tekstê dînî de tete gotin, heta ku firwar ji ba Xwedê nehatiye, rih nekete ber qalibê Adem da û dinya û beşeriyet jî çênebû. Heta ku xwedê biryar neda yanê firwar nekir ku rih bikevte ber qalibê Adem da û mirovayeti çênebû.”³⁶⁴

Lêkoler Arshad Hamid Miho jî di heqê têgihên ferman û firwarê de wiha dibêje:

“Ferwar tişteki dînî ye. Biryara Xwedê yanê. Firwara Xwedê. Ferwara Şêx Hadî. Ferman jî tiştek siyasî ye yanê leşkerkêşî yanê qetlîam. Çunkî ez bêjim tu baştir bizanî ferman kelîmek osmanî ye. Yanê ferwar a Xwedê ye. Di vir de gelek tê bikaranîn. Ji aliyê wateyê ve ji hev cuda ne. Belkî ji alî ziman ve yek peyv bin bes di boçûna êzîdîyan de ji hev cuda ne.”³⁶⁵

³⁶³ P. G. Kreyenbroek-X. C. Reşow, *Tanrı ve Şeyh Adî Kusursuzdur*, r. 72.

³⁶⁴ J.9., Pêvek 3.

³⁶⁵ J.10., Pêvek 3.

Li jêrê em ê çend mînakên vê têgihê bidin lê pêşî em ê ji metnê dînî yanê ji qewlan çend mînanan bidin.

“*Ji ba Şêşims ferware*”

Çiqas mexlûqet bi giyane
Here bi inse, here bi giyane
*Ew jî Şêşims xudane*³⁶⁶

“*Şêx Adî kiribû firware*”

Şêr Mehmed Reşan li berekî siware
*Go: Gelî mêra we çi heye li bale*³⁶⁷

“Ya Mûsa rabe û hilweste

Em dê ber bi behrê keyne qeste

Dê firwara Xudê nîşa te kem dest bi deste³⁶⁸

Di van qewlên jorîn de em dibînin ku *firwar* di konteksteke dînî de hatiye bikaranîn. Lê dema ku têgih ne di konteksteke dînî de be, hingê wekî ferman tê telafuzkirin. Wekî mînak di hîkayeta Koçek Brahmî de wiha derbas dibe:

“*Ferman* bi ser êzdiyan de hat. Tirka dest bi talankirin û malwêrankirinê kir...³⁶⁹

Wekî ku em di vê mînaka jorîn de dibînin, herwekî ku lêkoler û folklornasên êzîdî jî îfade dikirin, wateya fermanê bêtir bi kar û barên dunyewî ve girêdayî ye û ji bo êzîdiyan ew bêtir tê wateya qetlîam û talanan.

2.3.1.2.2. Di Vegotninên Gelêrî Yên Êzîdiyan De Motîfa Ferwar/Firwar

Ferwar/firwar, di metnên folklorî de, dîsa bi heman wateyê lê ne wekî qewl, bi serê xwe tê bikaranîn. Ev rewş bi rengê xwe yê herî berbelav, di Destana Memê Alan de derdikeve pêş me.

³⁶⁶ P. G. Kreyenbroek-X. C. Reşow, *Tanrı ve Şeyh Adî Kusursuzdur*, r. 359.

³⁶⁷ H.b., r. 311.

³⁶⁸ H.b., r. 623.

³⁶⁹ X. Şengalî, *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre, Bergî Yekem.*, r. 61.

“Ya rebî, bikî ferware

Postekî kevotkan bînî xare

Em bi xwe sisê ne

Zînê li ser me bikî çare

Xwedê da bû ferware

Postek jor da hate xare

*Sê horî bûne çare*³⁷⁰

Di varyanta ku Celîlê Celîl û Ordîxanê Celîl berhev kirine de, di heman epîzotê de dîsa ev têgiha dînî ya êzdiyatîyê derdikeve pêş me.

“Xwedêyo tu bikî ferware

Libasekî kewotka bînî xare

Em sisêne, xatûn Zîna delal bive çare

*Sih'eta nîvê şevê, şherê Muxurzemîn, p'encera Memê delalda bikî xare*³⁷¹

Di varyanta Memê Alan de ku ji aliyê Emînê Evdal, li herêmên kurdên êzîdî yên Kafkasyayê hatiye berhevkirin û ji aliyê Qanatê Kurdo ve hatiye çapkirin, têgiha ferwarê bi vî rengî derdikeve pêş me:

“Ay rebî tu bikî ferware

Zîna Mîr Sêvdîn ser me bikî çare

*Post jor da têne xware*³⁷²

Di varyanta destanê ya ku ji Tiflîsê ji aliyê Qanatê Kurdo ve hatiye berhevkirin de, di heman epîzotê de têgiha ferwar derbas nabe lê têgiheke dî ya cuda derbas dibe:

“Bi emrê Êzdanê me rehmanî

Kotiran Zîn ji xewê hilanîn

*Firîn birin li nav ciyê Memê danîn*³⁷³

³⁷⁰ H. Cindî, *Foklora Kurmanciyê*, r. 24.

³⁷¹ C. Celîl-O. Celîl, *Zargotina Kurda I*, r. 27.

³⁷² Qanatê Kurdo, *Mem û Zîn*, Weş. Roja Nû, Çap I, 1996, Stockholm, r. 28.

³⁷³ H.b., r. 120.

Bi vê mînaka jorîn jî em têdigihên ku firwar tê wateya *emrê ilahî* û ew Îlah jî li dû vegotinên êzîdiyan, *Êzdanê* wan e. Di heman pirtûkê de, varyanta ku ji aliyê Maksîmê Xemo ve hatiye berhevkirin, bi vî rengî ye:

“Ya rebî tu bikî ferware

Postekî kevotka jor da bikî xare

Em sisê ne, şîrîn Xatûn Zînê ser me bikî çare”³⁷⁴

Di pirtûka Cindî de di Destana Ferx û Sitî de jî heman motîfa dînî ya êzdiyatîyê derdikeve pêş me. Ferx ji Sityê dûr e û Sitî wiha dua dike:

“Rebî, tu bikî ferware

Postekî kevotkan min ra bikî xar e

Belkî ez îro Ferxê ra bibim heval e”³⁷⁵

Di strana gelêrî ya bi navê Eyşa Balê, ku ji aliyê Xeflî Cindî Reşow ve hatiye berhevkirin, heman têgih bi nuanseke cuda derdikeve pêş me:

“Ezê bîstekê herime li bala wê bikim qestê

Ez nebûm hecacekî tesbî û wekaz li destê

Dinya dem û heywanêd Xodê bûn

Wextê her du çavêd reş û belek keftine ber ferwarê

Mi dî bûwe xoşîne tok û mendel û zer

Xezane zerî zer bi ser xalekî gerdenê”³⁷⁶

Di vê mînakê de *ferwar* bi wateye ‘emrê heq’ yanê mirinê hatiye bikaranîn. Bêguman ev jî îşaret bi konteksta dînî ya têgihê dike.

Di berhevoka Xeyrî Şengalî de *ferwar* bi heman wateyê di hîkayeta Xidirê Hebabê û Koçek Brahîm de derdikeve pêş me:

“Go: Ya Şêxadî, ez hîvî ji te dikim hemrê(emrê) vê qocemanê bikî hijde sal. *Bi ferwara Şêxadî* hemrê jinikê bûwe hijde sal.”³⁷⁷

³⁷⁴ H.b., r. 142.

³⁷⁵ H. Cindî, *Folklor Kurmanciyê*, r. 137.

³⁷⁶ C. Allison, *Yezidi Sözlü Kültürü*, r. 470.

³⁷⁷ X. Şengalî, *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre, Bergî Yekem*, r. 77.

2.3.1.3. Xidir-Ilyas/Xidilyas

Baweriya bi Xidir an jî Xidir Ilyas ne tenê taybet e bi civaka êzîdiyan. Di nava civakên elewî û yarsanî de jî ev bawerî heye. Lê bêguman her civak ew li gorî şertên xwe yên çandî û dînî şîrove kirine. Hêvî û daxwazên xwe yên civakî lê bar kirine. Di nava civaka êzîdî de jî hem di pêwendiya dînî de û hem jî di nava berhemên folklorî de ew bi berbelavî derdikeve pêş me.

2.3.1.3.1. Di Nava Termînolojîya Dînî Ya Êzîdiyan De Xidir-Ilyas

Ev motîfa dînî di vegotinên elewiyên kurd de jî derketibû pêş me. Her wiha Xidir an jî Xidir Ilyas di çanda kurdên sunî de jî heye. Lê di nava civakên kurd de, her kom an jî grûba etnîk, li gorî têgihîştina xwe ya dînî wesf lê bar kirine

Xidir û Ilyaz di çanda dînî ya êzîdiyan de bi rojî û cejnê re bi hev re tèn bibîranîn.³⁷⁸ Ew her wiha şexsiyetên pîroz in ku di vegotinan de jî dertên pêş me.

Tosinê Reşîd ji bo girîngiya Xidir Nebî di nava baweriya êzdiyatîyê de wiha dinivîse:

*“Parastina Xidir Nebî, ji ola yazdaniyê tê, wisa jî di ola êzdiyan de heta îro maye. Çawa li ba êzîdiyan, wisa jî li ba yazdaniyan, yarsaniyan, elewîyan Xidir Nebî mirazbexş e.”*³⁷⁹

Amed Gökçen, ji bo Rojîya Xidir û Ilyas ya di nava êzîdiyan de wiha dinivîse:

*“Rojîya Xidir û Ilyas ku di nava elewiyên Tirkîyê de jî ciheke wê ya girîng heye, di nava civaka êzîdiyan de jî xwedî girîngîyeke mezin e. Ev rojî di îniya ewil ya meha sibatê de tê girtin. (Di nava êzdiyên Kafqasyayê de ev 17ê sibatê ye) Roja pêşîya wê yanê roja pêncşemê jî, wekî Îda Xidir û Ilyaz an jî Îda Xidir û Nebî tê pîrozkirin.”*³⁸⁰

Lêkoler û folklornas Xeyrî Bozanî ji bo girîngiya Xidir Ilyas ya di nava civaka êzîdî de wiha dibêje:

³⁷⁸ R. Lescot, *Yezidiler*, r. 65.

³⁷⁹ T. Reşîd, *Êzdiyatî*, r. 32.

³⁸⁰ A. Gökçen, *Yezidi Ağıtları*, r. 26.

“Xidir Ilyas du pêxember in. Ev her du rêz û îhtîrameke geleke mezin ya êzdiyan bo wan heyê. Êzdî ji bo wan sê roja bi rojî dibin. Û ji bo êzdiyan ew jêderê xêr û bereketê ne.”³⁸¹

Di metnên dînî û qewlên êzîdiyan de jî ev temaya dînî derdikeve pêş me. Di xebata Kreyenbroek û Reşow de, di qewlên êzîdiyan de di çend cihan de Xidir an jî Xidir Ilyas derdikeve pêş me ku ev yek nîşan dide ku ew di nava sîstema dînî ya êzîdiyan de xwedî cihekî ye. Di *Qewlê Kaniya Mara* de wiha derdikeve pêş me:

“Xozî min zanîba ezman çend mîqdar e

Heke Şixadî biket firwar e

Menzel pênsed salî bi hijmar e

Xozî min zanîba ezman çend qiyas e

Ji gotîna Xidir û Liyas e

Gotinê ewil heta esas e”³⁸²

Di heman xebatê de di *Qewlê Îmanê* de motîfa Xidir wiha derdikeve pêş me:

“Xoşî û şahî ji me ra çê dikirî

Dibirime ser terîqeta **Melkê Faxirî**

Xidiro bin Xidirî

Hey Xidiro bin Xidir

Te **kasek** da min bukir

Min vexwar bi nav û dikir

Dibirime ser ilmekî faxir

Te **kasek** ji min re anî

Ez dibirime ser **ilmê Qatanî**”³⁸³

Di van her du qewlên jorîn de li kêleka motîfa dînî, Xidir, motîfên dînî yên wekî Şêx Adî, firwar, Melkê Faxirî, kase, Qetanî jî di bawerîya êzdyatiyê de motîfên girîng in.

Di berhevoka Xeyrî Şengalî ya ku ji herêma Şengalê hatiye berhevkirin de, di *Qewlê Bav û Kur* de Xidir û Ilyas wiha derdikevin pêş me:

³⁸¹ J.11., Pêvek 3.

³⁸² P. G. Kreyenbroek-X. C. Reşow, *Tanrı ve Şeyh Adi Kusursuzdur*, r. 681.

³⁸³ H.b., r. 150.

*“Ew derwêşê minî xas e
Bi saya yar û bira vexwarî kase
Qes dikir çû dîwana **Xidir û Ilyas e**
Xidir û ya Xidirî
Li Derwêşê Adem fikirî
Xidiro bira durra ji me re bînin
Ji behrê ezîm in
Heke izzetî Şêxadî serê min ser Kela Xurestanê datînin
Ey Xidir wî we dibêye
Tirsa bû ji xofa Xudê ye
Bi çengilê Derwêş girt tasmîl kire behrê ye”³⁸⁴*

2.3.1.3.2. Di Vegotinên Gelêrî Yên Êzîdiyan De Motîfa Xidir-Ilyas

Ji bilî metnên dînî, di vegotinên gelêrî yên êzîdiyan de, bi taybetî di destan û çîrokên hevpar de ev motîfa dînî bi berbelavî derdikeve pêş me. Di varyanta Destana Memê Alan, ya ku ji aliyê Dawid Mirad Xetarî ve ji devera Şêxanê hatiye berhevkirin, Xidir û Ilyas her tim di qedera Memê Alan de rolên girîng dilîzin. Di van versiyonan de, li cihê ku behsa ‘firwara ji xwedê’ bê kirin, Xidir û Ilyas di vê rolê de derdikevin pêş.

*“Piştê du sala, Xudê Teala îrade kir, **Xidir Ilyas û Xidir Nebî**, Zîn sêrandin, înan ser ciyê Memoyî. Memo şiyar bû, dît ev keçeke wa li ser ciyê wî. Memo gotê: Ya keça qenc, tu çi dikey li ser ciyê min?”³⁸⁵*

Di heman versiyonê de dema ku Memo qesta bajarê Cizîrê dike lê lingên Borê wî birîndar in, dîsa Xidir Ilyas derdikeve pêş û derdê wî derman dike.

*“Wê şevê **Xidir Ilyas** perê qudrêtê di lingên Borê da û sip û sax kirin û du xalxalên zêrîn di lingên wî kir.”³⁸⁶*

³⁸⁴ X. Şengalî, *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre, Bergî Yekem*, r. 33.

³⁸⁵ D. M. Xetarî, *Mem û Zîn*, r. 33.

³⁸⁶ H.b., r. 40.

Di heman berhevokê de di versiyona Şengalê de jî, di pevgihîştina Mem û Zînê de rola Xidir û Ilyaz li dar e.

“Xelatên me dua ne

***Xidir Ilyas û Xidir Nebî** xewasên binê behra ne*

Ez duayekê dixwazim ji mîrekê qadirê rehman e

Roja vî tîfalê min dane bi heyvan e

Heyva wî min dane bi salan e

Sala wî bi çarde salan e

Bêzarvan dibêjit: Şalûlvanê Qemervanê

Rast e em in horiyên asmana

Xelatên me dua ne

***Xidir Ilyas û Xidir Nebî** xewasên binê behra ne”³⁸⁷*

Di vê mînakê de tîkiliya di navbera Xizir û behrê de derketiye pêş ku ev di baweriyên kevna û baweriyên elewîtiyê de jî bi vî rengî ye. Di heman berhevokê de di versiyona Şengalê de cardî Xidir û Ilyas derdikevin pêş me.

*“Ê dibêjin ciwamêra gotiye: Ne me ji dilê xwe çêkiriye. Deqayê **Xidir Ilyas û Xidir Nebî** lê hazir bûn. Qeydê ji lingê Bozê Rewan vekir, Memo mecbûr kir, Memo rabû.”³⁸⁸*

Di xebata Joyce Blau de, ku li herêmên Sincarê, li nava êzîdiyan hatiye kirin, di varyanteke hîkayeta *Aşiq Xerîb* de, motîfa Xidir Ilyas derdikeve pêş me:

“Êdî nesîb û qismetê mi li vê derê li ba wa jî nîne

*Û belê tembûreke li **Aşiq Xerîb** û **xerîb ketîne tîne***

Ewa li ser çoka xwe da tîne

Û belê gava destê xo lê dixîne

*Û îznê ji **Xidir Elyas** xwestîne*

Û belê aşiq li vê dîlanê saz da nîne

*Bi çardê rêza dîlanê li ber **Aşiq Xerîb** kamilîne û digerîne*

*Belê **Aşiq Xerîb** sih û heşt rojan û danekî lê dixîne*

*Mi'ada **Aşiq Xerîb** û **Şahsenem** ji xeyr roj û danekî li ber çêl rojîne mayîne*

³⁸⁷ H.b., r. 78.

³⁸⁸ H.b., r. 11.

Û mi dî li bajarê Bexdayê bû gormîne”³⁸⁹

Di xebata Xeyrî Şengalî de, di versiyoneke Destana Siyabend û Xecê de, ku ji deverên êzdiyên Şengalê hatiye berhevkirin, Xidir û Ilyas di çend deran de derdikevin pêş me ku ev rewş di versiyonên deverên kurdên misliman de nayê dîtin. Di vê versiyonê de dema ku Siyabend hê biçûk e û bi navê Gurî tê nasîn û mamê wî ji ber giliyên gundiyan mecbûr dimîne wî biqewirîne, *Xidilyas* derdikeve pêş Siyabend.

*“Li çolê ma.... **Dua Xidilyas li me û guhdara bî, Xidilyas çû ser lêda**, sax kir, go: Mi heft sal qetil da destê te. Guhê te li te bî. Taliyê mi kuştina te bi destê heywanekî çolê anî.*”³⁹⁰

Di heman versiyonê de dema ku Siyabend keça Hesên Axa li ser kaniyê dibîne û jê tasek av dixwaze, motîfa *Xidilyas* dîsa derdikeve pêş me.

*“Cêr ji milê keçikê girt û avê bi ser xwe ve kir, vexware û cêr şikênand. Go: **Ez banê Xidilyas dikim**, ramûsana te bi pûl û pere bikeve ber piyê mi, ez ji erdê hilnegirim.*”³⁹¹

Di xebata berhevkarî ya Îdrîs Farqînî de ku ev ji herêmên êzdiyên Şengalê hatine berhevkirin, di çîroka *Heseno û Xezalê* de, *fermanek li Şengalê radibe* û Hafîz Paşa bi ser Şengalê de tê.

“Fermanekê li Şengalê rabû Hafîz Paşa. Hafîz Paşa sefer kêşa ser êzdiya ser Çiyayê Şengalê. Çiyayê Şengalê revî kete Sûrî, hin derbasbûn ketine tirka. Camêrên êkûdû nas bikirana, rêbiwarî hebû û êzdî û misliman êkûdû dihewandin.”³⁹²

³⁸⁹ Joyce Blau, *Tekstên Folklorîk Ên Kurdên Îmadiye Û Sincarê*, Libarie C. Klincksieck, 1975, Paris, r. 180.

³⁹⁰ X. Şengalî, *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre, Bergî Yekem*, r. 189.

³⁹¹ H.b., r. 192.

³⁹² Î. Farqînî, *Bi Zarê Êzdiyan Çîrokên Gelêrî*, r. 28.

Heseno û Xezalê jî ji ber eskerên Hafiz Paşa direvin lê mecbûr dimînin zarokên xwe li Çiyayê Şengalê tenê bihêlin. Hingê Xidir digihîje zarokên wan û nanê germ dide wan.

*“Û ew û Xezal man hetaka bû êvar. Îvarî herduka da rê û hat. Hatine ba zarokê xwe ke nêrîn wa nanekî germ li ba herduka. Gotinê: Kê ev nan da we? Zaroka go: **Navê êkî Xidir bû**, hate ba me go metirsin. Ew nanê germ ji me ra anî û go metirsin ê dê û babê we wê ên. Berî cixarevexwarekî li vir bû ji ba me çû.”³⁹³*

2.3.1.4. Sur

Sur yek ji wan têgihan e ku îşaret bi batinîbûna baweriya êzdiyatîyê dike. Ev têgih di nava sîstema dînî ya êzîdîyan de ne hêmaneke esasî ye lê dîsa jî di pêwendiyêke dînî de tê bikaranîn. Her wiha wekî ku di têgiha Xidir de jî derkete pêş me, ev jî yek ji têgihên hevpar e di navbera baweriyên elewîti, yarsanî û êzdiyatîyê de. Lê wateya surê ya di nava baweriya êzdiyatî û ya di nava baweriya elewîtiyê de wekî ku di mînaka Xidir de jî derketibû pêş me, ne bi heman rengî ne.

2.3.1.4.1. Di Nava Termînolojiya Dînî Ya Êzdiyatîyê De Sur

Di nava çanda dînî û çanda devkî ya êzîdîyan de, yek ji motîfa ku bi baweriya elewîtiyê re hemaheng e *sur* e. Elewiyên kurd vê têgiha dînî-çandî wekî *sir* telafuz dikin lê êzîdî wekî *sur* telafuz dikin. Ji aliyê wateyê ve di navbera wan de nuansê heye. Di her du baweriyên de jî ew bi piranî di wateya nehênîbûnê de tê bikaranîn ku ev yek taybetmendiyeke girîng ya baweriyên batinî ye lê di qewl û vegotinên gelêrî yên êzîdîyan de *sur*, carina bi wateyêke firehtir derdikeve pêş me ku em ê mînakên vê ji metnên wan yên dînî û gelêrî nîşan bidin. Xana Omerxalî di pêwendiya baweriya êzdiyatîyê de, ji bo têgiha surê wiha dibêje:

“Sur: Sir, raz. Yek ji termên bingehîn ên dînî ên tradîsyonên êzdî û ehlê heq e.”³⁹⁴

³⁹³ H.b., r. 29.

³⁹⁴ Xana Omerxalî-Kovan Xankî, *Analîza Qewlên Êzdiyan*, Weşanên Avesta, Çap I, 2009, Stenbol, r. 96.

Wekî ku em ji vê ravekirina Omerxalî jî têdigehe, ev têgih ne bi tenê aydê baweriya êzdiyatîyê ye. Ew di nava tradîsyona dînên ehlê heq de cih digire ku elewiyên kurd û yaresanên kurd jî di nava vê tradîsyonê de cih digirin.

Kreyenbroek jî têgiha surê ji bo baweriya êzdiyatîyê girîng dibîne.

“Ji bo van heyinên pîroz, yezîdî herî zêde têgihên xas; ‘yê taybet’, sur; ‘nehênî-batîni’ û babçak; ‘bavê baş’ bi kar tînin. Ya rast digel ku hemî heyin bi navên xwe yên dewra Şêx Adî ya veguhaztina rûhî têne zanîn jî, tê zanîn ku di dewra afîrîne de hin ji vanan an jî hemiyên wan xwedî navên cuda bûn. Dibe ku tabîra surê, ji bo heft melekên (heft sur) ku xwedê rûh daye wan hatibe bikaranîn.”³⁹⁵

Li dû nêrîna Kreyenbroek, bikaranîna vê têgihê di nava êzîdiyan de di çend kontekstan de derikeve pêş me û wateya wê bi piranî, raz an jî nehênîbûn be jî, ne zelal e. Ew bi piranî ji bo heyinên pîroz yên di dînê xwe de têgihên wekî xas û sur bi kar tînin.

“Ji ber ku têgiha surê ji bo her hêmana, ku di xwezaya wê de razek heye tê bikaranîn, ne pêkan e ku mirov di vê têgihê de zelaliyek çêbike.”³⁹⁶

Ev têgih îşaret bi batinîbûna baweriyê dike û di heman demê de ji aliyê civakî ve, ji ber mînorbûna wê civakê jî, îşaret bi pêdiviya xweparastina komê ya ji komên serdest jî dike. Ji xwe di metnên folklorî de bi piranî bi vê kontekstê derdikeve pêş me.

Lêkolerên êzîdî têgiha surê bi piranî di nava sîstema dînî ya êzdiyatîyê de rave dikin û îşaret pê dikin ku ew taybet e bi baweriya êzdiyatîyê. Folklornas Kovan Xankî li ser têgiha surê wiha dibêje:

“Sur ev e; ew quwet, ew hêz ya ku bi kesekî derwêş re heye, bi kesekî normal re nîne. Lewma jî em ji bo derwêşa dibêjitine xas. Ji ber çî tiştî, ji ber ku sur hene û keramet hene. Yanê ew hindek tiştan karin bikin, kesên normal nikarin bikin.”³⁹⁷

Lêkolerê çand û dîroka êzdiyatîyê Arshad Hamid Miho li ser têgiha surê wiha şîrove dike:

³⁹⁵ P. G. Kreyenbroek-X. C. Reşow, *Tanrı ve Şeyh Adî Kusursuzdur*, r. 37.

³⁹⁶ H.b., r. 37.

³⁹⁷ J.9., Pêvek 3.

*“Sur, ew jî bi aliyê dînî ayînî ve ye. Ew dibêjin sura Tawisê Melek, sura Şêx Hadî. Yanê keramet. Di bisilmanetiyê de dibêjin teqwa û mucahid. Muqabila wan e. Zîrekiya ayînî ye. Kerama Xwedê ye.”*³⁹⁸

Lêkoler û folklornas Xeyrî Bozanî ji aliyê xwe ve şîroveyeke cuda li ser vê têgihê dike. Li gorî wî; êzîdî di şûna têgiha îslamê de ‘busurman’ dibêjin ku ev yek tê wateya bê sur man, yanê ji ‘surê’ mehrûm man. Telafuza misliman wekî busurman an jî surman di gelek metnên êzîdiyan de derdikeve pêş me.

*“Ev e li gor felsefa dînê êzdiyan dibêjin berê Xwedê yekem car durek çêkir. Ji wê durrê dunya hemû peyda bû. Îca behra wê durrê ketiye insan da jî. Her însanekî surrek di eniya wî de ye. Sur zêde wekî karîzma têt bikaranîn. Her însanekî, hindek ji heybeta xwedê, hindek ji wê surê gihîştîyê. Îca wextê ku karên baş dike, sura wî gelek zêde dibit di nava insanan de û xelk çavê xwe bi başî didinê. Ku hindek karên xirab bike, hingê sura wî kêr dibe di nava xelk de, heybeta wî kêr dibe. Lewma jî gotinek heye, dibêjine êzîdî nabêjin îslam, dibêjine busurman. Busurman ew e yanê ku bê sur man. Yanê sur li ba wan nema wexta ku ola xwe guhartî.”*³⁹⁹

Di *Qewlê Afîrîna Dinyayê* de, têgiha surê wiha derdikeve pêş me:

“Xudavendê me rehmanî

Kasa surê ji Adem ra anî

Av ji kasê vexwar, vejiya

*Cîda mest bû, hejiya”*⁴⁰⁰

Di qewla jorîn de *Kase, Sur û Adem* di heman risteyê de hatine bikaranîn ku di mîtolojiya êzîdiyan de cihê wan girîng e. Di baweriya êzdiyatîyê de, li kêleka bikaranîna berbelav ya têgiha surê, di hin metnan de em lê rast tînin ku têgiha *heft sur* tê bikaranîn. Ev *heft sur*, ji heft şexsiyetên pîroz yê êzdiyatîyê re tê gotin ku ev in: *Şêx Şemsedîn, Şêx Fexredîn, Şêx Sacedîn, Şêx Nesredîn, Şêx Hesên, Şêx Adî û Melekê Tawis*.⁴⁰¹ Di *Qewlê Afîrîna Dinyayê* de *heft sur*, wiha derdikeve pêş me:

“Nîveka Adem û heft sur zor tixûbe

³⁹⁸ J.10., Pêvek 3.

³⁹⁹ J.11., Pêvek 3.

⁴⁰⁰ P. G. Kreyenbroek-X. C. Reşow, *Tanrı ve Şeyh Adî Kusursuzdur*, r. 120.

⁴⁰¹ H.b., r. 37,58, 60.

Heft sur geriye, hate hindave
Qalibê Adem mabû bê gave
Go, ruho çima naçî nava

Xudawendê me îni kir esase
Şembî kir kirase
Çarşemê kir xilase
Hevsed sal paş **heft sur** hat duran û kase⁴⁰²

Di Duaya Ziyaretbûnê de têgiha surê wiha derdikeve pêş me:

“Emê ziyaret biken wan xelata

Surra Lalişê ji jor dihate

Pê zeyinî çiqas kinyate

Mêra ji ber bir maş û berat û xelate⁴⁰³

Di vê mînakê de sur dîsa bi têgiha pîroz ya lalişê re bi hev re hatiye bikaranîn. Di heman xebatê de, di *Çîroka Pêdabûna Sura Êzî* de, Sultan Êzî, an jî bi navê dî, Yezîd bîn Muawiye, ji aliyê diya xwe ve tê veşartin û heya ku wextê wî tê ew derdikeve meydanê û sura xwe aşkera dike.

“Gotê: Ezîzê min çî muqdare

Wekî sura heqî hate diyare

Min nekarî serî xo di bangî nekire

Got: Heke min **keramet û batin** dît, hola **Tawusî Melek** e⁴⁰⁴

Di vê mînakê de li kêleka surê, têgihên mîna Tawusî Melek û batin jî hatine bikarînin ku ev jî di nava sîstema dînî ya êzdiyatîyê de xwedî girîngî ne.

Di Qewlê Şêşims de têgiha surê bi vî rengî derdikeve pêş me:

“Çendî teyr difirin

Per û baskêt xo dinêrin

Ew jî li ba Şêşims bi surin⁴⁰⁵

Di beyta nesîhetê de sur, bêtir di wateya nihênîbûnê de derdikeve pêş me ku ev yek wê nêzikî wateya wê ya di nava elewîtiyê de dike:

⁴⁰² H. b., r. 119-120.

⁴⁰³ H.b., r. 150.

⁴⁰⁴ H.b., r. 242.

⁴⁰⁵ H.b., r. 359.

“Sura mekin aşkîra

Da teraşê ne ûman

Erzankar û xebersar”⁴⁰⁶

Di xebata Xeyrî Şengalî de, di *Qewlê Bab û Kur* de sur û dur bi hev re derdikevin pêş me ku her du jî di termînolojiya dînî ya êzîdiyan de girîng in.

*“Hey derwêşê mino îna **dure***

*Ji wan **dure** helgirtibû sê **dure***

*Dane destê Mîrê Xurestanê bi **sure**”*⁴⁰⁷

Di heman berhevokê de di hikayeta Şemsanî de, têgiha surê wiha derdikeve pêş me:

*“Li wê wextê koçer bûn, cuhtyar bûn, koçek û şikestî û keremdar hebûn. Şêşim ciwamêr digotinê (mala mezin), wextê deng bi Şêxadî ket, Şêşim bihîst. Pa **sur û keramet** hebûn. Herduka **surê** êk û du nas kirin. Şêşim qesta Lalişê kir hate ba Şêxûbekir.*”⁴⁰⁸

2.3.1.4.2. Di Vegotinên Gelêrî Yên Êzîdiyan De Motîfa Surê

Di çîrok û destanên ku ji zarê civaka êzîdî hatine gotin de, tê dîtin ku bi gelek munasebetan têgiha surê hatiye bikaranîn. Ev yek bingeha xwe, wekî ku me li jorê jî da nîşan, ji cihê wê yê dînî di nava vê baweriyê de distîne. Di xebata Celîlê Celîl û Ordîxanê Celîl de, di hikayetên *Rostem* de, têgiha surê derdikeve pêş me lê ne diyar e ku di çi wateyê de hatiye bikaranîn:

*“Mesîhan gazî cimeta xwe kir. Wezîr, wikalet, şêxul-îslam, sedirezem, **ehlê surê**, meclîs kubar kirin.*”⁴⁰⁹

Di heman xebatê de, di *Poêziya Mem û Zînê* de, dema ku Mem dikeve zindanê, Zînê, ji mala xwe heya cihê ku Mem lê dimîne kunek dide çêkirin û dixwaze ku ev wekî sur bimîne.

⁴⁰⁶ H.b., r. 527.

⁴⁰⁷ X. Şengalî, *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre*, Bergî Yekem, r. 34.

⁴⁰⁸ H.b., r. 51-52.

⁴⁰⁹ C. Celîl-O. Celîl, *Zargotina Kurda II*, r. 110.

“Gelî bira, hûn ji koçka min heta zîndana Memê min tê da gere rêke binerd çêkin. Çiqas zêr bixwazin ezê bidime we lê tenê hûn zû bikin, usa jî **sura min**, çewa xuşka xwe, kesî ra nevêjin.”⁴¹⁰

Di heman xebatê de, di heman varyanata *Mem û Zînê* de, dema ku aşkera dibe ku qîza Beko ya bi navê Zîn, ne Zîna rastîn e, ev têgih dîsa derdikeve pêş me.

“Qîza Bekoyê Ewan, wexta dît, **wekî sura wê dîhar bû**, dizgîna Borê Memê berda, go: Memo, wekî tu Zînê bivî, tuyê min jî bivî çewa cariya Zînê?”⁴¹¹

Di berhevoka Dawid Mirad Xetarî de, ku ji sê versiyonên Mem û Zînê pêktê û ji herêma Şengalê hatine berhevkirin, têgiha sirê di *Destana Mem û Zînê* de derikeve pêş me. Dema ku Mîr tevê mahiyeta xwe diçe nêçîrê û Mem û Zîn, li baxê torkirî yê koşkê hev dibînin, pêşî Badîn Çawiş tê wan dibîne.

“Memo dibêjit:

*Badîn Çawiş **sur** li balo*

*Tu li min û vê **surê** bikî sitaro*

Dê minetekê li min key

*Li ba **Melekê Cebaro***

*Li min û vê **surê** bike sexbîr*

*Dê minetekê li min key li ba **Melekê Cebîr**”⁴¹²*

Di vê pasaja jorîn de tê dîtin ku çawa têgiha surê bi pîroziyek mîna Melekê Cebar re bi hev re hatiye bikaranîn. Li vê derê Melekê Cebar, di wateya Melekê Tawis de ye.

Di xebata Heciyê Cindî ya bi navê *Folklorê Kurmanciyê* de, di versiyona Mem û Zînê de ku ji herêma Êrîwanê ji zarê êzîdiyan hatiye berhevkirin, têgiha surê wekî heman epîzota jorîn, wiha derdikeve pêş me:

“*Badîn çawiş çû der da*

Selam da Memê bi ser da

⁴¹⁰ H.b., r. 41.

⁴¹¹ H.b., r. 34.

⁴¹² D. M. Xetarî, *Mem û Zîn*, r. 49.

*Dît Memê paldaye Zînê di ber da
Memê go: Here çawîşo **sur** li balo
Herça vê **sura** min bike sitaro
Minetê dike li yekê **cebaro**”⁴¹³*

Di vê epîzotê de, têgiha surê, di heman konteksta, epîzota jorîn de hatiye bikaranîn. Di heman varyanta destanê de, di kêliya ku Tacdîn ji bo ku Mem û Zînê xelas bike, mala xwe dişewitîne, têgiha surê dîsa derdikeve pêşberî me.

*“Memê çû gihîşte agir û xênî, dîna xwe dayê wê agir xênî ketiye, cindiyêd Cizîrê tijî ser xênî bûne, ji tirsra Qeretajdîn vî alî, wî alî direvin, diçin û tèn. Memê go: Welle, ez ê du giliyan bêjime agir, herkê ez **maşoqê surê** bim, agirê vêse, lê ne maşoq bim, xwe ya min û Zînê derew e, go.”⁴¹⁴*

Di vê versiyonê de, di epîzota mirina Zînê de jî têgiha ‘*maşoqê surê*’ derdikeve pêş me.

*“Zînê ji Mîr re go: ...Ez zanim Qeretajdîn ê bê û tirba me veke, hergê te dît berê xwe yî hev daye, xûdanê zîpik zîpik ser me ra avîtiye, xwe bizanibe em **maşoqê surê** ne. Lê wekî usa nebû, gunê min li sitûyê te be, tê cinyazê me bavêjî çolê.”⁴¹⁵*

Di van her du mînakên jorîn de, têgiha surê, ji mînakên dî cudatir, di nava wateyêke tesewûfî de hatiye bikaranîn. Di *Destana Ferxê û Sitiyê Ala* de jî di heman kontekstê de ev têgih hatiye bikaranîn.

*“Bêrîvanêd wan tune bûn. Pez ê hema xwe bi xwe bikişiya, bihata bêriyê. Ferxê jî wê serî bigirta. De **aşiqê surê** bûn; de wê laqirdî hevdu bikirana, wê bê menî hev ramûsana.”⁴¹⁶*

Di heman vegotinê de bi heman wateyê dîsa têgiha ‘*aşiqê surê*’ derdikeve pêş me:

⁴¹³ H. Cindî, *Folklor Kurmanciyê*, r. 46.

⁴¹⁴ H.b., r. 50.

⁴¹⁵ H.b., r. 60.

⁴¹⁶ H.b., r. 122.

*“Îja em herin ser Sitiya Ala. Sitiya Ala ji kerba dergistiyê xwe kete koçikê, derî li ser xwe girt, pêşê wê şev û ro girî bû. De **aşiqê surê** ne, go: Gelo ez çawa bikim, Xwedê, ku çavên min çavên dergistiyê min keve.”⁴¹⁷*

Di van her du mînakên de, têgiha aşiqê surê dîsa di nava konteksta dînî-tesewûfî de hatiye bikaranîn. Di destanê de, di epîzoteke dî de têgih vê carê bi rengê ‘sura evînê’ derdikeve pêş me.

“Sitiya Ala hate pêşiya wan go:

Birê min î mezin î, çîqa aqilî kemal e

***Sura evînê** wê li bal e*

Go, Ferxê nekujin boy xatirê xûşka xwe Sitiya Al e”⁴¹⁸

⁴¹⁷ H.b., r. 127.

⁴¹⁸ H.b., r. 125.

BEŞA SÊYEM

3. ANALÎZ Û BERAWIRDKIRINA HIN METNAN DI KONTEKSTA BAWERİYÊN ELEWÎTÎ Û ÊZDIYATIYÊ DE

Di vê beşê de em ê li derdora hin metnên helbijartî, bala xwe bidine avaniya (structure) vegotinan ku li wê derê çawa epîzotên an jî temayên dînî-bawerî tevî vegotînê dibin. Ji bo ku em xwe ji bêserûberiya metnan rizgar bikin û teza xwe dirêj nekin, em ê çend metnên helbijarî deynin pêş xwe ku ev metn li piraniya herêmên kurdan tên zanîn. Ev metn bi vî rengî ne:

1. Çîroka Elik û Fatik
2. Efsaneya Şahêmar
3. Destana Zembîlfiroş
4. Destana Kela Dimdim
5. Destana Derwêşê Evdî û Edûlê

Sedema helbijartina van metnan ev e ku me xwest ku em miqayeseyê tenê bi cureyek wekî çîrok an jî efsaneyê bi sînor nekin. Lewma me hem cureya çîrokê hem efsaneyê hem jî destanê kir mijara vekolîna xwe. Zembîlfiroş jî digel ku bi piranî wekî destan hatibe binavkirin jî, di eslê xwe de ew hikayeyek dînî-evînî yel Lewre ew jî ji aliyê cureya xwe ve cureyek taybet e. Di çîroka Elik û Fatik de hem li herêmên ku em lê geriyan (Dêrsim; Perte-Mazgîrd) hem jî di xebatên ku li vê sehayê hatine kirin, me dît ku ev çîrok di nava kurdên elewî de baş tê zanîn. Her wiha li jêrê em ê di analîza xwe ya li ser çîrokê de jî nîşan bidin ku ew vê çîrokê di çarçoveya bawerîya xwe de ji nû ve însa dikin, di hin nuqtayan de di navbera vê çîrokê û serboriya Hz. Elî û Hz. Fatima de analojiyekê çê dikin. Her wiha di nava metnên ku me miqayese kiriye de ew temsîla cureya çîrokê dike. Gelek çîrokên di yên hevpar wekî Pepûg, Gur û Rûvî, Bejin Bostik/Mîrze Miheme li vê herêmê hebûn ku me karibû bikira mijara miqayeseyê lê hingê dê di teza me de bêserûberiyek peyda bibûya. Lewma wekî cureya çîrokê me xwe bi vê bi sînor kir.

Di nava cureya efsaneyê de, me Efsaneya Şahêmaran helbijart. Efsane ji ber ku di wan de taybetiyên herêmî û dînî zêde ne, zehmet e ku efsaneyên hevpar di navbera civakên etno-dînî de bêne tesbîtkirin. Lê Efsaneya Şahêmaran yek ji wan

efsaneyan e ku li gelek herêmên dî jî tê zanîn. Ev yek jî derfetê dide me ku em wan bi hev re miqayese bikin.

Hîkayeta Zembîlfiroş jî digel ku di roja îroyîn de li herêmên kurdên elewî bi qandî ku me tesbît kir, nayê zanîn jî, ji xebatên ku nêzî sedsal berê li herêmên kurdên elewî hatine kirin em rastî metna wê hatin. Her wiha ev hîkaye bi gelek versiyonên xwe di nava civaka kurdên êzîdî û kurdên sunî de jî baş tê zanîn. Lewre ji bo miqayeseyê derfetek baş dide dest me.

Her du vegotinên dî, Kela Dimdim û Derwêşê Evdî û Edûlê, wekî cure destan in. Di nava destanên civakên kurd de ev her du destan ji ber ku tema û mijarên wan bi piranî nakokiyên bi civakên derveyî re dihundurîn in, di wan de cî bi cî bêjareke netewî an jî etnîk derdikeve pêş me û ev yek derfetê dide me ku em di versiyonên wan yên di navbera komên etno-dînî de li gorî qebûlkirin an jî redkirina vê bêjara etnîk-netewî şîroveyê li serê bikin. Lê di van her du cureyan de em ê miqayeseyê di navbera civaka kurdên êzîdî û kurdên misliman de bikin. Lewre em ne di encama xebata xwe ya sehayê de û ne jî di xebatên ku heya niha hatine kirin de di nava civaka kurdên elewî de rastî metna wan nehatine. Sedema vê dibe ku ji ber lewazbûna çanda dengbêjiyê ya di nava civakên kurdên elewî de be jî lewre ev cure yanê destan bi piranî bi navgîniya dengbêjan li parçeyên curbecur yên welat digerin û dikevin nava çanda wan.

Bêguman hê gelek vegotinên gelêrî hene ku di nava civakên kurd de bi rengekî hevpar tên zanîn û li ser wan miqayese di vê çarçoveyê de dikare bê kirin lê ev metnên ku me helbijratine jî bi serê xwe nîşan didin ku metnên hevpar dema ku dikevin sîrkulasyoneke navber-civakî û etnîk, çawa diguherin.

3.1. Çîroka Elik û Fatik/Alik û Fatik

Li seranserê Kurdistanê hin çîrok hene ku, wekî hêmaneke bingehîn ya nasnameya çandî û cografî ya hemî kurdan, li nava hemî civakên kurd belav bûne. Tu sînorên cografîk an jî çandî li pêş wan nebûye asteng lê li gorî çand û baweriyên herêmî tûşî hin guherînan bûne. Bi curbecur navên cuda, çîrokên Mîrze Miheme, çîrokên li ser Mala Zalê û çîrokên mîna Şengê û Pengê, Pepûk, Hebhinarikê, Kunderikê, Elik û Fatik çîrokên bi vî rengî ne.

Di vê beşê de em ê di vê konteksta dînî-bawerî de, li ser çîroka Elik û Fatik bisekinim û di navbera çend metnên ji deverên cuda de miqayeseyê bikin. Varyantên ku ez ê li ser wan bisekinim, du jê bi navê Alik û Fatik, ji herêmên

Pêrtég û Mazgîrda Dêrsimê ne û ji zarê kurmancên elewî hatine gotin. Varyantek ji herêma Ermenistanê, ji zarê kurdên êzîdî hatiye gotin. Varyantek jî ji herêma Êlihê hatiye berhevkerin ku tê de ji aliyê temayên dînî ve hêmanên girîng hene lê ne diyar e ku zarbêj ji aliyê baweriyê ve kîjan komê temsîl dike. Her wiha, varyanteke çîrokê bi navê Cêran, ji herêma Xoresanê jî li ber destê me heye ku em ê cî bi cî ji wê jî mînakên bidin.

3.1.1. Di Konteksta Varyantên Kurdên Elewî û Kurdên Êzîdî De Avaniya Çîrokê

Balkêşiyê girîng di heqê vê çîrokê de ev e ku; ev çîrok li herêmên kurdên elewî pir baş tê zanîn û hema bêje di repertûara hemî çîrokbêjan de heye. Bi ya me sedemeke girîng ev e ku, her çendî ku avaniya wan bi tevahî li hev neke jî, di navbera vê çîrokê û hikayeya Hz. Elî û Hz. Fatima de hevterîbiyek an jî analogiyek tê çêkirin an jî bi rêya vê çîrokê hin kodên bingehîn yê dînî têne neqilkirin, têne bibîranîn.

Di prosesa xwe ya berhevkeriyê de, dema ku min ji çîrokbêjan vê çîrokê guhdarî kir⁴¹⁹, çîrokbêjan bi rengekî balkêş di heqê navên lehengan de bibîrxistineke bi vî rengî dikirin: “Navê xwe Alî û Fatma ne.” Çîrokbêjan, digel ku navê otantîk bi kar dianî jî, di dirêjahiya çîrokê de, di derekê de vê hişyariyê dikirin ku ev yek ji bo wan girîng e. Heman girîngî pê dana bo nav, di varyanta ku ji herêma Semsûrê ji aliyê Mehmet Öncü ve hatiye berhevkerin de jî heye. Di varyanta ku Öncü berhev kiriye de navê çîrokê *Elik û Fatik* e. Lê vebêj li ser navê lehengan wiha dibêje:

“Navê kur Elî bû, navê keçikê Fatme bû. Ji ber xweşikî û biçûkiya wan, bav û diya wan ji lêwik re digot Eliko ji keçikê re digot Fatikê.”⁴²⁰

Di varyanta ku ji herêma Êlihê de hatiye berhevkerin de jî navê çîrokê *Elik û Fatik* e. Di dereke çîrokê de ji bo navê lawik, *Elik* na lê *Elî* tê gotin.

⁴¹⁹ J.1., Pêvek 1., J.2. Pêvek 2.

⁴²⁰ Mehmet Öncü, *Çîrokên Efsaneyî*, Weş. Nûbihar, Çap I, 2014, Stenbol, r. 314.

*“Fatik hat firaqê xwe şuştin ciyê xwe danîn û go: **Elî birayê**! Ka em herin ser şikêrê.”⁴²¹*

Di varyanta ku me ji herêma Mazgîrdê berhev kiriye de, navê çîrokê *Alik û Fatik* e. Di nîvê çîrokê de, çîrokbêj vê yekê wiha bibîrtîne:

*“Navê xangê Fatik e, navê birê Alik e. **Alî û Fatma**. Alik dibên Fatik dibên da.”⁴²²*

Di varyanata ku ji aliyê Hilmi Akyol û Rojîn Zarg ve ji herêma Amedê hatiye berhevkirin de, navê çîrokê wekî *Elo û Fatê* û navê lehengan jî wekî *Elo û Fatê* derbas dibe:

*“Dibê **Elo û Fatê** hebûne. Dibê deheb sebî bûne. Diya wan miriye. Bavê wan şî xwa zewiciye.”⁴²³*

Di varyanta Heciyê Cindî de ku li Ermenistanê ji zarê kurdên êzîdî hatiye berhevkirin, navê çîrokê wekî *Elo û Fatê* hatiye teqdîmkirin û di dirêjahiya çîrokê de leheng wekî *Elo û Fatê* tênê binavkirin.

*“**Fatê** go: **Elo**, te çima ew kax avît? Ne ew çêkirina diya me bû?”⁴²⁴*

Li jorê me ji pênc varyantên cuda yên çîrokê, mînakên bi navê çîrokê ve têkildar, da. Di van her pênc mînakan de, yên ku ji herêmên wekî Amed û Ermenistanê hatine berhevkirin û ji zarê kurdên sunî û kurdên êzîdî hatine qeydkirin, çîrokê wekî *Elo û Fatê* bi nav kirine û ji lehengan re jî *Elo û Fatê* an *Elo û Fatik* gotine. Di du mînakên di yên herêma Semsûrê û Bişêriyê de çîrok wekî *Elik û Fatik* hatiye binavkirin û navê lehengan digel ku *Elik û Fatik* e jî di dirêjahiya çîrokê de qet nebe di derekê de, bi bîra guhdar tê xistin ku navê wan *Elî û Fatime* ye. Di varyanta ku min ji herêma Mazgîrda Dêrsimê ji zarê kurmancek elewî berhev kiriye de, di nîvê çîrokê de, vebêj dibêje ku navê wan *Alî û Fatime* ye. Ev tevlihevî an jî hesasiyeta li ser navê çîrokê û navê lehengan bi hevterîbiya

⁴²¹ Berhevkir: Vildan Sevim, Gotî: Sebriya Dewrêşo, Herêm: Êlih, Bişêrî, Bilêyder, Metna Neçapkirî, 2015, Bişêriyê/Batman, r. 2.

⁴²² J.2., Pêvek 2.

⁴²³ Hilmi Akyol-Rojîn Zarg, *Ji Zargotina Kurdî Çîrokên Gelêrî*, Weşanên Enstîtuya Zimanê Kurdî Ya Amedê, Amed, r. 31.

⁴²⁴ H. Cindî, *Hikayetên Cimeata Kurda VI*, r. 25.

wê ya bi hîkayeya dînî ve girêdayî ye. Lewre ji bo Elewiyan Alî/Elî û Fatima du navên pîroz in û tu car nayê tolerekirin ku navê wan wekî Elo û Fatê bê telafuzkirin. Ev yek di heman demê de bandora baweriyê ya li ser çîrokê jî ispat dike û nîşan dide ku vebêj li gorî herêman tercîheke li dû baweriyê xwe dikin ku ev ne bi zanîn be jî. Bi taybet herêmên elewî di navbera çîroka folklorî û çîroka rastîn ya Hz. Elî û Hz. Fatime de, hevterîbiyekê, analogiyekê çê dikin. Bêguman li herêmên kurdên sunî û kurdên êzîdî telafuzkirina navê lehengan wekî Elo û Fatê, nayê vê wateyê ku ew bêhurmetiyek li hember karakterên dînî dikin. Li vê derê wekî şîrove em dikarin bibêjin ku belkî ew di nava çîroka folklorî û hîkayeta dînî de hevterîbiyê çênakin. Lewma bi hesasiyet li ser navên lehengan nasekinin.

Lehengên Çîrokê

Di çîroka Elik û Fatik de, ji aliyê lehengan ve li kêleka neguhêrbariya di lehengên mîna Elik/Alik, Fatik, Dê û Dêmarî/Amojin, li gorî varyantan di lehengên çîrokê de guherîn jî çê dibin. Çîrok bi piranî bi temaya kêmaniyê yanê mirina dê dest pê dike.⁴²⁵ Ev tema di hemî varyantan de hevpar e. Bi tenê di varyantekê de hem dê û hem bav dimirin. Tabloya lehengan li gorî varyantan bi vî rengî ye:

Elik û Fatik: Di hemî varyantan de navê wan Elik, Alik, Elo û Fatik, Fatê ye. Bi tenê di varyanteke vê çîrokê ya herêma Xoresanê de, çîrok bi navê Cêran hatiye qeydkirin û digel ku çîrok heman çîroke jî, digel ku herka bûyera bi heman rengê varyantên dî û bi taybet bi heman rengê yê ku me ji herêma Dêrsimê qeydkirine ye jî, navê lehengan tune ye. Bi tenê wekî du zarok an jî xwang û bira hatiye behskirin.

Dê: Di hemî varyantan de diya lehengan dimire.

Dêmarî: Di piraniya varyantan de, dêmarî derdikeve pêş me. Bi tenê di hin varyantan de ew ne wekî dêmarî lê wekî jinapê derdikeve pêş. Di varyanta ku me ji herêma Pêrtégê berhevkiyê de dêmarî tune ye lê amojin heye. Ev leheng di çîrokê de çî bi rengê amojin û çî jî bi rengê dêmarî, navenda hemî xerabî û dînamîzma çîrokê ye. Çîrok li dû aksiyonên wê şêkil digire û kirinên wê qedera Elik û Fatikê diguhêrin.

⁴²⁵ Temaya kêmaniyê di çîrokan de wekî destpêk temayeke gelek berbelav e û di analîza fonksiyonên çîrokan ya Propp de jî cih digire.

Bav: Li gorî piraniya varyantan bav namire lê ji nû ve dizewice. Di hin varyantan de bav û dê tev dimirin û zarok dimînin li ber destê ap û amojinê. Di varyantên ku dê dimire û bav dimîne de, bav heye jî lê wekî ku tunebe, tu hukmê wî li ser geşedana bûyeran tune ye. Bi tenê dêmarî aktîf e. Di varyanta ku min ji herêma Mazgîrdê berhevkirî de wiha derbas dibe:

“Heye tune, xangik heye birakik heye. Diyê xwe mirine sêwî mane. Damarî xwe heye.... Dê bûye damarî, bav jî bûye bamarî.”⁴²⁶

Di varyanta ku min ji herêma Pêrtégê berhevkeriyê de wiha derbas dibe:

“Hewuye tunewuye xang û birakî hewune. Navê keçikê Fatik bûye, navê lîwik Alik. Dê û bavê wan mirine, ew mane sêwî, ketine ber destê apê wû amojinê.”⁴²⁷

Di varyanta herêma Bişêriyê de, destpêka çîrokê hinek cuda ye. Di vê varyantê de, dê beriya ku bimire, li mêrê xwe wesiyet dike ku, destê wê jê bike û ku jinek ji xwe re anî, jinek bi destê wê li zarokên wê bixe.

“Û sal û zeman tê de derbas bûn, go, mêrik ji xwe re jinek anî.”⁴²⁸

Di varyanta ku Heciyê Cindî berhevkirî de, mêrik piştî ku jina wî dimire, dizewice.

“Emirê Xwedê tê ser jinikê, ew diçe rehetê. Her du zarêd wê dimînin êtîm. Mêrik dinihêre ebûra wan nave, dizewice.”⁴²⁹

Di hemî varyantên mayî de, dê dimire û bav ji nû ve dizewice. Bi qandî ku ji vê rewşê em dibînin, di bingeha çîrokê de, dê dimire, bav dizewice û dêmariyek tevî prosesa çîrokê dibe. Ev yek di heman demê de hevterîbiyê bi çîroka rastîn ya Hz. Elî û Hz. Fatme re jî nîşan dide. Li wir jî Hz. Hatîce, wefat dike, yanê diya Fatima wefat dike û piştî wê Hz. Pêxember bi Hz. Ayşe re dizewice. Yanê Hz. Fatima xwedî dêmarî ye. Lê li vê derê rewşeke balkêş heye ku di hikayeta dînî de Hz. Ayşe her çendî dêmariya Hz. Fatima be jî, di rastiya de ew hema bêje hevsal in. Heta belkî Hz. Ayşe ji Hz. Fatima biçûktir be jî. Lewre di vê mijarê de rîwayetên cuda hene. Dibe ku ji ber vê hindê be ku di çîrokê de karakterek bi navê Eysîk heye ku ew ne wekî dêmariya Fatikê lê wekî qîza dêmariyê tê nasandin.

⁴²⁶ J.2., Pêvek 2.

⁴²⁷ J.1., Pêvek 1.

⁴²⁸ Berhevkar, Vildan Sevim, Gotî: Sebriya Derwêşo, Herêm, Bişêriyê/Batman

⁴²⁹ H. Cindî, *Hikayetêd Cimeata Kurda VI*, r. 23

Eyşik: Her çendî di hemî varyantan de nîn be jî di hin varyatnên Çîroka Elik û Fatik de, karakterek bi navê Eys an jî Eyşik derdikeve pêş me ku ev jî di heqê simbolîzma çîrokê de, fikrên ku di vê xebatê de em pêş dixin têkûztir dike. Lewre di çîrokê de, Fatik û Eyşik wekî du karakterên dijber xuya dikin. Ê di çîrokê de Eyşik wekî karaktereke nebaş tezahur dike. Bêguman li vê derê me niyeteke wiha nîn e ku em bibêjin di çîroka rastîn de jî rewşeke bi vî rengî heye. Lê di nava civaka elewî de îmajê Hz. Fatima û Hz. Eyşe ne di heman qîmetê de ye. Hz. Fatima ji bo civaka elewî karaktereke pir girîng e

Di varyanta ku ji Bişêriyê hatiye berhevkirin de, navê qîza dêmariyê Eyşik e. Eyşik bi qandî Fatikê xweşik nîn e lê ew û diya xwe bi hev re bi hîle û dek û dolaban li pêş Fatikê astengiyan derdixin. Hertim karên zor didin ber wê û Elik û eziyetê li wan dikin. Dêmarî, ji Elik û Fatikê re dibêje ku, ew û Eyşik dê herin dawetê û beroşekê dide ber wê û Elik û ji wan re dibêje ku heya ew hatin wê beroşê bi hêsirên çavê xwe tije bikin.

*“Îca jinik û qîza xwe (**Eyşik**) hatin. Her yekê tepek li nava serê wa da. Kete wê ava şor û xwar û xwar. Ê oooxweşşş! Kezeba min hênik bû. Paşê nizane jê ne hêsin in.”⁴³⁰*

Fatik fera şimika xwe di çem de hunda dike. ‘Kurê Mîrê Ereban’, li xwediyê şimika ku, wî di çem de dîtiye, digere. Dêmarî, pêşî dixwaze Eyşik şimikê biceribîne da ku Kurê Mîrê Ereban wê bistîne.

*“Go çûn **Eyşik** ka were li piyê xwe ke. **Eyşik** li piyê xwe da lê nehat. Fatik ka were tu li piyê xwe xe. Fatik hat li piyê xwe xist, ji xwe şimika wê bû û tam bû li gora wê. Mîr go: Temam ez ê vê ji xwe re bînim.”⁴³¹*

Kurê Mîrê Ereban, bi Fatikê re dizewice û zarokek wan çê dibe. Lê dîsa jî dêmarî û Eyşik dev ji Fatikê bernadin. Li ser vê Fatik wiha dua dike ji Xwedê re:

“Ya Îlahî! Tu min bikî çivîkek û ji lepê vê jinikê xelas bikî. Ez ketime bela wê. Va ez xelas nabim. Tu min jê xelas bikî.”⁴³²

Li ser vê duaya wê qebûl dibe û ew dibe çivîkek.

⁴³⁰ Berhevkar, Vildan Sevim, Gotî: Sebriya Derwêşo, Herê, Bişêriyê, r. 2

⁴³¹ Berhevkar, Vildan Sevim, Gotî: Sebriya Derwêşo, Herê, Bişêriyê, r. 2.

⁴³² H.b., r. 3.

Di varyanta Mehmet Öncü de ku ji herêma Semsûrê berhev kiriye, du varyantên Elik û Fatikê hene. Yek jê bi navê Elik û Fatik e û ya dî bi navê Fatik e. Di versiyona ku bi navê Fatik e de, wekî vê versiyona jorîn karakterek bi navê Eys heye. Ev karakter jî bi heman rengî karakterek ne baş e.

“Xwedê zarokek da dêmariya Fatê. Di navbera wê û Fatê de çend sal hebûn, her du bi hev re mezin dibûn. Dêmariya Fatê hemî kincên rindik li keça xwe dikirin, kincên qetî û kevin jî li wê dikirin.”⁴³³

Di vê varyantê de jî her tim di navbera Eysê û Fatê de rikeberiyek heye û dêmarî her tim li aliyê qîza xwe ya rastîn yanê Eysê ye. Lê çawa ku di varyantên dî de jî derdikeve pêş me ku carina hin heyinên wekî çêlek/mange û çivîk dîsa carina diya Fatikê tê xewna wê û wê di heqê hin tiştan de hişyar dike, di vê varyantê de jî pîrikek baş heye ku her tim aliyê Fatikê dike. Pîrik bi rêya sêhrê wisa dike ku Fatik xweşiktir û Eysîk jî nexweşiktir bibe.

*“Dema ku **Eysê**⁴³⁴ dest û çavên xwe bi wê avê şuştin, balûg di rûyê wê de derketin û **Eys** wekî sosretêkê çikos bû. Dema ku vegeriya mal, diya wê li rewşa wê nêrî, şaş û metel ma. Rabû li Fatê da û gotinên nebaş û dijûn li wê kirin.”⁴³⁵*

Di vê varyantê de jî Fatê dizewice û sê kurên wê çêdibin. Lê dêmarî û Eysîk dîsa belaya xwe jê nakin. Dêmarî ji bo ku Eysa xwe bixe dewsa wê, bi sêhrê Fatikê dûr dixê.

*“Dema ku ew dirrî dikevin paş stûyê Fatê, Fat dibe teyrekî, difire û diçe. Dema ku Fatê difire diçe, dêmarî keça xwe **Eysê dike dewsa wê.**”⁴³⁶*

Hiseynik: Di gelek varyantên Elik û Fatikê de, behsa zewaca Fatikê tê kirin her wiha zarokên wê jî çê dibin. Lê bi tenê di varyanta Bişêriyê de, kurê wê bi navê xwe di çîrokê de tezahur dike û navê wî jî Hiseynik e ku ev yek jî ji bo ispata îdîaya me gelekî girîng e. Wekî ku tê zanîn, çawa ku navên mîna Alî, Fatma, Ayşe ji bo elewiyan girîng in, belkî ji vanan bêtir, navê *Huseyin* girîng e ku ew kurê Hz. Elî û Fatima ye û serlehengê *Bûyera Kerbelayê* ye. Ya rast, navê Huseyin, wekî trajediyeke mezin, 1400 sal e ji binheşiya civakên elewî û şîe derneketiye. Lewma di vê çîrokê de tezahurkirina navê wî carek dî nîşan dide ku vebêjên vê çîrokê di

⁴³³ M. Öncü, *Çîrokên Efsaneyî*, r. 374.

⁴³⁴ Berhevkar pîrî caran navê Eys wekî Eş an jî Eşê navê Fatik jî wekî Fat an jî Fatê nivîsiye.

⁴³⁵ M. Öncü, *Çîrokên Efsaneyî*, r. 375-376.

⁴³⁶ H.b., r. 377.

navbera vê çîroka folklorî û hîkayeya rastîn ya Hz. Fatime de, hevterîbiyek çê dikin.

Li gorî varyanta Bişêriyê, piştî ku Fatik ji Xwedê dixwaze ku wê bike çivîkek, duaya wê qebûl dibe lê li aliyê dî, Eyšik dikeve şûna wê û êdî qedera kurê wê yê bi navê Hiseynîk jî di destê Eyšikê de ye. Di vê varyantê de jî çawa ku di hemî varyantên dî de derdikeve pêş me, mêr an jî bav yanê di asta pêşîn de bavê Elik û Fatik, di asta duyem de mêrê Fatikê hema bêje tu çalakiyeke wan tune ye. Her tim di roleke pasîf de, wekî ku jin çawa li wan ferz bikin, ew jî wisa qebûl dikin. Ev jî aliyê balkêş yê vê çîrokê ye.

Fatik, piştî ku dibîne qedera kurê wê di destê Eyšikê de maye, her roj tê nav zeviyê cotyarek û jê pirsan dike heta ku Kurê Mîrê Ereban pê dihesê û wê ji vê rewşê xelas dike.

“Go yekî cotyarî rabû çû binê darê bîna xwe berda. Carekê ve dît çivîkek hate raserî go:

Go: Haa cotyaro!

Go: Haa!

Go: Kurê Mîrê Ereba li mal e?

Go: Erê.

Go: Ew dêlika lêv deqandî li bal e?

Go: Erê.

*Go: **Gelo Halê Hiseynîkê min çi hal e?***

Mêrik go: Wele ne ti hal e.

Nizane çi ye jî û ma wisa dibêje. Çivîk giriya. Go, hêsirê wê hemû bûne sedef ketin binê darê. Go, wê rojê cotyarî sedefê xwe dane hev û çû go roja din dîsa hat, dîsa eynî rûnişt û dîsa eynî wisa.”⁴³⁷

Ji van hemî karakterên ku di çîrokê de tezahur dikin em dibînin ku çîrokbêj, di navbera vê çîroka folklorî û serpêhatiya Hz. Fatime de hevterîbiyek çêdikin. Bêguman ev nayê wê wateyê ku di her wechî de lazim e ev hevterîbî hebe. Lewre, wekî mînak; di çîroka rastîn ya Hz. Fatime de, ew û Hz. Elî ne xuşk û bira ne. Mêr û jin in. Ev yek ji bo nîşandana hevterîbiya di navbera çîroka rastîn û ya fiktîf de

⁴³⁷ Berhevkar, Vildan Sevim, Gotî, Sebriya Derwêşo, Herêm, Bişêriyê, r. 3.

wekî handîkapek xuya dike. Lê divê em vê bibîr bînin ku, di çîrokan de ji bo dramatîzekirinê, xuşk û bira hêmanên watedartir û bihêztir in. Lewre hebûna dêmariyê bi xwe re vê realîteyê tîne. Dîsa dema ku di navenda honakê de dêmarî hebe, bê wate ye ku lehengên dijber qîz û mêrê wê bin. Eger ku di çîrokê de bi tu rengî behsa lehengê kur nehatina kirin ev dîsa watedar bû. Jixwe di varyanteke çîrokê ku ji herêma Semsûrê ji alî Mehmet Öncü ve hatiye berhevkirin de, leheng bi tenê Fatik e. Di vê varyantê de behsa mêrê ku Fatik pê re dizewice wekî detayek hatiye kirin. Navek jî lê nehatiye kirin. Lewre kurek ji derve nabe ku bibe objeyeke temamkar ya konfliktê ku li ser aksiyonên dêmariyê hatiye însakirin.

Di varyanta Bişêriyê de, mêrikê ku Fatik pê re dizewice; Kurê Mîrê Ereba, digel ku dêmarî jina wî jê distîne û qîza xwe dixê şûna wê jî, ew dîsa jî wekî súbjeke dijber li hember dêmariyê rû nade. Eger ku aksiyon li derdora dêmariyê be, lazim e hêmana dijber zarok bin. Her cure hêmanên dî wê zêf bimînin. Ji xwe yek ji sedema ku di çîrokê de bav pir qels dimîne ev e. Bi piranî bav ‘safik’ e û li dû rênîşandanên dêmariyê tevdigere. Nabe ku li vê derê bav jî wekî objeyeke dijber bê bicihkirin. Lewre li vê derê bi tenê rê dimîne ku her du leheng, yanê Elik û Fatik, ne wekî çîroka rastîn mêr û jin bin lê xuşk û bira bin. Ev yek di heman demê de di asta dramaya çîrokê de jî bihêzbûnê pêk tîne.

Lê divê em li gorî hin mînakên ji hîkayetên dî bibîrbînin ku carina pevguherîna hezkiriyên bi xuşk û birayan derdikeve pêş me. Wekî mînak, di çîroka Hz. Îbrahîm û Sara de; digel ku ew jin û mêr in jî, dema ku diçin seraya Fîrewn, xwe ne wekî jin û mêr lê xuşk û bira didin naskirin. Ji ber ku, eger Hz. Îbrahîm bibêje ku ew jin û mêr in, bi îhtîmaleke mezin, ji ber ku Sara pir xweşik e, dê Hz. Îbrahîm bê kuştin. Lê dema ku ew ji Fîrewn re dibêjin ku ew xuşk û bira ne, hingê Fîrewn ji bo ku Sarayê bi dest bixe gelek diyariyên bi qîmet û mal û mülk dide Hz. Îbrahîm da ku xuşka wî li xwe mahr bike.⁴³⁸

Di kilama Şivan Perwer ya bi navê ‘Narîne’ de, dema ku hezkirî direvin, ji xelkê re xwe ne wekî hezkirî lê wekî xuşk û bira didin naskirin.⁴³⁹

⁴³⁸Ömer Faruk Kahraman, <https://islamansiklopedisi.org.tr/sare>, Dîrok Pêwendiyê: 25/06/2020

⁴³⁹ Şivan Perwer, <https://www.youtube.com/watch?v=9P9D5rKTo0s>, Dîroka Pêwendiyê: 01/07/2020

Di kilama dengbêj Şukriyê Îzol ya bi navê ‘Gundê Qenterê’ de jî em dibînin ku heman tema derdikeve pêş me. Her du evîndar dema ku direvin ji xelkê re xwe ne wekî du evîndar lê wekî xuşk û bira didin naskirin.⁴⁴⁰

Ji bilî vê jêknegiriyê, jêknegiriyêke di di navbera çîroka rastîn û çîroka folklorî de ev e ku; di çîroka rastîn de Hz. Fatima jiyanêke dirêj û dilşad najî. Piştî wefata diya xwe ya rastîn, bi Hz. Elî re dizewice, demeke pir kin ew û Hz. Elî ji ber ku Pêxember kesek wekî Hz. Hatîce ku rê nîşanê wî bide nabîne û dixwaze ku Fatime vê valahiyê tije bike, li mala bavê xwe tevî Hz. Elî dimîne. Bi dû re ji xwe bav yanê Hz. Pêxember wefat dike û piştî wefata pêxember bi çend mehan ew jî wefat dike. Di vê çîroka rastîn de ne pêkan e ku em behsa dilşadiyek an jî bextewariyek bikin. Lê di çîroka folklorî de, wekî ku ev tebîetê giştî yê hemî çîrokan e, piştî gelek êş û azaran ew digihîje jiyanêke bextewar.⁴⁴¹

Ji ber van sedemên ku me li jorê nîşan daye, dibe ku mirov nikaribe ji sedî sed îdîa bike ku çîroka Elik û Fatik ji serpêhatiya rastîn ya Hz. Fatima hatiye derxistin lê mirov vê dikare bibêje ku yek ji armanca vegotina çîroka Elik û Fatik; bibîrxistina vê bûyera rastîn û dîrokî ye. Dibe ku çîrok beriya vê bûyera rastîn jî hebûye lê bi dû re adaptasyon tê de hatibe çêkirin. Her wiha ev çîrok tevî bi çend çîrokên di yek ji wan çîrokan e ku li gelek deverên Kurdistanê bi rengekî berbelav tê zanîn. Bi taybet li herêmên kurdên elewî yek ji çîroka herî navdar û hevpar e.

3.1.2. Di Konteksta Varyantên Çîroka Elik û Fatik De Berawirdkirina Hin Temayên Dînî-Bawerî

Di binê vê sernavê de em ê di navbera varyantên herêma kurdên êzîdî û herêma kurdên elewî de miqayeseyê bikin. Di çîrokê de yek ji epîzota bingehîn, biryardana li ser serjêkirina her du zarokan yanê Elik û Fatik e. Ev di heman demê de beşa herî trajîk jî îfade dike ku bav li hember nefreta dêmariyê hem bêçare dimîne û hem jî tu îtirazê nake. Tê fêmkirin ku ne bi dilê bav e lê dîsa jî îtirazê nake. Di vê kêliyê de temayeke girîng ya dînî derdikeve pêş me.

⁴⁴⁰ Şukriyê Îzol, https://www.youtube.com/watch?v=-3Yg_VjAqBQ, Dîroka Pêwendiyê: 01/07/2020

⁴⁴¹ M. Yaşar Kandemir-Mustafa İsmet Uzun, <https://islamansiklopedisi.org.tr/fatima>, Dîroka Pêwendiyê: 25/06/2020

Di varyanta ku ji herêmên kurdên êzîdî ji aliyê Heciyê Cindî hatiye berhevkirin, ev epîzot bi vî rengî ye:

“Salekî mêrik toxim hazir dike ku biçîne. Ew(dêmarî) dizî va toxim diqelîne. Wê salê wan ra ji wê zeviyê nan şîn nave. Dimîne sala mayîn. Jinik divê:

*-Mêrik **çika ez herim ser koçekê**. Qe risqê me ra çi divê*

Êvarê wextê razanê, keçik(Fatik) nava wê êratê bûye, ew hişyar dimîne nava cî da. Mêrik divê:

*-Jinik, **koçekê qe çi got?***

*Jinik divê: **Koçekê çi got**, mala wî xirav be, go: Du zarê êtîm hene, bibin serê zeviyê têkin qurban, wê nanê we dîsa şînbe.*

Mêrik divê: Na wekî ez birçîna bimirim, ew yek nave.

Jinikê zanibû ku mêrik dixapîne. Go: Lê em bê nan ça bikin, bona her du zaran em gişk gerekê bimirin?

Mêrik nihêrî boş e, serî jinikê ra nayê kutanê. Go:

-De ez ê sivê herim bajar, tu nan bide zara, paşê wan bibe serê zeviyê têke qurban.

Fatê nav cî da nifir bavê xu kir, ku direve, wêya bawer dike.”⁴⁴²

Di vê varyantê de wekî ku me li jorê jî nîşan daye, di sê deran de têgiha *koçek* derbas dibe ku ev têgiheke dînî ya baweriya êzdiyatîyê ye.

“Koçek: Di nava cimaeta êzîdîyan de cihekî wan yê giran heye ku ew ji xwe ber ne xwedî wesfîyeteke rûhanî ne lê murîdên taybet yên xudreste ne. Ew vê zanava xwe ji welidîna xwe de nastînin lê bi zanînen xwe yên dînî û perwerdeyê distînin.”⁴⁴³

Di heqê Koçekan de Kreyenbroek jî wiha dibêje:

“Digel ku peyva koçek ji bo xizmetkarên perestgehê tê bikaranîn jî ev têgih di heman demê de, ji bo kahînen ku bi ‘alema xeybê’ re dikarin têkilî deynin jî tê bikaranîn. Wîlo tê bawerkirin ku ew vê erkê bi rêya bangê ku di xew de ji wan re

⁴⁴² H. Cindî, *Hikayetêd Cimaeta Kurda VI*, r. 23-24.

⁴⁴³ A. Gökçen, *Ezidi Ağutları*, r. 21.

*tê kirin hildigirin ser xwe. Di rewşên nebaş wekî nexweşînan de ji wan alîkarî tê xwestin.*⁴⁴⁴

Di berhema xwe ya bi navê Êzdiyatî de Kreyenbroek ji bo Koçekan wiha nivîsiye:

*“Karîgeriyek dî ya koçekan ev e: Ew kahînen civakê, xwedî keramet û vîzyon in. Ew vê hêza xwe ji bo şîfa, sêrbazî, pêşdîtina felaketan û astengikina wan û di heqê reankarnasyona ruhên kesên mirî de agahîdanê bi kar tînin. Tê bawerkirin ku ew bi rêya trans an jî xewnê bi alema xeybê re diaxivin.*⁴⁴⁵

Wekî ku em ji van her du îzahatên jorîn jî dibînin, di çanda dînî ya êzîdiyan de koçek, roleke girîng dilîzin. Ew wekî cureyek kahîn in û di heqê dahatûyê de pêşbîniyan dikin. Li vê derê, yek ji nîşaneyên esasî ya ku em di dirêjahiya vê tezê de dixwazin ispat bikin bi vî rengî li pêş me ye. Çîrok, çîrokeke hevpar ya hemî civakên kurd e. Dema ku ev çîrok li nava civaka êzîdî tê gotin, ew bi rengekî nîşaneyên xwe an jî mohra xwe ya dînî lê dixin. Di vê versiyonê de, ev mohra dînî di kêliya çûyina ser ziyaretê de derketiye pêş me. Divê em jibîr nekin ku ev nayê wê wateyê ku di her versiyonên nava êzîdiyan ya vê çîrokê de, di vê epîzotê de yanê di epîzota ziyaretê de mohra dînî heye. Dibe ku ew di epîzotek dî de derkeve pêş me.

Di heman çîrokê de di varyanta ku me ji herêma Mazgîrdê berhev kiriye de, di epîzota çûyina ser ziyaretê de, digel ku herka bûyera bi hema rengî ye jî, di temayên dînî de guherîn pêkhatine. Ev temayên dînî bi rengekî wilo ne ku, dema çîrokê tê gotin tê dîtin ku ew ji zarê elewiyên kurd belav bûye. Niha em ê li gorî versiyona Mazgîrdê epîzota çûyina ser ziyaretê bidin.

*“(Dêmarî dibê) Lê ez çer bikin? Payiz e genim dajon. Vaye jî genimê xwe tîni dikelîni, genim dikelîni, bila zevî hêşîn bibî. Zeviyê xelkê kulî hêşîn bûyî yê wê hêşîn nebûye. Mexsed ki yanê îşkî ser van zariyana bibîne (wan sûcdar bike)... Mêrê xwe re diwê: Mêrik zeviyê kuliyan hêşîn biye ê me qey hêşîn nebiye? Dibê: Nizam. Dibê: Hella hella em çer bikin? Hela biskin, dibê. **Ez du dor kulor lê dixim, here bibe ser ziyaretê.** Hela ban ke. Ziyaretê re bivê, bê: Ziyaret! Cîranan kulî genim ajotiye, genimê xwe hêşîn biye, yê me hêşîn nebiye. Qey ê me hêşîn*

⁴⁴⁴ P. G. Kreyenbroek-X. C. Reşow, *Tanrı ve Şeyh Adi Kusursuzdur*, r. 31.

⁴⁴⁵ Philip G. Kreyenbroek, *Ezidilik, Arka Planı, Dini Adetleri Ve Metinsel Geleneği*, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, Çeviri, Amed Gökçen, Damla Tanla, I. Baskı, 2014, İstanbul, r. 137.

nebiye acaba? Hela te ra çi divêje ziyaret. Dibê: Herê. Fam nake mêrik. **Jinik tînî kuloran dipêjî, çixinê tije kulor dike, çirê mirê dide dest mêrik**, divê, mesele du tene rê hene tere ziyaret. Divê: Vê riya ve here! Va riya jî qise ye. Jinik berî mêrik dere. Dere dar qulne. Kuva/Xuva xwe kun e. Jinik dere hema xwe berdide koka darê. Damariya wan zariyana. Dere xwe berdide koka darê. **Mêrik dere ser ziyaretê, çira xwe vêdixînî**. Divê: Ziyaret! Divê: Ha Ha! Divê: Lê kuliyan genimê xwe ajotiye, genimê kuliyan hêşîn biye, divê: Lê qey ê min hêşîn nebiye? Divê: Lê ê te qey hêşîn nebiye! Ti bibe Alikê li jêr şerjêke. Navê xwangê Fatik e navê birê Alik e. Alî û Fatma. Alik dibên Fatik dibên da! Dibê: Alik li jêr şerjêke, Fatikê jor şerjêke ki genimê te hêşîn diwe. Dibê: Xwedê hela hela! Lê ez van zaroyên xwe çer şerjê kim? Qîmîşî nakim divê. Alikê û Fatikê çira şerjê kim? Divê: Yoksa nanê te hêşîn nayê, genimê te hêşîn nayê. Mêrik özûlmîş diwi ha öyle sipsar diwi. Dibêje: Va çi dibêje, va ziyareta ser mi da? Nizani ki jinik ketiye koka darê, mi ra war divê.⁴⁴⁶

Herwekî ku em di vê pasaja jorîn de jî dibînin, dema ku çîroka hevpar di nava çanda elewiyan de digere, di kêliyên ku temayên dînî derdikevin pêş de, ew mohra xwe ya dînî li çîrokê dixin. Li vê derê ev tezahur, di awayê ziyaretkirina cihên pîroz de derdikeve meydanê. Wekî ku tê zanîn; li nava civakên kurd çanda çûyina ser ziyaretan, di nava hemî komên etno-dînî de berbelav e. Yanê êzîdî jî, elewî jî û kurdên sunî jî diçin ser ziyaretan. Lê bêguman di rîtuêlên wan yê ziyaretkirinê de guherîn çê dibin. Li vê derê ev yek di mînaka *vêxistina çirayê* de derdikeve pêş me.

Di nava çanda dînî ya elewiyan de çira an jî mûm, gelekî berbelav e. Elewî di ayinên xwe yê cemê de, di çûyina ser ziyaretan de çira vêdixin. Ev yek bi regekî aşkera, rîtuêleke elewiyan e û di nava grûba kurdên sunî de nayê dîtin. Lêkoler Munzur Çem qeyd dike ku elewî tevê ‘nanê niyazê’ tevî merasîma cemê dibin. Niyaz di nava qabekê de tê pêşkêşkirin ku li dora wî qabî mûm tene rêzkirin û di dema cemê de ev mûm tene vêxistin.⁴⁴⁷ Çem, îfade dike ku di dema çûyina ser ziyaretan de jî pêşkêşkirina çirayê erkekî ye:

“Di dema çûyina ser ziyaretê de sê nezir (adak) tene pêşkêşkirin:

1. Qurban

⁴⁴⁶ J.2., Pêvek 2.

⁴⁴⁷ M. Çem, *Dêrsim Merkezli Kürt Aleviliği*, r. 33.

2. *Nanê pîroz ku bi navê niyaz an jî pêsare tê binavkirin*
3. *Çiraya mûmê*⁴⁴⁸

Dema ku mirov li cihên pîroz yên elewiyan digere, ev realîteya vêxistina çirayê li ber çav e. Lewre çira di çanda dînî ya elewiyan de cihekî girîng digire.

Bi vî rengî me bi miqayeseya epîzoteke çîrokê li gori du baweriyên cuda nîşan da ku heman çîrok an jî metna hevpar, di konteksta bawerî û rîtuêlên dînî de çawa diguhere û ew guherîn wekî temsîlên wan komên etno-dînî çawa derdikeve pêş me.

Di çîroka Elik û Fatik de, ya ku me kiriye mijara vê miqayeseyê de, yek ji nîşaneyên mohra dînî, bikaranîna têgiha heq e ku ev taybet e bi kurdên elewî û yaresanî. Her çendî ku li herêmên dî yên kurdan bikaranîna vê têgihê hebe jî, di wateya Xweda de pir kêmtir bikaranîna. Her wiha ev têgih bi sêyîna girîng ya elewîtiyê ve girêdayî ye. Yanê: Heq-Muhammed-Elî. Heta di hin fraksiyonên vê baweriyê de, nêrînek heye ku di vê gotinê de wiha der diçe: *Heq Elî ye Elî Heq*. Ji ber vê rewşê ye ku carina ev bawerî wekî *Ehlî Heq* hatiye binavkirin. Di her du varyantên ku me ji herêma Dêrsimê; Pêrtêg û Mazgîrdê berhev kiriye de jî ev têgih derdikeve pêş me.

Di versiyona Pêrtêgê de dema ku Alik û Fatik ji ber kirinên amojîna xwe diçin axurê û digirîn, manga zer wiha bang dike li Xwedê an jî Heq:

*“Rokî amojîne, Alik û Fatikê ra hêrs ketiye, lê xistiye, tî wû birçî avêtiye der. Gotiye, carikî din mênê vê mala, herin êxur li cem manga zer rakevin. Çûne nav axurê dane girî, gîrane, gîrane, gîrane. Eman û gumanê manga zer hatiye birandin. Gotiye: **Ya Heq û tala**, yan canê min bigir yan jî zimanikî bide min, ez derdê van zarûkan ra çarekî biwînim. Xadê da nida diwî, mange tê bi ziman. Diwê, Alik, Fatik va çî zî wû zîwa weye. We heş û aqil li serê min girt. Alik û Fatik diwên, amojîna me xêrê bi me nake, em tî wû birçîne, bê xudî wû bê andêr mane.”*⁴⁴⁹

Di versiyona ku me ji herêma Mazgîrdê berhev kiriye de, di gelek derên çîrokê de têgiha Heq derbas dibe. Damarî dema ku hîn dike ku Mange, Alik û Fatik xwedî dike, ji mêrê xwe dixwaze ku ew mangê şerjê bike:

⁴⁴⁸ H.b., r. 90.

⁴⁴⁹ J.1., Pêvek 1.

*“Damarî tê mêrik re dibê, mêrê xwe re dibê, dibê mêrik mangê şerjê ke. Mêrik dibê lê lê **Heq lê xistê**, manga qey şerjêkim. Dibê: Mangê şerjêkî risqê me tê birandinê... Tişkî wisa, mane, manek li vir tînî yekî li wir tînî, diwê îlla şerjê ke. Mêrik diwê yaw **Heq li vê xe**, vêya diwê mangê şerjêke!”⁴⁵⁰*

Di heman versiyonê de dema ku mêrik ji ziyaretê tê û ew û damarî biryar didin ku zarokan şerjê bikin, lê çivîk xeberê dide zarokan û zarok direvin, dîsa ev têgih derdikeve pêş me.

*“(Mêrik û jinik xwe hazir dikin ku Alik û Fatik şerjê bikin lê çûk xeberê dide wan. Alik radike kumê Fatikê û direve û Fatik li dû diçe û wisa xilas dibin.) Mêrik tê dibê nizamî min nedî, nizamî hunda bûn bi ku ve çûn. Damarî dibê te nedî? Dibê, na. Dibê **Heq li te xe!**”⁴⁵¹*

3.2. Efsaneya Şahêmaran

Di nava vegotinên gelêrî yên civaka kurdan de, çîrok û efsaneyên li ser maran gelekî berbelav in. Marên ku evîndarê keçikan dibin û wan direvînin, marên ku nobedarê xezîneyên bin erdê ne, marên ku li ser kaniyên gundan/bajaran disekin û nahêlin kes av vexwe hin motîfên van vegotinan in. Di efsaneya navdar ya bi navê Efsaneya Kawa de jî, mar motîfeke girîng e. Li gorî vê efsaneyê, du mar ji ser girmilka Dehaq derdikevin û her roj du xort ji bo wan tene qurbankirin.⁴⁵²

Di folklorê civaka kurdan de, du têgih hene ku di çîrokên her devera ku kurd lê dijîn de derdikevine pêş me; *dinyaya ronî* û *dinyaya tarî*. Dinyaya ronî, ew dinaya ye ku em tê de dijîn an jî dinayaya ser erdê û li vê derê mirov serdest in. Dinyaya tarî jî, dinyaya binê erdê ye ku bi piranî li wê derê mar serdest in. Dinyaya binê erdê hem tije tirs e û hem jî cihê meraqê ye. Leheng carina bi nezanî û carina jî li dû vê miraqê diçin wê dinyayê. Wekî ku tê zanîn ronahî û tarîti di baweriya kevn ya zerdeştî de jî tê dîtin û wilo tê bawerkirin ku dinyaya tarî di binê hukmê hêza ne baş de ye.

Efsaneya Şahêmaran jî, yek ji van efsaneyan e ku di nava hemî civakên rojhilata navîn de tê zanîn û di nava civaka kurd de jî gelek versiyonên wê yên

⁴⁵⁰ J.2., Pêvek 2.

⁴⁵¹ J.2., Pêvek 2.

⁴⁵² Ş. Bedlîsî, *Şerefname*, r. 99-100.

cuda hene. Motîfa şahêmar, di xalî û xalîçeyên civaka kurdan de jî gelekî bi berbelavî hatiye bikaranîn.

Di binê vê sernavê de em ê varyanteke vê efsaneyê ya ji nava civaka kurdên elewî û varyanteke ji nava kurdên êzîdî miqayese bikin. Di vekolînê de em ê bi piranî li ser varyanta ji nava civaka elewîyan bisekinin û li gorî motîfên dînî binirxînin. Ev varyanta bi navê *Sae Marû* ji aliyê Mustafa Düzgün ve di sala 1989an de li herêma Dêrsimê hatiye berhevkerin. Vebêj, bi navê *Mursaê Silêmanî* ye.⁴⁵³ Metin Kahraman û Kemal Kahraman jî di albuma xwe ya bi navê *Sae Maru* de vê varyantê çap kirine. Digel ku di vê varyantê de hin mudaxele hene jî bi piranî mudaxele bi rengê tijekirina hin valahiyên di efsaneyê de ne û bandorê li bêjara elewîkî nekiriye. Varyanta nava kurdên êzîdî ji aliyê Heciyê Cindî ve hatiye berhevkerin. Çîrok ji herêma kurdên Ermenistanê ji kesek bi navê Gozelyanê Mûsa, di sala 1965an de hatiye berhevkerin û di pirtûka *Hîkayetêd Cimeata Kurda* de hatiye çapkirin.

3.2.1. Varyanta Kurdên Elewî

Di vê varyanta şahêmaran de, gelek hevbeşî bi çîrokên giştî yên li ser şahêmaran re heye. Lê di heman demê de em rastî gelek motîfên dînî tên ku taybet in bi baweriya elewîtiyê. Ev motîf wekî ku em di beşa diduyan de jî li ser wan sekinîn, motîfên heq, xizir û sir in. Ji bilî van motîfen dînî, gelek motîfên dî jî hene ku em ê cî bi cî ji wan jî mînakên bidin.

Herwekî ku me di beşa duyem de îzah kiribû, têgiha heq di nava termînolojiya dînî ya elewîtiyê de gelekî girîng e. Digel ku ev têgih di nava sûfîzma îslamî de jî heye û her wiha ew yek ji navê xwedaye jî, kurdên elewî ji bo bo lefza Xweda bi piranî têgihên *Xuda* û *Heq* bi kar tînin. Xuda, têgiheke hevpar e di nava hemî civakên kurd de.

Di vê metnê de ku ji aliyê Mustafa Düzgün ve hatiye berhevkerin têgiha heq di heft deran de bi wateya Xweda hatiye bikaranîn. Hin ji van bikaranînan bi vî rengî ne.

⁴⁵³ Metna ku li ber destê me ye ji xebata Metin Kemal Kahraman ya bi navê *Sae Marû* hatiye girtin. Di vê metnê de di hin cihan de bi pasajên ji versiyonên kurmancî mudaxele lê hatiye kirin lê ji ber ku esasê çîrokê neguherandiye me ji xwe re wekî bingeh girt.

“...Ev rewş ji Hz. Pêxember re eyan bû û got: Vayê Loqman Hekîm dîsa dixwîne; niha ew ê ji mirinê re çareyek bibîne. Lê ev kar, **karê Heq e**, ne karê wî ye.”⁴⁵⁴

Di heman rûpelê de têgiha heq bi vî rengî derdikeve pêş me:

“Rojekî di xewnê de/Ezraîl lê bû eyan/Got, tedarikê xwe bike Loqman/Heya sê wextan/Wê we’deya te bibe tamam/Emr û rizaya **Heq e**/Wê kurek te çê bibe/Navê wî deyne Camisan.”⁴⁵⁵

Di mînakeke dî de dîsa têgiha heq wiha derbas dibe:

“Pir ma hindik ma/**Heq dizane**/Yek car di nava tarîtiyê de/Ronahiyek peyda bû”⁴⁵⁶

Di mînakeke dî de, dema ku Belqiya rastî hûriyek tê hûrî jê re wiha dibêje:

“Belqiya rabû çû hilkişiya wî çiyayî. Dît ku hûrî li wir rûdinê. Silav dayê. Huriyê got: Eleykum selam ey benî adem. **Şukur ji Heq re**, te çi di **donek xweş** de çêkiriye.”⁴⁵⁷

Di vê mînakê de tê dîtin ku du têgihên aydê termînolojiya elewîtiyê hatine bikaranîn. Yek jê *heq* û ya dî *don*. *Don/ton veguhartin* wekî cureyeke baweriya reankarnasyonê di baweriya elewîtiyê de derdikeve pêş me⁴⁵⁸. Ji bilî van mînakên ku me li jorê dane di çend cihên din de jî ev têgih derdikeve pêş me.

Motîfa Xizir jî wekî têgiha heq, motîfeke berbelav e di vegotinên gelêrî yên kurdên elewî de. Her çendî di çîrokên hemî civakên kurdan de derkeve pêş me jî, ji ber gelek sedemên ku me di beşa duyem de neqil kir, di nava termînolojiya dînî ya elewîtiyê de cihekî wî yê gelekî girîng heye. Lewma jî divê em vê wekî motîfek taybet bi baweriya elewîtiyê şîrove bikin.

Di Efsaneya Şahêmaran de di gelek deran de derdikeve pêş me. Di şeş cihan de Xizir, di rola alîkariya bo lêgerîna Belqiya de derdikeve pêş me. Di vê

⁴⁵⁴ Mustafa Düzgün, *Sae Marû*, Herêm, Dêrsim, Vebêj, Mursaê Silêmanî, 1989, İstanbul, r. 1.

⁴⁵⁵ H.b., r. 1.

⁴⁵⁶ H.b., r. 5-6.

⁴⁵⁷ H.b., r. 15.

⁴⁵⁸ Baweriya bi reankarnasyonê ew e ku, wilo tê bawerkirin ku beden bimire jî ruh di bedeneke dî de dîsa tê dunyayê. Ev bedena nûh dibe ku mirovek be, dibe ku ajalek be û dibe ku nebatek be jî. Di baweriya elewîtiyê de ton veguhartin jî bi heman wateyê ye.

mînaka jêrîn de Belqiya diçe dibe mêvanê Şahêmaran û jê dixwaze ku ew cihê Hz. Muhammed nîşanê wî bide. Şahêmaran jê re wiha dibêje:

*“Tu nikarî dinyaya ronî, cemala Muhammed bibînî. Lê were wa li dereke dûr mêrgek heye. Roja îne here xwe li wê derê li cihek veşêre. Wê **du heb beran** bêne wê derê û bi hev re şer bikin. **Yek reş e yek sipî ye.** Tu hinek li dûr bisekine, dema ku ew serî li hev didin, bêje: **‘Ya Xizir’** û xwe bavêje ser beranê sipî. Bi tenê ew dikare te derxe **dinayaya ronî.** Lê haya te jê hebe ku tu bikevî ser beranê reş wê te bibe **heft qat binê erdê.**”⁴⁵⁹*

Di vê mînaka jorîn de wekî ku me îşaret kiriye, li kêleka motîfa xizir, gelek motîfên din yên dînî hene. *Dinyaya ronî* û *dinyaya tarî* motîfeke pir berbelav e di çîrokên civakên kurd de û di çîrokên kurdên elewî de jî derdikeve pêş me. Hema bêje di hemî çîrokên ku ev motîf derdikeve pêş me de, du beran jî hene ku yek sipî yek reş e. Yek temsîla dinayaya ronî yê dî jî temsîla dinyaya tarî dike. Dibe ku têkiliya vê simbolîzmê, bi her du hêmanên bingehîn yên dînê zerduştîyê re; ronahî û tarîtiyê re hebe.

Di vê mînaka jêrîn de Xizir dîsa wekî motîfeke alîkar derdikeve pêş me:

*“Go, ji te ricayek min heye, çar sed sal derbas bûye, te heya niha qet navê Hz. Muhammed li derekê nebihîstiye? Got: ‘Min nebihîstiye. Dîsa jî were wa li vê derê cihek heye jê re dibêjin Deriyê Mirada, here wê derê û bêje: **‘Ya Xizir!’** û derî veke. Eger cezayê te qediyabe wê derî li te vebe û tu yê bigihîjî miradê xwe.”⁴⁶⁰*

Di mînaka jêrîn de motîfa Xizir hinekî ji yên dî cudatir e. Li vê derê behsa mekanek tê kirin ku ew mekanê Xizir e.

*“Dîsa bi roja bi hefteyan rêwîti kir. Ê çû rastî wî çiyayî hat. Nihêrt ku deriyek li wê derê û li ber derî sofîyek rûniştî ye bi rûyek ronak. Sofî jê re got: ‘Hey mala te ava! Çi karê te heye li van deran? Ev der û mirov? Belqiya got: ‘Qey tu ne mirovî?’ Wî got: ‘Ez ji bo yên wekî te li vê derê me. **Ev der mekanê Xizir e. Gelek mekanên Xizir wekî vê hene.**’ Belqiya jê re got: ‘Xuya ye tu evdekî baş yê*

⁴⁵⁹ M. Düzgün, *Sae Marû*, r. 9.

⁴⁶⁰ H.b., r. 16.

*Xweda yî. Emrê min qediya lê neqediya cefaya min. Min her tiştî hîn kir, min hîn kir ku hikmet çî ye. Qey ev derî venabe êdî li pêş min?’ Got: ‘Tewekkula min û te Xweda Teala ye. Bêje: **Ya Xizir** û derî veke. Vebû, vebû. Eger ku venebû, qey qusûrên te neqediyane hê. Tê dîsa herî bigerî bi qandî ku tu heya niha geriyayî... Belkî hingê vebibe.*⁴⁶¹

Di Efsaneyaya Şahêmaran de motîfa sirê di çend deran de derdikeve pêş me. Hem di beşa evîna Belqiya bo Hz. Muhemmed de hem jî di beşa ku dê Şahêmaran bê kuştin de derdikeve pêş me. Wekî tema, tê dîtin ku ev têngih/motîf di nava temaya evîn û heqîqetê de derdikeve pêş me ku ev her du tema di nava baweriya elewîtiyê de gelekî girîng in. Mînaka pêşîn ji nava temaya evînê ye:

*“Belqiya dîsa dest bi girî kir; ew jî dewreke dirêj bû rastî hemcînsekî xwe nehatibû. Got: ‘Ez kurê şahê Misrê bûm. Piştî bavê xwe ez bûbûm padîşah lê ez evîndarê navê pêxemberê axir zeman Muhemmed bûm. Ji bo ku ez cemala wî bibînim, **bo ku ez bigihêm sirra wî navî** derketim rêwîtiyek bereday/nafile... Hemî emrê min di vê oxirê de çû; min terka dayka xwe, birayên xwe û hemî xizmên xwe kir...”*⁴⁶²

Di mînaka jêrîn de, piştî ku Camisan li Şahêmaran îxanet dîke û cihê wî nîşanî leşkerên padîşah dide, êdî sir aşkera dibe.

*“Xerabû tilsim û Şahêmaran hêdîka derket ji binê erdê bo ku rûbirûyê qedera xwe bibe. Sîtem kir li qedera xwe û **sira xwe** di guhê celadê xwe yê mesûm de aşkera kir. Got: ‘Sê hikmet hene di rûhê min de ey Camisan. Yek jê safî jehr e, ya duduyan **sirra Loqman** e û ya dawîn dermanê kullî derdan e...”*⁴⁶³

Ji van mînakên ku me li jorê dan diyar e ku, kurdên elewî vê efsaneyaya hevpar ku di nava civakên kurd û gelekî civakên rojhilat de tê zanîn, di çarçoveya tema û motîfên xwe yê dînî de ji nû ve honandine û wê kirine aydê xwe.

⁴⁶¹ H. b., r. 25.

⁴⁶² H.b., r. 17.

⁴⁶³ H.b., r. 30.

3.2.2. Varyanta Kurdên Êzîdî

Di nava civaka êzîdî de li ser mar an jî şahêmaran gelek çîrok hene. Her wiha mar di nava civaka êzîdî de xwedî hin taybetiyên dînî û çandî ye jî. Lê digel ku di nava vê civakê de çîrokê li ser şahêmaran hene jî, ev cure çîrok naşibin Efsaneya Şahêmaran ku me li jorê analîza wê kir. Lewre Efsaneya Şahêmaran xwedî honakeke taybet e û bi vê honaka xwe di nava gelek civakên rojhilatê de heye. Bi vê honakê re hevterîb em bi tenê rastî versiyoneke vê çîrokê hatin ku ji aliyê Heciyê Cindî ve ji nava kurdên êzîdî yê kafkasyayê hatiye berhevkin.

Di vê versiyonê de navê çîrokê *Şamer* e. Şamer ji her du peyvên *şa* û *me'r* pêk tê. Wekî ku tê zanîn li hin deverên kurmançaxêv peyva mar wekî *me'r* tê telefuzkirin.

Navê lehengê sereke wekî versiyonên dî ne Camisan e lê Canmest e. Wilo xuya ye ku vebêj, navê leheng bêtir nêzîkî kurdî kiriye. Lewre ew ji du peyvên kurdî; can û mest hatiye çêkirin. Canmest, berevajî versiyonên dî ne kurê mirovekî feqîr e. Ew kurê paşayekî/padîshahekî ye lê ji ber ku Canmest bi qumarê dilîze hemû serweta bavê wî diqede û ew feqîr dikevin.

*“Canmest destpê kir qumbar list. Ew xezne, defîne, çi ku hebû, qumbarê da da bê. De usa bûn wekî tişteki wanî xwerinê tunebû”*⁴⁶⁴

Her wiha digel ku di versiyonên dî de em tu car navê hevalê Canmest/Camisan nizanin jî di vê versiyonê de vebêj navê wan wekî *Keşîr* û *Beşîr* destnîşan kiriye.

*“Padşa rabû çû, du kurê biçûk kirîn, anîne mal. Navê yekî danî **Keşîr**, yê dinê **Beşîr**. Lê navê kurê padşeyî helal, Canmest.”*⁴⁶⁵

Her wiha dema ku em çîrokê dixwînin, tê ferqkirin ku ew ji herêma kurdên kafkasyayê hatiye berhevkin. Lewre hin peyvên ku taybet bi vê herêmê ne hatine bikaranîn. Wekî mînak:

⁴⁶⁴ H. Cindî, *Hikayetêd Cimeata Kurda IV*, r. 238.

⁴⁶⁵ H.b., r. 238.

*“Ewana çûne mal. Feraq hilda hatin. Canmest kirine bîrê. Canmest bîrê da vêdrok tijî dikir, wana dikişand. **Wê formê** sê roja sivê heta êvarê hngiv dikişandin.”⁴⁶⁶*

Di varyanta kurdên elewî de, çîrokek di nava çîrokê de heye ku ev çîroka Belqiya ye. Belqiya kurê mulûkê Misrê ye û ji ber ku navê Hz. Muhammed bihîstiyê, evîndarê wî bûye. Û dixwaze wî bibîne. Wekî ku tê zanîn, di nava kurdên elewî de bi taybet di gulbangên wan de evîna Hz. Muhammed gelekî berbelav e. Heta ev sêyîneya girîng stûneke bawerîya wan e: Heq, Muhammed, Elî. Lewre ne xerîb e ku di versiyonên nava kurdên elewî de ev tema derbikeve pêş me. Lê bi tenê wekî nîşaneyê baweriyê, di vê versiyona nava kurdên êzîdî de em dibînin ku bi tu rengî behsa çîrokek wiha derbas nabe. Li şûna wê çîrokek dî hatiye adaptekirin ku mijara wê dîsa evîn e lê navê Hz. Muhammed tê de derbas nabe.

“Şamer go: De îcar tu rûnê ez ê serê xwe bidime ser çoka te, te ra serhatikî bêjim. Serhatî bi gotina Şamer; ‘Hezaran Padşah hebû. Padşahê Anayê gazî kurê xwe kir, go: Melekşa, lao îdî hatiye wextê min û mirinê. Paşî min padşatiyê têkeve destê te. Tu ku da dixwezî here, tek neçe Çiyayê Qaf.

Rojekê padşê Hezeran çû remetê. Padşatî kete destê kurê wî. Rojekî Melekşa gazî heval û hogira kir, go: Canim wextekê bavê min digo, ‘tu wexta neçî Çiyayê Qaf.’ Nave em rojekî herin wira ka çi heye?”⁴⁶⁷

Li dû vê çîrokê, Melekşa di rêwîtiya xwe de rastî Meyane Xanimê tê û evîndarê wê dibe. Li vê derê jî wekî versiyona kurdên elewî temaya evînê heye lê ne evîna Hz. Muhammed e. Lewre ne pêkan e ku di çîrokeke nava kurdên êzîdî de temayeke bi vî rengî derbikeve pêş.

Di versiyona kurdên elewî de lêgerîna Belqiya bo Hz. Muhammed û di versiyona kurdên êzîdî de lêgerîna Melekşa bo Meyane Xanimê heman hîkaye ne. Heta çawa ku teyrê sîmir Belqiya ji dinyaya tarî derdixe dinayaya ronî, di versiyona kurdên êzîdî de jî Melekşa li piştî teyrê sîmir siwar dibe û teyr wî dibe bajarek efsanewî bi navê Gawirgîdîn ku Meyane Xanim li wê dimîne.

⁴⁶⁶ H.b., r. 240.

⁴⁶⁷ H.b., r. 240-241.

Di encamê de tê dîtin ku kurdên elewî di adaptasyona efsaneyê de meylên xwe yên dînî bawerî bi aşkerayî dane der û wateyê taybet li vegotinê zêde kirine. Lê kurdên êzîdî di adaptasyona vegotinê de zêde meyleke dînî-bawerî nîşan nedane. Bi tenê bi dîqet nuweyên ku temsîlên îslamî tê de hene jê derxistine û bi awayêke notr efsane hatiye vegotin.

3.3. Destana Zembîlfiroş

Ev destan wekî gelekî destanên bi vî rengî, di nava civakên kurd de tê zanîn û li gorî herêman carina hin cudahî tê de peyda dibin. Di vê beşê de em ê bi miqayeseya çend varyantên vê destanê nîşan bidin ku bandora dînî di çî radeyê de xwe nîşan dide.

Di miqayeseyê de em ê ji zarbêjên êzîdî, varyanta ku Celîlê Celîl ji herêma kurdên êzîdî yên Ermenistanê berhev kiriye û varyanta ku Xeyrî Şengalî ji herêmên êzdiyên Şengalê berhev kiriye esas bigirin. Ji bo miqayeseya bi vebêjiya ji zarê elewiyên kurd em ê du varyantên ku Le Coq di salên 1900î de ji herêmên Eyntab û Efrînê berhev kiriye esas bigirin. Wekî ku di nexşeya ku Izady dide de jî diyar e, ev herêm wekî herêmeke elewî-sunî têkilhev tê nîşandan.⁴⁶⁸ Lê divê em vê qeyd bikin ku Le Coq di berhema xwe de behsa baweriya zarbêjên xwe nekiriye. Lê di van varyantan de û di gelek vegotinên dî yên ku di heman berhevoka Le Coq de hene, hêmanên aydê baweriya elewîtiyê pir berbelav in.

3.3.1. Varyantên Kurdên Êzîdî

Ev destan yek ji wan destanên girîng û hevpar e ku di nava civaka êzîdî de bi berbelavî tê zanîn û wateyê dînî-etnîk lê tê barkirin. Êzîdî vê destanê, di nava hîsa rikeberî ya di navbera civaka xwe û ya civaka misliman de, vedibêjin. Lê li vê derê ev rikeberî ne di asta destanên mîna Derwêşê Evdî û Edûlê an jî Destana Ferîq Paşa de ne. Lewre di van mînanan de, asta şidetê gelek li jor e û nasnameyên etnîk û dînî di mecrayêke tundiyê de rûberê hev in. Di mînaka Destana Zembîlfiroş de, bi rêya bibîranîna hin qaîdeyên nav-civakî yên civakên etno-dînî wekî êzîdîyan, atmosfera vegotinê, li ser esasê cudabûna baweriyên û nepêkaniya hin xeyalên mirovî, radixîne pêş me. Helbet ev hemî ne rasterast lê bi rêya hin têgehên sembolîk û hin îmayên hesas tên kirin.

⁴⁶⁸ Bnr. M. R. Izady, *Kürtler*, r. 249, Nexşe: 43.

Folklornasê êzîdî Kovan Xankî li ser girîngiya destanê ya ji bo civaka êzîdî di hevpeyvîna ku me pê re kirî de wiha dibêje:

“Zembîlfiroş bi xwe êzdî ye. Ev di destanê de bi xwe heye. Ez ê niha zanînekê bidime te ku kes pê nizane. Ez ê di kitêba xwe de binivîsim. Beyta wî da diyar e. Dibêje Zembîlfiroş kurê rewal e! Rewal derwêşekî xas e. Ew derwêş edebiyata dînî nivîsîne û ciyê wan ê rêzê ye gelek. Em dibêjine wana xas. Rewal yek ji wan xasa ye. Di êzdiyatîyê de ciyê wî yê dînî heye, li perestgeha Lalişê her wisa jî li gelek deverên pîroz ê êzdiyan wek gundê Boza wan, ciyê pîroz ê Rewal jî hene. Rewal hem têgihek e hem jî kesek e. Di êzdiyatîyê de Rewal kesek e. Babçakek e, derwêşek e. Jiyaye û ciyê wî yê pîroz û dînî hene. Îca Zembîlfiroş di êzdiyatîyê de babê heft kura ye. Her heft kur jî derwêş in, babçak in, mezargehên wan, ciyê wan ê pîroz li nava hemû êzdiyan hene.”⁴⁶⁹

Her çendî ku Xankî wiha dibêje jî divê em bi bîr bînin ku kesayetên bi vî rengî di nava gelek civakan û baweriyên wan civakan de ji xwe re cih dibînin. Her wekî ku lêkoler Xeyrî Bozanî jî neqil dike ku, dewrêş an jî sofîyên ku digihîjin dereceyeke bilind êdî dibin aydê hemû civak û baweriyên ne ku yê yekî bi tenê. Bozanî îdîa dike ku kesayetên wekî Zembîlfiroş bi xwe jî xwe bi ser tu dînî de hesab nakin lewre ew di navbera xwe û Xweda de tu sînorî qebûl nakin. Ev taybetmendiyeke sofî û dewrêşên pile bilind e. Ji ber vê çendê jî her kes wan bi ser xwe ve hesab dike lê ew xwe bi ser tu dînî ve hesab nakin.⁴⁷⁰

Em vê nêrîna li kesayeta Zembîlfiroş di varyantên vê destanê yên di nava civaka êzîdî de dibînin. Di varyanta ku Celîle Celîl berhev kiriye de, nîşaneyên dînî û nasnameyî bi hev re li pêş in. Hê di destpêka destanê de em dibînin ku Zembîlfiroş wekî kurmanc tê nîşankirin. Lê li vê derê, kurmancbûn jî nasnameyeke etnîk bêtir di wateya nasnameyeke çînî de ye.

“Erê Zembîlfiroş lawkê ebbasî

Kurmanco lawikê ebbasî

Tu hînî serqotî hînî pêxasî

Were bidime te kurk û libasî

⁴⁶⁹ J.9., Pêvek 3.

⁴⁷⁰ J.11., Pêvek 3.

*Li ber destê min nabî xilasî*⁴⁷¹

Bi heman wateyê bikaranîna têgiha kurmanc di versiyona ku ji aliyê Feqiyê Teyran hatiye nivîsîn de jî heye.

“Keç dibê lawê rast ne

Mîr li kurmancan qiyas ne

Te ji destê min xelas ne

*Bo li te didim muhletê*⁴⁷²

Di vê mînakê de jî eynî wekî mînaka jorîn, têgiha kurmanc ne di wateya grûbeke etnîk de lê di wateya tebeqeyeke civakî de yanê bi wateya çînî hatiye bikaranîn ku ev reng bikaranîn di gelek metnên folklorî de derdikeve pêş me.⁴⁷³

Di mînaka jorîn de jî, diyar e ku kurmancbûn di wateyeke çînî, tebeqeyeke civakî de hatiye bikaranîn. Lewre Xatûn, ku jina Mîr e, ji Zembîlfiroş re dibêje: Kurmanco! Tu serqotî, pêxasî, were bidime te kurk û lîbasî. Ji xwe di hemî varyant û versiyonên vê destanê de em hertim lê rast tînin ku ji bo Zembîlfiroş têgiha *feqîr* tînin bikaranîn. Li gorî hin lêkolanan, di vê destanê de mebest ji têgiha *feqîr*, ji çîneke civakî bêtir, têgiha *feqîr* e ku di sîstema baweriya êzdiyatîyê de heye.⁴⁷⁴ Yanê dema ku di destanê de tînin gotin ku; Zembîlfiroş lawekî *feqîr* e, ev jî statuya wî ya dunyewî bêtir, balê bi ser statuya wî ya dînî ve dikêşe. Lewre di baweriya êzdiyatîyê de *feqîr* xwedî cihê girîng in.

“Di nava civaka êzdiyatîyê de erka bingehîn ya feqîran ew e ku; ew dev ji her tiştên dunyewî berdidin û xwe didin ser rêya xweda. Ew lazim e bibin mînakeke bêqusûr ya vê erkê. Feqîr, divê bi demên dirêj rojiyê bigire, cixare nekêşe û araqê venexwe. Divê di nava livînên hişk de razê û cilên hirî û qalind li xwe bike... Hem

⁴⁷¹ C. Celîl-O. Celîl, *Zargotîna Kurda I*, r. 189.

⁴⁷² M. Xalid Sadînî, *Feqiyê Teyran, Jiyan, Berhem û Helbestên Wî*, Weş. Nûbihar, Çap 7, 2013, Stenbol, r. 406.

⁴⁷³ Têgiha kurmanc di folklorê kurdan de jî têgiha kurd bêtir hatiye bikaranîn û pirî caran di wateya çînî de derdikeve pêş me. Wekî mînak di destana Cembelî û Binevşa Narîn de, dema ku Cembelî tînin ber çadira pîreke ji rêzê dibêje: ‘Li min heram be obê kurmancî!’ Her wiha, Binevşê dema ku pesnê Cembelî dide, dibêje ku; ew ne kurmanc e lawê mîra ye. (Bnr. A.V. Le Coq, *Kurdische Texte* (1903), r. 21.) Lê di nava kurmancên elewî de carina ew bi wateya nasnameya etnîk de derdikeve pêş me. Bi piranî ji bo xwe dibêjin: Em kurmanc û elewî ne. Li vê derê her du nasnameyên dînî û etnîk bi taybet tînin bibîranîn.

⁴⁷⁴ X. Şengalî, *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre*, Bergî Yekem, r. 130.

*feqîr û hem jî cilên ku ew li xwe dikin (xirqe) pîroz tê dîtin. Xirqeyê wan yê ku wilo tê bawerkirin ku kopyayêke xirqeyê Şêxadî ye, pir pîroz e.*⁴⁷⁵

Wekî ku em ji vê pênaseya jorîn têdigehên, feqîr bi daxwaza xwe, dev ji mal û mulkê dinyayê berdidin û cureyek jiyana derwêşî tercîh dikan. Ev yek di Destana Zembîlfiroş de, di gelekî varyantan de derdikeve pêş me. Heta li gorî hin varyantan Zembîlfiroş di eslê xwe de lawê mîr e. Lê ew dev ji hemî îmkânên dora xwe berdide û derwêşiyê yanê feqîriyê tercîh dike. Her wiha di vê termînolojiyê de bi têgiha feqîr ve girêdayî têgiha xirqe jî girîng e ku em di çend versiyonên destanê de lê rast tên ku ji bo Zembîlfiroş feqîr û xirqepoş tê gotin. Wekî mînak:

“Sondî dixwim bi enya babê

Narûnim ez li textê

Li kes nakem xedr û zulmetê

Dê bim feqîrek xirqepoş⁴⁷⁶

Lê divê em jibîr nekin ku têgihên mîna derwêş, xirqe, loqme ne tenê taybet in bi baweriya êzdiyatîyê. Heta ew di sûfîzma îslamî de jî derdikevin pêş me û her wiha di baweriya elewîtiyê de jî gelek berbelav in. Di vê risteya jorîn de li kêleka hev bikaranîna têgihên wekî feqîr û xirqe, ji ber girîngiya wan ya bi hev re di baweriya êzdiyatîyê de, wekî şîrove rê li me vedike ku em vê wekî xwendineke êzdîkî ya destanê bibînin. Jixwe êzîdî di her wesîleyê de xwedî li vê destanê derdikevin û wilo îdîa dikan ku Zembîlfiroş, êzîdî bûye.⁴⁷⁷ Di varyantên ku Celîlê Celîl û Ordîxanê Celîl berhev kirine de em vê israra li ser nasnameya dînî ya Zembîlfiroş aşkera dibînin.

“Zembîlfiroş serê xwe datîne

Xewka şîrîn hiltîne

Xatûn perî li ser serê xwe dibîne

Dibê dûrî min here! Dûrî min here!

Ez êzdî me tu surmanî

⁴⁷⁵ P. G. Kreyenbroek, *Ezidilik*, r. 135.

⁴⁷⁶ Mûrdxanê Bayezîdî, *Çiroka Zembîlfiroş*, Veguhastin: M. Xalid Sadinî, Kovara Nûbihar, Hejmar:87, Zivistan, 2002, Stenbol, r. 13.

⁴⁷⁷ X. Şengalî, *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre*, Bergî Yekem, r. 129.

Me'ra me hev nabire''⁴⁷⁸

Di vê risteyê de bi aşkerayî tê dîtîn ku Zembîlfiroş wekî xortekî êzîdî hatiye dîtîn. Li vê derê têgiha 'surman' bi wateya misliman e. Ew cureyek telafuza herêmî ya têgihê ye.

Di heman varyantê de, piştî mirinê, Zembîlfiroş diçe cenetê lê dibîne ku Xatûn li wê derê jî li dû wî tê:

*“Zembîlfiroş diçe cinetê, dergewanê cinetê xortek nû ye, navê wî Ahmed bûye. Divê: Kekê Zembîlfiroş, tu li van dera? Dibê ciyê Zembîfiroş nîşan didêda, lê dinihêre Xatûn jî hatêda. Divê: Eva kiyê? Divê: **Eva surman e**, mi kir nekir, lê xilas nebûm, îjar jî hatiye vira. Îjar erd dipîvin, sê gava lê dûr dixin.”*⁴⁷⁹

Di van her du pasajên jorîn de tê dîtîn ku êzîdî, vê destanê di çarçoveya baweriyên xwe yên dînî de dibînin û neqil dikin. Her wiha di nava êzîdiyan de, hatiye qedexekirin ku xortek êzîdî an jî keçek êzîdî bi mislimanek re bizewice. Ev wekî ku me di beşa yekem de jî îşaret pê kir, qaîdeyêke giştî ya civakên mînor e ku bi armaca xweparastinê hildigirin. Lewre ew pêşiya vê vekin, di demeke kin de ji aliyê demografîk ve, ew dikevin binê xetereyê. Di Destana Derwêşê Evdî û Edûlê de jî temayeke bingehîn; meseleya zewaca di navbera êzîdî û mislimanan de ye.

Di vê varyanta Celîlan de ji bilî van nîşaneyên ku mohra aîdiyetê li destanê dixin, behsa Qereçarşemê jî tê kirin ku ew rojek pîroz e bo êzîdiyan.

*“**Qereçarşem** roja cînara*

Ez bûm girtiyê zîn û zîndana

***Qereçarşem** roja şerîfe*

Ew xatûna gerden hebîbe

Egle kiriye lawkê letîf e''⁴⁸⁰

⁴⁷⁸ C. Celîl-O. Celîl, *Zargotina Kurda I*, r. 190.

⁴⁷⁹ H.b., r. 193.

⁴⁸⁰ H.b., r. 190-191.

Qereçarşem, di termînolojiya dînî ya êzdiyatîyê de wekî Cejna Melekê Tawis tê zanîn. Lê di nava gel de carina wekî Çarşema Sor jî tê binavkirin. Li gorî baweriya êzîdiyan, Melekê Tawis di vê rojê de daketiye dunyayê û di vê rojê de afirîna kaînatê qediyaye.⁴⁸¹

Di varyanta Xeyrî Şengalî de ku ji deverên Şengalê hatiye berhevkirin, ev vegotin wekî *Destana Zembîlfiroş û Gul Xatûn* hatiye binavkirin û hê di destpêka destanê de, di jêrenota yekem de berhevkar qeyd kiriye ku; li gorî bîr û boçûnê êzîdiya Zembîlfiroş êzîdî bûye.⁴⁸²

Di vê varyantê de gelek nîşaneyên ji baweriya êzdiyatîyê hene ku evana wekî ku me di beşa duyem de jî behs ji wan kiribû; şexsiyet an jî pîroziyên wekî *Melekê Cebbar, Melek Cebraîl, Laliş, Feqîr, Mîr Brahîm Adem* û têgihek bi navê *Toka Qudretê* ye ku li gorî Şengalî ew nîşaneyên kesayetiya êzîdiyan e.⁴⁸³

Têgiha feqîr di vê varyantê de jî derdikeve pêş me ku berhevkar bi xwe di jêrenota xwe de îşaret pê dike ku ev reng bikaranîna têgiha feqîr, nîşaneyên bikaranîna termînolojiya dînî ya êzdiyatîyê ye.

“Zembîlfiroş lawkê feqîra

*Keremke were dîwana mîra”*⁴⁸⁴

Di vê varyantê de, ji aliyê nîşaneyên baweriya êzdiyatîyê ve, herî zêde pîroziyên wekî Melekê Cebbar û Cebraîl hatine bikaranîn. Lê ji zarê vebêj bi qandî ku tê fêmkirin Melekê Cebbar û Cebraîl wekî du pîroziyên cuda hatine hêlengandin. Dema ku dua ji Xweda tê kirin, Melekê Cebbar tê telafuzkirin lê dema ku Zembîlfiroş xwe ji ser bircê davêje, bang li Cebraîl tê kirin ku bikeve milê wî û Zembîlfiroş li erdê nekeve.

“Îlahiyo Melekê Cebbar

Of of!...

Îlahiyo Melekê Cebbar

Êt wekî hebîbê necar

⁴⁸¹N. Fuccaro, *Öteki Kürtler*, r. 38.

⁴⁸² Bnr. X. Şengalî, *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre*, Bergî Yekem, r. 129.

⁴⁸³ Bnr. H.b., r. 129, Jêrenot: 3.

⁴⁸⁴ H.b., r. 130.

.....

Êt wekî Brahîmul Xelîl

Bi agirê mencenîqa Nemrûdî dibûwe sar

Êt wekî Mîr Brahîmê Adema

Li çilê germa havînê ji nîza dimrin

....

Îlahiyê ser kursiyê

Êt wekî Ebûzeydê bin Hîlal

Te ji Lalişê avêtine nav

Erebê binê beriyê

....

Tu mi xelas bike ji destê Xatûnê

Banga Îlahiyê Melekê bi tenê⁴⁸⁵

Di van pasajên jorîn de tê dîtin ku nîşaneyên dînî yên êzdiyatîyê di destanê de çiqas xwedî bandor in. Destan, ji metneke folklorî bêtir dişibe vegotîneke dînî ya êzîdiyan. An jî wan bi vegotîna xwe ya taybet, rengê bi vî awayî dane destanê. Li vê derê teqez tê dîtin ku Melekê Cebâr wekî Melekê Tawîs hatiye tesewirkirin. Lewre di hin mînanan de ew bixwe wekî Îlah û di hin mînanan de jî ew wekî îlahêkî li kêleka Îlahê mezin hatiye tesewirkirin. Wekî mînak:

“Cebraîlo teyrê sipî

Tu carekî kerekmke here deyne li ba wî

... Tu bi derwêşê mi bigire

Deyne ser erdê hêdî

Keleha mermer hezare

Zembîlfiroş tê de dihat xware

Bi îzna Xudê û Melekê Cebare⁴⁸⁶

Di vê pasajê de tê dîtin ku li kêleka pîroziya Xudê, pîroziyên wekî Melekê Cebâr û Cebraîl hatine telafuzkirin. Li vê derê baş nayê fêmkirin ku Cebraîl û

⁴⁸⁵ H.b., r. 131-132.

⁴⁸⁶ H.b., r. 133.

Melekê Cebâr wekî heman kesayet hatine dîtin an na. Lê ya teqez ev e ku Melekê Cebâr wekî Melekê Tawîs hatiye tesewirkirin. Lewre êzîdî Melekê Tawîs jî wekî cureyek Xwedê dibînin û jixwe Cebâr di heman demê de navekî Xwedê ye jî. Her wiha berhevkar Şengalî bi xwe di jêrnota xwe de diyar dike ku ji Melekê Cebâr mebest Melekê Tawîs e.⁴⁸⁷

Di pasaja jorîntir de, li kêleka têgiha Melekê Cebâr, behsa şexsiyetek bi navê *Mîr Brahîm Adem* hatiye kirin ku ew di termînlojiya dînî ya êzîdiyan de xwedî cihekî taybet e.⁴⁸⁸ Ji bilî vana peyva Laliş jî derbas dibe ku ev cihê pîroz yê êzîdiyan e.

Di destanê de di du deran de têgiha ‘Toka Qudretê’ derbas dibe ku berhevkar di jêrneota xwe de diyar dike ku ew nîşaneyê kesayetiya êzîdiyan e lê ez di encama lêkolînên xwe de, di vê mijarê de rastî tiştek nehatim.

“Xatûnê lê li te hermetê

Û te li stû de toka qudrêtê

Ez newêrim ji roja axretê

Lê xatûnê li te hermetê

Li stû de toka qudrêtê

Newêrim ji roja axretê”⁴⁸⁹

3.3.2. Varyantên Kurdên Elewî

Di binê vê sernavê de em ê bala xwe bidin du versiyonên Destana Zembîlfiroş ku ji aliyê A. v. Le Coq ve ji herêma Klîs û Islahiye hatine berhevkirin. Lê divê em vê qeyd bikin ku, ev berhevkarî beriya avabûna Komara Turkiyê hatine kirin (1902-1903) û sînor ne sînorên îroyîn in. Lewre herêma ku berhevkarî lê hatiye kirin, hingê di nava sînorê Klîsê de bû lê niha ew li derveyê sînorê Turkiyê mane. Jixwe vebêj di dawiya çîrokê de wiha neqil dike:

“Le sencaqê Helebê, le qezayê Klîs, le nehiyeyê Biya, le qariyeyê Mabata, bi mi ra diwên Lawê Cafer Axa Seydî Efendî diwên.”⁴⁹⁰

⁴⁸⁷ Bnr. H.b., r. 133, Jêrenot: 2.

⁴⁸⁸ Bnr. H.b., r. 131, Jêrenot: 1.

⁴⁸⁹ H.b., r. 129,135.

Her wekî ku me di nexşeyên beşa yekem de jî dabû nîşandan⁴⁹¹, herêmên ku vebêj îşaret pê dike bi kurmancên sunî, kurmancên elewî û kurmancên êzîdî dorpêçkirî ye. Ji xwe bandora vê rewşê di çîrokên wan de jî têne dîtîn. Konfliktên dînî di asteke bilind de li pêş in û lewre di çîrokên wan de mohrên dînî gelek in. Wekî mînak di heman berhevoka Le Coq de, di *Hikayeta Şêx Mûsa* de, tundiyeên dînî-bawerî gelek aşkera tîne dîtîn. Di vê çîrokê de Şêxmûs, ji ber ku xwişka xwe ya bi navê Sityê nade kurmamê xwe, mecbûr dimîne tevî şeş birayê xwe û xuşka xwe Sityê, ji ciyê xwe koçber bibe. Şêxmûs diçe heya herêma Şengalê û xwe dispêre Pîr Kal ê êzîdî ku serokê qewmê êzdiya ye. Lê Pîr Kal jî xuşka wî Sityê jê dixwaze û bi vî rengî ew bi êzîdîyan re dikevin şer. Di vê hîkayetê de vebêj hîkayeta xwe di nava gelek hêmanên dînî yên wekî, *Yezîd*, *Yezdîxan*, *Huseyin*, *Şehîd*, *Kafir*, *Bozatlî Xizir Aleyhî Selam* de honandiye ku ev motîf aydê baweriyên êzdiyatî û elewîtiyê ne.⁴⁹²

Heman vebêj, di vegotinên ku neqil dike de, di gelek deran de, refere bi sembol an jî têgihên dînî yên elewîtiyê dike. Wekî mînak di destana Memê Alan de, navê bavê Mem, digel ku di hemî varyantên destanê de wekî Al Paşa derbas dibe jî, di vê varyantê de wekî Alî Paşa derbas dibe.⁴⁹³ Dîsa di heman berhevokê de, vebêj dema ku Destana Memê Alan neqil dike hin têgihên dînî yên wekî *îqrar* û *duşkun* bi kar tîne ku ev têgih di nava termînolojiya dînî û civakî ya elewîtiyê de bi berbelavî tîne bikaranîn.⁴⁹⁴

Di cîlda pêşîn ya berhevoka Le Coq de, ku ev cîld bi alfabeya erebî û kurmancî ye, ji zarê sê zarbêjan, bi navê *Hikayê Zenbîlfiroş*, *Hikayê Zemilfiroş* û *Zemilfiroş* sê versiyonên cuda yên Destana Zembîlfiroş hene. Ji van hersê versiyonan ya pêşî, ya bi navê *Hikayê Zenbîlfiroş*, ji zarê *Cafer Oxlî Seyîd Efendiye Biya* hatiye qeydkirin ku ew bi xwe neqil dike ku ji herêma Biya an jî Efrîna îroyîn e. *Hikayê Zemilfiroş*, ji zarê *Eliyê Gundê Dilk* (Dibe ku Dîlok be) hatiye qeydkirin û ya bi navê *Zemilfiroş* ji zarbêjek bi navê *Hafîz* hatiye qeydkirin. Em ê di vê miqayesê de versiyona ewil ya bi navê *Hikayê Zenbîlfiroş* û ya dawî ya bi navê *Zemilfiroş* vekolin.

⁴⁹⁰ A. V. Le Coq, *Kurdische Texte II*, 1903, Berlin,

⁴⁹¹ Bnr., M. R. Izady, *Kürtler*, r. 249.

⁴⁹² Bnr., A. V. Le Coq, *Kurdische Texte II*, r. 5

⁴⁹³ Bnr., H.b., r. 57.

⁴⁹⁴ Bnr., H.b., r. 18, 39.

Di van her du versiyonan de têgihek, bi regekî watedar di metna destanê de dubare dibe. Ev, têgiha *Elî Ellah/Eliyullah* e. Di beşa li ser baweriya elewîtiyê de, di pênaseyên li ser vê baweriyê de, em rastî vê têgihê hatibûn. Baweriya Elî Îlahî cureyeke baweriya elewîtiyê ye lê belkî aliyê tûj yê vê baweriyê temsîl dike.⁴⁹⁵ Di metneke folklorî ya kurdan de rastî nîşaneyên vê baweriyê hatin, bêguman xaleke şayanê vekolînê ye. Loma me xwest ku em bi taybetî balê bikêşin ser vê yekê.

Di versiyona ku ji zarê Cafer Oxlî Seyid Efendiyê Biya hatiye qeydkirin de, di du deran de ev tegih derdikeve pêş me:

“Digo tu were meslehetê

Bi te dem malê dewleta

Tu bibînî vê lezetê

Elî Ellah şahê qudrete⁴⁹⁶

Di heman versiyonê de, di dereke din de ku Xatûn dixwaze Zembîlfiroş bixapîne, jê re wiha dibêje:

“Tu were ser meslehetê

Bibînî vê lezetê

Cîka deyne xewka min tê

Elî Ellah şahê qudretê⁴⁹⁷

Di versiyona ku ji zarê Hafîz hatiye girtin de jî bikaranîna têgihê bi regekî nêzîkê vê ye:

“Tu were ser meslehetê

*Şuxul bike xêra te*⁴⁹⁸ *tê*

Elî Ellah şahê qudrete⁴⁹⁹

⁴⁹⁵ Bnr. M. E. Zeki Beg, *Dîroka Kurd û Kurdistanê*, r. 198-199.

⁴⁹⁶ A. V. Le Coq, *Kurdische Texte I*, r. 19.

⁴⁹⁷ H.b., r. 20.

⁴⁹⁸ Di orjîna metnê de ku bi tîpên erebî ye, 'Xebra de' hatiye nivîsîn lê îhtîmalek mezin xelet hatiye nivîsîn û rastiya wê 'xêra te' ye. Lewre di hin metnên dî de heman hevok heye û bi rengê 'xêra te' ye. Bnr: Li varyanta ku di sala 1933'yan de ji aliyê Înstîta Tarîxa Kulturê ya Ermenistanê ve A, Xanaşanyan ji zarê Manûk Harûtûnyan vegirtiye hatiye berhevkirin. r. 560.

Digel ku me berê di mînaka Dêrsimê de dîtibû ku motîfên dînî di metnên folklorê de bi berbelavî tînin dîtin jî, di tu metneke elewiyên Dêrsimê de em rastî îfadeyek bi vî rengî nehatine. Di vê îfadeyê de Hz. Elî wekî Xweda hatiye dîtin.

Di heman berhevokê de têgiheke dî ya girîng aydê baweriya elewîtiyê derbas dibe. Ev têgiha, *Heq* an jî *Riya Heq* e. Wekî ku tê zanîn *Heq* jî di nava 99 navan de navekî Xweda ye. Lê di nava civaka elewî de rêjeya bikaranîna vî navî, li gorî navên dî gelek berbelav e. Mînakên vê yekê di nava civaka elewiyên Dêrsimê de gelek derketibûn pêş me. Ji xwe ji ber vê taybetmendiyê ye ku pîrî caran ev civak wekî civaka Ehlê *Heq* tê pênasekirin û ji baweriya wan re jî *Riya Heq* an jî *Rayî Heq* tê gotin.

Di versiyona Cafer Oxlî Seyid Efenî de, ev tabîr di dawiya destanê de sê caran derdikeve pêş me.

“Gul Xatûn ez tobedar im

Li ser riya heqî cebar im

Şevî reş e di şevê da

Zenbilfiroş dî je wê da

Cehenem reş e arî tê da

Gul Xanim ez î tobedar im

Li ser riya heqî cebar im

Zenbilfiroş nekîr

Du rike't nimê le boyê Xudê kir

Ya Rebî min xêçil meke

Gul Xatûn ez tobedar im

Li ser riya heqî cebar im⁵⁰⁰

Di vê pasaja jorîn de bandora diyardeya baweriyê li ser metna folklorê bi rengêkî aşkera derdikeve meydanê. Di vê mînaka jorîn de têgiha *Heq* bi du wateyan tezahur dike. Yek jê *Heq* a ku di nava têgiha *Riya Heq* de watedar dibe

⁴⁹⁹ H.b., r. 812.

⁵⁰⁰ A. V. Le Coq, *Kurdische Texte I*, r. 20.

ku ev yek balê bi ser navê baweriyê dikêşe. Ya duyem jî *Heqê Cebar* e ku li vê derê Heq wekî navekî Xweda derdikeve pêş me.⁵⁰¹ Di her du halan de jî têgiha Heq bi baweriya elewîtiyê re têkildar e. Wekî ku me di beşên jorîn de jî îfade kir, têgiha Heq bi wateya Xweda, di nava grûbên kurdên sunî de jî tê bikaranîn. Lê ne di rêjeyeke bilind de ye. Di nava grûba kurdên elewî de, ev yek gelek ber bi çav e û rêjeya bikaranîna wê gelek bilind e.

Di varyantên dî de ku ji zarê zarbêjên êzîdî hatibûn neqilkirin, heman têgih wekî Melekê Cebar derketibû pêş me. Wekî mînak; di varyanta Şengalî de ku ji herêma êzdiyên Şengalê hatiye berhevkirin, ev têgih di heman destanê de bi vî rengî derketibû pêş me:

“Keleha mermer hezare

Zembîlfiroş tê de dihat xware

Bi îzna Xudê û Melekê Cebare”⁵⁰²

Di gelek versiyonên dî de ev tabîr wekî *Xaliqê Cebar* derbas dibe. Çawa ku di versiyona ku Şivan Perwer û Gulîstan Perwer jî dixwînin de jî derdikeve pêş me:

“Ditirsim ji agirê êtûnê

Ya Xatûn ez tobedar im

Tobedarê Xaliqê Cebar im”⁵⁰³

Bi vî rengî di heman destanê de, di heqê heman heyinê de sê tabîrên ji hev cuda wekî Melekê Cebar, Heqê Cebar û Xaliqê Cebar derdikevin pêş me. Ev yek bêguman bi rengekî aşkera bandora baweriyê ya li ser metnên folklorî dide der. Li vê derê ji bilî têgiha melek, hemî têgihên dî; Heq, Xaliq û Cebar navên Xweda ne. Lê divê em vî sînorî bibînin ku, wekî mînak di tu metneke kurdên elewî de ne pêkan e ku em bibînin ku têgiha Melekê Cebar bê bikaranîn. Her wiha ev têgih di

⁵⁰¹ Divê li vê derê em qeyd bikin ku di Zembîlfiroşa ku Feqiyê Teyran nivîsiye de, têgiha heq di çend deran de derdikeve pêş me lê bi tenê wekî heq, ne wekî Heqê Cebar. Di varyanta Feqî de jî Heq bi wateya Xweda ye.

⁵⁰² X. Şengalî, *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre*, Bergî Yekem, r. 133.

⁵⁰³ Şivan-Gulîstan Perwer, *Zembîlfiroş*, https://www.youtube.com/watch?v=TkTD0_TrjwA, Dîrok: 01/07/2020, Saet: 17:00

tu metnên kurdên êzîdî de jî wekî Heqê Cebar an jî Xaliqê Cebar dernekete pêş me. Ew her tim têgiha Melekê Cebar tercîh dikin ku ji vê têgihê mebest Melekê Tawis e. Bi vî rengî tê dîtin ku semboleke dînî dema ku di nava berhemeke devkî de dikeve nava rêwîtiyeke navber civakên etno-dînî bi çî rengî tuşî guherînan dibe. Lewre her civaka etno-dînî, mohra xwe ya nasnameyî li berhema folklorê dixê.

3.4. Destana Kela Dimdim

Di binê vê sernavê de, em ê bi vekolîneke kurt nîşan bidin ku bêjara destanan bi çî rengî di kontekstên bawerî û dînî de, di nava dirêjahiya dem û asta mekanî de diguherin.

Di *Destana Kela Dimdim* de an jî bi hin navên cuda wekî *Destana Xanê Çengzêrîn*, *Xanê Lepzêrîn*, sê tema an jî konfliktên bingehîn hene ku li gorî varyantên destanê, di wan de hin guherîn rû didin. Ev konflikt ev in: Nasnameya etnîk, nasnameya dînî û nasnameya eşîrî. Di hemî varyantên destanê de kêr zêde di van xalan de li gorî diyardeya dem û deverê di warê girîngîdayînê de hin guherîn rû didin. Di hin varyantan de em dibînin ku diyardeya etnîsîteyê li pêş hemî diyardeyên dî ye û konflikt li ser esasê dijberiya du nasnameyên etnîk; kurd û ecem, rû dide. Di varyantên bi vî rengî de dîsa diyardeya eşîrî û dînî heye lê bi qandî diyardeya etnîsîteyê ne li pêş in. Di hin varyantan de em dibînin ku diyardeya dîn û baweriyê li pêş e û konflikt di navbera du baweriyên cuda de wekî sunî û şîe, rû dide. Dîsa di varyantên bi vî rengî de jî diyardeyên eşîr û etnîsîteyê hene lê li gorî diyardeya mezhebî gelek li paş mane.

Di vê beşê de, em ê wekî beşên dî, miqayeseyê di navbera varyantên ji herêmên elewî û êzîdî de nekin lewre em çî li herêmên ku em lê geriyane û çî jî di pirtûk û xebatên ku li ser vê mijarê hatine kirin de, rastî varyantek ku li herêmên kurdên elewî hatibe gotin nehatine. Di varyantên ku ji herêma Kurdistana Rojhilat hatine berhevkirin de, bi giranî dîskûrsa dînî li pêş e lê varyantek ku em karin bibêjin ji herêmên kurdên şîe hatiye berhevkirin tune ye. Lewre em ê berawirdiyê

bêtir di navbera varyantên ku ji herêma destanê, ji Bradost û Mukriyanê⁵⁰⁴ hatine berhevkirin û varyanteke ku ji zarê zarbêjên êzîdî hatiye gotin de bikin. Ev rewş bêguman me ji bingehê teza me dûr naxe lewre mijara teza me; bandora nasnameyên dînî û etnîk li ser vegotinên gelêrî ye.

Yek ji varyanta ku em ê bikin mijara vê miqayeseyê, varyanta Oskar Mann e ku wî, ev varyant ji herêma Mukriyan berhev kiriye û ev herêm di heman demê de cografyaya destanê ye jî lewma gelekî girîng e. Dîroka çapkirina vê varyantê 1906 e. Mann, vê varyantê li bajarê Mahabadê, ji zarê Rahmanê Bekir qeyd kiriye û ev versiyon di nava kurdên mukrî de baş tê zanîn.⁵⁰⁵

Varyanteke dî ku em ê bikin mijara vê vekolîna kurt, varyanta Heciyê Cindî ye. Ev varyant di sala 1931 de, ji gundî Sabûnçî yê bi ser nehîya Talînê, ji aliyê Heciyê Cindî û Cerdoyê Gêncî ve ji zarê Hemê Mamed hatiye qeydkirin.⁵⁰⁶

Varyanta dawîn ya ku em ê bikin mijara vekolînê, varyanta Celîlê Celîl û Ordîxanê Celîl e ku wan ev varyant di sala 1958an de Taşkenta Ozbekîstanê ji zarê Kerîm Melko qeyd kirine.⁵⁰⁷

Ji van varyantan, herduyên dawîn ji zarê zarbêjên êzîdî hatine tomarkirin lewre Celîlê Celîl û Ordîxanê Celîl bi xwe dibêjin ku zarbêjên wan êzîdî ne û her wiha ji bêjara destanê jî mirov têdigihê ku ew ji zarê êzîdîyan hatine gotin lewre tê de taybetmendiyên aydê bawerîya êzîdîyî hene.

“Çewa piraniya kurdê Ermenistanê û Gurcistanê ûsa jî piraniya zarbêjê ku me jê teksta nivîsiye kurdê-êzîdî ne, yek bi zaravê kurmançî xeberdidin.”⁵⁰⁸

Konjektora demî ya rûdana bûyerê, ji aliyê nakokiyên dînî û mezhebî ve gelek girîng e. Lewre di wê demê de, di navbera Dewleta Osmanî û Dewleta Safewî de şerekî hegemonîk hebû û di vî şerî de termînlojiya dînî bi regekî fonksiyonel dihate bikaranîn ku aliyek jê serkêşîya îdeolojiya sunîtiyê dikir (Osmanî) û aliyê dî jî serkêşîya îdeolojiya şîetiyê dikir (Safewî). Bi giştî

⁵⁰⁴ Ordîxanê Celîl, *Dimdim, Kürt Kahramanlık Destanı*, Avesta Yayınları, Çev. İbrahim Kale, 2. Baskı, 2016, İstanbul, r. 19-20.

⁵⁰⁵ Oskar Mann, *Kurdische-Persische Forschungen. Die mundart der Mukri-Kurden*, 1906, Berlin, Abteilung IV, Bd III, T.1, r. 12-24.

⁵⁰⁶ H. Cindî, *Folklor Kurmançiyê*, Weşanên Lîs, Ç. I., 2016, Amed r. 155-179.

⁵⁰⁷ C. Celîl-O. Celîl, *Zargotina Kurda II*, Weşanên Aram, Ç. 3, 2013, Amed, r. 164-178.

⁵⁰⁸ C. Celîl-O. Celîl, *Zargotina Kurda I*, r. 18.

Kurdistan û bi taybetî devera Biradost û Mukriyan ku navenda bûyerên destanê bûn, di navbera şerên van her du îdeolojiyan de wekî meydana şer bûn.

“Di vê serdemê de, Îran, di nava wê hewlê de bû ku yekîtiya siyasî ya herêma xwe li derdora dewleta Safewî ava bike. Dewletê axa xwe firehtir dikir û wekî encam meyleke navendîparêziyê derket pêş. Safewiyan, dixwestin ku vê herêma ku pir etnikî bû û di navê de ekonomiyên curbecur hebûn li derdora yekîtiyê siyasî ji nû ve ava bikin. Di vê navberê de dewleta Qizilbaş, baweriya şîetiyê wekî dînê serdest yê dewletê li ser gelê misliman ku tê de mezhebên cuda û eşîrên cuda hebûn, ferz dikir.”⁵⁰⁹

Vê tesbîta ku ji aliyê Celîl ve tê kirin, di gelekî versiyonên destanê de tê dîtin. Lê divê em vê yekê tesbît bikin ku di heqê bûyereke dîrokî de hem di dema xwe de û hem jî di nava dirêjahiya demê de dibe ku gelek nêrînên cuda hebin. Li vê derê rastiyeke teqez ya bi vî rengî tune ye ku em bibêjin nihêrîna herî rast ya aydê dema bûyerê ye an jî nihêrîna herî rast ya aydê herêma ku bûyer lê qewimî ye. Tesbîteke bi vî rengî wê me ber bi xeletiyên ve bibe. Lewre dibe ku bûyereke çiqas ji dema xwe dûr bikeve ew çend bi rengekî realist bê têgihîştin. An jî bûyer çiqas ji herêma xwe ya germ dûr bikeve, ew çend bi rengekî realist bê fêmkirin. Her wiha yek dikare bereksê vê jî îdîa bike. Yanê yên ku bûyerê di dema xwe û di herêma bûyerê de jiyane rastiya bûyerê têgihîştine lê yên ku ji dema dûr û devera dûr lê dinihêrin wê di çarçova texeyulên xwe yên wê demê û wê mekanê de têgihîştine. Li vê derê armanca me ne ew e ku em deynin meydana ka kîjan nihêrîn an jî ji ku nihêrîn ya herî rast e. Armanca ev e ku, em derxin meydana ku her bûyer di pêwendiya dem û deverê de tê şîrovekirin. Her wiha li kêleka faktora dem û deverê, faktoreke girîng jî ev e ku her civak an jî etnîsîte heman bûyerê di çarçoveya hevî û texeyulên xwe de şîrove dike. Lewma her berhema folkorî ku di dem û deverê de û di konteksta civakeke diyar de tê vegotin di heman demê de cureyê şîrovekirina wê civakê ye.

Di piraniya varyantan de, em fêmkirin ku Xan û derdora wî ji Dewleta Osmanî alîkarî hevî kirine lê ew alîkarî tu car nehatiye.⁵¹⁰ Ev yek jî nîşaneyek e

⁵⁰⁹ O. Celîl, *Dimdim, Kürt Kahramanlık Destanı*, r. 15.

⁵¹⁰ Di varyanta Mann û ya Albert Socin de tê gotin ku nameya Padişahê Osmanî bo Xan tê û jê dixwaze ku ew heft rojên di jî di ber xwe bide û ew ê alîkarî bigihîjê lê leşkerên Şah, sîxur diqefêlin û nameyê diguhêrin û heft rojan dikin heft sal. Dema ku Xan nameyê dixwîne, hevîya wî bi temamî dişkê.

ku ev bûyer di wê demê de ji aliyê piraniya kurdan ve wekî meseleyeke dînî hatiye fêmkirin.

3.4.1. Varyanta Oskar Mann

Di varyanta ku Oskar Mann di sala 1903yan de ji herêma Mukriyanê berhev kiriye û di sala 1906an de li Berlinê çap kiriye de, bûyerên wê demê bi temamî di nava dîskûrseke dînî û mezhebî de hatine ravekirin. Destan ew çend bi bêjareke dînî-mezhebî dorpêçkirî ye ku, bi tu rengî em dîskûrseke etnîk-netewî tê de nabînin. Girîngiya vê varyantê ew e ku ew ji herêma ku bûyer lê qewimiye, hatiye berhevkirin. Lewre ev varyant di heqê têgihîştina herêmî de gelek daneyan tîne ber dest. Ev varyant ji nava kurdên sunî hatiye berhevkirin û em ê vê varyantê bi her du varyantên êzîdiyan miqayese bikin da ku cudahiya di navbera xwendina navber-civakî de derbikeve holê.

Taybetiyeke vê herêmê ew e ku cîranên kurdan yên rojhelat û bakûr ‘ecemên qizilbaş û tirkên qizilbaş in. Li gorî Cafer Açar; her çendî ku Şah Ebbas, li hember hukumraniya herêmî û dewletî ya tirkên qizilbaş xwestiye îtîfaqa xwe bi kurdan re qehîm bike jî û bi vê mexsedê destûr daye Xan ku ew li Dimdimê kelayek ava bike jî, di encama tehrîkên tirkên qizilbaş de, mecbûr maye ku êrîşê Mukriyan û Kela Dimdimê bike.

“Piştî ku Emîr Xan Bradostî Kela Dimdimê ava kir, qizilbaşên tirkmen yên li herêma Êrmîyê vê yekê li hember desthilatdariya xwe ya herêmî wekî tehdîdek hesibandin û hewl dan ku navbera Şah û Emîr xera bikin. Di vê hewla xwe de bi ser ketin û nihayet di navbera Xan û Şah de şer qewimî.”⁵¹¹

Lê li aliyê dî, Ordîxanê Celîl, digel ku behsa konjektora mezhebî ya wê demê dike jî, îdîa dike ku dînamîka esas ya bûyerên Kela Dimdimê, ji şerên mezhebî bêtir, meseleya yekkirina îdareya kurdan e û li dû fikra wî Xanê Mukrî dixwaze vê yekê pêk bîne.

“Emîr Xanê ku dixwest herêmên kurdan ji talana biyaniyan rizgar bike, her ku diçû bêtir navdar dibû û îtibara wî mezintir dibû... Armanca Emîr Xan ew bû ku mîrekiyên kurdan bîne cem hev, di navbera wan de yekîtiyê ava bike û bi vî rengî

⁵¹¹ Cafer Açar, *Safevi Kroniklerde Dımdım Kalesi Kuşatması ve Emir Han Bradosti*, Avesta Yayınları, 1. Baskı, 2019, İstanbul, r. 22.

ewlehiya herêma xwe garantî bike û bingehên dewleta kurdan çê bike. 'Di dawiyê de fikra serxwebûnê kete hişê Emîr Xan.' Wekî gava pêşîn jî, ji bo ku fermanê derbixe li Êrmîyê bi cih bû, yanê vê derê ji xwe re kir paytext. Lê demek şûn de wexta ku seyra bûyeran dît, dev ji vê fikra xwe berda."⁵¹²

Wekî ku em ji van her du tesbîtên di heqê konjektora demê de jî têdigihîjin, di paşxaneya bûyerên wê demê de du dînamîkên esasî hene ku ev; mezheb û nasnameya etnîk-netewî ne. Lê balkêş e ku em di varyantên kevin û yên ku ji herêma destanê derketine de, tu car fokûsek li ser nasnameya netewî ya kurdan nabînin. Di varyanta ku di koleksiyona Jaba de cih digire jî, hîç behsa yekîtiya kurdan nayê kirin. Lê di vê varyantê de jî behsa 'ecemêd rafîzî'⁵¹³ tê kirin.

Di vê nuqtayê de divê em balê bikêşin ser tesbîteke Hassanpour ku bi Destana Kela Dimdimê re têkildar, îdîa dike ku konflîkta kurdan ya bi farisan re het tim dînî-mezhebî bûye.

"Ji nîşaneyên ku di kilaman de derdikevin pêş me pir aşkera ye ku begên kurdan li hember îraniyan bi piranî serî li dîskûrsa cudahiya dînî didan (wekî kurdên sunî û persên şîe); li hember rêvebiriyên turk û ereban jî serî li dîskûrsa cudahiyên etnîk didan (wekî li hember rûman kurd) û bi vî rengî eşîr û gundiya li dora xwe kom dikirin."⁵¹⁴

Di encama vê vekolînê de me jî heman rewşê tesbît kir. Lê ev dîskûrsa dînî, divê em bibêjin ku bi piranî ji bo kurdên ku li ser xeta sînor in derbasdar e. Her ku vegotin ber bi hundir ve tê yanê ji herêmên sînorî ber bi herêmên navîn yên civaka kurd tê, vîcarê dîskûrsa etnîk-netewî li dîskûrsa dînî serdest dibe. Ev taybetiyeke girîng ya vegotinên gelêrî ye.

Di varyanta Mann de, behsa hewla yekkirina îdareya kurdan nayê kirin heta berevajî vê lome li kurdan tê kirin ku ew jî di şikandina serhildanê de alîkariya Şah dikin. Ev yek xaleke baklêş e ku di gelek vekolînên li ser destanê de derdikeve pêş me.

Di vê varyantê de, digel ku ji herêmên kurdên sunî hatiye berhevkirin jî, destpêka destanê bi gelek motîfên şîetiyê tije ne. Lê di dirêjahiya destanê de em

⁵¹² O. Celîl, *Dimdim*, r. 22.

⁵¹³ Bnr. O. Celîl, *Dimdim*, r. 81.

⁵¹⁴ A. Hassanpour, *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil*, r. 129.

dibînin ku li hember şîetiyê îfadeyên gelek tund hene. Di destpêka destanê de ev îfadeyên jêrîn gelekî girîng in:

*“Bangî dikem we ber **îmam Hesên û Huseînî xerîb, merqedîan le Meşhed û Kerbelayê ecem û papaxreşîyan (tirk) deçîne zîaretê, delên: Rojî qîametê xula demandatê îmanê.***

*Bangî dikem we ber **Hezrefî Elî** rojî cime’ û cimae’tan sîar debe le Duldulî, dez dedate Zulfeqarî, daçête xezaî gawir qiranê.”⁵¹⁵*

Digel ku destan bi vê dîskûrsê dest pê dîke jî, di berdewamiyê de em dibînin ku vebêj mezhebê şîe wekî ‘kafir’, ‘rafizî’, ‘ji dîn derketî’ bi nav dîke. Dibe ku sedemê vê yekê ew be ku vebêj, wekî ku di piraniya civaka kurdan de jî tê dîtin, her tim hurmeta xwe ji bo çar xelîfeyan û diwanzde îmaman nîşan didin. Ev yek di berhemên Xanî de jî xwe nîşan dide. Her wiha vebêj bi vê bêjarê, xetek di navbera pîrozîyên bawerîya şîetiyê ku ew di heman demê de ji aliyê piraniya civaka sunî ve jî têne qebûlîkirin û di navbera civaka şîe de dikişîne.

Her wiha ji vê pasaja jorîn diyar e ku vebêj, ecem û tirkan wekî şîe dibîne. Li gorî ku dê ev ne Osmanî bin, li vê derê qesta vebêj; tirk û ecemên ku li herêma Mukriyanê cîranên kurdan e. Ji xwe rewşa herêmê ya îroyîn jî bi giranî bi heman rengê wê demê ye. Her wiha di vê varyantê de jî tirkên aliyê Anadolûyê wekî *rom* têne binavkirin û ji ber ku ew sunî ne wekî mutefîkên potansiyel yên Xan tîn dîtin.

“Dimdimim le bo bêîtine

Aû sal h’eût sale Xan le min yaxîne

Delê: Şa cê asîêr ez naiçomê

Himdadî bo dê le Romê

Danşkiênê tég deda komê”⁵¹⁶

Di vê pasajê de Şah ji Hesên Xan dixwaze ku ew êrîşê ser Kela Dimdimê bike lê Hesên Xan naxwaze vê bike lewre wisa hizir dîke ku ew êrîşê ser kelayê bike dê rom, yanê Dewleta Osmanî bêne alîkariya Xanê Mukrî.

⁵¹⁵ O. Celîl, *Dimdim*, r. 109-110.

⁵¹⁶ Oskar Mann, *Kurdische-Persische Forschungen. Die mundart der Mukri-Kurden*, Abteilung IV, Bd III, T.1, 1906, Berlin, r. 14.

Di vê varyantê de dîskûrsa mezhebî ew çend li jor e ku vebêj, reqîb an jî dijber rasterast wekî *şîe* bi nav dike û şer wekî şerekî dînî dibîne. Di varyantên di de dîsa dîskûrsa mezhebî heye lê bi pîranî reqîb wekî ‘*ecem* û *kafir* tê binavkirin.

“Alemî bo bezût’î e

Çak şerêk le ser dînî e

Xan delê: Aû şa bê, emnîş xan im

Xaleq bê be piştîwan im

Xulamî rawêk şêran im

Qatîlî kullî şîa’n im⁵¹⁷

Di vê pasaja jorîn de em dibînin ku vebêj şerê Kela Dimdimê wekî *şerekî dînî* teqdîm dike û di vî şerê dînî de Xan wekî kujerê hemî *şîeyan* dibîne. Vebêj, *şîeyan* bi tamamî wekî kafir dibîne û neqil dike ku piştî ku Kela Dimdim dikeve, rom yanê Osmanî têne alîkariyê û di dawiyê de eceman têk dibin û wan hemiyan dikin misliman û li Îsfehanê camiyê ava dikin. Di van pasajan de vebêj pesnê heybeta romiyan dide ku ev yek ji hîsiyata îtîfaqa mezhebî tê.

“Le heîbetî romîan

Le kul û yengîçerîyan

Geîe Tule û Tawîan

Rojekî beyan berdanê

Sultan geîe Lacanê

.....

Wezîr girtîan dîwane:

“Ya xula! Xoş bê sultane!

Hecem be fê û zor zane

Pê nawestîn be şîrane”

Wezîrî Estenbolê kîaye

Ya Xula! Xoş bê switan!

Li Ispehanê girt dîwan

⁵¹⁷ H.b., r. 15.

Ammê kirdin misliman

Mizgeufî le bo danan

Bangî heqqî le nêû dan”⁵¹⁸

Di van risteyên jorîn de bi renekî aşkera tê dîtin ku vebêj bi sempatiyeke mezin li Osmaniyan dinihêre û wan wekî hamiyê mislimanan dibîne. Her wiha nêrînên xwe yên dînî-mezhebî, ji vegotîneke gelêrî re dike bingeh. Bi taybetî di risteyên dawîn de, vebêj dibêje ku: *Sultan hat û Îsfehanê fetih kir*. Wekî ku miletek kafir be, li derveyê dînê îslamiyetê bin, vebêj dibêje: *Hemiyan kire misliman û ji bo wan mizgeft ava kir*. Di vegotîneke gelêrî de, bandora dîn ancax di vê radeyê de dikare bê dîtin. Ev di heman demê de nîşan dide ku destan çendî dikarin polîtîk û îdeolojîk bin.

Digel ku di vegotîne de bêjara mezhebî û dînî ew çend di asta jorîn de ye û ev yek nîşaneyê polîtîkbûna destanan e jî lê hîç nîşaneyên bêjara netewî an jî etnîk tune ye. Ev yek xaleke girîng e ku di heman demê de varyantên destanê yên ku li herêmên dî wekî Erzerom an jî Kafkasyayê hatine berhevkirin, bêjareke xurt ya netewî di xwe de dihewînin. Wekî mînak varyanta ku Albert Socin ji herêma Botanê berhev kiriye, nêzîkî bîst sal beriya ya Mann e lê dîsa jî bêjareke xurt ya netewî tê de heye.

Di varyanta ku ji aliyê Albert Socin ve hatiye berhevkirin ku ev varyant di sala 1890î de ji herêma Botanê hatiye berhevkirin, vebêj têgiha Kurdistanê bi kar tîne.

“Bela bû mabîni welatê Kurdîstane

Zêra bidin ji ber haqane

Da bo me çêkin du sûlixane

Pala bo me bînin ji welatê ra û naqa

Zêra bidin ji ber heqa”⁵¹⁹

Di varyanta Mann de bi tenê di derekê de têgiha kurd derbas dibe û ew jî ne bi wateyeke pozîtîf e. Dema ku îxanet rû dide, vebêj hingê îşaret bi nasnameya wî ya etnîk/netewî dike û dibêje ji nava kurdan yek derket û îxanet li Xan kir.

⁵¹⁸ O. Celîl, *Dimdim*, r. 121,122-123.

⁵¹⁹ Albert Socin, *Kurdische Sammlungen*, 1890, Berlin, r. 177.

“Xan be xezayê meşxûle

Xanek rabû le kurdane

Kê bû? Le Ehmed Begî Lêtane

Rûî reş bê degel cûane!

Li ser yek nîmçûn nalane

Zîz bû, çû bo nêû êwane

Pê nîşandan sûlexane

Kê bû? Le kafirî bê îmane

Têan kird haş û dermane

Pê qir debûn mislimane”⁵²⁰

Di van risteyên jorîn de hemî fikriyat û nêrîna îdeolojîk-polîtîk ya li dû vê vegotina gelêrî derdikeve meydanê. Vebêj di dirêjahiya destanê de tu car lefza kurd bi kar nayne lê dema ku behsa îxanetê dike li wê derê navê kurd derdikeve pêş me. Ev bûyera îxanetê di gelek varyantên destanê de derdikeve pêş me û di piraniya varyantan de behsa mirovek bi navê Mehmûdê Alekanî an jî Mehmûdiko tê kirin. Lê di tu varyatekê de îşaret, bi nasnameya wî ya etnîk nayê kirin. Wekî mînak di varyanta A. Socin de heman pasaj bi vî rengî derbas dibe:

“Nîşanê kahne û sulîn daya

Çê bû Mehmûdkê Alakana

Te kullak hinda li bin azmana

Ew bû sebebê kelê Xana

Ew rista hûr bismara”⁵²¹

Tê dîtîna ku heman pasaj ji aliyê vebêjê Socin ve, bêyî ku îşaret bi nasnameya netewî an jî etnîk bê kirin, bi tenê bi navê wî an jî bi navê eşîra wî (dibe ku Alekan navê eşîrek be) tê îşaretkirin. Hem di varyanta Socin de, hem jî di piraniya varyantên di de, berevajî varyanta Mann, dema ku behsa lehengî û xîretê

⁵²⁰ Oskar Mann, *Tekstên Kurdî*, r. 17.

⁵²¹ Albert Socin, *Kurdische Sammlungen*, 1890, Berlin, r. 189.

tê kirin navê kurd derbas dibe lê di dema îxanetê de, ‘xayin’ ne bi nasnmeşa etnîk lê bi navê wî ye şexsî an jî bi nasnava eşîrî tê binavkirin.

Di varyanta Mann de, li dû nêrîna vebêj; *kurdê xayîn*, ciyê sûlexanê nîşanê *kafirî bê îman* dide û di encama vê îxanetê de *mislîmanên nav kelayê* qir dibin. Yanê li gorî vê kodkirinê; kurd bi zanava *xayîn*, ecem bi zanava *kafirî bê îman* û xelqên nav kelayê jî bi zanava *mislîman* li pêş me ne. Lê ev yek dibe ku di varyanteke dî de bi rihetî cih biguhêrin û diguherin jî. Ji bo ku bandora bîr û bawerîyan ya li ser metna folklorê baş bê fêmkirin, em lê binihêrin ku heman epîzot di varyanta Kafkasyayê ku ji zarê zarbêjên êzîdî hatiye berhevkirin de çawa hatiye dayîn:

“Ew Mehmûdê Melekanî

Ew Emînê Mala Xanî

Xan bawerîya xwe pê anî

Pizka xirab bê serê zimanî

Xanê kurdan tu li beran î

Te ewil çêkir gere kanî

Rikinê kelê vederanî”⁵²²

Digel ku di varyanta Mann de xayîn wekî kurd hatibû binavkirin û Xan û xelkê di nava kelê de wekî mislîman hatibûn binavkirin, di vê varyantê de xayin bi aîdiyeta xwe ya eşîrî (Melekan) û leheng an jî Xan bi aîdiyeta xwe ya netewî yanê kurdbûnê tê pênasekirin ku ev yek nîşaneyeke girîng e di heqê cudahiya etno-dînî û herêmî yê di vegotinên gelêrî de.

3.4.2. Varyantên Kurdên Êzîdî

Di binê vê sernavê de em ê hewl bidin ku ji aliyê xalên ku me di varyantên jorîn de tesbîtkirî, miqayeseyê bi yê ku ji herêma Kafkasyayê hatine berhevkirin re bikin. Girîngiya varyantên vê herêmê ew e ku ew ji zarbêjên êzîdî hatine berhevkirin û ji aliyê temsîla dînî û etnîk ve ji varyantên dî cuda dibin.

⁵²² H. Cindî, *Folklorê Kurmanciyê*, r. 162.

Ji herêma Kafkasyayê, ji nava kurdên êzîdî du varyantên girîng hene ku em ê wan li vê derê bikin mijara miqayeseyê. Yek jê varyanta Heciyê Cindî ye ku di pirtûka *Folklor Kurmanciyê* de hatiye weşandin. Ev varyant di sala di sala 1931ê de ji nehiya Talînê ji gundê Sabûnçiyê hatiye berhevkerin. Varyanta dî ji aliyê Celîlê Celîl û Ordîxanê Celîl ve di sala 1958an de ji Taşkentê hatiye berhevkerin û di pirtûka *Zargotina Kurdan* de hatiye weşandin.

Digel ku di varyanta Oskar Mann de, fokûsa li ser mislimanbûna kurdan û kafirbûna eceman pir zêde heye jî, di varyantên êzîdiyan de fokûsa vegotinê, bi tu rengî ne li ser mislimanbûna kurdan e. Di van varyantan de şerê Kela Dimdimê ji şerekî dînî-mezhebî bêtir wekî şerekî netewî hatiye teqdimkirin. Ev yek di hemî prosesên destanê de xwe dide der. Wekî mînak di varyanta Celîlan de pênaseya 'Xanê Kurda' di seranserê destanê de 41 car hatiye bikarananîn û têgiha 'ecem' jî 16 car hatiye bikaranîn. Di varyanta Mann de têgiha kurd ji bo yên ku li Kela Dimdimê şer dikin, yek car nehatiye bikaranîn. Ew wekî 'şervanên rêya Xwedê' an jî 'şervanên dînê heq' hatine pênasekirin. Di varyanta Cindî de jî rewş bi heman rengî ye. Di vê varyantê de Xan, di 12 cihan de wekî 'Xanê Kurda' an jî 'Xanê Kurmanca' hatiye binavkirin, her wiha destan jî wekî 'Dimdim-Xanê Kurda' hatiye binavkirin.

Lê li aliyê dî, di her du varyantan de jî pir kêmbê jî îmayên li ser mezhebê eceman hene û wekî 'kafir' hatine pênasekirin. Yanê li vê derê zarbêjên êzîdî, aliyê ku li Kela Dimdimê şer dikin ne wekî misliman lê bi tenê wekî kurd bi nav kirine lê aliyê reqîb hem bi mîliyeta wan yanê 'ecembûn' û hem jî bi termînolojiyek dînî wekî 'kafir' pênase kirine. Lewre em ji metnên dî yên êzîdiyan jî dizanin ku di folklorê êzîdiyan de li hember cihû û şîe/qizilbaşan reflekseke wan ya dînî heye. Di vegotinên wan yê gelêrî de jî ku ji herêma Şengalê hatine berhevkerin, tê dîtin ku civaka êzîdiyên Şengalê, li hember 'qizilbaşan' (îranî) bi Padîşahê Osmaniyan re hevkarî dikin.⁵²³ Lewre em di varyantên Kafkasyayê ku ji zarê êzîdiyan hatine neqilkirin, dibînin ku vê bûyera ku di navbera kurdên sunî û ecem û tirkên qizilbaş de rû daye, di nava êzîdiyan de jî deng daye û wan di çarçoveya hîsiyatên netewî de li destanê xwedîtî kiriye. Lê

⁵²³ Bnr. X. Şengalî, *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre, Bergî Yekem*, r. 154, 155, 167, 171.

şîroveya wan ya destanê ji varyantên ku ji herêmederketine gelekî cuda ye. Di her du varyantên Kafkasyayê de jî Xan wekî Xanê Kurda hatiye binavkirin.

“Li Dimdimê Xanê kurda derkevtiye

Şîrê((şûr) xoyê helgirtiye

Pirsiyara kes nekiriye

Wê şevê ji heta sibey şer kiriye

Eskerê şay pi qirane biriye”⁵²⁴

“Go: Kuro, bikin bilezînin

Pênsed palan xwe ra bînin

Ser Xanê kurdan da bişînin

Xanê kurdan ketiye rêye

Rê da pênsed palan daye pê ye

Xanê kurdan çî cindî ye

Pêşiya palê xwe ketiye

Ser kela xwe da dihatiye”⁵²⁵

Wekî ku em ji van her du pasajên jorîn dibînin, Xan wekî Xanê Kurda hatiye binavkirin. Ev pênase di varyanta Mann de ku em li serê sekinîn, wekî Xan, Xan Ebdal, Xanê Mukrî hatibû bikaranîn. Lê di varyantên nav êzîdiyan de em dibînin ku zanava etnîk-netewî ya Xan gelek li pêş e û di rêjeyê zêde de tê bikaranîn. Ev yek xaleke girîng e. Hem di vegotinên gelêrî yên êzîdiyan de, hem jî di dîskûrsa wan ya rojane de, wekî ku me di beşa yekem ya vê vekolînê de neqil kiribû, ew carina bi hesasiyet xwe ji bikaranîna têgiha kurd dûr dixin, xwe di nava civaka kurd de nabînin an jî di nava civaka kurd de wekî entîsîteyê serbixwe dibînin.⁵²⁶ Lê hem di destana Kela Dimdim de hem jî di Destana Derwêşê Evdî de em dibînin ku (ev her du destan, tekane destan in ku têkoşîna civaka kurd ya bi neteweyek dî re fokûsa mijarê ye), ew di rewşên bi vî rengî de xwe di nava tevahiya civaka kurd de dibînin. Mînakên vê rewşê em ê li jêrê bidin.

⁵²⁴ C. Celîl-O. Celîl, *Zargotina Kurda II*, r. 170.

⁵²⁵ H. Cindî, *Folklorî Kurmanciyê*, r. 162-163.

⁵²⁶ T. Reşîd, *Êzdiyatî*, r. 118.

Her wiha di van varyantan de, di bikaranîna zanava reqîb/dijber de jî, nêrîneke etnîk-netewî hatiye tercîhkirin. Reqîb, wekî ecem hatiye binavkirin. Di kêma çiyana de em dibînin ku îmayên dînî-mezhebî hene lê bi piranî têgiha ecem hatiye bikaranîn. Wekî mînak di varyanta Celîlan de têgiha ecem 16 car hatiye bikaranîn lê têgiha kafir bi tenê carek hatiye bikaranîn.

“Şah dibête eceman e:

Bibînin hinirêd mêran e

*Min çend gote hingo da nekujit **xanê kurdan e***

He bo van tixmê rojane

Şah dibêje mezinê eceman e

Ca bir bo nik zêringir e

*Çê kin lepekî zêr bo **xanê kurdan e**”⁵²⁷*

Di vê epîzotê de di nava heft risteyan de em dibînin ku du car têgiha kurd û du car jî têgiha ecem hatiye bikaranîn ku ev ji bo têgihîştina atmosfera destanê daneyê girîng e. Di varyanta Cindî de jî rewş bi heman rengî ye.

“Xan kelê dimeşiya

***Eceman** tacek şand pêşiyê*

*Go: **Herê, Xano, tu kurmancî***

Xwe ra hilîne vî tacî

Hê min şer nekiriye bo armancî

Go: Tacê te serê te be

Gû di nav meshebê te be

***Her navê kurmanciyê bira hebe**”⁵²⁸*

Di van risteyên jorîn de em dibînin ku atmosfera destanê bi têgihên, ecem, kurmanc û mezheb xwe dide der. Li vê derê ecem tacek pêşkêşî Xan dikin lê di wateya biçûkxistinê de jê re dibêjin: ‘Tu kurmancî’. Di vê mînakê de wekî ku me di mînakên beşên jorîn de dîtibû, bi têgiha kurmancbûnê qesta tebeqeyeke çînî jî tê kirin lê dema ku ecem vê bi kar tînin, bi qandî ku mirov ji vê epîzotê fêma dike, ew di heman demê de îşaret bi nasnameya etnîk jî dikin. Yanê ecem, têgiha

⁵²⁷ C. Celîl-O. Celîl, *Zargotina Kurda II*, r. 166.

⁵²⁸ H. Cindî, *Folklor Kurmanciyê*, r. 174.

kurmanc bi wateya wê ya çînî û etnîk bi hev re bi kar tînin û bi vî rengî heqaret li nasnameya netewî dikin lê Xan bi tevahî di wateya netewî de bersivê dide. Her wiha li hember mezhebê eceman jî nêrîneke tund heye ku dibe ku em vê bi vegotina êzdîkî ve jî girê bidin. Lewre, wekî ku me di beşa yekem de jî neqil kiribû, lêkolerên mîna Kreyenbroek, Fuccaro û Bruinessen êzdiyatîyê wekî ku ji nava îslamiya sunî derketibe teqdîm dikirin. Li gorî wan hevterîbiyeke aşkera di navbera termînolojiya êzdiyatî û îslamiya sunî de heye. Loma di metneke wiha de, îfadeyeke bi vî rengî: ‘*gû di nav mezhebê te be*’ eger ku em bi xwendinek dîrokî û civakî lê binihêrin ew çend ne xerîb e.

Di varyantên êzîdiyan de, asta etnîk-netewî ya destanê ew çend bilind e û vebêjên destanê ew çend meyla destanê bi vî alî ve kêşane ku, di hin epîzotên destanê de, ji yên dî cudahî çêbûye an jî bi wan re nakok e. Wekî mînak digel ku di hemî varyantan de, em dizanin ku Xan li hember eceman ji Osmaniyan alîkarî dixwaze jî, di varyanta Cindî de vebêj wisa neqil dike ku, kurd di Şerê Kela Dimdimê de hem li hember eceman hem jî li hember roman (Osmaniyan) şer dikin. Di vê varyantê de wisa tê neqilkirin ku Xan, ji xanek bi navê Xanê Bedensêrê alîkarî dixwaze.⁵²⁹ Lê di hemî varyantên dî de ev Padîşahê Osmanî ye. Alîkarî, wekî ku di varyantên dî de jî xuya ye, di encama fêmkirineke xelet de nayê û Xan xwe tenê û têkçûyî hîs dike. Li ser vê diya wî wiha jê re dibêje:

“Bes bikişîne vê xîretê

Kul ketiye eşîretê

Bi destşûr here xêbetê

Bes bikişîne vê demê

Kul ketiye nava komê

Desteşûr herine nava Romê⁵³⁰

Her wiha di dawiya destanê de wekî kehanet rewşek wiha tê neqilkirin:

“Cixara wê sor bû. Ji jor da nav cebirxanê da kuta. Lêda kela bela belayî kir, avît, ew muxlûqatê tê da qir kir. Her otaxek ma. Jineke hemle tê da ma. Ew jinik jê xilaz bû, jîna Evla Begê bû. Mala bavê wê li Hekariyê bû. Çû nava Hekariya. Wê

⁵²⁹ H.b., r. 170.

⁵³⁰ H.b., r. 171.

*derê Xwedê kurek dayê. Silsileta wê malê hê heye. **Salê carekê li wê derê, hema wê rojê padşê ecem ra û yê romê ra şer dikin û kuştîyê kelê bi bîr tînin.***⁵³¹

Bi vê kehanetê, destan diqede. Bi encamek bi vî rengî, tê dîtin ku vebêjên êzîdî destanê bi tevahî ji konteksta wê ya dînî-mezhebî dûr xistine û di nava atmosfereke netewî de ji nûh ve şîrove kirine. Di hemî varyantên vê destanê de, wekî ku Ordîxanê Celîl jî neqil dike, Xan dixwaze ku mîrên kurd li dora wî bicivin û dema ku dikeve tengasiyê ji wan alîkariyê dixwaze. Lê ew alîkariya ku ew li bendê ye tu car nayê. Bi tenê di varyantên ku ji zarê êzîdiyan hatine neqilkirin de, em dibînin ku mîrên kurdan ji Xan re alîkariyê dişînin. Heta mîrên êzîdî jî di navê de.

“Bavê wî go:

Lawo, lawê Berazî

Go: Eskera bike gazî

Dor hate lawê Hekarî

Li sêrî tora tarî

Ewî nig da hezarî

Dor hate lawê Hertosî

Te li sêrî qerepoşî

Ewî nig da koma berjojî

Dor hate lawê Divînî

Xudanê şeşxana mezin î

Tu şerad î, kesê min î

Dor hate lawê Êzdî

Şer xweş kiriye li çadira spî

Dor hat lawê Beranî

Xwidanê rima ziravî

Xweziya wî şerî tu li navî

Dor hat lawê Tîmarî

⁵³¹ H.b., r. 179.

Xudanê sore savarî
*Şûr hilda çû qifarî*⁵³²

Di van beytên jorîn de jî aşkera xuya dibe ku, vebêjê êzîdî xwe di nava tevdehiya kurdbûnê de wekî parçeyeke serbixwe dibînin û naxwazin ku ev destan wekî destaneke dînî bê tesewirkirin lewre hingê nakokiya wan ya dînî ya bi piraniya kurdên misliman re derdikeve holê. Lewre ew xwendina xwe ya destanê di çarçoveyê netewî de, wekî îdîayek, li hember derketinek li dij desthilatdariya ecem û roman dikin. Ev yek nîşanê me dide ku, ev civak çendî hewl dide ku wekî parçeyê civaka kurd bimîne. Wekî ku me li jorê jî îfade kiribû, di nava civaka kurd de du destan hene ku di wan de şer li hemberî dagirkeriya hêzên biyanî ye. Yek ji van destanan Kela Dimdim e û ya dî jî Derwêşê Evdî û Edûlê ye. Êzîdî, li van her du destanan jî baş xwedî derketine û belkî destan hinek jî bi saya dengbêjên wan li seranserê civaka kurd belav bûne.

3.5. Destana Derwêşê Evdî û Edûlê

Çawa ku me di behsa jorîn de, di çarçoveya temsîlên dînî û etnîk de, li Destana Kela Dimdim nihêrî, di binê vê sernavê de jî em ê bi heman rengî vekolînek li ser Destana Derwêşê Evdî û Edûlê bikin. Di nava van her du destanan de ji aliyê temayên destanê ve gelek lihevçûn hene. Lihevçûna sereke, guherîna temayê di navbera diyardeya dîn û nasnameya etnîk de ye. Her wiha her du destan jî, di nava hemî destanên civaka kurd de, du destanên sereke ne ku li vê derê bi hêz an jî miletek derveyî/biyanî re şer heye. Lewre girîng e ku em bizanin komên cuda yên li nava kurdan vê temayê çawa adapteyê rewşa xwe ya etno-dînî dikin.

Em ê di vê beşê de miqayeseyê, li ser esasê derçûnên nasnameya dînî û etnîk, di navbera varyantên ji zarê zarbêjên kurdên êzîdî û zarbêjên kurdên misliman de bikin. Her wiha varyantek li ber destê me heye ku zarbêjê wê kurdekî bi eslê xwe ereb e. Em ê vê varyantê jî cî bi cî tevî nava miqayeseyê bikin.

⁵³² H. Cindî, *Folklor Kurmanciyê*, r. 178.

3.5.1. Varyantên Kurdên Êzîdî

Di pêwendiya berhemên folklorî de taybetiyeke girîng ya civaka êzîdîyan ev e ku; ew di her rewşê de mohra xwe ya etno-dînî li berhema folklorê dixin û ev reflekseke nasnameyî ya vê civakê ye. Digel ku wekî dîskûrseke polîtîk, carina di nava civaka êzîdîyan de tê dîtin ku ew xwe ji civaka kurd dûr dixin heta xwe kurd nahesibînin jî, wekî ku di bêjara êzîdîyên herêmên Kafkasya û Şengalê tê dîtin, ji mînakên ku me heya niha kire mijara vê tezê xuya dibe ku di asta berhemên folklorî de rewş ne wiha ye. Di berhemên folklorî de em dibînin ku; digel ku di fokûsa xwe ya etno-dînî de ew çend bi îsrar in jî, ew bi taybetî di destan û vegotinên ku tê de konfliktên netewî hene de, xwe di nava tevdehiya netewetiya kurdî de dibînin û ji komên dî yên nava kurdan bêtir xwedî dîskûrseke etnîk û netewî ne.

Di Destana Derwêşê Evdî û Edûlê de jî, ev xwe bicîhkirina etnîk-netewî ya civaka êzîdî derdikeve pêş me. Di hemî varyantên vê destanê de ku ji nava civaka êzîdî hatine berhevkirin (çi ji herêma Şengalê û çi jî ji herêma êzîdîyên Kafkasyayê), bûyerên ku di destanê de derbas dibin wekî bûyerên ku di navbera du neteweyan de derbas dibin tene teqdîmkirin. Lê di varyantên nava kurdên misliman de ev rewş bêtirî di konteksta jiyana eşîrî û konfliktên eşîrî de hatiye pêşkêşkirin. Tê xuyakirin ku kurdên êzîdî, destan an jî vegotinên gelêrî, yên ku taybetiyeke wan ya dînî-bawerî heye, dema ku li xwe adapte dikin, taybetiya wan ya dînî paş ve didin û taybetiya wan yan etnîk-netewî derdixin pêş. Ev helwesteke derûnî-civakî ye. Ji aliyek ve, ev tê vê wateyê ku civaka kurd xwe çendî di nava dîskûrseke dînî de îfade bike, ew çend rê li pêş civaka êzîdî tê girtin ku ew xwe di nava vê civakê de bi cih bike. Ev rewş di heman demê de xetereyek li ser hebûna civaka êzîdî jî peyda dike. Lewma ew berhemên folklorê yên di vê mecrayê de, bi îsrar ji konteksta dînî derdixin û di konteksteke etnîk-netewî de şîrove dikin. Ev yek di heman demê de daxwaza wan ya xwe bicîhkirina di nava nasnameya kurd de jî dide der.

Di varyanta birayên Celîl de hê di destpêka destanê de ev fikriyat xwe dide der. Destpêka destanê bi vî rengî ye:

“Bavê Derwêş, Evdî bû. Derwêş hê tinebû. Evdî şivanê Zor Temir Paşayê Millî bû. Hafîrê Gêsi û Ecîl Brahîm- ew Milî axê Kîka û Milla bû. **Kîka û Mila kurd bûn û Gêsa ereb bûn.**”⁵³³

Di hin varyantên dî de, wekî eşîrên êzîdiyan, navên Şerqî û Dina jî derbas dibin lê di vê varyantê de êzîdî xwe di nava eşîra Milî de dibînin. Lewre dema ku şêxê ereb ji Evdî re dibêje: Tu êzîdî yî, em misliman in. Tu nekeve navbera me. Evdî wiha bersîv dide jê re:

“Apo, erê bira **ez êzîdî me**, bes **ez eşîra** Zor Temir Paşayê **Milî** me.”⁵³⁴

Ji vê dîskûrsê em têdigihên ku, di vê varyantê de êzîdî xwe di nava eşîra Milî de û li hember ereban li kêleka kurdên misliman dibînin. Ji xwe di hemî varyantan de ku ji zarbêjên êzîdî hatine berhevkerin, heman bêjar heye. Wekî mînak di varyanta Xeyrî Şengalî de ku ji herêma Şengalê hatiye berhevkerin heman pasaj bi vî rengî ye:

“Wextekî Huweyd Begê Gêsi, mezinê Gêsa bû û Çilî Brahîm mezinê tirka bû. Her dû hîzbek bûn û **Şerqîya û Dina û Mila** hîzbek bûn.”⁵³⁵

Di vê varyantê de vebêj, ereb û tirkan wekî aliyek û eşîrên kurdan yê wekî Milî, Şerqî û Dina jî wekî aliyê kurd nîşan dide. Şerqî, eşîra Derwêşê Evdî ye. Di varyanta Şengalê ya ku di xebata Ömer Uluçay de hatiye çapkirin de jî heman meyl derdikeve pêş me.

“Paşayê Milan dibêje, ‘bira werin bin konê min.’ Zor Temir Paşayê Milan, Evdî û êla wî qebûl dike. Paşa dibêje: Ez dixwazim ji mêvanê xwe re bikim çend şorane/Me dil heye bi Şerqîyan re bikin biratî û sozane/**Em tev kurd in weke bira ne.**”⁵³⁶

Balkêş e ku di varyantên nav kurdên misliman de, bi destanê re têkildar behsa tirkan nayê kirin lê di gelek varyantên êzîdiyan de em dibînin ku tirk jî li kêleka ereban daxilî nava şer bûne. Ev bichikirina polîtîk, di Destana Kela Dimdim de jî derketibû pêş me. Her çendî ku di piraniya varyantên Kela Dimdim de, tirk wekî mutefîkên potansiyel yê kurdan xuya dikirin jî, di varyantên

⁵³³ C. Celîl-O. Celîl, *Zargotîna Kurda I*, r. 279.

⁵³⁴ H.b., r. 286.

⁵³⁵ X. Şengalî, *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre*, Bergî Yekem, r. 276.

⁵³⁶ Ömer Uluçay, *Destana Dewrêşê Evdî, Tehlîl-Tesnîf-Kilam*, Weş. Dîwan, Çap I, 2012, Stenbol, r. 183.

zarbêjên êzîdiyan de, me dît ku kurd li hember tirkan jî serî hildidin. Ev yek xaleke balkêş e. Wekî meyleke derûnî-civakî ya êzîdiyan derdikeve pêş me. Ew bi rêya vê destanê mesaj didin kurdên misliman ku dijminên wan li hember wan her tim îtîfaq dikin û lazim e kurdên êzîdî û kurdên misliman jî heman îtîfaqê bikin. Wekî mînak di varyanta Xeyrî Şengalî de vebêj neqil dike ku kengê kurdên êzîdî ji ber hin neheqiyên ji kurdên misliman dûr dikevin hingê dijminên wan dibin yek û êrîş dibine ser wan.

*“Çilî Brahîm mezinê tirka bû. Selefek siwara xwe helgirt, hate mala Efîrê Gêsî, gotê: Efîr. Efîr gotê: Yela xêr e? Vê derengiyê. Çilî Birahîm go: Bira mizgîniya mi li te! **Şerqiya (eşîra êzîdiya) û Mila bar kir (ji hev cuda bûn). Em ê cerdeke giran kar kin û em ê çîn Mila din.** Em ê heyfê kevin û nû ji Mila bin. (Efîr, şert datîne ber Çilî Brahîm ku dê têkelî eşîra Şerqiya nebin.) Çilî Birahîm gotê: Bira Şerqiya û Dina (her du eşîrên êzîdî) bar kiriye, Mila safî mayîne. Em ê cerdekê li Mila kin. Em ê heyfê kevin û nû ji Mila vekin û ya me û Şerqiya Xudê kerîm e heta rojeke wan jî heye.”⁵³⁷*

Di heman varyantên êzîdiyan de tê dîtin ku ereb û tirk dema ku êrîşê kurdan dikin *Kitêba Pîroz*, *Quranê* ji xwe re dikin al û wisa êrîş dikin.

*“Ecîl Brahîm milûkê wan e
Hafîrê Gêsî bêyreqdarê wan e
Li ber xwe danîne Qurana ezîmşan e
Teva sond dixwar bi ezîmşan e
Emê hucûmek bidine ser Kîka û Milan e”⁵³⁸*

Ev pasaj di varyanta Celîlan de çend caran dubare dibe. Di varyanta ku di pirtûka Ömer Uluçay de derbas dibe ku ji herêma Şengalê hatiye berhevkerin de jî heman fokûs heye.

*“Milîno, sibeyê bila dengê min bê we tevan! Dijminên we li hev kom bûne wekî wawik û mawikên devê çeman. Tirk û Gêsan ji hev re **sond xwarine bi kitêb û Qurana** ku kuştina wan heye lê bêyî talan û namûsa Milan vegera wan tune.”⁵³⁹*

⁵³⁷ X. Şengalî, *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre*, Bergî Yekem, r. 284.

⁵³⁸ C. Celîl-O. Celîl, *Zargotîna Kurda I*, r. 280.

⁵³⁹ Ö. Uluçay, *Destana Dewrêşê Evdî*, r. 188.

Di varyantên ku ji zarbêjên êzîdiyan hatine neqilkirin de, tê dîtin ku ereb û tirk dema ku êrîşê kurdan dikin, bi bêjareke dînî û wekî ku kurd ne misliman bin tevdigerin. Bêguman ev nêrîna êzîdiyan e lewre ew naxwazin ku civaka kurd li derdora bêjara dînî bi civakên ereb û tirk re hevkarîyeke dînî bikin. Eger ku ev hevkarîya dînî, di nava ereb, tirk û kurdan de çê bibe, hingê ne pêkan e ku êzîdî di nava vê îtîfaqê de ji xwe re cihek bibînin. Ew li derveyî vê û bê parastin û di binê xetereya man û nemanê de dimînin. Lê di heman demê de îşaret bi rastiyeke dîrokî jî dike ku ev rewş li hember kurdan hatiye bikaranîn. Ji aliyek ve eger ku kurd bi hevkarîya dînî bi ereb û tirkan re îtîfaqê bikin, hingê xetereyeke mezin li ser hebûna êzîdiyan pêk tê. Lewre li gorî êzîdiyan; çî dibe bila bibe divê kurdên misliman bi bêjareke dînî bi ereb û tirkan re di nava îtîfaqê de nîn bin. Ji bo vê yekê hem di Destana Kela Dimdimê de û hem jî di Derwêşê Evdî de, zarbêjên êzîdî ala bêjara netewî bilind dikin û hewl didin ku kurdên misliman û kurdên êzîdî li hember bêjara serdest ya dînî ya ereb û tirkan, bi bêjara netewetîya kurdan bersivê bidin. Lewre ancax hingê ew dikarin li hember êrîşên tundrew yê dînî ji xwe re baneke ku parastinê dide wan çê bikin ku ev dîskûrsa netewîtiyê ye.

“Bila xwîna te birjihe ser erdê kurdan e

Ta ku Gêsan bizanin xwîna kurdan ne erzan e

Bavê Etman; ez te nakujim

Te bidim xatirê Tawisî-Melek sund êzîdiyan e

Lê ez ê birînekê li canê te bikim,

Tu ji bîr nekî mêraniya me kurdan e”⁵⁴⁰

Di varyanta Xeyrî Şengalî de jî heman bêjar derdikeve pêş me. Di nava diyardeya jiyana eşîrî û dînî de, navenda propagandatîf ya vegotinê bêjara netewî ye.

“Hinga digo şerê Kîka û Gêsan e

Li piştê wane Dewletê Elî Osman e

Dîsa çî beytar û ala wane dane ser me kurdan e

Lê wey lê mire ketanî dilêrê min ketiye

Şer ketiye ser d(c)îwarê me kurdan e”⁵⁴¹

⁵⁴⁰ Ö. Uluçay, *Destana Dewrêşê Evdî*, r. 200.

⁵⁴¹ X. Şengalî, *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre*, Bergî Yekem, r. 348.

Di varyantên nava êzîdiyan de, di asta nasnameyî de du temayên bingehîn hene ku mesaja destanê an jî temsîl û protestoyên nasnameyî xwe di wir de didin der. Yek jê wekî ku me li jorê îfade kir, êzîdî di varyantên xwe de hewl didin ku destanê ji zemîna konfliktên eşîrî bikêşin zemîna konfliktên neteweyî. Ji bo vê di radeya herî bilind de dîskûrsa netewî bi kar tînin û di van varyantan de bêjara kurd û Kurdistanê gelek berbelav e.

Temayeke dî ya girîng jî konfliktê navbera kurdên misliman û kurdên êzîdî ye. Di vê nuqteyê de em protestoyeke aşkera ya etno-dînî ya êzîdiyan li hember kurdên misliman dibînin. Wekî ku me di beşa destpêkê de jî diyar kiribû, ji bo nasnameyên etnîk, parastina hafizayê xaleke gelekî girîng e. Ev hafizaya kolkîf ku lazim e di hemî endamên vê koma biçûk ya etnîk de were parastin, di heman demê de hîsa hevpar ya komî jî ava dike. Kurdên êzîdî, her tim ji nêrîna kurdên misliman ya di heqê wan de bê zar in. Lewre ev nêrîn bi giranî bi motîfên dînî rapêçayî ye û êzîdiyan wekî ‘kafir’ an jî ‘şeytanperest’ dibîne. Ji xwe em vê dîskûrsê di varyantên kurdên misliman de dibînin ku ji bo Evdî wiha tê gotin:

“Eslê te êzdî ye, pîrê te Şeytan e.”⁵⁴²

Di hemî varyantên deverên êzîdiyan de, beriya ku Gêsiyên ereb êrîşê kurdan bikin, di navbera bavê Derwêş, Evdî û Temir Paşayê Milî de ji ber meseleya qîzxwestinê aciziyek çê dibe û bavê Derwêş, warê xwe terk dike.

“Evdî sekinî li himberî Paşayê Milan e

Go: Paşa! Dema şer û cengan e

Em tev kurd in, egîd in, bira ne

Dema tirs ji ser we hat wergêran e

Ez êzdîkî bi du quruş û nîva me

Te soza xwişka xwe Rahmê

Da min bi soza mêran e

Çima te xera kir soza kurdan e”⁵⁴³

⁵⁴² Ö. Uluçay, ‘Varyanata Serhedê’ (Ji aliyê Perwîz Cîhanî ve hatiye weşandin), *Destana Dewrêşê Evdî*, r. 231.

⁵⁴³ Ö. Uluçay, *Destana Dewrêşê Evdî*, r. 203-204.

Di varyanta Xeyrî Şengalî de, sebebê ji hev cudabûna kurdên êzîdî û misliman, bi rengê cuda tê neqilkirin. Li gorî vê varyantê beriya ku Gêsî êrîşê bikin, rojekê Evdî û Temir Paşa di geşteke de rastê Efîrê Gêsî û zîlamên wî tîn. Paşa pir ditirse û Evdî bi şerekî lehengî wî ji wê derê xelas dike. Lê demek şûnde Paşa vê jibîr dike û li dîwana xwe heqaret li êzîdiyan dike û li ser vê yekê Evdî û kurê xwe Derwêş biryar didin ku konê xwe rakin.

*“Rojekê li dîwana Temir Paşa, xelqê kire qala Derwêş û medhê wî kirin. Gotin: ‘Fîlan rojê Derwêş hewe kire û fîlan rojê hewe kire.’ Temir Paşa go: ‘Hoo... Hema hûnê Şerqîya dipesinîn. **Ê bi xwedê Şerqîya xweş dizê keran e.**”⁵⁴⁴*

Di varyanta Celîlan de jî kêliya tansiyonê ya di navbera kurdên êzîdî û kurdên misliman de, bi heman rengî derbas dibe.

*“(Bavê Derwêş) Go: Lawo min sed ji wan kuştin û tev ji ber bavê te reviyane
Min konê Zor Temir Paşa xilas kir ji destê neyaran e
Paşê Zor Temir Paşa çi got? Go: **‘Evdî êzdî ye,
Li Çiyayê Şengalê dibe dizê keran e’**
Tu jî ya bavê xo bikî, Zor Temir Paşa, bêbext e emekheram e.”⁵⁴⁵*

Tê dîtin ku di van her du varyantan de jî heman heqaret heye û ev heqareteke navdar e ku li êzîdiyan tê kirin û di heman demê de nasnameya wan ya etno-dînî dike armanc.

Di varyantên êzîdiyan de hem di meseleya Bavê Derwêş, Evdî de ku dixwaze bi xwişka mîr ya bi navê Rahmê re bizewice û mîr vê qebûl nake û hem jî di meseleya daxwazkariya Evdî de ku dixwaze bi Edûlê re bizewice, cudanihêrîna dînî derdikeve pêş me. Di bûyera bavê Derwêş de, kurdên êzîdî jî bi tundî li hember zewaca Derwêş in. Lewre di nava civaka êzîdiyan de qedexeyeke gelekî bihêz heye li ser zewaca bi mirovek ji dînekî din re. Ev yek di heman demê de hewla parastina demografyaya koma etnîk jî îfade dike.

*“Go Derwêş dil ketibû Edlê. **Pa vêca bi qanûna me êzdiya, kêr nayê êzîdî jineke bisilman bibe.** Derwêş êzdî bû û Edlê bisilman bû.”⁵⁴⁶*

⁵⁴⁴ X. Şengalî, *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre*, Bergî Yekem, r. 279.

⁵⁴⁵ C. Celîl-O. Celîl, *Zargotîna Kurda I.*, r. 282.

Bavê Derwêş, li hember zewaca wî dertê. Derwêş ji bo ku destûrê bigire, diçe Şengalê cem *Babê Şêx* da ku destûra zewaca bi Edlê re jê werbigire.

“Çû dîwana *Babê Şêx* û kêfa *Babê Şêx* jê re hat bi qedr û merîfet. Bira rabû li ba *Babî Şêx* beyitî (?) li wê şîvê. ***Babî Şêx gotê: Kurê min Edlê kêrî te nayê, ê bisilman e.*** Çavê reş sipî nabe. Her Derwêş gotê: *Mi divê ti li mi helal kî. Babî Şêx qebûl nekir. Gotê: Heke mi li te helal kir, ez ê li gelekê dî helal kim.*”⁵⁴⁷

Derwêş her çendî israr dike jî, ji *Babê Şêx* destûrê wernagire lê ew ji rêya xwe venagere û terka Edlê nake. Di varyanta Uluçay de jî ku ji herêma Şengalê hatiye berhevkirin heman tema heye û hem bavê Derwêş û hem jî *Babê Şêx* destûr nadin ku Derwêş bi Edlê re bizewice.

“Derwêş:

Derdê min derdekî giran e

Derdê min evîn û eşqa dilan e

Evîndara min qîza Paşayê Milan e

Bavê min axayê Şerqîya û Dînan e

Mêrekî dîndar û şikestiyê ocaxan e

Rê nade evîna me her duwan e

Ez êzîdî me, ew jî misliman e

Babê Şêx:

Kurê mehra qîza Milan li te nabe

Qapî ji bo vê yekê venabe

Derwêş:

Babê Şêx bizane, derdê evînê derdekî giran e

Eşq bi xwe jî bi emrê Yezdan e

Ez ê bişkînim qapiyê olan

*Ez ê ji xwe re biguhêzim qîza Milan e”*⁵⁴⁸

Di van her du varyanatan de tê dîtin ku hem bavê Derwêş û hem jî îradeya dînî bi navê *Babê Şêx*, li hember zewaca Derwêş ya bi keça misliman re dertên û

⁵⁴⁶ X. Şengalî, *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre*, Bergî Yekem, r. 310.

⁵⁴⁷ H.b., r. 312-313.

⁵⁴⁸ Ö. Uluçay, *Destana Dewrêşê Evdî*, r. 187.

ev yek hem temsîla tansiyona di navbera kurdên êzîdî û kurdên misliman de dike û hem jî ji aliyê êzîdiyan ve hewla parastina demografiya koma etno-dînî dike. Di varyanta Şengalî de em dibînin ku Edlê dixwaze vê qedexeyê bi guhertina dînê xwe ji holê rake.

“Belê wez ê Edla qîza Zor Temir Paşayê Milî me

Wez ê li ser devê rê û dirba rûniştî me

Belê heke tîrsa mi ne ji bab û birakêt mi be

Min ê gotiba ez li ser heft babê xwe de êzdî me⁵⁴⁹

Tê dîtî ku di Destan Derwêşê Evdî û Edûlê de, ji bo civaka êzîdî sê tema hene ku ji bo her yekê ji wan, helwesta civaka êzîdî, bi qandî ku di metnên destanê de derdikeve pêş me, ser bi xwe ye. Temaya yekem nakokiya netewî ye ku di navbera neteweyê kurd û neteweyên tirk û ereb de ye. Digel ku di varyantên kurdên misliman de nakokî ne bi vî rengî be jî, metnên li nava civaka êzîdî vê temayê di radeya herî bilind de derdixin pêş û di vê nakokiyê de xwe di nava neteweyê kurd de wekî komeke etno-dînî bi cih dikin. Ji bo ku karibin xwe wekî komeke etno-dînî di nava neteweyê kurd de bicih bikin, çawa ku di mînaka Kela Dimdimê de jî derdikete pêş me, lazim e dîskûrsa ku li ser tansiyona vegotinê serdest e ne dînî be lê netewî be. Lê balkêş e ku di varyantên kurdên misliman de ev ne temayeke bingeîn e. Kurdên misliman, bi baldarî, nakokiyê di asta eşîrî de şîrove dikin û metna destanê li ser vê bêjarê însa dikin.

Temaya duyemîn, nakokiya etnîk e ku ev di navbera kurdên êzîdî û kurdên misliman de ye. Kurdên êzîdî, her çendî di rojên teng da li kêleka kurdên misliman cih digirin jî, her tim û bi rêya vê metnê jî, bi bîra wan dixin ku di navbera wan de cudahiyek heye û ew di parastina vê cudahiyê de bi îsrar in. Lewre di her prosesa destanê de motîfên xwe yên dînî derdixin pêş, wekî; *Melekê Tawis*, *Lalişa Nûranî*, *Êzdîxan* û hwd. Her tim bi bîra civaka kurdên misliman dixin ku, ew li wan neheqî dikin û qîmetê nadin wan û wan wekî xwe qebûl nakin. Yek ji mînakên derçûna vê temayê, meseleya zewaca Derwêş û Edûlê ye. Li vê derê her du civak jî li hember vê derdikevin lê bi taybet otorîteyên dînî yên êzîdiyan vê yekê qebûl nakin. Ev yek jî bi endîşeyên nasnameya etno-dînî ve girêdayî ye. Lê di varyantên nava kurdên misliman de em dibînin ku bi rengê

⁵⁴⁹ X. Şengalî, *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre, Bergî Yekem*, r. 329.

balkêş wekî ku di destanê de konflîketeke bi vî rengî tune ye tevdigerin. Êzdîbûna Derwêş û Evdî wekî meseleyeke pir detay derdiçe û heya ku ji vebêjan tê xwe ji vê temayê dûr dixin.

Temaya dawîn; temaya evînê ye û ev dînamîka herî xurt ya destanê ye jî. Li vê derê endîşeyeke bingehîn ya civaka êzîdî rû dide ku ev jî bi nasnameya wan ya etno-dînî ve girêdayî ye. Êzîdî, dizanin ku ew li hember kurdên misliman kêmar in û eger civaka wan û ya kurdên misliman bi rêya zewacê li nava hev bikeve, ne pêkan e ku ew taybetmendiya xwe ya demografîk berdewam bikin û ev yek jî xetereyê li ser hebûna wan ya etno-dînî çêdike. Lewre ew ji civaka kurdên misliman bêtir li hemberî zewacên navber-çandî û navber-bawerî dertên. Di hişyariyên Babê Şêx bo Derwêş de, em vê endîşeyê bi halê herî aşkera dibînin. Digel ku maf dide Derwêş jî, dizane ku pêşiya Derwêş vebike an jî ji bo vê zewacê ji wî re fetwayek derbixe, dê paşê ev rewşa îstîsnaî giştî bibe û mecbûr bimîne ku ji bo herkesê vê yekê pêk bîne. Ev yek jî dê hebûna wan ya demografîk bixe binê xetereyê.

Wekî ku tê dîtin, her sê tema jî bi rengekî bi meseleya etnîsîte û nasnameya dînî ve girêdayî ne û ev yek di heman demê de taybetmendiya îdeolojîk û polîtîk ya vê cureya vegotinên gelêrî nîşan dide.

3.5.2. Varyantên Kurdên Misliman

Di binê vê sernavê de, em ê li ser sê varyantên ku ji herêmên kurdên misilman hatine berhevkirin rawestin. Divê em vê yekê bibêjin ku di van varyantan de berhevkar di heqê dîn an jî baweriya vebêj de agahiyan nedane. Lê hem taybetmendiyan vegotinê û hem jî herêma ku berhevkarî jê hatiye kirin vê yekê nîşan dide ku vebêjên wan kurdên misliman in. Ji van hersê varyantan yek jê ji kitêba Mehmet Gültekîn hatiye wergirtin û wî neqil kiriye ku wî ev varyant di sala 1984an de ji herêma Bazîdê û ji zarê dengbêjek bi navê Xalido ji ser kasetekê veguheztiye.⁵⁵⁰ Varyanta duyemîn ji herêma Wanê, ji dengbêjek bi navê Ehmed Zeynal ku xelkê Mûrادیyê ye hatiye vegirtin ku Perwîz Cîhanî di sala 1989an de ji

⁵⁵⁰ Mehmet Gültekin, *Zargotina Kurdên Serhedê*, Weş. Avesta, Çap I, 2013, Stenbol, r, 124-136.

kasetê vegirtiye û di kovara Sîrwe de çap kiriye.⁵⁵¹ Varyanta dawîn ji aliyê dengbêjek bi navê Baqiyê Xido ve di sala 1987an de li ser kasetek hatiye neşirkirin û Şahînê Bekirê Soreklî ew veguheztiye metna nivîskî.⁵⁵² Ev varyant aydê herêma Kobanê ye ku ev herêm, herêma destanê ye. Taybetiyeke balkêş ya vê varyantê ev e ku vebêjê wê bi eslê xwe ereb e. Û herêm Kobanê ye ku ev herêm her çendî sed sal berê statuya wê cuda bû jî, ji sed salî vir ve ew girêdayî Sûrî ye û li wê derê kurd û ereb bi hev re dijîn.

Di varyantên herêmên kurdên misliman de, tişta ku pêşî balê dikêşe ev e ku hîç dîskûrseke netewî an jî etnîk nehatiye bikaranîn. Di van hersê varyantên ber destê me de, balkêş e ku yek car jî peyva kurd an jî kurmanc nehatiye bikaranîn. Lê li hember vê têgihên civaka eşîrî bi berbelavî hatine bikaranîn. Ev yek nîşan dide ku kurdên misliman, berevajî êzîdiyan, vê bûyerê an jî destanê di konteksta konfliktên eşîrî de xwendine an jî bi helwesteke polîtîk, dixwazin ev destan di vê astê (duzlem) de bê teqdîmkirin. Her wiha bêjareke dînî jî di metna destanan de derdikeve pêş me. Ku li vê derê kurd xwe wekî parçeyeke ‘umetê’ dibînin.

“Bê axawo de rabe

Aqûto de rabe

Maqûlo de rabe

Mîrê min de rabe

Êla me êleke giran e

Mîro bê rab û rav, tiv û tivdîra te nabe”⁵⁵³

Ev pasaj, hem destpêka destanê ye û hem jî pasaja dubareyê (naqarat) ye ku di varyanta Gültekîn de her tim derdikeve pêş me û di heman demê de atmosfera vegotinê jî dide der. Di vir de wekî ku em ji têgihên mîna *axa, mîr, êl* jî têderdixin, destan bi hêmanên jiyana eşîrî rapêçayî ye. Di vê varyantê de digel ku ji serî heya dawîn fokûsa destanê li ser lehengiyên Derwêş e jî, bi tenê di cihekî de, ew jî ne ji bo şexsê wî lê bi giştî ji bo kesên ku li hember Çîl Osman şer dikin têgiha *yezîdî* hatiye bikaranîn.

“Awirekî dide notila awirê gamêşan e

⁵⁵¹ Ö. Uluçay, *Destana Dewrêşê Evdî*, r. 223-257.

⁵⁵² H.b. r. 267-296.

⁵⁵³ M. Gültekin, *Zargotina Kurdên Serhedê*, r. 124.

*Berê xwe dide **kafir Çil Osman e***

Lê kafiro li eresa meydanê notila mûm û şemdan e

Dengek ji xwe ra tê, dengê xeybiyan e

*Dibê, kuro, **qebîla we yezîdiya çîqa nezan e***

Ma hûn nizanin çekê li canê Çîlo tevda zirx û pola ne

Sadûnê bira gava dibihîse vê gotina hane

Li ser şûrê xwe dinivîse kelîmê mihemediyan e

Berê xwe dide kafir Çil Osman e⁵⁵⁴

Di hemî destanê de bi tenê yekcar bêjeya ‘yezîdî’ hatiye bikaranîn û di ev cure bikaranînê de heqaret heye. Lewre vebêj, civaka êzîdî bi ‘nezanbûnê’, ‘cahiltiyê’ sûcdar dike. Divê neyê jibîrkirin ku di varyanteke herêma êzîdiyan de ne pêkan e ku tiştek wiha derbikeve pêş me. Her wiha Sedûnê ku birayê Derwêş e û ew bi xwe jî êzîdî ye, li ser bihîstina vî dengî, ‘kelîmê mihemediyan’ an jî kelîmeya şehadetê li ser şûrê xwe dinivîse û berê xwe dide Çil Osmanê ku ‘kafir’ e. Di vê mînakê de vebêjê mîsliman di du cihan de sivikahî an jî helwesteke îdeolojîk li hember nasnameya êzîdiyatîyê nîşan daye. Bi taybetî, êzîdiyekî wekî mîslimanek teswîrkirin, helwesteke berbalev ya serdestiyê ye jî. Eger em wiha bifikirin ku êzîdiyek dema ku lehengekî mîsliman teswîr bike û li ser navê wî bibêje ku got: Ya Melekê Tawis, hingê îronîkbûna rewşê bêtir bê têgihîştin.

Di vê varyantê de hemî temaya destanê hatiye berovajîkirin. Lewre wekî ku me di varyantên nava êzîdiyan de dît, yek ji temaya bingehîn ya vê destanê, di heqê nakokiyên di navbera kurdên mîsliman û kurdên êzîdî de bû. Ê ev nakokî di her prosesa destanê de derdiket pêş me. Ji ber ku Temir Paşa heqaret li êzîdiyan dikir û ji wan re digot ‘dizê keran’, hemî eşîra Şerqîyan bar dikirin û li ser vê yekê gêsî û tirkan êrîş dibir ser kurdên mîsliman an jî Milan. Li vê derê, di vê varyantê de em dibînin ku temayeke bi vî rengî tune ye û heta vebêj bi rihetî dikare heqaret li civaka êzîdî bike û wan bi cahilbûnê sûcdar bike. Digel ku yên di meydana şer de şer dikin jî endamên civaka êzîdî ne.

Di varyanta ku Perwîz Cîhanî neşir kiriye de jî heman helwest derdikeve pêş me. Di hemî destanê de peyva kurd yek car jî nehatiye bikaranîn û peyva êzîdî jî bi tenê di kontekstekê de hatiye bikaranîn ku ev e: Bavê Derwêş, Edlê ji Derwêş

⁵⁵⁴ H.b., r. 133.

re dixwaze û ew jî ji ber êzdîbûna wî lê heqaret dikin. Di vê varyantê de jî wekî varyanta jorîn, temaya bingehîn ya destanê evîn e. Temayên di yên etnîk û netewî, ku di varyantên herêmên êzîdiyan de li pêş in, bi tu rengî dernakevin pêş me.

Meseleya êzdîbûna Derwêş, di konteksta evîna wî ya bi Edûlê re derdikeve pêş me. Balkêş e ku pîrî caran vebêj an jî dengbêj, muameleya kesekî misliman li Derwêş dike û ji axaftinên wî an jî ji xwepênasekirinên wî, em nasnameya wî ya etno-dînî tênegihîjin. Her wiha di vê varyantê de du karakter hene ku ji welatê Serhedê tên û dibin mêvanê Evdî ku navên wan Seîd û Telhan e. Destan bi wan dest pê dike û diyar e ku ev her du kes ne êzîdî ne. Her wiha roleke girîng bi cih tînin di destanê de û Çîl Osmanê ‘gawir’ dikujin. Balkêş e ku dema Seîd û Telhan têne nava êla Miliyan, kes pêşwaziya wan nake û ew jî berê xwe didin konekî dûr ku Bavê Derwêş li wir e. Li vê derê vebêj Bavê Derwêş wekî mislimanekî baş teqdîm dike.

“Kalekî nûranî rûyê wî spî ye li ser çokan e

Diran di dêv da nemane

Hey lawo îro şaşikek li serî ye

Tizbiyeke sed û yek lib di dest da ne

Li ser postekî nimêjê rûniştiye

Ji xwe ra dikişîne selawat û werdane

Seîd digot:

Telhano bira bajo derê konê hane

Ew konê hanê yeqîn dikim tertîla wî bisilman e⁵⁵⁵

Di vê teqdîma vebêj de, ji aliyê nasnameyî ve rewşeke balkêş derdikeve meydanê. Digel ku vebêj bi dû re qeyd dike ku ew êzîdî ye jî, wî wekî mislimanek baş teqdîm dike û ev yek helwesteke polîtîk e. Lewre eger ku ev pasaj di varyanteke herêma êzîdiyan de derketa pêş me, wê hêmanên cudakar yên etno-dînî yên êzîdiyan bihatana pêşkêşkirin. Lê êzîdiyekî bi vî rengî teqdîmkirin, di heman demê de tê wê wateyê ku, vebêj naxwaze nasnameya wî ya etno-dînî derkeve pêş û wekî ku bixwaze bibêje: ‘Em hemî misliman in ne girîng e ku hin ji me êzîdî ne’, helwest nîşan dide. Wekî ku tê zanîn ev helwesteke tehekumî ye ku

⁵⁵⁵ Ö. Uluçay, *Destana Dewrêşê Evdî*, r. 228.

ji aliyê îdeolojiyên serdest ve her tim tê bikaranîn. Yanê digel ku nasnameya mînor tê zanîn jî, girîngî pê nayê dayîn.

Di vê varyantê de jî peyva kurd an jî kurmanç nehatiye bikaranîn û bêjara destanê bi temamî hêmanên civaka eşîrtiyê didin der.

“Go lawo tu nizanî ew kona konê Mîrê Mila e

Sêsed mêr tê da rûniştine li hundirê konan e

Her yek reîsê êlekê, di kon da rûniştine

Ji hev ra bi xeber dane

Belê go: Lawo ji Mîrê Mila ra hatiye

Kaxeza gawurê Çîl Osman e”⁵⁵⁶

Dema ku Seîd û Telhan li Bavê Derwêş dibin mêvan, (di dirêjahiya destanê de bavê Derwêş wekî Şêx Evdî tê binavkirin), Evdî ji wan re derdê xwe dibêje.

“Lawo em jê qehirîne naçin nava êla wane

Lê belê ez ji we ra bikim salixan e

Îsal heft sal e, dilê Derwêş

Li Edûla qîza Mîrê Mila da ne

Ez diçime xazgîniyê Edûlê, ji mi ra dibêjin

Eslê te êzdî ye, pîrê te şeytan e”⁵⁵⁷

Di vê pasajê de vebêj, di risteyekê de hem pênaseyeke heqaretî ji bo êzîdiyan bi kar tîne ku ji wan re dibêje ‘pîrê te şeytan e’ û hem jî rasterast ji Evdî re nabêje tu êzîdî yî lê dibêje ‘eslê te êzîdî ye’. Ev yek girîng e lewre heman vebêj li jorê Evdî wekî mislimanek baş teqdîm dike. Ev jî helewesteke polîtîk ya civakên serdest e, çawa ku di dîskûrsa neteweperestiya tirkî de jî derdikeve pêş me ku ji bo kurdan dibêjin; ‘esil kurd’ [kürd kökenli]. Di vê nêzikatiyê de ev îma heye ku eslê te kurd be jî tu tirkî. Li gorî vê, heman helwest ji alî kurdên misliman li kurdên êzîdî tê tetbîqkirin. Heman helwestê em di prosesa destanê de di cihekî din de jî dibînin. Dema ku Derwêş biryar dide ku biçe şerê Çîl Osman bike, Edûlê derdikeve pêş wî û wiha jê re dibêje:

“Digo de were, Derwêşo de were

⁵⁵⁶ H.b., r. 229.

⁵⁵⁷ H.b., r. 231.

Lehengo de were, hûto de were
Hey malxerabo bavê mi te dixapîne
Li rêya hat nehatê da dişîne
Dilê mi liyan e, serê dilê mi dêşê
Dilê mi ji dila dilekî del û dîn e

Lawo bi heqîya Xudê be, bavê we bisulman e, kalkê we êzîdî ne

Êla te êleke giran e, hemîn sûnda te

*Bi Yezdan re giran e, tirsê te tunîne.*⁵⁵⁸

Di vê epîzotê de em dibînin ku vebêj heman helwesta xwe ya jorîn berdewam dike. Lewre Edûlê, dema ku bang li Derwêş dike dibêje: *Bavê we bisulman e kalkê we êzîdî ne*. Yanê vebêj wekî ku bixwaze bibêje; Derwêş êzîdî nîn e, misliman e. An jî ew esil-êzîdî be jî, niha misliman e. Ev helwesteke dînî û poîtîk e. Lewre di hemî versiyonên destanê de û bi taybet di versiyonên nav êzîdîyan de, meseleya êzîdîbûna Derwêş gelek aşkera ye û ew dema ku şer dike dibêje: “Ya Melekê Tawis” an jî “Ya Şêşem”. Lê di vê varyantê û di varyantên dî yên nav kurdên misliman de, êzîdîbûna Derwêş yan tê veşartin yan jî wekî meseleyeke ne girîng li serê nayê sekinîn. Heman rewş di epîzoteke dî ya vê varyantê de wiha derdikeve pêş me:

“Derwêş zivirî cem her sê biran e

Digo: Biran em ê rast derkevin pêşiyê

Li para şer e yê pêşiyê qet nizane

Lawo eger em koka wan bînin

Sibê yê bêjin mêrkê bisulman vira dikin

Îşê bisulmana bi xiyaneî ye,

Bi xiyaneî li me dane⁵⁵⁹

Di vê pasajê de em dibînin ku Derwêş bi xwe xwe wekî ‘mêrikê bisulman’ pênase kiriye. Vebêj li vê derê mudaxeleyeke îdeolojîk-polîtîk li destanê kiriye û wê di çarçoveye bîr û baweriyên xwe yên dînî de guhartiye.

⁵⁵⁸ H.b., r. 244-245.

⁵⁵⁹ H.b., r. 250-251.

Folklornas Kovan Xankî jî îfade dike ku di varyantên nava kurdên misliman de dema ku behsa Derwêş tê kirin, wekî ku ew ne êzîdî be lê misliman be tê vegotin. Li gorî Xankî ev rewş berovajîkirina rastiye ye. Li gorî wî kurdên misliman hez nakin ku lehengek mîna Derwêş êzîdî be. Lewre di destanê de vê îmayê dikin ku bavê Derwêş êzîdî bûye lê Derwêş bi xwe misliman bûye.⁵⁶⁰

Ev yek di heman demê de nîşan dide ku vegtoninên gelêrî, li gorî çand, etnîsîte û baweriyên cuda, di çarçoveya hevî û tesewirên wan civakan de, wechên nûh digirin.

Di varyanta Baqiyê Xudo de, di asta dînî û eşîrî ya destanê de guherînek heye. Çawa ku di mînaka Kela Dimdimê de jî derketibû pêş me, varyantên ku ji erdnîgariya ku bûyerên destanê lê qewimîne, hatine berhevkirin; problemên şênber yên civakê bêtir didin der. Her ku vegotin ji cografyaya destanê dûr dikeve ew nakokiyên dînî ku di destanê de rû didin, şolî dibin an jî dikevin dereceya duyemîn û di temaya destanê de guherîn pêktê. Di vê varyantê de jî ku ji herêma hatiye berhevkirin, wekî ku di varyantên êzîdiyan de derdikeve pêş me, temaya dînî an jî nakokiya dînî ya di navbera kurdên misliman û kurdên êzîdî de derketiye pêş. Lê girîngiyek dî ya vê varyantê ev e ku, ew ji herêma Kobanê hatiye gotin û vebêjê destanê bi eslê xwe ereb e lê di nava civaka kurd de dijî. Vê yekê bandorê li vegotina wî ya destanê kiriye.

Di vê varyantê de vebêj di destpêkê de bi rengekî aşkera balê dikêşe ser cudahiya dînî ya di navbera kurdên êzîdî û kurdên misliman de. Dema ku Paşayê Milan qehwa şertê digerîne û kes newêre rakê, Derwêş radibe û wiha diaxive:

“Beg û serokê Milano

Serî xwe rakin li me binêrin

We çî ra serê xwe berdaye erdê

Em hîro Şerqiyên li bînanî konê we rûniştine

Va şeş meh bûn me bin vî konî nediye

We xwe bi xwe bi hev di ra digo

Wê Şerqiyên bînanî vî konî nebînîn heta roja mirinê

Ha hîro em li bin kon rûniştine

⁵⁶⁰ J.9., Pêvek 3.

Wûn çî ra serî xwe li me ranakin

Û hîro gulî Edûlê mor

Serfiraza sî û du hezar we yî Milan

Ketî mezat û herraca mêranê, ketî hindirî vê fîncanê

Wûn çî ra serî xwe li fîncanê ranakin

We digo kurê Evdoyê Şerqî

Wê bînanî vî konî nebîne

Hîro di ortê we da rûniştî

Piştê xwe dayî dîregî ortê

Berî xwe dayî hêla heremê û jinane

Wûn çî ra serî xwe lê ranakin

Wûn li pêş me ne fîncan a wê

Ti karê me bi fîncanê ra tuneye

Em Şerqî ne, wûn Milî ne, em êzîdî ne wûn misliman in⁵⁶¹

Wekî ku jî vê pasajê jî diyar e, vebêjê vê varyantê berevajî varyantên dî, hem yên herêmên êzîdîyan û hem jî yên herêmên kurdên misliman, konteksta destanê bi temamî li ser hêmanên cudakar dafîne û cudahiya bawerî û cudahiya eşîrî dixê navenda temayê.

Di varyantên kurdên êzîdî de jî cudahiya dînî heye û temaya jiyana eşîrî jî heye lê kurdên êzîdî û kurdên misliman di binê baneke firehtir de têne cem hev ku ev ban kurdbûna wan e. Û ev dîskûrsa netewî hema bêje di hemî varyantên êzîdîyan de heye.

Di varyantên kurdên misliman de jî cudahiya bawerî paş de dihate xistin heta di hin varyantan de vebêj, wekî ku Derwêş ne êzîdî be lê misliman be tevdigerin. Li şûna dîskûrsa netewî jî, dîskûrsa umetî an jî dînî li pêş bû û di destanê de evîn temaya sereke bû. Lê di vê varyantê de em dibînin ku vebêj jî aliyê pêşde derxistina temayan de tercîheke cuda kiriye.

Di vê varyantê de jî wekî her du varyantên jorîn yek carekî jî peyva kurd an jî kurmanc derbas nebûye. Lê wekî ku di pasaja jorîn de jî xuya dike dîskûrsa civaka eşîrî gelekî li pêş e. Lê di vê dîskûrsê de jî meylekî cudakar hem di asta

⁵⁶¹ Ö. Uluçay, *Destana Dewrêşê Evdî*, r. 270.

eşîrî û hem jî di asta dînî de heye. Dema ku Derwêş dibêje: *‘Em Şerqî ne hûn Milî, em êzîdî ne hûn misliman’*, bi tevahî balê dikêşe ser hêmanên cudakar yên di navbera wan û yên dî de.

Di varyantên êzîdiyan de jî ev dîskûrs qismen hebû lê di bana kurdayetiyê de her du kom digihîştin hev. Her wiha Şerqî û Dina wekî du milên eşîra Milan dihatin teqdîmkirin. Heta Derwêş ji bo xwe digot: *Ez eşîra Zor Temir Paşayê Milî me.*

Di vê varyantê de cudahiyeke balkêş ji varyantên dî ev e ku Evdî û Eferê Gêşî heval an jî destbirakê hev in. Wekî ku tê zanîn Gêşî eşîreke ereban e. Di hemî varyantên dî de Eferê Gêşî wekî karakterekî ‘pir xerab’, wekî fokûsa xerabiyên di destanê de li pêş me ye lê di vê varyantê de, fokûsa xerabiyê ne Eferê Gêşî ye lê Çîl Îbrahîmê tirk e (an jî Ecîl Brahîm). Ev xaleke balkêş e lewre di nava erebên herêmê de dijayetiyeke aşkera ya tirkan heye. Lewre di vê varyantê de ku ji herêma Kobanê hatiye berhevkirin û vebêj esil-ereb e, fokûsa ‘xerabiyê’ diguhere û dibe Çîl Brahîmê tirk. Ji xwe di vê varyantê de, bi qandî ku di varyantên dî de qet dernakeve pêş me, tirk an jî bêjara dijayetiya tirkan derdikeve pêşberî me.

“Eferê Gêşî, ew û Dewrêş bi hev ra bira ne. Dewrêş, birayê hespê xwe dayî Efer e. Vana li Şengalê berê diçûn hesp diçêrandin. Rokê hev dibûn, ji hev di hezkiribûn û bi hev ra bûbûn bira. Kevir bi hev ra li Şengalê kiribûn erdê, her yekî kevirêkî xwe kiribû erdê. ‘Kînga va kevira me ji erdê derketin,’ go, ‘kevirê me ji hev di qetiyên, wê biratî me jî ji hev biqetîne’”⁵⁶²

Beriya şer jî Efer û Derwêş hev dibînin û Efer ji Derwêş rica dike ku ew nekeve şer û jê re soz dide ku dê ew bi xwe here Edûlê jê re bîne lê Derwêş qebûl nake. Digel ku Derwêş qebûl nake jî Efer, di giraniya şer de jî dilê wî li bal Derwêş e û her tim dixwaze alî wî bike.

Dema ku Derwêş bi niyeta şer radike fîncana qehwê, Çîl Brahîm wiha jê re dibêje:

“Yekî serî xwe rakir go: ‘Law berde vê fîncanê!’

Tu min nas nakî?

⁵⁶² Ö. Uluçay, *Destana Dewrêşê Evdî*, r. 275.

Ez Çil Îbramê Begdilî me, Paşê tirkan

Tu meriyakî Şerqî yî, êzîdî yî

*Tu nikanî rakî cerd û bêregê me tirk û Gêsan*⁵⁶³

Wekî ku tê dîtin, di vê varyantê de bêjara dij-tirk gelekî berbelav e û ev yek ji ber taybetmendiya herêma varyantê û faktora dengbêj e ku ew bi xwe esil-ereb e. Dema ku şer giran dibe, digel ku hemî hevalên wî mirine û ew bi tenê maye jî Derwêş şer dike û di vê kêliyê de dîsa em dibînin ku vebêj bêjara dij-tirk bi renekî bi bandor bi kar tîne.

“Serdarê tirk û Gêsan li hev di kom bûn. Egîdê tirk û Gêsan go, ‘Xeyo, em bi vî nikanin, li ser hespê em pê nikanin; wellahî vava bû gurê devbixwûn, kesekî ji me bernadê ne ji tirkan û ne ji Gêsan, wê egîdê me tirkan û Gêsan gihan bikujê.’”⁵⁶⁴

Di vê pasaja jorîn de em dibînin ku di nava paragrafekê de çar caran peyva tirk û Gêsan hatiye bikaranîn û tirk wekî qebîleyeke newêrek hatine nîşandan.

Derwêş di şer de birîndar dibe û dikeve, hingê xuşka Eferê Gêsi û dûra Eferê Gêsi bi xwe ji tirkan vediqetin û li kêleka Derwêş cih digirin.

“Li hemberî toda Zihre Xatûnê, xweyînga Eferê Gêsi –Tode, yanî Erebe jê re dibêjin Huddec; li ser piştê delûlan girê didin, ji qîzan ra- Wexta ku Dewrêş kete xwarê, dibê tirkan hatinêkê, Zihre xwe ji ser todê çen kire ser Dewrêş û banê tirkan kir go: ‘Va kete alî min, dest jê berdin!’ Dibê tirkan şora Zihre negirtin, di bin wê da dîsa lêxistin. Wê çaxê Zihre ban kir, banê Efer kir go: ‘Efer birawo, dilê mi liyan e! Tirkan pêle rûyê Gêsan kirin. Bi ça min, vayî di bin mi da tû û wî bra ne; li Sêrega Çiyayê Şengalê we bi hev di ra kevir berdane erdê, wûn bûne bra! Vava wek brakî minî ji dê û bavan e. Tu hîro nabîntî tirkan di bin mi da li Dewrêş dixine. Dibê wê çaxê Efer banê Gêsan kir, go: ‘Gêsanno! Ji tirkan biqetin, tirkan merîne xayîn in, rûyê me şkênandin!’ Dibê li ser vê yekê, ku tirkan di bin Zihre de li Dewrêş xistin, tirkan û Gêsan ji hev diqetiyên û li hemberî hev disekiniyan, dikin li hev dixînin.”⁵⁶⁵

Faktora vebêj û taybetmendiya herêma varyantê di vê pasaja jorîn de bi temamî aşkera dibe. Digel ku di destpêka destanê de peyvên tirk û Gêsi her tim bi hev re dihate bikaranîn, êdî Gêsi jî xwe ji aliyê tirkan vedikêşin û peyva tirk ku

⁵⁶³ H.b., r. 272-273.

⁵⁶⁴ H.b., r. 292.

⁵⁶⁵ H.b., r. 293.

dibe fokûsa xerabiyê ya di destanê de, bi tena serê xwe tê bikaranîn. Vebêj dîsa balê dikêşe ser destbiraktiya Efer û Dewrêş û sadiqbûna Efer ya ji soza xwe re. Her wiha vebêj li vê derê têgiha Ereb jî di nava rewşeke pozîtîf de bi kar tîne. Yanê xuşka Efer jî wekî alîkarê Derwêş derdikeve meydanê û tirk wekî objeya nebaşiyê li meydanê ye. Ev pasaja jorî bi serê xwe meylên etnîk û nasnameyî yên di vê varyantê de didin der û nîşanî me didin ku temayên destanan li gorî faktora nasnameya etnîk ya vebêj û taybetmendiyên herêmî çawa diguherin.



ENCAM

Bi rêya vê vekolînê me hewl da em derxin meydana ku vegotinên gelêrî yên civakê di çî astê de temsîlên nasnameyên etno-dînî didin der. Dema ku me dest bi vê xebatê kir, pirsê sereke ew bû ku gelo em dikarin nîqaşên li ser nasnameya civakan, di nava têkiliyên çandî û folklorî de bigihîjin encamê. Lewre hin vegotinên gelêrî di nava civakê de, ne bi rêyên rasterast be jî, esasen wekî dokumentên dîrokî ne ku hin îdîayan îspat dikin û hin îdîayan jî pûç dikin. Bêguman her îdîayeke zanistî bi wê yekê ve girêdayî ye ku ne rewşeke îstîsnaî be û di binê hin şertên diyar de heman encaman bide û di nava temsîleke watedar de xwe nîşan bide.

Bi rêya vê vekolînê hate dît ku her çendî ku navê civaka kurd di asteke jorîn de wekî kurd hatiye diyarkirin jî û ev yek heya astekê nasnameyeke hevpar îfade bike jî, belkî wekî ku Anderson jî îfade dike, ev texeyulek be. Lewre di asta jêrîn de, digel faraziyeya zanava hevpar jî, gelek zanavên mînor an jî etnîk hene ku ew di her merheleya rêyên xwe îfadekirinê de, xwe didin pêş û carina bi nasnameya giştî re di nava nakokiyê de ne. Bêguman ev rewş tenê di diyardeyeke cudakar de tezahur nake. Gelek faktorên wekî dîn-bawerî, ziman-zarava, erdnîgarî-çand dikevin ser hev û li wê derê jî bo tezahura nasnameyeke mînor rewşeke seza peyda dibe.

Di dirêjahiya vê tezê de me dît ku bi rêya vegotinên gelêrî em dikarin di heqê awayê xwe pênasekirina civakan de bigihîjin hin fikran. Li wê derê jî têgiha xwe pênasekirinê mebesta me; di asta dem û mekanî de xwe bicihkirina li ser rûyê zemîn e. Ev zemîn an jî nuqteyî nêrîna ku kes an jî civak xwe li wê derê bi cih dike, di heman demê de îlaneke nasnameyî ye. Lê di encama vê xebatê de derket meydana ku jî bo civakan an jî komên etnîk, îdîayên nasnameyî ne statîk û bi îstîqrar in. Ew di konteksta mekan, dem û faktora dîkeyê de diguherin.

Di mînaka elewiyên kurd (kurmanç-kirmanç) de derkete meydana ku ew tercîhên xwe yên nasnameyî li gorî van faktorên dikin. Dema ku elewiyên kurd bi rûs û ermenyan re şer dikin xwe di nava cîhana îslamî de dibînin û xwe wekî misliman pênase dikin. Dema ku konflikta wan bi Dewleta Osmanî/Tirkîyê re be hingê xwe wekî kurmanç/kirmanç û welatê xwe jî wekî Welatê Kirmanciyê bi nav dikin. Dema ku konflikta bi kurdên sunî re be li kêleka zanava kirmanciyê an jî

kurmanciyê, hêmanên dînî yên elewîtiyê jî li zanava xwe bar dikin. Ev yek nîşan dide ku nasname ne diyardeyeke statîk e û li gorî kontekstên cuda bi rengên cuda tezahur dike. Lê divê em vê qeyd bikin ku kurdên elewî bi qandî ku me ji metnên ku li ber destê me ne vekola û her wiha ji tecrubeya xwe ya xebata sehayê jî; tu car xwe bi tenê wekî ‘elewî’ bi nav nakin. Ew her tim xwe wekî ‘elewî û kurmanç’, ‘elewî û kirmanc’, ‘kirmanc’, ‘kurmanç’, ‘elewî û kurd’ bi nav dikin. Yanê hem faktora dînî û hem jî faktora rehên etnîk derdixin pêş. Li vê derê têgihên kurmanç û kirmanc ji ziman/zarava bêtir îşaret bi pevgirêdana etnîk dikin. Bêguman divê sedemên vê yekê hebin. Dibe ku sedema vê, prosesa dîrokî be ku hê bi tevahî nasnameya dînî li ser nasnameya etnîk nekemiliye. Dibe ku sedema vê fakotra dîke û dîkeyan be. Lewre dema ku em bala xwe didin herêmên kurdên elewî, tê dîtîn ku ew ji rojhilat ve cîranên kurdên sunî ne lê ji rojava ve cîranên turk/turkmenên elewî ne. Tê dîtîn ku ew bi pênaseya kurmanç an jî kirmanc xwe bi dîqet ji tirkên elewî jî vediqetînin. Her wiha bi pênaseya elewî jî xwe ji kurdên sunî vediqetînin. Ev rewş ji bo faktora dîkeyê ya li ser pênaseya nasnameyî, nîşaneyê girîng e.

Di nava civaka êzîdî de ev rewş li gorî koma kurdên elewî cuda ye. Ew di heqê nasnameya xwe de bêtir monolîtîk in û xwe rasterast wekî ‘êzîdî’ pênase dikin. Lewre ji aliyê xwe pênasekirinê ve, civaka êzîdî ji civaka elewî bêtir zelal e û her wiha di nasnameya xwe de bêtir bi îsrar e. Ew di her rewşê de cudahiya xwe ya etno-dînî tînin ziman. Ji ber vê yekê eger em tesbîteke wiha bikin dê ne xelet be: nasnameya dînî di nava civaka êzîdî de li nasnameya etnîk vegeyriyaye. Ew dema ku xwe wekî komeke dînî jî teswîr dikin û dema ku xwe wekî komeke civakî jî teswîr dikin, pênaseya êzîdî ji bo xwe bi kar tînin. Dibe ku ev yek girêdayî cudahiya dînî be. Lewre her çendî ku wekî bawerî cuda be jî, elewîti di encamê de di nava dînê îslamiyetê de hatiye dîtîn û piraniya elewiyan jî elewîtiyê di nava îslamiyetê de dibînin. Lê ev rewş, digel ku di vê mijarê de nîqaş hene jî, ji bo êzîdiyan ne bi heman rengî ye.

Her çendî ku di heqê derketina vî dînî de nîqaş hebin jî di rewşa îroyîn de êzîdîtî, ne di nava îslamiyetê de ye û hem ew xwe li derveyê dînê îslamê dibînin û hem jî misliman bi xwe wan li derveyê dînê îslamê dibînin. Lê di metnên êzîdiyan yên dînî de me tesbît kir ku li hember ‘qizilbaşan’ reflekseke wan ya diyar heye. Dema ku Osmanî û ecem şer dikin bi rengê aşkera xwe li kêleka Osmanîyan bi

cih dikin û ‘qizilbaşan’ wekî ‘kafir’ dibînin. Her wiha di metnên elewiyan de jî bi taybet yên ku Le Coq ji herêmên Klîs û Efrînê berhev kirine, tê dîtin ku kurdên elewî jî li hember kurdên êzîdî xwedî reflekseke gelekî tûj in û bi rengekî vê konfliktê bi meseleya Kerbelayê û Yezîd ve girê didin.

Êzîdî di metnên xwe yên dînî û folklorî de, tirk, ereb û eceman wekî dîkeyên xwe dibînin lê tu caran kurdên mîslîman wekî dîkeyên xwe nedîtine. Di vegotinê gelêrî yên ku civaka kurd bi civakekekê dî re di nakokiyê de ye, wekî ku di Kela Dimdim û Derwêşê Ewdî de derdikeve pêş me, civaka êzîdî bi rengekî aşkera xwe di nava civaka kurd bi cih dîke û kurdbûna xwe derdixe pêş. Lê di van rewşan de jî her tim tevlêbûna xwe ya nasnameya netewî, bi rêya kodên xwe yên etno-dînî bi cih tîne. Yanê tenê xwe kurd nabîne lê xwe wekî kurdê êzîdî dibîne.

Bi rêya vê vekolînê jî me tesbît kir ku kurdên mîslîman û kurdên êzîdî di hevpariya berhemên folklorî de di asteke jorîntir de ne. Çîrok, destan, efsaneyên ku di nava piraniya kurdên mîslîman de tên zanîn di heman demê de di nava civaka êzîdiyan de jî tên zanîn. Bêguman sedemeke vê ya bingehîn ev e ku êzîdî li gorî civaka elewî bêtir li seranserê Kurdistanê belav bûbûn. Her wiha xwedî çandê xurt ya dengbêjiyê bûn û ji ber taybetiyên jiyana eşîrî her tim di nava vê erdnîgariyê de digeriyan. Lewma ew wekî veguhêzên çand û folklorê bûn. Lê me vê tesbîtê jî kir ku di nava civaka êzîdî de hin vegotinên gelêrî hene ku ev bi tenê taybet in bi civaka wan û ev vegotin bi piranî bi trajediyên wan yên dîrokî ve girêdayî ne.

Elewiyan kurd bêtir di herêmeke diyar de dijîyan/dijîn û ev herêm ji alî demografyayê ve bêtir tevlihev e. Elewiyan kurd hem bi xwe wekî kurmanç û kirmanç li du beşan vediqetin û hem jî ew hem cîranên tirkên elewî û tirkên sunî û dîsa cîranê kurmanç û kirmançên sunî ne. Ev yek bandorê li tercîhên wan yên nasnameyî jî dîke.

Di encama vê xebatê de me tesbît kir ku ev her du komên etno-dînî berhemên folklorî li taybetmendiyên xwe yên dînî-bawerî adapte dikin û di heman demê de termînolojiya xwe ya dînî lê ferz dikin. Dema ku em aliyê perwerdehî û neqilkirina hafîzeyê civakî ya folklorê jî bigirin pêş çav, derdikeve meydanê ku nêzîkatiya civakên etno-dînî li van metnan di çarçoveya mayendekirina îdfayên xwe yên nasnameyî û nêrîna xwe ya dînî-îdeolojîk de ye. Lewre heman metin

dema ku dikeve nava sîrkulasyoneke navber-dînî, navber-çandî, em dibînin ku taybetmendiyên ku wê koma etno-dînî temsîl dikirin, jê derdikevin û berhem yan bêalî dibe yan jî dibe meydana îdîayên nasnameyeke dî.

Di encama vekolîn û berawirdiyan de em gihastin van encaman:

1. Vegotinên gelêrî (wekî çîrok, destan, efsane û hwd.) di her astê de, gelek taybetmendiyên civakê didin der.
2. Ev taybetmendî heya niha bi piranî di asta çand û erdnîgariyê de hatine vekolîn. Lê di encama vê vekolînê de jî diyar e ku nasnameya etnîk û dîn-bawerî jî di nava berhemên folklorî de wekî temsîla koma etnîk cih digirin.
3. Civaka etnîk, folklorê wekî platformeke veguhêz dinirxîne û bi rêya van berhemên îdîayên xwe yên nasnameyî û etno-dînî neqil dike.
4. Ev neqil ji du aliyên ve xwedî wate ye. Yek jê, aliyê wê yê ku xîtabê koma xwe dike û ya dî jî aliyê wê yê ku xîtabê dîke an jî dîkeyên xwe dike.
5. Berevajî hin îdîayan, ev proses, proseseke xwezayî ye. Ne girêdayî sazî û organîzasyonên netew-dewletî ye. Ev ramanek an jî hişmendiyeke kolektîf ya wê koma etnîk bi xwe ye.
6. Di mînaka koma kurdên elewî û kurdên êzîdî de tê dîtin ku ew baweriya xwe di nava tevdehiya netewîtiya kurd de wekî rewşeke ferdî/takekesî nabînin. Ew xwe di nava tevdehiya netewîtiya kurd de wekî komeke cuda tesewir dikin. (Li vê derê ji 'netewîtiya kurdî' mebesta me, xwepênasekirina wan ya wekî 'kurmanç' an jî 'kirmanc' e.) Li dû vê yekê ev pênaseya koma etnîk an jî koma etno-dînî temam dike.
7. Vegotinên gelêrî di nava kurdên elewî, kurdên sunî û kurdên êzîdî de bi piranî hevpar in. Bi taybetî di çîrokan de ev yek aşkera ye. Lê di destanan de her kom bi refleksa xwe ya etno-dînî tevdigere. Yan nahêle ku ew cure bikeve nava komê yan jî adapteyê taybetmendiyên xwe yên etno-dînî dike.
8. Motîf an jî temsîlên etno-dînî hem di çîrokan de hem jî di efsane û destanan de derdikevin pêş me. Lê di nava van cureyan de efsane bi temamî bi sîstema baweriyê ya wê koma etno dînî ve girêdayî ne û transmîsyona wan ya navber civakên etno-dînî zehmet e. Ji bilî hin metnên îstîsnayî wekî Efsaneya Şahêmaran. Çîrok jî her çendî ku hevpar in jî dîskûrsa wan bi piranî berew bi koma etnîk bi xwe ye yanê ew xîtabê koma xwe dikin. Lewre jî di wan de tesbîtkirina xalên dînî hêsantir e. Civaka etno-dînî di

çîrokan de rûyê xwe ji dîkeyê bêtir vedigerîne koma xwe û ji ber vê yekê li wê derê ji îdîayên nasnameyî bêtir, sembolên dînî derdikevin pêş me. Lê di destanan de asta sosyo-polîtîk di radeya herî jorîn de ye. Koma etno-dînî bi pîranî bi rêya van metnan sekna xwe ya etnîk diyar dike û vê ji dîkeya xwe re aşkera dike.

9. Ji ber ku ziman di veguhaztina çandî de navgîneke sereke ye, bi taybetî têkiliya kurmancên elewî bi kurmancên sunî re û têkiliya kurmancên êzîdî bi kurmancên misliman/sunî re bêtir dînamîk e. Lê ji bo kirmancên elewî (bi taybetî yên herêma Dêrsimê) heman poreses ne li dar e.

10. Di vegotinên gelêrî yên kirmancên elewî de, bi taybet yên Dêrsimê de, hîsiyata hevpar ya nasnameya kurdî lewaz e. Ev ne rewşeke aydê dîroka nêz e. Lewre di metnên wan yên sed sal berê de jî tê dîtin ku heman hîsiyat bi wan re heye. Di berhemên wan yên folklorî de ji bo pênaseya etno-dînî têgiha ku herî zêde ew bi kar tînin; kirmanc an jî kirmanciyê ye. Ew wateyke dînî-erdnîgarî-zimanî li vê têgihê bar dîkin û xwe bi vî rengî ji tevdehiya civaka kurd cuda dîkin. Her wiha ev tesbîta me bi metnên folklorî yên ber dest re bi sînor e.

11. Di nava metnên ku me analîz kire de, di tu merheleyê de em lê rast nehatin ku ew xwe rasterast wekî kurd û welatê xwe jî wekî Kurdistan pênase bikin. Bêtir xwe wekî kirmanc pênase dîkin. Kirmanc û Kirmanciyê heta hin caran Welatê Kirmanciyê wekî cureyek xwe pênasekirina etno-dînî ya vê komê tezahur dike. Lê di nava elewiyên kirmanc de, dîskûrsa kurd û Kurdistanê tê dîtin. Ev yek nîşanê me dide ku bi tenê cudahiya dînî/mezhebî bi serê xwe têr nake ku komeke civakî ji xwe re nasnameyeke nûh însa bike.

12. Tê dîtin ku di nava elewiyên kirmanc yên Dêrsimê de çend faktorên ku bîngeha nasnameya hevpar ava dîkin, wekî hêmanên cudakar ketine ser hev û rê lê vebûye ku ew xwe ji civaka kurd-kurmancên sunî cuda bibînin. Ev faktor bi vî rengî ne: Ziman: kirmancbûn, Bawerî: elewîbûn, Erdnîgarî: Dêrsimîbûn. Ev her sê hêmanên ku cudahiye çêdîkin, bi hafizeya kolektîf ya dîroka nêz jî têne xurtkirin. Her çendî ku em nikarin kirmancbûn û sunîbûnê wekî bîngeha kurdbûnê îfade bikin jî, ji ber ku ew ji alî demografîya û erdnîgarîyê ve koma herî mezin in, di navbera têgiha kurd û kurmancên sunî de hevterîbiyek çê bûye. Ev hevterîbî, ji ber ku ew jî kirmanc in di hîsiyata hevpar ya koma kurmancên elewî û kurmancên êzîdî

de zeafiyeteke mezin çênake. Lewre di danûstendina çandî de jî tu asteng nîn e. Lê dema ku dor tê ser kirmancên elewî; du faktorên mezin yên ku bingeha nasnameya hevpar in; ziman û bawerî, ji hev cuda dibin û ev yek rê lê vedike ku nasnameya etno-dînî bêtir derkeve pêş. Her wiha yekambûna herêmî an jî Dêrsimîbûn jî di tesewira welatî de zeafiyetek di çêdike.

13. Ev tesbîta me ya; hevterîbiya di navbera kurd û kirmancên sunî de bêguman bi kurdên bakûr bi sînor e. Lewre dibe ku li rojhilat an jî başûr ev hevterîbî ji ber dînamîkên erdnîgarî û demografîk yên wan herêman, bi rengekî di teşekul bike.

14. Ji aliyê hafizeya dîrokî ve, tê dîtîn ku komên kurdên elewî û kurdên êzîdî xwedî refleksên cuda ne. Hafizeya dîrokî di heman demê de hêmaneke sereke ya nasnameya etnîk e. Bi rêya metnên folklorî ku me vekola, me tesbît kir ku kurdên êzîdî û kurdên elewî di vê hêmanê de ji tevdehiya civaka kurd cuda ne. Ew di heqê prosesên dîrokî de xwedî hafizeyeke yekane ne ku ev taybet e bi koma wan û ev xal di heman demê de bingeheke qehîm ya nasnameya wan a etno-dînî ye.

15. Kurdên êzîdî di aşkerakirina nasnameya xwe ya etnîk de li gorî kurdên elewî bêtir vekirî ne. Ev yek hem di metnên wan yên dînî de û hem jî di metnên folklorî de xuya dibe. Dibe ku sedema vê ji ber rewşa wan ya civakî-erdnîgarî be. Lewre civaka êzîdî, eger ku em navenda wan wekî Sîncar û Lalişê bigirin, bi pîranî bi kurdên misliman û erebên misliman re cîran in. Yanê li hember wan bi tenê du kategoriyên civakî û etnîk hene. Û dema ku ew mecbûrê tercîhekê bibin, bêguman dê xwe di binê bana kurdbûnê de, li kêleka kurdên misliman bi cih bikin. Her wiha êzîdî wekî kategoriyek civakî bêtir homojen in. Yanê bi tenê kirmanc û êzîdî ne Her wiha eger îro nîn be jî di dîrokê de bi demeke dirêj, ne bi tenê li Şêxan û Sîncarê lê li seranserê Kurdistanê di nava civaka kurd de dijiyan. Lê di nava kurdên elewî de rewş bêtir konflîkt e. Yek jê; ew bi xwe ne homojen in. Yanê hem kirmancên elewî hene û hem jî kirmancên elewî hene. Dîsa wekî civak, cîranên kurdên elewî, tirkên elewî, kurdên sunî û tirkên sunî ne. Di nava kurdên sunî de kirmancên sunî hene û kirmancên sunî hene. Lewre li vê derê digel ku ji bo kurdên êzîdî wekî dîke bi tenê du kategoriyên cuda hebûn jî ji bo kurdên elewî wekî dîke tê dîtîn ku gelek kategoriyên cuda li dora wan bi cih in û dema ku em di diyarkirina nasnameya etnîk de rola

dîkeyê bifikirin, hingê di heqê têkilheviya nasnameyî ya nava kurdên elewî de em dikarin bigihîjin hin fikran. Ev yek wekî ku me di beşên duyem û sêyem de bi mînakên nîşan da, xwe di metnên wan ên folklorî de jî dide der.





ÇAVKANÎ

Açar, Cafer (2019), *Safevi Kroniklerde Dımdım Kalesi Kuşatması ve Emir Han Bradosti*, Avesta Yayınları, 1.Baskı, İstanbul

Aday, Hakan, *Foklora Herêma Pêrtégê, Vegotinên Gelêrî Yên Herêma Pêrtégê, Gundê Coravan (Neçapkirî)*

Aksoy, Gürdal (2006), *Dersim Alevi Kürt Mitolojisi*, Komal Yayınları, 1. Baskı, İstanbul

Akyol, Hilmî (2005), *Ji Zarogitna Kurdî Stran û Pêkenok I*, Weşanên Elma, Ç. 1., Stenbol

Akyol, Hilmî-Zarg, Rojîn, *Ji Zargotina Kurdî Çîrokên Gelêrî*, Weşanên Enstîtuya Zimanê Kurdî Ya Amedê, Amed

Allison, Christine (2007), *Yezidi Sözlü Kültürü*, Avesta Yayınları, Çev. Fahriye Adsay, 1. Baskı, İstanbul

Alxasî, Alî (2003), *Ji Meraşê Xeberek Hat*, Weşanên Pêrî, Çap. I. Stenbol

Anderson, Benedict (2020), *Hayali Cemaatler, Milliyetçiliğin Kökenleri Ve Yayılması*, Metis Yayınları, Çeviren: İskender Savaşır, Yenilenmiş ve Genişletilmiş Basım, İstanbul

Arik, Sabahattin Ali (2015), *Aryan İnançlar ve Rêya/Raa Heqiye*, IBV Yay, 1. Baskı, İstanbul

Aslan, Besê (2005), *Nar Ağacının Gölgesi Yoktur*, Elma Yayınları, 1. Baskı, İstanbul

Bascom, William R. (2006) 'Halk Bilimi ve Antropoloji', *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar 1* (ed. M. Öcal Oğuz, Metin Ekici, Nebi Özdemir, Gülbin Öğüüt Eker, Selcan Gürçayır Teke), Geleneksel Yayıncılık, Çeviri, Metin Ekici, 3. Baskı, Ankara

Bates, Daniel G. (2009), *21. Yüzyılda Kültürel Antropoloji*, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, Çeviren, Süavi Aydın, 1. Baskı, İstanbul

Bauman, Richard (2014), 'Halk Biliminin Farklı Kimliği ve Sosyal Tabanı', *Halk Biliminde Kuramlar Ve Yaklaşımlar 2*, (Ed., Öcal Oğuz û yd.), Geleneksel Yayıncılık, Çeviren, Feridun Çotre, 3. Baskı, Ankara

Bayezîdî, Mûradxan (2002), *Çîroka Zembîlfiroş*, 'Kovara Nûbihar', Weşanên Nûbihar, Hejmar: 87, Veguhastin: M. Xalid Sadinî, Stenbol

Bayrak, Mehmet (2014), *Êzîdî-Kızılbaş-Yaresan Kürtler*, Özge Yayınları, 1. Baskı, Ankara

Bedlîsî, Şerefhanê (2007), *Şerefname*, Werg, Ziya Avcı, Weşanên Avesta, Çap 3. Stenbol

Blau, Joyce (1975), *Tekstên Folklorîk Ên Kurdên Îmadiye Û Sincarê*, Libarie C. Klincksieck, Paris

Bozkurt, Fuat (2004), *İmam Cafer Sadık Buyruğu*, Kapı Yayınları, İstanbul

Boratav, Pertev Naili (2011), *Halk Edebiyatı Dersleri*, Tarih Vakfı Yayınları, 2. Basım, İstanbul

Bruinessen, Martin Van (2002), *Kürdistan Üzerinen Yazılar*, İletişim Yayınları, Çeviren, Nevzat Kırış, 4. Baskı, İstanbul

Canerik, Caner (2019), *Dersim Masalları*, Dönüş Yayınları, I. Baskı, İstanbul

Celîl, Celîlê-Celîl, Ordîxanê (2013), *Zargotina Kurda I*, Weşanên Aram, Çap. 3. Amed

------(2013), *Zargotina Kurda II*, Weşanên Aram, Çap. 3. Amed

Celîl, Celîlê-Şadkam, Gulî (2012), *Sêxiştiyên Kurmancî*, Îstîtuya Kurdzaniyê-Wien, Wien

Celîl, Ordîxanê (2016), *Dimdim, Kürt Kahramanlık Destanı*, Avesta Yayınları, Çev. İbrahim Kale, 2. Baskı, İstanbul

Cengiz, Daimi (2001), *Dersim Fabılları-1*, Kalan Yayınları, 1. Baskı, Ankara

------(2010), *Dizeleriyle Tarihe Tanık Dersim Şairi Sey Qajî*, Horasan Yayınları, 1. Baskı, İstanbul

Cindî, Heciyê (2016), *Folklora Kurmanciyê*, Weşanên Lîs, Çap. 3. Amed

------(2014), *Hikayetêd Cimeata Kurda I*, Weşanên Rûpel, Ç. 1. Stenbol

------(2014), *Hikayetêd Cimeata Kurda II*, Weşanên Rûpel, Ç. 1. Stenbol

------(2014), *Hikayetêd Cimeata Kurda III*, Weşanên Rûpel, Ç. 1. Stenbol

------(2014), *Hikayetêd Cimeata Kurda IV*, Weşanên Rûpel, Ç. 1. Stenbol

------(2015), *Hikayetêd Cimeata Kurda V*, Weşanên Rûpel, Ç. 1. Stenbol

----- (2015), *Hikayetêd Cimeata Kurda VI*, Weşanên Rûpel, Ç. 1. Stenbol

Çem, Munzur (2011), *Dêrsim Merkezli Kürt Aleviliği, Etnisite, Dini İnanç, Kültür ve Direniş*, Vate Yayınları, 2. Baskı, İstanbul

Çobanoğlu, Özkul (2012), *Halkbilimi Kuramları ve Araştırma Yöntemleri Tarihine Giriş*, Akçağ Yayınları, 6. Baskı, Ankara

Dorson, Richard (2011), *Günümüz Folklor Kuramları*, Geleneksel Yayıncılık, Çeviren, Selcan Gürçayır-Yeliz Özay, 2. Baskı, Ankara

Dundes, Alan (2015) ‘Antropolog ve Folklorlarda Karşılaştırmalı Metot’, *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar 3*, Çeviren, Seval Kasımoğlu-Ferya Çalış, Geleneksel Yayıncılık, 2. Baskı, Ankara

Dundes, Alan (2014), ‘Halk Bilimi Çalışma Yöntemleri’, *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar II*. Geleneksel Yayıncılık, Çeviren: Ayşenur Nazlı, 3. Baskı, Ankara

Dundes, Alan (2006), *Fakelore Fabrikasyonu*, Milli Folklor Dergisi, Sayı: 70, Ankara

Durkheim, Emile (2008), ‘The Foundation of Sociologic Thought’, *Athropological Theory*, Texas State University-San Marcos, Mcgown- Hill Press, New York/America

Durkheim, Emile (2008), ‘What is A Social Fact’, *Anthropological Theory*, Texas State University-San Marcos, Mcgown- Hill Press, New York/America

Durkheim, Emile (2008), ‘The Cosmological System of Totemism’, *Athropological Theory*, Texas State University-San Marcos, Mcgown- Hill Press, New York/America

Düzgün, Mustafa (1989) *Sae Marû*, Herêm, Dêrsim, Vebêj, Mursaê Silêmanî, Stenbol

Düzgün, Mustafa (1992), *Tayê Lawikê Dêrsimî*, Weş. Berhem, Çap. I. Ankara

Ebdulfettah, Deham (2017), *Yarsan An Ji Ehlê Heq*, Weşanên Lîs, Çap. I, Diyarbakır

Eriksen, Thomas Hyyland (2004), *Etnisite ve Milliyetçilik*, Avesta Yayınları, Çeviren: Ekin Uşaklı, 1. Baskı, İstanbul

- Farqînî, İdrîs (2011), *Bi Zarê Êzîdiyan Çîrokên Gelêrî (Deverên Xankê û Baedrê)*, Weşanên J&J, Çap I, Stenbol
- Frazer, James (2017), *Dinin ve Folklorün Kökleri*, YKY, Çeviren: Mehmet H. Doğan, 1. Baskı, İstanbul
- Fuccaro, Nelida (2010), *Öteki Kürtler, Sömürge Irak'ında Ezidiler*, bgst Yayınları, Çeviren: Şerif Derince (vd.), 1. Basım, İstanbul
- Gellner, Ernest (1992), *Uluslar ve Ulusçuluk*, Hil Yayınları, Çeviren: Büşra Ersanlı Behar-Günay Göksu Özdoğan, İstanbul
- Gezik, Erdal (2000), *Alevi Kürtler*, Kalan Yayınları, 1. Baskı, Ankara
- Goldstein, Kenneth S. (1983), *Sahada Folklor Derleme Metodları*, Milli Folklor Araştırma Dairesi Yayınları, Çev: Ahmet E. Uysal, 2. Baskı, Ankara.
- Gökçen, Amed (2015), *Ezidi Ağıtları*, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, 1.Baskı, İstanbul
- Gültekin, Mehmet (2013), *Zargotina Kurdên Serhedê*, Weşanên Avesta, Çap I, Stenbol
- Hanko, Lauri (2006), 'Halk Anlatısı Araştırma Metotları, Bu Metotların Durumu ve Geleceği', *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar 1*, (Ed. Öcal Oğuz û yd.) Geleneksel Yayınları, Çev., İsmail Görkem, 3. Baskı, Ankara
- Hassanpour, Amir (2005), *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil, (1918-1985)*, Avesta Yayınları, Çeviren: İbrahim Bingöl-Cemil Gündoğan, 1. Baskı, İstanbul
- Haviland, William A. (û yd.) (2008), *Kültürel Antropoloji*, Kaknüs Yayınları, Çeviren, İnan Denis Erguvan Sarıoğlu, 1. Baskı İstanbul
- Hikmet, Bedran (2016), *Teoriyên Folklorê*, Weşanên Lîs, Çap I. Diyarbakır
- Hobsbawm, E. J. (2017), *Milletler ve Milliyetçilik, Program, Mit, Gerçeklik*, Ayrıntı Yayınları, Çev Osman Akınhay, 6. Basım, İstanbul
- Izady, Mehrdad R. (2013), *Kürtler*, Doz Yayınları, Çev., Cemal Atila, 4. Baskı, İstanbul
- Jusdanis, Gregory (1998), *Gecikmiş Modernlik ve Estetik Kültür*, Metis Yayınları, Çev., Tuncay Birkan, İstanbul
- Kardaş, Canser (2013), *Dengbejlîk Geleneği ve Aşık Edebiyatı İle Karşılaştırması*, Teza Doktorayê ya Neçapkirî, Zanîngeha Firat, Elazığ

Keskin, Necat (2014), *Akışkan Kimlikler: Etnik ve Dini Kimlik Arasında Becirman Seyyidleri*, Teza Doktorayê ya Neçapkirî, Zanîngeha Hacettepe, Ankara

Kreyenbroek Philip G, Reşow, Xelîl Cindî (2011), *Tanrı Ve Şeyh Adi Kusursuzdur*, Avesta Yayınları, Çeviren: İbrahim Bingöl, 1. Baskı, İstanbul

Kreyenbroek Philip G. (2014), *Ezidilik, Arka Planı, Dini Adetleri Ve Metinsel Geleneği*, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, Çeviren, Amed Gökçen-Damla Tanla, 1. Baskı, İstanbul

Kreyenbroek, Philip G, Allison, Christine (2008), *Kürt Kimliği ve Kültürü*, Çeviren, Ümit Aydoğmuş, Avesta Yayınları, 1. Baskı, İstanbul

Kreyenbroek, Philip G. (2014) ‘Ehlî Heq, Yaresaniyên Kurdistanê’, *Kürdistanda Dini Azınlıklar (ed. Khanna Omarkhali)*, Avesta Yayınları, Çeviren: İbrahim Bingöl, 1. Baskı, İstanbul

Krishemlet-Gimbeltt, Barbara (2014), ‘Folklorün Krizi’, *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar IV*, (Ed. Öcal Oğuz û yd.), Geleneksey Yayıncılık, Çev., Mehmet Emin Dede, 1. Baskı, Ankara

Kroeber, A. L. (2008), ‘Eighteen Professions’, *Anthropological Theory*, (Ed., R. Jon McGee, Richard L. Warms), Fourth Edition, McGraw Hill Press, Newyork/Ammerica

Kurdo, Qanatê (1996), *Mem û Zîn*, Weşanên Roja Nû, Çap I, Stockholm

Le Coq, A. V. (1903), *Kurdische Texte II*, Erster Teil, Gedruckt in der Reichsdruckerei, Berlin

Lescot, Roger (2014), *Yezidiler*, Avesta Yayınları, 3. Baskı, İstanbul

Maisel, Sebastian (2014), ‘Bir Topluluk İki Kimlik’, *Kürdistanda Dini Azınlıklar*, (ed. Khanna Omarkhali), Avesta Yayınları, Çeviren: İbrahim Bingöl, 1. Baskı, İstanbul

Oskar Mann (1906), *Kurdische-Persische Forschungen. Die mundart der Mukri-Kurden*, Abteilung IV, Bd III, T.1, Berlin

McGee, R Jon-Warms, Richard L. (2008) *Anthropological Theory*, Texas State University-San Marcos, Mcgrown- Hill Press, New York/America

Mead, Margaret (2008), ‘Introduction to Sex And Temperament’, *Anthropological Theory*, (Ed. R. Jon McGee-Richard L. Warms), Texas State University-San Marcos, Mcgrown-Hill Press, New York

Morgan, Lewis Henry (2008), ‘Ethnical Periods’ *Antropological Theory*, (Ed. R. Jon McGee-Richard L. Warms), Texas State University-San Marcos, Mcgrown-Hill Press, Ammerica, New York/America

Olrik, Axel (2006), 'Halk Anlatılarının Epik Kuralları', *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar 1*, (Ed. Öcal Oğuz û yd.), Geleneksel Yayıncılık, Çev., Aziz Erkan, 3. Baskı, Ankara

Omarkhali, Khana (ed.) (2014), *Kürdistan'da Dini Azınlıklar*, Avesta Yayınları, Çeviren, İbrahim Bingöl, 1. Baskı, İstanbul

Omerxalî Xanna-Xankî, Kovan (2009), *Analîza Qewlên Êzdiyan*, Weşanên Avesta, Çap. I, Stenbol

Öncü, Mehmet (2014), *Çîrokên Efsaneyî*, Weşanên Nûbihar, Çap I, Stenbol

Pertev, Ramazan (2018), *Folklor û Nasnameya Kurdî ya Neteweyî*, Weş. Avesta, Ç.1. Stenbol

Poladyan, Arşak-Astaryan G.S. (2016), 'Ezidi Dini', *Kürt Batınılığında Kutsal Metinler*, (Ed. Mehmet Bayrak), Özge Yayınları, Çev., Melis Taşçıyan, 1. Baskı, Ankara

Propp, Vlademir (1998), *Folklor, Teori ve Tarih*, Avesta Yayınları, Çev., Necdet Hasgül, Tolga Tanyel, 1. Baskı, İstanbul

Propp, Vlademir (2008), *Masalın Biçimbilimi*, Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları, 1. Baskı, Çev. Mehmet Rifat-Sema Rifat, İstanbul

Radcliffe-Brown, A. R (2008), 'On Joking Relationships', *Anthropological Theory* (ed. R. Jon McGee, Richard L. Warms), Texas State University-San Marcos, Fourth Edition, Newyork/America

Reşîd, Tosinê (2010), *Êzdiyatî*, Weşanên Lîs, Ç. 1, İstanbul

Rohrich, Lutz (2006), 'Halk Anlatısı Araştırmasında Anlam Arayışı', *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar 1*, Geleneksel Yayınları, Çev., Kürşat M. Korkmaz, 3. Baskı, Ankara

Sadinî, M. Xalid (2013), *Feqiyê Teyran, Jiyan, Berhem û Helbestên Wî*, Weşanên Nûbihar, Çap 7, Stenbol

Sevim, Vildan (2015) *Çîrokên Herêma Bişêriyê- Bilêyder (Neçapkirî)*, Êlih

Smith, Anthony D. (2002), *Ulusların Etnik Kökeni*, Dost Yayınları, Çeviren: Sonay Bayramoğlu-Hülya Kendir, 1. Baskı, Ankara.

----- (2017), *Milli Kimlik*, İletişim Yayınları, 9. Baskı, Çeviren, Bahadır Sina Şener, İstanbul

Socin, Albert-Pyrim, Eugen (1887), *Kurdische Sammlungen*, Presente a le Academie Imperiale, St Petersburg

Spencer, Herbert (2008), 'The Social Organism', *Anthropological Theory* (ed. R. Jon McGee, Richard L. Warms), Texas State University-San Marcos, Fourth Edition, Newyork/America

Stern, Stephan (2014), 'Etnik Folklor ve Etnisite Folklorü', Çeviri, Başak Çalışkan, *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar 4*, (Ed. Öcal Oğuz û yd.) Geleneksel Yayıncılık, 1. Baskı, Ankara

Steward, Julian (1973), *Theory of Culture Change*, University of Illionis Press, Urbana Chicago, 2. Edition, London

------(2008), 'The Patrilineal Band', *Antropological Theory*, (Ed. R. Jon McGee-Richard L. Warms), Texas State University-San Marcos, Mcgown-Hill Press, Ammerica, New York

Swanson, G. E. (1960), *The Birth of the Gods, The Origin of Primitive Beliefs*, University of Michigan Press, Ann Arbor

Sydow, Carl Wilhelm (2014), 'Coğrafya ve Masal Ekotipleri', *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar 2*. (Ed. Öcal Oğuz û yd.), Geleneksel Yayıncılık, Çev., Tuğçe Işıkhhan, 3. Baskı, Ankara

Şengalî, Xeyrî (2011), *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre*, Bergî Yekem, Weş. Enstîtuya Kelepûrên Kurdî-Senterî Duhok, Çap. I, Duhok

------(2011), *Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre*, Bergî Duyem, Weş. Enstîtuya Kelepûrên Kurdî-Senterî Duhok, Çap. I, Duhok

Tylor, Sir Edward Brunett (2008), 'The Science of Culture', *Anthropological Theory*, (Ed., R. Jon McGee-Richard L. Warms), Texas State University-San Marcos, Mcgown-Hill Press, New York/America

Uluçay, Ömer (2012), *Destana Dewrêşê Evdî*, Weşanên Dîwan, Çap I, Stenbol

Üzüm, İlyas (2002), *Kültürel Kaynaklarına Göre Alevilik*, Horasan Yayınları, İstanbul

Vali, Abbas (2013), *Kürt Tarihi Kimliği Ve Siyaseti*, Avesta Yayınları, Çeviren: İbrahim Bingöl, 1. Baskı, İstanbul

------(2005), *Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri*, Avesta Yayınları, Çeviren: Fahriye Adsay, Ümit Aydoğmuş, Sema Kılıç, 1. Baskı, İstanbul

Vali, Shahab (2018), *Kurdên Yarsan*, Weş., Avesta, Werg., Sevda Orak Reşitoğlu, Çap. 1., Stenbol

White, Lesslie (2008), 'Energy And The Evolution of the Culture', *Anthropological Theory*, (Ed. R. Jon McGee-Richard L. Warms), Texas State University-San Marcos, McGraw-Hill Press, New York/America

Xetarî, Dawid Mirad (2011), *Mem û Zîn*, Weşanên Enstîtuya Kelepûra Kurdî, Çap. 1. Duhok

Zekî Beg, Mihemmed Emîn (2002), *Dîroka Kurd û Kurdistanê*, Weş., Avesta, Werg., Ziya Avci, Çap I, Stenbol

JÊDERÊN ÎNTERNETÊ

Nişanyan, Sevan, <http://nisanyan1.blogspot.com/2018/03/alevi-koyleri.html>, Pêwendî: 20/08/2019

<https://alephpolicy.org/mapping-northern-iraq/>, Pêwendî: 20/08/2020

Öz, Mustafa, <https://islamansiklopedisi.org.tr/mehdi-el-muntazar>, Pêwendî: 24/06/2020

Kandemir, M. Yaşar-Uzun, Mustafa İsmet, <https://islamansiklopedisi.org.tr/fatima>, Pêwendî: 25/06/2020

Kahraman, Ömer Faruk, <https://islamansiklopedisi.org.tr/sare>, Pêwendî: 25/06/2020

Taşğın, Ahmet, <https://islamansiklopedisi.org.tr/yezidiyye>, Pêwendî: 01/07/2020

Yılmaz, Hacı (2017), *Anadolu Aleviliğinde Sır Kavramı*, Journal of Human Sciences, <https://www.j-humansciences.com/ojs/index.php/IJHS/article/view/4692/2246>
ISSN:2458-9489 Sayı:14, r. 2201-2205.

Perwer, Şivan, <https://www.youtube.com/watch?v=9P9D5rKTo0s>, Pêwendî: 01/07/2020

Perwer, Şivan-Gulistan, *Zembîlfiroş*, https://www.youtube.com/watch?v=TkTDO_TrjwA, Pêwendî: 01/07/2020

Îzol, Şukriyê, https://www.youtube.com/watch?v=-3Yg_VjAqBQ, Pêwendî: 01/07/2020.

JÊDERÊN DEVKÎ

Di xebata xwe ya tezê de me li sehayê bi gelek kesan re hevdîtin û hevpeyvînan kirin. Me van kesan, her yekê bi kodekê pêname kir. Ji bo kurtkirina kodê me tîpa 'J' bi kar anî ku ew sîmgeya peyva 'Jêder'e. Jêderên xwe me wekî J.1. , J.2., rêz kirin. Me herêma wan, temenê wan, cinsiyeta wan, rewşa wan ya perwerdehiyê û kar û pîşeyê wan hemî dan.

J.1. Sultan Yıldırım, di 1925an de li Perteg/Dersimê hatiye dinyayê, jineke nexwenda ye, bi kar û barên mala xwe re eleqdar e, hevdîtin di 10/09/2018an de li herêma Pertegê hatiye kirin, mijara hevdîtinan vegotinên gelêrî yên herêmê ne.

J.2. Şirin Hasbay, di 1958an de li Mazgîrda Dêrsimê li gundê Bilan hatiye dinyayê, dibistana seretayî xwendiyê, jineke bi kar û barên mala xwe re eleqedar e, di dîroka 15/09/2018an de li Gundê Bilan ya Mazgîrda Dêrsimê hevdîtin hatiye kirin, mijara hevdîtinê vegotinên gelêrî yên herêmê ne.

J.3. Makbule Taşkın, di 1948an de li Gundê Bilan yê Mazgîrda Dêrsimê hatiye dinyayê, jineke nexwenda ye, bi kar û barên mala xwe re eleqdar e, hevdîtin di 20/09/2018an li Gundê Bilan li herêma Mazgîrd Dêrsimê hatiye kirin, mijara hevdîtinê vegotinên gelêrî yên herêmê ne.

J.4. Hüseyin Bayır, di 1929an de li Gundê Bilan yê Mazgîrda Dêrsimê hatiye dinyayê, dibistana seretayî xwendiyê, bi kar û barên cotyarî û xwedîkirina heywanan re eleqedar e, hevdîtin di 20/09/2018an de li Gundê Bilan ya Mazgîrda Dêrsimê hatiye kirin, mijara hevdîtinê efsaneyên herêmê ne.

J.5. Hüseyin Erdoğan, di 1934an de li Yeniköya Pertega Dêrsimê hatiye dinyayê, dibistana seretayî xwendiyê, kar û barê wî seyidî (dede) ye, hevdîtin di 04/09/2018an de li gundê Tozkoparana Perteg/Dêrsimê hatiye kirin, mijara hevdîtinê vegotinên dînî û folklorî yên herêmê ne.

J.6. Caner Canerik, di 1973yan de li Pulumura Dêrsimê hatiye dinyayê, zanîngeh qedandiyê, bi kar û barê rojnemavanî û berhevkarîyê re elqedar e, hevpeyvîn di 05/07/2020 li ser înternetê hate kirin, mijara hevpeyvînê folklor û çanda herêma Dêrsimê ye.

J. 7. Cefîlê Celîl, di 1936an de li Erîvanê hatiye dinyayê, dîroknaş û folklornaş e, hevpeyvîn di 27/06/2020an de li ser înternetê hatiye kirin, mijara hevpeyvînê çand, dîrok û folklorê êzîdiyan e.

J.8. Dawid Mirad Xetarî, di sala 1964an de hatiye dinyayê, ji gundê Xetarê yê devera Duhokê ye, lêkolêrê dîrok, çand û folklorê êzîdiyan e, li Zankoya Duhokê mamostetiyê dike, hevpeyvîn 28/06/2020an de li ser înternetê hate kirin, mijara hevpeyvînê çand, dîrok û folklorê êzîdiyan e.

J.9. Kovan Xankî, di 1981an de li gundê Xanka Kevin ya bi ser Duhokê ve hatiye dinyayê, pisporê folklorê êzîdiyan e, li Zankoya Duhokê wekî mamoste kar dike, hevpeyvîn di 01/07/2020an de li ser înternetê hatiye kirin, mijara hevpeyvînê çand û folklorê êzîdiyan e.

J.10. Arshad Hamid Miho, di sala 1983yan de hatiye dinyayê, ji devera Duhokê ye, pisporê çand û dîroka êzîdiyanê ye û li Zankoya Duhokê kar dike, hevpeyvîn di 01/07/2020an de li ser înternetê hatiye kirin, mijara hevpeyvînê dîrok û çanda êzîdiyan e.

J.11. Xeyrî Bozanî, di sala 1970yan de hatiye dinyayê, ji devera Duhokê ye, berhevkar û folklornaşê êzîdî ye, kar û barên fermî yê dewletê dike, hevpeyvîn di 05/07/2020an de li ser înternetê hatiye kirin, mijara hevpeyvînê çand, dîrok û folklorê êzîdiyan e.

PÊVEK 1

ÇÎROKÊN HERÊMA PERTEGÊ/DÊRSIM

Cîhê Berhevkarîyê:	Dêrsim / Perteg
Gotî:	Sultan Yıldırım
Jidayîkbûn:	1925
Perwerdehî:	Nexwenda
Cinsiyet:	Jin
Mijar:	Çîrok
Berhevkar:	Hikmettin Atlı
Dîrok:	20/06/2018

I. Alik û Fatik

Hewuye tunewuye xang û birakî hewune. Navê keçîkê Fatik bûye, navê lîwîk Alik. Dê wû bavê van mirine, ev mane sêwî, ketine ber destê apê wû amojînê.

Amojîna wan wer fena wuye, wer fena wuye... Kanê diwên ku 'xadê wî neke diya sêwîyan' we çend bê derman û bê firsend wuye. Ew nekirin û newuyîn aniye serê wan zarûyan. Ew zarûkana birçî mane, tî mane, li sar û sermayê ji der mane.

Rokî amojînê, Alik û Fatikê ra hêrs ketiye, lê xistiye, tî wû birçî avêtiye der. Gotiye, carîkî din mênê vê mala, herin êxur li cem manga zer rakevin. Çûne nav axurê dane girî, gîrane, gîrane, gîrane. Eman û gumanê manga zer hatiye birandin. Gotiye, ya heq û tala, yan canê min bigir yan jî zimanîkî bide min, ez derdê van zarûkan ra çarekî biwînim. Xadê da nîda diwî, mange tê bi ziman. Diwê, Alik, Fatik va çî zî wû zîwa we ye. We heş û aqil li serê min girt. Alik û Fatik diwên, amojîna me xêrê bi me nake, em tî wû birçînê, bê xudî wû bê andêr mane.

Mange diwê, megirîn. Werin va usturiyê min helînin, navda nan û aş derdikevî, buxun, zîkê xa têrkin, dîsa van bikin şûndê. Alik û Fatik terin, heltînin

usruriyan ku binî da çi yemeg tunin... Têr dixun, tînin ustiriyêni mangê dîsa dikin şûndê. Endî ne tî dimînin ne birçî. Roy sê caran ustiriyêni mangê heltînin, nanê xa dixun, wan dîsa şûndê va dizeliqînin.

Rokî wer, du ro wer, sê ro wer. Çend ro radiwirin Xadê pê bizanî. Rokî amojina van xa bi xa ra diwê ku, ez nîn nadim wan, avê nadim wan, we çend heqeretê bi wan dikim, ev dîsa ro bi ro kîlo digirin, ro bi ro vedikelişin. Ez teqîwkim, ela vana li êxur çi dikin, çikê dixun. Amojin wan teqîw dike, diwînî ku, ustiriyêni mangê heltînin, nan û aşê ku bin da derdikevî, vî dixun, dîsa dikin şûndê.

Tere mal. Nanê tîrê dipêjî, hişk dike, dide ser parsuyêni xa, dikevî cilê. Êvarî mêrê xa tê mal, amojin dike nal û nal, berê xa vedigorî, nanê tîrê dike xirç û xirç. Mêrik diwê, jinik çike, te çi wû? Diwê mêrik nizamim, wer nexaşim, wer nexaşim. Gudarî ke, hestiyêni min kulî firîne, xa vedigirim, dikin xirç û xirç. Ez çûme doxtor, diwê, çarekî va nexaşiya te heye; ew jî mangekî şerjêkin, bikin qarme, tu vî goştî bixwe, diwî xaş û delal.

Mêrik diwê, jinik mange ji te ra qurban wî. Siwe da mangê şerjê dikim, dikim qarme, tu bixwe bibe xaş û rind.

Alik û Fatik dibîzin ku mangê şerjê dikin, dîsa terin êxur, digirîn, digirîn. Mange diwê zarûno ûn çima digirîn? Diwên me bîstiyê ku te şerjê dikin. Te ku şerjê kirin em dîsa birçî dimînînê. Em wî ra digirînê. Mange diwê megirîn zarûno, ku ez şerjê kirim, ku xarin goştê min, un van hestiyên min mavêjin. Top kin, bikin nav dorbekî. Ku birçî bûn, vekin devê wî torbeyî, navda turlu turlu aş derdikevin, buxun zikê xa têrkin. Dîsa girêdin devê wî torbeyî, veşêrin. Alik û Fatik diwên tamam.

Tînin, mangê şerjê dikin, digurên, goştê wî dipêjin, dikini qarme, dixun. Amojin diwî weki sing, radiwî ser xa. Alik û Fatik jî wan hestiyên top dikin, dikini torbekî, vêdişêrin. Siwê wû siwê ra diwin devê torbe vedikin, aşê ku tê da derdikevî dixun, dîsa diwin dikini şûndê.

Pir radiwirî hindik radiwirî xadê pê bizanî, wextikî wê tora tere. Rokî Fatik diwê Alik va halê me hal ninin. Şev ku nêvî bu rawinê, çi ku me lazime topkine,

ji vira bazdinê, herinê. Em ku li ber destê amojinê da bimînin, ew rokî me dikujî.
Alik diwê tamam Fatik.

Li şevê nêvî vana radiwin, ser û guy xa qeyîm verdigirin, berê xa digerînini çuyan, terk û diyar diwin terin. Pir terin hindik terin xadê pê bizanî, li tiyan û birçiyar taqet li vana dikişî, juniyeni vana nêni ber. Alik diwê Fatik tî me. Fatik diwê Alik sewirê wû xa de, nika ku kanîk der ket pêşiya me, avê têr veduxunê.

Xêlîk der ku terin kanîk derdikevî pêşiya wan. Alik dipekê ku avê vexe, Fatik diwê Alik vemexe, ew kaniya keran e. Alik venaxe. Êpêyî der ku dîsa terin, kanîki din der dikevî. Alik dipekê ku avê vexe, Fatik diwê Alik vemexe ev kaniya kûtiyan e. Alik venaxe. Êpêyî derê din ku terin, kanîk dîsa der dikevî pêşiya wan. Alik dipekê, Fatik dike ku biwê Alik vemexe ew kaniya beranan e, Alik kûr dike çaviya kaniyê, avê têr vedixe, diwî beran.

Fatik pê ustiyê beranê digirî, rêdikevî tere. Pir tere hindik tere xadê pê bizanî, ji dugelikî der dikevî. Tere nêzikê gundikî, kanîk hewûye, ser wê kaniy darikî qewaxê hewûye. Derdikevî ser dara qewaxê. Alik jî (beran) binî qewaxê da mexel diwî, disikinî. Padîşay wî dugelî li wî gundî rutinî. Lawikî padîşê hewûye, şanzede, lawê padîşê siwê wû siwê hespê xa tîni li wê kaniyê av dide. Wê siwê jî hespê xa digirî tê ser kaniyê sêr dike ku şewlek avêtiye kaniyê, ayil û mayîla wê şewlê dimînî.

Diwê keçê tu kiy? Li darê were jêr, ins û cinsê te, navê te çike? Fatik ne li darê tê jêr ne jî cawê dide. Şanzede çi dike ku Fatik qe awirê nade.

Şanzede tere xizmikaran ra diwê ku, herin wê qewaxa ser kaniyê bibirin, veliqîtnin, keçikik li ser qewaxê ye, wê keçikê bigirin waynin min ra.

Xizmikarêni padîşê biviran digirin terin, koka qewaxê dibirin, hindik dimînî ku qewax veliqîtî, êvar diwî. Diwên, em herinê mal, şev da zû werinê, va dera mayî jî bibirinê. Keçikê bigirinê, bînin şanzedê ra.

Xizmikar ku terin mal, beran tê binî qewaxê. Ew dera ku xizmikaran biriye dalêsî, dalêsî, hetanî siwê dîsa dike weki berênî, tu diwê qe natiye birandin. Şev da diwî beran radiwî tere çayîrê diçerî. Xizmikar tên ku çi biwînin, koka qewaxê

dîsa bûye weki berênî, tu diwê qe nebirîne. Serikî nû va bi teviran dibirin, hindik dimînî ku qewax were jêr, êvar diwî. Diwên herinê mal, siwê da werinê wê dera mayî jî bibirin, keçikê bigirin, bênê.

Xizmikar terin mal, beran tê, koka qewaxê dalêsî, dalêsî dîsa dike weki berênî. Siwe diwî, tere çayîrê ku biçêrî, xizmikar tên. Sêr dikin ku, ew dera ku birîne, xa daye hev, qapan bûye. Şaş diwin dimînin. Roy sisyan ku dîsa wer diwî, xizmikar terin huzûrê şanzedê. Diwên, şanzedey min, em îro sê ro ne ku terinê qewaxê dibirinê, êvarî hindik dimînî ku veliqîfî, cî dêlinê tênê. Şev da terinê ku ev dera ku me biriye dîsa qapan bûye. Va hêkmetiki Xadê ye. Ew qewaxa nê birandin.

Şanzede êl û komê xa top dike, diwê, her kî ku tere wê keçikê mi ra tînî, ez sê tenîke altûn, yêk jî nêvîkî ulka xa didim wî. Ji vî gundî pîriki cazû hewûye, keçikiki xayê azew jî hewûye, gotiye şanzedey min ez terim wê keçikê dafînimi jêr, digirim û têm. Şanzede diwê, tu here wê keçikê waynî mi ra. Çikê ku dixazî didimi te.

Pîra cazû sîntilîki xa digirî tere ser çaviya kanî, sîntilê çep dafînî ser dustanê, biroşê tijî av dike, ber dide ser sîntilê, carikî, du caran, sê caran... Fatik damîş nade, diwê dapîrê, dapîrê te ew sîntila çep daye ser. Pîra cazû diwê, dapîr te ra qurban bî, çavêni min nawînin, ez îsîrê, were sîntilê rastke, avê germke, tu avê li minke, ez jî li tekim, dîsa here şûnda xa.

Fatik li qewaxê tê jêr, sîntilê dorxî dike, êr dide binî, av ku germ bû avê li dapîrê dike, pak dişûy. Vê cara bixa tazî diwî ku dapîr avê li wê ke. Ku tazî diwî pîra cazû pînikî lê dixînî, daviyî nav golê. Fatik dixendikî, diwî dariki çinarê, ber golê da derdikevî.

Pîra cazû kincêni Fatikê digirî diwe li keçika xa dike. Diwe dide şanzedê, diwê şanzedey min bigir, va ew keçika ser qewaxê ye. Şanzede keçika pîrê va çel davul û çel dudikan, çel ro bûy dike, dizewicî. Ew li vê bîmînin, werinê Fatikê.

Fatik ku diwî taka çinarê ber golê da derdikevî, rokî şanzede hespê xa tînî avê, sêr dike ku keviya golê da fîdaniki çinarê der ketiye, ayîl û mayîla wê fîdanê dimînî. Siwê wû siwê tê siya wê çinarê da rutinî, ku êvar diwî, radiwî tere

mal. Rokî wer, du ro wer, sê ro wer. Jina şanzedê, rokî bêslmey xa wû dû şanzedê dixinî, diwê teqîwke, ela va şanzeda tere ku, çi dike?

Bêslmey, diziyar bi dû şanzedê dikevî, sêr dike ku tere kaniyê, binî wê fîdana çinarê da rutinî. Vedigerî tê serayê, diwê xatûn şanzede tere kaniyê, binî wê çinarê da, siy da rutinî. Wekî din taway nake.

Jina şanzedê xewerê dide diya xa, diwê dayê mal xirawê, şanzede li wê fîdana çinarê bûye xewerdar, çi dikê bike, çarekî biwîn ji me ra. Pîra cazû diwê keçê xizmikaran ra biwê sîntilan hazirkin, siwê da zû terinê beravê. Xatûn emrê dide xizmikaran ku, her tiştikî hazirkin, emê siwê da herinê beravê.

Siwê radiwin ser û guy xa vedigorin. Çê wû xirawan digirin. Terin beravê. Sîntilan didin ser, êr dikin binî. Pîra cazû tere vê fîdana çinarê kokê da hûr dike, tînî datînî keviya sîntilê ku bişewitînî.

Li vê saatê jinikiki kokim çûye êzigan, êzig top kirine, wê hêlê da tê, ku keviya sîntilê fîdanê çinarê diwînî, diwê xatûn xatûn va êzigan bidim te, wê taka çinarê didî min? Xa ra diwim dikim baston, bidimi ber xa. Diwê herê, wan êzigan daynî vira, ew fîdana çinarê bila ê tewî. Ew jinika pîr êzigan datînî wê, taka çinarê digirî tere mal.

Dapîr ku tere mal, qîmîşê nawî ku vê şivika çinarê bide ber xa, diwe paş istêr da vêdişêrî. Ew jinika pîr yanê dapîr tek û tenê wûye, qe kesiki xa tune wûye. Siwê wû siwê radiwî ser xa, tere mala cîranan rutinî, ku êvar diwî tê mal. Wê roy jî şev da radiwî, cîran û cîran digerî, êvarî tê ku çi bîwînî, xanî şuştî wû miştî ye, sofrek hazir kiriye ku aqilê merûyan disikinî. Xa hara diwê, ecewa va dorana kê pak kiriye, va sofra kê hazir kiriye?

Diwê wûy! Cîranino cîranino ez gû di devê bavê wekim. Terim mala wan rutinim, parîk nan didin min, nika jî aş patine, axû kirine nav, ku ez bimirim, ji min xelas bin. Un ku gewer bin naxum diwê. Diwê ema birçî ye, dora sofrê ra tê wû tere, diwê kefçîkî bixum, tenikî biskinim, ku hundurêşanê ez girtim naxum, ku hundurêşanê ez negirtim dixum. Kefçîkî dixwe, êpêyî disikinî, sêr dike ku tawa nawî, rutinî ser sofrê, zikê xa têr dike, radikevî.

Siwê da radiwî ser xa, derî wû derî digerî, êvarî tê mal ku dîsa her derik şuştî wû miştî ye, sofrak hazir kiriye. Diwê, xadê bela xa bide we cîranino, dêma do hindik axû kiriwûn nav, sêr kirin ku ez nemirîme, vê cara zêde axû avêtine ku ez bixum, bimirim. Un ku gewer win ez ê nexum. Ema birçî ye, dorê ra tê wû tere, kefçîkî dixwe, diskinî, sêr dike ku tawa newû, rutinî zikê xa têr dike, radikevî.

Roy sisyan diwê vî îşî da îşik hey. Ez xa veşêrim, va kî ye tê îşênî min dike, sofrê mi ra hazir dike? Xa li paş dêrî vêdişêrî, sêr dike ku, ew şivika çinarê bu keçikiki azew, der û ber pak kir; destê xa herdê ra kir; tasik yêmeg derket, bixa xar, tasik yêmeg jî derket, dayna ser sofrê. Vext tamam bû ku here şûnda xa, jinik dipekê jî guliyan da digirî. Diwê, ez kokimikî tek û tenê me, va rindikiya te, va îş kiriniya te ku heye, ez bextê te da me, tu mewe şivik, ez te ra biwim dê, tu jî mi ra biwe keçik, em her du hev ra biskininê. Keçik diwê tamam, ema şertikî min heye, ez ê qe dernekevîm der, tu jî kesiyar ra qala min meke. Dapîr diwê tamam, tora gotina te wî.

Dapîr û Fatikê va wekî dê wû qîz royni xa radiwirînin. Payîz tê, şanzede hespêni xa, her malikî yêkî diduyan bila dike ku zivistanî qayîte kin, barî şûva bidin şanzedê. Delalê dide bankirin, diwê alifê kê ku çend hespan ra goreye, werin we çend hesp bigirin ben.

Fatik diwê ku dayê. Dapîr diwê çike dayê qurban? Diwê dayê here hespikî jî tu bigir. Diwê keça min ne gâye me heye, ne kayê me heye, em ê pê çikê hespê xudî kinê? Diwê dayê tu here hespê waynî, qarişê mewe, ez qayîte dikim.

Dapîr tere diwê oxil hespikî jî bide min, ez bêm qayîtekim, ku xaş ma hespê digirî, ku mir jî çermê hespê didim te. Şanzede en hespê kotiyê jar dide dapîrê, dapîr digirî tê mal.

Fatik hespê diwe li êxur girê dide, ne ga heye ne jî ka ku bike afirê hespê. Siwê wû siwê tere dest û rûy xa li ber afirê hespê dişûy, ber êfir diwî çayîr û çîman, hesp diçêrî, gâye teze dixwe, heta barî wer diwî ku merû qîmîşê nawî ku sêrêke.

Zivistan radiwirî, dikevî barê, wê roy ku şanzede hespan li malan topke, Fatik siwê da tere êxur, ber pozê hespê, diwê hespê min ê delal, îro şanzede wû

xizmikaran tèn ku te şûnva ben. Ew ku hatin ez te derdixînimi der, şanzede ku çav li te ket, dixazi ku siyari te wî. Ew ku li te siyar bu, tu du qoran cirîtê bavij, were here, cara sisyan xa bavijî herdê, qe ramewe. Gundê heyî tuneşî topi ser te diwî, tuyê ranewî. Evê biwên ku kî maye kî nemaye, keçika dapîrê maye, banî min ku kirin, ez têm pê pozê qondirey xa dukutimi tê, diwêm ku rawe rawe tu jî wekî xudiyê xa bê bext mewe, tuyê helfirî ser xa.

Hesp li wê tê zimîn, diwê tamam ez weki gotina te dikim. Neyisine, dora beroy ra deriy dapîrê dikutin, dapîr tê dêrî ku xizmikarêni şanzedê ne. Diwên dapîr ew hespa ku me da te xaş e yan mirî ye? Ku xaş e hespê, ku mirî ye çêrm bide me. Dapîr diwê hesp xaş e oxil biskinin herim waynim. Tere êxur hespê dikişînî der ku mal bişewitî, merû qîmîşê nawî ku sêrêke. Şanzede ayîl û mayîlê dimînî, dixazî ku siyar bî. Xizmikar hespê zîn dikin, siyar diwî, du qoran tê wû tere, cara sisyan hesp xa davêjî herdê, çiton dikin ranawî.

Gundê heyî tuneşî tèn ku rakin, nikanin rakin. Diwên kî ma kî nema, keçikiki dapîrê heye ew ma ye. Herin deng lêkin bila were, belkî ew radike vî hespa.

Terin ban dikin, keçika dapîrê derdikevî der ku mala bavê keçikê xiraw newî, merû diwê ne bike ne bixwe sêrî vê keçikê ke. Şanzede çavê xa lê nagirî. Keçik tê, bi pê pozê qondirê dikutî hespê, diwê rawe rawe tu jî weki xudiyê xa bêbext mewe. Hesp heldifirî ser xa. Va qeziya şanzedê ra diwî derd. Xa xa ra diwê, min çi bêbextî kiriye ku va keçika mi ra wer diwê?

Şanzede tere mal, xizmikaran top dike, diwê siwe da xewerê bidin keçikêni vî gundî, kulî bila werin, êvarî bulxur helçinin. Unê wêr bikin ku keçika dapîrê jî were helçinandina bulxurê. Siwe da xizmikar axme wû gund diwin, kîjan malê da ku keçikiki azew heye xewerê didin ku êvarî saet li heftan li seraya padîşê bulxur tê helçinandin, unê wê saetê li wê bin. xewerê didin Fatikê jî, Fatik diwê tamam ez li wê saetê li wir diwim. Xa xa ra diwê ku min li xadê xast çavik, xadê du çav dani min. Va firsenda bi dest min ket, ez ê herim, çi ku hatiye serê min hûr û hûr qezî kim, xemê dilê xa bavêjim der.

Êvarî keçikêni gund kulî li seraya padîşê top diwin. Fatik jî tere. Şanzede dikevî dolawê, xa vêdişêrî. Ku sira tê bulxur helçinandinê, ew diwê tu çîrokikî

biwê, ew diwê tu çîrokikî biwê. Fatik diwê hevalino un ku qeziy didin min, ku kesiyar ra nawên, ez çîrokikî we ra diwêm. Diwên soza me soz bî ku te çi qezî ku kirin ewê va qeziyni te li vira bimînin.

Fatik başlê dike, çi ku hatiye sêrî hûr û hûr diwê. Ku sire tê kirinêni pîra cazûyê, diwê pîra cazû ez qan kirim, kincêni min bir li qîza xa kir, şûnda min qîza xa bir da lawê padişê. Çiton ku wer diwê lawê padişê li dolawê da der dikevî, diwê dêma tu ew keçika ser qewaxê yî? Te heta nika çima nat mi ra nego? Xizmikaran ra diwê ecele herin pîra cazû wû keçikê (jina min) waynin vira.

Xizmikar pîra cazû wû keçikê tînin huzûra şanzedê. Şanzede diwê ber vî kirinêni we ez ê cezakî bi wedim. Mi ra biwên, un çel qatirî yan çel satirî dixazin? Pîra cazû bi hêrs, diwê hi çel satirî tu bigir, çel satir ser defsînga te kevî. Çel qatirê bide me, em lê siyar biwinê, diyar û diyar bigerinê.

Şanzede çel qatirî tîni, wan doça çel qatirê va girê dide, dajûy ser çiya wû çengelan, li kevir û guçan dikevin, cîrim û cîrim diwin terin.

Şanzede wû Fatikê jî serik û se ning va bûya xa dikin, terin digêşin miradê xa. Xadê miradê bêmiradan bike, koşekî jî me ra...

II. Sewling û Hewling

Hewûye tunewûye bizinik û mîkî hewûne. Ew li bêlê dûr ketine, şûn va mane. Bizinê gotiye ku were em mîza xa bikinê. Mîza kê ku kef da ew tere digêşî bêla pêz, mîza kê ku kef neda ev jî li vira dimînî. Her duyan jî mîz kirine, mîza miyê kef daye, ew çûye gêştiye bêlê, mîza bizinê kef nedaye ew jî li wê derê ma ye.

Pir ma ye hindik ma ye xadê pê bizanî, saet û wext hatiye du tene karikê bizinê hatine dinê. Gotiye navê yekî Sewlîng bî, navê yekî jî Hewlîng bî. Xanîk çê kiriye. Her du karikêni xa kiriye nav xênî. Sibê wû sibê derî li ser daye cî. Gotiye Sewlînga minê, Hewlînga minê, dayê qurbanê, dayê îsîrê, ez terim çiyayê zozanan, şîr dikimi ganan, heta ku ez têm dêrî kesiyar ra vemekin. Ew jî dibên herê dayê venakinê.

Bizin sibê wû sibê tere li çiyayê digerî, diçêrî, xa têr dike tê ber dêrî, divê: Ez çûme çiyayê zozanan, min şîr kiriye ganan, Sewlînga minê, Hewlînga minê, dayê qurbanê, dayê îsîrê, şîrê beranê çi qas didananê. Sewlîng û Hewlîng dêrî vedikin, her êk ganikî dimijin, zikê xa têr dikin û radikevin.

Dera ku wê bizinê xanî çê kiriye, nêzikê vê derê xaniyêni rîvîkî, hirçikî wû gurikî jî hewûne. Yanê rîvî, hirç û gur cîranêni bizinê wûne. Gur her timê dipê ku firsendê bîwînî van karikan bixwe.

Rokî şev da bizin radiwî, diwê ku Sewlîng, Hewlîng ez îro pir dûr terim. Heta ku ez têm dêrî kesiyar ra vemekin. Va geziya min garik vî li guçikê veda vî. Cîranikî mey gur hey, ev dipê ku we bixwe. Dengê wî kewe ye, lemêni wî reş in. Ev ku hat, yaman yaman dêrî vî ra vemekin. Sewlîng û Hewlîng divên, dayê tu metirs, em hedari xa divinê, tu bê kisawet here îşê xa.

Bizin derdikevî tere. Gur tê ber dêrî, divê: Ez çûme çiyayê zozanan, min şîr kiriye ganan, Sewlînga minê, Hewlînga minê, dayê qurbanê, dayê îsîrê, şîrê beranê çi qas didananê. Sewlîng û Hewlîng dipekin paş dêrî. Divên dengê te kewe ye tu diya me ninî. Dêrî venakin.

Gur tere digerî dengê xa zirav dike dîsa tê, diwê: Ez çûme çiyayê zozanan, min şîr kiriye ganan, Sewlînga minê, Hewlînga minê, dayê qurbanê, dayê îsîrê, şîrê beranê çi qas didananê. Vê cara Sewlîng û Hewlîng diwên lemê xa me binî ke, ew sipî ne ya reş in? Gur lemêni xa van binî dike ku ev reş in, lemê te reş in, tu diya me ninî, diwên, dêrî venakin.

Gur dipekê tere êş. Diwê aşvan va lemêni min nav ardan ra ke bila sipî bin. Aşvan ningêni gur dike nav ardan, sipî dike. Gur dîsa tê ber dêrî. Dengê xa zirav dike, divê: Ez çûme çiyayê zozanan, min şîr kiriye ganan, Sewlînga minê, Hewlînga minê, dayê qurbanê, dayê îsîrê, şîrê beranê çi qas didananê. Sewlîng û Hewlîng sêr dikin ku ning sipî ne, dêrî vedikin. Gur dikevî hundur, her duyan jî dixwe, derdikevî tere.

Êvar diwî bizin tê mal ku ne Sewlînge ne jî Hewlînge. Dest û pê difirin, digîrî, der dikevî tere mala hirçê. Osturiyan li derî dixînî. Hirç tê dêrî diwê çike biray bizin? Bizin diwê te xariye Sewlînga min, te xariye Hewlînga min, tuyê

siwe da werê cenga min. Hirç divê, vê sonda wî, wê sonda vî, min nexariye Sewlînga te, min nexariye Hewlînga te, ne jî siwe da têm cenga te.

Bizin tere mala rivî. Bi hêrs dêrî dixînî, gum gum gum. Rivî ku dêrî vedike. Bizin diwê: te xariye Sewlînga min, te xariye Hewlînga min, tuyê siwe da werê cenga min. Rivî divê, vê sonda wî, wê sonda vî, min nexariye Sewlînga te, min nexariye Hewlînga te, ne jî siwe da têm cenga te.

Dil û pişikêni bizinê dihelin, radiwirî tere mala gur. Usturyan li dêrî dixînî. Gur tê dêrî. Bizin diwê: te xariye Sewlînga min, te xariye Hewlînga min, tuyê siwe da werê cenga min. Gur divê, min xariye Sewlînga te, min xariye Hewlînga te, ez siwe da têm cenga te. Bizin diwê, siwe ku şefaqê lêxist, were filan derê, cenga min te ra ceng e. Gur diwê bila wer bî.

Bizin radibî tere tukana hesinger. Diwê hesinger siwe da cenga min û gur heye. Van usturiyen min bike tûj. Hesinger usturiyêni bizinê tûj dike, dike weki cilêt. Bizin tere mal, gur tê. Divê hesinger siwe da cenga min û bizinê heye, van didanê min wer tûj bike ku, min ku gezik avêti bizinê cîkî wî bibizdînim. Hesinger didanêni gur kone dike, diwê tamam, min wer tûj kirin ku ew bûn wekû kêr.

Gur jî tere mal. Siwe da zû radibin terin dera ku cengê bikin wê derê. Gur li hêla jûrîn, bizin li hêla jêrîn disikinin. Bizin diwê, gurê bêbext hemla xa bike. Gur jûrda baz dide ser bizinê. Bizin bi usturiyan dikutî zikê gur, zik dipijiqî, xaş û rivî têni der. Gur gêri herdê diwî, dimînî li herdê. Pir dimînî hindik dimînî xadê pê bizani. Soxiniya gur kotî tê, dimirî, tere.

Bizin Sewlîng û Hevlînga xa digirî tere mal. Xadê cîkî xêrê veke Sewlîng û hewlîngê ra, koşekî jî me ra...

III. Kertî Kemal

Hewuye tunewuye jinikik hewuye, lawikî xa hewuye. Navê lîwik Kertî Kemal bû ye. Diya Kertî Kemêl merûxur bû ye. Wî rûy ra Kertî Kemal xêlik wext nezewiciye. Xa xa ra gotiye ez ku bizewicim, diya min xêrê wû jina min nake, çi dike dike, manekî diwînî wî çîg çîg dixwe.

Li derikî îsîz nav xanîkî da, dê wû law hev ra roynî xa radiwirînîn. Rokî Kertî Kemal li gundikî dilê xa dikevî keçikikî, direvînî diwe, bûy dike, dizewici. Dû bûy ra diwê jinik, ez ê te ra du sê hosiyan bikim, tu yê wan hosiyan royê hek waynî şûndê. Diwê tamam mêrik, tu mi ra biwê, ez wan tînimi şûndê.

Kertî Kemal diwê jinik tu ku siwê bi siwê rawûy ser xa; li salonê me hêla rastê eslanik, hêla çepê filik girêdayî ye. Li ber fîl goşt heye, li ber eslîn ga heye. Tu goştê ber fîl bide eslîn, gayê ber eslîn jî bide fîl. Ew deriyê mey ku vediwî der du qenad e, qenadik vekiriye, qenadik jî qapane. Tu wî qenadê vekirî bi cî de, ew ê cîdayî jî veke. Ku der ketî der, hemberî xaniy me kanîk heye, ava wê kaniyê ke nê vexarin, germxe, pîs e... Here dest û rûy xa li wê kaniy bişû, tasik av lê vexe, biwê ox ava minê xaşa minê. Li kaniy rawir, êpêyî ku çûy dariki sincikin derdikevî pêşiya te. Diya min toza xa, keş û kuşê xa dive dirijînî ser wê darê. Tu here destê xa sincêni wê darê rake, biwê ox sinca minê narinca minê, vege were mal.

Jina Kertî Kemêl siwê bi siwê radiwî ser xa, tê salonê, gay ber eslîn dide ber fîl, goştê ber fîl jî dike ber eslîn. Deriy cîdayî vedike, ê vekirî dide cî. Derdikevî tere kaniy, dest û rûy xa dişûy, tasik av vedixwe, diwê ox ava minê, xaşa minê. Tere ser dara sincikin ku nav qilêr û kertîşê da maye, destê xa têra dike, diwê ox sinca minê narinca minê. Vedigerî tê mal.

Her siwê va kirinêni xa tekrar dike. Rokî Kertî Kemal siwe da ra diwî tere îş, jina xa jî radiwî îşêni xa dike. Diya Kertî Kemêl cêraxikî reş tîni dide Jina Kertî Kemêl. Diwê bûkê vê cêraxa sipî dikê sipîke, sipî nakê te dixum. Bûk cêraxê diwe der, dawdişînî, çi dike, ku çer dike sipî nawî.

Êvar diwî Kertî Kemal tê, sêr dike ku jina xa li ber dêrîxeye, cêraxiki reş li destê, digîrî. Diwê jinik çi wû, tu çima li derî, çima digirî? Diwê diya te va cêraxa reş da min, go wiya be sipî dikê sipîke, sipî nakê te dixum. Ez jî şev da vay çer û çiton dikim ku sipî nawî. Nika ku herim hundur min dixwe, lima digirîm. Diwê ela bikiş bikiş. Jinik dikişê keviy. Kertî Kemal diwê tû, tûy dike cêraxa reş diwî sipî. Diwê bigir be bide diya min.

Bûkik cêraxê diwe dide xasiy. Xasî sêr dike ku cêrax bûye sipî, diwe bikiş bikiş va îşa îşê te dêlikê ninin, va îşê kertî Kemalê min in.

Çend ro ku dikevî nav, rokî dîsa diya Kertî Kemêl radiwî, bani bûkê dike, cêraxikî sipî dide dest, diwê vê cêraxa be der, reş dikê reşke, reş nakê jî te dixum.

Bûk dive der cêraxê. Dawdişînî, zompe dike, tûyê dike, çiton dike ku nawî reş. Cêraxê quc dike, rutinî li ber dêrî, digirî.

Êvar diwî Kertî Kemal tê, sêr dike ku jina xa li ber dêrî ye, cêraxiki reş li destê, digirî. Diwê jinik dîsa çi wû, tu çima digirî? Diwê diya te vê cara jî va cêraxa sipî da min, go wiya be reşî dikê bike, reş nakê te dixum. Min çiton kir ku reş newû. Ez ku herim hundur diya te min dixwe. Diwê ela bikiş bikiş. Jinik dikişî keviy. Kertî Kemal diwê tu, tûyê dike cêraxa sipî diwî reş.

Bûkik cêraxê diwe dide xasiy. Xasî sêr dike ku cêrax bûye reş, diwê bikiş bikiş va îşa îşê te dêlikê ninin, va îşê kertî Kemalê min in.

Neysel, bûkik vê cara jî dixelisî, ema ditirsî xa xa ra diwê va xasiya min rokî tiştikî dike mane min dixwe. Ez ê çiton bikim ku ji dest viya bixelisim? Çiqas wext radiwirî xadê pê bizanî. Şevikî Kertî Kemal xadisê, diwînî ku çira li qatê binî dişewitî. Bêdeng tere ku ewî diya xa didanêni xa tûj dike, ku were bûkê bixwe. Ecele tê, diwê ûcax kûr, jinik rawe, çentekî hazir ke em bazdinê, diya min ewî hazilixiya xa divînî ku were te bixwe. Jinik çentekî digirî, diwê mêrik ez çikê bikim nav viya? Kertî Kemal diwê jinik girmikik xo, kêrikikî, tasik av û sawûnikî bike çente, zû em birevinê.

Jinik girmikik xo, tasik av, kêrikik û sawûnikî dike çente ku bazdin, diya Kertî Kemêl nêrdîvanan da derdikevî qatê jûrîn, ev xa davijin salonê, dipekên. Diya Kertî Kemêl diwê eslan pê bigir, bermede. Eslan diwê va didanêni min tikmîşî cîgerêni te win, pê nagirim, te ez li birçiyar kuştuwum, ew jinika hat goşt da min, ez xodî kirim. Li eslîn radiwirin, tèn duşa fil. Diya Kertî Kemêl diwê fil pê bigir, bermede. Fîl diwê tu ku gewer bî, pê nagirim, te goşt dawu ber min, hindik mawû ku ez birçiyar bimirim. Va jinika hat gâ da min. Ez li mirinê xelisîm.

Têni dêrî, diya Kertî Kemêl diwê deriy vekirî bermede. Deriy vekirî diwê, te ez weçend ku cîdayî hiştuwum wext nemawû ku texteyni min çurmîşbin, ew hat ez vekirim, çurmîş bunê xelisandim. Çima bernedim? Pîra merûxur diwê

deriy cîdayî tu bermede. Deriy cîdayî diwê hiş, te rokî ez nedam cî. Weçend ku ez pas mawûm, pişt ketiwû ber min. Çi wextê ku ew jinika hat ez dami cî, min hînê rehet kir, pê nagirim.

Kertî Kemal wû jinê baz didin der ku rêdikevin, diya xa jî tê der, diwê kaniya lûlikan wê jinekê pê bigir bermede. Kanî diwê hiş, lûlikê min xûna dilê te bimijin, min kirinêni te bîr nekirin. Te qilêr û kertîşa xayê heyî tuneşî dirijand ser min, qayîli ava min nediwûy, ew jinika ku hat, siwê bi siwê dest û rûy xa pê ava min şûşt, Her roy tasik av vexar, go ku ox ava minê xaşa mine, ez ke wî pê digirim?

Neysel Kertî Kemal û jinê direvin dê jî dide dû. Digêşin cem dara sincikin. Diya xa ban dike diwê dara kertîşin wê jinekê pê bigir, bermede. Dara sincikin diwê hişwe. Sincikêni min bi cîgerêni te ra herin, tu toz û topraxê xa her time tînî davijî ser min, nika jî hatiy emirê didê min. Ew ro hek tê, destê xa mi ra dike, min hez dike, diwê ox sinca minê narinca minê. Tu ku bibayîcî pê nagirim.

Radiwirin terin, bûkik serê xa vedigerînî, paş xa va sêr dike, diwê mêrik mal şewitiyo, diya te wext nemaye ku bigêşî me. Kertî Kemal diwê jinek kêrê bavijî paş xa. Jinek kêrê davijî paş xa. Her derik diwî kêr. Diya Kertî Kemêl pe li kêran dikî. Kêr bi ninganra terin, kerî wû kerî diwin, hawêr diwî gola xûnê.

Ku êpêyî terin, jinek dîsa sêri paş xa dike, diwê wûy mêrik diya te vaye gêştî me. Diwê jinek xoy bavijî paş xa. Jinek xoy davijî. Hawêr diwî xoy. Diya Kertî Kemêl pêlê dinî, xo dikevî birînan, birîn bi jan didin, dike zîw û zîw, diqarê.

Jin û mêr direvin, xêlik der ku terin, sêr dike, diwê mêrik diya te hindik may ku bigêşî me. Diwê jinek avê bavij. Jin avê davijî, hêliki wan diwî av û dengiz, li ber dengizê ra dipekên, baz didin, dîsa jinek sêrî paş xa dike, diwê mêrik, mal xirawo diya te vaye digêşî me, vê cara îmkân tunun ku em xelasbin. Diwê jinek rama xadê pire, tu sawûnê bavijî paş xa. Jinek sawûnê davijî paş, dû ra her derik diwî sawûn. Pîra merûxur pêli sawûnê dinî, vediliqitî nav dengizê, dixendiqî, gewer diwî tere.

Kertî Kemal û jinê vedigerin tèn mala xa. Serikî sê ning va bûya xa dikin, terin digêşin miradê xa. Xadê miradê gotiyan û bîstiyân jî bike.

IV. Xiroz û Mişk

Hewuye tunewuye xirozik û mişkikî hewune. Vana hev ra bûne bira. Nav xanîkî da, ke tiştikî vana ayrî neçûye, hev ra bûne dert ortaxî. Xiroz axay mirîşkan, mişk jî axay mişkan bûye.

Rokî bervi beroy, gotine were gêrmiya genim bidinê, ser. Bipêjinê, ku hati patin, dixunê, zikê xa têr dikinê. Lê me genim ku kelandin diwî danûşk.

Neyselê gênim dikini tencikê, didini ser, tam ku kel tê, hewa dike şilî wû şepelî. Diwî tef û dûman, Şilî wû têrî dikevî telvi hev, jûr da dilop tîn nav malê. Xiroz diwê biray mişk tu hedari danûşkan we, ez derkevim ser xênî, loxikî bikşînim, va dilopana werini birandin. Mişk diwê tamam biray xiroz tu here, ez qayti danûşkan diwim.

Xiroz derdikevî ser xênî, du koran loxê dikşîni, korikî jî saxvêl dike. Dilop ku dibirin cîdilî tê mal. Biray mişk jî diwê carikî sêrkim ela va danûşkana kelîne yan nekelîne? Qapaxê li ser tencikê heltîni, doçika xa dirêji nav tencikê dike ku tevde, gêr diwî dikevî nav tencikê, nav ava kelî da gewer diwî, dimirî tere.

Biray xiroz tê mal ku biray mişk tunun. Ban dike, biray mişk, biray mişk, biray mişk; biray mişk ne li derikî xangî dike, ne jî ku deng û duy xa tê. Diwê neyselê, va danûyana heralde kelîne. Ez vana suzmîşkim, tenikî sar win, ew jî ku ketiye kîjan kunê, naha derdikevî tê, hev ra duxunê.

Tencika danûyan digirî, tali nav suzmê dike ku çi bîwînî? Biray mişk nav danûyan da gever bûye, çûye. Dest û pê difirin dikevin ber, çiton ku aviki sar lê dikin, digirî, dizîwê. Derdikevî der, çeng û çeng xaliy digirî li serê xa dike.

Li ber dêrî dariki kelemê hewuye, sêr dike ku xiroz xaliy li serê xa dike, diwê xirozo xirozo çima xalî li sêrî? Xiroz diwê xirozo xirozo xalî li sêrî, axay mişkan ketiye danûşkan. Ku wer diwê dara kelemê pelgêni xa diweşîni, rût û pûrt diwî dimîni.

Cûcîkîk dipirê tê li guliyê darê dihêwirî, sêr dike ku pelgêni darê kulî weşîvane, ketine binî. Diwê darê darê çima pelg weşîyan? Dar diwê, darê darê pelg weşîyayê, xirozo xirozo xalî li sêrî axay mişkan ketiye danûşkan.

Çûçik dibîzî ku axay mişkan miriye burtikan diweşînî, şulf diwî, dikevî herdê. Nêrik şêrda dîçêrî tê nêzika darê. Sêr dike ku nav pelgêni darê da çûçikiki rût û tazî heye. Diwê çûçiko çûçiko çima pûrtik weşiyar? Çûçik diwê çûçiko çûçiko pûrtik weşiyar, darê darê pelg weşiyar, xirozo xirozo xalî li sêrî axay mişkan ketiye danûşkan.

Nêrî wer ku bêkêf diwî rûyni xa kur dike ber vi gazê tere. Ku keviya kevirikî gir ra radiwirî, kevir diwê nêriyo nêriyo çima rokrokeko? Nêrî diwê nêriyo nêriyo rokrokeko, çûçiko çûçiko pûrtik weşiyar, darê darê pelg weşiyar, xirozo xirozo xalî li sêrî axay mişkan ketiye danûşkan.

Nêrî ku wer diwê, kevir li şûnda xa dibizdî, gindir diwî, tere dikevî nalê. Nal diwê keviro keviro çima gêrgêreko? Kevir diwê keviro keviro gêrgêreko, nêriyo nêriyo rokrokeko, çûçiko çûçiko pûrtik weşiyar, darê darê pelg weşiyar, xirozo xirozo xalî li sêrî, axay mişkan ketiye danûşkan.

Av zêde diwî, li hev dikevî, kevir û kuçan dide ber xa dadiwirî bejêr tere. Keçikik li hemerî nalê runiştîye, çînan dike. Sêr dike ku ava nalê bi hev ketiye, bûye laser, dizingê, şûr da tê. Diwê avo avo çima şêrşêreko? Av diwê avo avo şêrşêreko, keviro keviro gêrgêreko, nêriyo nêriyo rokrokeko, çûçiko çûçiko pûrtik weşiyar, darê darê pelg weşiyar, xirozo xirozo xalî li sêrî, axay mişkan ketiye danûşkan.

Keçik dersiy dest xa çavê xa ra dike, roniya çavê xa dirijînî, ber vi mal tere. Cutkarik masîse dêst da, bi pê gan cut dike. Sêr dike ku keçikik wê va tê, çav rijîye. Diwê keçikê keçikê çima derzî bi çêv ra? Diwê keçikê keçikê derzî bi çêv ra, avo avo şêrşêreko, keviro keviro gêrgêreko, nêriyo nêriyo rokrokeko, çûçiko çûçiko pûrtik weşiyar, darê darê pelg weşiyar, xirozo xirozo xalî li sêrî, axay mişkan ketiye danûşkan.

Cutkarî masîsey dest xa devê xa ra dike, tere mal. Jina xa jî nan tirş kiriye ketiye ber sêlê, nîn dipêjî. Mêrik dêrî da dikevî hundur. Jinik sêr dike ku masîse bi dêv ra çûye, nêvîk jî li der maye. Diwê mêriko mêriko çima masîse bi dêv ra? Mêrik diwê mêriko mêriko masîse bi dêv ra, keçikê keçikê derzî bi çêv ra, avo avo şêrşêreko, keviro keviro gêrgêreko, nêriyo nêriyo rokrokeko, çûçiko çûçiko

pûrtik weşiyar, darê darê pelg weşiyar, xirozo xirozo xalî li sêrî, axay mişkan ketiye danûşkan.

Mêrik ku wer diwê, jinik xa davijî ser sêlê, sêlê va dizelipî, dişewitî tere. Aciy kotî li merûy rind bila dûr here. Xadê koşekî rindî jî me ra veke.

V. Çûçik û Sincik

Hewuye tunewuye çûçikik hewuye. Va çûçika çûye li ser darê lîstiyê lîstiyê, sincikik bi ning ra çûye. Çiton kiriye ku nekaniye derxînî. Sêr kiriye ku evî jinikik sêl daye ser nîn dipêjî. Tere diwê amojin amojin sincikik ningê mi ra çu, tu dikanî vê sincika li ningê min derxînî. Jinik sincikê dikşînî, davijî bin sêlê, sincik dişewitî.

Çûçik ku ret diwî, vedigerî diwê amojin sincika min şûva bide min. Amojin diwê çûçiko çûçiko çûçika minê qiciko min sincika te avêtî nav êr, binî sêlê, ew şewitî bu xalî. Çûçik diwê mi ra çî, mi ra çî, ez sincika xa dixazim. Amojin diwê çûçika min ez ber vi sincika te ku du nanan bidim te, tu razî diwî? Diwê temam du nanan bide min, ez razî diwim terim.

Çûçik du nanêni xa digirî, dipirê tere. Tere ku evî şivanik li ber miyan e, mî berdane etega çiy, runiştîye, miyan diçêrînî. Diwê şivano şivano tu têrî yan birçî yî? Şivan diwê wele ku ez têr ninim, birçî me. Diwê du nanêni min hene, wan bidim te, tu bixwe biwe têr. Şivan diwê, tu ku min têr dikê, xadê te bigêşînî miradê xa.

Çûçik van du nanan dide şivîn, şivan dixwe, xa ku têr dike çûçik diwê şivan wan du nanêni min bide, ez herim. Şivan diwê çûçiko çûçiko çûçikê minê qiciko, te ew nanana nedani min ku ez bixum? Min ew xarin, ez çiton bidim te? Diwê mi ra çî, mi ra çî ez nanêni xa dixazim.

Şivan duşmîş diwî, dihêrifînî dinijînî, çarekî diwînî. Diwê çûçika min ez ku ber vi wan du nanan beranikî bidim te, tu razi diwî? Diwê temam tu beranikî bide min, ez razî diwim terim.

Şivan beranikî dide çûçikê. Çûçik pê ustiy bêrîn digirî, radiwirî tere. Pir tere hindik tere xadê pê bizanî, tere li gundikî derdikevî. Li wî gundî jî bûyik hewuye. Xudiyni bûy ku berbûçî hatin, ber vê terin bi dawul û tutikan, tînin didin runişkandin, vêra azet û xizmetê dikin. Sêr dikin ku çûçikik, beranik jî vê ra ye, ewe tê bûy. Zarû dikini hayleme, diwên berbûçî hatin, berbûçî hatin. Bi dawul û zurnan ber vê terin tînin li koşekî didin runişkandin. Vêra azet û xizmetê dikin. Diwên tu mîvanê meyê giranî, te beranik aniye bûya me, dilê te ku çikê dixazî, emirke te ra hazirkinê.

Çûçik diwê mi ra goşt hazirkin, waynin ez bixum. Terin ew berana ku çûçikê aniye, wî beranî şerjê dikin, digurên, dipêjin, axme wû mîvanan dikin, dixun ku zikê xa têr dikin, çûçik diwê axano ela wî beranê min mi ra waynin, ez hûr û hûr herim.

Zava tê diwê çûçiko çûçiko çûçikê minê qiciko me ew berana şerjê kir, goşt li mîvanan bila kir, beranê ku bidinê te tunun. Diwê mi ra çî mi ra çî ez beranê xa dixazim. Mezindêni gund topi hev diwin, diwên emê çarekî ji vê çûçikê ra biwîninê. Ber vi wê beranê em bûkê bidinê çûçikê. Diwên çûçikê min em ber vi wê beranê bûkikê bidinê te, tu razî diwî? Çûçik diwê tamam un bûkikê bidini min, ez razî diwim ku xadê jî li we razî wî.

Bûkikê didini çûçikê. Çûçik pê destê bûkikê digirî, rêdikevin, terin. Xêlik der ku terin têni yazîkî ku xortik keviya rê runiştiye, qewalik jî girtiye dest xa, ge qewalê dikutî ge dilorînî. Çûçik diwê xorto xorto xortê minê dil keliyo, ez ku vê bûkika bidim te, tu wî qewalî didê min? Xort diwê, ez xortê bi dil kelo, bila xastina te bi wî tutik û qewalo, wî bigir, bûkikê bide min, ew mi ra biwî hevalo.

Xort bûkikê digirî, tutikê dide bi çûçikê. Çûçik tutikê digirî, dikutî. Diwê sincikik û du nanan, du nan û beranikî, beranik û bûkikikî, bûkikik û tutikikî, dut durî lûrî lûrî lûrî lûrî...

Tere digêşî miradê xa. Xadê miradê me jî bike îşala.

VI. Hacî Ûsiv û Awrês

Hewuye tunewuye du tene rivî hewune. Navê êkî Hacî Ûsiv wuye, navê êkî jî Awrês wuye. Hacî Ûsiv riviye nêre, Awrês riviye mêkike. Ew her du mixarekî da yaşamîş diwin. Xaş û xar hewra royni xa radiwirînin.

Rokî Hacî Ûsiv tere nîrê cutkarîkî didizî tînî, diwê Awrês viya koşekî mixarê da vêşêr, ku xarina me xelas bu, wayninê çermê dora vî bixunê. Awrês diwê tamam Hacî Ûsivê min.

Cutkarî gayni xa digirî tere ber zeviy ku cut bike, sêr dike ku nîr li şûndê tunin. Vedigerî tê mal. Keriki cutkarî jî hewuye. Diwê kera min tu ku terê nîrê min diwînî, tînî, tenîkek ce didimi te, têr bixwe.

Neyse ker dizanî ku rivî nîr biriye. Siwêda zû radiwî tere, li ber deriy mixarey rivî radimerdî herdê, mirî dêyî tere. Xa dide mirinî.

Awrês li xewê xadisê, terlîgan ningê xa va dike, tê ber dêrî ku çi biwînî? Laşikî kerê li ber dêrî ramerdiye, av li dêv tere. Diwê biskin ez oyînikî Hacî Ûsivê xa ra bikim. Tere dikevî cilê, keviya Hacî Ûsivra radimerdî. Vê hêlê wû wê hêlê va xa diçerixînî, ku Hacî Ûsiv xadisê, çavêni xa oxmîş dike, diwê Hacî Ûsivê min tu xaîsiyay? Hacî Ûsiv diwê herê Awrêsa min siwa te bi xêr wî. Ê te jî xêr wî diwê Awrês, diwê Hacî Ûsivê min, min îşevî xewniki xa dî. Hacî Ûsiv diwê xadê wû ser xêrê de, ela biwê te çi dî?

Diwê min îşevî xenê da dî ku kerik hatiwû li ber deriy me gewer bûwû, min û te laşê kerê kişandi hundur, tam mehekî me pê wê laşê kerê xarina xa derxist. Radiwî, terlîgêni xa werdigirî, tere dêrî, diwê Hacî Ûsiv Hacî Ûsiv ela were were, xewna min bu rast, ewe laşike kerê li ber deriy me ramedandiyê.

Hacî Ûsiv tê ku rast jî laşê kerê li ber dêrî ye. Diwê Awrês tu here paş kerê tande, ez jî pê sêrî bigirim kaşkim, em viya bêne hundur. Hacî Ûsiv kaş dike, Awrês jî pa ra tan dide, qe nikanin bilivînin.

Awrês diwê Hacî Ûsiv ew nîrê ku te li cutkarî dizîwû, here wî wayn, hêlikî ustiy kerê va girêde, hêlikî jî bavij ustiy xa, tu bikşîn, ez jî tandim, belkî wê torê bêne hundur.

Hacî Ûsiv tere nîr tînî, tora gotina Awrêsê dike, hêlikî ustiy xa va girê dide, hêlikî jî ustiy kerê va, dike ku bikşînî, ker radiwî ser xa, bi çar nalê, nîr û rivî va, dorxo tere ber deriy cutkarî.

Cutkarî sêr dike ku kerê him nîr aniye him jî rivî. Diwê eferîm kera min, were tenikek cey te bidim te tu têr bixwe, ez û rivî jî sêri îşê xa kinê.

Riviy li nav nîr derdixinî, diwê riviyo ez ê te nekujim, postê te serda dikim, te berdidim. Tînî postê rivî serda dike, dugurê dike surgoşt. Berdide, diwê de terê ku here.

Hacî Ûsiv nav xûn û revanê da maye, giran giran ber vi mal tere. Awrês jî der ketiye ser gazikî çav li rê maye, dipê ku yêk were, lê pirske, ela Hacî Ûsiv diye yan nediye?

Pir dimînî hindik dimînî xadê pê bizanî, sêr dike ku tiştikî sûr va ye jêla tê. Diwê çux suro çux li banî, kerê Hacî Ûsivê min wê da anî, te qe xewerik mi ra nanî?

Hacî Ûsiv diwê Tu Awrêsî Awrêsa minê dînî, tu nêçe ku xewna xa da giregoştan diwînî, kî çi zanî hînê çi tefequnan ser Hacî Ûsivê xa da tînî.

Awrês ber vê tere, digirî pişta xa, tînî mal, li ser cilê radimerdînî. Diwê Hacî Ûsiv ez îlacikî dizanim, vê îlacê çêkim, canê teyê heyî tuneyî rakim. Tu biwî xaş û xar.

Tînî girmikik xo davişî nav tasik av, dihelînî dike sûravik. Wê sûravikê ku birînêni Hacî Ûsiv ra dike Hacî Ûsiv diqarê, dizîwê, bi nali nalan herd û azman kun diwî. Xa li herdê dipêçî gewer diwî tere. Awrês bi tek û tenê kuna xênî da dimînî.

Xadê merûyan bêderman nelî, dermanikî jî mera bişînî.

VII. Bejin Bostik

Hewuye tunewuye padîşak hewuye, sê lawêni xa hewune. Wext hatiye rawiriye, çûye, vana nezewicîne. Rokî padîşa bani wezîrê xa dike, diwê va

lawêni min wextê xa rawirîn, qe yêk nezewicî. Tu wezîrî, aqilikî bide min, ez çiton bikim ku vana bizewicînim?

Wezîr duşmîş diwî, diwê padîşay min lawêni xa topi virake, lê bipirs, ela dilê wan da keçikik heye yan tunun? Ku dilê wan tale, her yêkî oxikî bide dest, bila oxêni xa bavijin, oxê kê ku çu ber deriy kê ket ewê qîza wê malê ra bizewicin. Padîşa diwê tamam wezîrê min, te aqilikî rind da min, ez ê tora gotina te bikim.

Bani xizmikarê xa dike, diwê here xewerê bide hersu lawêni min, bila meskinin ecele werin serayê. Xizmikar tere xewerê dide lawan, hersu law ecele tèn serayê, diwên bawo emirke, emirê te li ser serê me ye. Padîşa diwê wer emir dikim ku unê bizewicin, ku dilê we da keçikik heye mi ra biwên, ez herim bixazim, we ra waynim. Ku dilê we da kesik tunun jî li we her yêkî oxikî didimi dest we, un vê oxê davijin, oxa we ku çu li kîjan deriy ket unê qîza wê malê ra bizewicin. Lawêni padîşê diwên bawo dilê me da kesik tunun, werê em oxêni xa bavijinê, ya wû xêr, qedera me ku çike emê biwîninê.

Oxêni xa davijin. Oxa lawê mezind tere dikevî ber deriy wezîrê mezind, oxa lawê ortê tere dikevî ber deriy wezîrê ortê, oxa lawê qicik tere dikevî keviya golikî. Lawê mezind qîza wezîrê mezind ra dizewicî, lawê ortê qîza wezîrê ortê ra dizewicî, heft dawul û heft tutikan bûy dikin, digêşini miradê xa.

Lawê padîşêy qicik jî diwê ez jî herim ew oxê min ketuwû keviya golê, wî bigirim, waynim. Tere oxê xa digirî ku beqik seriy oxê va zeliyê wî beqî jî digirî tê mal.

Şev da radiwî tere, êvarî tê ku her derik şuştî wû miştî ye, sofre hazir kiriye. Diwê hila hila ez dêrî kilît dikim terim, va kiye tê dikevî mala min, xa vêşêrim, biwînim ela va çi hêkmet e?

Siwe da radiwî, dêrî kilît dike li paş dêrî xa vêdişêrî, kuna dêrî da hundur teqîw dike. Sêr dike ku ew beqa postê xa li ser xa da kir, bu qîziki azew, merû qîmîşê nawî ku lê sêrke. Keçik der û beran pak dike, destê xa herdê ra dike turlu turlu yêmeg derdikevin, sofrê hazir dike, postê xa digirî ku dîsa biwî beq, lawê padîşê dikevî hundur guliyani da digirî, diwê keçê va rindikiya te va hunerêni te ku hene tu çima diwî beq? Rawerê digirî, diwê wî postê xa wermegir, vê tora

bimîn, em postê te veşêrinê. Kesikî yawancî, biyanî ku hat wê sirê werdigirî. Keçik qewûl dike, hev ra êpêyî zeman yaşamîş diwin terin.

Rokî, êvarî lawik rocinê da arikî dadide, keçik li hemerî êr runiştîye, tere postê keçikê tînî ku baviyî êr. Keçik rawerê raserê digerî, diwê mêrik meke, postê min maviji êr, paşê tu pir poşman diwî. Çiton dike ku nikanî lîwik bitexilînî. Lawik postê keçikê daviyî êr dişewitînî. Keçik diwê neyse te gu li min neyna, postê min şewitand, biskininê biwîninê, va kirina te, çi belan tînî serê te.

Sat û wext radiwirin. Kes nizanî ku keçik li mala lawê padîşê qicik heye. Padîşa rokî tere awê, nêçîrê. Nêçîra kewan pir hez dike. Tere, refik kew radike, padîşa dide du kewikî, kew tere li pençerey lawê padîşêy qicik da dikevî hundur. Padîşa tê ber dêrî, dêrî dikutî, diwê nêçîra min hat keti vira, heta ku ez nêçîra xa negirim derikî va narim. Çare wû midare li keçikê tê birandin. Kewê pê digirî, pê destikî dêrî vedike, pê destikî jî kewê dirêji padîşê dike. Padîşa ku çav li destê keçikê dikevî ayîl û mayîla destê keçikê dimînî.

Tere mal, çiton ku dike, rindikiya destê wê keçikê aqilê xa da dernaxinî. Xa xa ra diwê ez manekî biwînim, serê lawê xa lêxinim, wê keçikê bigirim, ew biwî jina min.

Bani jina xa dike, diwê jinik hal û kîfat ha ku ha. Dilê min keti bûka me yê qicik, ez ê halikî waynim serê lawê xa, jina wî bigirim. Ez ku vî negirim derdê mi ra derman nê diyîn.

Jinik diwê padîşay min, ew çiton qeziye tu diwêy? Va yaqîşmîşi te diwî? Ema padîşa tuyî, emir ferman ê teye. Çiton ku dizanî wer bike.

Êvar diwî, Padîşa bani bekçîkî dike, diwê here mala lawê minê qicik, biwê bavê te te dixazî. Bekçî tê dêrî dikutî, lawik dêrî vedike, diwê boyîr bekçî çike, çi hey? Bekçî diwê bavê te ecele te dixazî. Lawik derdikevî ew û bekçî hev ra terin huzûrê padîşê. Padîşa diwê oxil ez vê wû wê nizanim. Siwe da terê mi ra xalikî tînî, ehaliyê min kulî top diwî tê li ser rutinî, hiliki xaliy tal dimînî. Tînî wayn, naynî jî serê te lêdixinim.

Lawik kor û poşman tê mal ku pozxunê, dev venawî. Keçik diwê mêrik çi wû, bavê te te ra çi go? Diwê jinik hal û mecal vê tora. Bavê min xalik li min

xast ku xalîkî wê torê li rûy dunê nê diyîn. Miletê dugelê me ewê topbî were li ser xaliy rûnî, li ser cîwî, nêvîkî xaliy jî tal bimînî. Ez ku xalîkî vê tora newînim, bavê min serê min lêdixe.

Keçik diwê min te ra nego ku postê min maviji êr? Te gu li min nenna. Ema derdê te yê en ê gir bila va wî mêro, tu were em rakevinê weki nîr û hev caro, şev yêke qapû hezaro. Bila siwe wî, çarekî diwîninê.

Siwe diwî, diwê mêrik here ew dera ku te ez anîm, here wê, bi wê ku baldûz Xeycan baldûz Xeycan, xanga tey qicik, li wan xaliyni bowoy mezind yekî dixazî. Xalîk li golê da derdikevî, tu wî bigir were.

Lawê padîşê tere ber golê, diwê baldûz Xeycan baldûz Xeycan, xanga tey qicik, li wan xaliyni bowoy mezind yekî dixazî. Xalîk li golê da derdikevî, lawik wê xaliy digirî tê mal.

Êvar diwî. Bi wê xaliy va tere seraya padîşê. Padîşa delalê dide bankirin, butun ehaliy xa top dike, milletê heyî tune yî tîn li ser xaliy rutînin, nêvîkî xaliy tal dimînî. Lawik xelas diwî tê mal.

Çend ro ku derbaz diwin, padîşa dîsa xizmikarê xa dişînî, diwê here bani lawê minê qicikke bila zû were vira. Xizmikar tê dêrî dikutî, lawik dêrî vedike ku dîsa xizmikar e. Diwê çike, çibu? Diwê padîşa ecele te dixazî.

Lawik tere, el pençe wû dîwan diskinî, diwê bavo emîrke. Padîşa diwê ez vê wû wê nizamim, siwe da terê mi ra gûşîk tirî tînî. Ulka minê heyî tune yî dixwe têr diwî, nêvîk jî dimînî. Tînî wayn, naynî jî serê te lê dixinim.

Lawik pozxun û dalxun tere mal. Jinik diwê mêrik çi wû? Diwê, bavê min vê çara jî li min evikê dixazî, gûşîk tirî dixazî, Ez ê gûşîk tiriye wer waynim ku ulka heyî tune yî bixwe, nêvîk jî li ber bimînî. Wer newî padîşa serê min lêdixe.

Keçik diwê rind wûye, te va ceza heq kiriye, min te ra nego ku postê min maviji êr? Te gu li min nenna. Diwê mêro mêro, tu were em rakevinê weki nîr û hevcaro, şev yêke qapû hezaro. Bila siwe wî, çarekî diwîninê.

Radikevin, şev da radiwin, keçik diwê here dera ku te ez anîm wê derê, biwê baldûz Xeycan baldûz Xeycan, xanga tey qicik, li baxê bowoy mezind gûşîk tirî dixazî. Gûşîk tirî li golê da derdikevî, tu wî bigir were.

Lawik tere ber golê, diwê baldûz Xeycan baldûz Xeycan, xanga tey qicik, li baxê bowoy mezind gûşîk tirî dixazî. Gûşîk tirî li golê da derdikevî, lawik wî gûşiy tirî digirî tê mal.

Êvar diwî padîşa delalê dide bankirin, millet top diwî, lawê padîşê gûşiy tirî diwe, milletê heyî tuneşî dixwe, zikêşê dikevin, têr diwin, dîsa nêvîkî gûşiy tirî li ber dimînî.

Lawik dixelisî tê mal. Çend ro ku radiwirin Padîşa dîsa bani xizmîkarê xa dike, diwê here xewerê bide lawê minê qicik, meskinî ecele were serayê.

Xizmîkar tê dêrî dikutî, lawik dêrî vedike, diwê çike? Xizmîkarê padîşê diwê zû meskin were serayê padîşa tê dixazî. Lawik radiwî ser xa, rêdikevî tere huzurê padîşê, diwê bavo emirke.

Padîşa diwê ez vê wû wê nizanîm, here mi ra merûkî wer wayn ku bejna xa bostik wî, rûynî xa du bost bin. Tînî wayn, naynî jî serê te didimi lêxistin.

Lawik pozxun diwî tere mal. Jinik diwê mêrik çi wû? Diwê, bavê min vê cara jî li min bejin bostikîkî dixazî.

Keçik diwê va hînê te ra hindike, tu biskin hînê çi ser û dec têni serî te, min te ra nego ku postê min mavîjî êr? Te gu li min nena. Sêr dike ku mêrik pir pozxune, diwê mêro mêro, tu were em rakevinê weki nîr û hevcaro, şev yêke qapu hezaro. Tu bê qisatew we, bila siwe wî, çarekî diwîninê.

Şev da radiwin ser xa, Jinik diwê mêrik here dera ku te ez anîm wê derê, biwê baldûz Xeycan baldûz Xeycan, xanga tey qicik dîgo ku li sandiqêni bowoy mezind sandiqîkî mi ra bişîn. Sadiqîk li golê da derdikevî, tu wî bigir were, ema yaman yaman rê va ku hatî, deriy sandiqê venekê.

Lawik tere ber golê, diwê baldûz Xeycan baldûz Xeycan, xanga tey qicik dîgo ku li sandiqêni bowoy mezind sandiqîkî mi ra bişîn. Sadiqîk li golê da derdikevî, lawik sandiqê digirî tê. Rê ku nêvî diwî, merex dike, diwê ecewa nav

vê sandiqa da çik heye? Rutînî, deriy sandiqê vedike, bejin bostikik nav sandiqê da derdikevî, çiton dike ku nikanî bike şûndê.

Keçik li pecerê sêr dike ku bejin bostik li sandiqê derketiye duwakî duxunî, bejin bostik dîsa tê dikevî sandiqê, lawik sandiqê digirî tê mal.

Êvar diwî, bi sandiqê va tere seraya padîşê. Miletê heyî tune yî kulî top diwin tên, Padîşa wû wezîrêni xa jî tên. Deriy sandiqê vedikin, merûk tê da derdikevî der ku bejna xa bostik e, rûyni xa du bost in. Herkes şaş diwî dimînî. Padîşa diwê, bejin bostikê min tu xêr hatî, silamet hatî, li ser çav û rûy mi ra hatî. Li hemerî xa dide runişkandin. Hevdu xoş û bêş dikin. Milet jî li wan sêr dike.

Bejin bostik diwê padîşay min qeziyan bike. Badîşa diwê bejin bostikê min tu qeziyan bike, tu mîvanî. Diwê padîşay min te qe omir heyatê xa da dîwu, bîstîwu ku xalîkî waynin, ulka teyê heyî tune yî li ser runî, nêvîkî xaliy tal bimînî? Padîşa diwê, ez hatimi vê yaşa, min tiştikî vê tora ne bîst ne jî ku dî. Diwê tu hetanî juniyan biwî kevir. Padîşa hetanî juniyan diwî kevir.

Bejin bostik diwê padîşay min qeziyan bike. Badîşa diwê bejin bostikê min tu qeziyan bike, tu pir qeziyni xaş dikê. Diwê padîşay min te qe omir heyatê xa da dîwu, bîstîwu ku yêk here gûşîk tirî waynî, ulka teyê heyî tune yî bixwerî, kulî hundurêşanê kevin, têr bixun, nêvîkî gûşiy tirî li ber bimînî? Padîşa diwê, ez hatimi vê yaşa, min tiştikî vê tora, hetanî du sê ron pêşvatir, ne bîst ne jî ku dî. Diwê tu hetanî navê biwî kevir. Padîşa hettanî navê diwî kevir.

Bejin bostik diwê padîşay min qeziyan bike. Badîşa diwê bejin bostikê min tu qeziyan bike, tu pir qeziyni xaş dikê, tam li orta kitawê da den dikê. Diwê padîşay min te qe omir heyatê xa da dîwu, bîstîwu ku merûk li rûy dunê hevî, bejna xa bostik bî, rûyni xa du bost bin? Padîşa diwê, ez hatimi vê yaşa, min tiştikî vê tora, wexta ku tu hatî, min hînê dî, wê pêşvatir min ne bîst ne jî ku dî. Diwê tu hetanî gewriy biwî kevir. Padîşa hetanî gewriy diwî kevir.

Bejin bostik diwê padîşay min qeziyan bike. Badîşa dike xir û xir diwê bejin bostikê min tu qeziyan bike, tu orta kitawê da den dikê. Diwê padîşay min te qe omir heyatê xa da dîwû, bîstiwû ku padîşak rawî, çalişwî ku lawê xa bikujî bûka xa bigirî? Padîşa diwê, ez hatimi vê yaşa, min tiştikî vê tora ne bîst ne jî ku

dî. Kesî nekiruwû, ema ez çaliş bum ku bikim. Diwê tu hetanî ser sêrî biwî kevir.
Padişa hettanî ser sêrî diwî kevir.

Lawê padişê wû jinê jî seriki ser nû va bûya xa dikin bi heft dawul û heft tutikan, terin digêşin miradê xa. Xadê miradê we jî bike.

VIII. Pozbendê Pîrê û Zulufzerî

Hewuye tunewuye begik hewuye, pir zengîn wuye. Mal û milkê xa derya wû dengiz wuye. Angore wî mal û milkî tek û tenê wuye, jiniki xa tunewuye, navê wî Pozbendê Pîrê wuye.

Li wî diyarî qîzikî goçeberan jî heye, rindikiya xa axmewu dunê wuye, Heftê wû du dugel rindikiya wê keçikê qezî dikin. Navê xa jî Zulufzerî ye.

Pozbendê Pîrê dibîzî ku Zulufzerî wû aşîra xa hatine li filan derê, li Arî Qendîlê, kon daynane. Diwê ez herim Zulufzeriy birevînim waynim, ew biwî kewaniya min.

Pozbendê minê Pîrê

Daketi tewlê

Hespê qirîgupan kişandû dere

Zîna zêr û zîv jî avêti sere

Qolan quzxunê hespê qirîgupan tev badane,

Ber gerandiye etega deşt û çiyane lo.

Hespê xayê qirîgupan dikşînî der, qolan û quzxunan pêt dike, xa dide ber vi etega deşt û çiyane, wer dajûy ku çik difirî li ber ningêni hespê. Xêlik der ku tere sêr dike ku millet axmevu mergan bûye, duşuxulin, diwê:

Dilê minî yan û yane

Serê min dêşî hundurê minî pir bi jan e,

Mino qolan quzxunê hespê qirîgupan bi tev badane

Min ber gerandiye etega deşt û çiyane

Lo lo un Xadê dikin min ra biwên,

Riya Arî Qendîlê di kîjane lo.

Ditirsîn, diwên cawa viya bidinê, bila here riya xa va, deli me nekevî. Yêk nav da derdikevî, diwê:

Dile minî yan û yane
Serê min dêşî hundurê minî pir bi jan e
Arî Qendîlê dipirsî li paş çiyane
Riya xa riya sê ron û sê şevane
Were rawur, were ravur weki merdan e
Riya Arî Qendîlê vayê yane lo.

Dide rê, sê ron û sê şevan ku tere digêşî Arî Qendîlê. Zulufzerî sêr dike ku siyarik hemer va tê, çîk dipirê li ber ningê hespê, tirsik dikevî hundur, dil dikelî, diwê:

Dayê dilê minî yan û yane
Serê min dêşî hundurê minî pir bi jan e
Siyarik derket li wan gazane
Çîk dipirî li ber ningê hespane
Ew yan biraye yan mîvan e.

Zulufzerî diwê jinino un bikevini nav konan, dêrî li ser xa cîdin, belkî fêla vê siyariya kotî ye, ez cawa wî didim.

Jin ku dikevin nav konan Beg tê hemerî konan diskinî, diwê:

Lê dayê lê dayê dilê minî yan û yane
Serê min dêşî hundurê minî pir bi jan e
Mino qolan quzxunê hespê qirîgupan tev badane
Min ber gerandiye etega deşt û çiyane
Ez qe danekevimi nav konan e
Zulufzeriy bidin min bi rindiyan e
Wî xa ra bem bikim bermala bermalan e.

Zulufzerî digirî, diwê:

Lo siyaro lo siyaro dilê minî yan û yane
Serê min dêşî hundurê minî pir bi jan e
Nika em jin top diwinê pê şîş û rîman e
Te digurênê weki qar û berxan e
Zulufzerîra dîkinê qeda wû qurban e
Zulufzerî te ra nawî bermala bermalan e

Siyarî diwê min damexinin jêr, bi rindiy bidin min, ez pozê kesî xun
nekim, rawirim herim. Diwê:

Lê jinino lê jinino dilê minî yan û yane
Serê min dêşî hundurê minî pir bi jan e
Ela Zulufzeriy bi min binîkin ew kîjan e
Ez wî bavijim ser hespê qirîgupan e
Bigirim bem, xa ra bikim dil û can e

Zulufzerî diwê:

Lo siyaro lo siyaro dilê minî yan û yane
Serê min dêşî hundurê minî pir bi jan e
Zulufzerî dipirsî xanga heft biran e
Nika tèn te pêdigirin weki kar û berxan e
Te konê ortê ra dîkin kole wû şivan e

Zulufzerî ku wer diwê birayni xa tèn digêşin, sêr dîkin ku siyarîk hatiye,
jin kirine qûş qefesî, zorbalixî dike li ser wan. Heft bira bi hev ra diwên:

Lo siyaro lo siyaro dilê meyî yan û yane
Serê me dêşî hundurê meyî pir bi jan e
Dakevi jêr vira him dûz e him meydan e
Bila biwînin li me kî berx e kî Beran e
Te zulufzeriyra bikinê qeda wû qahlan e

Ku wer diwên beg sêr dike ku çare tunin, dadikevî jêr, diwê:

Ax de dayê dilê minî yan û yane

Serê min dêşî hundurê minî pir bi jan e
Ez dadikevim jêr, him dûze him meydan e
Un tek û tek werin weki mêran e
Bila biwînin li me kî berx e kî beran e

Hespê qirîgupan dajuy orta meydanê, birayni Zulufzeriy tek û tek derdikevin hemerê, hucûmê dikin, kîjan ku tê beg sêrî lêdixinî. Seriy şeş biran jê dike, ku biray qicik tenê dimînî Zulufzerî digirî, diwê:

Lo siyaro lo siyaro dilê minî yan û yane
Serê min dêşî hundurê minî pir bi jan e
Te şeş bira guran weki kar û berxan e
Biray qicik mekuj, sevgiya wî pir giran e
Wî bêne xa ra bikinê şivanê berê miyan e

Beg diwê neyse viya jî baxşîşi te dikim. Zulufzeriy davijî ser hespê qirîgupan, berê xa vedigerînî etega deşt û çiyar, biray qicik jî digirin cem xa, terin. Heft dawul û heft tutikan bûya xa dikin, dizewicin. Çiqes wext radiwirî xadê pê bizanî, rokî Zulufzerî ketiye ber sêlê, nîn dipêjî, beg jî li ser maqatê dirêj bûye, radikevî. Li der jî şilîk dibarî ku tu diwê herd û azman kun bû ye. Biray qicik li ber miyan e. Miyan tînî mal, dêrî da dikevî hundur ku li ser sêrî heta binî ningan bûye av. Çavê Zulufzeriy ku lê dikevî hundur jan dide, digirî. Biray qicik diwê:

Lê xangê lê xangê dilê minî yan û yane
Serê min dêşî hundurê minî pir bi jan e
Dilê te ku tunun li wî axay bêderman e
Were em şerjêkinê weki kar û berxan e
Destê hev ra bigirinê, herinê nav konan e
Ez konê ortê ra biwimi sermiyan e.

Zulufzerî diwê:

Lo birawo lo birawo dilê minî yan û yane
Serê min dêşî hundurê minî pir bi jan e

Dilê min tunun li wî kutiy olaxan e
Were tu wî şerjêke weki kar û berxan e
Em destê hev ra bigirinê, herinê nav konan e
Tu konê ortê ra biwe axa wû sermiyan e.

Biray qicik kêrê digirî, ji xewê da zavê şerjê dike. Tişt û taway xa top dike, diwê xangê rawe xa hazirke ku em herinê nav konênî xa. Zulufzerî diwê tu here, ez nê, Ez ê bi çi rûy werim nav konan? Xelk mi ra nawê ku, tuuu li rûy te, te him serê şaş birayni xa xar him jî serê mêrê xa xar, tu şerm nakê şûva têy nav konan?

Biray qicik çiton dike ku Zulufzerî ning dide herdê, diwê ancax meytê min li vê mala derdikevî. Tu ku min bikujî jî ez mala xa da dernakevim. Ku wer diwê, biray qicik kêrikî jî saplemîşi xangê dike. Wî jî dikujî, hespê qirîgupan siyar diwî, dajuy tere nav konênî xa.

IX. Qîza Orta Dengîz Xanê

Hewuye tunewuye padîşak hewuye, lawikî xa hewuye. Li seraya padîşê du hev ra tam çel tene ode hewune, deriy va odana kilît kirî bûye, kilît jî li padîşê ra bûne. Dij li padîşê kesî nezaniye ku va odana da çik heye.

Lawê padîşe gir diwî, tê dew û heft dew û heyşt salan, merex dike, diwê ecewa paş va deriyana da çik heye? Bavê min çik kiriye paş va deriyana, çel derî li ser kilît kiriye?

Rokî padîşa ku radikevî, lavwik kilîtan digirî, tek û tek deriyana vedike, deriy çelinî ku vedike sêr dike ku di vêr da resimik darxistiye, resimê jinikikî, tu diwê ne bixwe, ne vexe sêri vê resima dike.

Lawik aşiqi vê resima diwî. Deriyana şûva kilît dike, tê li nan û avê têbirandin, nexaş dikevî, xa dide cilê. Rokî wer, du ron wer, sê ron wer... Ro wi ro şûva tere, zayîf dikevî, derdê xa jî kesiyana ra nawê. Padîşa jî merex dike, tere ser balgiyê lîwik diwê, li dari dunêda lawikî min heye, ew jî ro wi ro li ber çavê min dihelê tere. Lawê min derdê te çike mi ra biwê, es qoce padîşakim, derdê te ra dermanikî biwînim.

Lawik diwê bawo, dermanê derdê min, ew fotirafê ku te kiriye paş çel deriyan, çel derî li ser kilît kirine, xodiy wê fotirafê ye. Wî mi ra tînî wayn, naynî jî ez li vî derdî dimirim, terim.

Padîşa diwê, lawê min ew fotirafa fotirafê qîza orta dengiz xanê ye. Min omirê xa li riya wîda çurmîş kir, min nekanî ku wî xa ra waynim. Seraya wan li orta dengizê da ye. Mar bi marya xa, têr bi têriya xa nikanî ku here wî melmeketî. Were li vê sewdayê bixelis. Tu li rûyê dunê ku kê qayîl diwî ez wî te ra vaynim.

Diwê na bawo, diwî jî va ye, nawî jî va ye. Tu îzinê bide min, yan terim qîza orta dengiz xanê tînim yan jî ku riya wî da telef diwim.

Bav rawer û raserê digerî, oxil êtme êyleme. Çiton dike ku lawik nê rê. Diwê ez ê siwe da, li vê oxirê da, derkevim rê.

Neysel biray xa ra ku biwê, êvarî ku vana radikevin, dewrêşik tê ser balgiyê lîwik, diwê oxil tu ku siwe da rabûy ser xa, filan rê teqîwke, ew riya dorxo tere ber dengizê. Tu ku çuy ber dengizê li filan derê keviriki sal heye, wî salî helîn bin da hefsarik derdikevî, te ku ew hefsara hev xist hespik û qatik kinc derdikevin, wan kincan xake, bazde ser hespê, dorxo bajo nav dengizê. Tu wekî din nikanî herê seraya qîza orta dengiz xanê, ancax ew hesba te diwe wê derê.

Lawik şev da radiwî ser xa, êvarî ku xewna xa da wî dewrêşî ku çi gotiye tora gotina wî dike. Rê dikevî dorxo tere ber dengizê, sêr dike ku ew dera ku dewrêşê tarif kiriye li wê derê salik heye, tere wî salî heltînî, binda hefsarik derdikevî, hêfsêr bi hev dixinî, qatik kinc û hespikî derdikevin. Kincan werdigirî, li hespê siyar diwî, bîsmîlax diwê, ber vi dengizê dajûy, dorxo tere ber seraya qîza orta dengiz xanê. Dêrî dikutî, qîzîk dêrî vedike. Çiton ku çav li lîwik dikevî aşiqê diwî. Diwê benî adêm tu çi insî çi cinsî? Mar bi marya xa, têr bi têriya xa nikanî ku were vê melmeketa, tu çiton hatî?

Lawik diwê, hal û kifât ha ku ha. Ez lawê filan padîşê me. Min fotirafê te li duwêr da dî, aşiqî te bum, derketim hatim. Keçik diwê tu xêr hatî, ser çav û rûyan ra hatî, ema sê tene birayê min û dêki min hene ew dêv in, nika çûne li gaz û çiyar nêçîrê dîkin, ku êvar bu ew tên him te dixun him jî min dixun.

Neysel hetta êvarî xoş û bêş dîkin, dixun û vedixun, ku êvar diwî, keçik duwakî dixunî, lîwik dike şivik li paş istêr radimerdînî. Hersu bira wê dê tîni mal, diya keçikê diwê, ûû bîna merûy xam li mal tê, dorxo biwê kî hat mala me? Keçik destê xa berdide gewriya diya xa, baskê merûkî derdixinî der. Diwê te çûye merû xarine, bîna merûy xam li devê te tê. Diwê neyse qîza min siwe da hîne du sat siwê ra ku maye rawe, tişt û taway me hazirke, em siwe da dûr terinê nêçîre.

Keçik şev da ku du sat siwê ra man radiwî ser xa, tişt û taway vana hazir dike, wan rêdixinî, dîsa duwakî dixunî lîwik dike tora berinî. Bi leq û kêfan êvar dîkin. Keçik dîsa duwakî dixunî, lîwik dike havlêk li paş dêrî vêdişêrî. Êvarî ku dê wû birayni xa tîni. Diya xa dîsa diwê, uuu bîna merûy xam li vê mala tê. Keçik dîsa destê xa berdide gewriya dê, pêtikikî tîni der. Diwê bîn li devê te tê. Sêrke te çuve merû daqulandine, bîna wane tê te.

Diya xa diwê neyse qîza min, siwe da em pir dûr terinê nêçîrê. Şev da hîne ku sê sat li siwê ra man tu rawe çê wû xirawê me hazirke, em herinê. Keçik diwê tamam.

Qîza orta dengiz xanê şev, ku siwê ra sê sat man, radiwî. Çê wû xirawê wan hazir dike, van rê dixinî. Bani lîwik dike, xadisênî, diwê rawe em îro birevinê. Radiwin, lawik ew hefsara li der vêşartiye, tere hefsarê tîni, hev ra dike, hesp derdikevî, lê siyar diwin, xa didini gaz û çiyay, terin.

Pir terin hindik terin xadê pê bizanî, terin digêşin etegê çiyakî. Çiton ku ew li vira ra herin, dê wû birayni wê keçikê jî ta li wan çiyayni hemerbin. Diya keçikê sêr dike diwê lowo sêrkin, xanga we ewe li çiyayni hemer mêtirikik jî vêray, terin. Un yêk herin, xanga xa bigirin waynin. Biray mezind diwê dayê ez terim wî merikî dixum, xanga xa jî digirim tîni.

Biray mezind, gavikî li vê gaza dixinî, gavikî li wê gazê dixinî, tere. Keçik dû xa sêr dike, diwê mal xirawo biray minê mezind vay tê. Ew ku hat te dixwe, min jî digirî diwe, çî dikê bike. Lawik diwê wele desperî min tawak nê, çî ku dikê tu bike. Keçik duwakî dixunî, lawik diwî dariki ulî, bixa jî diwî turlu turlu çîçeg bi darê va dizelipî.

Biray mezind tê, dora xa sêr dike ku kesik tunin. Sêr dike ku dariki ulf turlu turlu çîçeg vekiriye, diwê ya rebbî ez weçend li va gaz û çiyana digirim, min va dara rindik çiton nedî? Tere siya darê da rutînî. Rind ku vê êsiya radiwî şuva tere.

Dê sêr dike ku vay tek û tenê hat, diwê xanga te kanê? Diwê dayê dayê min kesik nedî. Tenê dariki ulf min dî, merû qimîşê neduwu ku lê sêrke. Diwê bêmirado, ew xanga te wû benî adêm va bûn.

Biray ortê diwê dayê dayê va çixa taway ra nawî, biskin ez herim xanga xa bigirim waynim. Biray ortê radiwî gavikî li vir, gavikî li wê dixinî. Keçik paş xa va sêr dike, diwê lo biray minê ortê vay gêşti me, me ra çarekî biwîn. Lawik diwê dest min da tawak nê, çi dikêse tu bike. Keçik duwakî dixunî, lawik diwî zevîki gêris, bixa jî diwî cutkarî, avê berdide ser zeviy, gêris avdide. Bira tê, mal bi xêr dî, xêr bi silamet. Diwê bira te qe kesik dî ku li vira rawurî? Keçik diwê na bira, kesik li vir ranewirî, min kes nedî.

Biray ortê jî şuva vedigerî tê, diwê dayê kesik li wê tunewu. Dê diwê te qe kesik li wê nedî. Diwê min tenê cutkarîk dî, ew jî garis av dida. Diwê xizir te zîffo be, ew xanga tebu.

Biray qıcik diwê dayê dayê vana çixa tawa yra nawin, tu biskin ez herim, xanga xa bigirim waynim. Radiwî dide bi gavan. Keçik sêr dike diwê lo biray minê qıcik vay hat, te dixwe min jî digirî diwe, zû çi dikê bike. Diwê ku çi dikê tu bike, desperî min tawa nê der. Keçik duwakî dixunî lîwik dike aş, bixa jî diwî aşvancî, gênim dihêrî, povikan çêdike. Biray qıcik tê, mal bi xêr dî, xêr bi silamet. Diwê bira qe kesikî ku li vira rawirî te dî? Diwê na bira, kesik li vir ranewirî. Min kes nedî.

Biray qıcik vedigerî tê ku ew jî tenê ye. Diya vana radiwî, pêşan li xa dipêçî, diwê xadê bela xa bide we ku un li pança mi da ketine, yan din ez herim xanga we bigirim waynim. Dide rê, wer tere, wer tere, wer tere ku, keçik sêr dike diwê mal xirawo, diya min vay tê. Ez ku xa bikim vizik ku duwêr va bizelipim jî diya min, min nas dike, digirî diwe. Lawik diwê wele çi dikê bike. Keçik duwakî dixunî lawik diwî sing xa li herdê va dikutî, keçik jî diwî marikî reş, xa li singva diçewirînî, serê xa dide ser sing, diskinî. Dê dorxo tê hemerê,

diwê keçê serê xa rake, keçik ranake. Dîsa diwê keçê serê xa rake, keçik dîsa ranake. Cara sisyan ku keçik serê xa dîsa ranake, diwê here here, tu heft salan li ax û zara mêr bimînî. Diwê, vedîgerî tê.

X. Kerika Xalînî

Hewuye tunewuye keçikik hewuye, dêki xa hewuye. Rokî li der ew keçika wû hevalênî xa dîlizin, yêk tirikî dike, yêk diwê serê biray minwî min nekiriye, yêk diwê serê xanga minwî ku min nekiriye, ew keçika jî diwê serê golika meyê henî beşikwî ku min nekiriye. Qîz li sêrî dixinin, diwên xalî li serê tewî, heft tene birayni te hene, tu seriy wan sond naxuy, terê li serî golika henî beşik sond duxêy.

Keçik digîrî tê mal. Diya xa diwê qîza min tu çima digîrî. Diwê dayê heft birayê min hewune, va rast e yan derew e, çima xewera min li wan tunin? Diya xa diwê herê qîza min, heft tene birayni te hene. Tu ku hînê qicik wûy, ew çuni melmeketê dûr. Cariki din venegerîn natin.

Diwê dayê werêse mi ra kerikiki xalînî çêke, ez herim ziyareta birayni xa. Dê tînî kerikiki xalînî vêra çê dike, diwê qîza min tu ku rêketî, va kerika te dorxo diwe ber deriy birayni te, rêva ku çuy ço ço ço biwê heta ber deriy biran. Yaman yaman, rêva çik rasti tê bila were, wer bike ku çoyîş newêy. Ku çoyîş biwêy va kerika dihêrifî. Keçik diwê tamam dayê, ez her timê ço ço ço diwê, qe çoyîş nawê.

Diya keçikê tînî kerikiki xalînî çê dike. Keçik li ser siyar diwî, dikevî rê, ço ço ço diwê tere. Êpêyî der ku tere sêr dike ku keviya rê altûnik dibiriqî, diwê biskin ez kerikê êglekim, wî altûnî bigirim, bem bidim birayni xa, bila şabin. Çoyîş ku diwê kerik dihêrifî. Keçik vedîgerî, digîrî tê mal.

Dê diwê keçê çi wû, tu çima şûva hatî? Diwê dayê hal û mecal wê tora, min li keviya rê altûnik dî. Min çoyîş go ku kerê êglekim. Ker hêrifî, ez jî şûva hatim mal ku tu kerikikî din mi ra çêkê.

Dê tîni kerikikî din vêra çî dike. Dîsa teme dike. Diwê dikê, yaman yaman çik û rasti te tê bila were, tu qe çoyîş mewê, timê ço ço ço biwê hetanî ber deriy birayni xa. Diwê tamam dayê.

Keçik li kerê siyar diwî, xêlik der ku tere, sêr dîke ku turlu turlu morî rijiyane keviya rê. Diwê kerê eglekim, wan moriyan topkim, bem belkî qîzêni birayni min hene, deziyan rakim, bikim dest û ustiyê wan, bila şabin. Çoyîş diwê ku kerê êgleke, ker dihêrifî, keçik dîsa digîrî tê mal.

Dê diwê dîsa çî wû? Diwê dayê hal û mecal ha, min li keviya rê hinik morî dîn, min çoyîş go ku kerê êglekim wan bigirim, ker dîsa hêrifî. Mi ra kerikikî din çêke, vê cara sozê min soz bî ku ez ê qe çoyîş newêm. Dê tîni kerikikî din vê ra çê dike. Diwê va son e, cariki din ku tu vê kera bihêrifînî, Endî te ra kerik merikan çê nakim. Tu ku rê va çûy, bavê te ku rasti te were jî tuyê çoyîş newêy. Keçik diwê dayê tamam, cariki din ez ê qe çoyîş newêm.

Dê kerikê çê dike. Keçik lê siyar diwî, rê va çî ku rastê tê qe çoyîş nawê, ço ço ço diwê dorxo tere ber deriy biran. Bira bervê tên, diwên tu xêr hatî, tu li ku têt, terê ku derê, tu kiy? Keçik diwê ez xanga we me, li mal têm, hatim ziyareta we. Bira şa diwin, tiweni mal, dikin mîvan. Heft bira jî xanga xa pir hez dikin, qedir û qiymetê didini wî.

Gel zeman gît zeman, çiqes wext ku radiwirî xadê pê bizanî, keçik gir diwî tê dew û çar dew û penc salanî. Heft tene amojinêni keçikê hewune. Vana li keçikê pir diqarên, qe lê hez nakin. Timê dipên ku halikî kotî waynin serê wî.

Rokî siwe da radiwin ser xa, kinc û kolêni xa top dikin terin beravê. Sîntilan didin ser, avê germ dikin, beravê dikin. Birayni keçike jî li zeviyni hemer pemû ajûtine, pemû wer bûye ku dide navê. Tam li germa beroy, çêlekî mêr diwînin, dikin nav vîdona avê ser qaonan dikin. Golikan ber didini nav pêmu, ban dikin, diwên xanga heft birano, golik ketine pemûya birano, diçêrin zeviy dikin wêrano.

Keçik derdikevî ber dêrî, sêr dike ku golik ketine nav zeviy, li germa beroy dipekê tere wan golikan li nav pêmu dike der. Diqefilî, li tiyan dişewitî. Tê cem bûkan, diwê bûkino ez li tiyan mirim tasik av bidin min, ez vexum.

Bûk tasa avê vêdişêrin, diwên tasa avê anda bûye, av jî ew e li vîdonê da ye, vîdonê bigir, wer li ser xa va ke, vexe. Keçik vîdona avê digirî ser xa va dike, vedixwe. Çilêy mêr jî tevli avê da daduqulunî, diwê bûkino min diştik daquland ema nizanim ev çik wû? Bûk diwên, tawak tunin, li te wer hatiye, ew ava pak bû.

Neyse terin mal, sê çar mehe ku radiwirin, zikê vê keçikê ro bi ro diperçifî, ro bi ro qalind diwî. Amojinêni keçikê biranra diwên, sêrkin xanga we kî çî zanî kê ra rabûye runiştîye, duganan ma ye. Navê we kiriye herdê. Zemanikî şûvatir zik tê ber poz. Wê sirê unê çiton derkevin nav millet? Çarekî ji vê duruma ra biwînin.

Birayni keçikê êvar ku diwî top diwin, biray qicikra diwên, bira siwe da rawe, xanga xa bigir cem xa, biwê xangê were hev ra herinê deşt û çîyan bigerinê. Bigir be, li çiyakî îsis bukuj, çîtika wî jî li xûna wî dake, mera wayn ku em bizaninê ew miriye, ancax wê wextê hundurê me ret diwî. Biray qicik diwê tamam.

Siwe da zû radiwî. Bani xanga xa dike, diwê xangê rawe, xa hazirke, hev ra herinê tenikî bigerinê. Xang radiwî ser xa, hazir diwî, diwê bira ez hazirim, haydê herinê. Radiwin, der dikevin, terin. Pir terin hindik terin Xadê pê bizanî. Têni çiyakî îsiz ku tê quy nake. Diwê xangê em pir qefilînê, were siya vê darê da dirêj wine, vê êsênê. Siya darê da ber hev ra dirêj diwin, keçik serê xa dide ser baskê birê xew da tere.

Keçik ku xew da tere, bira radiwî, dike ku keçikê bikujî, qîmîşê nawî. Diwê ez çîtika ser viya bigirim, du sê tene têr lêxinim, çîtikê xûna têran dakim. Birayni xa ra jî biwêm ku min xanga xa kuşt, çîtikê jî li van binêkim. Xanga min jî ku rabû. Ew nikanî rê bi derke, dityêzî tere.

Biray qicik çîtika xanga xa digirî, çûçikikî dikujî, çîtikê xûnê da dike, tê mal. Birayni din diwên bira te çî kir. Diwê birano min xanga xa bir li filan derê kuşt, hatim mal.

Neyse ew li wê bimînin, keçik xadisê ku ne bira heye ne jî kesik, li serê çiy tek û tenê ma ye. Biray xa ra nifiran dike. Diwê bira bira tu ku çuy diyarê malan, ningê te ra here usturiy maran, destê kesî newî derman, destê min biwî derman.

Radiwî ser xa, rêk derdikevî pêşî, dikevî rê, tere. Pir tere hindik tere Xadê pê bizanî, gundik derdikevî pêşî, tere nêzika gund li siya darikî da radimerdî ku tenikî vê êsê, qefiliye, xew da tere. Nêzika wê darê jî cutkarîk ga kirine cut, cut dike.

Çi qas wext ku radiwirî, cutkarî dibîzî ku du tene mar qeziyan dikin: Marê hundur diwê ku, marê der marê der were hundur ku dil heye, pişik heye, gurçik heye, kezew heye. Marê der jî diwê marê hundur marê hundur were der ku dar heye, gul heye, çîçeg heye, hawêr gul û gulustan e, dor bax û bostan e. Marê hundur diwê çî bikim, çîkik ar li mi rawana, min ew sincika ku tu li navday ar berdana, tu jî vêra bişewitiana. Marê der jî diwê ku, keşka sîlkey çel salanî li cem min hewuyana, min li wê keçikê bidana vexarin, tu biwuyana cîrim û cîrim. Keçik qeriyi te bavitana der.

Cutkarî wan maran gudarî dike. Her tiştikî dibîzî. Ku mar qeziyîni xa baş dikin tere keçikê xadisînî. Digirî diwe mal, Ji mal sîlkey çel salanî hewuye, wî sîlkey dide keçikê, keçik vedixwe, mar hundurê keçikêda cîrim û cîrim diwî tê der. Keçik xaş û xar diwî dimînî. Cutkarî wû keçikê dizewicin.

Ew li wê bimînin, em werinê biray keçikê qicik. Biray qicik ku tê mal, tiştik ning ra tere, kulik li ning derdikevî, li rûyê dunê doxtorikî nalî, tere. Çarekî ji wî kulî ra nawînî. En sonî diwê ez kerikikî bigirim, hinik jî çê wû xiraw bigirim, bavijim ser kerê, le siyarbim, gund û gund bigirim, tişt û taway bifiroşim, çerçîlixî bikim.

Kerikikî dikirî, diştê hûr û pûr jî dike heqîvê, davijî ser, lê siyar diwî, gund û gund digirî, balonan, tutikan, toqan, terlîgan difiroşî.

Çiqes are dikevî nav Xadê pê bizanî, rokî tere li gundê xanga xa derdikevî. Tere li meydanê gund, çê wû xirawê xa datînî, dişt û taway difiroşî. Mala xangê jî tam li hemerî wê meydanê wûye, xang li pençerê da sêr dike ku biray xay qicik ewê li meydanê axsatê dike. Bani lawê xay mezind dike diwê here wî çerçî ra biwê, xalo diya min diwê ku êvarî were li mala me biwe mîvan. Lawik tere diwê xalo xalo, diya min diwê ku îşevî li me biwe mîvan. Mêrik diwê mala we kîjane? Diwê mala me vayê hemer e. Diwê tamam, diya xa ra biwê ku tarî ket ez tîm li we diwim mîvan.

Êvar ku diwî mêrik tere deriy xangê dikutî, xang dêrî vedike, diwe odê, vê ra doşegikî datînî, li ser dide runişkandin. Tabî xang wî nas dike, ema ew xanga xa nas nake. Xang vêra azet û xizmetê dike, yêmegan hazir dike, nanê xa ku dixun, mêwetê dikin. Xang qezîkî li wir, qezîkî li wê tînî, diçerixînî tînî ser ningê birê. Diwê bira diwînim ku ningikî te seqet e, tu dikulêy, va derdê ningê te çike? Tu qe neçûy doxtoran? Wan qe çarek ji derdê te ra nedî?

Diwê wele xangê min li rûyê dunê da doxtor neliştin, loqman hekîm neliştin, kesik ji ningê mi ra newu derman. Min sêr kir ku çarek tunun, li vê kerika siyar bum, gund û gund digirim, çerçîlixî dikim.

Xang diwê ela gorey xa derxin, ez jî sêri birinê te kim. Diwê na xangê qe sêr meke, kul e, nê m û xûn tê da tere, hundurê te li hev dikevî. Xang tere ser, diwê tu veke ela ez carê sêrkim, belkî faydekî min li te diwî. Raser û rawerê digirî, axirî bira gorey xa tînî der, kulê ningê xa pas dike. Xang pê ning digirî, çiton ku destê xa têra dike, ew ninga diwî xaş û xar, tê tora berinî.

Ningê mêrik ku xaş diwî radiwî ser xa, tere destêni jinikê, diwê ew ku tu derdê mi ra bûy derman, tu vê dune wû wê dune xanga minî. Li viya şuvatir birakî te me, tu xanga minê axiretêy.

Ku wer diwê, jinik taplemekî li kûr da dixinî, diwê bêmirado bêmirado ez û te çixa xang û birayê hev û dunê. Ez xanga teyê heq im, xanga weyê heft biranim.

Bira wer ku şa diwî, li şawûnan digirî, diwê xanga min ku tu birî li wê yawanê da berdayîn, li wê wextê hetta nahanî ew kirina min li hundurê min da bû derdikî bêderman, qe li wê da derneket. Ez li kirinê xa pir poşman bum. Tu ku min ef dikê Xadê jî min ef dike.

Xang diwê bira sûç li te ninin, min zû va tu ef kirî. Sûç li amojinêni min e. Ez rasti îftiray wan hatime. Wan çêlikê mêr kirin nav avê, li min dani vexarin, ew mara ku zikê mi da gir bû, zikê min perçifî. We jî wer zan kir ku ez dugananim, te ez birim li derikî îp û îsiz berdâm, te ez nekuştim. Paşê ez rabumi ser xa, hatim li vî gundî derketim. Vê mêrika sîlkey çel salanî li min da vexarin, ew mara hundurê mi da kerî wû kerî bû hati der. Ez jî wî ra zewicîm. Va mêrê min e, vana jî zarûkeni min in, xarziyni tene.

Baskêni xa ser ustiy hev ra tînin, hevdu quc dikin, bi ken û kêf radikevin. Şev da radiwin, bira zavay xa wû xangê ra diwê hadê xa hazir kin, biraziyni min jî bigirin, kulî hev ra terinê cem şeş biran. Top diwin terin mala şeş biran her şeş bira jî ku xanga xa diwînin, şa diwin. Biray qicik diwê birano xanga me wê wextê halikî newuye, rasti îftiray amojinan hatiye. Jinêni me xanga mera îftira kirine, emê cezakî bidinê wan. Diwên tamam, en cezayê giran ku kîjan e emê wî cezay bidinê wan.

Bani jinêni xa dikin, diwên jinino, cezay we yan çel qatir e yan jî çel satir e, un kîjanî dixazin? Jin diwên em çel qatirî dixazinê. Tînin wan heft jinan li doça çel qatirê va girê didin, qatiran ber didini çiyar. Qatir wan li kevir û kuçan dixinin, cîrim û cîrim dikin, gewer diwin terin. Vana jî serikî ser ningva bûyni xa dikin, terin digêşin miradê xa.

Xadê merûy rind li îftiran biparêzî, koşekî jî me ra...

XI. Xizir û Sê Bira

Hewuye tunewuye mêrikikî kokimê feqîr û sê lawêni xa hewune. Ew mêrika, sat û wext tijî wuye, Xadê emenetê xa li ser helînay, nexaş ketiye, miriye. Hersu law li man e ortê. Mêrik feqîr wuye, ku ew mirî ye tawak li lawan ra nemayê, tî wû birçî ortê man e. Rokî, du ron, sê ron nav xênî da ku sikinîne biray mezind gotiye birano bavê me yê kokim mir çû wê dunê, em ji vê tora tazî wû rût manê li nav xênî da, werin em boxçeyni xa topkinê, derkevinê herinê diyarîkî dûr, bikevinê îşikî, bişuxulinê, zikê xa têrkinê. Biray ortê wû biray qicik jî diwên herê bira em tora gotina te bikinê.

Radiwin ser xa, tişt û taway xa top dikin, dikini boxçan, hersu rê dikevin terin. Pir terin hindik terin Xadê pê bizanî, mêrikikî kokimê rû sipî derdikevî pêşiya van, diwê mal bi xêr dî oxil; ew diwên xêr bi silamet kalo. Diwê oxil va xêre, un li ku tên, ku va terin? Hersu bira diwên wele kalo hal û kîfat ha ku ha. Bavê me yê kokim mir, feqîr bu, me ra tawa nelişt, em jî li mal derketinê, me go herinê li diyarîkî îşikî bîwîninê, bişuxulinê, zike xa têrkinê. Rû sipî diwê, diwî

ku ez jî we ra biwimi heval? Diwên ew çiton qeziye kalo, tabî ku hevaltiya te li ser serê me. Rû sipî wû hersu bira hev ra diwini heval, dikevini rê terin.

Bir terin hindik terin Xadê pê bizanî, têni deştikî ku ove ye, yazîkî fereyê sêrang e, ortê da çengik av tere. Biray mezind sêri dora xa dike, hundurê xa heldikşînî, diwê aax ax. Rû sipî diwê çike oxil, te çima hundur helkişand? Diwê kalo keşka va yaziya ê min wî, bax û baxçe wî, navda xanîk çêkirî wî, jinikî min jî hewî, ez û wî wû xizmikaran va vira da yaşamîş binê. Va dera biwî urdê min.

Rû sipî diwê hadê bila wer wî, tora gotina te wî. Ew dera diwî bax û baxçe, qonaxik jî nav da derdikevî. Diwê here, va dera viya şuvatir ê te ye, weki gotina dilê xa tê da yaşamîş we.

Biray mezind li wê bimînî, her du bira wû rû sipî riya xa va terin. Pir terin hindik terin Xadê pê bizanî, têni etega çiyar ku her derik ga ye, gul û gulustan e, wîli wîla têr û tûran e. Biray ortê hundurê xa heldikşînî, diwê aax ax. Rû sipî diwê çike oxil, tu çima hundurê xa heldikşînî, dikê ax û ax? Diwê çi bikim kalo, diwê keşka va mêrgana ê min wana, bêl û bêl miyê min hewuyana, qonaxik li vira batana çêkirin. Ez û jinikê va, çar pênc tene jî şivan, min va dera xa ra bikirana urd.

Rû sipî diwê hadê bila werwî, tora gotina tewî. Li wê derê qonaxik tê çêkirin, Surî wû surî mî derdikevin, şivan jî van miyan ber didini nav çêre. Diwê here, va dera viya şuvatir ê te ye, weki gotina dilê xa tê da yaşamîş we.

Biray ortê li wê bimînî, biray qicik û rû sipî riya xa va dewam dikin terin. Pir terin hindik terin Xadê pê bizanî, biray qicik ne hundurê xa dikşînî ne jî ku tawakî li rû sipî dixazî.

Rû sipî diwê oxil qe miradikî te tunun, tu ji min bixazî, ez miradê te jî bikim? Birayni te miradêni xa gotin, min anî şûndê. Tu jî miradê dilê xa biwê.

Biray qicik diwê kalo miradê min ew e ku Xadê keçikikî şîr helal rasti minke, ez û wî bizewicinê, cutik gayê min hewî, nehe dehe dolim erazi min hewî, du sê çavî xaniyê min hewî; ez û jina xa cutkarîlixî bikinê, mutaci kesî newinê bes e, wekî din tawakî naxazim.

Rû sipî diwê hey vaxî hey, oxil te ez deriki teng da pê girtim, li rûyê dunê tek keçikiki şîr helal heye, ew jî evî bûy dagirtine dizewicî, emê zû herinê, heta ku neketiye gerdegê, wî birevîninê, te ra wayninê.

Biray qicik diwê kalo çi dikê bike. Rû sipî diwê oxil çavêni xa bide hev, lawik çavan dide hev; diwê oxil çavêni xa veke, lawik çavan vedike ku li diyarikî xam in, li gundikîne. Miletê gund, bûy dagirtine dilîzin, ketine gowendê. Rû sipî diwê oxil qaytê ew keçika şîr helal ewe, ew pêringa ku darxistine, li paş wê pêringê ye. Emê kesiyar ra nexangênê, herinê wî birevîninê.

Sir diwin, terin bûkikê li paş pêringê digirin yala... Wext li wê wextê, sat li wê satê, terin şûnda ku biray qicik mirad xastiwû li wê derdikevin. Biray qicik sêr dike ku xanîkî qicik li wê hatiye çêkirin, cutik ga li ber dêrî girêdayî ye, dunya diwî ê xa.

Rû sipî wan hev ra nîkê dike, dizewicînî. Diwê oxil min miradê we hersu biran anî şûndê, Xadê viya şuva xêrê wû dorxolixî bi we de, hadê xatirê we. Rê dikevî tere. Meger ku va Rû sipiya Xizirê ku diwên ew e. Ema ew birana nizanin ku ew Xizir e. Zeman ku dikevî nav bîr dîkin terin.

Neyse ew li wê bimînin, arê da ku pênc şeş sal radiwirin, rokî ew birana tîni bîra Xizir. Diwê zemanikî li filan derê ez rasti sê biran hatiwûm, ew pir bêkes û feqîr wûn, min miradê wan kiriwû. Ela herim biwînim wan ew eyîlixiya heq kirine yan heq nekirine? Sir diwî tere li nav milkê biray gir derdikevî. Dikevî tonê merûkî kokimê nexaş, du sê kurtikan li xa dipêçî, dinalê dizîwê tere deriy qonaxê dikutî.

Xizmîkar tê dêrî vedike, sêr dike ku kokimikî nexaş li ber dêrî ye, li nav kul û birînan da ma ye, nal û nal e. Diwê kalo çike, tu çi dixazî? Diwê oxil qe pirs meke, ez rasti derdikî bêderman hatime, çum kujan doktorî derdê mi ra derman nedîn. En sonî rasti loqman hekîmikî hatim wî mi ra go ku îlaçê derdê te tiriy reş e, tu ku tiriy reş bixoy, nexaşiya te radiwirî, gûşîk tiriy reş didê min?

Xizmîkar diwê kalo ez emir qulî me, herim axay xa ra biwêmb bila were, tu derdê xa wî ra qezîke.

Tere diwê axa kokimikî nexaş hatiye dêrî derdikî xa heye ewê te ra biwê. Biray mezin tê dêrî. Diwê çike barsacî, tu çikê li min dixazî?

Xizir diwê oxil qe pirs meke, ez rasti derdikî bêderman hatime, çum kujan doktorî derdê mi ra derman nedîn. En sonî rasti loqman hekîmikî hatim wî mi ra go ku îlaçê derdê te tiriş reş e, tu ku tiriş reş bixoy, nexaşiya te radiwîrî, gûşîk tiriş reş didê min? Loqmey Xizir bî, ez buxum derdê mi ra biwî derman.

Diwê hadê siktir! Bêmiradê firî, tiriş sipî vî dest ketiye, ca tiriş reş dixazî. Basaciy derewçîn, tiriş reşê ku bidim te tunun. Siktir we here.

Xizir diwê bila wer bî, madam ku wîrêye, wê vextê eskî yerine diwê sir diwî tere. Biray mezind sêr dike ku şûnda xayê berênî ye. Ew dera ku ax kişandiwû li wê derê tek û tenê ma ye. Dike ax û vax. Diwê min nezani ku ew Xizirbu, poşman diwî ema pere nake.

Ew li wê bimînî, Xizir tere li ber deriy biray ortê derdikevî. Avîne, germa beroy, sêr dike ku şivanan mî kirine garê, miyan didoşin. Dîsa tonê xa vedigorî, xa dide nexaşi, kurtik pirtikan bi ser xa va dike, tere diwê mal bi xêrdî şivanino, Xadê bereketê bide. Ez pir nexaşim, li doxtorêni heyî tuneş gerîm mi ra gotin ku çareşê va nexaşiya te şîrê miya reş e. Xêra bavê xa dikin li şîrê miya reş bardaxik şîr bidin ez vexum.

Şivan diwên wele apo em emir qulî nê, biskin xewerê bidinê axay xa, tu derdê xa wî ra biwê, belkî ew bardaxik şîr dide te.

Terin xewerê didin axê, tek û biray ortê ye. Tawî Xizir ton vegortiye, nas nake. Diwê çike kokimê jar, te çima bani min kir?

Xizir diwê oxil tu li qisûrê min nemînî. qe pirs meke, ez rasti derdikî bêderman hatime, ku çum kujan doktorî mi ra gotin ku îlacê derdê te şîrê miya reş e, tu ku şîrê miya reş vexoy, nexaşiya te radiwîrî. Li şîrê miya reş bardaxik şîr didê min? Loqmey Xizir bî, ez vexum derdê mi ra biwî derman. Risqê te jî ku yêk bû biwî hezar.

Biray ortê pustumekî dide Xizir. Diwê hiş, duwayni xa xa ra bike. Parsaciyê pîs, şîrê miya sipî bi dest ketiye ca şîrê miya reş dixazî. Şîr mîrê ku bidim te tunun, here qotikê vexe. Bikiş, siktir we here, cariki din jî mê van

dorana. Şivanan ra jî diwê pê pîst bigirin bavijin der, cariki din jî êni tora vî nêziki deriy min mekin.

Xizir diwê oxil tu jî? Bila wer bî, madam ku wêtirêye, wê vextê eskî yerine diwê sir diwî tere. Biray ortê sêr dike ku şûnda xa yê berênî ye. Ew dera ku ax kişandiwû li wê derê ye. Biray mezind jî li cem e. Her du bira hevdu hemêz dikin. Diwên me nezanî ku ew Xizir bû, poşman diwin ema pere nake, tiştê ku rawurî şûva nê.

Neysel ew li wê bimînin, Xizir tere ziyareta biray qicik, li nêzika xaniy wan derdikevî. Avîne, germa beroy. Dîsa tonê xa vedigorî, xa dide nexaşî, xûn û nêmi di kul û birinan da tere. Kurtik pirtikan bi se xa va dike, Dike nal û nal, giran giran ber vi mala biray qicik va tere. Jinika biray qicik jî sîntil bi xa da kirine tere avê. Sêr dike ku kokimik wê va tê, dinalê, dizîwê. Kinci kol di nav xûn û nêmi da mane. Sîntilan datînî kanî, dipekê, ber vi rû sipiyê kokim tere. Diwê wûy kalo kalo va çi halê te ye? Zû were pişta min, te bemi mal. Xizir diwê na qîza min, ser û guy min kulî xûn û nêmi e, qilêr e, va qutnî wû qumaşê ser te ra gune ninin tu min piştê? Kincêni te qilêr newin, ez bi xa tîm ku diwê, jinik Xizir davijî ser pişta xa, digirî diwe mal, qatik cil vê ra datînî, kincêni ser vedigorî, kul û birinan pak dike, bi azet û xizmetê êvar dike.

Ku êvar diwî biray qicik tê mal, li ber dêrî tişt û taway xa datînî, jinik derdikevî der, diwê mêrik mîvanikî me heye li mal. Diwê jinik kî ye mîvanê me? Diwê mêrikikî kokimê rû sipî ye. Wer nexaşe wer nexaşe ku bi zorê li rê va dihat, min li te bêxewer ev anî li mal kiri mîvan, kinci kolê wî min vegortin, şuştin, birînêni wî pak kirin, pêçan. Tu newî newî ku hêrskevî. Diwê na jinik, ez çima hêrskevî? Te pir rind kiriye, Xadê ji te razî wî, Xadê xêra te qewûlke.

Têni hundur, biray qicik diwê kalo tu xêr hatî, hevdu xoş û bêş dikin. Nanê xa ku dixun dikevin mêwetê, qezîk li vir tê qezîk li wê, biray qicik diwê kalo tu pir nexaşî, va nexaşiya te çike? Tu qe neçûy doxtoran, çarekî nexaşiya te qe tunun, doxtor te ra çi diwên?

Xizir diwê oxil qe pirs meke. Min li rûyê dunê doxtor neliştin, doxtor û doxtor geriyam. Çarekî nexaşiya min heye, ema pir bi baye. Ew îlaca li rûyê dunê bînde bîr tê diyîn. Jin û mîr merex dikin, diwên ela biwê belkî li me tê

diyîn. Ew çiton îlac e tu ji me ra biwê. Diwê na oxil ez wî îlacî ji we ra nawêm, qe mêni ser min. Vana terini ser, yaxê bernadin. Diwên îla ku tuyê me ra biwêy.

Xizir yaxa xa xelas nake, diwê ku bi doktoran gore îlacê nexaşiya min zarûkî şeş mehaniye. Ku zarûkî şeş mehanî şerjêkin, xûna wî birînênî mi ra kin, ez xaş û xar diwim, gênclixiya min şûva tê, têmi dew heft dew heyşt salanî.

Zarûkî vana yê şeş mehanî hewuye. Jin û mêr seri hev dikan, terin der. Biray qicik diwê jinik tiştik hati aqilê min nizam te ra biwêm, newêm? Diwê mêrik biwê biwê ewê ku hat aqilê te hati aqilê min jî, tu biwê. Diwê jinik zarûkî me yê şeş mehanî heye, were em wî şerjêkinê, xûnê li mîvanê xa ra kinê, wî li vî derdî xelas kinê. Em hînê gêncinê, Xadê ku xast nêçe zarûkan dide me. Jinik diwê tamam mêrik were em tora gotina te bikinê. Mera jî rama Xadê pire.

Digirin wî zarûkê şeş mehanî şerjê dikan. Xûnê li Xizira dikan, orxanê dikşîni ser. Wî qundaxî jî tînin dikan bêşîgê, diwên siwe da zû rawinê, gundaxe benê, mezelikî vêra bikolinê, bikinê mêzel, helîninê.

Terin dikevin cila xa, radikevin. Şev da zû radiwin ser xa ku meyîtê wî zarûkî ben helînin, pêç li ser heltînin ku lawik li bêşîgêda lorîkan dike, xaş û xar e qe wekî berêniye.

Sêri rûy hev dikan, ecele terin ew oda ku kal raketiye ku kal bûye têrîjiki kesk û sor di pençerêda derdikevî. Rawer û raserê digerin, diwên me hînê zanî ku tu Xizir î, tu mere, şûnda te li ser serê me ye, çiton ku dikan nefîle ye.

Xizir diwê oxil min dî ku emegê min neçûye boşê. Xadê weçendî din bide we, un li ser kevirê hişk runin Xade we da bibarînê diwê sir diwî tere.

Biray qicik jina xa wû zarûkênî xa va xaş û delal yaşamîş diwin terin. Xizir her timê li cem merûyê rind wî.

XII. Dapîr û Rivî

Hewuye tunewuye jinikiki kokim hewuye, mangeki xa hewuye. Jinika kokim rokî mangê didoşî, şîr dike tencikê, datînî dolawê. Siwe da radîwî, sêr dike ku şîr tunin. Rokî wer, du ron wer, roy sisyan diwê ela biskin ez êvarî xa li

paş dêrî veşêrim, va kî ye tê şîrê min vedixwe? Êvarî kêrikikî digirî dest xa, dikevî paş dêrî xa vêdişêrî. Sêr dike ku rivîk hat şîrê heyî tuneşêrî kulî vexar, tam ku derkevî der, jinik kêrê davijî, doçika rivî dibizdînî, digirî. Rivî xa davijî der, sêr dike ku doçik li dest dapîrê da ma, vedigerî, diwê dapîrê dapîrê doçika min bide min, ez herim nav êl û qumê xa. Dapîr diwê tu sê rone şîrê min veduxêy, here şîrê min wayn, ez jî doçika te bidim te, tu here nav êl û qumê xa.

Neyse, rivî radiwî tere cem bizinê diwê bizinê bizinê şîr bide min ez wî şîrî bem bidim dapîrê dapîr jî doçika min bide min, herim nav êl û qumê xa.

Bizin diwê tu here hindik çilo mi ra wayn ku ez wî bixum, şîr bikevî ganêni min, ez şîr bidim te, tu bey bidê dapîrê.

Rivî tere cem darê, diwê darê darê hindik çilo bide min, ez wî çiloy bem bidim bizinê bizin jî şîr bide min, wî şîrî bem bidim dapîrê dapîr doçika min bide min, herim nav êl û qumê xa.

Dar diwê tu here hindik av mi ra wayn ku ez wî vexum, pelgêni min vewin, ez çilo bidim te, tu bey bidê bizinê.

Rivî tere ser kaniyê, diwê kanî kanî hindik av bide min, ez wê avê bem bidim darê dar çiloy bide min, wî çiloy bem bidim bizinê bizin jî şîr bide min, wî şîrî bem bidim dapîrê dapîr doçika min bide min, ez herim nav êl û qumê xa.

Kanî diwê tu here qîza padîşê wayn li ser min bîlîzî ku ez avê bidim te, tu bey bidê darê.

Rivî tere qîza padîşê ra diwê qîza padîşê, qîza padîşê çî diwî were li ser kaniy bilîz, kanî avê bide min. Ez wê avê bem bidim darê dar çiloy bide min, wî çiloy bem bidim bizinê bizin jî şîr bide min, wî şîrî bem bidim dapîrê dapîr doçika min bide min, ez herim nav êl û qumê xa.

Qîza padîşê diwê tu here morî wû mircanan wayn, ez wan bikim dest û ustiy xa, xa bixemilînim, werim li ser kaniy bilîzim.

Rivî tere cem çerçî. Diwê çerçî çerçî morî wû mircanan bide min. Wan morî wû mircanan bem bidim qîza padîşê, qîza padîşê wan di dest û ustiy xa da ke, xa bixemilînî, were li ser kaniy têr bilîzî, kanî avê bide min. Ez wê avê bem

bidim darê dar çiloy bide min, wî çiloy bem bidim bizinê bizin jî şîr bide min, wî şîrî bem bidim dapîrê dapîr doçika min bide min, ez herim nav êl û qumê xa.

Çerçî diwê tu here mi ra hêkan wayn, ez jî morî wû mircanan bidim te, be bide qîza padîşê.

Rivî tere cem mirîşkê. Diwê mirîşk mirîşk hêkan bide min, wan hêkan bem bidim çerçî, çerçî morî wû mircanan bide min. Wan morî wû mircanan bem bidim qîza padîşê, qîza padîşê wan di dest û ustiy xa da ke, xa bixemilînî, were li ser kaniy bilîzî, kanî avê bide min. Wê avê bem bidim darê dar çiloy bide min, wî çiloy bem bidim bizinê bizin jî şîr bide min, wî şîrî bem bidim dapîrê dapîr doçika min bide min, ez herim nav êl û qumê xa.

Mirîşk diwê ku tu here mi ra hindik genim wayn, ez jî hêkan bidim te, tu bey bidê çerçî.

Rivî tere cem pêtaga gênim (Berê li rixa mangan pêtagêni gir çedikirin, genim dikirin wan pêtagan). Diwê pêtag pêtag çengik genim bide min, ez wî genimî bem bidim mirîşkê, mirîşk hêkan bide min. Wan hêkan bem bidim çerçî, çerçî morî wû mircanan bide min. Wan morî wû mircanan bem bidim qîza padîşê, qîza padîşê wan di dest û ustiy xa da ke, xa bixemilînî, were li ser kaniy bilîzî, kanî avê bide min. Wê avê bem bidim darê dar çiloy bide min, wî çiloy bem bidim bizinê bizin jî şîr bide min, wî şîrî bem bidim dapîrê dapîr doçika min bide min, ez herim nav êl û qumê xa.

Pêtag diwê biray rivî, sêrêke, der û berê min hawêr qelişîne. Tu here tenik rix wayn, va qelişêni mi rake, wan qelişan kapanke, ez jî çengik genim bidim te.

Rivî tere axurê gan, diwê gawo gawo tenik rix bide min. Wî rixî bem li pêtagan ra kim, qelişêni wan pêtagan dûzkim, pêtag çengik genim bide min, wî genimî bem bidim mirîşkê, mirîşk hêkan bide min. Wan hêkan bem bidim çerçî, çerçî morî wû mircanan bide min. Wan morî wû mircanan bem bidim qîza padîşê, qîza padîşê wan di dest û ustiy xa da ke, xa bixemilînî, were li ser kaniy bilîzî, kanî avê bide min. Wê avê bem bidim darê dar çiloy bide min, wî çiloy bem bidim bizinê bizin jî şîr bide min, wî şîrî bem bidim dapîrê dapîr doçika min bide min, ez herim nav êl û qumê xa.

Ga diwê tu here çalik ka mi ra wayn, bike afirê min, ez bixum, rixê bikim, tu bigir be qelişêni pêtagan pê wê rixê dûzke.

Rivî tere kadînê, diwê kadîn kadîn çalik ka bide min. Wî kay bem bidimi gan, ga rixê bidin min, rixê bem qelişêni wan pêtagan ra kim, pêtag çengik genim bide min, wî genimî bem bidim mirîşkê, mirîşk hêkan bide min. Wan hêkan bem bidim çerçî, çerçî morî wû mircanan bide min. Wan morî wû mircanan bem bidim qîza padîşê, qîza padîşê wan di dest û ustiy xa da ke, xa bixemilînî, were li ser kaniy bilîzî, kanî avê bide min. Wê avê bem bidim darê dar çiloy bide min, wî çiloy bem bidim bizinê bizin jî şîr bide min, wî şîrî bem bidim dapîrê dapîr doçika min bide min, ez herim nav êl û qumê xa.

Kadîn diwê va xaliy ser tewanê min qelişîye, şilî ku barî dilop li ser kay mi ra tîn, va kay hundurê min şurmîş diwî. Tu here ser min loxke, wan dilopan bide birandin, çalik kay xa bigir be.

Rivî darloxê digirî tere ser kadînê lox dike, dilop tîni birandin. Tê çalik kay xa digirî tere, diwe dide gan, ga jî rixê didin wî. Rixê diwe qelişêni pêtagan ra dike, pêtag diwin weki berinî, pêtag jî çengik genim didin rivî. Wî genimî diwe dide mirîşkê, mirîşk jî hêkan didî. Wan hêkan diwe çerçî ra, çerçî morî wû mircanan didî. Wan morî wû mircanan diwe dide qîza padîşê, qîza padîşê wan di dest û ustiy xa ra dike, xa bixemilînî, tê li ser kaniy dilîzî, kanî jî avê dide rivî. Wê avê diwe dike koka darê dar çiloy didî, wî çiloy diwe dide bizin dixwe, şîr dikevî ganan, bizin jî şîrê xa didî, wî şîrî digirî, diwe dide dapîrê, dapîr doçika doçika rivî tîni ku bi morî wû mircanan xemilandiye, merû qîmîşê nawî ku sêrêke.

Rivî doçika xa digirî, xa da dike, ber vi mixarey xa dadiwirî tere. Cîranêni xa, ew riviyni din derdikevin der, sêr dikin ku rivî va ye jurda tê, doç xemilandiye kiriye xampul, Qîmîşê nawin ku sêrêkin.

Diwên biray rivî, te çiton kir ku va doça te vê tora bû? Va çi rindikiya doça tey? Sirê xa mera jî biwê, Em jî tora gotina te bikinê, doçikêni me jî weki doçika te biwî xampul û rindik.

Riviy derewçîn wan riviyni din kuliyan topi dora xa dike, diwê werin ku ez sirê doçika xa we ra biwê.

Diwê va nala ku li binî me da radiwirî tere, li wê nalê golikî kûr heye. (Hewa jî sar e, meha payîzê paşîn e, aw dicemidin). Ez êvar da çûm ketim wê golê, hetta siwe tê da mam, siwe da derketim ku doçika min vê tora bûye.

Ew riviyni din kulî terin êvarî xa davijin golê, heta siwê tê da dimînin, nav avê da dicemidin diwin weki êzik, gewer diwin terin. Riviy me yê derewçîn jî tere kunêni wan riviyan ku çiqe erzaq heye, top dike tînî kuna xa, hetanî barê dixwe sêri kêfa xa dike.

Xadê neheqan li me dûr be, wan meke derî wû qapûyê me.

XIII. Gul Qizî Elma Qizî Mircan Qizî

Hewuye tunewuye jin û mêrikî hewune. Mêrik pir fena wuye. Wer fena wuye ku olecax û nekirî li ser jinikê da aniye. Roy xadê qatik çu daye jinikê, kirfîyni dunê vê ra kiriye. Jinik li soxinî damîşi vê heqereta newuye, xa xa ra gotiye ku ez di vê mala da derkevim herim, li cem merûkî biyanî bêslemetî bikim, sed qatî li viya rindtir e.

Siwe da zû radiwî, tişt û taway xa top dike, dide rê. Ku pir tere hindik tere xadê pê bizanî, rasti nalikî tê. Li ber nalê rutinî, vêdisê, dest û rûy xa dişûy. Sêr dike ku çar pênc deqan da carikî mircanik li avêda tê. Satikî du satan li wê rutinî, girmikik mircanê xa top dike, radiwî dîsa dide rê. Pir tere hindik tere xadê pê bizanî li ber êvarî rasti qonaxikî tê. Xudiy wê qonaxê jî axakî şîrhelal e, jinika xa miriye, qîziki xayê heft heyşt salanî heye, yêk jî jinikiki kokim heye, azet û xizmeta wê keçikê dike, nav wê qonaxê da hersu hev ra yaşamîş diwin terin.

Jinik tere deriy qonaxê dikufî, ew jinika kokim dêrî vedike, diwê boyir, tu kiy, çikê dixazî? Jinik diwê ez bêkes im, kesikî min tunun, wer digirim ku li derikî xa sitarekim, qapûkî bêslemetî bikim, parîk nan ku dani min bixum. Bêsleme ku li we lazim e, her îşik desberî min tê, ez li vira bişuxulim. Jinika kokim diwê tu li vira biskin, ez herim li axê pirskim, belkî êtaca me li te diwî.

Jinik tere hizûrê axê, diwê axa jinikik hatiye dêrî, kesê xa tunun, li îş digerî, ez endî bûme kokim nikanim îş bikim, wê jinikê jî bigir îş, nav malê da xa

ra bigerî, temîzlixî bike, azet û xizmeta te wû qîza te bike. Axa diwê hay hay, bila were, viya şûva tu xizmeta min dikê, ew jî xizmeta qîza min bike. Em her çar hev ra yaşamîş diwinê terinê.

Neysel, wê jinikê digirin hundur, odakî pê bine dikin, Axa diwê ku viya şûva tu jî ferdikî vê malayî, tu li vê oda rawe rûnî, azet û xizmeta qîza min bike, ema wer bike ku dilê qîza min nehêrifî, tu yê her xastinikî qîza min waynî şûndê. Jinik diwê tamam, bila tora gotina tewî axay min.

Jinik li wê bêslometî dike, sêri îş û karê xa dike, wer qayti wê keçikê dike ku keçik ro bi ro boy davijî, kîlo digirî, rindik diwî, jinikê bir hezdike. Jinik û keçikê diwin weku dê wû qîz. Çend sal ku radiwirin, keçik tê de wû sê, de wû çar salanî, rokî jinik porê keçikê şedike, ew mircanana têni bîrê, tere wan mircanan porê keçikê ra dike, dixemilînî. Ew jinika kokim jî sêr dike ku va keçika ro bi ro li xa dûr dikevî, wê jinika din ra nêzik diwî, xa xa ra diqarê. Diwê ez çiton bikim ku halikî waynim serê vê jinika?

Tere cem keçikê diwê qîza min va mircanana te li ku top kirin li porê xa da kirin? Keçik diwê bêslema min dani min. Jinik diwê keşka li va mircanan xelik hewuyana, te dest û ostiy xa da kirana, wê sirê rindikiya te qat û qat zêde diwî. Diwê dapîrê ez weçend mircan li ku biwînim dest û ostiy xa da kim. Diwê ê ku girmikik mircan anî çalik mircan jî tînî. Tu bêslema xa ra biwê ew tere tînî.

Keçikê diperçifînî dişînî cem bavê. Keçik tere hizurê bavê, diwê bawo ez li va mircanan çalik mircan dixazim, bêslema min bişîn bila here mi ra çalik mircan waynî.

Axa bani bêslêmê dike, diwê terê li va mircanan çalik mircan tînî wayn, naynî serê te lêdixînim.

Bêslême çalikî xa digirî, rê dikevî tere dera ku ev mircanana top kiriwû tere wê derê. Li ber nalê rûtinî, çar benc deqan da carikî mircanik avê da tê, diwê vî halî ez mehekî da ancax çalik mircan top dikim. Ez rawim li ber avêra herim, çaviya mircanan biwînim, çalika xa tijîkim herim mal.

Ra diwî ser xa, ber avê ra giran giran heldiwirî bejor tere. Tê derikî ku dora nalê sada qewax û biye, sêr dike ku li binî bîkî jinikik serjê kirine, ostu

birîne, li wê birînê xûn tê, dilopa xûnê ku diweşî avê, diwî mircan dadiwirî tere. Jinik diwê vê îşa da îşik heye, ez xa vêşêrim ela biwînim va çi îş e.

Dikevî paş koka bîkî xa vêdişêrî. Êpêyî wext ku radiwirî sêr dike ku dêwik li nav daran da derket, hat li bîkî da şivikik jêkir, anî ostiyê jînikê ra kir, jînik xaş û xar bu, rawû ser xa.

Bêsleme şaş diwî dimînî. Neyse, ew dêwa wû jînikê ken û kêfa xa dikin, xêlik wext ku hev ra radiwirînî dêv radivî ser xa, dîsa tere li wê dara biyê şivikikî jêdike, tînî ostiy jînikê ra dike, jînikê şerjê dike, dirêji ser avê dike, nav daran da anda diwî tere.

Dêw ku tere bêslême radiwî ser xa, tê li wê dara biyê şivikikî dibizdînî, tînî ostiy jînikê ra dike, jînik xa tê, diwê keçê mal xirawê meskin, rawe bazde, xa bixelisîn. Hev ra baz didin, xêlik der ku tèn, bêslême diwê keçê keçê ez li ser derdê te ketim, min sewewê hatina xay vira bîrîr. Jinik diwê sewewê hatina te çik bû ku? Diwê ez li cem axakî bêslêmetî dikim. Axa ez şandiwûm ku mircanan topkim bem qîza axê ra, min mircan topnekirin, nika ku çûm mal axa serê min lêdixinî. Jinik diwê metirs metirs vay ku li cem tey mircan qizî ye, yêter ku tu mircanan bixaz, xastin li te, mircan li min, hadê herinê.

Vana rêdikevin tîni mal, bêslême jînikê diwe oda xa, jînik destê xa ku kura dike diwî tijî mircan. Bêsleme siwe da ku diwî wan mircanan digirî diwe dide qîza axê. keçik xa li mircanan dixemilînî, merû qîmîşê nawî ku lê sêrke, li şawunan tere ostiy bêslêmê dipêçî, gepan paçî dike, ew jînika kokim deha zêde qar tê.

Tere cem keçikê, diwê qîza min va çi rindikî ye li te, va mircanana çiqes yaqîşmîşi te bûne, ema hîne tiştik li te kê m e. Keçik diwê tiştê ku li min kê m e çike dapîrê? Ela biwê wî jî bikinê tamam.

Diwê tu li kê kêmtirî ku li ber deriy te baxçekî gulan tunun. Nika ku ber deriy te baxçekî gulan hewî, tu li vê rindikiya xa va herê nav gulan da bigerî, xelk ayîl û mayîla rindikiya te wî, kotî diwî? Keçik diwê lê dapîrê kî mi ra baxçey gulan hazir dike? Ez gulan li ku biwînim? Hadê min gul dîn, kî qayti va gulan dike? Dapîr diwê, te diğo kesik tunun ku mi ra mircanan jî waynî; qaytê, besleme

çû te ra mircan anîn kiri deyra. Tu beslemê ra biwê ew te ra gulan jî tînî, qayti gulan jî dike.

Çeçik tere cem bavê, diwê bawo ez li ber deriy me baxçekî dixazim ku tê da turlu turlu gul hewin, nav da turlu turlu têr bixûnin, ez li nav gulan da bigerim, xandina wan têran gudarikim. Axa diwê qîza min tu diştê newunê li min dixazî, va xastina te ez çiton waynim şûnde? Çeçik diwê tu beslemê ra emirke, ew emirê te nahêrifînî, vî îşa hal dike.

Axa bêblemê dixazî hizûrê xa. Diwê vê wû wê nizanîm, ez siwe da rawim ku ber deriy me bax û baxçe ye, nav gul û gulustan e, wîl û wîla têran e. Emirê min tînî şûndê wayn, naynî şûndê serê te lêdixinim.

Bêleme pozxûn pozxûn vedigerî tere oda xa. Mircan qizî diwê xangê çi wû, tu çima weçend pozxûnî? Diwê hal û mesele ha ku ha, siwe da axa serê min lêdixinî. Diwê tu were rûnî sêri kêfa xa ke. Heta siwe ra ma xadê pir e, ê ku mircan anîn gulan jî tînî.

Hînê şefaqê ku avêt, diwê xangê rawe, here ew dera ku te ez anîm, here wê derê.

XIV. Axcîxan

Axcîxanê, Axcîxanê

Çav doxanê

Deyaxa dilanê

Fera juniyanê

Hingiva tas û tewaxanê

Li ber beg û axanê

Wuy dilî, wuy dilî

Sewgulî dilî

Ezo çûmi Kulan

Hatimi Lolan

Gerîm li çol û golan
Çûmi diyarê Demenan
Min dî ku jin top bûne li ber malan
Rîs dirêsin giran giran
Wuy dilî, wuy dilî
Sewgulî dilî

Min dî ku yêk li nav wan e
Birû qelem û çav doxan e
Min nav pirs kir,
Gotin ku Axcîxan e
Min go, lê lê,
Axcîxanê, Axcîxanê
Çav doxanê
Deyaxa dilanê
Fera juniyanê
Hingiva tas û tewaxanê
Li ber beg û axanê
Wuy dilî, wuy dilî
Sewgulî dilî

Jin top bun
Ez girê dam bi qejiyan
Min xistin li pê tox teşiyan
Didan li devê mi da weşiyen
Jinikî xa ser mi ra girt,
Jina hesî Balikan,
Hay qiri bav û kalikan
Go jinino lê mexinin,
Va Husênê Qurêş û Bamasurî ye,
Li ku nifir kiriye, nifira xa biriye.
Wuy dilî wuy dilî
Sewgulî dilî.

XV. Zerê

Jurda têye giran giran
Ordega minê nav çadiran
Qedirê te li cemin wer ku pir e
Ne didimi bavan ne didimi biran.

Lê lê Zerê, Zera minê
Bostana minê av li binê
Tu ku tunî ez jî tunim,
Kesik tunin li ruyê dunê

Te go tî me, min go tî me
Ez kaniya orta dî me
Ez li rindan qayîl newum,
Li kotiyên hesilî me

Lê lê Zerê, Zera minê
Bostana minê av li binê
Tu ku tunî ez jî tunim,
Kesik tunin li ruyê dunê

Şev e şev e şeva tarî
Hîv derketî hîva zerî
Em derkevin mêrg û çiyên
Ez kewê nêr, tu jî marî

Lê lê Zerê, Zera minê
Bostana minê av li binê
Tu ku tunî ez jî tunim,
Kesik tunin li ruyê dunê

Jur da têye hûrik hûrik

Pêşmal sûrik dor bi çînik
Were em dest hev ra bigrin
Hev ra biwin jin û mêrik

Lê lê Zerê, Zera minê
Bostana minê av li binê
Tu ku tunî ez jî tunim,
Kesik tunin li ruyê dunê



PÊVEK 2

ÇÎROKÊN HERÊMA MAZGÎRDÊ/DÊRSIM

Cih: Mazgîrd/Gundê Bilan

Gotî: Şirin Hasbay

Jidayikbûn: 1958

Cinsiyet: Jin

Perwerdehî: Dibistana Seretayî

Berhevkar: Hikmettin Atlî-Sibel Taş

Dîrok: 01/07/2018

1. Alik û Fatik

Heye tine ye. Alikik heye Fatikik heye. Xangik heye birakik heye. Yanê diyê xwe mirine sêwî mane. Damarî xwe heye. Damarî jî qet ewa van zarokan nagire ser xwe. Sureklî eziyet dike. Nan didê ê xa, nan nadêne vana. Kinc li ê xa kiriye, kinc li vana nekiriye. Sureklî eziyet daye kişandin.

Zarok xursî ne hîn qicikin, çi bikin bavê xwe jî qet deng nadî. Te dî dê bûye damarî bav jî bûye bamarî. Newêrin deng bikin. Ondan sonra vana derin êxur mangekî xwe heye. Vana sureklî diçin êxur birçîna. Diya van tune, kesê van jî tunin. Derin li ser afirê mangê rûdinin, digirîn digirîn digirîn. Feqîra... Birçîne... Nan nadêye wan. Digrîn. Mange tê ziman, dibê wan zarokan: “Hûn qey digrîn?” Vana dibên: “Diya me miriye. Damarî me heye. Zarên xwe nan didiyê ê me nan nade me. Em birçîne... Em çi bikin li vira sekinîne. Nîn tune kesek parîkî bide ber me. Em çi çî bikin? Em ji xwe ra newêrin. Bavê me jî deng nake.”

Ev mange tê ziman, dibê: “Deng mekin! Qoçê min vî piya rakin diwê. Tije mewijê çîksiz in. Têr bixwin, dîsa qapatkin. Ema dengê xwe nekin. Mewên! Ev bêse min şerjê dikin. Yanê herin damariyê xwe bêjese, min şerjê dikin”. Dibên: “Temam em deng nakin.”

Qoçê radikin. Mewûjê xwe têr dixwin. Car din deynin dibê. Anika deng mekin. Derin dilîzin, xu ra dilîzin. Binê minê malan tişt mişt dikin. Derbas dibe. Dû ra jinik mêze dikî, damarî mêze dike ev zaroyên min ro bi ro wê ve derin. Vana jî ro bi ro rind dibin. Vana çi dixwin? Ez nîn jî nadim vana? Ji ê min rindtir dibin? Qey ê min rind nebûye vana rind dibin hela hela? Ez çer bikim dibê? Fam nake tawî. Tawî lîtîra lîtîra... Ez çer bikim hela taqîw bikim dibê. Zaroyên xwe teme dike, dibê herin tevlî herdiya bilîzin. Ew bikin hîn bikin, vana çi dixwin vana axirê da çi dikin.

Evana bi zarokên din ra derin lîstikê. Fam nekirine, birçî bûne derin qoçê mangê radikin mewûjê xwe dixwin û têr dixwin. Zarok dere dizîka diya xwe ra dibêje anê tu zanî vana derin qoçê mangê radikin binda mewûjê çîksiz hene, dixwin tîn. Diya wan dipirse te dît, dibê te dît, dibê herê me dî. Damarî tê mêrik ra dibê, mêrê xwe ra dibê mêrik dibe çer bûye, dibê mangê şerjê ke. Mêrik dibê lê lê heq lê xistê! Manga xwe şerjêkin, rizqê me tê birandinê. Evêya manekî tînî, ji vir tînî ji wir tînî diwê îlla şerjêke. Mêrik diwê ya heq li vêxe! Îla diwê mangê şerjêke. Ez qey vê mangê şerjêkim. Nizane ev zarona virda tiştan dixwin, hez nake da. Dibê şerjêke, tabî şerjêke rizqê zarokên tê birandinê. Şerjê dike danî wê dera. Zaro diwên tabî me cem da nexwarana wer nedibû.

Dibê rokî jinik, damarî vana dere dawetê, mêrê xwe û zaryon xwe dixemilîne diçin dawetê. Damarî sîtilka gir tîni datîne ber wan her du zariyan. Dibê gere hûn bigirîn ez heta ku hatim, vî sîtili gere hûn tije hêstir bikin. Lê heq li jinikê xî, wan feqîrana wan zariyana çawa bigirîn sîtil tije hêsir bikin. Ev feqîrana wer digrîn wer digrîn çîk çîka wan in. Qîreqîra xwe ne.

Jinikik deng tê. Cîranê xwe. Tabî damarî çûye cem zarokê xwe, çûye dawetê. Jinik kutî kutî xwe pahn dike tê. Dibê hele wî deriyê vekin. Çi bûye bi we? Qey digirîn, çi serê we hatiye, ev çi sîtile ber we ye? Vana dibên, damarî ev sîtile daye ber me gotiye bigrîn vê sîtila tijî hêstirkin ez wexta ku hatim divê vê qowa tije girî bûwe. Yoksa em cezalandîrmîş dike. Ev zarokên xwe bi kincên xwe xemilandiye wan bir kir dawetê, em jî kirine ser vî sîtila reş, dibê bigirîn.

Jinik dibê rawi rawin hele. Heq li wê xe! Çi îşe serê we tîne? Jinik dere sîtilê tije av dike hindik jî şor dike, tahma hêstir şore ya, sîtilê tije av dike û wan ra

dibêje, hûn jî xwe bixemilînin dibê, werin dawetê. Heta ku dawet neqediyaye, werin kincên xwe degîşkin. Werin ser sîtilê bigrîn.

Jinik tîne sîtilê tije av dike, xwey davêjê. Zaroyan dibe dawetê. Dibê xwe nîşan medîne. We newîne. Kincên wan jî degîş dike. Dibê wexta dawet daxilmîş nebe hûn herin. Herin kincên xwe degîş bikin, bira nizanibe. Ser sîtilê xwe ra rûnên bêjin va me sîtil tijî kiriye. Zarok, dawet neqediyaye direvin û tîn kincên xwe degîş dikin tîn ser sîtilê rûdinin û digirîn.

Damarî xwe têy mêze dike waye sîtil tije hêşir kiriye, deyn nake tawî ku tije newûna cezalandirmîş dikir da. Mêze dike waye tije av bûye ewkê xwe hatiye şûndê. Waye viya jî hatiye şûndê. Dibê ez çer bikim, çer bikim?

Payîze vêya car din bilxur dikelînî. Wiya jî tîne genimê xwe dikelînî, tîne dikelînî, davêje zewiyê bila hêşînbî. Davêje zewiyê, zewiyê xelkê kuliyê hêşîn bûye ê vê hêşîn nebûye. Meqset ku tiştê serê wan zariyan bînî. Mêze dike tevî zevî kulî hêşîn bûye zewiyê herkesi hêşîn bûye. Germ bû ye, mayis e wer bûye ku kulî mirîşk têda wenda dibin. Mêre xwe ra dibê, mêrik zewiyê kuliyên hêşîn bûye ê me qey hêşîn nebûye? Dibê qey? Dibê ez nizamim. Hela hela dibê em çer bikin? Jinik diwê hela biskine ez du kulor lêdixim here ser ziyaretê. Here bangke, bêze ziyaret: Cîranan kulî genima xwe hêşîn bûye ê me hêşîn nebûye. Qey ê me hêşîn nebûye? Hela te ra çi dibêje ziyaret. Dibê herê. Xwe ra fam nake mêrik.

Jinik tîne çixinê tije kulor mulor dike, çirê dide dest mêrik. Dibê, mesele du tene rê hene derin ser ziyaretê. Dibê tu vê riya va here, mêrik çixinê digire va riya ve dere. Vê riyê jî qise ye. Mêrik dere, jinik pêşî dere xwe ber dide koka darê, damariyê wan zariyana xwe ber dide koka darê, xwe di koka darê da vedîşêrîne. Mêrik dere ser ziyaretê, çira xwe vêdixînî. Diwê: Ziyaret! Ziyaret! Ziyaret diwê: Ha ha! Diwê: Lê kuilya genimê xwe hêşîn bûye diwê qey ê min hêşîn nebûye? Diwê lê ê te qey hêşîn newûye! Ti bibe Alik jêr şerjêke Fatikê jor şerjêke. Navê birê Alik e, navê xwangê Fatik e. Alî û Fatma. Alik diwên Fatik diwên da! Diwê Alik jêr şerjêke, Fatikê jor şerjêke, genimê te hêşîn dibe. Mêrik dibê hela hela ez van zaroyên xwe çer şerjêkim qêmîş nakim çawa Alikê û Fatikê şerjê bikim? Ziyaret diwê yoqsa nanê te jî nayê genimê te hêşîn nayê.

Mêrik uzilmîş dibî, ha wisa sipsar diwî. Diwê, çi ye va ziyareta serê min tîne? Nizane ku jinik ketiye koka darê wî ra wer diwê. Derdikeve tê dev lê kulor bûye, hişk bûye feqîro kes nizane oqase uzilmîş bûye. Mêrik dide ser riya xwe. Jinik diwê ser riya xwe here ha, mêrik dibê erê erê ser riya xwe derim. Mêrik çer ku ji ziyaretê dûr dikeve, viya ji koka darê derdikeve xwe berjêr berdide dere mal. Dere mal, tê dibê tu çû ser ziyaretê. Mêrik dibê erê. Dibê ziyaret te ra çi go? Ziyaretê mi ra gotiye Alîkê jêr şerjke Fatîkê jor şerjêke nanê te hêşîn diwî. Lê diwê jinik, mi te ra go ku nanê kuliyan hêşîn bûye.

Mêrik jî nabêje ku qey xelkê zarê xwe şerjê kiriye ku nanê wan hêşîn bûye. Fam nekiriye tawî. Jinikê pê xapandiye, cinan ser da tînî ha. Dibê lê şerjê bike. Mêrik dibê lê ez çer bikim, ez qîmîşê wan zariyên xwe nakim viya çi îşe? Jinik kêrê digire dide dest mêrik. Dibê her şerjêke. Ev tê lê lê nîn dipîjî, dibê hevrişkê çekim. Dibê van zariyana nîn bidînî zikê wan têrke, pey bînî yekî li jêr şerjêke yekî li serî zewî şerjêke. Tabî bira diqari, digirî. Nîn naxwe. Zaniye.

Çûçik tê dibê: Alik Fatik parî xwarik! Alik Fatik parî xwarik! Çûçik nasikinî ser vana tê dere, tê dere. Bira sî ketiye. Fatik dibê nîn bixwe. Dibê na naxwim. Zaten me şerjê dike, roya me ya dawî ye diwê. Diwê na naxwim. Çûçik dûr dikevî tê deri. Dibê Alik Fatik, parî xwarik. Bira parîkek davêje ber çûçikê, çûçik dixwe. Fatik bi birayê xwe pev diçî, Alik radibe kumê li ser Fatîkê digre direvînî, kuma Fatîkê ser digire û dere. Fatik bi dû birayê xwe dere, dibê qey kuma min ser min girt çû ez herim bînim. Direvin derin.

Derin derin, pir derin hindik derin tabî Xwedê zanî. Mêrik dû dere, mêrik qesten dibê vana wenda bûn çûn kuda çûn? Damarî ji mêrik ra dibê te nedî, dibê na. Diwê Heq li te xe! Diwê; ez revîm min wan winda kir rêda. min nedî bi ku ve da çûn. Vana xwe wenda kir û derin.

Vana derin, bi rê da Alik dibê Fatik ez tî bûme. Dibê mexwe mexwe va ava hespan e. Dibê tu bixwî dibî hesp. Naxwe. Hinkî derî cardin dibê ez tî bûme. Fatik diwê mexwe, va ava keran e! Dibê tu bixwî dibî ker. Wî jî nexwarî. Dîsa hinkî dere, pir dere hindik dere Xwedê zane. Dibê îja ez pir tî bûme. Dibê vê ava jî mexwe tu vê ava jî bixwî dibê dibî mange wî jî nexwerî. Hindik din jî dere de bes e pir tî bûme ez êdî dixwim. Dibêje ev ava jî ê berxikan e tu bixwîse diwî berxik. Eviya çer avê vedixwî diwî berxik.

Diwî berxik ji xwe ra ber kaniyê mexel dibe. Fatik dibê ez çer bikim? Dide ber rê dere ser dêr xwe ra rûdine disekine qîzik. Mêrikek tê hespa xwe tîne ser kaniyê, dibê hespa min tî bûye avdim. Tîne av dide, avê da qîzik şevqa xwe fotografa xwe xwîngî. Ew hespa di nav avê da fotoğrafa qîzikê dibîne naxwe ditirse. Belkî ji wê berxikê ditirse nizanim ji çi diitrse nizane însan bûye berxik.

Eviya diwê hespa min îro qey av nexwar tiştêk dî ye dere ser nayê naxwe. Dibê hela ez binêrim di vê ava da çi heye. Ser wî dere fotrafa însên têda heye. Dibê hela hela viya çi fotraf e vê avê da heye? Ser darê însan heye ser wî derê bilind. Sêr dike mêze dike qîzikek heye, çiyê ser wî qîzik sekiniye. Bang dike dibê qîza min qîza min hela were jêr dibê. Hespa min avê naxwe were jêr diwê. Qîzik der tê jêr. Dibê qîza min tu qey çuyî ser wê dara? Dibê ev çi berxike te bi xwe ra aniye? Dibê ev berxik nîne! Dibê lê çi ye? Dibê va birê min e! Tî bûye. Min gotiye mexwe mexwe tu yê bibî berxik! Kurik xwariye bûye berxik. Dibê biskine bila hespa min avê bixwe.

Berxik da ber hemêza xwe, hemêz dike. Dibê em herin ser kaniyê însanan. Bila va berxika av vexwe dîsa dibî însan. Wê hemêz dike, dibe, derin ser kaniyê însan. Avê didiyî avê dixwe. Çer avê dixwe dibe însan, berxik dibe însan. Mêrik dibê qey viya çito ye? Hûn ji ku hatine viya neyin nesî ye? Qîzik wê derê dibêje, dibê hal û mecalê me ha.

Dibê damariyê me heye bi me awa kiriye, awa kiriye. Serî heta dawî anlatmîş dike. Dibê anî ku me bibe şerjêke, bibe serê zeviyê. Çûçik hatiye dora me ketiye. Birê min jî parîkek nan avêtiye ber. Min jî pê ra pevçûye, va jî dest kuma min xistiye, girtiye revandiye. Ez jî dû ketim. Em rê ketin bavê me jî dû me ket. Me hevdu wenda kir hatin. Mêrik dibê tamam. Hatinese hatine. Wan her du zarok dibe derin mala xwe. Qîzikê xwe ra gir dike dide lawê xwe. Fatikê gir dike dide lawê xwe, lawikê jî dibê bira bisikin yekê jê ra diwînim dizewicînim diwê bira bisekinî. Mêrik wisa li wan xweyî derdikevi. Ha çîrok çû dîwara/diyara rehme li dê û bavê guhdara.

2. Beranê Reş û Beranê Sipî

Heye tune ye du tene bira hebûne diyekê xwe yê kokim hebûne. Gotiye ziyaretek me heye. Darika qalinda gir heye. Herin wê derê kevin ema şaş mekin. Du tene beran tên dilîzin. Herin beranê sipî xwe bavên ser. Çi miradê we hebe jê dixwazî ew tîne cî. Ema tu herî ser beranê reş jî heft qat derî xwar. Wer bikî ku tu nerî ser beranê reş, herî ser beranê spî. Dîqet bigirin.

Vana her du bi hev ra dikevin rê derin tên dikevin ber koka darê, dara qalind ê ziyaretê. Êvarê îniyê ye çitik beran way hatin tê da bi hev ra lîstin. Lîstin, beranek reş e yek spî ye tên dilîzin dilîzin. Dibêje bisekine em wer bikin ku ez herim ser berana spî. Birayê qicik dibêje bise ez bazdim ser beranê sipî. Çer ku têkeve ser beranê spî, beranê reş xwe bera dike. Dihere ser beranê reş, heft qata dere binî. Birê din tê mal dibêje welle xwe avête ser beranê spî lê beranê reş xwe bera kir. Bire me çû heft qat çû jêr, çû binî.

Birê biçûk tere dinya tarî. Vê dinê jî ava xwe tune ye. Ev jî gunde ema pir tarî ye. Vî gunda jî kanîka xwe heye. Ejder ketiyê kaniyê avê naderî. Gundî şevê zarîkî xwe dixemilînin jinê jiwanê helfînin dibin didinê. Ew jî avê berdide. Gunda jî kulî ava xwe digirin. Va birayê qicik jî tere wî gunda.

Diwê hela hela va gunda kulî rabiye, zarê xwe xemilandine. Diwê va çito tişt e. Ew jî gundê padîê ye ema dunya tarî ye. Va ji wan dipirse dibê: Va çi ye, şîn e we hilaniye? We çi şîn şivan e win dikin? Gundî jê ra dibêjin hal û mecal ha. Ava me dibên, kaniyê me dibêj ejder ketiyêkê em gere şevê zarkî bidin dêv ku, bixwerî avê bide me. Avê dide me em kulî ava xwe digirin, ew car din avê qapat dike. Dibê lê hûn nikarin lêxin. Dibên na em nikarin lêxin. Kes newêre serkeve. Tabî viya mezinê gund ra, padîşah e çiyese, dibê: Ez moletekî ji we dixwazim. Gere hûn jî ez vî îşa bikim vî îşa da jê xilas dikim, ez jî dinya ronî dixwazim, gere hûn min bavêjin dinya ronî. Dibêjin em te bavêjin dinya ronî be, dibêje erê. Dibên bisekine em ewkê te tînin şûndê. Dibên teyrek heye. Va teyra te nebe êddî kes nikanî te bibe. Va teyra ra dibêjin yek merîkî hatiye. Dibê ez çûme ser darê lê du tene beran bi hev lîstine. Min xwe avêtiye ser beranê spî. Beranê reş xwe bera kiriye ez hatime ser beranê reş heft qat hatime vê dinya tarî. Ez vira naskinim min bişînin. Teyr dibê ku hûn her perekekî min heft litir av heft lîtir jî goşt daynin ser. Tu jî bila ortê da siwar bibî. Ez çawakî qarîngî min xwest, gere hûn hema ava min

him jî goştê min bavêne ku, ez wî bigirim bibim. Yanê yoksa ez nikarim herim, gerek heft qat bifirim.

Padîşah dibêje: Were tu me wî îşa xilaske. Em vî îşa heralde gi tînin serî. Kurik diwê hûn şûrekî bidine dest min em herin. Haydê em hev ra herin ez ê wê bikujin dibê. Viya ji wan ra dibêj va îşa wiha ji bo we pir zor e. Hûn kes nemane. Vana dibên haydê. Şûrê xwe mêrik tertemiz tûj dike digre paş xwe. Dibê de hadê em bi bev ra herin. Hev ra derin tên. Vana zarê xwe xemilandine. Înan nakin dibên, va çito ejder bikuje. Digirin feqîra şîn şivana xwe heldidin, dikevin rê serê xwe xemilandine zariyên xwe girtine anîne. Girtine anîne tabî wa mêrike ku çûye wê derê ku dêv dikujî, jê ra dibê hinekî merhemet bike, hebki însaf e dibê. Kurê xwe hinî bînî der de. Me jî gune ye. Em şevê zarîkî xwe didine te, tu dixwî, hebki jî tu kurê xwe bîne der, hebki jî em te bibinin. Avay çîke çîka vê qîzika ye giriya ye, bizdiya ye. Heb ki jî tu kurê xwe derîne em bibinin, em te naxwin xwe tu me dixwî. Mêrik dibe em te naxwin tu me duxwî. Tu royê yekî dixwî. Eviya înam dike, kurê xwe tîne der. Pir zorlemîş dike, kurê xwe êpêy tîne der. Wexta ku qîzîkê didinê, hema ûcû ûcûna, lawik, şûrê xwe dide paş kur. Lêdixî, xwînê û av lê şikulî tev avê dike. Deniz berde ortelixê. Dibêje wan dibê werin ha, werin min heyata we qurtermîş kir ha. We royê canikî xwe didayê. Min we kulî ji vî îşa xilas kir.

Vana dibên Xwedê te me ra pak anî. Dêmek viya îşê Xwedê ye. dême mirad jî va ye. Te heyata me xelas kir. Mirada mezin jî ev e, te zar û zêçê me xilas kir. En son demek xwedê te tayin kir ji me ra şiyandî. Em jî miradê te tînin şûnê. Em jî te dişînin dinya ronî. Mêrik dêw şerjê kir. Heft lîtir av heft lîtir goştê xwe dagirî pakê dike dike ser ewkê wî teyra. Ew jî ortê siwar dibe. Vedalaşmîş dibin. Kulî dorê lê digirin, digirîn. Qet destê xwe jê nabin. Jê ra dibêjin mere, te em ji vî îşê xelas kir li cem me bimîne. Lê mêrik dibê na, min di serî da bi we ra wisa qezî kir. Gere hûn min bişînin dinya ronî. Ondan sonra lê siwar dikin dibên de here. Têê hingî dere xwaringî avê didiyî goşt didiyî avê didiyê goşt didiyî.

Tabî dinya negerîni wekî ku derketiye. Way xwanê dike. Sankî belî dike. Xêylî dere. Goşt didî teyrê av didiyê, goşt didiyê av didiyê. Dibê sanki ronî belî bû. Cardin dere xêylekî dere. Xurungî avê didiyê goşt didiyê hêlkî dere dibê da ronî dernekê qasî bêderkî derket. Dibê wisa be pir nemaye. Qasî bêderkî derket

derin. Meqset goştê min tiştê min baş neyê, dibe viya bavêjim derveyê, dibê cardin xurînê davêyê davêyê dibê pir nema ne, dibê pir nema derdikevin dinya ronî, goştê xwe baş dî. Tabî xwaringê goşt tune, diqede. Dora xwe pak dike kêrê davê herke goştê qora xwe da jê dike. Teyr li goşt dinêre, şêrîne naxwe. Va davê bin zimanê xwe naxwe. Hiltînî tên der, têne jor datînî. Vedalaşmîş dibin, dibê ku xatirê hev bixwazin, em ji hev biqetin. Dibê wisa be tu birêkeve, hevki te sêr bikim rêçûna te bibînim. Dibê na rêçûna min gayet rind e. Dibê na tu birêkeve here, ez te sêr kim hîna ez herim şuna xwe. Tabî ev lawik bi rê dikeve. Ev genca total e. Dibê banî dike dibê were tu virda were, dibe qora xwe pezke. Di bin zimîn goştê wî tîne der, tîne der qoriya wî va dizelîqînî. Car din pan dike. Xweş dibe, de îşê Xwedê ye. Xweş tê dibê hele here. Dere total nine. Car din banî dike dibê were vedalaşmîş bibin, xatirê xwe ji hev bixwazin. Tu dihatî memleketê xwe, hun ji te ra memleketê te. Xatirê xwe ji hev dixwazin. Ew têyra tê memleketê xwe, va jî tê memleketê xwe.

Tê gund. Gund da ji vî ra dibên tu çere hatî tu çûyî çere hatî tu? Tê anlatmîş dike wî meseleyê. Dibê ez çûm wî heft qat binê erdê, çûm dinya tarî û li wê derê av gundek hebû ejdiyar av nedida wana. Ejdiyar vê gunda da zaruyê wan dixwar. Dawî zarokek ma, ev zaroya jî ê padîşê bû. Ew jî wê şevê anîne xemilandîne, şîn şivan kirine. Min çû şûra xwe girt. Min ew ejdiyara serî ser fit kir. Av jî xwîn jî laş jî kir tevî avê kir. Min ew gunda jî ber avê xist. Min heyatê wan jî xilas kir. Dême ew mirada Xwedê da min jî ew bû. Ez şandim hef qat erd da. Çûm min heyat xilas kir. Ê teyr jî vana ez danîtime ser vî teyra. Teyr jî ez anîme dinya ronî. Em wedalaşmîş bûn. Ew çû memlekete xwe, ez jî hatim memleketê. Miletî wî gunda vîna ra heyret dikevî. Ev qasa di bîra min da maye. Dewamê xwe heye tuneze nizanîm. Çîroka çû diyara, rehme li dê û bavê guhdara.

3. Kerê Çamûr

Heye tuneze. Sê bira xangek û dêkî xwa hebûne. Diyê xwe û sê tene lawê xwe hebûne. Qîza xwe ra negotiye sê tene birayê te hene. Qîzik hay jê nîne. Qîzik tere ber golikê xwe dilîzin xwe ra. Zarû ne herkes karikê xwe golikê xwe girtine, derin ber. Derin tabî dilîzin. Îş kar dikin diwê kulî sond dixwin. Ew dibê serê birê min, ew dibê serê bavê min. Kulî serê birê mirê xwe sond dixwin. Qîzik jî, divê

serê golikê min ê enî beşik diwê min ha nekiriye. Serê golikê xwe ê enî beşik sond dixwe. Zarû diwên em gi bi serê birayên xwe sond dixwin tu qey serê golikê xwe yê enî beşik sond dixwî. Sê tene birê te hene. Ê me gi tek, ê te sê tene birê te hene.

Qîzik digirî. Dibê na birê mi tinin. Dibên erê erê tunin. Ê me gi te ê te sê tene birê te hene. Qîzik digirî tê malê. Diya xwe diwê; tu qey giriyay? Çi biye?? Diwê îşte em li wir lîstine bi hev ra. Yanîşlix bûye kuliyan sond xwariye. Min jî serê golikê xwe sond xwariye. Wana serê birê xwe gotine. Min ra pevçûne. Gotine sê tene birê te hene. Qîzikê ji diya xwe ra gotiye; rast sê tene birê mi hene? Diya wê gotiye; herê hene. Qîzikê gotiye; ku derê ne? Diya wê gotiye; çûne paş wî çiyayî nêçîrê û qet nehatine û min jî qet ji te ra negotiye. Qîzikê gotiye; ez çer herim cem birê xwe? Diya wê gotiye çer herî? Ez te ra kerkî çamûrnî çê dikim, te siyar dikim ama qe meyê çoyiş. Sade bê çooo wa kera te dibe diçe cem birayê te. Diya wê dibê derî se ez te ra çêkim. Keçik dibê erê ez derim. Diya xwe kerê çamûrnê çê dike û qîzikê lê siyar dike. Dibê qe deng meke. Sade bê ço. Qe te rêva tiştêk dît menihêre, te got çoyiş ker heldiweşî. Diwê tamam sîwar dibe feqîrê.

Tere xêylek dihere. Bi rê da hindik morî, tişt mişt aşiyane. Çav lê dikevê û ji kerê ra diwê çoyiş. Çer diwê çowiş, kera xwe diwi xwelî. Feqîrê wan tiştê xwe jî digirî û vedigerî tê. Tê, dê diwê te qe kera xwe aşand? Diwê anê mi rê va tişt dît, Min jî hez kir. Çer mi go çowiş, kera mi helişî. Diya wê dibê; ê lê mi ter a nego heldiweşî? Kerê çamûr e da. (Li) navê xwe çû ye. Cardin jê ra kerik çê dike cardin siyar dike. Dişîne, dibê qîza min qet te rê va tişt mişt dît nesekine. Mewê çowiş ha. Sade bê ço û here. Qîzik xêylî cî va diçe, dîsan tişt mişt ketiye ser rê va. Hez dike û car dî ji bîr dike dibê çowiş û ker diwî xwelî.

Qîzik digirî û cardin vedigerî. Diya wê jê ra dibêje ku mi ter a gotiye viya kerê çamûr e. Te çer ku çowiş heldiweşî. Ez nikarim her seferî ji te ra kerê çêkîm. Te got ez diherim cem birê xwe. Tu qey wê heldiweşînî û têy? Va cara son e carê sêsêyane. Da diherî here, merî mere. Eviya diwê tamam. Dîsa siyar dike, nan man dide dest. Dibê here. Qe mewê çowiş ha. Ava te jî cem te ye. Bixwe bê çooo. Va kera te diwe cem derî.

Feqîrê diwê ço ço çoo. Tere heya gomek heye. Tere wê goma û dibîne sê tene, sê cot sol hene li wira. Çamûrê da mane. Çûne nêçîrê hatine. Kurikê xwe hene. Lastîke xwe çamure da mane, neşûştine. Qîzik dere dêrî vedike, dere solê

wan birêd xwe, kurikê wan kulî dişo, temîz dike. Kewê wan pûrt dike, dide ser dipêjî, nanê wan hazir dike. Birê xwe nêçîrê tèn. Diwên hela hela va kê ye têketiye mala me. Va kî ye ku hatiye? Jê dipirsin. Dibên va xwanga me ye. Lê vaya çer hatiye. Diwê em çûne yanê hal û mecal ha tê. Zariyan tev hev em lîstin lîstin. Ewkik, yanlişlixek bû û me kuliyan sond xwar, kuliyan serê birayêd xwe sond xwar mi jî serê golikê xwe yê enîbeşik sond xwar. Wana mi ra pevçûye. Ez giriyame hatime malê. Çûme cem diyê xwe min pirsîye. Gotiye herê sê tene biray te hene. Ez, kerê çamur ji mi ra çekiriye, ez hatim vira. Kera xwe ra mi go çowîş, kera mi bûye xwelî. Ez hatime hundir. Dibên tamam te rind kiriye hatiyî. Ema xwe jî hewûye. Dibê qe em çûn nêçîrê bîra te da bi. Va pisînga te çi xwar gere ti bidî va pisînga jî. Ti arê xwe veşêrînî. Arê te xew da nere. Arê te xew da çû ar tune! Pisîng dere pê da mîz dike. Diwê tamam.

Radiwe arê xwe vedişêrînî. Nanê xwe tiştê xwe hazir dike. Wê royê du tene mewij ketine, diye çîye, du tene mewij hewûne. Bîr dike her duyan jî dixwe û nade pisîng. Pisîng dere bi êr da mîz dike. Êr xew da dike. Ê tere ku here êr vêxe, nanê bira hazir bike lê ar tine. Pisîngê ar da mîz kiriye. Ar xew da kiriye. Çer bikim.

Qîzik tere derve diwê hela ku derê da dû heltê. Ez wî dûyî ra herim. Herim hes û karê xwa bînim. Diwê qîzik dû dibîne pey dere. Dere dere ku gundê dêwê ye. Dêvê sîtila heft qulp tijî danî kiriye. Bilxur dikelînî danîtye ser. Ber raketiye. Bûka xwe li ber e. Bûka dêw ji kêçikê ra diwê tu çer hatiye vira. Xwe veşêre. Dibê wele min ar veşartiye. Min mewij xwariye. Min nedaye pisîngê. Pisîngê çûye arê da mîz kiriye. Ar bûye qefilî. Ez hatim min dît ki li vir dû heltê. Min hesûwa xwe girt pey vî dûyî ra hatim. Bûka dêw tînî wê ra hesûwê tije ar dike. Pêşûyê jî tije darîn dike. Diwê hewkî bixwe hewkî birjîîn here mal diwê. Diwê dêw şiyar bibe, bîna însanê xam hildigire. Ez çi bikim jî dêw tê, dîsa wî bînê ra tê. Zû bike ku negihê te. Çûy mal jî derê xwe kilît bike qe derî vemeke. Pêşîya qîzikê tiji danî dike, masiwê jî tije ar dike. Daniyê xwe jî masiwa xwe jî tînî rê va dirijînî heta ku dere mal.

Tere mal ber dêrî. Dere hundir. Derê xwe kilît dike. Arê xwe jî diwe hundir. Dêv tê. Xirme xirme derî dixînî. Diwê dêrî veke. Diwê derî venabe qîzik. Ditirsim ez dêrî venakim. Dêv diwê pêçîka xwa ya qilîgê vê kunikê da dirêjî mi

ke. Pêçikê qilîngê feqîrê dirêjî wê dike. Dêv pêçîka wê dimijîî. Diwê ez her ro têm gere ti vê pêçîka xwe ya qilîngê dirêj biki. Wê saetê ez têm gere tu bidî min ez bimijim.

Dêw her roj pêçîka va keçikê dimijî. Ro ro va keçîka xweşik zer û zepale diwî. Va biranê vê dibên hela hela. Xwanga me ku delal bû va qey di vê halê da ye? Va çi bû ye? Xwan newêrî ji wan ra bibê. Dibê birayê qicik xwe vedişêrînî. Dibê xwe di mal da vedişêrînî. Paş derîkî xwe vedişêrînî. Dibînî ki va dêv hat hat ber derî. Derî kuta. Ji keçikê ra diwê pêçîya xwa dirêj biki. Pêçîya xwa dirêj dikî. Dimijî, dimijî. Dev devê ku bira bên, êdî direve. Dêv ku dihere bira di hundir da pey xwanga xwa digirî. Dibê xwangê va çiyê? Keçik diwê lê ez çi bikim. Pisîngê êr da mîz kir. Ar kir xew da. Min jî çû ar anî ji gundê dêvê. Hasiwek ar dane min. Pêşa min jî tije danû kir. Mi rê va xwar rijand hatim mal. Bûkê gote tu çûy mal derî kilît ke. Diwê dêv bînê însanê xerîb digirî. Dû min ketiye hatiye. Pêçîya mi dimije. Ez çi bikim.

Birê xwe li nêçîrê tên. Diwê hal û mecal ha ye. Dêv tê pêçîka wê dimijê. Xwanga me loma lê wa hatiye. Hii diwêjin. Diwêjin newêrî deng jî bike. Her sê bira bi hev ra silahê xwe tije dikin xwe vedişêrin. Xwe vedişêrin dêv tê. Tê paş derî, ban qîzikê dike. Bira xwe di hundir da veşartine. Diwê were. Dibê herê va têm. Pêçîka xwe di dêrî da dirêj dike. Bira sîlê di dêvê da tal dikin. Dertên derva lê dixin dêvê dikujin. Xwangê xwe jê xilas dikin. Cardi ji wî çiyayî mala xwa tiştê xwa bar dikin. Dêrdikevin têne gundê xwe cem diya xwe. Ev qasa. Erê çîrok çû li diyara rahme li dê û bavê guhdara.

4. Heft Bira û Dêw

Heye tine ye. Heft bira hewûne. Heft bira destê xwa girtine. Birakî xwa nav da gurî ye. Girtine li gundan das geriyane. Heft tene gund va çûne. Çûne, çûne... Rokî jî derin gundê padîşê. Rokî çûne gundê dêvê. Gundê dêvê jî, heft law jî ê dêvê hene. Heft tene jî vana ne. Diwe çarde tene. Wana tawî derin dasê diçinin, gurî boyinde mektûbê yazî dike, dide lawê dêvê ê qicik, dişînî. Lawik tînî diwê va çi ye? Nizanim diwê mektûb yazî kiriye. Mi ra dane mi mi jî aniye. Aniye

mektûb dixwînî. Dêv dixwînî, diwê dayê îro dê mera beranê me şerjêke, sac kawirmasî bike, me ra bişîne.

Dêv beranê şerjê dike. Goştê xwa hûr dike, sac kawirmasî dike. Zariyê xwa ra dişînî yanê. Dikevî dora royê din, dîsan mektûbê yazî dike dişînî, diwê gere ti îro me ra ziyafet kî çêkî, me ra bişînî yanê. Wê royê jî ziyafetekî çê dike. (Yanê va mektûba gurî dinivîsînî, li ser navê layê mezin yê dêv. Ji diya wî ra dinivîse. Lawê mezin ji mektûban hay tune) Tabî royê tişkî dixwazi, tişkî dixwazi, heta roja dawîn jî diwê mangê şerjêke.

Mektûbê yazî dike dişîne diwê mangê şerjê bike. Diya wî diwê vî layê min qey wer dike li min diwê. Diwê mange jî xwa rizqê me ye. Diwê mangê şerjêke. Diwê manga xwa şerjê dike, digiri hûr dike. Digirî şînî dixwin, dasê diçinin baş dikin. Têne mal. Vêya lawê xwa ra diwê, mangaka me hewû ew jî te go şerjêke. Te qey li me ha kir? Lawik diwê çi manga ye dayê diwê? Dayik diwê lê te mektûb yazî kiriye, te her carê tişteki xwestiye. Lawik diwê na, mi wa mektûba yazî nekiriye. Diya wî diwê li va ha! Vana çi ne mektûb in lê? Lawik diwê xwêê... li serê me ketê! Xwa ra va Guri ye kulî ha kiriye. Qe xewera mi ji vî tiştê tinebû. Qe mektûb mektûb mi yazî nekiriye. Çi kiriye vî kiriye!

Hiii! Vî kiriye diwê! Diwê herê. Diwê neyse. Disikine diwê çi biye biye. Ez geri îşev van her heftan bidim ser hev. Îşev ki ketin xewê, ez şûrê bikişînim, vana kulî hev ra serîkim, şerjêkim, daynim mirar. Wî ez xiraw kirim. En soninde jî ez vî gerekî şerjêkim, millet jê xilaskim. Va vêtra ki here, her gundikî xiraw dike.

Gurî dibîsi. Gurî dibîsi ku viya şûrê xwa li stûyê ye diwê ez gere îşev van her heftan şerjêkim. Gurî ranakevi tawî. Diwê wele va îşev me şerjêke. Em newêrin ser jî bikevin diwe. Em çer bikin diwê. Zariyê dêwê kulî dikevîne xewê, dêw jî ketiye xewê. Radiwe vana kaş dike, zariyên dêwê dixê bin cila xwe, ê xa jî dixê bin cila zariyê dêwê. Cihê wan degiş dike.

Dikevine xewê. Va diwê hela biskin, Gurî raketiye raneketiye. Birayê xwa zaten di xewê da ne qe ranebûne. Gurî jî xure xure, xwa li xewê daniye. Şev e tarî ye. Dêw şûrê dikişînî, kuliyan, her heft zariyê xwa, ser pijiqîne, jê dike. Zanî ku ê Gurî ne. Halbikî ê xwe ne. Dêv dikevî xewê. Gurî ew dike ki dêw ketiye xewê,

xure xura wî ye. Radiwî, birayê xwa kulî dileqînî, diwê rawin rawin, mal xiraw. Dêvê îşev diwê win serî kirin, min yêr degiştirmîş kir, zarokê xwa kulî şerjê kir. Rawin em birevin.

Radiwin van zariyan, hêdîka dêrî vedikin. Birayê xwa dide dû xwa, direvînî. Derin, diwên werin em herin gundê padîşê. Em herin gundê padîşê diwê em herin vê carê jî wê ra dasê biçinin.

Derin gundê padîşê. Gundê padîşê jî tawî paşdişê gundê ye. Dawet heye, daweta qîza padîşê ye. Ew digirî, dêv digirî, lorîkê lêdixînî, tere gaze garan digirî, taliyê, nare gundê padîşê. Zanî ki Gurî çi ye gundê padîşê ema nare wê ra. Diwe padîşê ra diwê, padîşa, diwê çi ye? Diwê ti kuşterê(?) xwa, birekê, kîlok mix û yek jî tevşo bide min, ez derime baxçê xwa. Diwê qet tê herî baxçê xwa, tê çi bikî? Diwê hêlîka(?) girtîne. Bi qasî derîkî diwê. Bûka te, layê te, bila li ber hîlî bin herin. Gir çêkim. Xwa ra jî înam dike. Kuşterê, mixan û tevşiyê, birekê kulî didiyê. Li xwa girê dide xire xire ha yî. Qewaxan dibirî, textan tînî der çêdikerî.

Dêv digirî û tê dere serê xwa girê dide, lorik lê xistiye. Diwê dakapîr çi biye te? Qey digirî diwê? Diwê teww, çi negirîm diwê. Gurîk hat keti gundê me, hat me ra das çiniya. Heft bira bûn diwê, Gurî ez ji her heft lawan kirim, ez ji mangê kirim, ez ji bêrîn kirim. Diwê ez ji malê kirim ez ji her tişt kirim. Ez çer bikim diwê. Em her wî bikujin em jê xilas bin. Diwê qey derda tev ra me da, ketiye gundê padîşê, padîşê bîle pê nikane diwê. Diwê dest da maye. Ez jî şalê tawûtîkî çêkim, ez biwim, îşkî bi ser da bînim. Diwê ti rind dikî, to tooo, qedê te birim diwê ti pir xweş dikî îşkî wer derxînî.

Çêdikerî, hazir dike. Diwê daka pîr hela wer tê da rame diwê. Rinde yan na hela ez olçiyê xwe tam biwînim. Keviyê, diwê hîna teng e. Diwê teng e, diwê were der. Cardin çê dikeee, xêylîkî uğraşmîşî diwe. Diwê dakapîr diwê hela cardî tê da rame. Cardî tê rame, cardî tê ramedî, diwê da rind e. Da rind e. Diwê tamam, were der. Qapax mapaxê çê dike hazir dike. Diwê cardî tê rame, cardî tê ramedî, diwê hela biskin, qapaxa wî serdim, tam eyar bî ye nebiye! Dike nav, qapaxê jî de ser, rind temîz doran moran kulî mix dike. Diwê tarî bû ha, tu van mixan qey lêdixînî, qey mix dikî min? Diwê deng meke diwê, te pişt dikim digirim derim. Radike ew kaş dike, kaş dike, rind diwe ser zik dike xwar, tawitê radibe pişt dikî, teva pîrê dibe gundê padîşê.

Dibe gundê padîşê. Li gundê padîşê vedike, ber dide ortalixê, xwe jî direvi, xwa nav millet da dike, dere dikevi oda bûkê, dîrî li ser xwa kilît dike. Dêwê ber dide gundê padîşê. Dêwê gunda kulî serî kir, tek nehişt. Tek li ser tekê nehişt. Baş kir en son tê Gurî dimînî û bûka padîşê dimînî. Dêw tê diwê dêrî veke. Diwê şixa(?) mi çî biye. Diwê ti vî zimanê xwa dirêjke, ez sê caran paç kim, qe mizkun dexel(?) nedî. Fam nake vî ya, zimanê xwa dirêj dike. Vêya diwê hewkî din, hewkî din, rind tam dirêjke, e ku tam dirêj dike, pê digirî, mixa xwa tevşoyê xwa tê da dikutî, dêrî vedike, tê li der tertemiz dide ber tevşuyan, dêva xwa dikujî, gundê padîşê jî, mala dêwê jî, eşyê dêwê jî yê padîşê jî, kulî li Gurî dimînî. Gurî dêv berda nav gund da, padîşê jî dikujî, her du gund jî kulî li Gurî dimînî. Gurî bûkê jî digirî, li ser malê jî rûdinê. Tawî xwa jî diwî padîşa, xwa jî diwi her tiştik. Çîrok çû diyaran rehme li dê û bavê guhdaran.

Gotî: Makbule Taşkın

Herêma: Mazgîrd/Gundê Bilan

Cinsiyet: Jin

Temen: 70

Perwerdehî: Nexwenda

Berhevkar: Hikmettin Atlı-Sibel Taş

Dîrok: 02/07/2018

Qemertayî

Dibê padîşahek heye qe zarê wî tunene. Diwê jinik em çî bikin? Qe vî memleketî nasekinim. Serê xwe digirim terim. Radibe çoyê xwe digire, hindek nanê xwe dixê çixinê. Çixinê xwe digire tere. Pir dere hindik dere, dere li ser kanîkî rûdinê. Çixina xwe vedike ki nanê xwe bixwe. Kalekî sipî kokim jêr da tê. Diwê axayê min ti ku va derî? Diwê ez çî nerim. Xwa ra derdikevim derim

memleketan da hunda diwim. Diwê, qey? Diwê zariyê mi tinin. Diwê axayê min, sêvekî didime te. Vê sêvê bibe parçeke. Parçekî bide jina xwe, parçekî jî bide jina xwe. Hespa te taykî xwe diwi, jina te lawkî xwe diwi. Ema nêv pê ve newe. Heta ki ez hatim nêv pê va neve.

Vedigerî lêdixîne tê mal. Tê mal. Jinik diwê mêrik te go ki ez serê xwe digirim derim. Tu vay vejerî hafî. Diwê jinik ez çûm li ser kanîkî rûniştim. Min çixina xwe vekir ki başle kim nanê xwe bixwim. Kalekî kokim, ji hêlê hat. Gote, tu derî ku derê. Mi gote ez derim memleketan da hunda dibim. Sebeb pirs kir, min gotiye zarê mi tunin. Gotiye eva sêvê kerî dikim didime te. Kerîkî bide hespa xwe, kerîkî bide jina xwe. Hespa te kurrîki xwe tîne. Jina te jî nexweş diwî lawekî xwa tîni.

Wê sêvê kerî dike. Kerîkî dide jina xwa kerîkî dide hespa xwa. Jinik nexweş dikeve layekî xwe tînî, hesp jî tayekî xwe tîni, kurrîkî xwa tîni. Gund e, gund top diwin. Dibên padîşahê min. Tu qoçqocaman padîşahî. Zarê te heye qey nav lê nanî? Gotiye ez nêv lê nanim. Hela ew bila biskinî. Ev mileta tev li wir top bûye. Ew mêrika kalikê sipî dêrî da dikevi hundir. Dibê ev çi qerebalix e, ev çi ye? Navê lêwik Şahîsmaîl e, navê hespê jî Qemertayî ye.

Diya xwe ra ki bêjim, ev mileta daxilmîş dibî dere. Pir dimînî hindik dimînî. Şahîsmaîl, ew tay mezin dibe. Şahîsmaîl lê siyar dikinê. Siyar dibe diçe li çiyay digere. Çiyay da derî ke hindik goçeber in li wan deran daniye. Qîzika xwe wek xezalik li wê dera ye. Eva li pey vê xezalê dere diçe bin çadirê. Goçebara dibên Şahîsmaîl, ev qîza me ye. Tu qey para didî dû? Şahîsmaîl dibê hela nîşanî mi bide. Nîşanî wî didin ku ro dibê ez im, hîv dibê ez im. Wer ku rindik e. Sê ro pey hev pey hev dîsa dere. Dîsa dide pey xezala ku ew xezala diçe dikevî wan çadira goçebere. Evan dîsa ji Şahîsmaîl ra diwên: Şahîsmaîl, ev qîzika me ye. Lêdixin wî der dikin.

Şahîsmaîl vedigere tê mal. Dikeve odeya xwe. Pozxûn e. Sinir e. Bavê wî ji hevalên wî ra dibêje ku herin cem binêrin. Vana derine cem dibên tu qey wer dikî. Viya diwê wele li filan dera koçeberan çadirê xwe danîne. Qîzek heye tê da, ro dibê ez im, hîv dibê ez im.

Rokî Şahîsmaîl lê dixine deri ki dibîne koçeberan bar kirine çûne. Li wira koçik hene. Şahîsmaîl destê xwe li wan dixî û diwê, qet destê gulîzara min li vana neketiye. Navê qîzîkê jî Gulîzar e. Şahîsmaîl wî kuçîkê radîke ki mektûb di bin da ye. Diwê Şahîsmaîl em derine Yêmenê. Diwê heft salan te beklemiş dikim. Heft salan da hatî hatî. Natî jî ez da ji dest da çûm.

Lêdixînî tên mal. Şahîsmaîl diwê dayê. Dayik diwê çî. Diwê dayê ez siwe derkî da derim derim hunda dibim. Dayik diwê layê min, ew qasa wariyeta me heye. Tu çî dixwazî, çî ew dikî em didine. Wa gunda em qîzê wan gişk top dikine tên, tu sê caran dora wan ra here were. Şahîsmaîl diwê na. Diwê kes şûnda Gulîzara mi nagire. Dayik diwê layê min meke, etme eyleme. Ew koçeber in. Îro li vira ne siwa ne li vira ne. Şahîsmaîl gotiye na naa! Kesin ez derim.

Terin diya wî wana li wî gunda gişk qîza top dikin. Şahîsmaîl li Qemertay siyar diwî sê cara li dora wan wî xeznî digirî. Diwê na, kes şûnda Gulîzara mi nagire. Pey kesî da qayil nawî.

Şahîsmaîl tê siwê da radiwî, qehwaltî mehwaltiyê xwe dikî, li Qemertayiyê xwe siwar diwî tere. Dere dere, memleketek gundek da derdikevî ku tek xaniyek tê da ye. Xanî mohr kirine ku kes hundir da tune. Viya li derî dixînî, dêrî difirînî, hespa xwa diwe li hundir girê dide. Dere jor hundir, dinêre ki qîzek azew di hundir da ye. Qîzik diwê Şahîsmaîl tu li ku va dera li ku? Teyr bi teyrtiya xwe nayê vê dera? Tu çito însanî hatî vê dera?

Ew dimîne li wira. Deha wê şevê ew qîzîka vî ra azetê xizmetê dike. Haşa ji we yek fînikê xwa jî heye. Fînikê xwa jî pir qîmetlî bûye. Navê wê keçîkê jî Gulperî ye. Siwe da diwê Gulperîna min siwe bûye ez derim. Gulperîn dibê Şahîsmaîl mere. Diwê teyr bi teyriya xwa nayê vira. Benî Adem qe nayê vira. Diwê na wele ez derim. Gulperî diwê Şahîsmaîl tu derî, ez jî teva te tîm. Diwê tamam.

Derin. Pir derin hindik derin. Diwê a vê riya jêrîn ra dere Zengîn. Ew riya da derin. Qîzik li hespkî siyar diwî ew li hespkî. Lê dixine derin. Derin li ser kanîkî rûdinin. Çixina xwa vedikin, nîn dixwin. Erebe Zengî radiwî derdikevî diwê, çî qîsmetkî min ê rind hatiye. Şahîsmaîl diwê: Hey kafirî kafir! Sedemî te hatine îja çî qîsmetê te ye? Nanê xwa dixwin. Erebe Zengîn tê diwê îşev win

mîvanî min. Gêrî dere. Ew jî qîzika azew bî ye. Îja başqe kinc li xwa kiriye. Wê şevê ew jî azet û xizmetê dike ji vê ra. Şahîsmaîl siwe da dibê ku em diherin. Dibê Şahîsmaîl mere. Ez Erebê Zengîn im. Kes nayê vira. Mebê ku te xwa ra wer şansê xwa girtiye û hatiyê. Kes nayê vira. Şahîsmaîl diwê na ez derim. Hêj kes li Gulîzara mi neçûye. Diwê ez derime Gulîzara xwa. Erebê Zengîn diwê Şahîsmaîl diwê biskin em bi hev ra herin. Diwê Şahîsmaîl şertik mi heye. Diwê şertê xwa biwê. Diwê ez û te gulaşê digirin, kê kê avête erdê.

Siwe da radiwin her du dikevîne cengê. Hev û du diwin tînin, diwin tînin. Kes bi yekê nikani. Ne ew wî davê erdê ne ew. Radiwin. Erebê Zengîn diwê Şahîsmaîl dîsan em bi hev ra dikevîne herbê. Dikevîne herbê. Dîsa hev dibin û tînin, dibin û tînin. Dayax nakin. Roya sisêyan Şahîsmaîl diçe ser hespê xwe siyar diwe. Hespa wî diwêje Şahîsmaîl evîna kêleka çepê da bade. Kete erdê qîzîk azeb e.

Siwê dibe. Erebê Zengîn diwê Şahîsmaîl em îro dîda bikevîne herbê. Diwê Erebê Zengîn. Diwê ha. Diwê em îro gulaşê digirin. Pey hespa nakevîne. Diwê he qeziya te be. Evana gulaşê digirin. Şahîsmaîl birine ser kêlek çepê. Vaye Erebê Zengîn ba dide li erdê dixînî. Perdê ji ser rûyê wê heltînî ku qîzîkek e. Hîv diwê ez im ro diwê ez im.

Diwê êvarê têne mal. Erebê Zengîn diwê, Şahîsmaîlê mi siwe mere. Qey em sê tene ne. Yek Gulperî yek ez yek jî tu yî. Em sê tene ne. Şahîsmaîl diwê naaa! Ez derim. Kes şûnda Gulîzara mi nagiri. Evan diwên em jî tev da te tîn.

Radiwin siwe da hersê, siyar dibin. Lêdixîne derin. Pir derin hindik derin. Derine ku çobanek li ber miyan e. Derin silavê didinê. Selamun Eleykim. Diwê Eleykimî Selam. Diwê terî ku. Diwê wele xwa derime Yêmenê. Ew jî, ew mêrika jî li Yêmenê biye. Diwê wa çi heye çi tine ye li gundê we. Diwê wele li gundê me koçeberek hatiye. Qîzika xwa heye. Îsal heft sal e dilê lawê ketiye. Diwê hev û du ra dikevîne cengê. Diwê royê yek royê yek. Diwê dawî ewk nake. Qîzîk kêr girtiye destê xwe. Xwa dayi pişt heft deriya disekine.

Diwê vana lêdixîne derin. Derin diwê, derine gundekî. Derin ku pîrika kokim, li pêşiya dêrî ye. Vana diwên xêr diwî pîrê. Xêr hatî silamet. Vana ji pîrê ra diwên me îşev mêvan nakî? Pîrê diwê lo lo vî halê min vî usûlê min û mêvan?

Lê vana diwên pîrê tişt pê nayê. Zêrikî em didine te, tu me mîvan dikî. Pîrê diwê, layê min layê min. Ser serê min ser çavê min. Şûnda we jî heye, şûnda hespa jî heye.

Pîra kokim wana dike mêvan. Mîvan dibin li mala wê disikinin wê şevê. Diwê pîrê çi heye çi tine. Pîrê diwê lawikê mi, koçeberek hatiye vira, qîzika xwa heyi, layê padîşahê gundê me dil ketiyê. Îsal heft sal e hev û du diwinin û tînin. Diwê da hevdu bêcer nakin. Diwê qîzik ketiye paş heft deriya diwê kêrik girtiye dest xwa, axû jî girtiye destikî. Diwê pîrê em zêrekî te din, di derî îşê me dibînî. Diwê, layê mi layê mi, ez li ku ev li ku. Diwê pîrê ha vê hungulîskê didime te, vê hungulîskê bibe biwê Gulîzar, ewî dêrî veke ez werim hundir. Bê Gulîzar, tu nalîna ku dinalî evê pêçîka mi bêle hundir.

Pîrê dere ber derî. Diwê hela vekin vekin, ez ê îş çêkim. Vana jê ra dibêjin, pîrê tê îş ku va çêkî. Diwê win dêrî vekin. Derî vedikin. Pîrê dere ber derê Gulîzarê. Diwê Gulîzar, Gulîzar tu nahêlî nahêlî lê ev ê bêçîka mi bihêle hundir. Vê bêçîkê dihêle hundir dinihêre dibê wele ew hungulîska ku mi dawû Şahîsmaîl ev bû. Qîzik diwê hela dêrî vekin bila vê pîrê bê hundir. Dêrî vedikin, pîrê dikeve hundir.

Pîrê ji Gulîzarê ra diwê, Gulîzara min, Şahîsmaîl îşev mêvanê me ye. Hatiye li mala me ye. Diwê hal û mecal vêtira ye. Gulîzar ji pîrê ra diwê, here padîşah ra biwê ku bila dawetê dagirî, hespan goliyan li hev xînî, sê caran mi dora xênî ra diwî tînî. Diwê ji xwe ki Şahîsmaîl wê çaxê bi hespa hatin mi birin birin, nekirin ji xwa ez ji dest çûm.

Diwê Pîrê dere ji Padîşê ra diwê Padîşahê mi, te dî mi çiton çêkir. Qîzikê gotiye bila dawet mawetê dagirin, sê cara mi dora xaniya ra bibin û bînin, bigerînin, diwê hespê siyarkinî.

Evana dawetê dadigirin, Şahîsmaîl wana jî siyarê hespê diwin, hinek jî tîn wê qîzikê siyarê hespê dikin. Dora xênî da tînin diwin. Şahîsmaîl carê berdidiyê nikanî bavê ser hespê. Ev mileta jê ra diwê Şahîsmaîl ev çi ye ti wer dikî? Diwê qîsûrê mi mêze nekin. Hespê min herçel e ez nikanim rast bikim. Cara diduyan dîsa saldirmîş dike, davê ser hespê û ew Erebe Zenîn û Şahîsmaîl lê dixine tîn.

Tên. Pir tên hindik tên. Tên derikî Şahîsmaîl diwê ki ez qefilî me diwê, hewkî radikevim. Şahîsmaîl serê xwe didi ser qora Gulîzarê, radikevî. Ev mileta li pêy tê. Tên tên, pir tên hindik tên. Birayê Gulîzarê jî tevlê bûne. Erebi Zengî wana ra dikeve herbê. Wana qir diki. Ev qîzika ji bo birayê xwe digirî, digirî. Hêstirê xwe dere li rûyê Şahîsmaîl dikevi. Şahîsmaîl hişyarê xwe diwi. Diwê, çi ye çi bû ye? Gulîzarê diwê; gewde xwîn biriye. Radiwin li wira jî siyari hespa diwin, lêdixini tên tên, tene mala Erebi Zengî.

Siwe dibe, Şahîsmaîl diwê ez derim. Erebi Zengî diwê Şahîsmaîl mere. Em vay teva te çar tene ne. Em xwa ra li vira bin. Kes nayê vira. Qûlekî Xweda nayê vira. Belkî çike teyrekî Xwedê were. Şahîsmaîl diwê na. Diwê îlam ki ez derim. Diwê êtme eyleme Şahîsmaîl. Mere serê xwe neke belayan. Diwê na ez derim.

Radibin ew û Gulperî jî tevî wan tê. Dîsan bi hev ra tên, tên mala Gulperiyê. Tên wê şevê Gulperî mala xwa da wan ra ezet û xizmetê dikerî. Birayê xwa jî hebûne. Diwê merin. Şahîsmaîl diwê wele ez diherim. Bavê mi wana nizanin ku ez ku va çûme. Vaye îsal çax da, îsal du sal e ku ez li rê û ûlaxa me.

Lêdixin tên, pir tên hindik tên. Gulperî diwê ki Şahîsmaîl çi didin te bêje na. Bêje ez tek wî finika digirim. Wî finikê didinê, finik digire. Tên didine bavê lêwik, jê ra dibêjine lawê te sê tene jin girtin vaye hatin. Bavê xwe jî kêf dike, sevînmîş dibe, ber bi dere. Çarşeva Gulperiyê derdixine ser ra, padîşah wan bûkan diwînî. Dilê xwa dikeviyê. Diwê îlam ki ew.

Gulperî diwê Şahîsmaîl bibê bavo em nayêne hundir. Em li der çadirê lêdixine. Çadir da disikinin heta ki me xanî çêkir. Bavê wî diwê Şahîsmaîlê min îllam ki were hundir. Tu qoçqocaman lawê padîşê yî. Şahîsmaîl diwê na bavo, nayême hundir. Em li der çadirê lêdixinê di çadir da disikinin.

Temam. Çadir da disikinin. Şahîsmaîl çalişmîş diwî. Xaniyê xwe çêdikerî. Sê çaviyan çêdikin. Dikevine binî. Ew dike, rokî, leleyê Şahîsmaîl jî heye. Bavê Şahîsmaîl diwê leleyê min! Diwê, ha. Diwê em çi bikin ki vî Şahîsmaîlî weynine rê. Diwê vî gundî topke, Şahîsmaîl jî topke weyne, yêmegê Şahîsmaîl zehîrî têke li ber dayne. Bavê li wî dike haa!...

Bana gund dike, bana Şahîsmaîl dike. Tê, tê êvarê, lele xwe ban dike diwê Şahîsmaîl! Diwê ha. Diwê bavê te ban dike. Gulperî diwê Şahîsmaîl, mi te ra nego ki em merin. Biskin ka serê te di çi belayê da ye.

Gulperî ji Şahîsmaîl ra diwê here here. Ku vî fînika li ku derê nan xwar, tu li wê derê bixwe. Fînîk digerî digerî, tere li ber padîşê, di tebexa padîşê da dixwerî, fînîk tere li wê derê dixwerî. Îca Şahîsmaîl ji tebexa xwa naxwe. Şahîsmaîl jî dere li wê tebaxê dixwe. Padîşê diwê Şahîsmaîl tu qoçqocaman lawê padîşê yî, tebexa xwe bixwe. Şahîsmaîl diwê na. Fînîkê mi ku li ku derê xwar ez li wê derê dixwim.

Wê derê dixwin, dixwin. Radiwî, lêdixinî tèn. Gulperî diwê Şahîsmaîl çi bû, dibê hal û mecal wêtira. Diwê Şahîsmaîl mi go mere, serê te dikevî belayê, te go na. Bû şeva din padîşê go leleyê min em çi bikin, vî Şahîsmaîlî weynin vê rê ki ez wan jinan bigirim? Lele gotiye ki, binê xanîkî boşke, serê xalî û kilîman rêxin, bi sungiya jî çaqmîşkin. Belkî Şahîsmaîl here pêlêke, taqilmîşê wan sungiyan biwe.

Wî xaniya boş dikin, xalî û kilîman rêdixînin, binî jî, sungiyan çaqmîş dikin. Dîsa êvarî tèn banî Şahîsmaîl dikin. Diwên Şahîsmaîl, bavê te bana te dike. Diwê e, jinika jê ra go Şahîsmaîl me te ra nego em merin. Vana serê te dîsa dikin belayê. Diwê Şahîsmaîl kûtiyê te ki ku va çû ti wi ra here. Kûtîk pêla ku derê kir, tu rêça kûtîkê teqîwke. Şahîsmaîl digirin, terin kûtî diwê Şahîsmaîl, çar goşê bigerin. Şahîsmaîl dide pêy kûtî ki kûtî pêla ku derê dike ew jî teqîw dike. Wê royê jî Şahîsmaîl geçirmîş dike.

Dibe roya sisiya. Padîşê diwê leleyê min em çi bikin? Lele diwê here boçika hespê wîna jêke, hespê wîna jî heft sal e xanîkî da girêdane, hîre hîra erd kola ye, weke quyî vekiriye. Şahîsmaîl neçiyê nediye. Şahîsmaîl diwê here boçika hespê jêke, weyne wan her dû bêçîkê wana girêde, diwê Şahîsmaîl diwê lele min çavan derxin. Şahîsmaîl wê wexta ki ew dikerî, ew ewka, ew boçika hespê dikevî hestiyar, nayê bizdandinê. Dere tînî, boçika hespê bona Şahîsmaîl jê dikin. Jinik diwê here Şahîsmaîl, tu qedera xwe razî be. Boçika hespê jê dikin, bêçîkê Şahîsmaîl pê girê didin. Padîşê dibê lele min îja çavan derxin. Şahîsmaîl destê xwe sîlkelemîş dike, ew boçika hespan dikevi wan hestiyar, nayê birandinê. Şahîsmaîl nikare derê.

Lele çavan derdixînî. Çavê rastê dike cêba çepê, çavê çepê dike cêba rastê. Derdixînî, dikine torbekî diwin davên qûyîkî. Davêne qûyî û wî fînika jî diwin davêne wî qûyî. Ew qûyîya jî li ser rêkî, li ser cadekî ye millet, tê dere. Kî ki tê parîk nan davê, ew kûçika nîn digire di wî qûyî da diwe jêr, dide Şahîsmaîl diwê bigir. Şahîsmaîl destê xwe digirînî digirî. Rokî bazirgan başî, lê dixinê bazirganê xwe digirin tînin. Tîni wê li serê wê quyî da rûdinin, nê dixwin, tişt mişt dixwin, diwê ew kûtiya nê digire. Bazirgan başî li milletê xwa ra diwê ki hela ew kûtiya teqîwkin, ew deri ku derê. Kûtî dere ser quyî, wî nanî davê. Diwê kûtî tê zimên. Wî mêrika ra diwê Şahîsmaîlê mi, min nan avêtiye destê xwe bigerîni. Destê xwe digirînî Şahîsmaîl, nîn digirî.

Ew bazirgan başî diwîni. Diwê em şerîtik berdidin, destê xwe bigerînî, wê şerîtê bigirî, em te dikişînine jor. Evana şerîte berdidin. Şahîsmaîl destê xwe digirînî, şerîtê diwîni, digirî. Şerîtê digirin tînin, mêrik tînin, diwên haydê em tev da tevî bazirganê me herin. Şahîsmaîl diwê na. Mi li ser vê kaniyê daynin cî bihêlin herin. Diwin li ser wê kaniyê daynin. Du tene sê tene gogerçin li wi ra pev diçin, diwê yek li yek dixin. Yek ji wana diwê keşkena vî Şahîsmaîlî zimanê me bizaniya, çavê rastê di cêwa çepê da ye yê çepê di cêwa rastê da. Şahîsmaîl jî ewk nake, çavê rastê dike ê çepê, ê çepê jî dike ê rastê. Çavê xwe hewkî şaş dibîne.

Tên, lêdixî kûtiyê xwa digirî tên. Pir derin hindik derin. Tên, têên, li derikî, cotyarekî hebûye cotî dajo. Dibêjin Selamun eleykum amca, ew dibê eleykum selam. Diwê çi heye çi tune ye. Cotyar diwê wele tawî/tayî ji tune. Îsal heft sal e padîşê lawê xwa avêtiye qûyîkî, sê tene jinê xwa hene, teva wan jinan dikevî herbê. Ew Erebkî Zengîn heye millet qir kiriye. Kes nawê soy û sira min e. Diwê kalo, diwê apo, mi bigiri here. Soz îja ez bera te ra dikevime herbê. Êvarê ku çito baş dikan, bi hev ra lê dixinin tên. Sade êvarê ew padîşa tê ser qulikê, diwê amca diwê kalo diwê, soy û sira te ye. Diwê herê herê, lawkî mi heye dişînim. Saleke diwî. Lêdixînin hespik heye, hespik topal didine wî Şahîsmaîlî. Şahîsmaîl de çavê xwe şaş e. Telva wîni dikevî ewkê, dikevî herbê. Hev û du dayin nakin Êvarê ku Erebê Zengî diçe malê diya lêwik ra, diya Şahîsmaîl ra diwê wele va mêrika xurt e. Ez nikanim pê. Hespê xwa ku topal newûna, ez dikuştim muheqeq. Êvarê ku tê mal diwê amca, diwê çi ke, diwê lawê xwa Şahîsmaîl jî tunewû, diwê hewû. Diwê lê hespê wî ne hebiye? Hespê wîna li ku ye? Diwê wele hespê wîna va heft sal e di axwerekî da ye, qet kesê nêzika xwe naki. Dihîre disikini, herd kola

ye, du metre, sê metre herd kola ye. Diwê hela ez herim, mi nahêlî. Diwê hela here.

Lêdixinê ki diçinê. Hesp hîrînê xwe didi ser Şahîsmaîl. Şahîsmaîl desmala xwa derdixîni, sê caran hespê ra dike. Hesp dise. Qemertayî, Şahîsmaîl digire dîsan lê siya diwe. Tê ew û bavê xwe dikevîne herbê. Dikevinê herbê hev û du dibinin û tînin. Va dayî nakerî. Diwê ev jinana ji hev ra diwên ki, va mêrika, diwê ku ku li padîşêh xîni, diwê axûyê vexwîni kêrê li xa xîni. Hiç diwê vî padîşahê mekin. Megirin diwê. Diwê roya din dîsan dikevîne. Diwê padîşah digiri, Şahîsmaîl dayni erdê. Diwê millet diwê ha Şahîsmaîl ha Şahîsmaîl. Şahîsmaîl lêdixîni, bavê xwa dikujî. Padîşah dikujî. Jinan ra jî diwê qe metirsin. Ban dîkin diwê qe metirsin. Şahîsmaîl lê dixîni dere ku çavê xwe şaş e. Diwên Şahîsmaîl ti qey wîtirê, diwê çavê min ê rastê kiriye cêwa çepê, ê çepê jî kiriye cêwa rastê. Wê çaxê va mi yanliş va çavê xwa kirinê. Li wê derê hev û di digirin, sazan, dawilan, derin miradê xwa şa dibin. Çîrok çû li diyaran rahme li bavê guhdaran.

Gotî: Hüseyin Bayır
Temen: 89
Cinsiyet: Mêr
Herêm: Gundê Bilan/Mazgîrd
Perwerdehî: Dibistana Seretayî
Berhevkar: Hikmettin Atlı-Sibel Taş
Dîrok: 02/07/2018

Not Ev efsane bi tirkî hate vegotin lê me wergera wê bo kurdî kir.

Dewrêşê Gewr

Mesela navê Dewrêşê Gewr ji ku derê tê? Hecî Kurêşê Mubarek. Kurêş Bava, bavê Duzgun Bava ye ha. Kurêş Bava ji aliyê Mekkeyê hatiye. Ev baxê

hember heye ya, dema Aladdînê Keykûbad bûye. Em bêjin waliyê Aladdînê Keykûbad. Wê derê wî îdare kiriye. Ew ji ser wî baxî, Kurêş Bava ji ser wî baxî wisa urbane xwe derxistiye û lê siwar bûye ji ser çem derbas bûye. Vana dicing ji Kral ra dibêjin. Dibêjin Paşayê min vayê merivekî wisa wisa kir. Em nizanin ew çi meriv e? Sêrbaz e yan tiştêk dî ye. Dibê wî bigirin bînin. Wiya digirin tînin.

Jê ra dibêjin: Tu sêrbazî tu çi yî? Tu kî yî? Te ev av çawa derbas kir? Zilam dibêje ku; ez feqîrekî me, derwêşekî xwedê me. Eviya jê ra dibêje madem tu derwêşî here ji min re xiyarek teze bîne were. Ka em bibînin tu çawa dewrêş î. Wê demê ew mubarek diçe, li jora wî baxî cihek heye. Goya li wê derê xiyaran çiniye. Ji wê derê ew mubarek xiyarek tevî lema wê tîne. Dîsa ev ji wî bawer nake. Dibê ku ev vî karî bike di viya da tiştêk heye. Dibê ku li vê derê wê xelkê bide dû xwe, bi xwe ve girê bide. Wê di navbera me û xelkê de nexweşî derê. Herkes wê li dû viya here.

Go, em çi bikin bi vîna. Ya baş em firinê vêxin, em viya bavêjin firinê. Wî digirin tabî. Firinê pêdixin. Piştî ku firin pêdikeve, tê hesabê, derê firinê vedikin, bi çepilê viya digirin, dibin davêjin firinê ha. Dema ku viya dibin ber devê firinê, ev ê ku em dibêjin Dewrêşê Gewr heye ya, ew jî peywirdarê Aladdîn Keykûbad bûye ha. Li wê derê bûye boy wezîfeya xwe. Li ber derê firinê bûye. Çawa ku derî vedikin boy ku vîna bavêjin firinê, ew jî bi milê viya digire û wî jî bi xwe re dikişîne hundirê firinê. Ew jî dikeve firinê.

Tabî, rojek du roj şûnde, firin sar dibe. Dibêjin hela ka em herin binihêrin xwelî meliya vana li ku ye. Têne vê derê dinihêrin ku vayê simbêlê vîna bûz girtiye. Simbêlê Dewrêşê Gewr jî yê Kurêş Bava jî. Vana dipirsin dibêjin çi bi we hatiye? Yaw me, we avêt firinê! Çi bû? Çawa bû ev? Eviya ji wan re dibêje wele me firin mirin nedî. Çawa bi milê mi girt, ez birim, li wê derê wer bayek hat... Hewayek sar hat. Me agir magir nedît!...

Hingê ew zilamê Keykûbad, waliyê wî jê bawer dike, jê hemen bawer dike. Ji Kral re dibêje: Ev dibêje ez derwêşekî feqîr im. Zirara min ji te re çênabe. Eviya, Kurêş Bava dibêje: Ez zirara min ji însnan re nabe. Yanê ez exlaqê wan rast dikim. Eger ku di rêya ne baş de bin ez wan tînim ser riya baş. Ez tenê nesîhetan dikim. Wan ji rêya xerab digirim.

Vana jê re dibêjin: Em ku derê bidine te? Tu çi dixwazî, ku derê dixwazî em bidine te. Wê hingê ew gundê ku dibêjin Çalakas, yanê gundê Kurêş heye ya. Dibêje, ew gund qasî gomekî ye, wî gundî bidine min. Ez ê li wê derê mekanek ava bikim, mirovan perwerde bikim. Ez ê mirovan bixim rêya rast. Ku di riya ne rast de bin, ez ê wan bînim ser riya rast.

Ew mubarek li wê derê bicih dibe. Dewrêşê Gewr jî, ew zilamê Aladdin Keykûbad heye ya, ew jî kerametê Kurêş Bava digire. Te dî ji firinê tevî xweliya agir derdikeve ya, her derê wî sipî ye gewr e loma jê re gotine Dewrêşê Gewr.

Kerameta Seyid Huseyin

Te dî, kerameta Seyid Huseyin aşkera ye. Rêberê me ye, Seyid Huseyin, ew jî ji ocaxa Dewrêşê Gewr e. Tabî kurê viya, kurê Seyid Huseyin heye, bi navê Seyid Memed. Seyid Memed di wexta me de bû. Çûndin û hatina me hebû. Dihate cem me. Ew, hê ku bavê wî sax e, diçe ewê, diçe Mazgîrdê. Karek wî heye diçe Mazgîrdê. Bavê wî dibêje: Kurê min here lê zû vegere. Nekeve derengiyê. Yanê şevê li wê derê nemîne. Eviya diçe. Diçe tabî. Ê dereng dibe, şev e, tabî viya nayê. Li wê derê dimîne wê şevê. Li Mazgîrdê dimîne.

Şeveq dibe, di riya çiya de ji Mazgîrdê tê. Kert dibêjin ji wê derê re. Ji wê Kertê, ji Çiyayê Çilan, ji wê rêyê tê. Ew tê, li wan deran rastî bavê xwe tê. Bavê wî ji wê derê de tê. Diçe destê bavê xwe. Bavê wî jê re dibêje: Kurê min kanê tu yê bi şevê nemana? Tu çima dereng ketî? Ew jî dibêje bavê xwe: Bavo, wele min karê xwe negihand, tarî bû êdî loma nehatim. Îja tu ku va diçî bavo? Bavê wî dibêje: Tu here, ê min li aliyê Çiyayê Çilan karek min heye, ez ê herim û werim. Eviya tamam dibêje. Hinek diçe dibîne ku wayê komek mirov li ser goristanê kom bûne. Qelebalixek heye li ser goristana gund. Hinekî nêz dibe, evana tèn pêşiya wî, tèn pêşiya Seyid Memed. Dibêjinê: Serê te sax be. Bavê te duhî şevê rehmet kir. Eviya şaş dibe. Yaw, dibêje. Bavê min çawa rehmet kir? Min hê nû ew dît! Carekî ji devê wî dertê ya. Dibê mi li wê derê ew dît, ji min re got, ez va diçim têt! Ji min re got tu here ez va têt... Îca van mirovan wiha xwedan keramet bûn. Niha li ku ne ew mirovên xwedan keramet. Wî jî wefat kir.

Ha li vê derê li Akpazarê, li goma Bardakçî, yek hebû bi navê Berber Yûsif. Ev Yûsifê berber dema ku gayên wî cot dikirin, her tim lingên gayê xwe

maçî fikir. Hem bi wan cot fikir hem lingên wan maçî fikir. Nav li gayên xwe kiriye. Gotiye; yaw vana heywan in erê lê em çima ev qasî eziyet bi wan dikin? Eviya merivekî baş bûye. Her tim wisa bûye. Hem nîr daniye ser van gayan hem jî lingên wan maçî kiriye. Wiha dewam kiriye. Havînê dema çandinê, wê demê dema çandina zeviyê, me di çandina pêşîn de niyaz dibir di ser nîra wan gayan deparçe fikir û paşê dianî li gund, li cîranan belav fikir.

Eviya jî Yûsifê berber jî wisa dike, niyaza xwe dibe, wextê ku niyaza xwe parçe dike û lingên gayê xwe maçî dike, ga tê ziman, wekî mirovan xeber dide. Êdî çî xeber didin kes nizane lê ev Yûsifê berber lal dibe, ji xwe ve diçe. Te dî ga diaxive ya, eviya dikeve heyecanê û ji xwe va diçe. Ev Yûsif ha, ev berber.

Ê tabî rojek wiha, pênc roj wiha, deh roj wiha nexweş dimîne. Hinek dibêjin; yaw rêberê me Seyid Memed heye, em bibin ocaxa wî. Dibin ba Seyid Memed. Seyid Memed, wiha lê dinihêre, dinihêre. Dibê: Kurê min, ga ji te re çî got te ji gayî çî got? Hela lê dibîn!... Kesê ji Seyid Memed re behsa ga nekiriye lê ew dizane. Ê ev Yûsifê berber, hingê tê ziman. Heya wê wextê nikare xeber bide ha. Li wê derê zimanê wî vedibe. Ê tabî kes nabêje ku gayî jê re çî gotiye. Ev sir e. Herkes nikare sirê bibêje kî!... Aşkerakirina sirê ne baş e. Mesela Seyid Memed dikaribû bigota ku gayî jê re çî gotiye. Ew xwedan keramet bû, dizanibû. Karibû bigotana ku; wî ji te re viya got û te jî jê re viya got. Lê negotiye. Ev sir in, nayêne gotin. Hihh... Însan e yanê, her tişt di însan de ye. Di însan de nûra xuda jî heye û ji heqiyê/heq cudabûn jî heye. Ya... Wisa yanê...

Ev Yûsifê berber jî hinekî baş bûbû ha. Mêrik van demên dawîn hinekî li ser hişê xwe bû. Me ew dît ha. Hinekî wisa ew bû, wekî bûdelayan bû ha... Wisa merivek sar bû. Bi kesê re xeber nedida.

Evana ocaxa Dewrêşê Gewr bûn ha. Hîmeta xwe ji Kurêş Bava girtibûn.

PÊVEK 3

HEVPEYVÎN BI LÊKOLER Û FOLKLORZANÊN KURDÊN ÊZÎDÎ RE

1. Hevpeyvîn Bi Celîlê Celîl Re Li Ser Folklor û Civaka Êzîdiyan

Hevpeyvîn bi rêya înternetê hatiye kirin.

Dîrok: 27/06/2020.

Hikmettin Atlî: Silav mamoste. Ez Hikmettin. Ji bo xebata xwe ya doktorayê dixwazim bi we re li ser êzîdiyan, folklorê wan, nasnameya wan hevpeyvînekê bikim.

Celîlê Celîl: Hîkmet can. Ez êdî extiyar im, kal im. Nikarim wiha xeber bidim. Ne te dî Şivan xeber da çi hat serê wî.

Hikmettin Atlî: Rast e mamoste. Ez jî naxwazim we aciz bikim. Bi tenê çend pirs min ê bipirsiyana. Wekî êzîdî kî ne. Tu eleqeya êzîdiyan û elewiyan û yarsaniyan he ye an na?

Celîlê Celîl: (Ev der ji ber problemên teknîkî tam nehatiye famkirin) ...Laleş bingehêk bûye ku wê derê her du jî civiyane (civakên êzîdî û elewî). Çunkî şêxekî kevin, extiyar 50 sal berê ji mi ra got. Go, em Mergehî ne. Go êzîdî Mergehî ne. Lê belê Kekeyî jî hebûn. Du qisim bûn. Kekeyî û Mergehî. Mi go Mergehî çi ye Kekeyî çi ye? Tu wê zanî?

Hikmettin Atlî: Kakeî ez zanim mamoste...

Celîlê Celîl: Na Kakeî na! Merge çi ye?

Hikmettin Atlî: Nizanim mamoste.

Celîlê Celîl: Merge Laliş e. Yanî goristan. Tu çû yî wê derê?

Hikmettin Atlî: Na ez neçûme mamoste. Nikaribûm biçûma..

Celîlê Celîl: Goristan e. Goristana pîroziyan e. Îja tiştêkî ji min re got. Wekî tu zanyarî zû fam dikî. Go zimanê wana giran e. Wana ji me qetiyar, ji me dûr ketin. Çûn hunda bûne. Hunda bûne ne hunda bûne. Dûr ketine. Ji wana re hunda bûne.

Yanî êdî ew nîne. Zimanê wan giran bûye. De îjar merge çi ra dibêjin. Ji ber ku wê derê gişk mixare, şikeft in. Û gişk pîroziyên êzdiyan tê de çalkirî ne. Îjar hin zanayên êzdiyatîyê hene li ewropayê û ne kurd in. Hevalên min bûn paşê min wana re şer kir. Min got hûn zanyar in lê tu tişt nizanin. Çimkî êzdiyan wekî êtnîk grûp dîtin. Çawa êtnîk grûp e? Dîn diguhêzin dibin êtnîk grûp? Erebeke dînê xwe biguhêzîne bibe xaçparêz, katolîk qey ew êdî ereb nîne? Erebe! Dînê xwe berdaye. Lê nabêjin bûye fransîz yan jî ermen.

Hikmettin Atlî: Yanê hûn dibêjin cudahiya dînî rê lê venake ku etnîsîteyêke cuda çê bibe?

Celîlê Celîl: Baş e. Îcar em li ser diyanetê ji ber ku gelek kokbir kirine. Ez hinekî zêde çûm lê ez serê te naêşnim. Li ser Ansîklopediya Îslamî. Dinivîsin ku êzîdî kurdziman in. Lê kurê kê ne? Ji çi eslî ne? Yanî ji kurdan diqetînin. Veke li Ansîklopediya Îslamî binihêre. Tiştên wisa Kreyenbroek nivîsî, şagirta wê jî nivîsî, Allison. Lê ev ne rast in. Gişk hevalên min bûn. Ez nika ji wana gelek aciz bûme. Ez ji yekê stranên şînê dixwazim Dostê min ê berê bû. Di radyoya kurdî de kar kiriye. Stranên şînî li ser bavê min dibêjin. Ji mi re dibê Celîl eva çi ye? Kurdkî ye yan êzdîkî ye?

Hikmettin Atlî: Mamoste ez pirsek bikim. Ev tiştê ku hûn dibêjin. Yanê ku hin zanyar êzdiyan wekî civakek cuda, etnîsîteyêke cuda dibînin, di nava êzdiyan de jî hene kesên wiha. Çi li Kafkasyayê çi li Şengalê û li herêmên dî?

Celîlê Celîl: Ew gotin berê da jî hebû. Lê Sovyêtê de me pir safî kiribû. Stranên ku di radyoyê de dihatin gotin, ji sedî 98 gişk êzdiyan digot ew stran. Û hinek jî ermenî bûn. Kes tişt nedigot, eva êzdî ye eva kurd e. Lê wexta ku ermenî û azeriyan şerê wan çê bû. Ermenî ketin Qerebaxê. Azerî, ermeniyan rakirin ji welatê xwe, ermenî, azeriyan rakirin ji welatê xwe. Û pê re jî kurdan jî gelek aciz kirin. Şerê wana pêşî şerê diyanetê bû. Yanê beyraqa diyanetê rakirin. Icar kurdên misliman çûn em man. Yanî te' de dikirin. Ne ku dikuştin lê xirabî dikirin.

Hikmettin Atlî: Ermeniyan vê li kurdên misliman dikir ne mamoste?

Celîlê Celîl: Lê kê dikir? Îjar êzdî tu zanî. Eger diyanetek wekî ku digere, rabe bîne xelqek bixe ser diyaneta xwe, ew hov e. Ew mecbûr xwîne birijîne. Ku tu bibêjî, ez çîn im, mesela diyaneta min navê wê çîn e, tu nayê nabî, gere ez te

bikujim, ez ê te bikujim dîsa ez cinetî me. Lê diyaneta ku dibê ez ev im, îşê min bi te neketiye, ez dihêlim bijîn eva nikare agresîf bibe. Tu tiştêk bêjî ser diyaneta wî belkî bixeyide belkî kuştin jî çê bibe. Êzdî weha ne, nakin. Tu bibî zêr jî wê ji te spasdar bin, wê çiqas be jî dost bin, wekî nav kurda dibin kirîv lê diyaneta xwe naguhêrin. Dêmek di nava êzdiyan de agresîvî tune. Lê ermenî ew kirin, xwestin wan ji kurdîtiyê biqetînin, berî kurdên misliman dan lê berî wana nedan bo ku wan ji kurdîtiyê biqetînin.

Hikmettin Atlî: Mamoste tiştêk ji we bipirsim. Hun dizanin di nava ermeniyên de kesên wekî Poladyan hene. Hûn dizanin ne wisa?

Celîlê Celîl: Îca ez li serê dixebitîm.

Hikmettin Atlî: Poladyan hûn dizanin dibêje ku eleqeya êzdiyatîyê bi dînê berê yê kurdan re tune ye. Êzdiyatî ji nava îslamiyetê derketiye. Hûn çawa li vê meseleyê dinihêrin.

Celîlê Celîl: Hîkmet can evana pirsên hêsan nîn in. Êzdî xudênas in. Dêdorê giş muhemmedî û îsayî ne. Milletê ku ne ereb bûn, wekî ku xwe hinekî ji qetlê dûrxin, ewana xudênasiyê qebûlkirine lê dîn qebûl nekirine wekî sunî yan jî şîe nebûne. Eviya zanî mijara lêkolînên mezin e. Rastî êzdîtî kûr e. Çimkî wexta ku meriv êzdîtiyê vedike, gelek baweriyên kevin, gelek ku di nava kurda da heye, di nava êzdiyan de maye. Mesela eşîrek heye di nava êzdiyan de ku çêlek diparêzin. Tu zanî ev li Iraqê hebû li Hîndistanê heye.

Hikmettin Atlî: Yanê hûn dibêjin êzdîtî wekî dîn beriya îslamiyetê jî hebûye mamoste?

Celîlê Celîl: Êzdîtî wekû diyanet, wekû diyaneteke rêk û pêk, êzdî xwe dibêjin, hed û sed, erebî ye, nizanim tu zanî yan na. Yanê qanûn, rêk û pêkiya diyanetê, rê û rijmên diyanetê, eva Şêx Hadî daniye. Lê parastin, ew berê de hebûye. Eşîrê me her yek ser tiştêkî de çûne. Lê bingeh av bûye, tabîat bûye, tav bûye, ard bûye. Dibêjin dewrêş Erd. Şems tu zanî. Hêla îranê Şemsanî hebûye.

Hikmettin Atlî: Mamoste tiştêkî bipirsim, şemsanî êzdîtî ye an na?

Celîlê Celîl: Şemsanî êzdîtî ye lê çawa! Şems diparêzin. Yek ji ewê mezin ew e. Tawis jî heye. Ew jî mezin e. Tu dizanî Feliks heye. Li Fînîke. Gelek tişt hene Hîkmet can. Evana tiştên bingehîn in.

Hikmettin Atlî: Mamoste çend pirsên min yên dî jî hene.

Celîlê Celîl: Hîkmet Can, ez 84 salî me. Zanîn heye lê taqet tune.

Hikmettin Atlî: Li min biborin mamoste. Ez wiha we diwestînim.

Celîlê Celîl: Ez aciz dibim lê hema ez dîsa rûdinê karê xwe dikim. 25 cild heye ez hazir dikim. Cîldeke qewl û beytên êzdiyan. Yên îslamî jî hene qesîde, ser Elîşêrê Xwedê, Hemze Palewan, Fatime, hazir dikim cildek. Evana hemî folklor in.

Hikmettin Atlî: Mamoste li ser Mishefa Reş û Cîlwe. Bi ya we ev kitêb hene? Li ber dest hene an na?

Celîlê Celîl: Mishefa reş gerek win bixûnîn. Du cara min bi kurdî çap kiriye. Bersiva vê min berê nivîsiye. Herin li vê nivîsê binhêrin hûnê bibînin heye an na. Min kurdî hazir kiriye. Min du sê salan bi taybet li ser êzîdîzmê lêkolîn kir. Ya bavo çemek bû bû behr dûre jî behr bû okyan. Qeraxên van hene. Min lêkolînek li ser Huseynê Hellac jî nivîsiye. Çiqas sûfiyî îslamî hene li ser wan qewl û beytên êzdiyan hene. Ya bavo herin binihêrin sûfiyê îslamê. Tu here nava mislimana şerab vedixwin. Îranê vedixwin. Sûfiyê wana şerab muqedes dibînin. Edebiyata wan gişk şerab e.

Hikmettin Atlî: Mamoste di qewlê êzdiyan de dibêje Sultan Ezî şerab vedixwe ku wî gunehê herkesê girtiye ser xwe.

Celîlê Celîl: Hîkmet Can, hezar tişt hene. Rebîa Edawî tu dizanî. Jinek e eva. Ji Misirê bûye. Sedala heftan wê şewitandine. Qewla Rebîa Edawî heye di nava êzdiyan de. Tu çûyî Iraqê. Tu herî gundê Barzan. Rê va navê ciyan, çolan, deştan gişk navê êzîdî ê kevin in. Çiyayê Dasinî. Dasinî eşîrek bûye mezin û êzdî bûne û di nivîsên mîxî de mane. Tu dizanî Dunbuliyên Xoresanê êzîdî ne. Bixwîne. Şerefname dibêje hêza xirab diparêzin. Ev îsbatiyekî ye. Gelek tişt hene lê em nizanin.

Hikmettin Atlı: Mamoste di Şerefnamê de tê gotin ku demekê dînê fermî yê Mîrekiya Cizîra Botan, êzdiyatî bûye...

Celîlê Celîl: Ez te ra bibêjim, eva teze ye. Yanê navê êzdiyatî teze ye. Eva paşê çêbûye. Em bibêjin di edebiyata berê de navê êzdiyatî tune. Êzdî dûre ji xwe ra gotine em êzdî ne. Ji wan re gotine ku evana şeytanperest in. Evana jî ji wî navî xwe dûr dixin. Çunkî kirêt e. Çunkî nalet dikan. Êzdî jî di dîne xwe da lê nalet nakin. Navê şeytan hilnadin. Çunkî tune jî. Tu zanî di Quranê de dibêjin ew hêz xerab e. Loma navê Xweda li xwe kirine. Evana jî ji wî navî xwe dûr kirine. Te dî navê şeytan tê lenetkirin. Êzdî ew lanet nakin. Tu dizanî Tawîs, beriya îslamî heye. Ji Fînîke wan deran heta li Iraqê hebûye. Iraqê, naka tu di nava Barzaniyan de bigerî ewê êzdiyatîyê gelek hene. Diçî Barzan, gundê wana. Dibêje va çiyayê Pîrafat e. Eva Kurfat e. Pîroziya jinan e. Wana berê êzdî bûne. Hevalekî min li Hekariyê hezar çavkaniyê dîtin ku cî wekî navê Şêxadî ye navê êzdiyan e. Îjar tu zanî wana jî mecbûr in hinek îslamê ve girê bidin. Îcar tu zanî êzdiyan xwe ra gotine em êzîdî ne. Ew kuştin e. Loma vana gotine na em Yezdanî ne em êzdî ne. Hewramî jî wisa ne. Ewana jî îslam qebûl nekirine. Dînê xwe xef kirine. Gotine em Ehlê Heq in Heta niha qewlê xwe venekirine. Lê êzdiyan qewlê xwe vekirine. Min û Ordîxan dawîya salên 60î destpêka 70 cara ewil vê kir. Şêxê êzdiyan ji me ra digotin em ê we bikujin. Em ê serê we jê bikin. Digotin tu dînê me vedikî tê kitêba me ya muqedes çap bikî bikeve destê neêzdiyan ew ê bavêjin erdê, pêpes bikin. Lê min nivîsî gişk. Dîroka pîroziyên êzdiyan, legendî, poem. Evana çandekî ne. Ez mirovekî lîberal im.

Sûfîzm jî eva bûyerek e. Pêşiyê nava erebên ku ne bedewî bûne ku çanda wan hebûne. De Hikmet ez te ra bêjim kurê min. Heta tu sûfîzmê nizanibî tu nikarî êzdiyan jî fam bikî. Mesela şetîya îranê ku bûne Elî, evana sûfîzm e. Tu binihêre sûfîzim di nava milletên ku ne areb in de pêş dikeve, Asya navîn, Besra, Misir û Mûsil ku kurd e bingeha sûfîzmê ye.

Navê Sultan Ezî didin ku Xelîfe bû, Yezid bîn Muawiye, kuştin ew. Çunkî ewî guh nedida. Kêfan de wextê xwe derbas dikir. Çunkî wî gelek cî dida tiştên ne misliman. Evana ê Sûriyê ne. Gelek lîberal bûne. Tradîsyonên beriya îslamê li cem wan hebûne. Sûriye û Lubnan

Hikmettin Atlı: Mamoste bi ya we eleqeya elewî û êzdiyan çi ye?

Celîlê Celîl: Ewana mi got te ra. Ewana parçeyekî Kekeî ne. Ji Hewramanê ne. Ji Kurdistanê rakirine şandine Xoresanê. Ewana diyaneta xwe parastine. Wexta ku şahên zalim ji ortê rabûne ewana vegeyriyane. Hin vegeyriyane Hewramanê hin belav bûne. Biniya behra Xezarê. Dure hatine jorî Êrmiyê. Yên Dêrsimê jî ji wir hatine. Wana dibêjin em Dunbulî ne Xoresanî ne. Rast e. Diyaneta wan vê îspat dike. Evana hemî yaresanî ne.

Hikmettin Atlî: Mamoste teza min folklor e. Ez zêde meseleyên dînî nizamim.

Celîlê Celîl: Erebi nîn e lê sûfiyên wana gelek tesîr li êzdiyan kirine. Ya bavo ez bêjim zindî hene berê. Diçe digihîje Şêx Hadî. Şêxmûsê ku hûn diparêzin.

Hikmettin Atlî: Sultan Şêxmûs?

Celîlê Celîl: Erê ew e. Abdulqadirê Geylanî heye. Şêx Adî. Wana tev digihîjin hev. Tev ekolekî bûye. Tu zanî beytên vana hene. Eva jî edebiyat e. Eva edebiyata diyanetê ye. Her pîrsek lêkolîneke. Nava êzdiyan de pîrê çêlekna heye. Afsûna wî heye. Legend e. Sûfizmê bixwîne. Evana di bingeha xwe da dijî îslamiya ortadkoks e.

Hikmettin Atlî: Mamoste di folklorê de êzîdî xwe bêtir wekî êzîdî an wekî kurd pênase dikin?

Celîlê Celîl: Ta zanî êzdiyên sorana tune ne. Giş kurmanç in. Evana kurmanç û kurd yek in. Peyv ji eynî cihê tê. Kurd û kurmanç yek e. Eva jî mi îspat kiriye. Navê kurmanç ji kurd tê. Min nivîsiye lê hê min çap nekiriye. Eva zimanzanî ye jî.

Hikmettin Atlî: Mamoste min versiyoneke Destana Derwêşê Evdî xwend, Derwêş ji Zor Temir paşa dixeyide, diçe, diçe binê konekî. Jê dipirsin tu kî yî çi mîletî? Ew dibêje ez êzîdî me.

Celîlê Celîl: Dewrêşê Evdî, min şaxek nivîsiye, ji yekî 40 sal berê. Wekû kitêb ew ê derbikeve. Yekî êzîdî dibêje.

Hikmettin Atlî: Ev versiyon tiştêkî cuda tê de heye yan na? Di nava êzdiyan de tê gotin yan?

Celîlê Celîl: Êzîdî dibêje. Eva heft bav pêş de dest pê dike. Pir dirêj e.

Hikmettin Atlı: Mamoste li min biborin min we gelek westand. Spas dikim.

Celîlê Celîl: Erê birê min. Ez hinekî gêj bûme. Dê baş e. Te dengê min girt. Eger te tişteke tu serwext nabî ji min re bibêje.

Hikmettin Atlı: Mamoste hûn di nava rojê de kîjan wext musaît dibin. Ez ji we bipirsim.

Celîlê Celîl: Na. Ez êdî nikarim. Bawer nakim ez êdî karibim werim wan deran jî. Dê baş e. Bimîne di xweşiyê de Hîkmet.

Hikmettin Atlı: Gelek spas mamoste.



2. Hevpeyvîn Bi Dawid Mirad Xetarî Re

Dîrok: 28/06/2020

Dawid Mirad Xetarî: Ew bi xwe ji xelkê êzîdî ye. Ji herêma Şêxanê. Niha li zanîngeha Duhokê dersdar e. Gelek xebatên wî li ser êzîdîyan hene. Xebatek wî ya bi navê: *Mem û Zîn, Sê Versiyonên Wê Ji Devera Êzdiyan* heye û min ev pirtûk di teza xwe de nirxandiye.

Hikmettin Atlî: Merheba mamoste Dawid Mirad Xetarî. Navê min Hikmettin Atlî ye. Ez dixwazim di heqê folklor û civaka êzdiyan de bi we re hevpeyvînekê bikim.

Hikmettin Atlî: Navê pirtûkê sê versiyonên ji deverê êzdiyan

Dawid Mirad Xetarî: Belê belê.

Hikmettin Atlî: Mamoste navê min Hikmettin Atlî. Ez li Zanîngeha Bîngolê xebata doktorayê dikim. Li ser folklor êzdiyan.

Dawid Mirad Xetarî: Belê

Hikmettin Atlî: Dema ku xebitîm rastî kitêba we hatim.

Dawid Mirad Xetarî: Eger li ser folklorê ye kitêbê min gelek in. Dikarim bo te bişînim.

Hikmettin Atlî: Kitêba we demekê hevalem ji başûr hatibû bo min anîbû. Tenê ew li ber destê min heye. Enstîtuya Kelepêura Kurdî çap kiriye. Ne wiha?

Dawid Mirad Xetarî: Belê Wiha ye.

Hikmettin Atlî: Îcarê di wê derê de ji xwe ez li ser Mem û Zîn jî xebitî me û wekî dî jî li ser folklorê êzdiyan dixebitim. Min got ez bi we re li ser folklorê êzdiyan li ser civaka êzdiyan hevpeyvînekê bikim. Çend pirsên min hene dixwazim bo we pirs bikim.

Dawid Mirad Xetarî: Baş e ser çava.

Hikmettin Atlî: Mamoste xeyn ji vê ya pirtûkên we çi hene yên li ser folklorê êzdiyan?

Dawid Mirad Xetarî: Wek folklor ew kitêb heye. Û du kitêbê stranan hene. Min 35 kitêb hene.

Hikmettin Atlî: Tev li ser folklorê ne mamoste?

Dawid Mirad Xetarî: Na na, mêjû û dokumentî ne.

Hikmettin Atlî: Hûn niha li ku derê kar dikin mamoste?

Dawid Mirad Xetarî: Li vir li Duhokê, li Zanîngeha Duhokê, Beşa lêkolînê.

Hikmettin Atlî: Mamoste hûn bi xwe jî xelkê êzîdî ne?

Dawid Mirad Xetarî: Belê

Hikmettin Atlî: Êzîdiyê kîjan herêmê?

Dawid Mirad Xetarî: Herêma Şêxan.

Hikmettin Atlî: Ser seran ser çavan mamoste. Mamoste dixwazim ji we pirs bikim. Mesela bi ya we, dema ku mirov bêje folklorê êzîdiyan, meriv çawa dikare wê pênase bike bi giştî? Hûn çi dikarin bibêjin ji me re li ser folklorê êzdiyan?

Dawid Mirad Xetarî: Bê şik her miletekî folklorê xwe heye. Ew jî kevnarbûna wan diyar dike. Dîroka wan diyar dike. Êzîdî jî xwedî mêjûyekî kûr û dûr in. Bê şik folklorê gelekî xurt heye. Eger bêt û berê xwe bideyne folklorê êzdiyan, dewlemendiyeke mezin tê de heye. Bes li serê lêkolînê dewletî nehatine kirin. Sazî û dezgeh li serê kar nekirine. Bi tenê kesan xebat kirine. Hindek kesan kirine. Gelek pêdivî heye ku xebat li serê bê kirin.

Hikmettin Atlî: Mamoste we got folklorê miletê êzîdî gelekî dewlemend e. Hûn dizanin bi giştî miletê kurd xwedî folklorê dewlemend e. Êzîdî jî parçeyêkê wê civakê ne.

Dawid Mirad Xetarî: Ezê bême ser vê pirsê. Kurd, li gor mêjûyê, beriya îslamiyetê, tevaya wan rojperestî bûn, êzîdî bûn. Îca wextê miletekê bête ser dînekî dî, folklorê xwe nagorit, axa xwe nagorit, zimanê xwe nagorit. Bi tenê

baweriya xwe digorit. Rast e miletê kurd dînê xwe ji dest da lê axa xwe ji dest neda, zimanê xwe, folklorê xwe ji dest neda. Her ma wek xwe. Ji vê yekê jî em dibînin hîç cudahiyeke nîne di navbera folklorê êzdiyan û folklorê kurdan de. Heta nûka jî wek xwe maye.

Hikmettin Atlî: Mamoste ez ê bême ser wê pirsê. Bi ya we çima di nava civaka kurd de folklorê êzdiyan bi taybet dewlemend e? Sebebek vê heye gelo?

Dawid Mirad Xetarî: Erê heye. Kesê kurdên misliman, her cume' diçine xutbê. Xetîb tu carî behsa kurdayetiyê nake. Filan erebî wiha gotiye, nizanîm Xalid bîn Welîd wiha gotiye. Behsa xelîfeyan tê kirin. Her ew di serê kurdan de bi cih kirine. Tu car behsa şexsiyetên kurd, mêjûyê kurd nayê kirin, kurdewarî, nayê kirin.. Ê ma bi hezaran sala em li ser kurdayetiyê ne. Ev berê jî wiha bûye û anîha jî. Her tiştê me bi zimanê kurdî bûye.

Hikmettin Atlî: Mamoste bi qandî ku min li ser êzdiyan lêkolîn kiriye, di nava civaka êzdiyan de heya demê nêz jî xwendin û nivîsandin dibêjin ku qedexeyê bûye. Gelo dibe ku sedemê dewlemendbûna folklorê wan jî ji vê be?

Dawid Mirad Xetarî: Na na! Tu zanî dewlet hingê nebû. Xwendin û nivîsandin bi tenê li du cihan hebû. Eva digotîne hucre. Li wê derê xwendin û nivîsîn hebû. Îslamiyet wiha dikir. Kerînîsa jî bes bo îlmê mesîhiya xwendin û nivîsandin dikirin. Êzdî mecbûr diman wisa bê xwendin û nivîsandin di nava civakê de. Ji ber ku di van hucreyan de xwendin û nivîsandin bi erebî bû kurd li wê derê folklorê xwe ji dest didan.

Hikmettin Atlî: Mamoste pirseke dî. Bi ya we di nava berhemên folklorê yên kurdên misliman û kurdên êzîdî de hevparî heye yan ji hev cuda ne?

Dawid Mirad Xetarî: Folklor her folklor e. Lê mi gote te hindê cara ew tiştên kevin mane. Carina tu diçî nava civata kurdên misliman ji te ra behsa folklorê ereban dikin. Behsa folklorê xwe nakin. Eva hanê problemeke mezin e. Di nava êzdiyan de ev tune ye. Her ev e folklorê kevin. Çênabitin behsa folklorê ereban bikin. Cem me ereb qedexeyê ne.

Hikmettin Atlî: Yanê hûn dibêjin ku di navbera civaka kurdên êzîdî û ereban de wiha cureyek rikeberî heye?

Dawid Mirad Xetarî: Na na! Em zimanê hev û du fam nakin keko. Ew zimanek e ev zimanek e. Em fam nakin. Bav û bapîrê me fam nakin. Li ba me mele nebûn ku erebî bo me bixwînin.

Hikmettin Atlî: Mamoste demekê min li derekê xwendibû, dibêjin ku hin êzîdî bi taybetî yên devera Ba'edrê, dibêjin ku têkiliya wan bi ereban re baştir e. Hera qismek ji wan xwe wekî ereb dibînin.

Dawid Mirad Xetarî: Keko Seddam Huseyin gote Tehsîn Beg (Mîr Tehsîn, mîrê êzîdiya): Ente Ereba (hûn ereb in). Tehsîn Beg got: Ma nizanim tu çi dibêjî. Tu bi erebî diaxivî ez bi kurdî diaxivim. Seddam Huseyin kenî gote: Here here tu kurdî.

Hikmettin Atlî: Li cem me jî xelkên ku nêzî sînorên tirkî carina ji xwe re dibêjin em tirk in. Ev e bêguman encama polîtîkayên dewletê ye. Mamoste dixwazim di heqê folklorê de pirsek dî bikim. Mesela li cem me jî Mem û Zîn heye li cem kurdên êzîdî jî. Dîsa Derwêşê Evdî û Edûlê jî, Kela Dimdim jî û her wiha gelek berhemên bi vî rengî hevpar hene. Li gorî we di versiyonên nava êzdiyan de mirov wê taybetiya wan ya dînî, bawerî dibîne yan jî hîç guherîn pêk nayê

Dawid Mirad Xetarî: Zanî eger berê xwe bidî Mem û Zînê, berê her tiştî Ehmedê Xanî bi xwe êzîdî bû, ne misliman bû.

Hikmettin Atlî: Hûn wisa dibînin mamoste? Ez wê nizanim bi rastî.

Dawid Mirad Xetarî: Na na, bes çî bû. Bavê wî Şêxî Şêxhesina ye. Eva hanê lazim xwendin û nivîsandina wan hebe. Li wê derê qutabxane nebû. Mecbûr bû ku kurê xwe bişîne ba melan. Îca mela ew fêrî Quranê bû. Eger ku bêy tu kûr berê xwe bidiyê, gelek tiştên êzdiyatîyê di Mem û Zînê de hene. Tesewif e, êzdiyatî ye.

Hikmettin Atlî: Mamoste, dîsa dixwazim bipirsim ku taybetiyên berhemên hevpar yên di nava êzdiyan de çi ye? Êzîdî hîç mohra xwe ya dînî li berhema folklorê dixin?

Dawid Mirad Xetarî: Dizanî carina di berhemên folklorî de di vê wateyê de gorînên mezin çê dibin. Te dî meriv lê rast tê ku di berhemeke folklorî ya nava kurdên misliman de tê gotin ku; yekî weke Xalid Bin Welîd bû. Yanê carina tê dîtî ku hin tiştan li berhemên folklorî zêde dikin û dibine ser sîstemeke îslamî. Lê

Mem û Zîn de tu çawa bixwînê jî, tu tesîra îslamiyetê li serê nîne. Ez wisa dibînim.

Hikmettin Atlî: Mamoste hûn di nava êzdiyan de peyva firwar dizanin?

Dawid Mirad Xetarî: Firwar biryar e. Di nava êzdiyan de ev tê bikaranîn. Hevalekî min heye, kitêbek wî heye bi navê “Êzdiyatî Di Mem û Zîna Xanî De”

Hikmettin Atlî: Nivîskar kî ye mamoste?

Dawid Mirad Xetarî: Kovan Xankî

Hikmettin Atlî: Belê dizanim. Li ser Qewlên êzdiyan kitêbek wî heye. Mamoste pirsek dî bipirsim. Ez hem li ser folklorê êzdiyan hem jî li ser folklorê elewiyan dixebitim. Gelo bi raya di navbera êzîdî û elewiyan de têkiliyek heye an na? Li alî hev in yan li hember hev? Hûn çawa dibînin.

Dawid Mirad Xetarî: Elewî bi xwe ne misliman in. Lê problema wan ev e, dema ku dibe şîniya Hz. Huseyin, ew şîniyeke mezin digirin. Ez nizanim çima wisa dikin. Tiştêkî seyr e. Ev urf û edet çawa hatiye nava wan de nizanim. Lê ew jî em dikarin bijên cor in, tebeqat in. Hindek ji wan hene ji wan re dibêjin tawisî. Tu bala xwe bidî ew beşa elewiyan hîç ferqek di navbera wan û êzdiyan de tune. Her du jî di rojperestiyê de digihîjin hev û du. Hindek elewiyan dî jî hene ji ber ku xwe nêzikî dewletê dikin, dibêjin em misliman in.

Hikmettin Atlî: Mamoste we behsa meseleya Hesên û Huseyin vekir. Pekî têkiliya Yezîd bîn Muawiye bi êzdiyatî re heye an na?

Dawid Mirad Xetarî: Na, tu eleqe tune ye. Wî êzdî nedîtine eslen.

Hikmettin Atlî: Te dî di hin metnên êzdiyan de behsa Sultan Ezî an jî Yezîd bîn Muawiye tê kirin di qewlan de. Ew ne eynî kes e.

Dawid Mirad Xetarî: Sultan Ezî bi xwe Padşa ye. (Padşa yanê Xuda) Hezr û yek nav li xwe dana ye. Navê mezin her Xuda ye. Ew dizani di behrekê de ke Ewî Hawa kir bûk Adem lê kir Zava. Yanê di vê derê de Sultan Ezî ne ew Yezîd bîn Muawî ye. Xudê ye.

Hikmettin Atlı: Di qewlên wan de navê Yezîd bîn Muawiye jî derbas bûye. Hin dibêjin ku ew jî ehlê tesewifê bû ye loma êzîdî lê xwedantî dikin.

Dawid Mirad Xetarî: Temam, ez ji te re tiştêk bibêjim. Nuka ez jî mirovekî ilmanî me. Hiz ji însaniyetê dikim. Yekî Kûba jî Corciya jî. Dibe ku ez jê re rêzgirtinê bikim. Madem ku mirovek baş e ez ê jî rêz jê re bigirim. Lê ev nayê wê wateyê ku ew birayê min e, pismamê min e an jî tiştêkî min e. Ya duyê jî, êzdiyatî bi xwe xiybeta kesekî nake. Nabêje ku filankes nebaş e, ne xweş e. Ew di nêbeyna wî û Xudê de ye.

Hikmettin Atlı: Yanî li gorê we têkiliyê rasterast di navbera Yezîd bîn Muawiye û êzdiyan de tune ye?

Dawid Mirad Xetarî: Na na. Bes tiştêk dî heye. Meselen di îslamiyetê de cemaeta şîe heye, eva lenetê dikin. Xeberên pîs dibêjinê. Em na. Yanê di nava êzdiyan de ne qenc ne xirab, me şol pê nîne.

Hikmettin Atlı: Mamoste tiştêk bipirsim. Min di çend cihan de di pirtûka Xeyrî Şengalî ya bi navê Li Çiyayê Şengalê Qebqeba Kewê Nêre de jî dît, di metnên folklorê yê civaka êzdiyan de li hember şîe/qizilbaşan reflekseke wan heye. Ji wan zêde hez nake. Hiç agahiyên we hene di vê mijarê de.

Dawid Mirad Xetarî: Qizilbaş zanî, di hindik wextan de, di dewleta Osmanî de, rolekî wan yê nebaş hebû. Li cem me peyva qizilbaş wekî ku tu bibêjî ‘cehş’ e. Dijminê milletê xwe ye. Vêca me ji elewiyan re digot qizilbaş ma ne? Eva em dibêjine kewa xwelîser, dijminê serê xwe ye. Ev e qizilbaş ku bigotina ev tiştêk ne baş e.

Hikmettin Atlı: Sedemek vê nêrîne heye mamoste?

Dawid Mirad Xetarî: Min got te, eva hanê xwe hesêb dikirin turk. Xwe hesêb dikirin xasên tirka. Dijî milletê xwe radibûn. Cehş bûn. Îca xelkê jî digot e, eva qizilbaş e, qizilbaşî ye. Yanê wateya wê ne xoş bû.

Hikmettin Atlı: Mamoste pirsek dî. Hûn dizanin folklorê me hemî parçeyên milletê kurd nêzî hev e. Heman çîrok û hîkayet in. Xeyn ji van berhemên hevpar, folklorê êzdiyan ya cuda, ku bi tenê di nava êzdiyan de têne gotin, çîrok an jî hîkayetên dînî hene an na?

Dawid Mirad Xetarî: Zehf in. Hem hîkayetên dînî hem jî civakî ne.

Hikmettin Atlî: Mamoste pirsek min ya dî jî hene. Gelo êzdî xwe çawa pênase dikin. Ji bo wan kîjan nasnameya wan muhîm e. Hem di metnên folklorî de hem jî wekî dî. Hûn çawa dibînin. Li gorî tecrubeyên xwe yên di nava miletê êzîdî de.

Dawid Mirad Xetarî: Ez tiştê bibêjim birayê Hikmet. Ez dibînim, her yek ji me komeke kîmlîkan (nasnameyan) heye. Dema yekê ji vana ji dest det, lê aciz dibe, radibit berevaniyê jê dike. Mesela ez bi xwe weke kesek, ez ji binemala Xwedêdayê Eysê me. Demê yek bê li binemala Xudêdayê Eysê te'dê bike, wek nasnava min ez ji binemala wan im, ez aciz dibim, ez rapêrînê dikim, ez ê berxwedanê bikim. Ez weke kesek ez ji êla Xetariya me. Demê hindê kes bîn, êlên dî bîn te'dê li êla min bike, ew nasnama min ya ku bi navê êlê, ez dê berxwedanê bikem. Ez wekî dîn êzîdî me. Demê êrîşek bê û te'deyek zulmek bê ser nasnama min ya êzdiyatî, ez ê berevanî bikim ji wê nasnama min ya êzdiyatîyê. Ez wekî netew kurd im, demê êk bê te'dê li miletê kurd bike, hingî nasnama min ya kurdewariyê têk diçe, ez ê berevaniyê ji wê nasnama xwe bikem.

Hikmettin Atlî: Min fam kir mamoste. Yanê hûn dibêjin nasname tiştêkî pirtebeqeyî ye. Kîjan tebeqeya nasnameya te di binê te'dê de be, tu li wê xwedî dertê. Ev e tam mijara teza min e jî.

Dawid Mirad Xetarî: Belê eynî wiha. Yanê ne yek nasname, gelek nasname hene.

Hikmettin Atlî: Pirsek dî mamoste gelo hûn têtîliya êzdiyatî û îslamiyetê çawa dibînin. Hin kesên wekî Fuccaro, wekî Kreyenbroek dibêjin ku êzdiyatî ji nava îslamiyetê derketiye. Hin kesên wekî Izady, Tosinê Reşîd jî dibêjin; na tu eleqeya êzdiyatî û îslamiyetê bi hev re nîne. Dîne berê yê kurdan e. Gelo hûn çawa difikirin?

Dawid Mirad Xetarî: Bê şik em ne bi îslamiyetê ve girêdayî ne. Me tu pêwendî bi îslamiyetê ve jî nîne. Lê em mecbûr in ku em bi hev re pêkve jîyanê bikin. Te dî gotineke ereban heye dibêje; eger kesek çil roj çû nav miletêkî, wek wî miletî lê têt. Îja wextê ku em têtîda bijîn, hindêk urf û edetên me ew ê ji me bigirin û hindêk jî em ê ji wan bigirin. Berê têtê bîra min, miletê êzîdî ne diçûne ser û çavê hev. Maçkirin zêlam bo zêlam nebû. Piştî têtîliya ereban kirî nûka diçîne çavê

hev û du. Berê bes destê xwe li destê hev didan. Tê bîra min bi tenê wextê ku em ji derek dûr bihatana, bavê me dihat çavê me. Bes wekî dî tunebû. Hindik edetên wisa mirov werdigirit ji miletan.

Hikmettin Atlî: Mamoste hûn meseleya Şêx Hadî çawa dibînin? Rola wî di nav dîne êzdiyatîyê de, cihê wî hûn çawa dibînin mamoste?

Dawid Mirad Xetarî: Şêx Hadî teb'en her milet carina di tengahiyan de derbas dibit. Êzdiyatî jî gelek carî firman li ser hatine. Êş û nexoşî û birçîtî, ser da hatiye. Wextekî de êzdiyatî pirt û belav bûne. Ji êş û nexweşîna filan. Ha Şêx Hadî demê hatiyî, evî ji Şamê hat, bi xwe jî êzîdî ye.

Hikmettin Atlî: Mamoste hûn dibêjin ku Şêx Hadî berê jî, beriya ku were deverên êzdiyan jî êzîdî bû?

Dawid Mirad Xetarî: Erê erê! Bavê wî êzîdî bû. Di salekê de baran nehat. Xudan pez û ew in. Çûn heta Baalbegê, wêderkê li gundekî man. Îja demê Şêx Hadî hatî, êzîdî li hev hatin. Yanî wan li hev kom kir. Îtîhadek çêbû. Îtîhada êzdiyatîyê. Îcar ev î karî, Şêx Hadî, ewan êzdiyên pirt û belave lêk kom kirin. Ê hindek bîr û boçûnê wan carek dî nûje biket.

Hikmettin Atlî: Yanê hûn dibêjin Şêx Hadî di dîne êzdiyatîyê de nûjeniyek çêkiriye?

Dawid Mirad Xetarî: Erê yanê tu dizanî nûjenkirin çi ye? Yanê ew heye, tu nûjen dikî. Ne ku ew bi xwe çê kiriye. Ew î jî jiyana xwe hemî bo dîni terxan kir. Zewacê li xwe heram kir. Mal û maldariyê li xwe heram kir. Dirêv li xwe heram kir. Her tişekî li xwe heram kir. Şev û roj ji bo miletî kar dikir. Bê şik kesê wisa ciyê rêzgirtinê ye.

Hikmettin Atlî: Mamoste di nava êzdiyan de û ji derve de gelek behsa hebûna kitêbên Mishefa Reş û Kîtabî Cîlwe tê kirin. Gelo hîç agahiyên we li ser van kitêbên dîni hene? Bi rastî ev hene?

Dawid Mirad Xetarî: Na xêr. Jiber ku firman gelek li ser êzîdiyan hatine. Nexweşî û tengavî. Lewma em dibînin her tiştê wan pirt û belave ye. Ev her du kitêban jî nema ne. Lê mane jî. Çawa mane? Bi xwe her alimekî vana, ev beytan ji

bo ku hunda nebin, ser dil girtine, jiber kirine. Mishefa Reş ewana ez dikarim ji te re bibêjim ji sedî heştê hatine heya îro.

Hikmettin Atlî: Yanê ev qewlên êzîdîyan ku hatine çapkirin, ev qewl ji wan her du kitêban e yan ev cuda ne?

Dawid Mirad Xetarî: Belê belê, evana ji wan her du kitêban e. Çunki ser dil da hatine ew kirin, yekî bo yekî gotiye.

Hikmettin Atlî: Yanê bi şeklekî fizîkî ev her du kitêb tune ne lê ev agahiyên ku di van kitêban de ne, bi vî hawayî di nava gel de mane?

Dawid Mirad Xetarî: Belê belê. Wisa ye.

Hikmettin Atlî: Mamoste pirsek dî. Gelo dînê Şemsanî û dînê êzdiyatî eynî dîn e? Yan ji hev cuda ne?

Dawid Mirad Xetarî: Belê belê! Eynî dîn e. Bê şik. Em dibêjin êzdiyatî şemsanî ye. Berê du ew hebûn. Ew deverêt ku serma lê daîma rojê digirt. Çunkî di roj de jiyana xwe debar dikirin. Ewan hez ji rojê dikir. Îcar dibûne wek îbadê rojê. Li cihên germ jî, ji ber ku bi roj pir germ bû miletên wan dua dikirin ku roj biçe ava û şev bibit û heyv derkevit da ku kar û barê xwe bi şevê li ber heyvê bikin. Eve jî bûne cimaeta heyvê. Ême êd rojê bûn.

Hikmettin Atlî: Mamoste di nava dînê kevnar yên kurdan de behsa mîtraîzmê tê kirin. Ev şemsanî û mîtraîzîm eynî tişt e? Yan ji hev cuda ne?

Dawid Mirad Xetarî: Peyva mitra yanê roj e. Yanê di navbera şemsanî û mîtraîzmê de çu cudahî nîn e. Hemû yek e.

Hikmettin Atlî: Mamoste pirsekî dî. Niha li başûr têkiliya civaka kurdên êzîdî û kurdên misliman bi çi şeklî ye? Hîç problem hene yan na?

Dawid Mirad Xetarî: Na na! Elhemdulîlah. Tu zanî her civakek hindêk problemê wê hene. Nika li gundê me de, hemû êzîdî ne jî dîsa problem hene. Ev normal e. Di nav kurdên misliman û êzîdî de jî hindêk problemên sivik hene bes ew problemên mezin ku li ser dînên dilê hev bihêlin nîn e. Tiştêk wisa nîne.

Hikmettin Atlı: Mamoste di pirtûka Şerefxan de tê gotin di sedsalên 13 û 14an de gelek eşîrên mezin yên kurdan êzîdî bûne. Heta dibêjin mîrîtiya cizîrê dînê wan yê fermî êzdiyatî bûye. Dûre dibin misliman. Bi ya çima wiha evqasa ji êzdiyatîyê dûrketin çêbû? Berê hejmara wan zêde bû lê her ku çû kêmbûn, hindik man?

Dawid Mirad Xetarî: Dînê îslamatê dibêjit here xezweta bike. Here cîhadê bike. Erdî bo bisilmanetîyê veke. Jin ji te ra, zaro ji te ra û mêra bikuje û mal û helalê wî jî ji te ra. Ê bê şik, dê wisa bit (nifûsa êzdiyan kêmbibit) û di wê wextê de alemeke bê aqil bû jî.

Hikmettin Atlı: Mamoste ferqa êzdiyên Kafkasya û Başûr heye gelo? Di navbera wan de ferqek heye gelo?

Dawid Mirad Xetarî: Na na! Çu ferqek nîn e.

Hikmettin Atlı: Mesela min demek pirtûkek xwendibû tê de digot êzdiyên Kafkasyayê alkol vedixwin lê yên başûr venaxun. Tiştêk wiha heye?

Dawid Mirad Xetarî: Di êzdiyatîyê de dibêjin her tiştê ku tu pê aqilê xwe ji dest bidî heram e. Eger te aqil ji dest da heram e. Meşrûbê jî eger te vexwar û aqilê xwe ji dest da heram e. Vêca bes bi nav nekiriye.

Hikmettin Atlı: Mamoste gelek spas dikim. Min wextê we girt. Gelek gelek spas dikim. Mal ava.

Dawid Mirad Xetarî: Wellehî tu her tiştêkî bixwazî em di xizmet de ne. Daxwaza serkeftinê dikim.

Hikmettin Atlı: Mamoste em di xizmeta we de ne. Her hebin. Mala we ava. Silav û rêz.

3. Hevpeyvîn Bi Kovan Xankî Re

Dîrok: 01/07/2020, Saet: 17:00

Kovan Xankî: Lêkolerek êzdî ye li herêma Kurdistana Iraqê. Bi xwe xelkê Duhokê (Beravê) ye. Li ser çand û folklorê êzdiyan xebat kiriye.

Hikmettin Atlî: Silav mamoste. Min telefona we ji Mamoste Dawid Mirad Xetarî girt. Her wiha min pirtûkek we ya bi navê Analîza Qewlên Êzdiyan jî xwendiyê. Min xwest ez bi we re li ser folklor, çand û nasnameya êzdiyan hevpeyvînekê bikim. Bixwe ez tezeke doktorayê amade dikim. Di xebata xwe de ez bi miqayeseyî li folklorê êzdiyan jî mêze dikim. Miqayeseyê li gorî hêmanên nasnameyî bi kurdên elewî re dikim. Navê min jî Hikmettin Atlî. Ji zankoya Bîngolê, Beşa Kurdî.

Kovan Xankî: Ser çava belê. Ew kitêba ma tu zanî ew bi tenê li ser yek kesayetiya êzdiya bû. Min û Khanna Omarkhali bi hev re amade kiribû. Li ser pîrên malabata Omarxala bû. Yanî pişkeke biçûk e ji êzdiyan e.

Hikmettin Atlî: Mamoste hûn bi xwe xelkê kîjan herêmê ne?

Kovan Xankî: Ez ê Duhokê me. Tu zanî êzîdî li Şengalê, Şêxanê, Başûq û Ba'ezen heye û minteqa Hewêriya em dibêjinê hene. Wekî dî jî li hin deverên biçûk dijîn. Ez bi xwe yê beravê me. Ber rûbarê Dicle me.

Hikmettin Atlî: Mamoste hûn bi xwe li ser çand û folklorê êzdiyan xebitîne qet?

Kovan Xankî: Belê, bi xwe îxtîsasê mi ewa. Pisporiya mi ew e. Gelek kitêbê mi hene. Vêga 32 kitêbê mi hene. Û 16 kitêbê babê mi hene. Weke berê nîn e ku êzdiyatî di binê erdê de be. Gelek gelek tişt derketine. Yanê yek alî te nekit, gelek zehmet e.

Hikmettin Atlî: Rast e mamoste. Tabî zehmet e mirov xwe bigihîne hemî berhevan, hemî tiştan. Bi qasî ku ez dikarim bikim ez jî vedikolim.

Kovan Xankî: Belê mamoste.

Hikmettin Atlî: Mamoste hez dikim pîrsekê ji we bikim. Mesele hûn li ser folklorê êzdiyan xebitîne. Bo we folklorê êzdiyan çi îfade dike? Mirov çawa

dikare pênase bike? Çima folklor di nava êzdiyan de dewlemend e? Hûn di van mijaran de dikarin çi bibêjin bom e?

Kovan Xankî: Zanî êzdiyan du cure edebiyat hene. Edebiyata dînî û edebiyata folklorî. Ê edebiyata ku di navbera her dûka de ye. Edebiyata dînî gelek berfireh e. Edebiyata folklorî gelek berfireh e. Edebiyata di navbera wan de jî gelek berfireh e. Yanê her edebiyatekê gelek janr tê de hene. Bo nimûne ya dînî qewl, beyt, qesîde, dua, dirûze, mishabet, keramet, serhatî eva her yek janrekî serbixwe ye. Di nava edebiyata folklorî de jî wisa ye. Serhatî ne, efsane ne, destan in, gotinên mezina ye, pêkenîn in gelek gelek hene. Ê di edebiyata di nava wan de jî, xizêmok in, payizok in, xerîbok û lavijok in. Îca her yekî jî sîmayên xwe hene, taybetmendiyên xwe hene. Tiştê here diyar ev edebiyata sîmayê êzdiyatîyê tê de diyar e. Çi dînî be çi civakî be.

Hikmettin Atlî: Mamoste ez jî dixwazim vê bipirsim. Bi ya we dema ku mirov tekstekê ji folklorî êzdiyan bixwîne, mirov têdigihîje ku eva folklorî êzdiyan e? Yanê ewan nîşaneyên xwe yên nasnameyî tê de diyar dikin?

Kovan Xankî: Belê wiha ye. Di hemû janrên edebî yên folklorî êzdiya de ew tişt a heye.

Hikmettin Atlî: Bi ya we mamoste sedem ji vê rewşê çi ye? Ez jî di metnên êzdiyan de rastî vî tiştî hatim ku bi her munasebetê îla wê taybetmendiya xwe ya dînî didin der? Sedem çi ye bi ya we?

Kovan Xankî: Ne tenê di nava êzdiyan de, di nava hemû miletan de ev wiha ye. Ev e pênaseya edebiyatê ye jî. Tişt a edeb, rengvedana jiyanê ye. Ew tişt a di jiyanê de, bîrê de, di sirûşt de, di jîngeha mirov tê de dijît, ew tesîrê li mirov dike. Di êzdiyan de jî wiha ye. Wextî ew edebiyata xwe dinivîsin behsî xwe dikin. Wekî dî jî eger bes em strana folklorî werbigirin, strana folklorî ya Şengalê, dibêjin di sedsala 18, 19 û 20ê de, xwendin û nivîsîn nebû. Televizyon û tomarkirin nebû. Hemû ew tiştê bi serê wan de dihatin, jenosîd û xweşî û nexweşî hemû bi rêya stranê dihatine gotin. Lewma jî eger em dîroka êzdiyan ya sedsala 18, 19 û 20ê bigirin, di nava strana folklorî de ev tê dîtin.

Hikmettin Atlî: Mamoste tê gotin ku heya demekê di nava êzdiyan de xwendin û nivîsandin qedexe bûye, tiştê wilo hebûye bi ya we?

Kovan Xankî: Zanî ne qedexê bû. Li destpêkê da, berî sedey 9 û 10ê, û beriya hingê jî, me kitêbê pîroz hebûn. Û xwendin û nivîsîn hebû. Û me Xweda jî hebûn, bi navê Xwedanê Qelemê, Xwedanê Kaxizê, Xwedanê Defterê. Û piştî hingê jî, hatina Şêx Hadî jî, yanê bizaveke geş ya xwendinê, nivîsînê, wergêranê li perestgeha Laliş hatiye kirin û gelek têkst jî hatine nivîsîn. Bes bêjin vê dawiyê, ji sedsala 17an vir ve gelek ferman û jenosîd hatine serê êzdiyan. Vêca xwendin li vê deverê kete hucre û mizgeftan de. Ciyê olî yê ne êzîdiyan. Lewma jî êzîdiyan xwe ji xwendinê dane paş. Ji ber vê bûye. Eger ku xwendin ne di cihê jêr diyanet da ba, êzîdiya xwe nedida alî. Bes piştî ku hukûmet hatin û dezgehên perwerdehî hatine çêkirin, dibistanên serbixwe hatine avakirin, êzdiyan jî careke din dest bi xwendinê kir. Yanê di dîne êzdiyan de tiştêk nîne ku xwendin û nivîsandinê li êzdiyan qedexê bike.

Hikmettin Atlî: Mamoste tiştêkî dî biprisim. Bi ya we di navbera folklorê kurdên misliman û kurdên êzîdî de hevparî gelek in yaxud cudahî gelek in? Hûn vê çawa dibînin?

Kovan Xankî: Bi ya min ev her du di çarçoveyê yek sînor de ne. Ew gotinê mezinana, ew serhatîna, ew stran gelek wek hev in. Bo nimûne Destana Rostemê Zal yan jî Xanê Lepzêrin yan jî gelek stran hene wiha, wek hev in. Eva hevpar in. Mulkê hemû civakê kurdî ye. Heta derbasî nava faris û ereban jî bûye. Lê dîsa jî êzîdî edebiyata xwe ya taybet hene çunkî sîmayên wan ên dîni û civakî tê de diyar e. Yanê gotinê mezina me heye, behsî tiştê êzîdiya dike. Behsê şêxa dike, behsê pîra dike. Bisulmanetî de pîr û ew nîn in. Belê hin stran jî hene ku taybet in bi civaka êzîdî. Evana bi ferman û jenosîda re eleqedar in. Ev rewşeke xwezayî ye. Em bi rêya van stranên dizanin ku ka çi hatine serê civaka êzdiyan. Evana taybet in bi dîroka kurdên êzîdî re.

Hikmettin Atlî: Mamoste ez ji ber ku miqayeseyê dikim, dema ku ez metnekê dixwînim mirov fam dike ku ev e ji nava civaka êzîdî derketiye. Mesela di versiyonên Destana Derwêşê Evdî de ev aşkera tê dîtin. Hûn jî rastî tiştên wiha hatine.

Kovan Xankî: Çunki ew jî li deverê êzîdiyan bûye. Derwêş êzîdî bû. Îca vê dawiyê çi dikine. Dibêjine Derwêşî misliman bû, Evdî êzîdî bû.

Hikmettin Atlı: Mamoste ez jî rastî vê yekê hatim. Di versiyonên nava kurdên misliman de li ser êzdîbûna Derwêş nayê sekinîn. Wekî ku bêjin bavê wî êzîdî bû lê ew misliman bûye. Eve çi ye?

Kovan Xankî: Ev e berevajîkirina rastiye ye. Êzdîbûna wî diyar e. Ew vê yekê di berjewendiyên xwe de bi kar tînin. Ne xweş e. Zanî ji kurdên misliman ra gelek nexweş e ku Derwêş êzdî ye. Bi keçikek misliman re yanê. Diyanetê wan qebûl nake.

Hikmettin Atlı: Mamoste heman tişt ji bo civaka êzdiyan jî derbas nabe. Şêx û pîrên êzîdî îzna zewaca bi Edûlê ra nadin Derwêş. Di nava êzdiyan de tiştên wiha hene ne wisa?

Kovan Xankî: Di êzdiyatîyê de nabe ku tu kesekî bînî ser dînê êzdiyatîyê. Ew kesê dibite êzîdî bi rêya dê û bav e. Wekî dî êzîdî dibête wextê Xwedê mi bidite êzîdî ez ê dimînin li ser êzdiyatîya xwe. Ji ber ku xwedê ez dame êzîdî, divêt ez rêzê li wê biryarê bigirim û bimînim êzîdî.

Hikmettin Atlı: Te dî hin lêkoler dibêjin ku ev e hewldana parastina demografîyê ye. Yanê ji ber ku êzîdî hindik in loma biryareke wiha sendine.

Kovan Xankî: Na na çi eleqe bi nifûsê re nîne. Ev e mijareke bawerîyê ye.

Hikmettin Atlı: Mamoste, ez li ser kurdên elewî jî xebatê dikim. Hin kes dibêjin ku elewîti, êzîdîti, yarsanî ji heman bingehê tînin. Hin kes jî li dijê vîna dertînin. Hûn çawa difikirin? Gelo di navbera êzîdî û elewîtiyê de têkiliyek heye?

Kovan Xankî: Tu zanî eve pisporiya min nîne. Ez dîsa jî dikarim bersiva te bidim. Ez ê hin navan bididime te da ku tu ji wan sûdê wergirî. Ez naxwazim derkevim derveyê pisporiya xwe. Elewîti, baweriyên kevin wekî elewî, yarsan, ehlê heq e eva hemû ew tiştê ku ew dikin. Ew cejn, rê û resim, di nava êzdiyan de jî hene bi heman şeklî. Sema kêşan, cejn, pîroziya mûsîqê, tembûr û tekstên wan ên dî. Bawerîya wan ya bi rojê bi agir, axê, elementên jîyanê. Gelek wekhevî hene û kêr cudahî hene... Bes hin tiştên dî jî hene xwezî te xwendiba. Bo nimûne kitêbeke min hey e li ser miqayeseya Destanê Gilgamêş û Mîr Mihê. Te dikarî jê sûd wergirtiba. Min muqarene kiriye. Bêtir tiştên êzîdiyan di Gilgamêşê de hene

ne ku di Mîr Mihê de ku ya êzdiya ye. Ji ber van tiştên han jî ê me dibêjine êzîdî paşmawe ye, paşmaweyê şaristaniyetên herî kevin ê welatê Mezopotamya ne.

Hikmettin Atlî: Mamoste tam di vê nuqteyê de we dî hin kes êzdiyatîyê di nava îslamiyetê de dibînin û hin kes jî di nava wan de tu têkilî nabînin. Hûn çawa dibînin?

Kovan Xankî: Em dibêjine, Destana Gilgamêş yek ji belgeyên herî kevin e. Wexta ku em dibêjin êzdiyatî diyanetek kevin e, em wekheviya di navbera êzdiyatî û welatên şaristaniya mezopotam de diparêzin. Sumerî, Babîlî, Aşûrî... Berî vana jî mîtraîzm jî heye. Mîtraîzim û êzdiyatî gelek nêzî hev in. Têgihên mîtraîzmê, bi gelek şeweyan, bi gele forman di nava êzdiyatîyê de mane. Ji ber vî çendî em dibêjine êzîdîtî diyanetek gelek kevin û paşmaweyê welatê Mezopotamya ne.

Hikmettin Atlî: Mamoste êzîdîtî û şemsanî eynî tişt e?

Kovan Xankî: Berî digotîne êzîdîyan, ji ber ku wan di hemû rê û rismên xwe de, cejn û helkeftên xwe da, gelek girîngiyê bi rojê didine, ji wan ra gotîne şemsanî. Nêzîkî rojê, girêdana bi rojê ve ye. Lê piştî hatina Şêx Hadî, Şemsanî bûye yek ji çeqên şêxa ya sîstema çînî û kastî ya êzîdîyan. Şemsanî ew tabîê Şêxşems in. Qatanî hene, Edanî û Şemsanî hene. Şems di êzdiyatîyê de xwedanê rojê ye. Beriya hatina Şêx Hadî da, digotîne êzîdîyan hemû Şemsanî bûne. Ji ber ku gelek girîngî bi rojê dane. Îro jî ev girîngîdan heye. Agir dîsa wisa ye. Gayekî em ji bo xwedanê rojê dikine qurban. Di duayên xwe de sibê rojê berê xwe didine aliyê rojê. Duayê xwe dikine.

Hikmettin Atlî: Mamoste gelo li gorî we êzîdî xwe di desta pêşîn da xwe çawa pênase dikin? Êzîdîbûna wan yan kurdbûna muhîmtir e ji bo wan.

Kovan Xankî: Ev hinekî derveyî pisporiya min e. Hinekî polîtîk e jî.

Hikmettin Atlî: Mamoste pirseke dî. Di nava êzîdîyan de behsa kitêba Mishefa Reş û Kîtabû Cîlwe tê kirin. Bi rastî jî ev her du kitêb hene yan ev efsane ne?

Kovan Xankî: Her ji kevin da hatiye gotin ku du kitêbên pîroz ê êzîdîyan hebûne. Bêlkî bêtir ji du kitêban jî. Bes wisa tête gotin. Di encamê wan ferman û jonosîdê li ser êzîdîyan yên dirêjiya dîrokê, tişteki nemaye bi navê kitêbê pîroz ê êzîdîyan.

Hunda bûne. Ne tenê kitêbên pîroz, wisa jî sembolên êzdiyan gelek hunda bûne di fermanan de. Gelek rojhilatnasan, behs kiriye ku êzîdiyan du kitêbê pîroz hene, belave jî kirine, lê me êzîdiyan bawerî bi wan kitêba nîne. Çima me bawerî nîne, ji ber ku, ne zimanê edebiyata dînê êzdiyan e. Ew kitêbên ku va rojhilatnasa belav kirine ne zimanê qewl û beyt û edebiyata dînî ê êzdiyan e. Û her wisa jî, zimanê wan gelek şikest e. Edebiyata êzdiyan ya dînî ku tu bixwînî, astê ziman tê de gelek bilind e. Ji aliyê têgiha ve ji aliyê gramatikê ve gelek dewlemend e. Îca dema ku em wan kitêbên ku rohilatnasan belave kirine dibînin, em zimanê qewl û beytên xwe didin ber wan, em dibînin ku ev kitêba ne êzdiyan e. Û her wisa jî di wan de gelek tişt hene ku dûrî baweriya êzdiyan e. Êzdiyan bawerî bi wan tiştan tune ye. Ne ez dibêjim, nivîserên êzdiyan dibêjine me bawerî bi wan kitêban nîne ji ber vanj egeran. Yanê yek ji wan Cîlwe, em êzîdî dibêjin ku Şêx Hesên, yê ku Cîlwe nivîsiye, şeş sala xwe xewle kiriye. Şeş sala ketiye çilexanê de. Çilexane ciyekî pîroz ê êzdiyan e. Hemû kes nikare bikeve wê ciyê. Ciyekî pîroz e. Îlle derwêş bin an ew kes bin ku zewac nekirî, çine wê çillexanê da duayên xwe dikine, tekstên dînî dinivîsine eve ê berê ez dibêjim. Îca Şêx Hesên şeş sal ji bo nivîsîna Cilwe ketiye çilexanê de. Îca dema ku em li Cilwe ya di nava kitêbên rohilatnasan de dinihêrin, em dibînin şeş laper e. Yanê ne maqûl e, nakete ber aqil ku şeş sala yek bikete ciyekî ji bo nivîsînê û kitêbek şeş laper binivîse. Ji ber wê yekê êzîdî bawerî bi wan kitêban nîne. Bes em dibêjine ku ew kitêbên me yên pîroz hebûne lê bes nemane.

Hikmettin Atlî: Ev qewl û beytê ku di nava êzdiyan de dibe ku ji wan kitêban mabin?

Kovan Xankî: Em nikarin vê bibêjin zanî ji ber ku em nikarin ispat bikin. Lewra li ber me tu têkst tune yê van kitêban. Nêzîkê hezar salî ev kitêb hunda ne. Tu nikarî li ser tiştêkî bi axivî ku te nedîtibe. Me nedîtine.

Hikmettin Atlî: Mamoste di nava êzdiyan de girîngiyeke Destana Zembîlfiroş heye bi ya we?

Kovan Xankî: Belê e. Zembîlfiroş bi xwe êzîdî ye. Ev di destanê de bi xwe heye. Ez ê niha zanînekê bidime te ku kes pê nizane. Ez ê di kitêba xwe de binivîsim. Beyta wî da diyar e. Dibêje Zembîlfiroş kurê rewal e! Rewal derwêşekî xas e. Ew derwêş edebiyata dînî nivîsîne û ciyê wan ê rêzê ye gelek. Em dibêjine wana xass.

Rewal yek ji wan xasa ye. Di êzdiyatîyê de ciyê wî yê dînî heye, li perestgeha Lalişê her wisa jî li gelek deverên pîroz ê êzdiyan wek gundê Boza wan, ciyê pîroz ê Rewal jî hene. Rewal hem têgiheke hem jî kesek e. Di êzdiyatîyê de Rewal kesek e. Babçakek e, derwêşek e. Jiyaye û ciyê wî yê pîroz û dînî hene. Îca Zembîlfiroş di êzdiyatîyê de babê heft kura ye. Her heft kur jî derwêş in, babçak in, mezargehên wan, ciyê wan ê pîroz li nava hemû êzdiyan hene.

Hikmettin Atlî: Mamoste li gorê êzdiyan gora Zembîlfiroş li ku derê ye?

Kovan Xankî: Tu zanî tiştê wisa wextê serdema Şex Hadî û Şex Hesen de ku Bedreddîn Lolo şer kirî, çi kir Bedreddin Lolo? Hat bi ser perestgeha pîroz Lalişê da girt û gorên wan derwêşan hemî xerakirin û agir berdanê. Êzdiya çi kir? Piştî wê dîrokê, wextê kesek miriba, veşartibana, cihê wî nedigotin. Ji ber wê hindê jî em niha kesek nizanin kî li kê derê veşartiye.

Hikmettin Atlî: Di hin metnan de min dîtibû behsa gundekî li devera Zaxo û Duhokê tê kirin...

Kovan Xankî: Ew Batûfa ye. Ew nêzîkî Zaxo ye. Bes ev tiştêkî wiha ye, hindî derwêş, hindî xwedênas e, her kesekî dibêjine li vê derê veşartî ye. Ji bo ku bêtir pîrozî bide wî ciyî. Di nava êzdiyan de kesayetîkî wekî Bestamî wergirin mesela Bazîdê Bestamî. Li ba me li Xangê heye dibêjine li wê derê binaxkirî ye, li Îranê heye dibêjine li wê derê binaxkirî ye, li xwariya enbaxê(?) heye dibêjitine li wê derê binaxkirî ye, li Bangladeş jî heye dibêjitine li wê derê binaxkirî ye. Ev e jî tiştê wisa ye. Ji bo ku bêtir pîrozî û girîngiyê bide wî ciyî.

Hikmettin Atlî: Mamoste tiştêkî bipirsim. Di metnên dînî êzdiyan de em rastî têgiha firwarê tên. Ferman jî heye lê ferwar jî heye. Bi ya we cudahiyek di nava vanan de heye?

Kovan Xankî: Erê heye. Gelek heye. Ferman ew e ya ku em bêjine ji aliyê dewleta Osmanî ve hatine. Ferman di nava êzdiyan de bi wateya jenosîdê têtê. Bes di êzdiyatîyê de wisa ye. Yanê ferman an ku jenosîd. Bes firwar ew biryar e ku ya ku ji alî Xweda ve têtê ji bo tiştêk. Bo nimûne tekstê dînî de têtê gotin, heta ku firwar ji ba xwedê nehatiye, rih nekete ber qalibê Adem da û dinya û beşeriyet jî çênebû. Heta ku xwedê biryar neda yanê firwar nekir ku rihe bikevte ber qalibê Adem da, û mirovayeti çênebû.

Hikmettin Atlî: Tiştekek dî jî mamoste. Di nava metnên êzdiyan de têgiha sur jî heye. Ev têgih di nava sîstema dînî ya êzdiyan de girîngiyek wê heye gelo?

Kovan Xankî: Di ya dînî de heye ne di ya folklorî de. Ew quwet, ew hêz ya ku bi kesekî derwêş re heye, bi kesekî normal re nîne. Lewma jî em ji bo derwêşa dibêjîtine xas. Ji ber çî tiştî, ji ber ku sur hene û keramet hene. Yanê ew hindêk tiştan karin bikin, kesên normal nikarin bikin.

Hikmettin Atlî: Mamoste, di navbera êzdiyên Kafkasyayê û yên herêmên we de tu cudahî hene gelo, ji aliyê dînî ve?

Kovan Xankî: Na na. Tu cudahî nîn in. Bes dûratî hindêk guhertinan peyda kirine. Li ser tekstên wan. Hindêk êzdiyên van herêman, ji ber ku nêzî ereban e, belkî hinek peyvên erebî di nava zimanê wan de hebin, û yên sovyetê jî bêtir peyv û tegihên rûsî di nav de hene. Ji aliyê şêwezar ve hinek cudahî çêdibe. Lê ji aliyê baweriyê ve yek in. Carina hindêk êzîdiyan baweriyaya xwe guherîne ew tiştekek dî ye.

Hikmettin Atlî: Mamoste pirsên min ev bûn. Gelek spas dikim. Naxwazim we zêde biwestînim.

Kovan Xankî: Ez jî spas dikim. Ez ê ji bo hin kesê pisporek ji te re lîsteyek navan bişînim.

Hikmettin Atlî: Spas mamosteyê hêja. Her hebin. Silav û hurmet.

4. Hevpeyvîn Bi Arshad Hamid Miho Re

Dîrok: 01/07/2020, Saet: 15:00

Arshad Hamid Miho: Lêkolerek êzîdî ye. Li herêma Kurdistana Federal dijî. Êzîdiyê herêma Duhokê ye. Li Zankoya Duhokê kar dike. Bi xwe li ser çand û dîroka êzdiyan pîspor e.

Hikmettin Atlî: Merheba mamoste Arshad. Ez Hikmettin Atlî. Ez li Zanîngeha Bîngolê di Beşa Kurdî de doktora dikim. Mijara xebata min miqayeseya di navbera kurdên êzîdî û kurdên elewî de li gorî derçûnên nasnameyî yên di tekstên folklorê de. Gelek spas dikim ku we vê hevpeyvînê qebûl kir.

Arshad Hamid Miho: Spas xweş bit. Hez dikim xizmet bikim.

Hikmettin Atlî: Mamoste li gorî ku hûn bêtir li ser dîrok û çandê disekin, ez jî dixwazim pirsên ji wî aliyê bikim. Mamoste ji bo êzdiyan nasname çima girîng e. Ew xwe bêtir çawa dibînin? Hûn dikarin bi perspektîfeke dîrokî bersiv bidin vê pirsê.

Arshad Hamid Miho: Nasnama êzdiya; zanî wele kêşe li ser hebûye. Berê de jî, kevin de jî. Û niha jî ev kêşe meztir lê hatiye ka nasnama êzdiya çi ye. Bi rastî wekî ku min ji dîrokê xwendîye, yanî nasnama ayînî ya êzdiyan li pêş nasnama wan ya netewî hatiye. Yanî di dema Dewleta Osmanî, dîsa Dewleta Safewî, berê hingê heya Ebbasî û Emewîyan jî, serederî gel êzdiyan kirine yanî li gor nasnama wan ya ayînî ne ku ya netewî. Ber hindê êzîdî gelek tûşî kêşa û girîfta û fermana, qirkirina bûne li ser vê nasnamê. Îca ji ber hindê jî êzîdî bi kurdî diaxivî û belê li Kurdistanê dijîn lê serederî gel wan hatiye kirin wekî hindê kesên ciyawaz wekî grûpeke ayînî yê ciyawaz. Ber hindê nasnameyek etnîk bi wan ra çêbûye. Wekî grûpeke etno-dînî (etno religious) çêbûye.

Hikmettin Atlî: Tam di vê nuqteyê de mamoste, ji xwe di teza xwe de ez jî wan wekî grûbeke etno-dînî dinirxînim. Gelek spas mamoste.

Arshad Hamid Miho: Belê wa ye. Axir ev nasname ji êzdiyan re çilo bû yanê li gorî dîrokê û li gorî rûdana û aniha da jî bi rastî taybet piştî firmana Şingalê, ev nasname bêtir diyar bû, bêtir xuya bû yanê bêtir çespiya. Yanê ev nasnameya

etno-dînî. Yanê hindekê berê êzîdiya bêtir meselê netewî, kurdî, zimanê kurdî hinekî dualin.

Hikmettin Atlî: Mamoste hûn dibêjin nasnameya etno-dînî bêtir li pêş e. Bi ya we ew di nava civaka kurd de xwe çawa dibînin? Kurdbûn ji bo wan tê çi waateyê? Xwe jê dûr dixin, îmtîna dikin an jî bi rengekî dî ye?

Arshad Hamid Miho: Wele ez nizanim boçûna kevin bêjim bo te yan ya aniha?

Hikmettin Atlî: Yanê hûn karibin her duyan jî neqil bikin bo miqayeseyê dê baştir bibe.

Arshad Hamid Miho: Xwedê gorîn ser da hatine kirin. Di kevnî de êzîdiya xwe li Kurdistanê û kurdî girtiye. Yanî dema dewleta Iraqê çêbûye û kêşeya kurdî çêbûye. Herçende berê hingî serdemî mîrgeha, bo nimûna êzîdiya mîrgeha xwe ya taybet hebû jî ji bilî Mîrgeha Soran û Mîrgeha Botan û Mîrgeha Amêdiyê, êzîdiya jî mîrgeha xwe ya etno-dînî hebû, dînî-netewî hebû. Ev guherîn lê di niha de wek mi gotî, hindek gorîn li ser vê çendê çêbûne. Êzîdî bêtir xwe didin êzîdîtîyê. Çunkî aniha de wiha ye.

Hikmettin Atlî: Mamoste yanê hûn dibêjin êzîdî berê bêtir nêzî nasnameya kurdî bûn lê aniha ev rewş hinekî kêmtir bûye? Nasnameya êzîdîbûnê li pêş e aniha?

Arshad Hamid Miho: Erê belê. Yanê xaseten ev kesane ku nûh gihîştine, neweyên nûh bêtir êzîdîtiya xwe derdixin pêş. Ez dibînim boçûnên ciyawaz hene di nava êzîdîyan de jî. Di meseleya êzîdîyatî li pêşê ye yan kurdî li pêşê ye, hin ciyawazî jî hene di nava êzîdîyan de.

Hikmettin Atlî: Mamoste ev ciyawazî li gorî herêman diguhere gelo? Yanî wekî êzîdîyên Kafkasyayê, yên Şengalê, yên Şêxanê?

Arshad Hamid Miho: Belê belê. Li Başûrê Kurdistanê jî niha du boçûn hene. Boçûna xelkê Şengalê bêtir ber bi êzîdîtiyê ve ye. Boçûna xelkê Dasin, dewr û berê Duhokê heta Zaxo, heta nêzîkî Hewlêre, ew boçûna wan bêtir bi kurdayetiyê ve girêdayî ye. Lê ya bêtir, bi rastî Herêm Şengalê mezintir e. Xelkê me yê êzîdîyê Şengalê pirtir e ji xelkê Duhok û dewr û ber jî.

Hikmettin Atlı: Mamoste demekê min di hin lêkolînan de xwendibû ku digote ku êzdiyên herêma Başîqa û Baedrê bêtir xwe nêzî ereban dibînin. Tiştêk wiha win dizanin?

Arshad Hamid Miho: Tu zanî Başîqa bi tenê ye, ew tiştêk ciyawaz e di nava civaka êzdiyan de. Başîqî rastî ew nêzîkê herêma Mûsil va ne. Ew xwe bi xwe jî bi erebî diaxivin. Yanî bi kurdî napeyivin. Aboriya wan, têkiliya wan ya komeleyatî bêtir girêdayî Mûsilê va ne. Xwe bêtir nêzîkê ereba ve dibînin. Belê rast e.

Hikmettin Atlı: Mamoste hûn têkiliya êzdiyatî û îslamiyetê çawa dinirxînin? Win dizanin hin lêkoler dibêjin êzdiyatî wekî terîqetek ji nava îslamiyetê derketiye lê hin kes jî dibêjin ew ji hev cuda ne û êzdiyatî beriya îslamiyetê jî hebûye? Win çawa dibînin mamoste?

Arshad Hamid Miho: Wek min xwendiyî, ew boçûna jêderên dîrokî yên erebên misliman in ku dibêjine, êzîdî ji Yezîd bîn Muawiye û vir da peyda bûne. Lê me dibînin ku di dîrokê de jî û niha de jî hindê ciyawaziyên mezin hene di navbera vanan da, di navbeyna êzdiyatî û emewiyetê de û îslametê de. Em hindêk tiştên kevin û dîrokî yên berê îslamiyetê di nava êzdiyatîyê de dibînin. Di rê û rismên wan de, di cejnên wan de, di folklorê wan de, dua û nivêjê wan de. Yanî tiştên wan ên ayinî, eger tu herî Lalişê û bala xwe bidî ew rê û resmên ayinî, ew cejn û helkeftên êzdiyan, tu dê ciyawaziyek mezin bibînî di navbeyna êzdiyatî û emewiyetê yan êzdiyatî û îslamê de. Lê di ser hindê re jî me jêderên dîrokî yên bawerpêkirî nîn in ku bo me durust diyar biken ku êzîdî berê îslamê çawa bûn, kî bûn, navê wan çi bûn. Ê ev jî arîşe ye.

Hikmettin Atlı: Mamoste di hin qewl û beytên êzdiyan de em rastî Yezîd bîn Muawiy, Ebûbekir, Osaman tîn. Evana win çawa dinirxînin?

Arshad Hamid Miho: Ew em dibînin. Ew tişteke ne wisa ye ku mirov bike belge ku êzîdî ji wan hatine. Bo nimûna ev tiştê hatiye nav êzdiyatîyê de, piştî hatina Şêx Hadî bi rêka tesewifê û serdema Ebbasiyan de hatiye. Di wê demê de êzîdiya jî şiya ye bi xwe bi mîrgehek serbixwe, îtirafek pê ve bînin ji layê Ebbasiya ve. Hinekî xwe li gorî îslamê subx kirine. Yanî tiştê hatiye nav êzdiyatîyê de ye. Ez wisa dibînim.

Hikmettin Atlı: Mamoste di nava êzdiyan de û lêkolerên derveyê êzdiyan behsa her du pirtûkên Mishefa Reş û Kîtabî Cilwe dikin. Bi ya we ev hedû kitêb bi rastî hene yan ev efsaneyek e?

Arshad Hamid Miho: Na na, tu zanî Mamoste Hîkmet, efsane nîne bi rastî hebûne. Lê em dibêjin ew pirtûka orjînal nemaye, ew pirtûka di 1200î di serdemê Şêx Hesênê birazayê Şêx Hadî hatiye nivîsîn ew nusxe bi xwe nemaye. Ema niho ê li ber dest hene, hatine tercumekirin bo zimanê îngilîzî û almanî û zimanê cuda cuda, em dibêjin ev ne ew in ewên ku Şêx Hesên nivîsiye.

Hikmettin Atlı: Mamoste li gorî we êzdiyatî û şemsanî heman dîn in yaxud ji hev cuda ne?

Arshad Hamid Miho: Bi Xwedê min gelek pêzanîn li ser şemsanî nîne. Bes çî ye, şems yanê roj, yan binemala şemsaniya heye di nava êzdiyan de. Eger em behsê rojperestan bikin ev hinekî cuda ne ji êzdiyatîyê. Lê me binemalek di nava êzdiyan de heye dibêjine wan şêxên şemsa, şêxên şemsanî. Yanê ez dibînim têkiliyek heye di navbera wan de.

Hikmettin Atlı: Mamoste ji ber ku teza min miqayese ye, ez li kurdên elewî jî dinihêrim. Bi ya we di navbera kurdên elewî û kurdên êzîdî de ji aliyê dînî ve eleqeyek heye?

Arshad Hamid Miho: Tu zanî nêzîkbûn ev e: Ev êzîdî, elewî, yarsan û zerdeştî yanî çarenivîsa wa bi hev ve girêdayî bû. Ewan di navbera xwe de meşakil û kuştin û şer nebûne. Evan grupên etno-dînî kêşe li gel desthilatdarên îslamê, dewleta îslamê hebûne. Ji ber hindê hinek nêzîkê hev bûne. Êzîdî nêzîkî mesîhiyetê jî bûne. Di dema dewleta Osmanî de. Bo çî? Êzîdî û mesîhî cuda ne. Ne Osmanî her du dikuştin, her du qir dikirin. Herduwa xwe li hev digirt. Alîkariya hev dikirin. Yanî li gorî min ew ji aliyê boçûna dînî ve nêzîkî hev nîn bûn lê çarenivîsa wan nêzî hev bû, peywendiyê wan xurt bûn di navbera hev de. Dijminatî nebû. Yanî dîsa jî dibe ku hindê tiştên wan wekî cejn, rê û resmên dînî nêzî hev bin. Ev jî heye. Lê eve nabit ku her du ji yek bingehê tèn.

Hikmettin Atlı: Mamoste di hin metnên folklorî yên êzdiyan de ez lê rast hatim ku êzîdî ji qizilbaşiyê hez nakin. Reflekseke wan heye li hember qizilbaşan. Ji aliyê xwe ve qizilbaşan wekî cureyek kafir dibînin. Gelo hûn vê çawa dinirxînin?

Arshad Hamid Miho: Belê ma qizilbaş, ceyšê kê bûn? Ma ne leşkerê Sefewiyan bûn? Ê Sefewiyan gelek ferman îname ser êzîdiyan. Heta berî Osmaniyan. Dewr û dorê Hewlêrê, dewr û dorê Kerkûkê, jêderên farisan dibêjin ku êzîdî li wir hebûn. Serdema Ismaîlê Sefewî de, ewan gelek mîrên êzîdiyan kuştin û xelkê êzîdî li dewr û berê Erbilê qir kirine. Her çawa êzîdî ji qizilbaşan ditirsin ji romiyan jî ditirsin. Leşkerên Osmaniyan. Ew ji wê çaxê de hatiye ez dibêm.

Hikmettin Atlî: Mamoste min hin nusxayên Kela Dimdim xwend, di wir de jî diyar e ku êzîdî li hember qizilbaşan gelek refleksên wan ên xurt hene.

Arshad Hamid Miho: Rast e rast e. Êzîdiyan dijinkarî hebû di navbeyna wan û qizilbaşên ecem de.

Hikmettin Atlî: Mamoste di Şerefnameyê de û di gelek berhemên dî de tê gotin ku êzîdî di sedsalên navîn de hejmara wan gelek bû dûre ev hejmar gelek kêmbûye? Bi ya we sedema vê çî ye?

Arshad Hamid Miho: Hejmara êzîdiyan bi taybet ji fermanên Osmaniyan kêmbûye. Li serdema Şêx Hadî, di serdema Şêx Hesen de, di destpêka Osmaniyan de, jimara êzîdiyan zehf bû mezin bû. Lê di sedsalîya 19ê de jimara wan kêmbû. Ji ber fermanên Osmaniyan li paş fermanên Sefewiyan. Her ku çû nifûsa wan biçûk bû.

Hikmettin Atlî: Mamoste we behsa fermanan kir. Ez di metnên çî yê dînî çî jî yê folklorî de rastî du têgihan gelek hatim. Yek jê ferman û yek jê jî firwar e. Bi ya we ev her du yek têgih in yan cudahiya wan heye?

Arshad Hamid Miho: Ferwar tiştê dînî ye. Biryara Xwedê yanê. Firwara Xwedê. Ferwara Şêx Hadî. Ferman jî tiştê siyasî ye yanê leşkerkêşî yanê qetlîam. Çunkî ez bêjim tu baştir bizanî ferman kelîmek osmanî ye. Yanê ferwar a Xwedê ye. Di vir de gelek tê bikaranîn. Ji aliyê wateyê ve ji hev cuda ne. Belkî ji alî ziman ve yek peyv bin bes di boçûna êzîdiyan de ji hev cuda ne.

Hikmettin Atlî: Mamoste di heqê têgihê sur de agahiyên we hene gelo?

Arshad Hamid Miho: Sur ew jî bi aliyê dînî ayînî ve ye. Ew dibêjin sura Tawisê Melek, sura Şêx Hadî. Yanê keramet. Di bisilmanetiyê de dibêjin teqwa û mucahid. Muqabila wan e. Zîrekiya ayînî ye. Kerama Xwedê.

Hikmettin Atlı: Mamoste win hîç li ser çand û folklorê êzdiyan xebitîne?

Arshad Hamid Miho: Na bi xwedê. Ez li ser folklorê nexibitîme. Kovan Xankî heye. Ew baş xebitiye li ser folklorê. Ew gelek şariza ye. Ez bêtir li ser dîrokê şariza me. Dr. Saîd jî heye ew jî li ser dîrokê xebitiye. Xeyrî Bozanî heye li ser folklorê kar dike. Gelek baş e.

Hikmettin Atlı: Mamoste pirsên min ev in. Gelek spas dikim

Arshad Hamid Miho: Zor spas. Gelek serkeftin dixwazim bo te.



5. Hevpeyvîn Bi Xeyrî Bozanî Re

Dîrok: 05/07/2020

Xeyrî Bozanî: Berhevkar û lêkoler e li ser folklor û çanda êzdiyan. Bi xwe êzdiyê herêma Başûr e.

Hikmettin Atlî: Mamoste silav ji we re. Ez Hikmettin Atlî. Min berê we agahdar kiribû. Dixwazim li ser folklorê êzdiyan bi we re hevpeyvînekê bikim.

Xeyrî Bozanî: De baş e. Dibe. Eger zêde dirêj nebit baştir dibe.

Hikmettin Atlî: Mamoste we li ser folklorê êzdiyan xebat kiriye. Gelo win bi giştî folklorê êzdiyan, hevpariya wê bi folklorê kurdên misliman re çawa dinirxînin.

Xeyrî Bozanî: Folklorê êzdiyan, ji ber ku êzîdî, tevî oleke dî nebûne. Zewac û jin û jinxwazî di navbera êzdiya û xeyrî êzdiyan de nabit û tune, ji ber ku deverê ew bi tenê lê dijîn, têkilî xelkekî dî nabe, weke xirîstiyar, misliman, turkuman, têkilî wan nabe, gundên wan taybet in, ber hindê em dikarin bibêjin êzîdiyan heta niha, heta radeyeke gelek gelek baş, parêzvanî li kultûr û folklorê xwe kiriye.

Hikmettin Atlî: Mamoste teza min hem folklor e hem jî nasname ye. Bi ya we civaka êzîdî xwe di nava civaka kurd de li ku derê dibîne? Xwe di navê de dibîne yaxud li derve dibîne? Bi ya we ew çawa pênasê dikin?

Xeyrî Bozanî: Xwe êzîdî, ji aliyê dînî ve êzîdî ne lê ji aliyê netewî ve bêguman êzîdî kurd in. Ji ber ku folklorê wan hemû kurdî ye, kultûrê wan hemû kurdî ye, têkstê ola wan hemû kurdî ne, dua, diroze û her tiştê wan ê olî bi zimanê kurdî, kirmancî ye. Ber vê jî em dikarin bibêjin êzîdî ji aliyê kultûrî û aliyê netewî ve hindê ji kurdên misliman û kurdê dî resen in. Ji ber ku ewan heta niha jî ola wan bi zimanê kurdî ye, talîma wan bi zimanê kurdî ye. Danûstandina wan hemû folklor, kiltûr û cejnê wan, hemû hemû kurdî ne.

Hikmettin Atlî: Mamoste li gorî we civaka êzîdî yan jî win şexsen wekî Xeyrî Bozanî, têkiliya êzdiyati û îslamiyetê çawa dinirxînin? Te dî hin kes dibêjin ku

êzdiyatî ji nava îslamiyetê derketiye û hin kes jî dibêjin beriya îslamiyetê hebûye. Hûn çawa dibînin?

Xeyrî Bozanî: Na. Kurdên misliman ji nava êzdiyatîyê derketine. Belê têkiliyê êzdiyatî û îslamiyetê; xwe êzdiyatî paşmaweya diyaneta mîtraîzmê ye.

Hikmettin Atlî: Mîtraîzim yanê şemsanî mamoste?

Xeyrî Bozanî: Şemsanî belê. Paşmaweya wan e. Heta niha jî eger em berê xwe bidine tîtal û urf û adetê êzdiyan û eger em berê xwe bidine pirtûkên ser mîtraîzmê hatine nivîsîn, em dikarin bibêjin heta zêdeyî ji 85 ji sedê, tiştên êzdiyatî û mîtraîzmê heman tişt in. Eva wekû edet û teqalîd û tîtal û kiltûr û folklor. Wek felsefa olî jî, ew jî zêdetir hev digiritin. Ber vê çendê, êzîdî, kakeî, elewî ev olêt kevnar evêt ku mayine, ew hemû jî paşmawa ola mîtraîzmê ne. Paşmawa ola şemsaniyetê ne. Lê dema ku îslamiyet hatiye, îslamiyet hatiye gihîştîye Mûsil û îja ji Mûsil berew Kurdistan ve pêş ketiye ew hingê bêguman ew êzîdiyên li wir, ew olêt kevin gelek jê bûne misliman lê heta niha jî êzîdî mayine, kakeî mayine, elewî mayine weke xwe. Herçende ku elewiyan bêtir xwe nêzîkê îslamê kirine jî, di rêya Elî kurê Talib de û wekû şîagerî xwe dane naskirin jî, lê eva em karin bibêjin wekû xweparastinê bû.

Hikmettin Atlî: Mamoste di metnên dînî ên êzdiyan de jî em rastî hin kesayetên, şexsiyetên îslamî ten wekî Ebûbekir û Osman heta wekî Yezîd bîn Muawiye. Ev jî gele di wê çarçoveyê de ye? Yanê hewldana xweparastina êzdiyan? Yan jî wateyek wê ya dî heye bi we?

Xeyrî Bozanî: Tenê ev e ji bo xweparastinê bûye ji dewr û berê xwe ne tiştêkî dî ye. Çunkî tu dizanî di jwariya îslamê di wê wextê de gelek gelek bû. Îca mecbûr bûn xwe biparêzin heta niha.

Hikmettin Atlî: Mamoste bi ya wer pirtûkên dînî ên êzdiyan; Mishefa Reş û Kîtabî Cîlwe, te dî hin kes dibêjin ku hene û hin kes jî dibêjin ku eslê wan, orjînalê wan nemaye. Hûn çawa difikirin?

Xeyrî Bozanî: Nexêr tune ne. Ji ber ku ew fermanê bi ser êzdiyan hatin û heta niha fermana dawî ya DAIŞê, bêguman ji ber van fermanan pirtûkên wan gelek tiştê wan hatine hundakirin. Bi sedan sedan ferman bi ser êzdiyan de hatine. Demê

ku ferman tèn, kes nikare pirtûkan biparêze. Xelk xwe, giyanê xwe, zaroyên xwe diparêze. Ber vê çendê jî êzdiyan nekarî van pirtûkên xwe biparêzin. Hebûne lê nekarîne biparêzin heta niha. Ev nusxêd ku derdikevin, hindêk kopya hene ku derdikevin dibêjin evana Mishefa Reş û Cîlwe ye, em vana rast nabînin.

Hikmettin Atlî: Mamoste ev qewl û beytên ku niha hene, evana ji wan kitêban mane yan eleqeya wan bi wan kitêba nîne?

Xeyrî Bozanî: Na. Eva nêzîkî hezara salan hatine nivîsandine. Destê Şêx Fexrî hatiye. Evê hanê çend kesayetiyên oldarê êzdiyan hebûn, şair jî bûn. Bi şîer va tişta jî nivîsîne.

Hikmettin Atlî: Mamoste di folklorê êzdiyan têgiha qizilbaşiyê bi şeklekî nebaşî derbas dibe. Bi ya we xelkê êzîdî çima ji qizilbaşiyê hez nake.

Xeyrî Bozanî: Tu dizanî gelek eşîrên kurdan hebûne di wextê Osmaniyan de, wexta ku ferman li ser êzdiyan radibûn, bêguman leşker, ceş ji Babi Alî nedihat lê van kurdên van deran eşîrê xwe, eskerê xwe dianînin. Êzdiyan qir dikirin. Bi destê wan dihatine kuştin. Bêtir wan te' de li êzdiyan dikir. Ji ber hindê jî gelek caran di stranan de, tekstan de behsê wan bi xirabî tete kirin. Ji ber ku ferman ji destê wan dihat. Ji ber vê çendê behsê wan eşîran yan hindêk wan grûpan tete kirin.

Hikmettin Atlî: Min pirsar qizilbaşên sefewî kir.

Xeyrî Bozanî: Di tekstên olî de na lê di tekstên folklorî de hene ew jî.

Hikmettin Atlî: Mamoste hem di tekstên olî hem jî di tekstên folklorî de ferwar û ferman derdikeve pêş me. Bi ya ev têgih çi ne? Ji hev cuda ne?

Xeyrî Bozanî: Ferman û firwar eynî manê didin. Lê firwar bêtir di aliyê olî de tê bikaranîn. Firman jî di aliye ne olî de, di aliyê dinyayî de tê bikaranîn.

Hikmettin Atlî: Min fam kir mamoste. Mamoste li gorî we di navbera herêmên êzdî de, em bêjin Şêxan, Şengal yan jî Kafkasya, ji aliyê nêrîna etnîk û dînî de cudahî hene yan tune ne?

Xeyrî Bozanî: Na di bingehîn de çu cudahî tune. Lê mikun e ku di diyalektan de hin guherîn bibe. Carina hindêk tiştê civakî de jî guherîn hene lê tiştên bingehîn her eynê ye.

Hikmettin Atlî: Mamoste di nava xelkê êzîdî de, bi ya we girîngiyeke Destana Zembîlfiroş heye yan na?

Xeyrî Bozanî: Destan Zembîlfiroş, Destan Şêxê Sena, Destana Mem û Zîn, ev destan hemû jî di nava folklorê êzdiyan de tekstên wan yê taybet hene.

Hikmettin Atlî: Mamoste li cem me jî Destana Zembîlfiroş heye lê di versiyonên me de, Zembîlfiroş wekî kesayetiyeke mislimanê sunî tê dîtin. Min hin versiyonên nav êzdiyan dî ye ku ew wekî êzdiyek feqîr tê dîtin. Pirsê min jî vî ali ve bû.

Xeyrî Bozanî: Eger em berê xwe bidine sofîzmê, sofî wexta ku digihîje derece û pileyeke bilind, hingê ew kesê sofî, bawerî bi hindê nayîne li ser vî olê yan wî olê ye. Ew bi xwe di navbeyna xwe û Xwedê de tu kesî nabîne. Însanê sofî jî ber wê çendê jî, ewê sofî baweriya wî bi ola tune ye. Îcar her oleke ku hebitin wî li ser xwe hesab dike, belkî elewî li ser xwe hesab bikin, belkî êzîdî jî xwe re hesab bikin, belkî misliman jî xwe re hesab bikin, lê di esasê xwe de, sofîzim wexta ku gihîştê dereceyek bilind, bawerî bi çu ola jî nîne bawerî bi çu pêxembera jî nîne. Ber vê çendî jî her kes wî bi ê xwe dizane û ew jî xwe bi ê kesî nazane.

Hikmettin Atlî: Mamoste bi ya we girîngiya Şêx Hadî ji bo êzdiyan çî ye? Rola wî di nava êzdiyan de çî ye?

Xeyrî Bozanî: Şêx Hadî jî dîsa sofîzim bû. Sofî bû. Malbata wî jî Hekkarî hatiye. Êzîdî bûn. Dema ku ferman û ew çêbûn revîn hatine vê derê. Başûr. Dûre revîn çûn Lubnanê, Bae'lbekê. Şêx Hadî jî li wir jî dayik dibe. Bêguman ew malbata di dawiyê de dibe misliman. Lê Şêx Hadî bi xwe dibe mutesewif û terîqeyek jî bi navê 'Edewî jî xwe re çê dike. Dûre ew tê vedigerê ba bav û kalikê xwe yê berê, di dawî de tê aliyê Lalişê û li wir dimîne. Lê ewê eleqeta xwe bi êzdiya neanî. Lê kura birayê wî navê wî jî Şêx Hadî bû. Ew jî mutesewif bû lê malbata wan bûne êzîdî. Ew Şêx Hadî yê duduyan ew ê ku kurê Şêx Berekat e, ev e di nava êzdiyan de reform çê kir. Şêx Hadî yê ewil ewî tiştê bo êzdiyan nekir. Reforma Şêx Hadiyê duyem di berjeveniyan miletê êzîdî de bû. Ji bo ku xwe jî dewr û bera

xwe biparêzin. Êzdiyatiyê di gelek waran de nêzikî mislimantiyê kirin. Ji bo ku te' de lê neyê kirin.

Hikmettin Atlî: Mamoste di heqê têgiha êzdî, navê êzdî de fikreke we heye? Ji ku tê ev nav?

Xeyrî Bozanî: Êzîdî ji îzed hatiye. Di zimanê kurdî û îranî de bi me'neya xwedawend e, Xwedê. Êzdî ji wê hatiye. Yanê evê ku xwedê diparêzin. Ew tiştên ku lêkolerên ereb dibêjin ne rast in.

Hikmettin Atlî: Mamoste di hin metnên nav êzdiyan de yên folklorî de, wekî Destana Kela Dimdim, Derwêşê Evdî û Edûlê, meriv dibîne ku di versiyonên nav êzdiyan de asta netewî bilind e. Yanê hem nasnameya xwe ya êzdî diparêzin hem jî nasnameya netewî ya kurdî. Di nava kurdên misliman de ev ne wiha ye. Win vê yekê çawa dinirxînin?

Xeyrî Bozanî: Ji ber ku ola êzîdî bi zimanê kurdî hatiye. Êzîdî fêrî ola xwe, êzdiyatiyê dibin bi zimanê xwe. Kurdê me yê sunî, fêrî ola xwe dibin bi zimanekî din. Bi zimanê erebî. Ziman di aliyê neteweyî de fakereke gelekî muhîm e. Girêdana êzdiyan bi kiltûr û folklorê xwe, bi baweriya xwe, bi axa xwe, bi zimanê xwe, gelek zêde ye. Qiblegaha wan Laliş e, ne cihek di wekî kurdên sunî. Kurdên me yên sunî zêde bi kiltûrê erebî ve girêdayî ye, bi çîrokên wan, destanê wan. Lewma jî ev ferq û cudahî heye. Wextî ku êzîdî ola xwe diparêzin hingê otomatîk netewa xwe jî diparêzin.

Hikmettin Atlî: Mamoste di metnên dînî û folklorî yên êzdiyan de têgiha sur gelek derbas dibe. Hun di heqê vê têgihê de tiştek dizanin gelo?

Xeyrî Bozanî: Ev e li gor felsefa dînê êzdiyan dibêjin berê Xwedê yekem car durek çêkir. Ji wê durrê dunya hemû peyda bû. Îca behra wê durrê ketiye însan da jî. Her însanekî surrek di eniya wî de ye. Sur zêde wekî karîzma têt bikaranîn. Her însanekî, hindê ji heybeta xwedê, hindê ji wê surê gihîştîye. Îca wextê ku karên baş dike, sura wî gelek zêde dibit di nava însanan de û xelk çavê xwe bi başî didinê. Ku hindê karên xirab bike, hingê sura wî kêmbê dibe di nava xelk de, heybeta wî kêmbê dibe. Lewma jî gotinek heye, dibêjine êzîdî nabêjin îslam, dibêjine busurman. Busurman ew e yanê ku bê surr man. Yanê sur li ba wan nema wexta ku ola xwe guhartî.

Hikmettin Atlı: Mamoste we got busurman lê ez di hin metnan de rastê surman jî hatim. Ev çi ye bi ya we? Ew jî telefuzekî vê peyvê ye?

Xeyrî Bozanî: Yanê dever ji deverê hindêk cudahiya telafuzê çê dibe. Lê eslê wê busurman e yanê bê sur man. Yanê ew heybet û ew karîzma nema li ba wan ji ber ku ola xwe ber dan û çûne oleke dî. Ev e tê gotin yanê...

Hikmettin Atlı: Mamoste di nava kurdên êzîdî de taybetiyêke Xidir Ilyas heye gelo?

Xeyrî Bozanî: Xidir Ilyas du pêxember in. Ev her du rêz û îhtîrameke gelege mezin ya êzdiyan bo wan heye. Êzîdî ji bo wan sê roja bi rojî dibin. Ê ji bo êzdiyan ew jêderê xêr û bereketê ne.

Hikmettin Atlı: Mamoste wextê we tune. Pirsê min jî hema bêje ev bûn. Gelek spas dikim bo vê hevdîtinê û bo alîkariya we.

Xeyrî Bozanî: Baş e. Ser çava.

Hikmettin Atlı: Ser seran û ser çavan mamoste.

JÎNNAME

Nav-Paşnav: Hikmettin Atlı

Dem û Devera Jidayikbûnê: 20/02/1980-Amed

e-mail: bedranh@gmail.com

Perwerde:

Lîsans: 2008, Zanîngeha Dicleyê, Beşa Ziman û Wêjeya Tirkî

Mastir: 2013, Zanîngeha Mardin-Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Beşa Ziman
û Çanda Kurdî